**Abdullah OCALAN**

**MANÎFESTOYA CIVAKA DEMOKRATÎK**

**Pirtûka Duyemîn**

# ŞARISTANIYA KAPÎTALÎST

**-Serdema Qralên Tazî û Xwedayên Bêmaske-**

**Weşanên Akademîya Zanistên Civakî ya Abdullah OCALAN**

Cihê Çapkirinê: Çapxaneya Azadî
Dîroka Çapkirinê: 2012
Werger: Rêşad Sorgul
Sererastkirin: Luqman Guldivê

**Pirtûka Duyemîn**

# ŞARISTANIYA KAPÎTALÎST

## -Serdema Qralên Tazî û Xwedayên Bêmaske-


**1- DESTPÊK** ........................................................ 7

**2- SEDEMÊN DERKETINA KAPÎTALÎZMÊ** ........................ 23

-DIZÊ MALÊ-

a- Rasyonalîzm ........................................................ 27

b- Ekonomîzm ........................................................ 54

c- Têkiliya wê bi Desthilatdariya Siyasî û bi Huqûqê re ........ 75

d- Mekanê Kapîtalîzmê ............................................ 90

e- Kapîtalîzmû Şaristaniyên Civakî-Dîrokî ....................... 105

**3- KAPÎTALÎZM NE EKONOMÎ DESTHILATDARÎ YE** ............... 127

a- Kapîtalîzm ne ekonomî desthilatdarî ye ...................... 135

b- Agahiyên nîşan didin ku kapîtalîzm ekonomî nîne ........... 141

c- Kapîtalîzm di nava rastiya civakî û şaristaniyê de li ku û çi demê cih digire? ........................................................ 148

d- Dema kapîtalîzm derket rewşa Ewrûpayê ....................... 189

**4- LEVÎATHANÊ HEMDEM: DEWLETA NETEWE** ............................... 195
-Rûyê Xwedê Li Ser Erdê-
a- Pêşketina netewe, diyardeya netewe.................................. 201
b- Binavkirina dewletê ........................................................ 206
c- Îdeolojiya Şaristaniya (Modernîte) Kapîtalîst û
çawa kirin mîna dîn ........................................................ 218
d- Ji bo bîranîna qurbanên qirkirina Cihûyan........................... 228

-Çîroka Qebîleya Ibraniyan-
1- Cihû û Şaristanî ............................................................... 229
2- Îdeolojiya Cihûyan............................................................ 235
3- Milletperestiya Cihûyan..................................................... 238
e- Di modernîteya kapîtalîst de desthilatdarî .......................... 245
f- Modernîteya Kapîtalîst û Dewleta Netewe .......................... 254

**5- ZEMANÊ MODERNÎTEYA KAPÎTALÎST** ......................................... 287
a- Kapîtalîzma Bazirganiya Yekdestdar .................................... 290
b- Serdema Îndustriyalîzmê û Şoreşa Pîşesaziyê ...................... 299
c- Serdema Fînansê-Fermandar Pere ...................................... 319

**6- ENCAM**
GELO ŞARISTANIYA DEWLETDAR DIKARE
BI ŞARISTANIYA DEMOKRATÎK RE LI HEV BIKE? ......................... 343

**Pirtûka Duyemîn**

# ŞARISTANIYA KAPÎTALÎST

**-Serdema Qralên Tazî û Xwedayên Bêmaske-**

## 1- DESTPÊK

Ez wexta hewl didim xwe li dijî sîstema kapîtalîzmê biparêzim yek ji karên pêşî divê ez bikim ew e ku divê ez xwe ji format û qalibên wê yên zêhnî rizgar bikim. Çawa ku di Îslamiyetê de mirov dest bi her karekî dike ‘Bismillah’ dibêje, kapîtalîzm bi xwe jî pîroziyên wê yên bi heman rengî hene. Madem em dixwazin ji wê rizgar bibin, divê berê pêşî em duaya wê ya niyetê qebûl nekin û red bikin. Di serê pîroziyên wê de jî ‘rêbaza zanistî’ ya ku bi darê zorê dide qebûlkirin tê. Ya ku em qala wê dikin, exlaqê azadiyê û etîka wê nîne ku di parzûnkê jiyana civakî re derbasbûye û mirov bê wê nikare bimîne. Berevajî, li ser esasê înkarkirinê jiyana civakî bêmane dike, ew çanda maddî û manewî ya ku rê li ber rizîn û belavbûna civakê vedike zêhniyeta jiyana koledar a herî pêşketî ye.

Ez wexta hewl bidim xwe ji vê xilas bikim, bêguman wê argumanê min ji MIN bi xwe zêdetir tiştekî din nebe. Descartes, bi felsefeya xwe ya bêyî ku haya wî jê hebe pê bingeh ji kapîtalîzmê re pêşkêş dike, ji her tiştî guman dikir, lê yê tenê jê guman nedikir ew bi xwe mabû. Gelo diviyabû ji xwe jî gumanê bike? Ya girîngtir jî ew bû ka çawa ketibû wê rewşê? Em dizanin ku di dîrokê de çend qonaxên dişibin rewşa ku ew jiyan dike hene. Ji aliyê rahibên Sumeran ve avakirina xwedê, gumanên mezin ên pêxember Brahîm der barê xwedê de, mînaka herî dawî jî serhatiya Hz. Muhammed a der barê xwedê de û septîsîzma (gumankarî) Îonya di vê mijarê de ji wan mînakan in ku divê mirov bîne bîra xwe. Di van qonaxên dîrokî de zêhniyetên nû yên ku dikevinê û hem jî yên berê yên her kes ketiye navê û divê bêne redkirin, xwedî wan xisletan e ku dikarin civakê hûrûkûr biguherin û şikilbidinê. Qet nebe paradîgmayên bingehîn pêk tînin. Zêhniyeta berê ya bi kok ku mirov dikare jêre avahiya îdeolojîk jî bibêje, li hemberî şêwazê jiyaneke nû zîl dide, dikeve kêmasiyan û gumana wê ji ber vê yekê ye. Ji bo jiyaneke nû jî qalibên zêhniyetê gelekî zehmet in û

gavavêtinên bi kok yên kesayetiyê jêre hewce dikin. Çi gavavêtineke pêxemberwarî be, çi qonaxeke fîlozofî be, çi jî keşfeke zanistî be, ya rastî hemû jî li bersiva heman pêdiviyê digerin. Qalibên zêhniyeta nû ku bêyî wan nabe, ji bo jiyana nû wê çawa bêne danîn? Gumankariya xeternak xisleta vê qonaxa navberê ye.

Di sedsala 16. deli mekanê ku ji mezinbûneke mayînde yaji kapîtalîzmê re dergûşî kir ango hema hema li Hollandaya îro, li jiyanên balkêş ên mîna Descartes, Spînoza û Erasmûs şopên bi vî rengî yên qonaxên dîrokî hene.

Dîroka jiyana min a ku ji salên 1950'yî dest pê dike ew salên ku pêngava kapîtalîzma global a demê derketiye asta herî bilind e. Li mekanê min bermahiyên qalibên zêhnî yên reh û rîşên xwe digihên serdema neolîtîkê hene û em li erdên xam ên Kevana Zêrîn ên li sîstema çiyayên Toros-Zagrosê li jorê Mezopotamyayê dimînin. Li qûntara van çiyayan şoreşa gund û cotkariyê çêbû û şaristanî derket. Ji van qadên bingehîn neolîtîk derbas bû û bi heybet qurbanî hatin dayîn. Li nêzî Ûrfayê ku mînaka vê yekê ya yekem derket holê, kulta perestgeha bi kevirên mezin ên tîk dor lê hatiye girtin a 12 hezar salan heye.

Wexta ez dibêjim 'ji ber ku notirvanên sîstema kapîtalîst bi awayekî gelekî sîstematîk ji şêweyê Zeus ku Prometheus li zinarên Qafqasan girêda gelekî xirabtir ez li giravaÎmraliyê di girtîgeheke yek kesî de jiyankirinê mehkûm kirim, li ser min ferz e ku ez bi xwe dijberiya xwe ya sîstemê ji hev derxînim'.Bi gotineke din bêyî ku ez van rastiyên dîrokî bînim bîra xwe û ez wan ji nû ve ji hev derxînim, wê haya me ji maneyê nebe. Eger ez herim û werim bela xwe li Komara Tirkiyê bidim wê ti cudahiya xwe ji rewşa conegayê Spanî yê êrîşî rengê sor dike nemîne. Bêguman li vir rola Tirkiyê pê radibe daxistine asta matedorekî. Lewra ev rol danê. Jê dixwazin ku vê rolê timî baş û kêrhatî bi cih bîne. Lê ya divê ez jî bikim ew e

ku ez vê lîstika hov a qralan û xwediyên wê yên rastî tevî rastiya jiyana wan hemûyî bi nav bikim.

Ji bo em nekevin şaşiyek e ku piraniya civakê pê dixape, divê em bi awayekî girîng mînaka Karl Marks li ber çavan bigirin. Marks yek ji wan kesên li rêza pêş e ku dixwest kapîtalîzmê ji hev derxîne û ji wê xilas bibe ku ji vê hîç guman nayê kirin. Lê bi giştî tê qebûlkirin ku guhertinên mezin ên civakî yên ji nêrînên wî îlham girtine, tê zanîn ku nikarîbûne ji kapîtalîzmê bibihurin. Di vê mane û çarçoveyê de ez ê nebim Marksîstekî ehmeq û mirîd.

Wexta ku ez nasnameya xwe bi nav bikim, parametreyên bingehîn ên ez ê bi wan tevbigerim hêjayî fêmkirinê ne. Ew çi ne? Jiyana mirov hînbûyî û bermahiyên zêhniyeta neolîtîkê û derbasbûna neolîtîkê, kulta dewletê û hiyarerşiyên desthilatdariyê yên xwe dispêrin şaristaniya bajêr û herî dawî jî rastiyên lîstika kapîtalîzmê ku di ti dema dîrokê de bi vê mezinahiyê nehatiye dîtin.

Divê mirov behsa qatên hînê jêr jî bike: xisletên mirov ên ji nifş û cinsên din cihê dike; ji bo jiyanê çi hêsan dikin û çi dixin rîskê.

Wexta ez van hevokan datînim, haya min ji cihê min ê di nava sînorên rewabûnê yên kapîtalîzmê de ez tê de têm girtin heye. Ez nikarim înkar û mandel bikim ku ez di nav van sînoran de dijîm an jî dibim Prometeus. Bi vebûnên ku ez her saet li serê diponijm, ez bêhtir hay ji hêza xwe û maneya têde dibim.

Eger em bi mînakên têne zanîn rabin, em ê bibêjin; ji aliyekî ve li ber deriyê desthilatdariya Sasanî Manî, li ber deriyên desthilatdariya Îslamîst Îmam Husên, Hellacê Mensûr û Suhreverdî û ji aliyê din ve rêûresma Îsa bi sedan ezîz û ezîze, her weha qurbanên desthilatdariyê yên ku Bûda û rêûresmawî ji hovîtiya wê reviyan, yên di nava agirê engîzîsyona dêrê re derbasbûn û yên bi hovîtiyên kapîtalîzmê yên di asta qirkirinê de re rûbirû man, tespîtên nivîskî ne ku mînakên zêde beloq û darî çav in. Xisletên hevpar ên van mînakên sereke ew in ku ji bo hayjêbûna jiyanê bi

israr bûn. Nedixwestin li perdeya ku di navbera wan û jiyanê de dihat danîn bialiqin. Gunehê wan ê bi tenê jî ev bû.

Eger dualîteya jiyanê û mirinê di cihekî de hatiye asêkirin, sedema vê ji sedî sed civakî ye. Ya rastî, ne mirineke weke tê gotin û li ber me tê danîn heye, ne jî jiyaneke timî reklama wê tê kirin têkiliya xwe bi jiyanê re heye. Divê em rastiya xwe ya jiyanê ku kirine mîna sîmulasyonê (divê weke teqlîda mekanîk a jiyanê were fêmkirin) fêm bikin. Hema hinekî jî rêz û hurmeta mirov ji jiyanê re hebe, hewce dike mirov ji vê toqa lanetê ya her li dora xwe dizîvire û xwe dubare dike, xwe rizgar bike.

Ez gihîştim şêst saliya xwe. Min hînê jî meraqên xwe yên beriya dibistana seretayî nebihurandine. Ez hînê jî li sînorê wan im. Ez nikarim di nava sînorên ku kapîtalîzmê daniye de mezin bibim. Mîna ku di nava wan sînoran de ji bilî jiyaneke sextekar û bejinbohstî pêve jiyaneke din nîne. Yan jî bi tevahî sîmulasyon, sextekarî, bejinbohstî, xapandin, bêwicdantî, krêtî û cahiltî ye. Lê divê mirov jiyanê di ser her nirxî re payeberz bigire. Esas wezîfeya yê ku dixwaze rast bijî jî fêmkirinajiyanê ye. Mirov fêm bike dikare bijî. Mirov dijî ji bo fêm bike. Li derveyî viya ez yeqîn nakim ku şîroveyeke din a kozmosê hebe. Herçiqas zehmet be ku maneya mutleq di warê pêkhatinê de nêzî nemumkiniyê be jî ez li ser a xwe me ku ya jiyanê dimeşîne rastî bi xwe ye. Ti hêz bi qasî hêza maneyê bi hêz nîne yan jî li hemberî hêza maneyê ji ketina rewşa xwenîşandanên hêza sexte nikare xelas bibe.

Ez dîsa divê li rastiya xwe vegerim. Ev qaşo parametreyên jiyanê, yên min hewl da wan diyar bikim hem nikarîbûn bersivê bidin meraqên min ê jiyanê, hem jî sedemên bingehîn bûn ku ez bikevim şik û gumanên hûrûkûr. Min tenê gumanê ji vana nedikir, di heman demê de dilê min jî ji wan dixeliya.

Kengî parastina maneya jiyanê biqede yan jî bê manetî weke maneyê were pêşkêşkirin, wê pêşî li bûyerên bi kansêr neyê girtin. Sedema vê yekê jî ji sedî sed civakî ye. Tespîta; kansêr

nexweşiyeke civakî ye ku ev rastiyeke ji rêzê ya antropolojiyê ye. Kengî bê manetî hakim bû û maddeya kor dor li şaneyê girt êdî kansêrbûyîn destpê dike.

Ji bo ez bersivê bidim hin pirsên tên pirskirin ez divê hin xusûsan diyar û destnîşan bikim. Ji ber hurmetê divê ez vê bikim. Wexta min dest bi nivîsandina van hevokan dikir, heyeta rêveber a herî jor a Komara Tirkiyê û heyeta herî jor a sîstema kapîtalîzmê rêveberiya DYE'yê digotin 'Em DYE, hukûmetên Tirkî û Iraqê, PKKê dijminê hevpar îlan dikin.' Li gorî ezmûn û tecrûbeyên xwe diviyabû min ev 'îlankirina PKKê weke dijminê hevpar' di çarçoveya maneya cih û dema ku tê de dihatim girtin de hûrûkûr fêm bikira.

Bi vê ravekirinê dixwazim vê bibêjim: şêweyê jiyana kapîtalîst li gorî min nîne. Ez nikarim nebêjim ku hin caran dilê xwe nabijînimê. Lê der barê şêweyê vê jiyanê de bi temamî haya min ji min heye ku şensê min ê serketinê tineye. Haya min ji min heye ku ez nikarim bibim ew 'zir mêrekî' berê hatiye qebûlkirinû bi hev re hatiye qebûlkirin jî. Mirov dikare bibêje; li gorî sîstemê rewşa ez têde me, rewşeke welê ye, dikarin pê bikenin. Lê ez sîstemê xeternak, xwînrij, zordest û mêtinkar dibînim. Di hebûna van diyardeyan de jiyan bi temamî krêt e, dilê mirov dixelîne û tespîtkirina vê di jiyana min a fîlozofîk de divêtiya ev parametreyên min ên dijber an jî paradîgmayê ye. Ez bawer im ku ez xwe qet mezin nîşan nadim. Lê weke mirovekî mafê xweparastinê, hem weke nîşaneya bingehîn a hebûna jiyanê ye, hem jî li hemberî kesên îdîaya wan a jiyana civakî heye, wezîfeya min a bingehîn a exlaqî ye. Ez welatîbûna ku desthilatdarî sînorê wê destnîşan dikin manedar nabînim, lê eger em ê behsa welatîbûneke divê mirov ciddî bibîne bikin, weke hewcedariya exlaqê ez behsa wî dikim, ez ê li hemberî wê jî xwe wezîfedar bibînim. Pirsgirêk jiyîn an jî nejiyîn nîne, ya girîng divê mirov

zanibe rast bijî; her çiqas em nikaribin zêde rast bijîn jî ya girîngtir ew e ku em ji gera li wê negerin, rêwiyên rêya wê bin.

Di dîrokê de bi qasî ku hîç nebûye, di sîstema kapîtalîst de gotin û çalakî ji hev qut in û ji vê jî wêdetir îxanet û bêbextiyeke mezin heye. Di vê sîstemê de gotin,mîna ku timî çalakiyê çewt bikin hene. Çalakî bi qasî ku hîç nebûye di bendîtiya sîstema hegemonîk de mîna amûrekî mekanîk kirine xwediyê rol û ristê.

Eger mirov xwezaya kapîtalîzma ku ketiye qonaxa împaratoriya global, ji hev dernexîne, avakirina form û bernameyên der barê jiyana azad de yên mirov li ser wan difikirin, dikarin ji rê derxînin û ev yek ji gelek mînakên dîrokî dikare bê fêmkirin. Her gotina bê gotin, her çalakiya bê kirin, ango her teorî û pratîk li qada raqibê xwe nikare rolekê bide xwe. Herî kêm çarsed sal in, modernîteya kapîtalîst bi rêûresmekê ketiye rewşeke hegemonîk û li dijî kirin û têgînên wê yên ji dînekî herî fanatîk bûye kultek, mirov bi helwestên pêxemberî, ewliyayî û Bûdîstîk ranebe, wê her mîna ehmeqekî ku aşê sîstemê digerîne bimîne. Analîzên dijberiya kapîtalîzmê gelekî hatin kirin. Di vê qonaxê de hatiye îspatkirin ku divê ev kes bi hosteyî li xwe mikur bên ku piraniya wan bi tenê bi ehmeqî aşê kapîtalîzmê gerandine.

Ez kapîtalîzma xwe gihandiye serê globalîzmê hîç jî bi hêz nabînim. Belkî jî di qonaxa xwe ya herî qels de ye. Ya rastî, lawaz e û her tim mumkin e ku bişkê. Ya nayê kirin ew e ku bi hostayî civak li hemberî wê nayê parastin. Ne ku ez ê bişibînim, lê fena rastiyekê jî em dikarin hegemonyadariya kapîtalîst weke kansêrbûna civakê bi nav bikin û em nikarin wê weke çarenûsên din weke çarenûs şîrove bikin. Divê mirov kapîtalîzmê weke sîstema hegemonîk a herî qels bibîne. Ya hewce dike ew e ku kesayetek bi tenê bimîne jî divê civakîbûn rast û bi hostayî were jiyîn. Di dîrokê de ya her tim hat kirin ew bû ku di têkoşîna li dijî'zilamê bi hêz' yan jî 'hegemon' de bikaranîna sîlehên wî bû. Hem bi têgihîştin û hem jî bi çalakî wekheviya rêbazê di encamê de yê mîna xwe çêdike. Ya ku

diqewime jî ev e. Di têkoşîna li dijî Romayê de gelek Roma derketine. Em berê xwe bidin demên kevintir em ê bibînin, sîteya orjînal Ûrûk hînê jî 'Iraqên Nû' çêdike. Guhertin gelekî kêm e, lê dubare gelekî zêde ye.

Girîng e ku mirov hegemonyayê zêde mezin jî neke. Civak ti carî desthilatdarî, mêtinkarî û zordestiyê bi dil û rizaya xwe qebûl nekirine û bawer nekirine ku bêyî desthilatdariyê nabe. Divê mirov xwe ji têgihîştinên bi vî rengî jî xilas bike: têgînên weke 'civaka nipînû' û 'şêweyên civakan' yên li pey hev tên naşibin hev, têgînên pûç in. Civak weke şêweyekî hebûna cinsê mirov çêdibin, lê weke hev pêş dikevin.

Eger eşq bi awayekî çavkorî be, mirov dixe rewşên rezîlane û dikare mirov bixe rewşên herî cahilane. Ev yek hem di eşqa ji bo desthilatdariyê de û hem jî di eşqa ji bo têkiliya cinsî de jî wisa ye. Lê eger mane li eşqê barkirî be, di asta 'Nîrwana' de ye. Fenafillahî ye; mirov di nava rastiyê de dihele; 'Ena El-Heq' e; civaka azad û adil xwe dike hukumran ango rewşa bi temamî demokrasiyê ye.

Hemin rast e ku min xwe teslîmî civaka gund nekiriye. Ya şaş ew bû ku min moderníteya kapîtalîst weke rohniyê fêm dikir. Wexta mirov dereng ji hev derxîne, civaka gund be jî, hînê demokratîk nebûbe jî, tew jixwe ji qonaxên bingehîn mîna dewleta netewe û îndustriyê dûr be jî ji civaka gund veqetîneke min a radîkal şaşiyeke mezin bû. Yek ji sedemên bingehîn a xemên min ev e. Bavê min ku ez di tehlîlên xwe dekêm navê wî hildidim, bi qasî ku haya wî bi awayekî rast ji enerjiya min a jiyanê çêbûbû, wexta rastiyeke dilêşane li rûyê min digot jî weke diya min mirovekî arifane bû. Peyva wî ya ku weke zaneyekî digot; 'ez bimrim tu yê dilopek rondik jî nerijînî' hînê di bîra min de ye. Ji bawermendên dinya kevn bû. Ji dinya kedê bû û weke cewher mirovekî demokrat bû. Ez hînê jî hûrûkûr diponijim û lêdikolim, ka xwedatiya kapîtalîst çawa evçend bi lanet û xapandin bala min dikişand ser xwe.

Karl Marks zêdetir bi helwesteke pozîtîvîst nêzî kapîtalîzmê dibû û dixwest wisa ji hev derxîne. Ew jî nîvrê ma. Negihîşt ku destê xwe jî bide dewlet û desthilatdariyê. Min ti carî nikarîbû hûrûkûr bi vê helwestê dakevim. Ez diyardeya mêtinkariyê fêm dikim. Lê timî ji min wer dihat ku ew encam e. Ji encamê jî mirov dest pê bike, helwesteke gelekî kêmasiyan dihewîneû ji aliyê polîtîk ve jî tam rewşa bêparastiniyê îfade dike. Ya rastî li ber serê wî şoreşeke mîna pêvajoya şoreşên 1848'an diqewimî. Bi qasî meşa bûrjûwaziyê ber bi desthilatdariyê ve, hilweşîn û veguherîna senyoran jî baş analîz dikir. Têra xwe eleqedariya wî bi ekonomî-polîtîk, felsefe û sosyalîzmê re hebû. Lê diyardeya desthilatdariyê ya xwe ji nû ve organîze kiriye û mîna axtepotekê xwe li piraniya civakê û kedkarê xizan gerandiye, bihêlin ew wê fêm bike, nikarîbû pêşiyê lê bigire ku di encamê de sîstematîka wî bi xwe jî nebe destikê wê. Haya wî jê tinebû ku modela teorîk-pratîk ya pêşniyar dike, hegemonya kapîtalîzmê têra xwe xurt dike. Mînaka herî dawî ya sosyalîzma reel a ku ji Marksîzmê çavkaniya xwe digire jî pratîka Çînê ye, çawa ku bûye çavkaniya herî xurt a palpiştiya kapîtalîzma hegemon a DYE'yê dike. Ev rewş jî têkiliya xwe bi vê hayjixwenebûnê re heye.

Eger hegemontiya kapîtalîst evçend bi hêz e, yek ji sedemên wê yê bingehîn ew e ku rê li ber koletiya mirov bi dilê xwe bikin, vekiriye. Ma îro karkerekî bi tenê heye ku ger heqdesta wî zêde be li dijî xebata bi heqdestê be? Bi rastî jî rewş mirov gelekî xemgîn dike.

Ez wexta li ser têkoşîna li dijî kapîtalîzmê diponijim, timî têkiliya pîrek û zilamî tê bîra min. Eger zilam li gorî atmosfera têde, jiyaneke normal pêşkêşî jina xwe kiribe, zehmet e mirov vê jinê bixe pozîsyona ku li dijî zilamê xwe têbikoşe, ha di vê çarçoveyê de eger karker jî heqdestekî baş bistîne, zehmet e mirov karibe wî bixe pozîsyona têkoşînê li dijî efendiyê wî yê kapîtalîst ê heqdestekî baş dayê. Karkerê ku di berdêla heqdestekî gelekî kêm

de li ber efendiyê xwe yê kapîtalîst xwe qulupanî dike, bihêlin azadbûna wî, wê li dijî piraniyên civakê jî xulamtiya sîstematîka efendiyê xwe bike. Jixwe di demekê de ku artêşa bê karan ref bi ref zêde dibe, karkerekî rewşa xwe misoger kiribe bi qasî karmendekî dewletê belkî jî ji wî wêdetir rewşa xwe ewle û misoger dihesibîne.

Jixwe burokratê dewletê çiqasî dibe proleter, di nav refên proleteran de jî ewqasî burokratbûyîn çêdibe. Çawa ku li jor bûrjûwazade û feodalzade têkel dibin, şiklekî mîna wan li jêr jî di nava karker û karmendan de pêk tê.

Civaka bajêr a weke miqnatîzê ez ji civaka gund ber bi xwe ve kişandim, bi rewşa hatiye analîzkirin ji bo min mekanê bingehîn ê pirsgirêkê ye. Gunehkarê sereke yê ji rizîna civakê di nava xwe de û veqetîna ji hawîrdorê, bajar e û civakîbûna bajêr rê li ber vekirî ye. Ya rastî, civaka bajar a şaristaniya dewletdar a çînî ye. Civaka klan a herî destpêkê jî bi qasî civaka şaristaniya bajêr li hemberî jiyanê cahil nîne. Berevajî, eger civaka bajêr a şaristaniyê di qonaxa kapîtalîzmê de bi temamî veguherîbe kujerekî hawîrdorê, herhal ev rewş xuya ye ji cehaletbûna sîstematîk a bunyeya wê ye.

Eqlê ji mejiyê hisî qut bûye û têkiliya cinsî ya ji zû ve maneya xwe wendakirî, nîşaneyên bingehîn in ku kanserojeniya kapîtalîzmê berçav dikin. Ji bo desthilatdariyê pişta xwe bi nukleera xeternak ve girê dide, ji bo karkeriya erzan bi qasî ku di cîhanê de hilneyê dihêlin şênî zêde bibin, ev bi tevahî têkiliya xwe bi cewherê sîstemê re hene, nexasim jî bi şêweyê desthilatdariya wê ve. Şerên cîhanê, şerên mêtingeriyê û şerên desthilatdariyê yên li hember tevahî civakê, di her astê de tên meşandin û heta rehên zîro civakê bandor dikin, ji bilî îflasa sîstemê xwedî maneyeke din nînin.

Lîberalîzm û ferdiyetparêzî gelek caran weke çarçoveya bingehîn a îdeolojiya kapîtalîzmê tê gotin. Lê ez dikarim îdîa bikim ku ti sîstem bi qasî hegemonya îdeolojîk a kapîtalîzmê nebû xwedî wê hêzê ku ji bo ferd bike êsîrê xwe.

Dikare were gotin;“zimanê tu bi kar tînî weke naverok hînê ji rewatiya sîstemê zêde dûr nîne, tu jî berhemê sîstemê yî”. Lê mekanê ez têde me, di pozîsyoneke welê de ye, hêjayî dijberiya sîstemê ye. Hûrûkûr haya min jê heye ku di şexsê min de antî-kapîtalîstekî baş tê dadgehkirin û dadgeh dike. Gelekî normal e ku ev dadgehkirin qat bi qat ji huqûqê bibihure. Ji çarsed salan û vir ve di aşê hegemonya kapîtalîst debê hejmar çandên gelan hatin hêran, helandin û tinekirin. Mekanê ez lê mezin bûm mîna goristaneke kevn a çandan e. Eger mirov bikole ji her deverekê çandek wê serî bide. Kurdên ku hîn bi temamî xwe negihandine têgînekê ku divê ez jî weke yekî ji wan werim qebûlkirin, li tevahiya vê goristana çandan a bêdeng, mîna şahidan in. Kurdên di dîrokê de hema bêjin navê wan li binê piraniya vedîtinên pêşî hene, niha goristanên wan jî bi wendabûnê re rûbirû ne ku ev yek cihê êş û xemê ye. Hovîtiya îro li Iraqê tê jiyankirin, maneyeke wê ya din jî tolhildana çandan e.

Divê mirov çanda Rojhilata Navîn li hemberî kapîtalîzmê biparêze. Hemin, mirov ji oryantalîzma Rojava nebihure, nikare di wezîfeya xwe de bi ser bikeve. Ji nû ve Îslamtî jî ji serî heta binî ji oryantalîzmeke herî pûç e. Piştî ku mirov bi şîroveyên rastgir û çepgir ji Îslamtî û Oryantalîzmê bibihure wê pirsa bê hişê mirov ev be, ma wekî din li dawiyê çi ma? Jixwe divê ez jî parêznameya xwe ji vê nuqteyê û pêve bikim. Naxwe ez ê jî nikaribim xwe rizgar bikim û bibim berdevkekî vê sîstema ku ji zû ve bûye mîna vereşiyê. Ew nabe parêzname, wê bibe dugîsinkirin û dubarekirineke papaxanwarî.

Mekanê serketinê yê kapîtalîzmê peravên Bakur-Rojavayê Ewrûpayê û girava Ingilistanê bû. Kapîtalîzm meşa xwe ya serketinê çarsed sale di asta sîstema dinyayê de dimeşîne. Mekanê lê dihilkume navenda çandên qedîm Rojhilata Navîn e. Ya rastî, kapîtalîzm bi xwe ewladê dawî yê bê xêr û înkarker ê vê çandê ye. Şerê di navbera wan de ji yê weke tê zanîn kûrtir e. Şerê niha

diqewime yê amatoran e. Mîna kopyayên Skender û Darîûsê Sêyemîn dilîzin. G. W. Bush çiqas Skender be, Ehmedînejad jî ewqasî Darîûs e. Nakokiya diyalektîk gelekî kûr e û bi pir şêweyan diqewime. Nakokî bi tenê di navbera klîkên serwer de nayê ziman. Dijberiya civakê li beramberî desthilatdariyê jî bi awayekî berfireh li ser kar e.

Ya di şexsê min de tê ziman an jî hewl didim bînim ziman bi tevahî şêweyên li dijî desthilatdariyê ne. Kara ku kapîtalîzm vedidize û dibe jî yek ji van şêweyan e. Ji bo mirov li dijî vê be, têrê nake ku mirov sosyalîst be. Jixwe ev bi serê xwe serketinê misoger nake. Eger mirov heta bi tevahiya formên jiyana azad û berxwedanan di zikhev de bi devkî û bi çalakiyan bi awayê orkestrasyonekê hevdeng neke, mirov yan ji 'Laneta Agadeyê' yan jî ji 'Ji Bo Nîppûrê Lorîk' wêdetir nikare biçe.

Dost û hevrêyên min, serhatiyên min weke trajediyeke mezin bi nav dikin. Lê ez dixwazim ew piştrast bin ku ev trajedî nebûya, me yê jiyana azad nas nekiribûya. Di demekê de ku ti tişt pênc qiruşan nake de, ma me yê çawa li rûyê hev binêriya! Ez ewladek bûm ku nedikarî li ser mirina bavê xwe rondikan jî bibarîne, ma minê dikarî behsa kîjan anora jiyanê bikira?Bila şaş neyê fêmkirin. Di sala wê mirinê de min sefera pêşî ya Kurdistanê bi îdeala nasnameyeke azad ji qûntara Çiyayê Agiriyê dabû destpêkirinê. Min bihîst ku Kurdên Serhedê hînê jî her gava wê meşê jî bi pîroztiyê bi bîr tînin. Lê dîsa jî rastiya me bi awayekî xedar li cihê xwe ye. Ji meşa azadiyê ya bi temamî ji sîhûpênc salan wêdetir ez dikarim bibêjim meşa mîna maratonê xwe bi van hevokan bi mane dike. Ev maratona ku her kesê têde cih girtiye, her mekanê wê û her bêhndanûstendina wê ya di buhayê destanekê de wê çawa bi encam bibe?

Eger ez xwedî artêşên mîna yên Skenderwarî bûma û min serketin li pey serketinê bi dest bixista jî ev yek ê ji sedî sed nebûya serketina azadiyê. Jixwe serketinên eskerî, bi piranî ne

serketinê, koletiyê tînin. Kengî bi artêşan xwe, dost û hevrêyên xwe biparêze qîmeteke van serkeftinan heye. Ez parastina xwe ya li dijî serketina desthilatdariyê herî kêm bi qasî parastina xwe li hemberî desthilatdariyê pêwîst dibînim. Eger hebûya jî min ê parastina xwe li hemberî serketinên artêşên xwe weke cîhada herî mezin qebûl bikira.

Di rastî û realîteya me de jiyan li erdê maye, di bin lingan de ye. Bi halê heyî maneya wê bi temamî pûç bûye. Heta mirov bêje bes xwe xapandin û derew, krêtiyeke ku ketiye her qul û deverê û zimanên bi qasî kundan jî nikarin bixwînin; em di rewşeke welê de ne. Eger ez bi tena serê xwe neh salan dikarim di odeyekê de bimînim, ev yek hinekî jî têkiliya xwe bi derve re heye ku ji zîndana Îmraliyê gelekî xirabtir e.

Ez parêznameya xwe bi giştî weke çemê sereke li dijî pêvajoya şaristaniyêamade dikim û ez ê hûrûkûr li ser hegemonkariya kapîtalîst rawestim. Gelek îşaret û nîşane hene ku em bi wan dibînin dawiya sîstemê tê. Zanyarên rastî jî di warê van nîşane û îşaretan de hemfikir in. Pirs jî ew e ku mirovatiyê ji vê kaosê bi kîjan gavên tekûz karibe ber bi civakeke azad, demokratîk û wekhevîxwazve biçe.

Ya rastî sîstema kapîtalîst bi xwe jî hewl dide xwe ji destên xwe xilas bike, ji lewra mirov dikare fêm bike ka çima em bala xwe didin avakirina civakîbûnê. Sosyalîzmên me yên dused salan jî di nava kapîtalê de asîmîle bûn, di vê rewşê de herhal nabe ku aqûbeta me jî bibe weke ya wan şervanên divê mirov girêdayî bîranîna wan be û bi îdealên mezin ên mirovatiyê rabûn. Nabe ku em di nava refên lanet li wan kirî de cih bigirin. Ji vê jî wêdetir, nabe ku em Sokrates, Bûda û Zerdeşt weke ku gotinên xwe yên dawî gotine û bêdeng bûne bihesibînin. Eger ji nû ve em wan bi ruh nekin hingî me ji felsefeya azadiyê ti tişt fêm nekiriye. Wekî din mirovatiyeke dinale heye, heta mirov êşên wê nekewîne, xwezayeke tê talankirin heye, heta mirov vê talanê ranewestîne,

eşqeke bêbextî lê hatiye kirin heye, heta mirov bersiva wê nede, ma mirov dikare behsa kîjan jiyanê bike?

Eger ez qala zanistîbûna parêznameya xwe bikim, gotina min a pêşî pirseke wiha ye; kîjan zanistîtî?

Eger weke hîmê bingehîn zanist 'xwe naskirin' be, hingî berevajiyê tê zanîn zanist û herî zêde jî pozîtîvîzma ku sîstemê weke îdeolojiya fermî qebûl kiriye, ji bo mirov xwe nas neke xwedî rol e. Qonaxên dîn û metafizîkê yên ku pozîtîvîzm gelekî wan rexne dike, belkî jî ji pozîtîvîzmê bêhtir nêzî zanistê ne. Bêguman di serî de zanistên insanî. Jixwe wexta mirov hûrûkûr baş bala xwe bide zanistên xwezayê jî mirov ê bibîne bi analîzên dawî ew jî di kategoriya zanista insanî de tên qebûlkirin. Belkî jî pozîtîvîzm dîn û metafizîka herî seresere ye. Mirovatî di ti qonaxa dîrokî de evqasî bi awayekî hov ji xelekên xwe yên zincîrwarî nebûbû. Dîsa evçend nehatibû asêkirin û girêdan. Li ser civak û xwezayê desthilatdarî evçend nehatibû danîn. Pêkhatina vana bi tenê bi dîn û metafizîka pozîtîvîst mimkun bû.

Mirov heta xwe nas neke, dest bi çi hewldaneke zanistî bike, wê bi felsefe û dînekî dogmatîk bi encam bibe. Bi gotina 'xwenaskirinê' mebesta min fikra mirov dixe navenda xwe nîne. Ez dixwazim bibêjim ku mirov dikare kozmos û kaosê bi tenê bi çavdêriya hundirîn û bi hisên xwe yên ceribandinên hûrûkûr red nakin, fêm bike. Wexta cihê wê bê, ez ê nîşan bidim ku zanista xwe dispêre cihêkirina obje-sûbjeyê çawa koletiyê rewa dike. Ez ê îspat bikim ku objektîvîzm xwe çawa mezin dike an jî ev yek bi xwepiçûkdîtinê re çawa yek e. Ez ê bi heman awayî raber bikim ku objektîvîzma zanistî, alîgiriya hegemonya û kapîtalîzma herî rezîl e jî.

Li gorî felsefeya me, têderxistina maneya di çavê hespekî de heta jihevderxistina maneya di dengê çivîkekê de jiyanê yekpare his dike. Felsefeya me ewçend mane barkirî ye, bi rêz û hurmeta ji zanyarê pîr re dest pê dike, hewl dide ji lêgerîna di çavê keçeke

ciwan a mîna xezaleke bizdonekî de bersivê ji her tiştî re bibîne. Jixwe têgihîştineke seksualîteyê ya ji qirkirinê xirabtir heye. Di encama vê têgihîştinê de cehaleta mezin di çêkirina zarokan de heye. Felsefeya me zanisteke welê dike bingehê xwe ku sedemên vê cehaletê yên di mirov û sîstemên hegemonîk de hûrdikole û hewl dide xelekên beridandinê tevan di xwe de ji hev derxe û çareser bike.

Kapîtalîzmê zanist pêşde nebir, bi kar anî. Di xizmeta desthilatdariyê de bi mebesta karê bikaranîna zanistêji aliyê exlaqî ve ne bi tenê rê li ber rewşên xirab vedike, di heman demê de gelek Hîroşîmayan çêdike. Jiyaneke manedar diqedîne. Jiyana medyatîk û sîmulasyon, gelo serketina zanistê ye? Yan jî manewendakirina jiyanê ye? Ez li vir qala keşfên teknolojîk û zanistî nakim. Ez li vir hewl didim rave bikim ku weke dînê zanistê pozîtîvîzm, zanist nîne.

Heta ku mirov xwe ji hukumraniya zanistî ya pozîtîvîzmê xilas neke, di serî de ya dewleta netewe, xilasbûna ji ti hukumraniya desthilatdariyê mumkin nîne. Di serdema me de pozîtîvîzm dînê rastî yê pûtperestiyê ye.

Weke encam, nexweşiyeke gumankirinê ya Descarteswarî timî zêhnê min keritand. Ez ketim rewşekê welê ku nirx û buhayeke jê bawer bikim û nas bikim, nema. Ji ber ku li aliyekî min çanda berê bi awayekî trajîk wenda dikir, li aliyê din jî li hemberî min modernîzma kapîtalîst weke dêwekî –Levîathan- bilind dibû û tirsa kes nikare xwe bigihînê hebû. Min bi zor û zehmetî ji xwe bawer dikir. Ya rastî, min hewl dida li ser piyan bimînim. Bêguman ev rewşeke seyr û xerîb e. Civak di rewşên bi vî rengî de dizanin rêyekê bibînin ku dil û mejiyê endamên xwe xweş bikin. Ya hînê seyr jî ew bû ku min bawer nedikir civakeke min jî heye. Di van şert û mercan de baweriya min bi malbat û gund nema. Heta bi zanîngehê xwendina min, şoreşgeriya min, dîndariya min a berê hemû, ji bo ku dost û dewrûber bibînin şeklî û xwenîşandan bû. Ez

nîhîlîstekî tûj jî nebûm. Min tiştek ji dil fêm nedikir ku ez pir bi kok jî pêdiviyên wê bi cih bînim. Ya hînê seyrtir jî di serî de mamosteyên min, dewrûbera min ez zîrek û bawermend didîtim. Ez weke nîvdînekî bûm, ya rastî ez ji xwe piştrast nebûm ku bi rastî nîv jî hebûm. Lê wexta ez vedigerim li pey xwe dinêrim, ez dibînim ku ev dema dûrûdirêj jî ewqas bêkêr nebihuriye. Veqetîn û pêve negirêdan, beza ber bi rastiyê ji bo vekirina rûpelekî spî û maneyeke mîna paqijkirina zemîn jî bi xwe re tînin.

Şexsiyeta min bi vê xisleta xwe karîbû baştir avahiya sîstema hegemonîk nas bike. Ez gihîştibûm wê hêzê ku dîrokê jî şîrove bikim. Li şûna ku ez ji rewşa kaotîk bitirsim min karîbû maneyê lê bar bikim û di derketina ji wê de rêyeke îdeal vekir. Piştî ku min dît, baweriyên dogmatîk, li ser xeteke pan û rast gavavêtin, mutleqiyetên zanistî û hukmên hişk çavkaniya xwe heman zêhniyet in, hinekî bêhna min hate ber min. Piştî ku min bi hêsayî di şêweyê tevgera xwezayê ya li cem mirov de xweş dît, bend û sukirê li pêşiya têgihîştina min teqiya. Ew tirs û gumana di bin hîmê xerîbketina min ji min bi xwe de her ku li dawiyê dima, qabîliyeteke bi hêz û têgihîştineke xurt a şîroveyê di her şert û mercên insanî de bi zêdeyî rê dida cesaret û serwextbûnê.

Kapasîteya min hebû ku ez bêyî lêkolîn û lêgerînên hûrûkûr û bêyî ku xwe bispêrim demên konjonkturel, kapîtalîzmê bi xwe weke rejîma krîzê bi nav bikim. Kapîtalîzm qonaxa şaristaniya bingehê xwe dewlet, çîn û bajar e, ev qonaxa dawî ya eqlê mirov gihîştiyê nîne, berevajî ev qonax a bi dawîhatina eqlê berê ye û bi tevahî dewlemendiya xwe derketina eqlê azadiyê ye. Di vê çarçove û maneyê de mirov dikare serdema modernîteya kapîtalîst weke serdemeke hêviyê şîrove bike.

## 2- SEDEMÊN DERKETINA KAPÎTALÎZMÊ

-DIZÊ MALÊ-

Eger mirov kapîtalîzmê weke dînekî di heqê wî de zêde tê axaftin û çalakî têne kirin şîrove bike, dibe ku ji bo em lê serwext bibin bi kêr bê. Mekanê ku kapîtalîzmê serketina xwe lê bi dest xist Ewrûpa ye. Zêhniyeta Ewrûpayê tevî ku der barê kapîtalîzmê de gelek gotinan dibêje û çalakiyan dike, weke di gelek dînan de hatiye dîtin, rastiya hebûna kapîtalîzmê mîstîsîze kiriye. Xirîstiyan, sosyalîst û anarşîst jî di navê de yên weke dijberxuya dikin jî li ser heman xetê çûne. Eqil û fikra navenda wê Ewrûpa ekolek e. Ji sedsala 16'an ve weke sîstema dinyayê pêvajoya hegemonyayê dest pê kirine. Li gorî ponijîna min a şexsî, ev ekoleke wisa ye ku ji avakirina sîstemên xwedayî yên rahibên sumeran qat bi qat bi hostayî karîbûn mîstîfîkasyona rastiya civakê pêş bixînin. Di sîstema fikir û eqlê Rojavayê Ewrûpayê de 'rêbaza zanistî' xwedî roleke bingehîn e.

Mirov jî di navê de, ez behsa zanista hayjêbûna ji xwezayê nakim. Zanist weke xizna hevpar a mirovatiyê bi qasî ku mirov neke malê ti kes, kom, sazî û neteweyî, anonîm e. Mirov ê eger ille behsa pîrozbûneke xwedayî bike, di vê çarçoveyê de mirov vê payeyê bide zanistê wê helwesteke nêzî rastiyê be. Lê belê 'rêbaza zanistî' di termînolojiya Ewrûpayê de xwedî cihekî cuda ye. Ew, prototîpa dîktatorê hemdem e. Ango şêweyê her cure dîktayê yê otorîter û total e. Ya rastî, ew tov e ku dikeve malzarokê. Rêbaz weke peyv tê maneya usûl, rê û terîqetê. Di destpêkê de her çend erênî be û bi kêra qabîliyeta fêmkirinê bê jî demeke dirêj wexta mirov pêve girêdayî bimîne rê li ber dîktatoriyeke zêhnî ya temam vedike. Li ser navê zanistê israra di mijara rêbazê de dikare mirov ber bi dîktatoriya herî bi tehlûke ve bibe. Jixwe dewletdariya netewe ya elman a ku parêzvaniyeke hişk a rêbaza zanistî dikir, çû faşîzmê û ev jî şîroveya me piştrast dike.

Bêguman li Rojavayê Ewrûpayê şoreşeke zêhniyetê pêk hatiye. Lê mirov vê, weke rêvekirinekê ji bo navendparêziya Ewrûpayê şîrove bike şaş e. Jixwe bi tevahî pêşengên vê şoreşê pêşketinên xwe yên zêhnî ji derveyî Ewrûpayê girtine.

Sosyolojiya Max Weber di warê têkilîdanîna rasyonalîzma Ewrûpayê bi pêşketina kapîtalîzmê re bi roleke girîng radibe. Weber di berhema xwe ya bi navê 'Kapîtalîzm û Exlaqê Protestan' de mîna bixwaze derî li vê tezê veke. Tevî ku di pêkhatina kapîtalîzmê de rola rasyonalîteyê yek ji sedemên diyarker e jî bi tena serê xwe mirov bi rasyonalîte û huqûqê vê diyardeyê nikare rave bike.

Di sosyolojiya Karl Marks de weke sîstem serketina kapîtalîzmê bi berhemdariya wê ya ekonomîk ve tê ravekirin. Ji ber ku ji tevahiya şêweyên hilberînê bêtir hildiberîne, nirxa zêde çêdike û werdigerîne sermaye û karê, bi vê qabîliyeta xwe rê li serketina kapîtalîzmê vekiriye. Kêm cih dide dîrok, polîtîka, îdeolojî, huqûq, cografya, çand û şaristaniyê. Mirov dikare van, weke kêmasiyên wî yên bingehîn ên nirxandinê destnîşan bike. Pir bi hêsayî bûye ekoleke ku dikare weke reduksiyonîzma ekonomîk were dîtin. Bêguman mirov nikare qîmeta analîzên sosyo-ekonomîk ji nedîtî ve bê. Lê cihên wan di nava sedemên din de ji ber ku baş nehatine zelalkirin, tevî îdeayên zanistî hemûyan tehlûkeya bikeve dogmatîzmê kêm nabe. Bi piranî ya ku qewimiye jî ji ber van kêmasiyan her tim tehlûke û rîsk hene.

Fikrên ku pêşketina kapîtalîzmê bi desthilatdariyê û bi îfadeya wê ya huqûqî ya bêhtir darî çav 'dewleta modern' ve girê didin, gelek in, ne hindik in. Di nav yekparebûna civakî de kok û rîşên hiyarerşiyên desthilatdariyê diçine gelekî kevn. Rola wan a di rêvebirin û meşandina jiyana maddî de yek ji sedemên bingehîn e. Lê zor bi xwe nikare rê li derketina jiyana maddî, ekonomî û weke serê wan kapîtalîzmê veke. Rolên sererastkirin, pêşdebirin û astengkirinê her tim di zikhev de bûn.

Serketina kapîtalîzmê li Bakur-Rojavayê Ewrûpayê girîngiya faktora cografî û mekanê wê radixe ber çavan. Pirî caran tê gotin ku Amsterdamê jêre dayiktî kiriye. Dîsa jî weke faktorên din cografya jî ji bo ravekirinê bi sînor e. Bêyî ku mirov zêde mezin bike, her tiştî li gorî qîmeta wî deyne, wê rastiya wî jî bi qîmeta wî diyar bibe.

Daxuyaniyên xwe dispêrin faktorên çandî û şaristaniyê hêza wan a şîroveyê nayê guftûgokirin. Kapîtalîzm, esas, di qonaxên pêşketina şaristaniyê de li qonaxa rizînê rast tê. Teza min a ez giraniya xwe didimê ev e. Çemê mezin ê şaristaniyê li devera diherike okyanûsê di heman demê de dawiya vê sîstemê ye jî. Ji bo vê jî bi awayekî sembolîk mirov dikare peravên Amsterdamê û Okyanûsa Atlasê destnîşan bike. Bêguman sîstem ji okyanûsê bihuriye, bi dewleta netewe ya DYE'yê bi hegemonyayeke nû karîbûye xwe bigihîne serê globalîzmê. Ji ber ku jiyan zêdetir ketiye rengekî ferazî û medyatîk, civaka zêde dixwe û xwe nîşan dide bûye serwer, li şûna ku ekonomî bersiva pêdiviyan bide daxwazan har dike, desthilatdarî ketiye heta bi tevahiya demarên zîro yên civakê, îdeologên sîstemê bi xwe behsa bê dîrokbûnê dikin, ev giş eşkere kaos û rizîna sîstemê îfade dikin.

Mirov bê dîrok, bê zeman nikare rastiyê bifikire. Pêşketin, beridandin, pircuretî û cudatî bi dîrokê dibe. Gotina bê serûbinî ji bo şêweyekî tê gotin. Ti şêwe û awa xwedî payeya bê serûbinî nîne. Di şêwegirtina civakan de têgînên mîna bê serûbinî, heta bi qiyametê, pêxemberê dawî, qanûnên naguherin, ji serî heta dawiyê û pêşketina bê dawî zêdetir bi dogmatîkbûna bawerî û fikrê re eleqedar e, di vê de hewldanên ji bo desthilatdariyeke mayînde û derdorên xwedî paye ji bo berjewendiyên xwe dewamî bikin, rol lîstine. Di vê de bi propagandayê baweriya cewherî bidestxistinû mayîndekirina berjewendiyan esas e. Lîberalîzma ku îdeolojiya navendîya kapîtalîzmê ye, îdeaya wê ya bibe gotina dawî ya bê serûbinîbûnê, dubareya heman lîstikê ya modernîstîk e.

Wexta mirov kapîtalîzmê bi nav bike, divê weke fikir û çalakiyeke nayê guhertin, afirandîû xwedî yek navend e destnîşan neke. Ya rastî, di civakê de potansiyela berhemê zêde çiqasî pir bibe, komên di telş û terkan de kurtêlên civakê dikeritînin û ji vê çalakiya wan a sîstematîkbûyî re mirov dikare bibêje kapîtalîzm. Hejmara van kesan ti carî ji sedî yek û dudiyê civakê derbas nake. Hêza xwe ji firsendkarî û rêxistiniya xwe digirin. Ji ber ku li ser mekan xwe baş bi rêxistin dikin, di nava neqebên civakê de ku telşê wê hîn mezin dibin pêdiviyan dixin kontrolê, di meseleya erz û daxwazê de bi buhayan dilîzin û bi vî awayî serketina xwe bi dest dixin. Eger hêzên fermî yên civakê wan nexin kontrolê, berevajî wê ji îhtîkara (spekulasyon) wan bibin deyndar û di berdêlê de timî xwe bi îltîzaman (xwedî derketina neheq) xwedî bikin, ev komên piçûk ku di her civakê de hene wê weke efendiyên nû yên civakê bikaribin rewa bibin. Di tevahiya dîroka şaristaniyê de, nexasim di tevahiya civakên Rojhilata Navîn de komên bi vî rengî yên marjînal ên faîzxur û îhtîkarê her hebûn. Ji ber ku her tim civakê ji wan nefret dikir newêrîbûn ji telş û terkan derkevin. Rêveberên herî zordest ên civakê jî tu kes nikarîbûn van koman rewa bikin. Ne tenê kêm û piçûk hatine dîtin, di heman demê de weke hêza herî bi tehlûke û hêza dejenere hatine nirxandin. Her weha ji aliyê exlaqî ve weke tovê xirabiyê hatine hesibandin.

Di dîroka mirovatiyê de bi qasî çarsed salên bi navend Rojavayê Ewrûpayê şer, talan, komkujî, mêtinkarî û xirakirina xwezayê ti carî evqas nehatiye dîtin û ev yek têkiliya xwe bi sîstema hegemonîk re heye. Bêguman dîsa heman cografyayê şahidî li têkoşînên mezin ên dijber kiriye. Ev pêvajo ji bo mirovatiyê bi tevahî weke xisarekê nabe ku bê dîtin.

Ya ez dixwazim bikim ew e ku destketiyên mirovatiyê yên Rojava bi nirxên pozîtîf ên qedîm ên Rojhilat re sentez bikim û qevdeke tîrêjên rohniyê bidim pêngaveke manedar.

**A- Rasyonalîzm**

Kapîtalîzm di derketina xwe de roleke sereke dide rasyonalîzmê. Em di vê qonaxê de dibin şahidê kategoriyeke bi navê şêwazê fikrê yê Rojava. Rasyonalîzm mîna vedîtineke civaka Rojava be tê nîşandan. Li gorî vê feraziya Rojava civakên di tevahiya dîrokê de ji aqil mehrûm mane. Tê gotin ku Rojava aqlê xwe bi kar anîne û zanist afirandine; wexta îspat bûye ku zanist jî hêz e, êdî hegemonîktiya sîstemê jî bivê nevê pêk hatiye. Jixwe roja îro bi sedema ku bi hegemonyayeke çavkaniya xwe aqil e, dor li me hatiye girtin, cîddiyeta vê îdîayê jî nîşan dide. Lê ji bo em aqlê vê sîstema ku xwe bi polîtîka xeternak a nukleerê li ser piyan digire bi nav bikin, divê em berê pêşî aqil bi xwe û weke cinsekî biyolojîk xisletên mirov ji cinsên din cihêwaz dike bi nav bikin.

Mirov dikare ji du milan ve nêzî pirsê bibe: weke cinsekî biyolojîk û pêşketina civakî. Divê mirov bi awayekî herdu şêwe hevdu temam bikin û wan bigihîne hevdu bi nav bike.

1- Weke cinsekî biyolojîk mumkin e behsa zêhnê mirov were kirin. Ji bo mirov karibe bi hostatî li mijarê temaşe bike divê mirov di sîstema zindiyan de bi pîvanên makro û mîkro bipirse ka aqil di çarçoveyeke gerdûnî de xwedî çi maneyê ye. Fikrên di çarçoveya perçikên jêr atoman de têne hûnandin pircuretiyê, cudatiyê û tevî van ji bo ravekirina pêşketinê bivê nevê mirov pêwîst e behsa aqil bike. Motora sereke ya tevahiya pêşketinên di gerdûnê de li mekanekî piçûk ê bi qasî atomê û dîsa bi lezên ku mirov nikaribe bifikire bi tevgerên pircure yê pêlan û perçikan vediguherin hev û bi vî awayî rê li pêşketinê vedibe. Ne tenê di alemajêr atomê de, di alemên fizîkî û biyolojîk de jî pêşketin weke pircuretiyê di vê çarçoveyê de diqewimin. Haya me ji me hebe ku em di nava sînorên metafizîkê de digerin.

Em bi heman rengî dikarin gerdûna makro jî bigirin dest. Gerdûn bi xwe bi kategoriyên mîna zindî-nezindî, bi dawî-bêdawî, cuda-wekhev, madde-enerjî, dahvdan-kişandin hebûna hebûnan e.

Ango yekpare ye. Jêr atom û jor gerdûn dualîteya diyalektîk a bingehîn a heman yekpareyê ne. Zeman bi yekîtiya kûrahî û berfirehiya mekan diqewime yan jî wan dide fêmkirin û nîşan dide. Pirsa çima gerdûn heye têgihîştina metafizîkê tîne hişê mirov, lê mirov nikare bibêje pirseke tewş e, an jî li cih nîne. Em ji bîr nekin ku yê pirsê dike mirov e, ew jî civakî ye. Fenomenolojî ji hiskirinên me wêdetir ji hebûnan zêde bawer nake. Em çiqasî his dikin û heta em difikirin em ewqasî jî hene. Metafizîk jî bi xwe hebûnek e, bi his û fikrê xuya dibe. Haya min ji vê dualîteyê heye ku çiqasî mirovî heyranî xwe dike û bi girîngî destnîşan dikim ku divê mirov wê ji hev derxîne û jê bibihure. Wer xuyaye ku mirov bi van dualîteyan nikare gerdûnê fêm bike. Cihêkirina fikir û bedenê felsefeyeke herî zêde jiyanê înkar dike û heta jirêderketineke dînî ye. Pirsgirêkeke welê ya gerdûnê tineye.

Em di rêxistinkirina zindiyê herî pêşneketî de jî hêmanekî seyr ê mejî dibînin. Xisleta pêşî ya em dibînin ew e ku ev mejî xwe di nav kêliyan de dabeş dike û bi vî awayî meyla xwe ya bê dawîbûnê nîşan dide. Ti zindiyê pêşî xwe çêkiriye tine nebûye. Berxwedana vî zindiyê xwe bi xwe çêkiriye, herî dawî weke cinsê mirov rê li potansiyela mejî vekiriye. Potansiyela di şaneyekê de pêkhatina zindîtiyê, çawa çêbû ku weke mirov xwe kir pircure û rê li zindiyekî muazam ê xwedî jîrekiyê, mirov vekir? Dibe ku ne tenê ji bo şaneya zindî, heta ji bo gerdûnên herî mîkro jî xwe zêdekirin, bi hawîrdorê xwe xwedîkirin û ji bo vê jî xweparastin esas e. Perçikên jêr atoman bi awayekî tine nebin zêde dibin, pêdiviyên xwe yên zêdebûnê û xwe xwedîkirinê dibe ku bi tenê bi vî şêweyê gerdûnên mîkro pêk tînin. Sînorên wan ên ku wan sînordar dikin, yên ewlekarî, xwe-xwedîkirin û bêserûbinî-pirbûnê ne. Em bi kêmanî be jî dikarin bersiva pirsa xwe ya der barê mejiyê gerdûnê de li vir bibînin. Em vê gerdûnê li derveyî xwe nebînin. Gerdûnên em behsa wan dikin li hawîrdora me tijî ne û dor li me girtine. Dibe ku gera me ya li ewlekarî, xwedîkirin û pirbûnê bi van gerdûnên mîkro vê

dinya me ya yekbûyî îfade dike. Belkî gerdûna makro jî bi heman awayî heye û xwe çêdike. Ew (gerdûna makro) di nava sînorên bêserûbinî de bi awayekî ku zorê bide zeman û mekan di mejiyekî ewle û mezinbûnê de biryardar e. Heye ku gerdûna makro jî xwe di mejiyê mirov de nîşan dide.

Haya min ji min heye ku ez zêde mijarê dihûnim. Lê em nikarin potansiyela mejî ya mirov weke ji tine peyda bûbe şîrove bikin. Em çiqasî dikarin bi hebûn û beridandinê mejiyekî neberbiçav bifikirin? Mirov mejî weke ku bi tenê xisleteke mirov be, bibîne çiqasî rastbîn e? Mirin bi xwe jî ji bo jiyan an jî hebûn were fêmkirin weke ku pêdivî pê heye tê qebûlkirin. Em têderdixin ku mirin nebûya, haya me wê ji jiyanê nebûya. Bêyî guherînê jiyana bêdawî, ya rastî nejiyîn e. Ji ber ku di rewşekê de haya mirov ji tiştekî nebe, di wê rewşê de ti tişt nîne. Di vê rewşê de jî ya rastî mirin ji bo jiyanê weke pêdiviyeke hewcedarî pê heye xuya dike. Baş e, mirin a divê weke nîmetekî were dîtin, çima mîna dawiya jiyanê bê em jê ditirsin? Li şûna ku em jê bitirsin, em hewl bidin, jiyana ew dike ku mumkin be, fêm bikin. Ji wir jî mirov biçe encamê û li gorî vê yekê tevlî gerdûnê bibe, baştir e. Mirov çawa nikare ji destê mirinê xilas bibe, mirov nikare ji destê jiyanê jî xilas bibe. Ya rastî, bi van dualîteyan em dikarin bi sira gerdûnê derxin û ev weke armanca yekane li pêşiya me xuya dike.

Baş e, piştî ku ev dualîte ji hev hat derxistin, mirov wexta xwe bigihîne maneya jiyaneke hosteyane hingî ya diqewime û bi cih tê çi ye? Ev pirs ji bo min hem tewş e, hem jî gelekî hewce ye. Kengî mirov bigihîje sira gerdûnê hingî mirov dikare behsa serketina dawî ya jiyanê bike. Çi cenneta di Pirtûkên Pîroz de, çi jî di Bûdîzmê de xwe gihandina Nîrwanayê, yan jî di tesewifê de rewşa tam a wecdê mirov dikare weke pîrozkirina jiyanê û rewşa timî pîrozkirina cejn û roşanê şîrove bike.

Hin fikirkarên Rojavayî, li gor çavdêriyên tên zanîn gotine; jiyaneke bi sînor a li dinya me bi temamî xweber pêk hatiye û

kengî sîstema rojê biqede wê dinya me jî di nava kozmogoniyekê bêmane de wenda bibe. Ev jî dişibe tesewireke mîna ya cehennemê. Hêmanên ku hûnandina bi vî rengî jî xwe disipêriyê, hene. Lê ev, îdeaya jihevderxistina jiyanê hûnandineke herî bêber e. Em ne tam bi gerdûnê dizanin, ne jî em maneya jiyanê bi hostayî dizanin. Sedemên hûnandina dabaşan bi vî awayî têra xwe bi hêz nînin. Dinya me bi xwe çawa ku rê nade jiyaneke têra xwe rewşa wê ya hebûnê tineye, bi wî rengî jî biqasî ku li gorî potansiyela xwe atmosfera jiyanê ji her ruhberê dema wê hatî re çêbike, zindî û adil e.

Pir girîng e ku mirov çîroka çêbûnê ya cinsê mirov neke eznavend û neke ji rêzê, naxwe ev yek ê ji gera gerdûnê ya seyr re bibe bê hurmetî. Metafizîka herî xirab pozîtîvîzm e ku mirov ji tevahiya gerdûnê şûştiye û hewl daye behsa wî bike. Ez yeqîn dikim, em kengî pozîtîvîzma ku materyalîzma herî çor e, têkiliya wê bi kapîtalîzmê re destnîşan bikin, em ê manedartir û ewqasî jî bi rêz nêzî jiyanê bibin.

Weke encam; wer xuya ye, weke cinsekî biyolojîk mirov di gerdûnê de herî zêde xwedî şens e ku hay ji gerdûnê hebe. Mirov haya xwe ji vê potansiyelê hebe tiştek e, bi cih anîna wê tiştekî din e. Di fikra Rojhilat de gotina 'çi hebe di mirov de ye' mîna ku haya xwe ji vê rastiyê heye. Divê ez dubare bînim ziman ku fikra ber bi navend-mirov ve çûye, zindî-nezindî bi tevahî xwezayên din di xizmeta mirov de dibîne ku ev têgihîştina zemînê felsefa têgihîştina desthilatdariya totalîter, otorîter û hiyarerşîk e, diyar e mirov digihîne aqlekî hûnandinê yê herî zêde ji jiyanê dûr. Ya rastî, ev yek berhema aqil e. Hin aqlên berevajî xuya dikin jî hene. Hin felsefeyên ekolojîst  ên ku mirov bi tevahî bela serê xwezayê dibînin jî di encamê de ji têgihîştinên ku me qala wan kirî dûr nînin. Felsefeya ku mirov weke belayeke serê xwezayê dibîne, têkiliya wê bi jiyanê re qels bûye û bêber e. Eger qîmetê nede beridandineke heta gihîştiye mirov, wê wextê yan tayê wê yê bi

jiyanê re zirav bûye li ber qetînê ye, yan jî têkildarî sîstemên li ser hîmê mêtinkariyeke zêde hatine hûnandin e.

Beridandineke gihîştiye sînorê mirov, pirsên gelekî ciddî yên exlaqî datîne pêşiya me. Beriya ku em derbasî vê mijarê bibin, divê em bikaribin têkiliya aqil a bi civakê re rave bikin.

2- Cinsê mirov potansiyela xwe ya mejî çendîn bike civakî, xwediyê wê qabîliyetê ye ku wê karibe vê potansiyela xwe ya mejî nîşan bide. Ya girîngtir, çêbûna mirov a biyolojîk civakîbûnê ferz dike. Civakîbûneke ku di ti zindiyên din de nayê dîtin, mirov neçarî wê ye. Zarokeke mirov piştî panzdeh salan dikare ji zaroktiyê derkeve ku ev pêvajo jî bêyî civakîbûnê nayê bihurandin. Zarok pir qels ji malzaroka diya xwe dibe. Çêlikên heywanên din di nava çend rojan de heta di demên hin kin de dikarin jiyana xwe bi xwe tedarik bikin. Civakîbûna mirov gelekî tevlîhev e û divê hûrûkûr bê fêmkirin. Cinsê mirov ê civakbûna xwe wenda bike, yan wê weke cinsekî nêzî meymûnê ji nû ve biberide ku ev beridandineke berevajî ye û mumkin e; yan jî wê tine bibe. Bi tevahî zindî hem weke cins, hem jî weke tevahiya cinsan hewcedariya xwe bi bihevrebûneke xweser dibînin. Civak xweseriyeke cinsê mirov e û ji bihevrebûnê wêdetir xwediyê xisleteke hebûnê ye.

Weke têgînekê civak mîna xwezaya duyemîn tê binavkirin ku ev helwesteke hîn hûrûkûr e. Kengî potansiyela mejî dikeve pêvajoya çalak, civakîbûn destpê dike. Ji bo kom û civatê timî hewcedarî bi fikrê heye. Pêşketina civakî ya esas pêşketina fikrê ye. Bi wê derfet û îmkanê wê yê hebûnê çêdibin. Civakîbûn çiqasî mezin dibe, ewlekarî, zêdebûn û xwe xwedîkirin jî ewqasî pêş dikeve. Ez dixwazim bi awayekî eşkeretir bibêjim; ewlekarî, zêdebûn û xwe xwedîkirin li cem tevahiya zindiyan nîşaneya aqil e. Bi awayekî herî çor, hînbûna bi ajoyên hundirî ne. Tevgerên hînbûnê yên tevgerên zindî ne. Eger em ji bo giştî bibêjin; bi tevahî pêşketina gerdûnê mejî û hînbûnê tîne hişê mirov. Weke xwezaya

duyemîn civak, bi şiklekî qonaxa jor a xwezaya yekemîn an jî rûyê wê yê xuya dike ye.

Ez yeqîn dikim, eger weke xwezaya duyemîn em civakîbûnê ji hev dernexin, di pêkhatina çalakî û fikrên li ser xwezaya yekemîn de wê jirêderketineke bi tehlûke hebe. Madem mirov berhema xwezaya duyemîn e, wê wextê divê pêşî mirov hewl bide wê xwezayê fêm bike da ku li insên serwext bibe. Ji lewra ez razî nebûme ku objektîvtiya zanista xweser bi xwezaya yekemîn re mijûl dibe, bêyî xwezaya duyemîn karibe bi cih were anîn. Evtimî ji min re wisa tê ku weke jirêderketinê ye. Ez difikirim ku fizîk, kîmya û heta zanista biyolojiyê, nabe ku ji xwezaya duyemîn û ji zanista xweserî mirov serbixwe bin. Haya min ji min heye ku ez li peravên qanûnên dînî digerim. Lê di vir de pirsa bingehîn a divê bersiva wê bê dayîn heye. Ev pirs jî ev e; bi tevahî qanûnên xweserî xwezaya yekemîn bi navbeynkariya xwezaya duyemîn bi mirov têne ziman, gelo di rewşeke welê de çi maneya cihêkirina obje-sûbje heye? Mirov çiqasî dikare yê zane û tê zanîn ji hev bike? Pirsa hînê dijwartir jî ev e; gelo mirov zane û ya tê zanîn weke obje-sûbje bike dualîte, hingî ev nabe jirêderxistineke bingehîn? Li gorî min mirov xwezaya yekemîn û duyemîn weke obje û sûbjeyê deyne, bi tevahî hîmê rêveçûnên xweser ên çewt û pêvajoyên êşê bi civakan dikişînin datîne. Ev sîstema mentiq an jî hînbûna fikrê bi sîstema kapîtalîzmê tevahiya civakê dixe bin esaret û mêtingeriyê. Ya hînê xirabtir, ev mentiq heman zordestî û mêtingeriyê li ser tevahiya hêmanên xwezaya yekemîn belav dike û xwe ji vê dûr nagire.

Civakîbûyîn ku ji bo rewşa trajîk a cinsê mirov weke çareseriyekê ket dewrê, di gelek qonaxên diyar de gav ber bi pêş ve avêtin û di vê yekê de hem di bunyeya civakê de û hem jî li ser hawîrdora xwezayî bû pirsgirêk. Em niha dikarin bibêjin ku em ê paşê di serî de pirsgirêkên aboriyê û sedemên din ên sereke bi nav bikin û niha em ê bûyerên di asta zêhniyetê de şîrove bikin.

Pir girîng e ku mirov tespît bike, hêza zêhnî ya di encama beridandina biyolojîk de digihîje mejiyê mirov, bi beridandina civakî hem çalak û hem jî jê cihê dibe. Min berê jî diyar kiribû ku civakîbûn bi xwe rewşeke zêhnî ya ji xew şiyar dibe û timî dixebite mumkin dike. Wexta zêhn timî bixebite bi awayekî xwezayî weke encameke beridandinê mejî jî pêş dikeve. Herçiqasî demeke dirêj biçe jî jiyana civakî ya çalak, ji bo pêşketina zêhnî sedema bingehîn e. Ravekirinên der barê dehayên şexsî de mirov nikare zêde pê bawer bibe. Di bin her rewşa mejî de xweseriya civakî heye.

Em ji agahiyên xwe yên antropolîjîk dizanin ku beşekî mezin ê jiyana civakî ya mirov bi nêçîrê û berhevkirina pincaran bihuriye û mirov bi cinsên nêzî xwe re bi zimanê sembolan têkilî daniye. Di vê qonaxê de em nikarin behsa pirsgirêkeke ciddî ya civakî bikin. Bi awayekî xwezayî beridandin hukmê xwe dike û bi weznekê dimeşîne. Asta mejiyê wê hisî ye. Ya rastî, karektera hisî ya mejî serdest e. Xisleta bingehîn a mejiyê hisî jî ew e ku bi refleksan dixebite. Xwestek an jî ajoyên hundirîn jî mejiyê hisî ye. Lê ev cureyê herî kevn ê mejî ye û mirov dikare heta zindiyê pêşî yê yekşane biçe. Bi awayekî dixebite ku li hemberî hişyarkirinên ji nişkê ve refleksan nîşan dide. Mîna ku bi awayekî otomatîk bixebite tevdigere. Bi vî şêwazî, pêdiviya parastinê bi awayekî herî kêrhatî bi cih tîne. Em vî şêwazî li cem nebatan jî bi hêsanî dikarin bibînin. Li cem mirov digihîje şêweyê herî pêşketî. Mejiyekî bi pênc hisan û koordînasyona di nava wan de bi qasî li cem mirov li cem ti zindiyên din pêş neketiye. Bêguman hisa dîtin, deng û tahmê li cem gelek zindiyan ji ya mirov pêşketîtir e. Lê di warê pênc hisên komple û koordîneyî de mirov li pêş e.

Xisleta herî girîng a mejiyê hisî têkiliya wî ya bi jiyanê re ye. Fonksiyona wî ya bingehîn parastina jiyanê ye. Di warê parastina jiyanê de gelekî pêş ketiye. Ev aliyê wî divê hîç biçûk neyê dîtin. Hema bêjin hîç şaşiyê nake. Ez vê yekê bi maneya yekser bersivdana wî dibêjim. Bêparbûna ji vî mejiyî di jiyanê de têra xwe

rê li tehlûkeyan vedike. Nirxdan û rêza ji jiyanê re bi asta pêşketina mejiyê hisî re têkildar e. Tewazun û wezna di xwezayê de li ber çav digire. Mirov jêre dikare bibêje; mejiyê jiyana xwezayî mumkin dike. Em dinya xwe ya hisan bi temamî deyndarê cureyê vî mejiyî ne.

Li cem cinsê mirov pêşketina komple ya mejiyê hisî, şensê têkilîdanîna di navbera hisan de zêde dike. Di serî de hisên dîtin, deng û tahmê di nava xwe de hev his dikin û tevgerên jîr datînin. Komên mirovan demeke dirêj bi zimanê işaretan bi hev re danûstendin, piştî ku şertên fîzyolojîk ên axaftinê pêşketin xwe gihandin zimanê 'sembolan'.Zimanê sembolan hîmê xwe li ser peyvan e. Bi van peyvan fikra neberçav pêş dikeve. Li şûna îşaretan bi têgînan danûstendin di dîroka mirovatiyê de şoreşeke mezin e. Êdî ya mirov divê bike ew e ku nav li obje û bûyerên bersiva pêdiviyên wî dide bike. Navlêkirin qonaxeke mezin e. Têkiliyên di navbera navên curbecur de bi xwe re çêbûna têgînan pêş dixîne. Çi xisletên objeyên bi nav têne temsîlkirin, çi jî fonksiyonên di nava wan de rê li ber lêker û daçekan vedikin. Bi hevokdanînê re şoreşa ziman bi ser ketiye.

Ev şêweyekî nû yê fikrê ye. Di zêhn de bicihkirina peyvan, mumkin dike ku mirov bêyî obje û bûyeran li ser wan bihizire. Em li destpêka pêkhatina mejiyê dikare bûyeran bihûnîne ango ev mejî dikare teoriyê bike ne. Ev pêşketineke mezin e. Aliyê çepê yê mejî beşê loba pêş bi vî cinsê mejî dibe pispor. Bi qasî aliyê xwe yê kêrhatî, ev beş dikare rê li ber rewşên bi tehlûke jî veke. Yek ji xisleta wî ew e ku ji hisan qut dixebite. Mirov dikare vî mejiyî weke FIKRA ANALÎTÎK an jî mejiyê bûyeran dihûne jî bi nav bike. Mejiyê analîtîk an jî aqil avantaja wîya herî mezin ew e ku bêyî xwe biwestîne, dema pêwîst bike dikare di heqê tevahiya gerdûnê de bifikire. Qabîliyeteke wisa ye ku bê sînor dikare xeyalan bike. Mejiyê analîtîk bi awayekî pir seyr dikare dinya form û qaliban biafirîne. Qabîliyeta wî ya pîlan, dafik û bêbextiyê bi pêş dikeve.

Dikare xwezayê teqlîd bike û her cure vedîtinê peyda bike. Bi pîlan dikare dafikê vedeû bi her cure bêbextiyê bigihîje xwesteka xwe, ev jî li derve û hundirê civakê wî dike çavkaniya sereke ya her cure pirsgirêkan.

Pêşketina mejiyê analîtîk û hisî di nav hev de xwesertî û fazîleteke mirov e. Lê yagirîngtir ew e ka mejiyê analîtîk wê bi çi armancê were bikaranîn. Hînê di qonaxên pêşî de haya civakê ji vê dualîteyê çêbûye. Bersiva civakê ji vê re weke prensîba bingehîn a rêxistiniyê, EXLAQ e. Eger exlaqê civakê tinebe bi mejiyê analîtîk re nikare serî derxe. Mînak kesekî bi ber hisa hêrsbûnê bikeve, hinekî mejiyê analîtîk bixebitîne her zindî û koma mirovan a li dij e, dikare tine bike. Li hemberî vê tehlûkeyê, civakê exlaq weke prensîbeke bivê nevê qebûl kiriye û xwestiye serî bi vê tehlûkeyê re derxe. Her komê xwestiye endamên xwe pir bi exlaq mezin bike û ev yek weke wezîfeya sereke erê kiriye. Di exlaq de veqetîna 'qencî û xirabî' ku dualîteya bingehîn e têkiliya xwe bi fonksiyona vî mejiyê analîtîk re heye. Eger mejiyê analîtîk kêrhatî bixebite ji aliyê exlaqê qenc ve tê xelatkirin û na eger bi zirar bixebite weke exlaqê xirab tê mehkûmkirin. Ya rastî, xirabî weke tiştekî divê di ti exlaqî de tinebe, tê tepisandin û cezakirin, heta exlaqê qênciyê bibe yê sereke.

Lê belê ev çareya civakê ji sedî sed nabe bendeke ku pêşiyê li vê tehlûkeyê bigire. Di telş û terkên civakê de her tim kesên xasûk dahfikan vedidin û yên li kirina bêbextiyan digerin wê hebin. Jixwe di vê de rola çandeke pir kevin heye: NÊÇÎRVANÎ. Prensîba çanda nêçîrvaniyê li dijî zindiyên din dahfikvedan û bêbextî ye. Ev çand rîş û rehên xwe di alema heywan û nebatan de jî heye. Ev reh û rîş di heman demê de reh û rîşên biyolojîk ên mejiyê analîtîk in jî. Ev çanda nêçîrvaniyê ku li cem civaka mirov hîn cuda ye, bi pêşketina mejiyê analîtîk re dibe yek, bi wî re sentez dike û di bunyeya civakî û hawîrdora ekolojîk de pir zû dibe tebeqeyek û kêrhatin an jî hêza avakirina hiyarerşiyek bi dest dixe. Felaketê bi vî awayî destpê

kiriye. Dualîteya cennet-cehennemê bi hiyarerşiya civakî ya mejiyê analîtîk bi hev re dimeşin. Di civaka hiyarerşîk de komikeke 'zilamên bi hêz' li ser civakê konê xwe vedigirin û rê li texeyula jiyana cennetwarî vedikin, ji bo civaka li jêr jî rêya cehennemê tê vekirin ku bi giranî, sedem û derketina wê civak fêm nake.

Li hemberî zilamê bi hêz qurbana pêşî jin e. Ji ber têkiliya xwe ya bi jiyanê re mejiyê jinê yê hisî hînê pêşketîtir e. Bi kedeke bi êşê strayî, weke diya zarokan, berpirsiyara sereke ya jiyanê ye. Bi qasî ku haya wê ji jiyanê heye dizane wê çawa dewam jî bike. Pel û pincaran berhev dike. Ev berhevkariya wê hem encameke mejiyê wê yê hisî ye, hem jî ji ber ku ji xwezayê hîn bûye. Daneheva civakî demeke dirêj li dora jin-dayikê pêk hatiye û em ji agahiyên antropolojiyê jî dizanin ku jin-dayikê bi şiklekî, ji dewlemendî û nirxan re rola navendê bi cih aniye. Mirov dikare texmîn bike ku dayika nirxên zêde ye. Ji lewra mirov dikare fêm bike ku zilamê bi hêz ê bi rola nêçîrvaniyê radibe çima çav berdaye vê daneheva civakî ya jin-dayikê. Diyar e ku wexta li ser vê danehevê serdest bibe wê gelek avantajan bi dest bixe. Gelek tişt hene ku dilê xwe dibijîne wan û çavbirçiyê wan e. Rewşa jinê ya weke objeyeke cinsî, bavtiya zarokan û hin tiştên din rê dide zilamê bi hêz ji bo li ser danehevên çandî yên maddî û manewî bi xwedî gotin be. Hêza bi nêçîrvaniyê digihîjê, firsend û keysê dide wî hiyarerşiya civakî çêke û serdest bibe. Em di van bûyer, diyarde û pêşketinan de cara pêşî dikarin bibînin ku mejiyê analîtîk di bunyeya civakê de bi armanceke xirab û bi awayekî sîstematîk hatiye bikaranîn.

Ji çanda dayika pîroz derbasbûna çanda bavan, dihêle ku mejiyê bûyeran bihûne, zirxê pîroztiyê jî li xwe bike. Mirov dikare texmîn bike ku sîstema bavikan bi vî awayî şax û rehên xwe berdane erdê û xwe girtiye. Em derketina bi heybet a zêhniyeta bavikan li tejaneya Dîcle-Firatê bi belgeyên dîrokî jî îspat dikin. Zêhniyeta navborî li derdora salên 5500 û 4000î B.Z. li Mezopotamya Jêr derketiye û li tevahiya Mezopotamyayê belav

bûye û em dibînin ku weke çandeke sereke bûye xwedî rol. Berî ku em behsa vê çandê bikin, em Berî Zayînê li Mezopotamya Jêr li keviyên deştan û li qûntarên çiyan civakeke dayikan a xwe dispêre bereketa berheman dibînin ku di tevahiya qonaxên mezolîtîk û neolîtîk de xwedî roleke sereke ye û em vê yekê nexasim ji agahiyên arkeolojîk fêm dikin. Em di çanda nivîskî de jî li gelek îşaretên di vî warî de rast tên. Di civaka Neolîtîk de hêmanên ziman û dîn ên xwe dispêrin dayikê gelekî pêşketî ne.

Mirov dikare bibêje ku pirsgirêka civakî cara pêşî bi awayekî ciddî di nava komên bavikan de yên li dora zilamê bi hêz civiyabûn derket holê. Ev destpêka koletiya jinê ye û ji zarokan destpê kir zemînê koletiya mêr jî amade kir. Koleyên jin û mêr di serî de çiqas bibin xwediyê tecrubeya danehev a nirx û berhemê zêde, ewçend jî êdî têne kontrolkirin û serdestiya li ser wan zêde dibe. Desthilatdarî û otorîte her diçe girîng dibe. Weke beşekî xwedî îmtiyaz zilamê bi hêz + pîremêrê bi ezmûn + hevkariya şaman kulmozeke desthilatdariyê ava dike ku kes nikare xwe li ber bigire. Di nava vê kulmozê de mejiyê bûyeran dihûne, ji bo serdestiya xwe ya zêhnî bi awayekî awarte vegotina mîtolojiyan pêş dixîne. Ev dinya mîtolojîk a em wê di civaka Sumeran de bi dîrokî jî nas dikin, mêr dike mîna xwedê û wî weke yê erd û ezman afirandiye mezin dike. Xwedawendiya jinê û pîrozbûna wê heta mirov bêje piçûk tê xistin û weke xwediyê hêza mutleq a serwer mêr bi her kesî didin qebûlkirin û bi tevneke mezin a mîtolojîk a destanan têkiliya yê hukim dike û ya hukim lê tê kirin, yê diafirîne û ya tê afirandin, tê çêkirin. Ev dinya mîtolojîk a bi piraniya civakê didin qebûlkirin, weke vegotineke bingehîn bi nirx dibe û dibe dînî. Em êdî bi vî şêwazê zêhniyetê yê di warê hûnandin û sazîbûnê de sînor nas nake re rûbirû ne.

Ev pergala têkiliyên hiyarerşîk a derketiye holê, nîzama otorîter a sazî, zordestî û mêtingeriya pêşî ye. Ev nîzam, bi mejiyê mîtolojîk ê rehên wê digihîjin sîstema baviktiyê û qalibên

zêhniyeta çavkaniya xwe sîstema baviktiyê ne, bi temamî tê rewakirin. Di qonaxên curbecur de be jî em vê pêşketinê li cem gelek komên mirovan dibînin. Her çiqas di warê şêwe, kêm û zêdebûnê de wekhev nebin jî. Mejiyê ku zordestî û mêtingeriyê ferz dike nabe ku hisî be. Heta ku negihîje asta analîtîk û bi dafik û xasûkiyên ji çanda nêçîrvaniyê re nebe yek, nabe zêhniyeteke rê li ber pirsgirêkên civakî vedike. Ev zêhniyet ji bo fonksiyona xwe ya bingehîn veşêre, neçar e ku efsaneyên sexte û qelp biafirîne.

Bêguman mirov dikare bibêje, mejiyê bûyeran dihûne û mejiyê hisî di nav hev de xwedî rêûresmên gelekî erênî ne û sazîbûna xwe afirandine. Eger mirov bi tevahî cîhana zêhniyetê weke ya desthilatdariyên hiyarerşîk bibîne, rast nîne. Ji ber vê yekê ye ku bi qasî şerên eşkere, em şerên fikrê û qalibên zêhniyetê yên bê eman, di van pêvajoyan de gelekî dibînin. Gelek bûyer û diyardeyên em ji wan re şerê îdeolojîk dibêjin, gelek şêweyên dînî, felsefî, etîk û hunerî yê derdikevin pêşiya me, em bi vî awayî dikarin dakevin reh û rîşên wan. Şerên em pirî caran li cem dînan û di mîtolojiyan de dibînin, di cewherê xwe de têkoşînên polîtîk û aborî ne. Şerên desthilatdariyên siyasî û ekonomîk, heta serdema zêhniyeta kapîtalîst, timî xwe di kirasê dînî û mîtolojîk de nîşan didin. Dewlet avahiyên hiyerarşiyê yên bi sazî û mayînde bûne, temsîl dike. Temsîla ferdî ya avahiyên desthilatdariyê ya veguherî sazîbûnê, têkiliya xwe bi civaka çînî re ya ku bi bajarvaniyê pêş ketiye, heye ku em di dîrokê de jêre şaristanî dibêjin.

Çînayetî û bajar zêdetir bi sîstema kapîtalîst re dibin têgîn. Lê hînê girîngtir jî ew e ku mirov reh û rîşên wan rave bike. Mirov nikare ti têkiliya civakî ya ku derketin an jî kokên wê baş nehatibe ravekirin, bi awayekî temam û têrûtijî bi nav bike. Pêkhatina bajar hînê bi temamî ji hev nehatiye derxistin. Pêkhatina bajar, bi kêmanî bi qasî derketina kapîtalîzmê girîng e û divê were ravekirin. Ez bi xwe yeqîn dikim ku mirov ji bajar re bibêje, xisletên proto-kapîtalîsta pêş dihewîne, wê ne şaş be. Çawa ku

bazar meydaneke têkiliyan e ku kapîtalîzm xwe li ser xwedî dike, pê bi gewde dibe, mirov dikare bajar jî weke mekanê bazarê yê pêşketî û mayînde bi nav bike. Têkiliya wê bi mijara me re ew e ku mekanê pêşketî yê mejiyê bûyeran dihûne, xwe dispêre hebûna bazarê. Bajar bi xwe ji bo avabûna civakîbûneke mezin amûr û navgînek e. Ji ber bazarê, hewcedariyê xwe bi mejiyekî analîtîk û mucered heye. Cihekî welê yê têkiliyan e ku dinya mîtolojîk û dînî ya hînê zêdetir bi aqil rabûn, bi zanistî tevgeriyan û ewqasî jî berevajî kirin, pêre rê li ber pêşketina felsefeyê vekirin û di encamê de bûyerên dîrokî bi lez kirin. Zêdetir bi mejiyê analîtîk kar û xebatê dike.

Cîhana têgînan a neberçav, kengî xwe di hunerê de nîşan da, bajar hînê bi heybet û balkêştir bû. Bajarê bi vî rengî, cîhana şiklên li naverastê ji bo her cure bêbextî û dahfikê lotikan didin û têkiliyên spekulatîf ên sînornenas û ji mejiyê hisî hatiye şûştin, dikin zêhniyeta civakê. Di nav bajêr de aqil pêş dikeve, lê xisletên vî aqlî çi ne? Zêdetir rohniyê yan jî tariyê bi pêş dixe? Bersiva rast a pirsên bi vî rengî hê bi temamî nehatiye dayîn. Guloka têkiliyên sereke yên civaka bajêr ew çêkirine; şer û mêtinkarî, desthilatdarî û çînayetî ye. Bajarê ku di nava xwe de bi piranî rê li beşekî civakê vedike ku xwe dike çîneke din û tebeqe, li dijî hawîrdorê jî bi temamî saziyeke qirkirinê ye. Komên ji derveyî bajaran, herçiqas îfadeyên wan ên dînî û mîtolojîk têkiliya xwe bi mejiyê analîtîk re hebin jî zêdetir bi roleke pozîtîf radibin. Di serî de xwedayên wan, şiklê baweriyên wan, dinya wan a bi hisên samîmî barkirî nîşan dide. Xwedayên wan dost, dilovan, dilovîn û bi mehder in. Êşan kêm, zehmetiyan hêsan dikin. Formên dînî û mîtolojîk çiqasî bûn bajarî, xwedayên wan jî neberçavbûn, diceribandin û ceza dikirin û xwe xistin postekî ku diviyabû her kesî lavahiya li wan bikira. Êşê bi mirovan didin kişandin û zêdetir ji hukimkirinê hez dikin. Di van forman de ya rastî, tişta hatî serê dinyaya malê ketî bazarê û di nav

destan de digere, tê nîşandan. Xwedayên bajar û bazarê di nav hev de ne.

Kengî têkiliyên komên mirovan ên klanê yên bi rêya xizmtiyê bi hiyarerşiya desthilatdariya jor ve girêdayî, têkiliyên malbat, eşîr û qebîleyê parçebûn, çînayetî pêşket. Komên jor dibin dewletdar, komên jêr jî dibin komên têne rêvebirin. Ev pêvajoya kuxwedî xisleteke bê rehm e û dike ku mirov li hemberî xwe xerîb û biyanî be, bi paşketina mejiyê hisî ve têkiliya wê heye.Çînên bindest çiqasî girêdayî komên rêveber ên çîna serdest bin, serweriya wan a zêhnîyetê jî ewqasî rewa dikin û ketîbûna xwe ya exlaqî jî didin erêkirin. Ev rewş kêliya herî bi lanet a bindestan e. Bi zordarî mêtinkariya li ser xwe erê dike û ev jî nîşan dide ku ji her du mejiyan jî êdî bi temamî mehrûm e. Bêparmana ji zêhniyetê di nava civakê de rewşa herî neyênî û deklasebûnê[1] îfade dike. Li serê herî jor çiqasî mejiyekî bûyeran ji bo bendekirinê dihûne û bi awayekî neberçav dike qurban hebe, li herî jêr û binî jî ewqasî bêaqilî, ehmeqî, parsektî û koletî heye.

Eger em dîrokê ji aliyê zêhniyetê ve dabeşî deman bikin, em dikarin weha bêjin; serdemên pêşî B.Z. di salên 5000 û P.Z. salên 500'î bi giranî ji qonaxên mîtolojîk û dînî pêk tên, serdema navîn a teolojîk P.Z. salên 500 û 1500'î ji senteza dîn û felsefeyê pêk tê û serdema hemdem a P.Z. ji salên 1500'î û heta roja îro cihêbûna felsefe û zanistê îfade dike.

Bi dogmabûyîna mîtolojiyê re dîn pêk tê. Mirov bi temamî nikare ji mîtolojiyê re bibêje dîn. Ji bo dîn şêweyên bawerî û perestinê yên naguherin hewce dikin. Bi tevahî hûnandî ye. Bingeha dînî bawerkirina ji bûyerên hûnandî ye. Aliyê wê yê bi tenê erênî ew e ku di gavavêtina fikra neberçav de telşên mezin di nava civakê de vedike, zorê dide fikra felsefî û zanistî û nebidestê

---

[1] Deklase: (Déclassé) Gotineke Fransî ye. Kesên karekterê xwe yê çînî wenda kirine.

xwe ji wan re zemîn amade dike. Fikra zanist û felsefeyê bi fikra dînî re di nava pêwendiyeke diyalektîkî de pêş dikeve. Şopên kûr ên dînî li ser felsefe û zanistê hene.

Felsefe herçiqasî çavkaniya xwe mejî be jî bi giranî bûyeran dihûne û ya berbiçav bi çavdêriyeke objektîv re timî têkildar e. Têkiliya xwe bi tevahî bi mejiyê hisî re qut nake. Şêweyê fikra neberçav, şêweyê fikra herî payebilind e. Kêrhatin û tevkariya wî ya ji bo zanistê, ji ya dîn pêşdetir e.

Ya rastî, zêde cudahiya zanistê ji felsefeyê nîne. Mirov dikare zanistê weke felsefeya bingehê xwe yê ceribandinê xurt, şîrove bike. Herdu bi çavdêrî û ceribandinê hewl didin ku herdu xwezayan manedar bikin. Ya rast jî ev e. Lê ji pirsa dîn a 'çima' re bersiva wan nîne û ev kêmasiyeke wan a herî girîng e. Mirov bersiva xweza 'çawa ye' bide, ev nabe bersiveke têrûtijî ya ji bo jiyanê. Gerdûneke gelekî mezin heye, nabe ku mirov wê weke bê armanc, çima heye û bê sedem hebûna wê bibîne. Ev yek li gorî daxwazê nîne. Zanista nikaribe ji bo jiyanê bersiva pirsa 'çima' bide, bivê nevê wê di encamê de ji bo desthilatdariyê bibe amûrê kolekirinê.

Ez weke tezeke xurt pêşkêş dikim ku zanist ji ber têkiliya xwe ya bi zêhniyeta kapîtlalîst re ji felsefe û dîn cihê bûye.Ez vê teza xwe weha dikarim piştrast bikim: Dîn û felsefe û heta mîtolojî bîr û nasnameya civakê, hêza xweparastinê ya zêhnê wê ne. Gelekî berevajî bikin û bikin dijberê xwe jî ev yek rastiyeke civaknasî ye. Civakeke têkiliya wê ya bi bîr û dîroka wê re hatibe qutkirin, wê zanista wê bi vî rengî di xizmeta desthilatdariya rojane de be ku ya kapîtalîzm dike jî ev e. Di kapîtalîzmê de mîtolojî, dîn û felsefe xistine rewşekê hema bêje pênc pere nakin. Çima? Bersiv eşkere ye. Bi hezar salan, felsefe, dîn û destanan rê neda kapîtalîzma di telş û terkên civakê de ketibû kemînê. Wan kesên faîzxwir û spekulatorên bi buhayê alavan lîstin û kareke neheq bi destxistin şermezar kirin û ew di civakê de nerewa îlan kirin. Di sîstema fikra

civakê de heta ku dîn, felsefe û efsaneyan cihên xwe parastin û mejiyê hisî di civakê de giraniya xwe dewam kir, mumkin nîne kapîtalîzm bibe ya sereke. Ti desthilatdarî, di vê rewşa zêhniyetê de her weha di rewşa exlaqî de nikare kapîtalîzmê rewa bike. Nîzama civakî-aborî ya xwe dispêriyê, nikare biparêze.

Sosyolog Max Weber, mezhebê Xirîstiyantiyê Protestantiyê weke mezhebê ku ji kapîtalîzmê re zemînê zêhnî amade kirî û bi exlaqî weke cîhana zêhnî ya rê daye kapîtalîzmê bi nav dike. Ev şîroveya ku para xwe ya rastiyê gelek e, mirov dikare ji du aliyan ve rexne bike.

a- Protestanî bi xwe dînekî qels e. Şêweyê kapîtalîzmê nêzikî zanistê ye jî. Ya girîngtir, serdema dînên millî dide destpêkirin. Bi awayekî, qonaxa pêş a milletparêziyê ye. Milletparêzî jî îdeolojiyeke xas a kapîtalîzmê ye. Eger mirov di vê çarçoveyê de li şerên mezin ên dînan ên li Ewrûpayê binêre, ev ê rê li ber maneyeke temamkertir veke.

Li devera dîn lê herî qels, yan jî li cografya nû bûyî protestan (Hollanda, Ingilîstan, DYE) cara pêşî derfetê serktinê bi dest kapîtalîstan ketin. Li van welatan, di heman demê de her cure mezhebên jirêderketî bi cih bûne. Ez li vir ortodoksiya dîn naparêzim. Ya ez dixwazim bibêjim ew e, ji ber ku exlaqê Protestaniyê exlaqê herî qels ê Xirîstiyantiyê ye, ji lewra bi hêsayî rê daye kapîtalîzmê. Ez di vê nuqteyê de ji Weber cihê dibim. Ya ew erênî dibîne, ez jî weke neyînî şîrove dikim.

b- Weke paradoksê xuya bike jî di dawiya meşa dirêj a dîrokî ya zêhniyeta dînî û qonaxa wê ya herî qels de bi giştî zêhniyeta kapîtalîst rewa bûye. Ez zanistê ji sedî sed weke berhemeke pêşketina kapîtalîzmê nabînim. Ya qewimiye, ew e ku li qonaxa pêşketinê ya bêşens rast hatiye. Ew jî ew e ku şoreşa zanistî û şoreşa ekonomîk a kapîtalîst li Rojavayê Ewrûpayê hema hema di heman sedsalê de pêk hatine. Avakerên zêhniyeta kapîtalîzmê, ev hevdemiya herdu bûyeran, weke ku kapîtalîzmê zanist derxistibe

holê nîşan dane û bi vî awayî fersend dîtine ku dereweke mezin li şûna rastiyekê deynin. Bêguman kesên di warê zanistê de kêrhatî û civakên ku kapîtalîzm di navê de bi lez pêş diket, di zikhev de bûn. Lê ev xusûs bi ti awayî rê nade wê totolojiya ku dibêje; kapîtalîzmê zanyar derxistine holê. Nakokiya zanyaran bi fikra dînî re hebû. Lê piraniya wan jî di rewşeke wisa de bûn ku li xwe danedianîn guh bidin zêhniyeta kapîtalîzmê.

Ya divê mirov bibêje ew e ku kapîtalîzmê çawa ji mal û spekulasyona peran kar-sermaye bi destxistiye, ji tevahiya şêweyên fikrê sûd wergirtiye. Bi tevahî formên fikrê li weznê xistine û yên bi kêra wê hatine bi şêweyê dibistanên dînî yan jî felsefeyê hilanîne, bi navê lîberalîzm û pozîtîvîzmê ji nû ve xistine piyaseyê. Ya bêhtir cihê xemgîniyê jî ew e ku jê hatiye wan weke cawekî nû bin bi kareke gelekî zêde bifiroşe, ango wan bike zêhniyeta serdest, hostatî yan jî xasûkiyawan pêşkêş bike.

Mirov zêhniyeta kapîtalîzmê dikare bi gelek awayan bi nav bike. Berê pêşî mirov dikare ji bo wê bibêje; qetqetokî û bi serhevkirî ye, dikeve her reng û qalibî, tehlûkeya wê ya xapandinê zêde ye, ji aliyekî ve ji dogmayên herî hişk ên dînî dogmatîktir e, ji aliyê din ve ji felsefeyên herî mucered beredayîtir e, spekulatîf e, ji pûtperestiyê jî wêdetir pûtperestiya pozîtîvîzm û lîberalîzmê dike. Kapîtalîzm, bi pozîtîvîzmê zanist xesandiye û bi vî awayî li dijî cîhana bawerî û exlaqê rakiriye, bi lîberalîzmê jî ferdparêziya canê civakê stendiye veguherandiye xwedayetiya dewletparêz a netewe ku heta bi qirkirinê biriye. Ti zêhniyeta dînî bi qasî zêhniyeta kapîtalîzmê rê li şer, zordestî û êşkenceyê venekir. Ti zêhnê ferdê civakê bi qasî zêhnê ferdê civaka kapîtalîzm têde bi ser ketiye, bê berpirsiyarî û nefsokî nebû; ev qas zalim, ên qir dikin, asîmîlasyonîst û dîktator dernexist holê.

Weke sîstema yekdestdar a li ser cîhana mal û peran hatiye avakirin kapîtalîzm, wexta zêhniyeta xwe ya fînansê ava dike, civaka mirov bi qasî ku ti nemrût û fîrewnî neaniye hişê xwe bi

qalibên zêhniyetê ve girê dide û li hemberî pûtên herî rezîl mirovatiya global dibe sucûdê û mirov wê wextê tenê dikare behsa têkçûna zêhnî û rizînê bike.

Gelekî girîng e ku mirov naveroka zêhniyeta kapîtalîzmê hinekî din ji nêz ve hûrbikole.

Berê pêşî divê ez bibêjim ku yekalî binavkirin û ravekirinên kapîtalîzmê, encama xebatên zêhniyetên bi giranî di bin bandora sîstemê de ye. Şîroveyên bi vî rengî li cem anarşîst û Marksîstên herî zêde îdîa dikin ku civaknasên zanistî ne û herî zêde antî-kapîtalîst in, têne dîtin.

Marks bi xwe jî binesaziya ekonomîk ji bo tevahiya formên huqûqî, siyasî û îdeolojîk weke çavkaniya ravekirinê bi cih kiriye, belkî jî yek ji sedemên bingehîn ê serneketina sosyalîzma di rêya wê de şerên mezin hatin kirin, ev e. Divê em vê xusûsê baş zanibin ku ti koma mirovan heta ku demeke dirêj forma zêhniyetê nas neke, neceribîne, wê nikaribe şêwazê jiyana maddî ango jiyana ekonomîk ava û sîstematîze bike. Analîzên li ser sîstemê yên pêşketina zêhniyetê di tariyê de dihêlin, ew bi xwe jî ji hegemonya sîstemê re xizmetê dikin. Zêhniyet li ser bingehên pir dijber werin avakirin jî wê nikaribin xwe ji xizmetkariya wê xilas bikin. Sîstemên serdest ên heyî, beriya her tiştî vê serdestiya xwe bi sazîkirina zêhniyet û siyasetê misoger dikin. Jiyana maddî jî bi tenê di vê çarçoveyê de dikare bê sererastkirin. Îdeaya Marks a ku dibêje; ‘Ez diyalektîka Hegel rast dikim’ berevajiyê tê zanîn, ew piştrast nekiriye, ew zêde dixape. Êdî baş hatiye fêmkirin ku weke asta herî jor a metafizîkê, îdealîzma Hegel di pêlika diçe dewleta netewe ya elman de yek ji gavên pêşî ye. Hînê beriya wî, avakerê îdeolojiya Prostestaniyê Luther û E. Kant ê li dijî objektîvîzma hişk sûbjektîzmê, hinekî jî exlaq li ber çav digire, tên. Ya rastî, Karl Marks jî weke nakokî xuya bike jî ev xeta proleter, bi navê sîstema antî-kapîtalîst dewam kiriye. Di encamê de îdeolojiya elman ango

zêhniyeta wê bi şêwazê faşîzm û pêşengiyên mîna Hîtler derxistiye holê.

Di pirsgirêka zêhniyetê de kesê li vê tehlûkeyê herî baş hayil bûye jî fîlozofê elman Nietzsche ye. Şêwazê xebatê yê Nietzsche a li ser zêhniyetê, dijberiyeke rastî ya modernîteya kapîtalîst e. Kêmasiyeke mezin e ku nehatiye pêşxistin, paşê felsefeya siyaseta wê nehatiye kirin û bi cih nehatiye anîn. Fîlozofên Frensî Deleuze, Guattarî, M. Foucault û hwd. û hewldanên Gramsci yê Îtalî yên derengmayî gelekî kêm in û ji aliyê siyasî ve bi sazî nebûne. Jixwe ya bi sosyalîzma pêkhatî bi serketî, herî kêm sedûpêncî salî bi navê çepgiriyê hevkariya objektîf a bi modernîteya kapîtalîst re ye. Ezmûneyên Sovyeta Rûsyayê û Çînê vî hukmê me bi awayekî balkêş piştrast dikin. Ez hêvîdar im ku di dabaşên pêwendîdar de li ser vê mijarê bi awayekî berfireh rawestim.

Ji anarşîstan, nexasim ji yên pêşî yên kevn di serî de Proudhon, Bakunîn û Kropotkîn rexneyên wan ên li ser derketina kapîtalîzmê di gelek waran de mirov rohnî dikin. Anarşîstan aliyê kapîtalîzmê yên siyasî û îdeolojîk hînê baştir didîtin. Lê ji ber ku ji felsefeyeke siyasî ya rast mehrûm bûn û nikarîbûn fikrên xwe bisazî bikin û dîsa ji ber ku haya wan ji exlaq û dîrokê tinebû, li gorî analîzên dawî; neçar di destê kapîtalîzmê de bûn metayeke îdeolojîk. Her weha divê ez dîsa bibêjim ku xebateke zêhnî bi siyaseteke hostekarî, exlaq, dîrok û pratîkê re nebe yek, çare nîne,yan wê ji aliyê dijberên xwe ve were bikaranîn, yan wê were tinekirin yan jî were asîmîlekirin û bi vî awayî were bêtesîrkirin. Cihê xemê ye ku ya hatiye serê antî-kapîtalîstan, weke di dîrokê de gelek mînakên wan hatine dîtin ên xebatên zêhniyetê û ekolan, di serî de Xirîstiyantî, Bûdîzm, Zerdeştî û Manîtî hatiye serê heman rêwiyên vê riyê û heman çarenûs parve kirine. Bêguman ez hema divê di cihê cih de bibêjim ku ez îdîa nakim ev doktrîn badilhewa çûne û mirov nikare ji çarenûsê xilas bibe. Eger wisa bûya, jixwe ne hewce

bi nivîsandina van hevokan dikir, ne jî maneya exlaqê azadiyê hebû. Ya ez dikim rexneyek e.

Eger di roja me ya îro de, ya rastî di nava yekparebûna dîrokê de qonaxa dawî ya şaristaniyê kapîtalîzm bi şêweyê xwe yê hat binavkirin û li hemberî spartekên wê yên dîrokî, bixwaze xwe bigihîne sîstemeke alternatîf a serketî, divê felsefeya siyasetê, sazîbûna siyasetê û di jiyana maddî de çalakiyên wê bi pêşengiya xebatên yekpare yên zêhniyetê,bi eşq û şewq di zikhev de werin hûnandin.

Di hegemonkariya sîstema kapîtalîst de tevî ku cihê zora eskerî û siyasî gelekî girîng e jî ya ku esas hegemonyayê li ser piya dihêle; civakê bi çanda îndustriyalîzmê teslîm girtin û heta mirov dikare bibêje tevizandin e. Eger gotin li cih be, mirov dikare destnîşan bike ku zêniyetên komên di bin bandora sîstemê de ji meymûnên nêzî cinsê mirov paşdetir in û sîstem bi hêsayî dikare wan bireqisîne. Nîzamê li baxçeyê heywanan, ya rastî mînakeke baş e ji bo mirov fêm bike, çawa civak bi awayê baxçeyê heywanan li gorî xwe sererast kirine. Gelek fîlozof destnîşan dikin û dibilîninku çawa li bexçeyê heywanan, heywan ji bo temaşekirinê ne, sîstemê jî civak kiriye civakeke ji bo temaşekirinê. Di serî de bi sê 'S'yan ango îndustriya **s**eksê, paşê û di zikhev de îndustriya **s**inaet, çand, huner û **s**porê bi kampanyayeke berfireh a reklama medyatîk, sîstem timî mejiyê analîtîk û hisî bombe dike, bi temamî bêkêr dike û kengî civakê tîne asta temaşeker fetha wê ya zêhniyetê temam dibe, diseride.

Ev civak ji teslîmgirtinê jî xirabtir, xistine rewşeke welê ku sîstem çawa bixwaze welê rêve dibe û îdare dike. Ya rastî, ezmûna faşîzmê ya di warê civaka temaşekirinê de têkneçû. Serekên wan têkçûn. Lê di şerê sar de û piştî şerê sar, civaka temaşeker bi şîrketên fînansê yên global û dewletên netewe li ser tevahiya komên mirovan serwer kirin.

Ya qewimî, bi maddî û manewî fetihkirina kapîtalîzmê ya civakan, di serî de ji demên Sumer, Misr, Hind, Çîn û Romayê ji fetha dema sîstemên împaratoriyên bi hêz li ser civakan qat bi qat bi hêztir pêk hat.

Piştî qonaxên mêtingerî û emperyalîzmê, qonaxa împaratoriya kapîtalîzmê qonaxa asta herî jor a hegemonya wê ye. Herçiqasî bi awayekî berçav bi xisletên kaotîk be û gelek nîşaneyên rizînê pêre bêne dîtin jî sîstem gelekî bi civakê dilîze ango dike ku hegemonya zêhnî têra xwe tevlîhev bibe ku mirov nikaribin ji navê derkevin. Bi vî awayî dixwaze kaotîkbûna xwe û nîşaneyên vê rizînê telafî bike, veşêre.

Di gihîştina vê qonaxê de weke îndustrî pêşkêşkirina seksê rola xwe diyarker e. Mirov xistine rewşekê ku serketinê di hêza seksualîteyê de dibînin. Lê têkiliya cinsî di jiyana tevahiya zindiyan de weke fonksiyeneke hayjixwehebûnê û bêserûbinîkirina wê de roleke mirov jê hîn bibe bi cih tîne. Ji zindiyên yek şaneyî bigirin heta cinsê mirov di hemû zindiyan de fonksiyona seksualîteyê mirov dikare bi vî awayî rave bike. Ji lewra manedar û heta pîroz e. Komên mirovan jî di tevahiya dîrokê de şêweyekî bi vî rengî yê şîroveyê esas girtine. Bi tevahî lêkolînên antropolojîk jî vê şîroveyê piştrast dikin. Eger têkiliyek an jî têkiliyên divê nebin meta ango îndustrî hebin, pêwîst e ku di serê vana de têkiliyên cinsî bên. Ji ber ku têkiliya cinsî têkiliya xwe bi pîrozbûna jiyanê, bi bilindî û mezinahiya wê û domdariya wê re heye. Têkiliyên cinsî divê zêdetir ji rê neyên derxistin, ji ber ku berpirsiyariya wê heye ku jiyanên din nexe tehlûkeyê.

Bikaranîna seksualîteyê, mirov dikare bibêje yek ji amûrên hegemonîk ê bingehîn ê sîstemê ye. Ne tenê kiriye meta û wergerandiye îndustriyeke mezin; di civakê de seksualîteyê hem rizandiye, hem jî xwedatiya fallûs a Hindî jî çilcarî jê bihurandiye û dînekî mêran ê cinsparêz û serwer pêk aniye. Ev nîşaneya dînî ya nû bi taybetî di her mêrî de heta bibêjî bibandor hatiye kirin, di

serî de wêje li serê quncika hunerê datîne û bi temamî dike fena amûrekî narkotîkê. Li ber vî dînê seksualîteyê narkotîkên kîmyewî jî nabin tiştek û heta mirov dikare bibêje hîç in. Bi tevahî ferdên civakê bi reklamên medyatîk, ne bi tenê bi reklamên ji rêzê, bi kampanyayan kirine kesên her wekî di warê seksualîteyê de ji rê derketî. Ciwan, pîr û kal û heta zarok ferq nake; her kes tê bikaranîn. Jixwe jinê kirine weke amûrekî herî pêşketî yê seksualîteyê. Ew bi zêhniyeteke wer mehkûm kirine ku bi qasî serê derziyê beşekî wê bi awayekî cinsî xîtab neke, mîna pênc quriş qîmeta wê nîne, difikire. Malbata pîroz kirine dergeheke seksualîteyê. Ji dayika pîroz û xwedawendiyê 'pîrejineke' bêkêr li dawiyê maye. Rewşeke gelekî xemgîn û xembar e. Bi rêya sûnî ya avishiştinê jin bi temamî kirine amûrekî seksualîteyê û ev yek gihandine asta herî jor.

Rewşa berovajî jî, li gorî sîstemê, gihîştiye wê astê ku mirov nikaribin xwe lê ragirin. Anîna pir zarokan, di serî de zarokê kur, bi daxwaziya xwedîbûna pir zarokan ve girêdayî, di cewherê xwe de rêûresmeke civaka bavikan e, lê piştî ku teknîkên bijîşkî ketin dewrê, jinên tebeqeya jêrîn kirine mîna makîneya zarokanînê. Bi vî awayî, karekî zehmet ango gihandina zarokan jî dixin stûyê xizanan û bi vê riyê hewcedariya bi karkerên ciwan jî tê tedarikkirin û li aliyê din jî malbateke riziyayî tê afirandin. Bi vî rengî bi kevirekî çend nîşanan bi hev re radikin. Mêr û jinên tebeqeya jor bi zarokên sûnî, kurê hewiyê û xwedîkirina heywanan têgîna zarok dirizînin qaşo pê kêmasiya ewlad tedarik dikin û bi vî awayî hewl didin heta dawiyê seksî bimînin û bi awayekî ji xwe biçin dînê nû yê seksualîteyê rîtualîze dikin. Encam; şêniya bêmane zêde dibe ku mirovatî nikare di binî de rabe, bê kariyeke di dîrokê de hîç nehatiye dîtin û pêsîrtengiya hawîrdorê, kiriye ku mirov nikarebe vî barî rake. Mirovatî wê çawa ji heqê vê pirsgirêkê derkeve? Ez difikirim ku di 'Sosyolojiya Azadiyê' de hûrûkûr li ser vê mijarê rawestim.

Wexta çand dibe îndustrî, ango bi gotineke din, wexta bi berfirehî bibe metayeke hilberandinê dibe duyemîn amûrê bi bandor ê kolekirinê. Di çarçove û maneyeke teng de mirov dikare çandê weke cîhana civakan a zêhniyetê bi nav bike. Sê mijarên xwe yên bingehîn hene û ew jî ev in: fikirkirin, ecibandin û exlaq. Di nava sedsalan de desthilatdariya ekonomîk û siyasî di nava sîstemê de dor li hêmanên çandê girtine û kirîne. Di tevahiya dîrokê de şaristaniyan hêmanên çandê hemû bi xwe ve girêdane û ev yek ji bo rewabûna wan şert e. Pir zû haya erkdarên aborî û desthilatdariyê ji vê xusûsê çêbûye û tedbîrên di vî warî de ti carî dereng nexistine. Asîmîlekirina çandê ji aliyê desthilatdariyan ve heta bi damezrandina demên hiyarerşiyê ve diçe. Amûrên wan ên bingehîn ên rêveberiyê ne. Eger hegemonya çandî nebe, nikarin yekdestdariya aborî û desthilatdariyê rêve bibin. Sîstemên xwe bi mêtinkarî û darê zorê rêve dibin, tenê bi talanên demkurt dikarin xwe li ser piyan bigirin, wexta tiştekî talan bikin nemîne jî xwe bi xwe bi hev dikevin an jî hildiweşin û belav dibin, diçin.

Di şaristaniya kapîtalîst de rola çandê gelekî girîng e. Weke tevahiya zêhniyeta qadên civakî çand berê tê asîmîlekirin ango li gorî desthilatdariya siyasî û aborî tê hûnandin û paşê ji bo li tevahiya komên dinyayê ango netewe, gel, dewleta netewe, civakên sivîl û şîrketan bê belavkirin dikin weke îndustriyeke mezin. Wêje, zanist, felsefe, qadên din ên hunerê û qadên sereke yên weke dîrok, dîn û huqûqê kirin obje û bi vî awayî kirin meta. Pirtûk, film, rojname, TV, internet, radyo û amûrên wekî wan, fena metayên vê îndustriyê kêrhatî ne. Li vir metayên çandî tenê rê li ber hatineke mezin a aborî venakin.Esas fonksiyona wan a herî hilweşîner bi awayekî di dîrokê de hîç nehatiye dîtin zêhniyetê êsîr digirin. Ango mirovan ji dewaran jî wêdetir, dikin çînek, neteweyek, eşîrek û her cure cemaet, bi kurtî GIRSEyeke mîna meymûnên nefsokî, maneya xwe wendakirî, bêserûber û çeloxwarî diafirînin û bi vî rengî erka xwe bi cî tînin. Mîmarên wan ên sereke dewletên netewe ne,

şîrketên global û yekdestdarên medyayê ne. Ji bilî hatina peran û çûna wan, ti tiştê civakê wan eleqedar nake. Derdorên herî zêde hatine xizankirijî xistine rewşekê ku ji derveyî xeyala tenê rojekê gelek peran bi dest bixin û li gorî kêf û dilê xwe bijîn tiştekî din bifikirin.

Bala xwe bidinê, xizankirina mirovan weke diyardeyeke çandî tê bikaranîn. Di wan serdemên navîn de jî ku em wan naecibînin, xizanî dibû sedema isyanê, lê di bin hegemonya îro ya çandî ya fermî de bi destxistina heqdestekî bûye armanc û hedef, ev jî serketina çandî ya sîstemê nîşan dide.

Îndustriya çandî û îndustriya seksê bi hev re dibin serwer ango mirovan bi riza dilê wan êsîr digirin û heta vê yekê weke azadiya li herî asta bilind bi nav dikin. Ji sedî sed diyar e ku ev stûneke bi hêz e ku rêveberiya kapîtalîst ji bo rewabûnê xwe dispêrê. Qonaxa împaratoriya kapîtalîzmê bi tenê bi pêşxistina îndustriya çandê mumkin e. Ji lewra têkoşîna li dijî hegemonya çandî têkoşîneke dijwar a zêhnî ferz dike. Têkoşîna li dijî şerê vê sîstemê yê çandî yê bi rêya asîmîlekirin, fetihkirin û îndustrîkirinê dimeşîne, heta ji aliyê naverok û form ve neyê pêşxistin û birêxistinkirin, şensê serketinê yê ti têkoşîna demokrasî, azadî û wekheviyê tineye. Ez ê pirsgirêkên di vî warî de jî hewl bidim di Sosyolojiya Azadiyê de bi berfirehî guftûgo bikim.

Spor, ji destpêkê ve ji bo tevlîkirina civakê weke lîstikeke amadekariyê bi kêr hatiye. Ji bo mirovan bi awayekî serketî tevlî jiyanê bikin lîstikên sporê amade dikin. Mîna ku bi van lîstikan mirovan hînî rola wan a civakê dikin. Nexasim, em dibînin ku împaratoriya Romayê di qonaxa rizînê de, hînê nû sporê weke îndustrî bi kar tîne. Gladyatorî bi xwe saziyeke bi vî rengî ye.

Kapîtalîzmê ji destpêkê ve sporê jî bi desthilatdariyê re kir yek û ew ji cewherê wê yê amatoriyê şûşt (profesyoneltî) û îndustrîbûna wê ferz kir. Qadeke din a girîng e ku kirine meta û pê civakê ditevizînin. Li şûna ku mirovan bi moraleke bilind û li ser

hîmê bedeneke tekûz tevlî civakê bike, hevrikiyeke dînane ya ji bo bi destxistina peran sor dike û civakê jî dixe rewşa temaşekerên bêkêr. Çanda arenayê ango avêtina mirovan a ber şêran û ji bo gladyator hev bikujin zor li wan kirin weke ruhekî di tevahiya qadên sporê de hatiye bicihkirin. Rekor û çepik di vî warî de du nîşaneyên berçav in. Li şûna dîn û felsefeya kesekî hebe, hebûna tîmekî wî/wê ya sporê hînê girîngtir bûye. Piştgirî û alîgiriya tîmên sporê kirine mîna nexweşî û şewbekê. Bi vî awayî ji bo rêveberan dibe amûrekî baş ê rihet rêvebirinê. Mînak rola ku fûtbol ji bo rêveberan bi cih tîne, kîjan dîn an jî felsefe dikare bi cih bîne?

Kurtebir mirov dikare bibêje; seksualîte, spor û hunerê kirin îndustrî û bi vî awayî di hunerê rêveberiyê de xwe gihandin asta herî jor û bilind. Bêyî seksualîte, spor û çand û hunerê, ne rêveberiya sermaya global, ne jî desthilatdariya dewleta netewe bi cih tê. Ez dubare dibêjim; em li vir bi serê xwe seksualîte, çand û sporê xirab û rexne nakin. Em van qadên tevî ku her tim di pêkhatina civakê de hewce dikin, bikaranîna wan weke îndustrî û dejenerekirina wan rexne dikin.

Cîhana ferazî ya di bin hegemonya zêhniyeta kapîtalîzmê de di bingeh de ji aliyê saziyên medyayê ve tê meşandin, dîsa amûrekî desthilatdariyê yê girîng ê zêhnî ye. Ferazîbûna jiyanê asta herî jor a mejiyê analîtîk gihîştiyê nîşan dide. Wexta bûyereke mîna şer ya herî bi dehşet jî bi awayekî ferazî were nîşandan, heye ku ew bi serê xwe karibe exlaqê hilweşîne. Jiyana beden û mejiyê mirov nediceriband, ji berê de jêre digotin jiyana sexte. Navê ferazî lê kirine, bi vê jiyan ji sextetiyê xilas nabe. Em li vir teknîk û zanista bi serê xwe rê û derfet daye jiyana feraziyê gunehbar nakin. Em li vir careke din li bikaranîneke xirab rast tên û dibînin zêhnê ferd ditevizîne. Teknolojiya serberdayî, sîleha herî bi tehlûke ye. Serdestiya kapîtalîzmê li teknîkê û hewcedariya birêvebirina milyaran, sedema bingehîn e ku jiyana ferazî ferz dike. Jiyan êdî nayê jiyîn. Timî dibe ferazî. Mîna ku mirov şipiya bimire û mirî

bimîne. Simulakr îfadeyên herî berçav ên jiyana ferazî ne. Mirov her têkilî, bûyer û berhemî sîmule bike pê nabe xwedî zanîn. Ev yek mirovî ehmeq dike. Bi teqlîdkirina tevahiya berhemên şaristaniyê pêşketin çênabe; hegemonya çanda teqlîdê tê çêkirin. Di cewherê jiyanê de cihêtiya heyî, xwe naspêre dubarebûnê. Dîrok bi xwe jî xwe dubare nake. Teqlîd dijberê pêşketinê ye. Jiyana ferazî jî xwe dispêre teqlîdeke bê sînor. Her kes hev teqlîd dike û bi vî awayî wan dişibînin hev. Bi vî awayî keriyên pez diafirînin. Serdema fînansê jiyana ferazî nebe nikare li ser piyan bimîne. Lê bi ehmeqiyeke bê sînor dikare bimeşe ku ew jî bi sextetî û jiyana ferazî dibe.

Yek ji wezîfeyên bingehîn ên jiyana azad ew e ku divê mirov li ber vê jiyana ferazî rabe. Ji bo em jiyana azad bi nav bikin, bi rêxistin bikin û civakan li ser piyan bihêlin, wezîfeyeke bivê nevê, divê em bi cih bînin. Pirsên herî zêde divê sosyolojiya azadiyê bersiva wan bide di vê qadê de ne.

Em serketina sîstemê ya di mijara afirandina jiyana ferazî de dikarin ji çend aliyan ve şîrove bikin.

Yekemîn, girêdana kêrhatî ya dîn û exlaq bi civakê re sist dike, bi huqûqê laîk re dîn û exlaqê dixe dereceya duyemîn û civakê bi xwe ve girê dide. Dîn û exlaq bi qasî ku ji sîstemê re xizmetê bikin destûra wan tê dayîn. Huqûq û laîktî di cewherê xwe de ji bo kontrola civakê bikeve bin desthilatdariya kapîtalîzmê, amûrên girîng in. Ji civaka berê hem beşê arîstokratîk, hem jî serfên wê ji bo ji sermaye û hêza xebatê re cî veke û rezervên xwe çêke, bi sîleha huqûq û laîktiyê dîn û exlaqê tasfiye dike. Bi tevahî ji holê ranake. Ji ber ku ew amûr in, ji alî şaristaniyê ve gelekî têne bikaranîn, weke gotina dawiyê ya şaristaniyê hewcedariya sîstema kapîtalîst bi wan gelekî heye. Lê bi şertê ku nebin hevparê desthilatdariya wê ya siyasî û ekonomîk û li pêşiya wê nebin asteng. Di dîn de reform û dewleta huqûqê, bi vê fonksiyonê radibin û dibin nîşaneyên bingehîn ên modernîteya kapîtalîst.

Kengî civak û ekonomî dikevin rewşa kapîtalîzmê, hingî weke du amûrên bingehîn bi rolên sereke radibin. Di heman demê de pirsgirêkên sîstemê yên zêhniyetê çareser dikin.

Ya diduyan, 'rêbaza zanistî' bi kar tîne. Cihêkirina obje û sûbjeyê kilîta hegemonya zêhniyetê ye. Bi qasî xuya dike, rêbaza zanistî bêyî prensîba objektîvîzmê nabe, lê ya rastî ji bo serdestiya sûbjektîvîzmê qonaxeke pêş e, hewcedarî pê heye. Ji bo mirov karibe bi rê ve bibe divê mirov sûbje ango kirdar be. Di vê rewşê de bi awayekî xwezayî yên têne birêvebirin jî dibin obje. Tiştê dibe obje yanî dibe eşya jî serdestî lê tê kirin û tê rêvebirin. Eşya weke obje xweza, ji lewra mafê kirdar çêdibe wê bi rê ve bibe. Ango ev îfadeyeke birêvebirina eşya ji aliyê kirdar e. Mîna amentûya zanistê be. Cihêkirina obje-sûbjeyê reh û rîşên xwe diçin heta dema Eflatûn. Cîhana 'îdea'yan a navdar a Eflatûn ku xwe bi dualîteyên basît nîşan didin, bingehê tevahiya cihêbûnên bi heman rengî ye. Jixwe em bingehê mîtolojîk ê van dualîteyan bi awayekî harîqûlade li cem civakên Sumer û Misrê dibînin. Li jor, hiyarerşî bi awayekî xwedayî tê mezinkirin û bilindkirin, yên li jêr jî dikin benî û bende. Ev rewşa dîrokî reh û rîşên dabaşê ne. Îfadeya zêhnî ya dualîteyên mîna afirîner û yê tê afirandin, rêveber û yê tê rêvebirin, xweda û bende, kelam û eşya, îdeayên mukemmel û nîşandanên wan ên basît hêdî hêdî pêş dikevin û xwe digihînin cihêkirina obje û sûbjeyê. Cihêkirina beden û ruh jî di vê çarçoveyê de ye. Maneya siyasî ya vê yekê înkara demokrasiyê ye û rêvekirina li olîgarşî û monarşiyê ye.

Divê mirov baş fêm bike ku bi kapîtalîzmê zêhnê analîtîk kirasê herî hîlekar û bêbext li xwe dike. Borsa ji bo vê yekê rastiyeke balkêş e; qadeke welê ye ku mejiyê bûyeran dihûne (mejiyê spekulatîf) zêde jê karê dike. Di nava sîstemê de mejiyê ku bûyeran dihûne û spekulatîf dibin mîna cêwiyan. Di qada eskerî û polîtîk de jî her wisa ye. Şer li ser xasûkî û hîlekariyê hatiye avakirin. Asta herî jor a çanda nêçîrvaniyê ye. Mejiyê bûyeran

dihûne, di qada borsa, polîtîka û eskerî de bi qasî ku li ti devera din nebe, bûye amûrekî manîpulasyon û komployê. Bi qasî serê derziyê cih nade wicdan û hisan. Li qadekê bi carekê bi bombeyên nukleer û bombeyên din mirov bi hovîtiyeke mezin diqelin, li qadeke din bêyî ku dilopeke xwêdanê birijînin, di nava çend rojan de dibe ku mîlyar werinbidestxistin. Mirov dikare bi hêsanî bibêje, kapîtalîzm zêhniyeta xwe bi tevahî di borsa, polîtîka û şer de nîşan dide. Kapîtalîzm ji bo karê bike ti nirx û hisa mirovatiyê nîne ku binpê neke.

Ya rastî mejiyê ji bo jiyanê bivê nevê hewce ye, mejiyê hisî ye. Wexta mirov ji vî mejiyî qut bû, wê maneya jiyanê jî hêdî hêdî nemîne. Felaketên ekolojîk, mîna nûçeyên qiyametê bin, tehlûkeya li ser dinyayê radigihînin. Berpirsê vê felaketê mejiyê analîtîk e. Ev mejiyê bûyeran dihûne, bi ziman, desthilatdarî, bajar, dewlet, zanist û hunerê xwe xwedî kir û di dawiyê de bû Levîathanê global ango bû împaratoriya dinyayê ya sermaya global. Ji bo rawestandina vî cinawirî hewcedarî bi hewldanên berfireh ên mejiyê hisî heye. Ji bo mirov wî bê zirar bike divê mirov zordestiya wî ya li ser jiyana azad kêm bike. Hê dinya me nekiriye rewşekê ku jiyan lê nebe, divê mirov wê bixine rewşekê ku nikaribe bijî û bimîne. Wezîfeya bingehîn a sosyolojiya azadiyê ew e ku xwe bi awayekî serketî bigihîne teoriya vê çalakiyê û wê rast ava bike ku ev yek bi qasî man û nemanê girîng e.

### B- Ekonomîzm

Fikrên derketina kapîtalîzmê weke encameke xwezayî ya pêşketina aborî dibînin, di vê komê de cih digirin.Nexasim Marksîzm ji vî aliyî ve hêsan û besît kirine û kirine ku bi tenê ekonomîzm jê bimîne. Weke ku hewldane kapîtalîzmê mîna modeleke ekonomîk fêm bikin. Ji ber vê yekê, fena ku ekonomî-polîtîka danîbin serê quncika civaknasiyê, jêre cih veqetandine. Di

avabûna dewleta modern de hin biryarên der barê jiyana ekonomîk de dane, weke zanistê hatine disîplînekirin.

Ji ber ku kapîtal, ango sermaya karê dike li bazarê buhayên alavan îstîsmar dike, di çêbûna vê fikrê de dibe xwedî roleke girîng. Weke ku ji dîrok, civak, desthilatdarî û tevahiya pêşketina şaristaniyê qut pêşketineke kapîtalîst mumkin be. Meyleke bi vî rengî xuya dike. Bi awayekî paradoksî kesên herî zêde antî-kapîtalîst xwe dihesibînin, bi awayekî kapîtalîzm hîç heq nake, wê li cihekî welê didin rûniştandin qaşo bi vî awayî li dijî kapîtalîzmê şer dikin.

Mirov dikare aborînas û siyasetvanên bi eslê xwe ji Ingilistanê fêm bike. Weke ekonomî û siyasetvanên li vî welatê ku lê kapîtalîzm bi ser ketiye, mirov li bendê ye ku ew ekonomiya nû bikin model. K. Marks li ser vê modelî ponijiye û weke rexneyeke li ekonomî û siyasetvanên Ingilîz, hewldanên wî gelekî girîng in û têra xwe rewşê rave dike. Bê şensî ew e ku berhema Marks nîvco maû Marksîstên piştî wî jî hatin ew bi temamî karîkaturîze kirin. Yek ji kêmasiya wî ya bingehîn ku mirov dikare diyar bike, ew e ku têkiliya kapîtalîzmê bi desthilatdarî û dewletê re bi rêkûpêk analîz nekir û ji hev dernexist. Hewl daye ku rola îdeolojiyê diyar bike. Der barê zêhniyeta kapîtalîzmê de hin caran ravekirinên wî têra xwe xurt in.Lê ew bi nêrîna pozîtîvîzmê ya li bûyeran, xapiya. Di dema Rohnîbûnê de îdeolojiya berdilê her kesî pozîtîvîzmê ji zû ve mohra xwe li atmosfera entelektuelan xistibû û wî jî bi nêrîna vê îdeolojiyê ya li bûyeran, analîz kirine. Bawer kiriye û guman nake ku weke zanista fizîkî mirov dikare zanista civakê jî bike. Ev helwesta wî, hiştiye ku xebata wî ya bi navê Kapîtal a gelekî hêja ye, berdar nebe û kiriye ku mîna pirtûkeke dînî were şîrovekirin. Jixwe karên ku mirîd jî bikin diyar e. Şîroveyên Lenîn ên der barê emperyalîzm, kapîtalîzma yekdestdar û dewlet-şoreşê de hewldanên ku ji felsefeya dema Ronahiyê nebihurîne ne. Dîsa tevî ku gelek fikrên kêrhatî pêşkêş kirine jî, nebûna kapasîteya wî ya

bihurandina ji modernîteya kapîtalîst, di serneketina ezmûna Sovyetê de jî dibe yek ji sedemên sereke.

Şîroveyên anarşîstan ên der barê kapîtalîzmê de jî bi giranî ekonomîk in. Mîna ku kapîtalîzmê bi ekonomîkbûnê mehkûm bikin, bawer kirine ku wê hilweşe. Têgihîştinên bi pozîtîvîzmê seqetbûyî; çi ye, ne çi ye qanûnên zanistê hene. Ekonomî jî zanistek e. Ji lewra qanûnên wê jî hene. Li gorî van qanûnan, ji ber ku krîz û arîşeyê diafirîne, kapîtalîzm sîstemek e ku wê nikaribe bimîne. Eger wisa be, wê wextê divê mirov van qanûnan bi lez bikêrhatî bike. Encam, kapîtalîzm ê hilweşe û li şûnê wê komînîzm ava bibe! Li ser hîmê van fikran civak rast nayê binavkirin. Civak bi giştî li derveyî îdeolojiyên dema Rohnîbûnê xwedî sîstemekê û hata kaosekê ye. Ekonomî jî di navê de, bi tevahî avahiyên sazî û zêhniyetê yên civakê bi xisletên xwe ji zanistên weke pozîtîf têne binavkirin ji binavkirinên wê yên der barê xwe de bi wesfî cihê ne û rewşa wê ya çalakiyan bi piranî xwedî xisletên kaosê ye ku ev yek jî bi helwestên gelekî cihê çareseriyan û bi vê ve girêdayî çalakiyan pêşxistinê hewce dike.

Di çarçoveya rohniya van rexneyan de em dikarin pêwendiyên di navbera ekonomî û kapîtalê ango nîzama sermayeyê de bidin fêmkirin. Belkî nakok xuya bike, lê ya pêşî divê em bikin ew e ku em kapîtalîzmê ekonomî nehesibînin. Eger em kapîtalîzmê weke rejîmeke siyasî analîz bikin, ev dikare me hinekî li kara wê ya di naveroka wê de cih digire, serwext bike. Girîng e ku em li vir nekevin reduksiyona dewlet û desthilatdariyê. Ango em ê ji ekonomîzmê ber bi desthilatdariyê ve, bi ber bê nekevin. Eger civaknas Max Weber li şûna nirxandina xwe ya bi navê ‘Exlaqê Protestan û Kapîtalîzmê’ yekser kapîtalîzm weke terîqetekê şîrove bikira, wê şensê wî yê ravekirinê zêdetir bûya. Fernand Braudel dixwaze derketina kapîtalîzmê bi xisleta wê ya bi hewldana li bazarê kontrolkirina buhayan, rave bike. Marks jî di navê de, ev

şîrove bi tevahî girîng in, lê kêmasiya wan a bingehîn ew e ku timî xwe mecbûr his kirine mijarê ji awirê ekonomiyê rave bikin.

Li gorî min, kapîtalîzmê ji destpêkê ve xwe weke eskerî, siyasî û çandî bi rêxistin kiriye, ji rêûresmeke kevn a rêxistinî tê ku bi xasûkî di serî de danehevên maddî, nirxên civakî desteser kirine, ha vê rêxistiniyê ji sedsala 16'an û pêve li Rojavayê Ewrûpayê weke civakeke serdest şikil girtiye û bi gewde bûye. Zilamê bi hêz ê bi koma rêbirr û tolaz ku pêşî li dora xwe kom kiriye,nirxên civakî yên li dora jin-dayikê desteser kirin û em dikarin vê derketinê weke xeleka modern a vê rêûresmê bi nav bikin. Li Ingilistan û Hollandayê, berê jî li bajar-dewletên serkêş ên Îtalyayê Cenova, Floransa û Venedîkê, komên kapîtalîst ên pêşî bi dewletê re di zikhev de weke endamên terîqetekê ku jiyana wan a taybet hebû, bi tiştên nû ku di qada ekonomîk de dikirin bi hostayî pere ji piyasê dimêtin, li bazarên li her devera dinyayê belav bûbûn, bi buhayê alavan dilîstin û bi vî awayî nirxeke mezin desteser dikirin û wexta hewce dikir bêfikar serî li darê zorê didan. Ango kapîtalîzm çalakiya wan komên xwediyê mejiyê analîtîk e. Li hin deveran mirov ji van kesan re dikare xanedan, arîstokrat û bûrjûwa jî bibêje. Ji dizek û heramiyên serdema navîn û destpêkê cudahiya wan a bi tenê û girîng ew e ku bi giranî li bajaran rûdiniştin, bi otorîteya dewletê re ketibûn zikhev û wexta hewce bikira bi awayekî sernuxumandî û di dereceya duyemîn de serî li darê zorê didan. Li gorî xuya dike, rêzik û pîvanên ekonomiyê hene. Ew jî li gorî van rêzikan bi mejî û pereyê xwe yê pêşî, karê dikin. Eger li dîroka kapîtalê baş hûrûkûr were kolan wê were dîtin ku nirxê vê helwestê bi temamî bi qasî çîrokekê ye.

Di wan şerên mêtingehan ên ku tê de danehevên pêşî hatin komkirinde ti rêzik û pîvanên ekonomiyê tinebûn. Li Portekîz, Spanya, Hollanda, Franse û hînê berê jî li koloniyên bajarên Venedîk û Cenovayê rasterast bi temamî bi darê zorê danehevên kapîtal ên pêşî bi dest hatibûn xistin. Hem li bazarên welatên nêz,

hem jî li qadên mêtingeriyê tespîtkirina van rastiyan zehmet nîne. Ji Çil Heramiyan paşê efendî çêbûne. Begzade çêbûne. Mirov ji çil heramiyên modern re efendiyên bûrjûwa bibêje, ev ê ne ji modeyê wêdetir be. Disîplînên bi navê aborînasiyê fonksiyonên wan ên bingehîn ew in ku ser cewherê meseleyê bigirin. Kîjan teorî di van mijaran de pêşkêşiyeke serketîbike weke berhema sereke lêkolîna wê tê kirin û xelatê didinê. Bi qasî zanista diyardeya ekonomiyê, ti zanist bi rastiyan nelîstiye û rastî berevajî nekirine. Aqlê ku bûyeran dihûne, berevajîkirina wî ya herî mezin di qada polîtîk-ekonomiya kapîtalîst de derdikeve pêşiya me. Modernîteya kapîtalîst sîstema bi tenê ye ku xwedî luks e, bi temamî li ser vê zanista qelpezaniyê mezin bibe.

Ekonomî yan jî bidestxistina objeyên jiyana maddî, pirsgirêka herî bingehîn a zindîtiyê ye. Ji bo pêkhatina beridandinê, ekonomî amûrek e. Sîstema zindî, bi riya metabolîzmayê objeyên li gorî hezma xwe ji derve peyda dike û bi vî awayî hebûna xwe dewam dike. Rêzikeke gerdûnî ye; bi cihêbûnê beridîn jiyanê domdar dike. Ji bo bi awayekî pir zêde pêşî li pirbûna cinsekî bigire û dagirkeriya li ser cinsên din jî bisekinîne ango ji bo pêşî li tinebûna wan bigire, timî weznek an jî rewşek li ber çav girtiye. Ji bo mişk pir zêde nebin û nebatan tine nekin bi mar pêşiyê li zêdebûna wan digire, ji bo bizin, mîh û heywanên din hemû yên mîna dewaran giha û nebatan talan nekin bi heywanên dirinde pêşî li zêdebûna wan girtiye û weznek daniye ku cinsên wan hebûna xwe berdewam bikin, rê daye ku cinsên wan bi pêş bikevin. Gelo xweza çima bi vî awayî diberide? Mirov li gorî encamê dikare bersiva vê pirsê bide. Li gorî min, sedema bingehîn a vê yekê ew e; sîstema zindiyan bi vî awayî xwe domdar dike. Gelo mirov ji vê re dikare bibêje hovîtiya xwezayê yan jî dadperweriya wê? Ev guftûgoyeke cuda ye. Dîsa gelo ev yek encama mejiyekî pêşketî ye, yan jî têkiliya xwe bi paşve mayînê re heye? Xusûsa tê pirsîn, gelo mirov vê mijarê bixe çarçoveya metafizîkê yan na jî li gorî min pirseke manedar e û divê

mirov van pirsan weke yên der barê gerdûnê de bibîne û bi mejiyekî analîtîk li ser raweste. Mirov dikare têkiliya wê bi hebûnparêziyê (existentialism) re jî deyne.

Bersiva mirov bide van pirsan ew e ku beridîn hostatiyê timî li ber çav digire. Bi awayekî din, di rêveçûna gerdûn û zeman de hostatiyek, gera li seridandinê, kemaliyetê heye yan jî wer xuya dike. Naxwe em ê beridînê heta bi mirov û pêşketina mirov weke civakeke teng çawa rave bikin? Eger bi tevahî şêr an jî dewar hebûna û naverastê dagir bikirana û belkî jî jiyan ji asta kevzên destpêkê wêdetir neçûya. Beridandina bi heybet a heta bi mirov rê li pêkhatineke mîna wicdan û exlaq jî vekiriye. Maneya vê çi ye? Dilovanî û dadperwerî! Mirov vê rêzikê jî weha dikare îfade bike: 'Eger fikir yekbûya, gur û mîh wê bi hev re bijiyana.' Di vir de jî rêzika gerdûnîbûnê veşartiye. Gelo biratiya gur û mîhê mumkin e? Tevgera mirov nîşan daye ku ev yek mumkin e. Ango mirov bifikire û bixwaze ku mirov nabe gurê mirov, armanceke dest jê nabe ya mirovbûnê bi xwe ye. Jixwe demekê pêşiyên gur û mihê yek bûn. Piştre ji hev cihêbûn. Herdu jî çima bi kêmanî ji bo xwişk û biratiyê nebin yek û nekevin ser vê rêyê? Ev qet nebe weke teorî mumkin e û em li gelek mînakên di vî warî de rast tên.

Ez van xusûsan ji ber vê dibêjim: kapîtalîzm ji bo derketina xwe kêm bûyerên hovane yên em di beridandinê de dibînin ji xwe re weke mînak nîşan dide, lê bi mînakên me dan eşkere ye ku ev îdîaya wê tewş e. Em dikarin bersiveke balkêştir bidin û weha bibêjin: ji kevzên destpêkê ber bi kevzên bejî ve, ji wan jî ber bi darên bi heybet, ji vir jî sîstema bi mîlyonan zindiyên gihaxwir (heywanên hev naxwin) heye, em ê van mînak negirin, çima em ê çend mînakên ku weke kansêra beridandinê bin, mînak bibînin? Ez divê weke pêşekekê bibêjim ku di qanûnên beridandina xwezayî de cih ji teoriyên derketina kapîtalîzmê erê dikin re tineye. Ji bo bi heqdesta kêm mecbûrî xebatê bike her tim artêşa bê karan zêde dike. Prensîbeke wiha berevajî jî tevî viya ye.

Tespîteke biyolojîk e ku cinsê mirov, li ser hîmê civakîbûnê hebûna xwe dewam dike û tevahiya qonaxên beridandinê di nava xwe de digire û tevdigere. Eger em zanistê bêyî ku tevlî dînê pozîtîvîzmê bibin şîrove bikin, divê em baş zanibin ku ev bi xwe tesbîteke muhteşem e.Ezli vir dixwazim bibêjim; çi ev xisleta cinsê mirov çi hêza wî ya hilbijartina exlaqî û çi jî xisleta wî ya dadgeriyê (derfeta tercîha azad) ez ê wan di Sosyolojiya Azadiyê de guftûgo bikim.Ez ê bi kurtî PÊŞKETINA AHENGDAR a ku bi beridîna xwezayî ya pêşketina xwezayî re li hev e, bînim ziman. Dema min ev kir, ez ê hewl bidim îspat bikim ka çima divê em jiyana şaristaniyê ya xwe disipêre mezinbûna zêde ya bajaran û hêmanên dewlet û desthilatdariyê yên bi hiyerarşî û çînayetiyê mîna kulmozan mezin dibin, yan di kategoriya ‘zêde weke şêran’ de yan jî berevajî vê di kategoriya ‘zêde weke dewaran’ de bi cih bikin.

Beriya her tiştî divê ez bibêjim ku bûyerên bi vî rengî kêm be jî reh û rîşên xwe di beridandinê de hene, lê em dikarin van bûyeran di beridandina mirov de weke nexweşiyekê, ji rêderketinekê, mirovxwariyekê yan jî bermahiyeke çor şîrove bikin. Her weha divê em baş fêm bikin ku şêwazê ahenga xwezayî yê beridandinê ev nîne. Pir eşkere û hêsan destnîşankirina rastiya ku bi bikaranîna xisleteke bermahî sîstema civakî ango xwezaya duyemîn nayê afirandin jî, bi vê ve têkildar tenê diyarkirin (ev wezîfeyeke li pêşiya akademîsyenan e) ne bes e, bi giştî di şaristaniyê de û bi taybetî jî di qonaxa kapîtalîzmê de ya esas ew e ku mirov vê weke prensîbeke misêwa û mayînde ya jiyanê şîrove bike. Naxwe ji serî ve em ê şîroveyên xwe yên civakî seqet bikin.

Fernand Braudel wexta derketina kapîtalîzmê şîrove dike, vê yekê dispêre hebûna derfet û îmkanên danaberhev û hêza çavdêriyê. Her weha ji aliyê dîrokî, civakî, desthilatdarî, çand-şaristanî û mekanî yekpare di zikhev de digire dest, şîrove dike û bi vî awayî pirsgirêka rêbazê jî zelal dike. Li hemberî helwestên pozîtîvîst bi îhtiyat e. K. Marks di bin bandora zêde ya Rohnîbûnê

de zanista pozîtîvîst dike bingehê xwe û ji bo ekonomiyê bike zanistek têra xwe bi îddîa ye. Ji ber ku civaknasî hînê bi çarpîkan diçe para xwe di vê rewşê de heye. Di zanistê de misogerî û li ser xetekê qewimîna bûyeran ji zû ve weke 'amantû'yekê di mejiyan de cih girtibû, bist bûbû. Romantîzmê wexta hewl da vê xetê hilweşîne, berovajî bi îradeperestiyê ji rê derket û bi vî awayî, pirsgirêkên zêhnî hê girantir kirin. Helwesta Nietzsche ya bi giranî bi mejiyê hisî, guherbar (relativizm) û li dora xwe dizîvirê zêde nehat pêşxistin. Di vê hengameya zêhnî de lîberalîzm hema bêjin bi dilê xwe lotika dide. Kapîtalîzm zanista fizîkî ango kîmya, biyolojî û matematîk jî di navê de bi pozîtîvîzmê dike felsefe, bi gotineke rasttir dike dîn û di heman çarçoveyê de rastiya civakî bi lîberalîzmê dike felsefe û dîn. Li ser vî hîmî di şerê îdeolojîk de bi ser dikeve û di encam de bi sedsala 19'an re globalbûna sîstemê êdî hema zelal dibe. Jixwe di şerê aboriyê de beriya hingî bi ser ketiye. Em van rexne û şîroveyên xwe hinekî din bi firehî bînin ziman wê baştir bibe.

Komên mirovan di nava zêhnê xwe de timî li objeyên maddî yên pêdiviya wan pê heye geriyane û xwestine baştir bikin; xwarin, bicihbûn, zêdebûn û parastin timî fikarên wan ên bingehîn bûn. Komên destpêkê yên ku hewl didan pêwîstiyên xwe yên bingehîn bi cî bînin, berê çi didîtin û peyda dikirin qîma xwe pê dianîn.Di şikeftan de bi cî bûne, li keviyên gol û daristanan xwe parastine û ji dayika dizê re jî qedir girtine. Her diçe nêçîrvanî jî dikeve dewrê. Hem bicîanîna pêwîstiya xweparastinê û hem jî xwe xwedîkirina bi goşt vê çandê xurt dike. Lê belê ji destpêka civakbûnê ve di navbera berhevkirina pincaran a jinê û nêçîrvaniya ku bi giranî bi destê zilam de tengezariyek heye û pêşketina beridînên çandî yên cihê têne dîtin. Li herdu aliyan jî bûyerên yekalî ango pêşketin û paşketin hene; yek ji wan her diçe dibe 'mêrê weke şêran', ya din jî gav bi gav dikeve nav çanda 'jina weke dewaran'. Têgihîştinên cihê yên li ekonomiyê cara pêşî bi vî rengî hîmê xwe datînin. Di

serdema neolîtîkê de çanda jinê derdikeve asta herî jor. Piştî dema dawî ya qeşayî ango ji 15 hezar sal B.Z. ve, nexasim li qûntara sîstemên Toros-Zagrosan gelek cureyên nebat û heywanan, dihêle ku mirov bi hûnandina jiyaneke mîna cennetê rabin. Ji wê demê heta roja me ya îro çemê mezin ê civakbûnê ku diherike bi dîroka nivîskî û şaristaniyê cihêwaztir bû û mohra xwe li globalbûnê xist. Rewşa kom û malikên zimanan ên ku heta roja me hatine jî berhemên vê demê ne.

Di vê dema dîrokî ya dirêj a mirovatiyê de xusûsa bi tenê ya mirov dikare li ser kapîtalîzmê bibêje ew e ku mêrê çanda nêçîrvaniyê her ku çûye hegemonîk bûye. Bi qasî ku tê tespîtkirin çanda neolîtîk a di salên 10 hezarî B.Z. de mayînde bûye, bi giranî çanda jin-dayikê ye. Di pêvajoya berhevkirina nebatan de ji şikeftê derdikeve li kêleka wê li bin holikan bi cih dibe, tovên nebatan datîne û bi vî awayî rê li şoreşa gund û cotkariyê vedike. Li gorî daneyên di erdkolanên arkeolojîk ên di roja me ya îro de ev çanda em behsa wê dikin li tevahiya Mezopotamya Jor, nexasim li hundirê qûntara çiyayên Toros-Zagrosê li Bradostiyan, Xerza, Amanos, li herêmên hundir ên qûntara çiyayên Torosa Navîn, Newala Çorî, Çayonu û Çemê Hallanê tê dîtin. Berhemê zêde hindik be jî êdî didin serhev û hiltînin.

Ne weke têgîn, lê weke cewher mirov dikare cara pêşî ekonomiyê di vê daneheva berheman de bibîne. Weke tê zanîn, gotina eko-nomos Yewnanî ye û maneya wê; qanûna malbat, xaneyê ye. Kengî malbatên li dora dayikê çêbûne bi erdê re mijûl dibin û zêde nebe jî hin qût û zad hiltînin û dixin kewaran, mirov dikare êdî behsa ekonomiyê bike. Lê ev danehev û hilanîna qût û zad ji bo bazirganiyê nîne, ji bo malbatê ye. Jixwe ekonomiya rast û insanî jî ev e. Ji ber ku mirov danehevên xwe diyarî hev dikin, kes çavê xwe berî qût û zadê hev nade. Bi vî awayî danehev ji bo mirovan nabe sedema tehlûkeyê. Prensîba ‘mal timayiyê tîne’

herhal ji vê demê maye. Çanda xelat û diyariyê şêweyekî girîng ê ekonomiyê ye. Bi ahenga pêşketina mirov re jî têra xwe li hev dike.

Çanda qurbankirinê jî mirov dikare ji vê demê bide destpêkirinê. Hatina aborî ya mirovan her diçe zêde dibe. Ji ber vê yekê, weke hurmeta wan a ji nasnameya wan re şêweyê qurbankirinê ji têgîna xwedayan re çêdibe. Bi vî awayî mirov dikare meselê fêm bike û bibîne. Ji ber ku bereket malavahî û spasdariyê hewce dike. Têkiliyeke xwe ya xurt bi şoreşa cotkariyê re heye. Li gorî şêweyê koma mirovan ê beridîne, xwestine xwe bi nasname bikin, xwe mezin bikin, xwestine dua bikin, îbadetê bikin û bi pêşketina cîhana zêhnî hebûnên xwe pêşkêş kirine. Berhemên arkeolojîk vê fikrê bi awayekî balkêş piştrast dikin. Hînê bi awayekî berçavtir têgîna dayika xwedawend û dayika pîroz jî weke belgeyan li pêşberî me radiwestin. Pirbûna fîgurên jinan jî vê rastiyê têra xwe piştrast dikin.

Lê tehlûkeya tirs jê heye wê paşê bê. Berhemê zêde yê bi pêşketina zêhnî û ezmûneyê dikeve ser hev bi diyarî û xelatdayînê naqede, lê mêrê nêçîrvan ê li benda keys û firsendê ye, tevî karê xwe bazirganiya vî berhemê zêde jî dixe hişê xwe û li çanda xwe zêde dike. Li herêmên cuda berhemên cuda zêde dibin û ev yek bazirganiyê dixe dewrê. Berhem pêdiviyên beramberî hev ên aliyan tedarik dike, ev jî bi xwe re pîşeyê yan jî cara duyemîn dabaşkirina kar a civakî weke bazirganî û bazirgan derdixîne holê. Herçiqas bi fikaran barkirî be jî rewa dibe. Ji ber ku malên têne veguhestin dabeşkirina kar hêsan dike. Ew jî bi xwe re hilberîneke hînê bi bereket mumkin dike. Kengî li aliyekî zad û tevn, li aliyê din jî kanên madenê zêde dibin bazirganî jî manedar dibe.

Dîrok ji salên 4000 B.Z. de nîşan dide ku bazirganî bi awayekî berfireh heye. Li Mezopotamya Jêr dewleta bajêr a pêşî li dora sîteya Ûrûkê di salên 4000-3000 B.Z. de bi pêşketina şaristaniyê re ji Elam a li Başûr-Rojavayê Îranê û li Mezopotamya Jor li herêmên Elezîz û Meletiya îro koloniyeke bazirganan tê dîtin. Bi vî awayî

cara pêşî deriyên mêtingeriyê vedibin. Beriya hingî jî di salên 5000-4000 B.Z. de em kolonîvaniya çanda beriya Ûrûkê serwer a El Ubeydê dibînin. Ev çand berî dewletbûnê yekemîn çanda bavikan e ku hatiye tespîtkirin. Bazirganî û kolonî di zikhev de ne. Di berdêla dîzik û berhemên tevnê de bi giranî alavên maden û kereste têne veguhestin. Bi bazirganî û bazirgan re bazar jî şiklê xwe digire. Navendên berê yên qurban û diyarî dayînê hêdî hêdî vediguherin bazarê. Bazirganê wê demê li gorî xwe buhayê berhemên herêmên cuda diyar dike û belkî mirov dikare wî weke kapîtalîstê destpêkê bi nav bike. Ji ber ku bi xêra destnîşankirina buhayê alavan ew wer dibe xwediyê malekî ku heta wê rojê ti kes têde bi ser neketiye.

Em hînê di nava mijarê de ne, ji lewra divê ez bibêjim, dîsa bi hev guhertina mal û tevgera bazirganiyê cara pêşî rê li pêvajoya metabûnê vekiriye. Ji ekonomiya diyarîkirinê ber bi hev guhertina nirxê hînê gav nehatiye avêtin. Ji ber ku ji bo civakê ya esas nirxa bikaranîna mal û alavan e. Nirxa bikaranînê, ji bo tedarîkkirina pêdiviyekê, xisleteke mal e. Ji bo mirovan nirxa bingehîn jî ev e. Têgîna 'nirxê pevguhertinê' têra xwe cihê guftûgoyê ye. Ji lewra pir girîng e ku mirov wê rast bi nav bike. Li gorî min, Marks jî di navê de gelek kesan ked xistine bingehê nirxê guhertinê ku ev cihê nîqaşê ye. Mirov kedê çi berçav û çi jî neberçav rave bike, timî nirxê guhertinê aliyekî xwe yê spekulatîf heye. Ferazî em bibêjin; bazirganê pêşî yê Ûrûkî li koloniya xwe ya li peravên Firatê xwest dizîkan bi kevirên madenê biguhere. Gelo kî wê nirxê guhertinê diyar bike? Em dikarin bibêjin; pêşî wê hewcedariya herdu aliyan, ya duyemîn jî wê însiyatîfa bazirgan be. Eger xwesteka hewcedariyê zêde be, bazirgan çawa bixwaze wê li gorî dilê xwe nirxê diyar bike. Bi hêsayî dikare li şûna yekê diduyan, li şûna yekê çaran diyar bike. Tiştekî wî ji vê bigire nîne. Ji wicdanê wî, ya rastî ji hêza wî wêdetir ti tiştnîne wî bigire. Baş e, wê wextê rola kedê li ku ma?

Ez li vir bi tevahî faktora kedê li derve nahêlim. Lê ez îdîa dikim ku ya diyarker ew nîne. Di dîrokê de di tevahiya bi hev guhertinên mal de mirov dikare vê xusûsê bibîne. Car caran di reqabeta azad a kirîn û firotinê de mirov dikarin di asta wekheviyê de nêzî keda dane, bidin û bistînin. Lê ev danûstendineke zêdetir di asta teorîk a ked-nirxê de ye. Di pratîkê de ya diyarker spekulasyon e. Di hin rewşan de jî zêde mal dikeve ser hev. Wê wextê jî nirx û qîmeta wî dikeve binê sifrê. Îcar ji bo îmhakirina mal wekî din hewce bi kedekê heye. Em di vê rewşê de nikarin bibêjin nirxê kedê nîne, lê derdikeve holê ku ked xwedî roleke diyarker nîne. Dîsa yê xwediyê şensa afirandina tinebûn û zêdebûnê ye, hêza bazirgan bi xwe ye. Jixwe mal bi malan tê hilberandin. Di tevahiya dîrokê de bi keda danehev a hezaran kedkarên bê nav mal tê hilberandin. Baş e, gelo wê kîjan mekanîzmayêkaribe berdêla heqê xwediyê keda qeşagirtî bide? Em wexta para pîşesazên afirîner û heta bi tevahî çalakiyên civakî yên hewcedarî bi wan heye li van zêde bikin, keda zindî jêre tê gotin çiqasî mumkin e ku bibe xwedî buhayekê watedar ango nabe ku heqdestekî xwe hebe.

Seqetî an jî sextekariya ekonomî-polîtîka Ingilîzan di vir de li xwe eşkere dike. Çawa ku tê zanîn, kapîtalîzmê weke sîstem serketina xwe ya pêşî li girava Ingilistanê û Hollandayê bi dest xist. Ji bo kapîtalîzm rewa bibe, hewcedariya bi teoriyekê şert e. Nexasim jî hewcedarî bi hinceteke teorîk heye ku diyardeya kara wê ya spekulatîf veşêre. Çawa ku dînên bazirganiyê yên Ûrûkê hewcedariya wan bi vegotinên mîtolojîk hebû, pêşkêşkirina versiyoneke wan a nû jî bi zanyarên qaşo ekonomîk-polîtîk û di cewherê xwe de jî bi mûcîdên dînî yên nû yên kapîtalîzmê ket. Ya hat avakirin ne ekonomîk-polîtîk bû, dînekî nû bû. Mîna her dînî bû xwedî pirtûkên pîroz û mezhebên curbicur şaxên xwe jê berdan. Ekonomîk-polîtîk berhemeke sextekar û talanê ya mejiyê bûyeran dihûne ye ku ji talana Çil Heramiyan a kapîtalîzmê gelekî wêdetir

spekulatîf e, ango bi cudahiya di navbera herêman de lîstina bi buhayên alavan e. Di vê mijarê de teoriya ked-nirxê bi temamî amûrekî nêçîrê ye. Ez bi rastî meraq dikim ka çawa hatiye hilbijartin. Ez yeqîn dikim ku sedema wê ya sereke ew e ku pê serî li kedkaran bigerînin. Yekî mîna K. Marks jî mîna kesekî êm dide nêçîrê ketiye nava meseleyê û nikarîbûye xwe ji vê rewşê vede. Ez wexta vê rexneyê dikim, ez êşeke mezin dikişînim. Lê weke erkeke rêz û hurmeta me ya ji bo zanistê, qet nebe divê em gumanên xwe eşkere bikin.

Eger em hinekî din berfireh li ser van xusûsan rawestin em dikarin weha bibêjin:

Di dîrokê de em gavavêtina mezin a duyemîn a bazirganan di şexsê koloniyên Asûran de salên 2000î B.Z. dibînin. Dikare bê gotin, ti despotîzmê (ez ê di beşên paşê de têkiliya desthilatdariyê bi kapîtalîzmê re guftûgo bikim) bi qasî ya Asûr xwe nespartiye bazirganî û koloniyên bazirganiyê û şaristanî neafirandiye. Di asta global de (globalbûna wê demê) hêza ku cara pêşî yên kolonî û bazirganî di salên 2000-600 B.Z. de pêkanîn, Asûr bûn. Herçiqas di heman demê de bazirganên Fenîkiyan pişta xwe dan şaristaniya Misrê û bazirganî û kolonî bi hostayî pêşde birin jî dîsa di dereceya duyemîn de dimînin. Li cem Ingilistanê mîna Hollanda û Portekîzê, herduyan jî di dîrokê de bi zordariyên çavsorane bi bazirganiyê mîna Çiyayê Qafê nirx desteserkirin. Eger dîroka dewlemendiya Asûr û Fenîke ya bi bazirganî û zordariyê di zikhev de bi pêş ket, were lêkolînkirin, belkî mirov bibîne ku kolonyalîstên Ewrûpî yên mîna Spanya, Portekîz, Hollanda, Ingilisitan, Fransa, Belçîka û hwd. herî baş di van mînakan de bibîne ku di şopên wan de dimeşin. Asûrî bi pesn û serbilindî tînin ziman ka çawa bi serê mirovan keleh û dîwarên bircan lêkirine. Ev çand û exlaqê jiyanê ya li ser hîmê desteserkirinê ava kirin, hînê jî dest ji pêsîra Lubnan û Iraqê bernade û herdu welat hînê jî her mijarên şerên dilêşane ne. Komara Romayê bê sêdem Kartaca ango koloniya bazirganiyê ya

Fenîke bi erdê re nekir yek û nekir zevî. Dîsa Medan di salên 612'an B.Z. de Nînovayê bi erdê re kirin yek û wêran kirin.

Divê mirov balê bikişîne ser şaristaniyên bazirganiyan. Di dîrokê de yek ji sedema bingehîn a damezrandina dewletan û şeran girîngiya koloniyan û bazirganiyê ye, ya rastî parastina berjewendiyan e. Baş tê zanîn ku şerên li Rojhilata Navîn di cewherê xwe de ji bo bazirganiya petrolê ye. Cihê xemê ye ku şerên pêşî yê bazirganiyê lê destpêkirin, şerê dawî jî hînê bi dijwarî û bê rehm lê dewam dikin. Ev şer li Iraqê ye û navê Iraqê ji Ûrûkê tê. Mirov dikare hînê gelek mînakan bide, lê hewce nake.

Di vê demê de ku gav ber bi kapîtalîzmê ve têne avêtin û navenda şaristaniyê konê xwe li Ewrûpayê vedigire, dîsa em dibînin ku bazirganî serî dikişîne. Şaristaniya bazirganî û bazirganan a navenda wê Rojhilata Navîn, di serdema navîn de bi Îslamê ji nû ve pêngavek avêt. Xetîce bi xwe û karkerê wê yê paşê pêre zewicî Muhammed, li ser hîmê hevrikiyê xwe li selefkar û bazirganên bi koka xwe Cihû û Suryaniyên bi koka xwe Asûrî radikişînin û li ser hîmê zorê bingehê şaristaniya bazirganiya xwe dispêre Meke û Medîneyê datînin. Di bin perdeya dînî ya Îslamê de bajarên qedîm ên Rojhilata Navîn li dora bazirganiyê ji nû ve şên dibin. Bi têkçûna Bîzans û Sasaniyan re, di serî de Heleb, Bexda, Qahîre û Şam dibin xwedî toreke mezin a bajar û bazaran. Ji Çînê heta Okyonûsa Atlasê û heta hundirên Îndonezya û Efrîkayê tevn û tora bazirganiyê ya ku belav dibe tam globalbûnekê dijî. Piyaseyeke berfireh a dirav û metayan çêdibe. Pereyekî mezin di destê Cihû, Ermenî û Suryaniyan de dikeve serhev.

Ewrûpa bi temamî xwe dispêre vê mîrateyê. Dîrok şahid e ku çanda bazirganiyê ya li Rojhilata Navîn bi destê bazirganên misilman gaveke din avêt û ji sedsala 13'an û pêve bi pêşengiya bajarên Îtalyayê Cenova û Floransê, gav avêt Ewrûpayê. Pere û bazirganî sedema bingehîn a dewlemendiya van bajaran e. Ji bazirganiya di navbera Ewrûpa û Rojhilata Navîn re heta sedsala

16'an pêşengî kirin. Di dîrokê de belkî jî cara pêşî kapîtalîzm hem weke têgîn û hem jî weke pratîk serketinên xwe yên piçûk bi dest xistin. Di van serketinên piçûk de korsantiya li Derya Spî û yekdestiya buhaya alavan a di navbera du aliyên rojava-rojhilatê Derya Spî de bi roleke sereke radibin. Dîsa di bin siya darê zorê de spekulasyon bi wan re dimeşe. Bazirganî rê li ber kapîtalê, kapîtal li bazar, bazar rê li ber firehbûna spekulasyonê vedike û ji bo şaristaniya kapîtalîst dem ev dem e.

Prototîpeke vê qonaxê li serdema Athena-Roma ya klasîk di salên 500 B.Z. û salên 500 P.Z. de çêbûbû. Di vê serdemê de biserneketina kapîtalê ji ber hebûna giraniya cotkariyê û di şerên dînî de têkçûna wan bû. Li bajarên dewlet ên Îtalyayê ezmûneya serketî ya kapîtalîzmê di salên 1300-1600î de pir dereng nebû li Bakur-Rojava û Bakurê Ewrûpayê belav bû. Jixwe Spanya berê hatibû fetihkirin. Ji sedsala 16'an û pêve çîroka dirêj a bazirganî û bazirganan, cara pêşî sînorên ji bajaran bihurî û ew ji bo serketineke li gelemperiya welêt tengav kir.

Êdî li gelemperiya dinyayê bazarek çêbûye. Efrîka û Emerîka kirine mêtingeh. Împaratoriya Osmanî li derve hiştine, di ser Okyonûsa Atlas û Efrîka Başûr re gihîştine Hindistan û Çînê. Li Ewrûpayê gelekî bajar çêdibin. Cara pêşiye bajar ji cotkariyê serdestir dibin. Qraliyetên feodal dibin dewletên monarşîk ên modern. Împaratoriya Îslamê ya dawî împaratoriya Osmanî li pey hev derbên têkçûnê dixwe. Ronesans di sedsala 14'an de li Îtalyayê destpêkiribû û litevahiya Ewrûpayê belav bûbû. Di dîn de tevgera Reformasyonê li bakurê welatên Ewrûpayê bi serketibû. Şerên ji bo dîn cara pêşî êdî serdema xwe bi dawî kirin. Ya hînê girîngtir jî bi tevahî nirxên çandî û şaristaniyên Çîn, Hind û heta Efrîka û Emerîkayê li bênderên Ewrûpayê hatine rijandin. Li aliyekî dewleta modern û li aliyê din jî netewe derdikevin holê.

Kapîtalîzm wexta ber bi serketineke wiha ve dimeşe, çand, dîrok, daneheveke bazirganiyê ya ev çend mezin, şaristanî, erka

siyasî û dinyayeke yekpare ya bazarê daye pişta xwe. Ji bo ekonomiya kapîtalîst ev şertên pêş çênebin û xwe nesipêre wan, ma dikare gavê biavêje? Ji karîn û nekarînê wêdetir, ma mirov dikare kapîtalê bi xwe bifikire?

Şaristaniyêçawa li Mezopotamya Jêr bi sîteya Ûrûkê gava xwe ya pêşî bi bajarvanî, çîneyatî û dewletdariyê avêt û gava xwe ya diduyan a mezin bi bajarî û bazirganiya li Fenîke û Iyonyayê avêt, vê carê jî gava xwe ya mezin a sêyemîn li mekanê cografîk ê di nava şertên navbihurî de îdeal bûyî yê Îtalya, Hollanda û Ingilistanê li ser hîmê bazirganiya mezin û bajarîbûnê gav avêt ekonomiya kapaîtalîst a li gelemperiya dinyayê weke di ser bazarê re be û dijberê wê be berfireh bûbû. Ev yek hînê jî bi pêşengiya DYE'yê dewam dike.

Fernand Braudel bi israr wexta dibêje; ekonomiya kapîtalîst li dijî bazarê ye û şêweyekî ekonomiyê ye ku di qada bazirganiya mezin de xwe dispêre buhayên yekdestdar ên spekulatîf, di warê rastiya ekonomiyê de ji K. Marks bêhtir nêzî rastiyê ye.

Em şêwe an jî cureyekî tevgera ekonomîk dibînin ku di neynika dîrokê de bûye desthilatdar, di nava xwe de heta tu bibêjî bazar mezin kiriye, bi demê re ji bajêr êdî serdestiyê li derve li gundan dike, di nava pêşketineke civakî de girêdana wê ya bi dîn û exlaqêre ketiye dereceya duyemîn, metayên ketine serhev bi talaneke îdeolojîk û finasgerî desteser dike. Hemin ev şêweyê desteserkirinê bi vî rengî li gorî berê gelekî bi hostayî tê kirin. Li bazarê di çarçoveya xwestin û pêşkêşkirinê de buha diyar dibe û ev buha bi riya peran re tê nîşandan. Li şûna selefkarî û serafkariyên pêşî, banke, sened, perê kaxizî, kredî, muhasebe û şîrket têra xwe pêşketine û ev hemû di serdema modern de mijarên bingehîn ên îlmîhala ekonomiyê ne. Li vir a kêm maye raveya zanistî ye. Siyasetvanên aboriyê yên welatê sereke yê kapîtalîzmê Ingilîstanê, nakok jî be dijberên wê yên kişandî cem xwe û di serî de K. Marks sosyalîstan hewl daye vê yekê ava bikin.

Pergala talanê ya bi navê ekonomiya kapîtalîst kengî civakên dinyayê yên nû û berê û cografyayên wan bi tevahî kir mêtingeh û ji nû ve kir kole, bi tevahî hêzên wan ên erkê (dewletên wê demê bi deyndarkirinê ku şêweyekî desteserkirinê ye) bi xwe ve girêda, şerên herî hov ên dîrokê meşandin, li ser bunyeya civakê bi her tiştê wê lîst û hegemonya xwe da erêkirin. Bi ya min, K. Marks û yên piştî wî hatin û dibistanên fikrê yên weke wan ên ku ekonomiya kapîtalîst li gorî civaka berê weke şoreşger îlan kirin, li gorî min zanistê ava nakin. Pirtûka Das Kapîtal yek ji wan pirtûkan e ku li dijî kapîtalê bi herî zêde kêmasiyan hatiye nivîsandin û lewra jî pirtûkeke welê ye ku gelekî derfetê dide da ku mirov wê şaş şîrove bikin. Ez li vir Marks gunehbar nakim. Ez tenê dibêjim; pirtûka wî ji aliyê dîrok, dewlet, şoreş û demokrasiyê ve kêm e û nehatiye pêşxistin. Rewşenbîrên Ewrûpayê ku weke karekter xwe gelekî 'zanistparêz' dihesibînin, ji qastîka nebe jî bi awayekî sûbjektîv, ji ber pozîsyona xwe ya objektîv, bi lêkolîn û lêgerînên xwe yên li ser Das Kapîtalê, li ser bingeha antî-kapîtalîstiyê, li ser navê 'kedkaran' nikarîbûn îdeolojî û zanistê bikin. Lîberalîzm jî pir baş bi vê kêmasiya wan hisiya û bi tehlîlên der barê kapîtalê de ji ber ku derketina kapîtalîzmê weke bûyereke şoreşê îlan kirin, ev yek gelekî baş bi kar anî û îstîsmar kir. Jixwe piştre pêşî sosyal-demokratên elman, paşê sîstema sosyalîst a pêkhatî (Rûsya û Çîn jî di navê de) û herî dawiyê jî sîstemên rizgariya neteweyî asîmîle kirin (bi hêza îdeolojiya modernîst, dewleta netewe û îndustriyalîzmê) û bi vî awayî di şerê çînan de ku ji bonê gelekî têkoşîn hat kirin, bi ser ket. Li hemberî lîberalîzmê hersê ekol jî pir eşkere têkçûne û gelekî mixabin di vê mijarê de hînê jî kes eşkere rexneyê li xwe nagire.

Gotinek heye dibêjin: zanist dûr nêz wê ya xwe bi cih bîne. Eger ev metnên rewşenbîran, bi rastî der barê kapîtalîzmê de ku di serî de çîna karker şerekî li dijî dîrok û civakê ye, analîzên wan birastî zanistî bûbûna, wê li hemberî sîstema dijber bi vî rengî bi

bin neketina.Ya hînê xirabtir jî mîrateya wan ê evqasî badilhewa nehatibûya xwarin. Ez niha bi tenê bibêjim, ez ê vê guftûgoyê di Sosyolojiya Azadiyê de bi awayekî berfireh bikim û ez ê li vir rastiyên weke 'ekonomiya kapîtalîst' baştir bi nav bikim û hewl bidim di nav fonksiyona wan de ji hev derxim. Der barê daneheva sermayeyê de hin gotin hene gelek têne bikaranîn weke berhemê zêde, nirxa zêde, nirxa kedê, heqdest, kar, buha, yekdestdarî, bazar, pere û wekî din. Ez hewce nabînim li ser vê ferhenga ekonomîk rawestim. Li ser van mijaran bê hejmar lêkolîn hatine kirin. Ez ê li gorî helwesta xwe ya exlaqî û civakî wan di nava hêsantiya wan de bihêlim û ez ê bi mijarên sereke yên divê bêne ravekirin mijûl bibim, lê bi qasî hewce kir jî ez ê destê xwe bidim wan û bi wan bilebikim.

Mirovatiyeke heye ku kapîtalîzmê perçeperçe kiriye. Bi tevahî daneheva mirovatiyê ya dîrokî ku bi rê û rêbazên bêrehm û xasûkî asîmîle kir û di dawiyê de bi qirkirin û xeternakiya nukleerî bi dinyayê ket. Di çarçoveya ekonomîk de çêkirina têgînkirinên weke kar û heqdestê û di çarçoveya civakî de jî têgînên bûrjûwa û proleter ji bo ravekirina vê sîstema bi dinya me ketiye, şêweyekî pozîtîv ê zanistkirina wê ye û ev gavên pêşî ne têne avêtin. Mîna ku proleter bi serê xwe nirxa kedê diafirîne, paşê jî sermayedarê bi awayekî mîna xwediyê wî ye, berdêla pere û amûrên xwe yên din ji vê nirxê weke kar distîne. Yên bi vê tespîtê radibin wê weke hukmekî zanistî datînin holê û ev helwest bingehê ekonomîzmê ye. Herhal têgihîştina reduksiyonîst a ekonomîk ev e. Fikreke bi vî awayî ji ravekirina nirxê ya ji erkên siyasî, civakî û dîrokî qut bi serê xwe bi pirsgirêk e. Weke kes eger em karker û sermayedar weke xwedê mezin bikin jî nirx û qîmet bi vê têgihîştinê çênabe. Xisletên civakî-dîrokî yên nirxên ekonomîk gelekî zelal in. Jixwe bi sedema ku mirov zêdeyiyan diyarî hev dikin û wan pîroz dibînin, destpêkê bi hev guhertina nirxan jî şerm dibînin. Hînê jî ti cotkar nabêje; 'ez vî zadî çêdikim' hînê jî cotkar dibêjin; 'Em bi malê

pêşiyên xwe debara xwe dikin’. Jixwe gotina hin cotkaran a weke ‘Mala Xwedê ava, em bi dayîna wî debara xwe dikin’ pir eşkere nîşan dide ku ew ji çavkaniyê çi fêm dikin û ew bi vê gotinê xwe ji qaşo ‘zanistê’ manedartir îfade dike.

Dayikek, proleterekî neh mehan di malzaroka xwe de hildigire û bi hezar zehmetiyan heta wî dike hêza kar, baş e, em ê berdêla keda vê dayikêçawa bi nav bikin? Amûrên hilberînê yên bi daneheva hezaran salan çêbûne û sermayedaran ew dizîne, em ê çawa xwedîtiya wan û para wan diyar bikin? Em ji bîr nekin ku ti malê li bazarê tê firotin nirxa wî ya firotinê ya rastî nîne. Vedîtina avakirina teknîkî ya karxaneyekê berhema afirîner a bi hezaran kaşifî ye. Em ê nirxê keda van çawa diyar bikin û bidin kê? Eger mirov bi tevahî bê exlaq nebe ma mumkine para van a civakî ji nedîtî ve bê? Ma mirov van nirxên civakî û dîrokî di nava du kesan de par ve bike çiqasî bi têgihîştina li dadê re li hev dike? Jixwe malbat û derdorên van herdu kesan jî hene. Îcar malbat û civaka ev herdu kes parastine, ma hîç heqê van li ser wan nîne? Em hînê jî dikarin pirsên no zêde bikin. Lê evqas bi xwe jî têrê dike ku nîşan bide dualîteya kar-heqdestê çiqasî pirsgirêk e.

Em vê carê xwediyên karê û heqdestê weke bûrjûwa-proleter têkiliya wan deynin. Çiqasî rast e ku mirov di qonaxa derketinê ya van herdu çînan de wan weke du çînên şoreşger bi nav bike û îdîa bike ku li hemberî civaka berê ev herdu çîn rê li civaka nû vedikin? Di dîrokê de ti berdêla vê hevgirtinê nîne. Paşê li ser nakokiya bingehîn tên beramberî hevdu, lê têra xwe mînak nînin ku şerekî welê bi esas di navbera wan de nîşan bidin. Ew mînakên kêm jî jixwe şerên rêûresma berê ne. Ya berçav û diyar di nava jiyanê de ew e, çawa kole mîna pêvekeke bedena Fîrewn e, karker jî ji bo bûrjûwa di heman pozîsyonê de ye. Di dîrokê de ti çalakiyeke serketî ya koleyan li dijî efendiyên wan tineye. Spartakus bi xwe jî ku gelekî di vî warî de navê wî tê hildan, li gorî tehlîla dawî, em fêm

dikin ku ew jî asiyek e ku hesreta wî ya efendîtiyê heye. Em dizanin ku ji bilî vê ti Bernameya wî tinebû.

Divê em ji bîr nekin ku patron-karkeran mîrateya têkiliyên hezar salan ên kole-efendiyan, wergirt. Ev têkilî bi hezar girêkan bi hev ve girêdayî ne û çend mînakên îstîsna ne têde kes li ber patronan ranebûye û yên serî rakirine jî mirov nikare wan serketî bihesibîne. Têkilî, bi giranî li ser hîmê girêdana bi patron re hatine meşandin.Jixwe em dizanin, çend serîrakirinên karkeran jî piranî yên nîvgundiyan bûn û li dijî bêkartiyê pêk hatine. Serîrakirin bi bandorên giştî yên civakî ve têkildar in. Ya di têkiliyên karker-patron de xwe dide der jî ev bandor in. Ya girîngtir jî ne têkoşîna heq a karkeran li dijî patron e (me gotibû bi pirsgirêk e), têkoşîna li dijî proleterkirinê, karkerkirin û bêkarkirinê ye. Helwesteke manedar e û têkoşîneke civakî ya etîk e ku mirov proleterkirin, karkerkirin û bêkarkirinê qebûl neke. Em weke kesên bindest divê ti carî koletî, serftî û karkertiyê mezin û bilind nekin. Eger bi rastî tiştekî divê em mezin û bilind bikin hebe ew jî ew e ku mirov nebe kole, nebe serf û nebe karker. Meyla hevpar a tevahiya oportunîstan ew e ku efendiyan nas dikin, bi nav dikin, paşê jî têkoşînê pêşniyarî xizmetkaran dikin. Ev zêhniyetin ku tevahiya têkoşîna ked û heq a dîrokê pûç kirine. Bi kurtî, bi vantêgînên pêşî yên 'zanistê' ne mirov dikare sosyolojiyeke manedar bike, ne jî mirov dikare têkoşîneke serketî ya civakî pêşde bibe! Em wexta behsa van xusûsan dikin, em ked, nirx, çîn û karê înkar nakin, em zêdetir şêweyê wan ê di avakirina zanistê de rast nabînin. Ez dixwazim bibêjim ku sosyolojiyeke çewt hatiye avakirin.

Di jiyana ekonomîk a civakê de kapîtalîzm li qatên herî jor bi cih tê. Di destpêkê de bazirganê mezin bi buhayên yekdestdariyê yên li ser bazarê sermayeyê dide serhev. Sermaye jî li gorî terîfa xwe, nirxên pereyî ye ku timî xwe mezin dike. Nexasim di bazirganiya di navbera bazarên ji hev dûr û di nava wan de cudahiyeke mezin a buhayê heye de sermayedar bi pey danehevên

mezin dikevin. Rêya duyemîn a ji bo mezinbûnê jî ew e ku weke fînansê deynan didin dewletê û di berdêla wê de faîz û îltîzaman distînin. Dîsa demên şer û xelayêû bikaranînên kanên madenê ew dem û qadên din ên girîng in ku têra xwe jê dixwe. Ji bilî bazirganiyê eger kara xwe têde bibîne di cotkarî, îndustrî û sektora çûnûhatinê de cih digire. Bi şoreşa îndustiriyê re qadên bingehîn ên karê êdî sektora pîşesaziyê ye. Di herdu deman de jî bi xwestin û pêşkêşkirinê dilîze û bi vî awayî hewl dide hem hilberînê û hem jî bikaranînê diyar dike. Çiqasî karibe diyarker be, ewçend jî dikare rêjeya kara xwe zêde bike. Di dema destpêkê û stewîna kapîtalîzmê de bazirganiya mezin û pîşesazî qadên wê yên karê ne, lê di roja me ya îro de giraniya sektora fînansê heye. Amûrên sereke yên fînansê pere, senet, banke û kredî, ekonomiya kapîtalîst bi lez dike û qonaxên wê yên karê kin dike, bi vî awayî wê zêde û berfireh dike. Ji ber vê yekê di rêjeyên karê de balonên mezin ên spekulatîf çêdikin. Bi vî awayî pêvajoyên krîzê dibin parçeyekî vê ekonomiyê û ev ekonomî nikare bê wan bimeşe.

Bê karan zêde dikin û bi vî awayî heqdestan kêm dikin, li welatên ku karker lê bi heqdestekî kêm dixebitin sermayeyê radizînin û ev jî ji wan rêbazan e ku karê zêde dikin. Weke encam em dikarin bibêjin; ev şêweyê ekonomiyê çavkaniya xwe nêçîrvaniya berê û çanda bazirganiyê ye. Bi hêza xwe ya dikare bi buhayan bilîze şens û keysa pêşketinê dibîne, bi sistkirina dîn û exlaqê xwe ji kontrola civakê xilas dike, desthilatdariyê bi deynan bi xwe ve girê dide û bi yekdestdariya li ser bazarê pêş dikeve. Li gorî tehlîla dawî ev şêweyê ekonomiyê talan e. Bi armanca karê dest avêtiye îndustriyê, li gorî rêjeyên karê nêzî hilberîn û bikaranînê bûye. Ji ber vê yekê, barên gelekî giran ên nayên hilgirtin li bunya civakî û hawîrdora xwezayî kiriye û bi vî awayî rê li krîzan vekiriye û ji roja derketina wê ve hilweşîn û rizîn hevrêyên wê ne. Bêguman bi tevahî ekonomî kapîtalîzm nîne. Ne bazirganî, cotkarî, pîşesazî, ne jî çûnûhatina mal, bazar û teknîk,

vedîtinên kapîtalîzmê nînin, berevajî ev saziyên bingehîn ên civakî û ekonomîkin ku rastî îstîsmar û talaneke giran a kapîtalîzmê tên. Bi dîrok û şaristaniyê diyar dibe û bi polîtîkayê di zikhev de ye.

Bi vî awayî, min hewl da nîşan bidim ku ekonomîzm ekoleke fikrê û têgihîştinek e, binavkirina ekonomiya kapîtalîst gelekî berevajî kiriye. Di çarçoveya van rexneyan de min hewl da wê rast bi nav bikim û li ser hîmê têkiliyên civak û dîrokê, siyaset, çand û şaristaniyê di zikhev de şîrove bikim, ez yeqîn dikim ku bi vî awayî hindik be jî min mijar hinekî rohnî kir.

### C- Têkiliya wê bi Desthilatdariya Siyasî û bi Huqûqê re

Bi tevahî çavdêrî piştrast dikin ku kapîtalîzm hînê kakil e, şitl e li meştela desthilatdariya siyasî û huqûqê çêdibe. Kapîtalîzm ji her desthilatdariyê û huqûqa wê sûd wergirtiye û wexta bi kêra wê hatiye bi awayekî muhafezekar ew parastiye, lê wexta zirar li berjewendiyên wê bûye bi her rêbaza komplowarî –tevlîbûna çalakiyên şoreşgerane jî di navê de- ketiye nav tevgerê. Carnan bi çavkorî tevlî lîstika şoreşgertiyê jî bûye. Ji darbekariyafaşîst heta darbekariya sexte ya kominîzmê –nexasim di demên pêsîrtengî û kaosê de- şerên desthlatdariyê pêk anîne. Di dîrokê de şerên mezin û berfireh ên împaratorî, emperyalîzm û mêtingeriyê meşandine.

Ti şêweyê ekonomiyê bi qasî kapîtalîzmê hewcedariya xwe bi zirxê desthilatdariyê nabîne û her weha divê em bi girîngî destnîşan bikin ku kapîtalîzm bê desthilatdarî nikare pêk bê. 'Zanyarên' ekonomî-polîtîk weke xisleta bingehîn a kapîtalîzmê îdîa dikin ku di dîrokê de cara pêşî li derveyî desthilatdariyê bi rêbaza ekonomîk bi dilxwaziya bi hev re a ked-sermayeyê berhemê zêde-nirx û kar çêbûye. Hem jî vê weke feraziyeke sereke dibêjin. Li vir em bi gotinekê re ku bi qasî teoriya kedê hatiye berevajîkirin rûbirû ne. Ji hin deveran bi şêweyekî aştiyane sermaye hatiye peydakirin; dîsa di encama têkiliyên aştiyane de gundî, serf û pîşesazên ji amûrên hilberînê qut dibin, têne cem hev

û mîna zewaceke şoreşgerane û bextewer kiribin, weke nirxên kêrhatî sentezekê çêdikin û bi şêweyê ekonomiyeke nû derdikevin ser dika dîrokê. Yanî kurtûkurmancî çîrok welê tê nivîsandin. Çi çepgir û çi jî rastgir ekonomî-siyasetvanên mezin di metnên li biryargehan de amade dikin, weke 'amentûyekê' qîmet didin vê îdîayê. Ev îdîa nebe ekonomî-polîtîk jî nabe. Eger tu li vê reqabeta li bazarê jî zêde bikî, te pirtûkeke temam a ekonomî-polîtîk di çarçoveya prensîbên bingehîn de nivîsandiye.

Ez dibêjim hewce nake ku ez bi xwe tiştekî îdea bikim. Fernand Braudel weke sosyolog û dîroknasekî di lêkolîna xwe ya bi navê Şaristaniya Maddî de (ku berhemeke şahane ya sê cild a keda sîh salan e) bi helwestên xwe yên muqayesekirin û lêkolînê vê yekê bi awayekî zelal derew derdixîne. Braudel di cilda yekê ya vê berhema xwe de îdea dike ku kapîtalîzm li dijî bazarê ye. Duyemîn, kapîtalîzm heta qirikê di nava hêz û desthilatdariyê de ye. Sêyemîn, ji destpêkê ve berî û piştî îndustiriyê her yekdestdar bû. Çaremîn, kapîtalîst ne bi reqabeta ji hundir û ji jêr ve, lê ji derve û ji jor ve bi yekdestiyê –bi talanê- hatiye ferzkirin. Fikra sereke ya pirtûkê ev e. Herçend aliyê pirtûkê yên kêm û ez tevlî nabim hene jî bi giştî ji aliyê naverok û cewherê ve şîroveyeke civaknasî û dîrokî ya hêja ye. Bi kêmanî ji bo sererastkirina texrîbat û berevajîkirinên li ser zanista civakî ekonomî-siyasetvanên Ingilîz, sosyalîstên Fransî, dîroknas û fîlozofên elman bi sînor be jî destpêkeke baş e.

Sîstemeke ekonomîk nîneku di nava atmosfereke reqabetê ya bi dilê xwe û serbest de karker û kapîtalîstan hêz û daneheva xwe ya kedê kirine yek. Çîrok û çîvanok jî evqasî ji rastiyan dûr neketine. Kom û yek bi yek hêmanên em dikarin weke çîna kapîtalîst bihesibînin û dîsa hêzên xwediyê ekonomiyê saniyeyekê jî bêyî parastina desthilatdariyê nikarin li ser piyan bisekinin û desthilatdarî di destê wan de namîne. Dîsa bêyî dorgirtina berfireh a desthilatdariyê li ti bazara bajêr kirîn û firotina mal bi reqabeteke serbest û li ser hêza kar, bazar nabe. Ya girîngtir, ev

yek jî heta ku serf, gundî û pîşesazê li bajêr bi awayekî bêrehm û bêedalet ji erd û dezgehên wan neyên kirin, ev atmosfera em behsa wê dikin, bi cih nayê. Li Ewrûpayê ji sedsala 14'an heta 19'an kedkarên erd û dezgehan ên mîna bi diya xwe ve girêdayî bi kar û xebata xwe ve girêdayî bûn, kengî ew ji cih û debara wan kirin, serî rakirin û bi serhildanan rabûn. Bi hezaran mirov hatin darvekirin, bi milyonan mirov di şerên navxweyî de hatin kuştin, di hepisxane û nexweşxaneyan de hatine rizandin. Van jî têrê nekiriye, di şerê netewe û mezheban de naverast bûye derya xwînê. Şerên mêtingeriyê û şerên emperyalîst li vê encama kambax bobelatên nû zêde kirine.

Ev bi tevahî bandorên bi darê zorê di derketina kapîtalîzmê de têkiliya xwe bi karekterê wê yê talanker ê yekdestdar re heye ku ferz dike. Em vê têkiliyê bi hêsanî û eşkere dibînin. Ma kîjan retorîka ekonomîk-polîtîk dikare vê rastiyê berepaş û berevajî bike?

Em ji bo rastiyê hînê eşkere bibînin divê em ji nêz ve çav li şerên di sedsala 16'an de bigerînin ku van şeran kapîtalîst bi ser xistin.Hêmanên sereke yên şer û desthilatdariyê yên sedsalê ev in; binemala Habsbûrgê ya milê împaratoriya Spanyayê, li Franseyê qralên ji binemala Valois, li Ingilistanê xanedanên Stuart ên Anglo Sakson ku ketin şûna qralên bi koka xwe Norman û ya herî balkêş jî Prenstiya Orange ya Hollandayê bû ku ev prenstiya hînê varik bû û nav lê nehatibû kirin, ew ê rêzeke reaksiyonan bida destpêkirin.

Împarator û qralên elman ên bi koka xwe Habsbûrgî, piştî ku misilman ji Spanyayê di salên 1500'î de hatin qewitandin bi hêz bûn û ber bi împaratoriyê ve meşiyan, xwe weke xwediyê mîrasa Romayê dibînin. Di sala 1453'an de ketina destê Osmaniyan a Konstanatînopolîsê û di şerê bi Osmaniyan re serkêşiya Habsbûrgiyên Awusturyayî weke sedema vê îdîayê tê bikaranîn. Silaleya qralê Fransewî Valoîs jî bi pey împaratoriyê ketiye. Xwe weke xwediyê rastî yê mîrateya Romayê dibîne. Qraltiya

Ingilistanê û mîregtiya Orange ya Hollandayê ji bo ji aliyê van herdu împaratoriyan ve neyên daqurtandin şerekî mîna yê proto-rizgariya neteweyî dimeşînin. Qraltiya Swêdê, Mîregtiya Prûsyayê û heta dema Mîregtiya Moskovayê bû çartî, hêzên weke vana wê li pey hev weke tevgerên bi heman rengî li dinyayê deng vedana. Qraltiya Ingilistanê û Mîregtiya Orangê di serê sedsala 16'an de bi tehlûkeyeke rastî re rûbirû ne ango heye ku ji aliyê Qraltiya Franse û Spanyayê ve werin daqurtandin. Eger ev çalakî bi serketana, di serî de Ingilistan û Hollanda li Bakur-Rojavayê Ewrûpayê ya ku pêşketina kapîtalîst lê serwer e, bi îhtîmaleke mezin biketa rewşa bajarên Îtalyayê Venedîk, Cenova û Floranseyê.

Ji van bajarên Îtalyayê yên gelekî bihêzbûyî yên kapîtalîst nehat ku kapîtalizmê li seranserê Îtalyayê bi ser bixin; sedema sereke ya vê yekê bêtaqetiya wan a siyasî bû. Bi gotineke hînê rasttir mirov dikare bibêje ku li ser dewlemendiyên Îtalyayê şerên mêtingeriyê û serweriyê yên împaratorî û qraliyetên Spanya, Franse û Awûsturyayê kir ku bajarên Îtalyayê serî bitewînin. Bajarên navborî qîma xwe bi hêzeke sînorkirî ya ekonomîk û siyasî anîne. Ji lewra hem yekîtiya Îtalyayê dereng maye, hem jî ezmûna Îtalyayê ya kapîtalîzmê nîvco maye û li tevahiya welat belav nebûye. Demborî be jî di vir de zor bi roleke diyarker rabûye. Çawa wekî ku her hêmana kapîtalîstî li beramberî hev dike, kapîtalîstên bajarên Îtalyayê jî di berdêla ji serweriya siyasî bigerin wan bi rêya fînansê bi xwe ve girêdidin û xwe ji polîtîkaya 'bide û bistîne' paşve nadin. Ji ber ku dînê nû yê kapîtalîzmê li dora pere > pere (PP) şikil digire.

Qraltiya Ingilîstanê û Mîregtiya Orangê têk neçûn. Hêmanên kapîtalîstî hem kredî dabûn dewletê, hem jî bi dewletê re pîşesaziya keştiyan a çûnûhatinê çêkiribûn, ev sedema sereke ya nebinketina Qraltiya Ingilîstan û Mîregtiya Orangê ye. Li ser artêşa bejahiyê zêde nesekinîn, giraniya xwe bêhtir dan hêzaderyayî û vê

yekê rêya serketinê li wan vekir. Di vê pêvajoyê de du bûyerên girîng ên stratejîk qewimîne:

1- Qraltiya Ingilîstanê û Prenstiya Hollandayê bi şêwazê kapîtalîst giraniya xwe dan modela dewleta ji nû ve xwe bi rêxistin dike û çalak dibe. Dewletên bi vî rengî dibin mînakên pêşî yên bi rêkûpêk bacê berhev dikin, budçeyê maqûl parve dikin, bi burokrasiyeke aqilane û profesyonel radibin. Bi hêza xwe ya deryayî ya serketî hêzên deryayî yên Spanya û Franseyê têk birin. Serweriya wan a li Okyanûsa li Atlasê û paşê jî li Derya Spî çarenûsa şerên mêtingeriyê diyar kir. Serberjêrçûna Franse û Spanyayê jî bi vî awayî dest pê dike. Serketina Qraltiyên Franse û Spanyayê ya di şerê erdê re, bi sedema deyndarbûne serketina wan vediguhere serketinên Pîrûsê. Li gorî şîroveyeke giştî jî ya tê qebûlkirin, guhertinên nû yên di desthilatdariya Ingilîstan û Hollandayê de çarenûsa ekonomiya kapîtalîst diyar kiriye. Em careke din dibînin ku di werçerxeke krîtîk de zora siyasî dikare li ser şêweyê ekonomîk bi roleke diyarker rabe. Ya bajarên Îtalyayê têde nikarin bi serkevin, bajarên London û Amsterdamê têde bi ser dikevin.

2- Bûyereke berevajî erka siyasî ya Hollanda û Ingilîstanê, di vê sedsalê de li cem împaratoriyên Awûsturya, Franse û Spanyayê diqewime. Ev hersê dewletjî dixwestin modeleke mîna Romayê ava bikin. Di nava wan de hem xizmantiyeke xurt hebû, hem jî nakokiyên mezin hebûn. Qraltiya Ingilîstanê pir zû ji vê xwesteka xwe xilas bû. Li şûna împaratoriya Ewrûpayê çavê xwe berda împaratoriya dinyayê. Di çarçoveya serketina sîstema kapîtalîst de rejîmên dewletên Spanya, Franse û Awûsturya herçiqas ji bo bibin monarşiyên modern gelek reform kirin jî ya rastî ji aliyê cewherî ve amûrên siyasî ne ku li gorî sîstema civakî ya berê şikil girtine. Ji wan nedihat ku sîstemeke bacê ya modern, burokrasî û artêşeke profesyonel damezrînin. Budçeya wan bê wezin bû. Timî deyn dikirin. Aloziyên ji ber kapîtalîzmê derdiketin nikarîbûn çareser

bikin. Bihêlin kapîtalîstên wanpiştgiriyeke tam bidin wan, ji ber deyn û îltîzaman bi wan re di nava nakokiyên mezin de bûn. Navendbûnû bi sedema pêngava qraltiya monarşîk nakokiyên bi arîstokrasiya feodal re gelekî zêde bûn. Ji ber nakokiya di navbera bajar û gund de tevahiya civakê serî rakiribû. Bi tenê bi serê xwe serhildanan jî dikarîbûnbêhnê li van monarşiyan biçikînin. Ji ber ku Hollanda û Ingilîstanê di binî re destek didan muxalifan, rê li ber gelek şoreşan vedikirin. Bêguman carnan armanc û encam gelekî cihê dibûn. Çawa ku di Şoreşa Mezin a Franseyê de çêbû.

Li Îtalyayê heman hêzên ku serketina civakî û siyasî ya ekonomiya kapîtalîst asteng kirin, monarşiyên Franse, Spanya û Awûsturya; li hemberî modelên dewletên ji aliyê kapîtalîstên bajêr ên Ingilîstan û Hollandayê dihatin destekkirin ve, gelek caran nikarîbûn xwe ji têkçûnê xilas bikin. Em careke din eşkere dibînin ku têkiliyên di navbera sîstemên zorê û şêweyên ekonomiyê de rê li ber encamên stratejîk vedikin. Ji bo serwextbûna li têkiliyên di navbera zor, desthilatdarî û ekonomiyê de Ewrûpaya sedsala 16. weke laboratuarekê kêrhatî ye. Fena ku bi tevahî dîroka şaristaniyê ji gora xwe rabûbe û qala çîroka xwe bike. Mîna ku wiha bibêje: tu bi qasî ku sedsala 16. ya Ewrûpayê fêm bikî, tu yê min jî fêm bikî!

Eger mirov têkiliya di navbera zor û ekonomiyê de bi kurtî bi bûyerên dîrokî-civakî bîne ziman mijar wê hînê baştir were fêmkirin.

**a-** Di serdemên civakê yên beriya şaristaniyê de bi zora cara pêşî ji aliyê ‘zilamê xurt’ ve hat birêxistinkirin ne tenê heywan pê ketin dafik û xefikê. Keda hisî ya jinê ku mirov dikare weke nûra çavan jî bi nav bike û daneheva malbat û klanê ye, heman rêxistiniyê çav berdayê, destavêtê û xist dafikê. Cara pêşî ye zor evçend ciddî tê birêxistinkirin. Bi vê zorê, jin, zarokên wê û xizmên wê yên din; bi tevahî danehevên wan ên maddî û manewî, ekonomiya malê ya destpêkê hatin desteserkirin, talankirin. Li ser

vî hîmî, proto-rahib şaman, şêxê xwedî tecrûbe û ezmûn zilamê xurt ê xwedî rêxistinkirina zorê destê xwe dan hev û bi vî awayî di dîrokê de rêveberiya pîroz a hiyerarşîk a bavikanî cara pêşî pêkhat û em qonaxên vê bi heman rengî di tevahiya pêvajoyên dîrokê de dibînin. Eşkere ye ku ji destpêka derketina xwe ev hiyerarşî di jiyana ekonomîk û civakî de heta qonaxa çînîbûn, bajarbûn û dewletbûnê bi roleke diyarker rabû.

**b-** Şêweyê aboriyê yê bi pêvajoya şaristaniya bi pêkhatina çîn-bajar-dewletê dest pê kir û ev kulmoza hêzê ya em dikarin weke rahib-qral-fermandar muşexes bikin jêre dewlet tê gotin. Eskerî-siyaset-dîn weke sazî di zikhev de desthilatdariyê pêk tîne. Yek ji xisleta bingehîn a vê sîstema hêzê ew e ku aboriya xwe bi şêweyê kominîzma dewletê bi rêxistin kiriye. Min hînê nedîtibû Max Weber bi kar aniye, min jî ji vî şêwazê aboriyê re 'sosyalîzma firewn' digot. Aboriya dayiktiyê di nava aboriya eşîrî-feodal û baviktiyê de bi awayekî bermahî hebûna xwe dewam dike. Di sosyalîzma firewnan de mirov weke koleyên ji rêzê têne xebitandin. Mafekî wan heye ew jî ji bo nemirin tasek şorbe ye. Li dora perestgeh, qesr û avahiyan hînê jî bi hezaran kûzikên tasên şorbê peyda dibin û ev, a em behsê dikin piştrast dike.

Zor a bi şêweyê dewletê xwe birêxistin kiriye, li her qada digihîjê di warê aboriyê de çi bibîne li cem xwe heq dibîne ku talan bike. Talan, şiklekî mafê yên zorê bi kar tîne tê dîtin. Zor tiştekî xwedayî û pîroz e. Çi bike heq e û helal e. Nemaze navend Rojhilata Navîn şaristaniyên Hind û Çînê avahiya jor a siyasî yan jî kast, li cem xwe heq dibînin ku avahiya jêr bi her awayî di warê aboriyê de bi dilê xwe bi kar bînin û rêve bibin. Ji ber ku bazar û reqabet hînê çênebûne têgîneke karûbarê aboriyê bi maneya îro îfade bike çênebûye. Herçiqas bazirganî hebe jî ev çalakî yek ji fonksiyona sereke ya di navbera dewletan de ye. Bazirganî hînê taybetî nebûye. Yekdestdariya dewletê di heman demê de yekdestdariya bazirganiyê ye. Bajarên bazarê pir kêm caran li herêmên tampon

ên dewletan, ew jî car caran, çêdibin. Ew jî di demeke kin de vediguherin dewletên bajêr. Ji ber ku di vê pêvajoyê de bazirganî bi karwanan tê kirin, şêlandinên 'Çil Heramiyan', 'Korsan' û 'Cerdevanan' piştî 'zilamê xurt' herî kêm bi qasî dizî û şêlandina dewletê hene.

**c-** Di dema şaristaniya Grek-Roma de em dibînin ku bajar, bazar û bazirganiya xweser pir zêde û belav in. Babîl û despotîzma Asûrê ku mîrateya Ûrûk û Ûrê wergirt, bi vekirina nûneriyên bazirganiyê belkî jî cara pêşî di warê aboriyê de ji bo ekonomî û şaristaniyê gaveke kêrhatî avêtin. Li vir têgînên bazar-karûm-kar ketine zikhev. Jixwe dîroka koloniyên bazirganiyê diçe heta bi Ûrûkê û beriya wê. Pêkhatina bazarê û zêdebûna guhertinê, dike ku dewleta Asûr weke împaratoriya pêşî ya bi heybet derkeve ser dika dîrokê. Ya rastî împaratorî bersivê didin ewlehiya ji bo aboriyê pêdivî pê heye. Li cem Asûran ji ber ku stûna sereke ya aboriyê bazirganî ye, bazirganî û karûm rêxistineke siyasî ya bi şêweyê împaratoriyê ferz dikin. Dîrok ji me re wexta behsa împaratoriya Asûrê dike wê weke împaratoriya herî xedar û despot bi nav dike. Dîsa bingeha viya ew e ku Asûr di warê yekdestdariya bazirganiyê de pêşnûmeyeke kapîtalîzmê ye. Li cem Asûran avahiya jor a kapîtalîzma bazirganî-yekdestdariyê bi xwe re rêveberiya herî xedar a împaratoriyê aniye.

Erka siyasî ya Grek-Romayê, li mîrateya ji Asûran girtibû mîrateya ji Fenîkeyan mayî jî zêde kir û bi vî awayî bi jor-avahiyeke siyasî avakirina binesaziyeke ekonomîk bi ser xistin. Bihevguhertina mal zêde bûye, bi sînor be jî bajarên xweser, bazar, bazirganî û reqabet êdî li ser kar in. Em bajarvaniyekê dibînin ku êdî bi gund re di weznekê de ye. Gund êdî bi armanca guhertinê ji bo bajaran berhemê zêde hildiberînin. Bazirganiya berhemên tevnê, maden, qût û zad pêş ketiye. Nexasim ji bo vê yekê, ji Çînê heta Okyanûsa Atlasê rê hatine vekirin. Erka siyasî ya li Îranê bi bazirganiya rojhilat-rojava vediguhere împaratoriyeke bazirganiyê

ya mayînde. Bi qasî ku Grek û Romayê bixin bin hegemonyaya xwe ew tengav kirine. Li pêşiya tevgerên dagirkirina rojavaji aliyê qewmên Çîn, Hind û Asya Navîn û erkên wan ên siyasî Îran benda sereke ye. Ji bo Rojava jî Rojhilat dagir neke, dîsa bi rola bendê radibe. Lê Skender û yên piştî wî tên, tenê ji bo demeke kin (salên 330-250 B.Z.) vê bendê xira kirine û karibûne deriyên bendavê vekin.

Şaristaniya Greko-Roma li mekanekî ye ku em mînakên pêşî yên aboriya kapîtalîst temsîl dikin, lê dibînin. Asta xweser a bajaran, li bazarê guhertin û destnîşankirina buhayan û hebûna bazirganên mezin êdî nîşan dide ku hebûna kapîtalîzmê hatiye ber derî. Çi hêza gundan a li hemberî bajêr, çi jî rêxistiniya împaratoriyê (esas xwe dispêre aboriya gundan), nahêlin ku kapîtalîzm bibe sîstema serdest a civakî. Kapîtalîst bi piranî weke bazirganên mezin dimînin. Destwerdana wan a hilberîn û îndustriyê heta bibêjî bi sînor e. Her weha bi astengkirinên cidî yên erka siyasî re rûbirû ne. Koletiya bi efendiyê xwe ve girêdayî hînê di rewşeke gelekî xurt de ye, ji lewra şensê hêza kar a serbest bibebi qasî tine be, hindik e. Jin weke cariye, mêr jî bi tevahî bedena xwe weke kole têne kirîn û firotin. Hemin hêza bi tenê ya diyarker a aboriya kole, şîddet e. Weke nirxekî ekonomîk hebûna koleyan bi tenê jî nîşan dide ku di navbera şîddet û ekonomiyê de (ekonomiya xwe dispêre desteserkirina berhemê zêde) bi qasî neyê nîqaşkirin têkiliyeke aşkere heye. Di sîstema Serdema Destpêkê ya Çîn û Hindê de ji damezrandina kasta siyasî û eskerî heta mêtingeriya kapîtalîst civaka li jêr weke kargeheke aboriyê hatiye dîtin û xebitandin û ev yek weke wezîfeyeke xwe ya bingehîn a rêveberî û mafekî xwe yê xwezayî hesibandine, ya rastî weke mafekî xwe yê xwedayî dîtine.

Ekonomî weke gotin, aydî Serdema Kevn a cîhana Grek-Helen e. Weke qanûna malê tê şîrovekirin, ev yek hem têkiliya wê ya bi jinê re destnîşan dike, hem jî rewşa erka siyasî ya rêûresmê eşkere

nîşan dide. Ew di ser ekonomiyê re mîna rola yekdestdariyê ya di serdema kapîtalîzmê de bi rola yekdestdariya siyasî radibin. Ez divê vê xusûsê bi girîngî bînim ziman ku di navbera yekdestdariya siyasî û yekdestdariya ekonomîk de têkiliya bi hev re ya dualî-piralî (correlation) şidandî heye û yek hewcedariya bi ya din ferz dike. Hêza siyasî ya Roma û Atînayê ji ber ku gelekî mezin e, bi awayekî paradoksî li kapîtalîzmê girtî ye. Li aliyê din, ji ber ku li hemberî gund pir biçûk dimînin piçûk e, hêza wê têra ekonomiyeke bi koka xwe bajêr nake. Di vê demê de tevî ku şaristanî kapîtalîstan nas dike jî, şert û merc hînêdest nadin ku ji aliyê sîstemî ve pêş bikevin.

**d-** Di şaristaniya Îslamê ya Serdema Navîn de bazirganî heta bibêjî bi roleke mezin radibe. Dînê Îslamê û Hz. Muhammed ji aliyê aborî ve têra xwe têkildarî bazirganiyê ne. Arîstokrasiya ereb a di navbera Împaratoriyên Bîzans û Sasanî de tengav bûye, ji aliyê bazirganiyê ve pêş dikeve û di derketina Îslamê de jî ev sedema bingehîn a aborî û civakî heye. Jixwe tê zanîn ku Îslam bi derketina xwe re şûr weke esas dibîne. Serdestiya li ser pere û bazirganiyê ya Suryaniyên ji ber Asûr û Cihûyan mayî nakokiya wan bi Ereban re eşkere nîşan dide. Jixwe rê nade ku du hêzên yekdestdar Bîzans û Sasanî bêhna xwe bidin. Ev rewş di vê qonaxa dîrokî û vî mekanê qedîm de têkiliya di navbera zor û ekonomiyê de balkêş dibe. Serdema Navîn her weke serdema Îslamê ye. Ji bo bazirganiyê bi qasî ku pêdivî bi şêwazê împaratoriyê heye, haya wê jê heye ku ji ber heman sedeman pêşiya wê tê girtin. Ji bo sermaya bazirganiyê veneguhere şêwazê hilberîna kapîtalîst timî wê asteng dike. Di bin kontroleke şidandî ya exlaq, dîn û tevna civakî ya gund de ye. Ev sermaye serbestiya bi sînor a li bajaran bi dest xistiye venaguherîne hêza siyasî. Tevî tevneke mezin a bajar û bazaran û heta bibêjî mezinbûna bajaran, di wê hêzê de nîne ku ji bajarên Îtalyayê bibihure. Pirsgirêk ji sedî sed teknolojîk nîne; sedema vê faktorên ji yekdestdariya dînî û siyasî ye. Gelek caran bazirgan tên

musaderekirin ango bi qanûnan malê wî tê desteserkirin ku ev jî ji sîstemê ye. Ji Îslamiyetê kaptîalîzm peyde nabe û mirov dikare vê yekê ji qenciya wê bihesibîne. Hînê jî li dijî kapîtalîzmê astengeke ciddî ye û eger mirov ji aliyê erênî ve li meseleyê binêre dikare di projeyên azadiyê yên civakî de gelekî bi kêr bê. Ji ber ku têgihîştinên Îslamê yên mîna enternasyonalîzm qewm û ummetê, dijberiya wê ya faîzê, alîkariya bi xizanan re û xusûsên wekî van aliyê wê yên kêrhatî ne. Lê divê mirov baş bibîne ku îslama radîkal a heyî di himbêza xwe de neo-Îslameke kapîtalîst a milletgiriya ekonomîk û rastgir jî dihewîne.

Emewiyên Endulus, bi pêşengiya Ereb û Berberiyan, çanda şaristaniya Îslamê derbasî Ewrûpayê kirin. Bazirganên bajêr ên Îtalî jî ekonomî-bazirganî barkirin û derbaskirin. Bi tenê bi sînor be jî, Osmaniyan jîyekdestdariya siyasî derbasî Ewrûpayê kiriye. Bandora wan li ser hêzên dînî û siyasî yên Ewrûpayê bûye ku ji bo li dijî Osmaniyan bi ser bikevin xwe bêtir bi kapîtalîzmê girtine. Eger Osmanî nebûna belkî jî yekdestdariya siyasî û dînî ya Ewrûpayê wê evçend neçarî rêxistiniya eskerî, siyasî û ekonomîk a kapîtalîzmê nebûna. Em careke din dibînin ku hêz hêzê derdixe holê û ew jî lêgerîna li şêweyên ekonomîk bi lez dike.

Li Ewrûpayê di derketina kapîtalîzmê de rola Rojhilata Navîn a diyarker bi Xiristiyantiyê re têkildar e. Ez niha qîma xwe pê tînim ku bibêjim ez ê vê mijarê di Sosyolojiya Azadiyê de bi firehî bigirim dest û berhema Max Weber a bi navê Kapîtalîzm û Exlaqê Protestaniyê bi bîr dixim. Li vê jî mirov dikare zêde bike û bibêje; Rojhilata Navîn heta sedsala 10'an diyarkirina exlaqê Ewrûpayê temam kiriye, di derketina feodalîzma Ewrûpayê de hem ji aliyê siyasî û dînî ve bi roleke bingehîn rabûye û di Şerê Xaçperestan de careke din Rojhilata Navîn barkirin Ewrûpayê. Bi tevahî xusûsên me destnîşankirî xisletên diyarker ên bivê nevê ne.

Wexta em vê vegotina xwe ya xulase der barê dîrok û civakê de bi vegotina xwe ya der barê sedsala 16. de bikin yek, em ê

bandora Rojhilata Navîn li ser derketina erka siyasî û kapîtalîzmê baştir fêm bikin. Bi hêsayî mirov dikare bibêje ku carnan dereng dixe, asteng dike, carnan jî bi lez dike û heta dike ku ber û dol bigire. Di sîstema kapîtalîst de herî zêde yekdestdariya dewletê nêzî yekdestdariya kapîtalîst dibe ango yekdestdariya dewletê = yekdestdariya kapîtalîst.

Mirov ji çend aliyan ve bi kurtî be jî behsa têkiliya huqûqê bi sîstema nû re bike wê baş be. Bi giştî kengî têkiliyên bazirganî, bazar û bajêr pêşketin, huqûq xwe weke saziyekê ferz dike. Di civakekê de kengî huqûq bikeve dewreyê, di wê civakê de exlaq dejenere bûye, rola zorê zêde dibe û rê li kaosê vedike û her weha pirsgirêka newekheviyê gelekî xwe dide der û xuya dike. Ji ber ku pirsgirêkên mezin ên exlaq û wekheviyê li bajaran li dora çîn û bazarê çêdibin di nîzamê dewletê de huqûq bivê nevê xwe ferz dike. Bêyî huqûqê rêvebirina dewletê bê îmkan nebe jî gelekî zehmet dibe. Mirov dikare huqûqê wiha bi nav bike; hêza çalakiya siyasî ya dewletê mayînde, bi pîvan û bi sazî dike. Bi awayekî din mirov dikare bibêje; dewleta aram, sakin û camid îfade dike. Yek ji wan saziyan e ku herî zêde têkiliya xwe bi dewletê re heye. Têkiliya girêdana dewlet û bazirganiyê ji destpêkê heta bi merhaleya kapîtalîstbûyînê her pêş de çûye, tevlîhev bûye û dewam kiriye. Ji civaka Babîlan heta Romayê li gelek dewletan metnên qanûnî yên em dikarin ji wan re huqûq bibêjin hatine amadekirin. Bi giranî ev metn li ser ewlehiya mal û astengkirina jidestdana can hatine amadekirin. Armanca huqûqê hem kêmkirin û hêsankirina pirsgirêkên siyasetê ye, carnan jî berevajî rê li pirkirina pirsgirêkên wê vedike. Wezîfeya huqûqê weke ku tê yeqînkirin, bi awayekî wekhev nêzikbûna her welatiyê xwe bigire bin ewlehiyê nîne, berevajî hewl dide newekheviyên heyî bîne astekê ku rewa bêne qebûlkirin û kes nikaribe destê xwe bide erka siyasî. Bi kurtî, mirov huqûqê weke rêxistinkirina yekdestdariya

erka siyasî bi awayekî mayînde bi nav bike, wê ev bibe şîroveyeke nêzî rastiyê.

Têkiliya hiqûqê bi exlaq re gelekî girîng e. Exlaq mîna çîmentoya civakekê ye. Civak tineye ku exlaqê xwe tinebe. Exlaq prensîba pêşî ya rêxistiniya civaka mirov e. Fonksiyana wê ya esasî ew e ka mejiyê analîtîk û mejiyê hisî wê ji bo başiya civakê çawa bêne bikaranîn û çawa bibin helwest, rêzik û pîvan. Li hemberî tevahiya civakê bi awayekî wekhev tevdigere, lê rola cudahiyan û mafê wan jî li ber çav digire. Di destpêkê de wicdanê kolektîf ê civakê temsîl dike. Kengî erka siyasî û hiyerarşî xwe weke dewlet bi sazî dikin, civaka exlaqî derba pêşî dixwe. Dabeşbûna çînî bingehê dabeşbûna exlaqî jî amade dike. Pirsgirêka exlaqî bi vî awayî destpê dike. Elîta siyasî vê pirsgirêkê bi huqûqê dixwaze çareser bike, lê rahib zêdetir dixwazin bi rêbaza dînî rêyekê bibînin. Ji vî alî ve hem dîn û hem jî huqûq, exlaqê weke çavkanî qebûl dikin. Çawa ku siyaset ji hêza siyasî ya mayînde, bi pîvan û mekanîzmayên bi sazî huqûqê pêk tîne, damezrînerên dîn jî bi heman fonksiyonê radibin û dixwazin bi avakirineke din a bi sazî, bi pîvan û mayînde ya çavkaniya xwe exlaq ango bi dîn bi cî bînin û krîza exlaqî çareser bikin. Di nava wan de cudahiyek heye, ew jî ew e kuhêza huqûqê ya bide kirin heye, dîn ne xwediyê vî wesfî ye,li şûna wê tirsa xwedê û wicdanê esas digire.

Exlaq ji ber ku bi qabîliyeta hilbijartinê ya mirov re têkildare, pêwendiya wê ji nêz ve bi azadiyê re heye. Exlaq azadiyê hewce dike. Ya esas, civakeke bi exlaq azadiya xwe diyar dike. Ji lewra ya azadiya xwenebe exlaqê xwe jî nabe. Rêya herî hêsan a têkbirina civakekê ew e ku têkiliya wê bi exlaq re were qutkirin. Kêmkirina bandora dîn, bi qasî lawazbûna exlaqê rê li ber têkçûna civakê venake. Îdeolojiyên bûne mîna dîn ên curbicur, felsefeyên polîtîk û jiyanên ekonomîk dikarin valahiya çêbibe dagirin.Valatiya cihê ji ber têkçûna exlaqê mayî jî, mehkûmiyet û bêparbûna ji azadiyê bi tenê dikarin dagirin. Teoriya exlaq, etîk an jî exlaqiyet, weke

pirsgirêkeke bingehîn a felsefî wezîfeya wê ye hebûna exlaq ê mirov zêdetir lê digerin, divê lêbikole û jinûve bigihîne rola wê ya rastî û bingehîn. Bi qasî ku fonksiyona rast a exlaqê were destnîşankirin, heta bibe prensîbeke jiyanê ya bingehîn wê girîngiya xwe weke pirsgirêkekêdi nava civakê de dewam bike û biparêze.

Em wexta behsa derketina ekonomiya kapîtalîst bikin, ev binavkirinên kurt ên der barê exlaq û huqûqê de têkildarî desthilatdariya siyasî gelekî girîng dibin. Dîn û exlaq, heta huqûqa feodal hinekî neyê dejenerekirin û hin caran neyê şikandin, ekonomiya kapîtalîst di nava civakê de nikare cih bigire. Em li vir nêzikahiya çîna jor a berê ya ji dîn re û exlaqê wê naparêzin. Ya em dibêjin ew e ku dînên mezin, rêrûresm û doktrînên exlaqî yên mezin, gelekî zehmet e ku têkiliya sîstemeke mîna kapîtalîzmê bi pîvanên xwe re deynin. Hêza siyasî jî di van mijaran de xwedî bandoreke bi sînor e. Hilweşandina dîn û exlaq dawiyê li erka siyasî jî tîne.

Di sedsala 16. de ev guftûgoyên der barê reformasyon, huqûq û felsefeya exlaq de eşkere ye ku der barê derketina kapîtalîzmê de ne. Ji ber ku me wateya şerên siyasî û rewşa hêza siyasî bi kurtî bi nav kir, ez ê xwe ji dubarekirinê dûr bigirim.

Reformasyona Protestaniyê û pêre guftûgoyên rê li ber vekir û encama şerên qewimîn, ji bandorên sereke ne ku çarenûsa Serdema Nû ya Ewrûpayê diyarkirin. Li gorî min wexta Max Weber rola exlaqê Protestaniyê nirxandiye, xala herî girîng îhmal kiriye. Protestaniyê derketina kapîtalîzmê hêsan kiriye. Lê bi giştî dîn û exlaq, bi taybetî jî derbeke mezin li Katolîkiyê daye. Ji tevahiya gunehên kapîtalîzmê Protestanî jî têra xwe berpirsiyar e. Ez vana li ser navê parastina dîn û Katolîkiyê nabêjim, ez îdea dikim ku Protestanî civakê bê parastin hiştiye. Li ku derê Protestanî mezin bûye, li wê derê kapîtalîzm gelekî pêş ketiye. Bi awayekî bi rola Hespê Trûva yê kapîtalîzmê rabûye.

Li hemberî rewşên neyînî yên reformasyona Protestaniyê rê lê vekir û Levîathanê nû yê afirand, hin fikirkarên serdemê, cara pêşî ji dil hişyarkirin. Ji van fikarkaran yek Nietzsche ye ku mirov dikare wî weke pêşengê van fikarkarên li dijî moderniteya kapîtalîst xwedî helwest bibîne. Fikarkarên em behsa wan dikin, girîngiya xwe weke antî-kapîtalîst, lêgerînerên ferdê azad û civaka azad di roja me ya îro de jî dewam dikin.

Hobbes û Grotius ên ku serkeşiya guftûgoyên li ser huqûqê kirin, ji bo rê li Levîathanê nû (dewleta kapîtalîst) vekin huqûq ji nû ve teorîzekirin. Yekdestdariya li ser tevahiya şîddetê dayîna destê dewletê civakêbê çek hiştin e. Encam, bi qasî ku di ti dema dîrokê de nehatiye dîtin hêza dewleta netewe ya navendî xwe gihandiye faşîzmê. Pîvana serweriya nayê parvekirin, teoriyek e ku ji bilî dewletê bi tevahî hêzên civakî ji erkan dike. Li hemberî cinawirê kapîtalîst bi awayekî di dîrokê de hîç nehatiye dîtin civak ji amûrên xweparastinê bêpar dihêle. Van herdu fikarkaran îlan kirin ku mirov gurê mirov e, tevî vê yekê jî rewşa yekdestdariyê ya monarkan mizgîn kirin û bi vê jî ji tevahiya bereyan rê li pêşiya yekdestdariya kapîtalîst vekirin. Eger em dubare bikin em ê bibêjin; yekdestdariya siyasî = yekdestdariya aborî ye. Machiavelli yek ji fikirkarê sedsala 16'ane ku bêyî xwe veşêre û rûyê wî biêşe, dibêje û destûrê dide ku ji bo serketina siyasî hewcedarî bi ti pîvana exlaqî nîne. Bi vî awayî prensîbeke xwe bigihîne faşîzmê beriya bi sedsalan aniye ziman.

Ji bo şaş neyê fêmkirin dibêjim; divê neyê fikirîn ku ez bi tevahî hewldanên reformasyonê gunehbar û rexne dikim. Ez dibêjim; divê reformasyona dîn ne tenê çend caran divê gelek caran were kirin. Bi salane ez dibêjim; nexasim ji reformasyona Xiristiyantiyê hûrûkûrtir hewcedarî bi reformasyoneke Îslamî ya dewamî heye. Eşkere ye ku ji bo hewldaneke bi vî rengî hewcedarî bi kesayet û kapasîteyê heye. Lê ji bo li dawîhiştina despotîzma Rojhilata Navîn ev wezîfeyeke ferz e. Di xebata xwe ya bi navê

‘Konfederasyona Demokratîk a Rojhilata Navîn’ de ku weke cildeke cihê difikirim, ez ê hewl bidim mijarên bi vî rengî û gelek mijarên din guftûgo bikim.

Ne karê van çend rêzan e ku behsa tevgerên Ronesans û Rohnîbûnê bikin. Ji ber ku ev tevgerên sedsalên cihê ne. Eger têkiliya wan bi kapîtalîzmê re were danîn jî ev têkilî yekser nîne. Her weha rast nîne mirov her tiştî giştî bike. Di nava wan de bi qasî ku yên li ber kapîtalîzmê rabûne, yên xwestine pêşî û rê lê bigirin jî hene. Kapîtalîst dijberên xwe bi hêza peran asîmîle dikin û ev xusûs tê fêmkirin. Çawa ku desthilatdarî dixwaze muxalîfên xwe girê bide. Lê demên em behsa wan dikin bi fîlozof, reformator (Brûno, Erasmûs), Utopyager û Kominkarên mezin ên dikarin bi qasî ku şewitandina xwe jî li ber çav bigirin li hember kapîtalîzmê li ber xwe didin di şexsê wan de di xizmeta tevahiya mirovatiyê de ne.

Ez dubare bînim ziman ku di serdema Ronesans, Reformasyon û Rohnîbûnê de bi tevahî şaristanî rabûn ser piyan. Ji nû ve vejiyan. Xwe anîn ziman, kirin wêne û awaz; bûn xweda, bûn evd; şer kirin, li hev hatin; bi serketin, têkçûn. Lê belê di encamê de hêmanên kapîtalîstî yên bi sedsalan di hinav û telşên civakê de bi awayekî marjînal ketibûn kemînê, di tevlîheviya van sedsalên mehşerî de weke xwediyê hêza maddî û rêxistina amade, naverastê bi xebatên xwe yên zêhniyet, şîddet û pereyan îstîsmar û asîmîle kirin û kengî hewce dîtinbi darê zorê kirin bin serweriya xwe û bi vî awayî sîstema kapîtalîst bi serketinê tacîdar kirin. Heta roja me ya îro jî vê meşa xwe ya serketinê dewam dikin.

**D- Mekanê Kapîtalîzmê**

Hêja ye ku mirov li ser pirsgirêka mekan a civakê rawest e. Li ser têkiliya civaka mirov bi kîjan cografyayê girêdayî pêş dikeve, û hewl dide vê têkilî û pêşketinê fêm bike. Mijareke berfireh e. Mirov dikare pêkhatina mekanê bi pêkhatina sîstema rojê bide

destpêkirin. Û heta ji vê jî wêdetir xeleka sêyemîn a li dora rojê pêkhatina qonaxên dinya me; tebeqeyên atmosferê, derya, okyanûs, çem û pêkhatina baranê, derketina holê ya teht û zinaran, tebeqeya axê, li okyanûsan rewşa zindiyan û şaneyên pêşî yên zindî, cîhana nebatan a bi kevzê destpêkirî, dîsa cîhana heywanan a bi bakteriyên pêşî destpêkirî, têkiliya heywan-nebatan, bi giştî beridandina cîhana heywan û nebatan, di xeleka beridandinê de prîmatên ku pêşiyên mirov ên pêşî têne hesibandin di kîjan xelekê de weke cinsê mirov şikil digirin, ha em wisa gelek pirs û bersivan dikarin li lîsteya mijara cografyayê zêde bikin.

Bi xetên stûr û xelekên li hev badayî têkiliyeke xurt û eşkere di navbera mirov û cografyayê de heye. Mînak eger rojekê atmosfer, nebat, heywan, erd û çavkaniyên ava vexwarinê ji ser mirov qut bibin, cinsekî bi navê mirov namîne. Ev rewşên ku me behsa wan kirî mîna berhemên mejiyekî mezin bin kêliyekê jî xira bibin wê dawî li jiyana mirov bê. Ji lewra divê bi giştî têkiliyên  mirov û cografyayê timûtim li ber çav were girtin. Bêyî vê nabe ku mirov li civaknasiyê bikole. Lê heta van demên dawiyê mîna ku hewcedarî bi lêkolîna vê têkiliyê tinebe zanist, felsefe û dîn hatiye meşandin, bi hezaran pirtûk hatine nivîsandin. Seyr e, mîtolojiyên em wan herî zêde li derveyî rastiyê dihesibînin, bêhtir bi têkiliya mirov û cografyayê re pêwendîdar bûne. Di vê mijarê de bêeleqedariya zanistê dibe ku encama qutbûna mejiyê analîtîk ji mejiyê hisî be.

Di qonaxa ‘dema dirêj’ a civakên mirov de ku klan forma civakî ya destpêkê ye mekan ango bandora şertên cografyayê hîn diyarker in. Heta dawiya dema qeşayî ya çaremîn civaka klan nikare gav biavêje, ji bo vê şîroveyeke rast e ku mirov bibêje; di vê yekê de ji kêmbûna beridandina hundirîn wêdetir, bêkêrbûna rewşa cografîk bandorê dikin. Çend mîlyon salên tê texmînkirin ku klan jiyaye, ji bo ji hundir ve biberide, demek e ku têrê dike. Lê diyare ku şert û mercên derve ji bo vê derfetê nadin. Cografyanas hemfikirin ku di dawiya dema qeşayî ya çaremîn de (ji salên

20.000'î B.Z. heta îro) rewşeke cografî ya bi xetên sereke ku dişibe şertên niha pêk hatiye. Cinsê mirov heta vê demê (wer texmîn dikim ku ji bilî piraniya Giravên Okyanûs û Emerîkayê) li cografya bi gelekî paşê weke Asya, Ewrûpa û Efrîka hatin bi navkirin, piştî derbaskirina gelek qonaxan, di dawiya dema qeşayî ya çaremîn de bi cinsê Homo Sapiens (Mirovê difikire) gav diavêje dema nû.

Gelek lêkolînên antropolojîk û arkeolojîk nîşan didin ku piştî salên 20.000'î B.Z. sê komên çandê diyar dibin. Koma pêşî semîtîkên nêzî reşikan e, ku pêla dawî ya qutbûnên timî yên ji parzemîna Efrîkayê ne. Ev kom li Bakurê Efrîka, Erebîstan û li hin deverên qûntara çiyayên Toros-Zagrosê belav dibin. Ev belavbûna wan heta qonaxa şaristaniyê pir zêde û piştre jî bi qasî ku karibin bi dewrûbera xwe ve diçin. Milekî koma duyemîn jî ji keviyên Sibîryayê qut bûne,  di ser Tengava Berîngenê re çûne parzemîna Emerîkayê, milekî wan ên sereke jî çûye perav û giravên rojava yên Okyanûsa Mezin, çûne Asya Navîn û hinek jî ji wan li hin deverên Ewrûpa Rojhilat (Fîn-Uygur) belavbûne. Weke Çermezer û Çermesoran jî têne binavkirin. Koma wan a herî mezin ji Çîn, Japon û Tirkên îro pêk tê. Di qada navberê ango qada hînê fireh û kêrhatî de koma em jêre Hind-Ewrûpa dibêjin ango cinsê spî cih digire. Koma ku şaristaniyê û qonaxa wê ya pêş serdema cotkariyê ya neolîtîkê dide destpêkirin ev e. Herçiqas bi derengî be jî cinsê bakur û başûr cinsê zerik û reşik gavavêtine neolîtîk û şaristaniyê jî şîroveya min ew e ku bêyî cinsê spî yê li qada naverastê cih digirin zehmet e ku vê yekê bikin.

Antropolog, arkeolog, jeolog û biyologên xwedî gotin hemû hemfikir in ku di koma Hind û Ewrûpiyan de mekanê neolîtîkê û weke qonaxa paşê weke mekanê ku şaristaniyê dane despêkirin qûntarên Zagros-Torosan e, lewma ji bo derbasbûnê derfetên herî baş û kêrhatî li wan heye.Hêmanên esas ên diyarker in cinsê heywanan û nebat, bi zêdebûna xwe ya çem û baranê, bi rewşa xwe ya bahewa û jeolojiyê di navbera Efrîka, Asya û Ewrûpayê de

derbasokeke esas û mekanekî bêhndanê yê sereke ye. Kakilê pêşengî ji koma Hind-Ewrûpî re kir di dîrokê de ji aliyê yên şaristanî cara pêşî dan destpêkirin ve weke koma Aryen hatin binavkirin. Ev kom, di vî mekanî de neolîtîk-cotkariyê û piştre jî serdema bajar-dewlet-şaristaniyê dan destpêkirin û di vê de bi roleke sereke rabûne. Dibe ku Sumeran ji bo ku çandiniya nebatên li ser giran û li nav zeviyan bi nav bikin peyva Aryan –Îrana îro – bi kar anîbin û bivî awayî bûbin çanda pêşî ya ku ev nav bi kar anî.Ji ber ku min pirtûka yekemîn a parêznameya xwe ji vê mijarê re veqetandibû ez ê dubare nekim.

Xusûsa mijara me ya bingehîn ew e ku em lêbikolin ka li Hollanda û Ingilîstana di dîrokê de navê wan kêm tê hildan çawa ekonomiya kapîtalîst bi ser dikeve û di vê serketinê de rola cografyayê çi ye.

Civaknasên di roja me ya îro de rola cografyayê di bin navê ‘jeopolîtîk’ û ‘jeostratejîk’ de teng dikin, cewherê wê yê bingehîn ji nedîtî ve tên û bi vî awayî hewl didin şîrove bikin. Lê ya rastî têkiliya di navbera cografya û dîrokî-civakîbûnê de esas e û divê mirov berê pêşî bigire dest û li ser raweste. Herhal a manedar ew e ku mirov bi rehan re, ne bi şax û guliyan re bilebike. Bi giştî şaristanî û serdem ji aliyê cografya ve bê lêkolînkirin ji bo zanîneke watedar a dîrok û antropolojiyê şert e. Dîrok bê mekan nabe. Jixwe bi xetên sereke dualîteya zeman-mekan a gerdûnê her tim awir li ser in. Bandora li hev dikin, heta veguherînên wan û qabîliyetên wan ên bi hevrebûnê ji aliyê zanistan ve timî tên guftûgokirin û nirxandin.

Em careke din li çîroka xwe ya ‘zilamê bihêz û xasûk’ vegerin. Lê wexta em derbasî çîroka xwe bibin divê ez destnîşan bikim ku ez ji hewcedariya têkiliya di navbera zanist-zanîn û çîrokê de bawer dikim. Ez yeqîn nakim ku zanista bê çîrok bi temamî manedar bibe. Ji ber vê, çîroka ‘zilamê bihêz û xasûk’ di civaknasiyê de yek ji wan têgînan e ku kevirê çarqozî ye, divê li

serê quncikê were danîn. Ji bo em gelek têkiliyên civakî şîrove bikin, hewce dike. Jixwe di gelek qadan de wexta gelek bûyer û têkilî dikevin zikhev, weke çîrok anîn ziman ji bo zanistê rola amûreke tevkariyên herî bi nirx dilîze. Dîndartiya bi navê pozîtîvîzmê evçend bûyer û têkiliyên nayên jimartin nikar e û pêkan nîne bi awayekî pozîtîvîst tespît bike, ji lewra heye ku anîna ziman û pêşdebirina zanistê bi rêya çîrok, dîn, exlaq û cureyên din ên hunerê rêyeke rast be. Zilamê bihêz û xasûk ê destpêkir gav avêt qonaxa zilamê serwer û di nava kulmozên hêzê yên super de cihê xwe girt, di vê pêvajoya dirêj de rêyeke bi labîrent û tijî bêbextî dişopîne. Gelekî girîng e ku mirov mekanê vî zilamî yan jî zilaman ên carnan eşkere lê dixuyên û carnan jî xwe vedişêrin lêbikole. Eger mirov wan timî weke hêzên timî di nava pêngavên stratejîk ên civakî (ekonomîk, siyasî, eskerî) û taktîkan de bifikire wê me bêhtir nêzî fêmkirina rastiya wan bike.

'Zilamê bihêz û xasûk' mîna dizekî ket ekonomiya malê ya jinê. Qîma xwe tenê bi talanê jî neanî. Ya hînê xirabtir û tehlûketir jî jin xist rewşeke timî destavêtinê û malbata pîroz kir mîna nivîna Çil Heramiyan. Rewşa xayînekî dizane çi dike ti carî neterikand. Tovên danehevên sermaya pêşî li du mekanan  hatin çandin. Yekemîn, li nêzî ekonomiya malê, mal bi xwe hat dagirkirin; duyemîn, li dijî yekdestdariya fermî ya rewa ya dewletê yekdestdariya taybet li baregehên navendî yên çil heramiyan an jî li nêzî wan mekan girtin. 'Zilamê bi hêz û xasûk' ji ber ku ji çavdêriya civak û dewletê direve, pir zû bi maske û hîle di nava mekanande geriya. Kemîn danî. Kengî keys dît weke şêrekî xwe çengî ser nêçîra xwe kir. Carnan bi xasûkiya rovî nêçîra xwe zevt kir. Mîna bûkalemûn li gorî rewşê reng girt. Di nuqteyên marjînal de xwe weke pisporê bazirganiyê îlan kir. Qadên gund û bajaran ên şaristaniyan nikarîbû xwe bigihînine wan bi dijwarî di bin çavdêriya wî de ne. Gelekî hoste ye ku xwe di qelş û terkên nav civakê de veşêre. Pir baş dizane bi rola balansê rabe û herdu aliyan jî bişêlîne. Haya xwe

jê heye ku ji bazirganiyên mesafeya kin hindik, ji bazirganiyên rêyên dirêj gelekî karê bi dest bixe. Yek ji pîvanên bingehîn ê pîşeya wî ye ku mîna bi pozê xwe bêhn bike qadên jê karê bike nas dike, bi ser de diçe. Eger mirov çalakiya wî weke korsantiya stratejîk a van rêyan binirxîne wê zêdetir hînker be. Wexta ku tê gotin "welatê sermayê tineye", ev rastî tê destnîşankirin.

Mirov dikare bibêje eger bajar-bazar-bazirganî şertên pêş ên hebûna kapîtalîst in, çima li van mekanan serketina xwe zû îlan nekir? Di vê nuqteyê de divê ez bi girîngî bibêjim ku kapîtalîzm weke sîstem ti têkiliya xwe yekser bi zanist û teknolojiya pêşketî re nîne. Çawa ku bi awayekî serketî li Amsterdamê derket holê, dikarîbû li sîteya Ûrûkê jî derketa. Mirov dikare bifikire li şûna ku hewl bide bibe xwediyê tevahiya sîstemê û xwe lê rakişîne, mayîna wî weke bazirganekî hevkar yan jî serdezgedar û bûna xwediyê gundikekî zêdetir dikare li hesabê wî bê. Sedema bingehîn a vê yekê dibe ku ev be;yekdestdariya rahib, siyasetvan û esker cih nedanê ku bikaribe bibe serdest. Ev kulmozên hêzê yên rewa bûne û hatine ceribandin, dibe ku kulmozeke çaremîn, zêde û belkî jî ji ber pêkhatina wê weke tehlûkeyekê dîtibin.

Em dibînin 'zilamê bihêz û xasûk' weke hêza çaremîn a yekdestdariyê ji bo bibe sîstem xwe radikişîne. Lê timî têk diçe. Ez yeqîn dikim, kavil û wêranbûna gelek bajarên li cografyayên kesek ne li bendê, bi van bûyeran pêkan e. Di serdema pêşî û navîn de bajarên bazirganiyê yên gelekî dewlemend ji nişkê ve bi awayekî di dîrokê de tine bibin, wêran bûn, dibe ku ev yek bi berxwedana eskerî û siyasî ya yekdestdariya çaremîn re (kapîtalîzma destpêkê) têkildar be. Li cografya Hindistan û Pakistanê bajarê Harappayê (gelekî pêşketî ye, nivîsê jî bi kar tîne, avahî û mîmariya wê gelekî bi rêkûpêk e, bajarekî dewlemend e, B.Z. 2500) pir zû ji holê radibe, dibe ku ev yek ji reqabet û serhildana wê ya li hember yekdestdariya sêber a rahib-siyaset-esker a li cografya cîran be. Îhtimaleke xurt e Harappa, pêşî koloniyeke bazirganiyê ya

şaristaniya bi koka xwe Sumer be, piştre ji bo serxwebûnê serî rakiribe. Bi serketa, belkî jî ji ber şertên wê yên mîna hevrikê wê tinebûn, weke Amsterdamê kiriye xwe li avakirina sîstemekê biceribanda ango wê xwe li avakirina kapîtalîzma destpêkê rakişanda.

Mînakeke balkêş jî çîroka Kartacayê heye. Fenîkiyan di sedsala 8. B.Z. de ev bajar li deverên herî dûr û berfireh ên Derya Spî ava kiribûn û Kartaca bi temamî bajarekî bazirganiyê bû. Mîna ku Rojavayê Derya Spî û Efrîkayê temsîl bike û weke hinterlandê xwe bi kar bîne. Pir eşkere pêş diket, lê bi sedema şert û mercên xwe qelsiya wê hebû, nikaribû împaratoriyê ava bike. Yên dixwestin ava bikin jî asteng dikirin. Heye ku nakokiya wê ya bi Romayê re ji vê yekê be. Bi saya nîvgirava Îtalyayê ji Romayê dihat ji dewleta bajêr bibihure, li ser deverên fireh komar û împaratoriyê ava bike. Ji bo Kartaca rizgar bibe yek şert hebû; diviyabû ya ku Amsterdamê li dijî împeretoriyên Spanya û Franseyê kir, bike. Ango karektera yekdestdar a bazirganiya bajêrê pêşketî, bi dewleteke kapîtalîst, li ser cografyayeke her diçe berfireh dibe bigihîne hev û taqwiye bike. Mînak, yekdestdariya dewletê ya mîna dewleta ku silala Emewiyan li Spanyayê ava kir li hemû Bakurê Efrîkayê ava bike. Ji bilî vê ti rêya wê tinebû ji Komara Romayê rizgar bibe. Ji bilî têkbirina Kartacayê, ti rêya Romayê jî tinebû. Ji ber ku Kartaca dikarîbû li ber serê wê bibe alternatîfek û dawiyê lê bîne. Têkiliya Kuba-DYE'yê çawa jî tîne bîra mirov! Hînê jî weke gotineke li ser zimanan tê gotin: senatorên Romayî di destpêka her civînê de ji cihê xwe çeng dibin û dipirsin, 'Ma wê ev meseleya Kartacayê çi bibe?'

Qurbanekî din ê bi heman rengî yê Romayê bajarê navdar ê li rojhilatê Sûrî Palmyra ye. Di nîvê duyemîn ê sedsala 3. B.Z. de wexta krîzên pêşî yên hilweşîna împaratoriyê dikeve rojevê, serhatiyên Palmyrayê balkêş in. Ez wexta li Sûrî bûm, ez timûtim diçûm serdana xirbeyên vî bajarî û bi heyranî min li bermahiyên

wê temaşe dikir. Li nava çolê li dora aveke ji binerdê derdikeve ava bûye. Li dora avê daristaneke xurmeyan û li keviyên wê jî keleyeke tevî bircên xwe heye. Herweha bi agora xwe, Perestgeha Delfê ya navdar, avahiya senatoyê, goristanên li newalê, çarşiyên wê yên dirêj û bi gelek qesrên xwe bajarekî bi heybet e. Di warê niqirandin, verotin û şehkirina keviran de bi temamî xwedî wesfên harîqa ye. Bajarekî welê ye ku mirov matmayî dihêle û dixe nava aramiyê.

Palmyra bajarekî girîng e. Ji ber ku di navenda çûnûhatina bazirganiya rojhilat-rojava û bakur-başûr de cih digire. Herweha di navbera împaratoriya Îran-Sasanî û Romayê de bi rola bajarekî dewlet ê tampon radibe. Salên dûrûdirêj li ser yekdestdariya bazirganiyê her mezin û dewlemend dibin. Li gorî min mirov wê bişibîne Amsterdam an jî New Yorka demê têrê nake. Ji aliyê gerdûnbûnê ve ev wiha ye! Împaratoriya Romayê weke Kartacayê ji vê mînakê jî bêzar e. Dîrok nîşan dide ku bajar di demên xwe yên dawî de ango di salên 270'î P.Z. de qîma xwe nayne weke silaleyeke xwedî statuya fena qraltiya bi ser Romayê ve bimîne û heta hez kiriye weke alternatîfeke Romayê rabe.

Ya Kartaca têde nikarîbû bi ser bikeve, gelo wê Palmyrayê bi ser biketa? Pirs ev e û diyare Palmyra xwedî potansiyeleke bi tehlûke ye. Li gorî gotinê, Împaratorê Romayê Aurelius piştî şerê dûvdirêj bajar zevt kiriye û xwestiye bajar çawa zevt kiriye welê jî radestî qralîçeya bi hêz a bajêr a wê demê Zennûbeyê bike. Kengî bajêr weke eyaletekê radestî Zennûbeyê dike, vedigere. Lê di nîvê rê de dibihîse ku li bajêr dîsa serhildanê destpê kiriye û bajar doza serxwebûnê dike. Ji nû ve bi hêrseke mezin bi ser bajêr de diçe û wer li bajêr dide ku careke din bi ser xwe ve neyê. Li dawiya xwe xirbeyê bajêr dihêle û vedigere Romayê. Zennûbeya direviya cem Sasaniyan û li peravên Firatê girtibû jî bi xwe re jî dibe. Bûyer û nivîsên dîrokê radigihînin ku Zennûbe bi tevahiya dewlemendiya xwe ve weke êsîrekê li pêşberî gelê Romayê hatiye teşhîrkirin.

Zimanê Romayê yê der barê jinê de timî tesîr li min kiriye. Piştî ku ez li çîroka Zennûbeyê serwext bûm, mîna ku min sira vê yekê zevt kiribe. Roma ne bi tenê ew bajar e ku tevahiya rêyan diçinê, herweha bi tevahî qral û qralîçeyên xwediyê hêzê û bi qabîliyet jî bar dikinê. Wer xuya ye ku ya nîv-komîk nîv-trajîk di çûna min a Romayê de bi serê min de hat, ji nêz ve bi vê dîroka Romayê re têkildar e. Eger min Spartakus, Saint Paul û Brûno baş û ji dil fêmkiribûna, ez ê herhal hînê bi baldarî tevgeriyabûma. Wekî din jî diviyabû min Gramsci baş xwendibûya. Ax Sosyalîstno ax!

Ji bo Palmyrayê rêya bi tenê ya rizgariyê rêya Amsterdam an jî Londonê bû. Li ber xwe da, lê bi ser neket.

Eger mirov Atîna Serdema Antîk jî mînak nîşan bide, heye ku mirov jê hîn bibe. Ev bajarê ku berhemekî bazirganiya deryayê bû, di salên 500-350 B.Z. de mîna stêrka şaristaniyê bû. Pir bi hêsanî mirov dikare tespît bike ku kapîtalîzma destpêkê herî zêde li vî bajarî pêş ketiye. Yekdestdariya bazirganiyê ya mezin ûtaybet (ne yekdestdariya dewletê) bi sedan mîl û kîlometreyan li deverên dûr karê xwe dimeşînin. Dewlemendî diherikin Atînayê. Ji Rojhilatê Derya Spî heta bi Marsîlyayê, ji Bakurê Efrîkayê heta bi Makedonyayê,ji tevahiyaAnatolê û Derya Reş, bi tevna bazirganiyê, pere û berhemê zêde diherikînin Atînayê. Felsefe afirandiye, pîşesazî li ber fabrîkebûyînê ye; hunerê çêkirina keştiyan li asta herî jor e, pere li ser kar e. Li her deverê kolonî hene. Ji her alî ve dewlemend û xwediyên pereyan têne Atînayê. Cara pêşî ye ku dibe xwediyê rewşeke bajarê kozmopolît. Li gorî şîroveya min a şexsî, kêmasiya wê bi tenê ew bû ku nikarîbû yekîtiya di nava nîvgiravê de pêk bîne û ev li pêşiya serketina kapîtalîzmê astenga sereke bû. Pirsgirêka peydakirina hêza ji bo kar jî tinebû. Koleyên li bazarê dihatin firotin ji xweliyê erzantir bûn. Di vê qonaxê de Atîna yan wê ji koletiya berê bibihure, di çarçoveya nîvgiravê de dewleteke netewe ava bike û zû bikeve rewşeke weke Hollandayê, yan jî wê li ber hevrikên xwe têk biçe û di rewşeke bê qimet de bê hiştin.

Qraltiya Spartayê ya hêza bejahiyê bû û Împaratoriya Pers a ji deryayê dûr bû ji sedsalekî zêdetir timî li vî bajarî dan. Lê wê bi demokrasiya xwe her hewl da li ser piyan bimîne. Pençên qralên Makedon Filîp û kurê wî Skender Atîna ber bi têkçûneke strajîk ve birin. Li hemberî qraliyetên Helenîstîk ên Anatolyayê û Romayê yên di salên 300î B.Z. de mezin dibûn zêde şensê wê yê gavavêtinê nemabû.

Eger mirov li vê derê mînakên proto-kapîtalîzma şaristaniya Îslama serdema navîn û mînakên li devê nîvgirava Hindê hatin avakirin bide, bawer dikim ku wê bibe dubarekirina mijarê. Mînakên balkêş ên vê demê bajarên kapîtalîst ên navdar ên li nîvgirava Îtalyayê ne. Spanya, Franse û Awûsturyayê daxwaziya xwe ya bi şêwazê berê împaratoriyan ava bikin derbas nebûn, çawa li tevahiya nîvgiravê û yek bi yek bajaran desthilatdariya Venedîk, Cenova û Floransayê şikandin û girtin destê xwe, hingî şensê vana ê ku zû bibin Amsterdam û Londonekê ji destê wan çû.

Bajarên Îtalyayê ji bo kapîtalîzmeke modern çi hewce bike afirandibûn. Bi daneheva sermayê, banke, şîrket, krêdî, weke amûrên fînansê sened, bazirganiya dûr û nêz, manîfaktur, pîşesazî û her cureyê hunerê, bi tevahî berhemên pîşesaziya demê, ezmûnên komar û împaratoriyê, bi dîn û her cure mezheban, nîvgirava Îtalyayê di rewşa prototîp û labûratûvarekê de ye ji bo Ewrûpaya ku wê di salên 1300-1600'î de çêbibe. Her weha dayîkniştimana Ronesansê ye. Bêguman ev yek bi têkiliyên wê yên bi cografya Rojhilatîya pêşeng û mîrateya Rojhilatî ya dîrokî re têkildar e. Îtalya vê demê, weke Îslama Rojhilata Navîn, Çîn, Hindistan û heta Rûsyayê ye ku mezin dibe. Danehevên cografyayê Rojhilat, di serî de Venedîk, Floranse û Cenovayê ji aliyê yekdestdariyên bazirganên bajaran ve bi çavbirçîtiyeke têr nabe anîbûn nîvgiravê. Ya girîngtir, di dîroka Ewrûpayê de cara pêşî ye ku bi pêşengiya bajarên Îtalyayê tevgerên bajarbûnê pêş dikevin û ji daneheva sermayê re hinterlandeke mezin çêdikin. Li her

bajarekî Ewrûpayê bi hêsayî mirov dikarîbû destê bazirganekî Îtalî bidîta. Jixwe Dêra Katolîk ji zû ve zemînê şaristaniyê danîbû. Ronesans ji bo pêşengiyê dibû gotina ji sedî sed a dawiyê.

Îtalya nebû weke Ingilîstan û Hollandayê, ev yek tenê ji ber cografya wê bû. Bi awayekî paradoksî heman cografya di kapîtalîzma bajêr de dike pêşeng, litevahiya nîvgiravê wê tîne ber serketinê, lê di dawiya dawî de nikarîbû gava dawî ya serketinê bide avêtin. Wexta bida avêtin jî ti tişta nehata serê wê nedima. Sedem eşkere li naverastê ye. Eger Îtalya zû bûbûya Ingilîstana demê, wê tacên Spanya, Franse û Awûsturyayêyên ku dixwestin wê dagir bikin, bi serê wan de bianiya xwarê, mîna Romaya di dema derketina împaratoriyê de  gavek biavêta û bikariba bibûya emperyala dinyayê ya duyemîn. Lê wê li ser hîmê sosyo-ekonomîk a kapîtalîst ev gav biavêta. Mirov fêm dike ka çima xwediyên tacan li ser serê bajarên Îtalyayê piçikîn. Yekîtiya bajarên Îtalyayê li ser hîmê sosyo-ekonomiya nû wê dawî li împaratoriyan bianiya, pêşî li Ewrûpayê û paşê jî li tevahiya dinyayê wê demeke belavbûnê xwe ferz bikira. Ji bo vê jî di serî de sermaye, her tişt di destê wan de hebû. Ya rastî, serneketin bê şensiyeke mezin bû û dihat maneya paşvemayîneke neteweyî ya sêsedsalan bikudîne.

Bi ya min, ji ber sedemên cografî nikarîbû bibe Romaya duyemîn û ev firsend bi tiştekî pir hindik ji dest çû. Piştî meşeke dirêj Hannîbal ji bakur ve êrîş biribû ser Romaya yekemîn û Romayê bi şenseke mezin dûvê xwe ji nav lepan xilas kiribû. Yên vê carê ji bakur êrîş dikirin, ne yek çil carî ji Hannîbal bi hêztir bûn. Ji lewra şensê wê tinebû. Ji bo vê bi tenê rêyek hebû, mîna Îslama Ereban a li tevahiya Rojhilata Navîn belav bûbû wê bûbûya dînekî bi zora şûr. Li şûna Xirîstiyantiya li Romayê eger Îslam bûya an jî Xirîstiyantiya Katolîk,belavbûna dînî û siyasî bi hev re û bi şûr bimeşanda, belkî rêveçûna dîroka dinyayê pir cudabûna. Mirov xwe nagire û dipirse: eger Xirîstiyantî nebûya wê aqûbeta Romayê çawa bibûyaû rê li ber çi vekirana? Ya hînê seyr û balkêş: eger

Fatih Siltan Mehmed bi vexwendina Papa Xirîstiyantiya bi şûr qebûl bikira, encamê çi bibûna? Dîrok qadeke spekulasyonê nîne. Lê rastiyeke nayê înkarkirin e ku pêşketina dîrokî, her tim gelek alternatîfan di hundirê xwe de jî dihewîne. Ya bajarên Îtalyayê nikarîbû têde bi ser bikevin, di dawiya sedsala 16. de Amsterdam û Londontêde bi ser ketin. Yek ji wan qadane ku dîroknas herî zêde li ser sedem û encamên wê radiwestin û dikin mijara tezan. Ev qad heta bibêjî hatiye rohnîkirin jî. Eger em sedeman bi kurtî rêz bikin:

1- Bi tevahî qadên şaristaniyên berê li serê Bakurê Ewrûpayê cih digirin ku li vir herî dereng û lawaz digihîjin Okyanûsa Atlasê.

2- Sê hêzên mezin ên Ewrûpayê, Qraliyetên Spanya, Awûsturya û Franseyê ji bo serweriya Ewrûpayê di nava xwe de şer dikin.

3- Bi qasî bajarên Îtalyayê bi tehlûke nayên dîtin, ji lewra jî bi hêzeke yekbûyî û têrê bike bi ser de naçin.

4- Ji belavbûna Reformasyona li Bakurê Ewrûpayê re pêşengiyê dikin.

5- Ji ber ku li peravên Okyanûsa Atlasê ne, di bazirganiya dûr û nêz de xwedî avantajeke mezin in.

6- Tevahiya çanda maddî û manewî ya bajarên Îtalyayê transfer kirine.

7- Yek ji wan qadane ku çanda maddî û manewî ya feodalîzmê lê qels û lawaz e.

8- Ji ber ku negihîştine feodalîzmeke bi hêz a karibe pêşî li kapîtalîstbûna çûnûhatin, cotkarî û îndustriyê bigire, li gelek herêman şaristanî belkî jî cara pêşî bi rengekî kapîtalîstîk pêş dikeve.

Em dikarin hejmara van sedemên bandor kirine, hînê zêdetir bikin, ji nêz ve têkiliya van sedeman bi rewşa cografîk re heye. Ya rastî jeostratejî û jeopolîtîka rewşeke gelekî baş pêşkêş dikin. Kengî ev rewş bi şertên civakî re bûye yek serketin jî mumkin bûye.

Ewrûpa, Asya û heta Efrîka sê parzemînên yekbûyî ne. Yek ji tespîtên girîng ên antropolojiyê ew e ku heta dema qeşayê ya dawî di serhatiya mirovatiyê de Efrîka bi rola pêşengiyê rabûye. Cografya pêşeng paşê di vê rola xwe de li qûntara çiyayên Toros-Zagrosê bi şoreşa neolîtîkê dest guhertiye. Qûntarên van çiyan ji salên 15.000'î B.Z. heta salên 4000'î B.Z. ji bo pêvajoya ku wê paşê bi navê şaristaniyê dest pê bike çi hewce bike, her tişt çêkir: weke çanda maddî û manewî her tişt amade kir. Mirov ji bo şoreşa neolîtîkê bibêje, di dîrokê de şoreşa herî mezin e, bawer dikim ku tespîteke li cih e. Avên Firat û Dîcleyê ji van çiyan û qûntarên wan ne tenê axa bi bereket birin devê Halîçê; bi keştiyên pêşî û pîşesaziya keştîvaniyê, xwe û bi tevahî nirxên xwe yên çandî birin. Bajarên Ûrûk û Erîdûyê wexta dest bi meşa şaristaniyê ya pêşî kirin, ya rastî nirxên vê rêwîtiya bi qehr sentez kiribûn. Mezinbûnê li devê çemên pîroz û heta ketina li devê okyanûsan mîna herikîna çemekî dewam dikir. Bê navber dewam dikir û her diçû mezin dibû.

Ûrûk çandeke mirovatiyê ya ji rêzê nîne. Destpêka mûcîzeyeke nû ye. Dengê Xwedawenda Ûrûkê Înannayê hînê jî çavkaniya tevahî destan, helbest û stranan e. Ev deng, dengê vê çanda muhteşem û bi heybet e. Di heman demê de dengê wê jinê ye ku zilamê krêt hînê ew ne lewitandî ye. Çanda Ûrûkê li cografya xwe kulîlk vekirin. Bajarên li pey hev dihatin avakirin zêde bûn. Kêmberek ji bajaran çêbû. Zilamê bihêz û xasûk vê carê çavkaniya danehevan di derfetên bajaran de dît ku her diçû zêde dibûn. Bi awayekî berevajî çandek herikî û çû heta qûntarên çiyan. Bajar cografya neolîtîk dadiqurtîne û ev destpêka vê pêvajoyê ye. Dengê Înannayê yê ku her diçe kêm dibe û ev dengê jinê ye ku her diçe bê tesîr dibe. Êdî dengê zilamê bihêz û xasûk her diçe gurr derdikeve. Di zimanê Sumerî de daçekên pêş bi karektera jinê ne, ango mê ne. Ev xusûs di pêkhatina ziman de rola jinê nîşan dide.

Li vir hewce nake ku em behsa serhatiya cografya şaristaniyê ya ku xwe dispêre hêzê bikin. Lê were nivîsandin baş e. Lê em bi tenê bi awayekî sembolîk bi gotina hevokê qîma xwe bînin û bibêjin; mîna çemekî sereke û mezin diherike, ji hezaran kîlometir perav û erdên bi kaş bihuriye, çandeke nû li pey xwe hiştiye û herî dawî li peravên Amsterdam û Londonê ketiye Okyanûsa Atlasê.

Eşkere ye ku çanda maddî û manewî ya ji tevahiya serdem û cografyayan hatiye girtin herî dawî bi pêşengiya van herdu bajaran ekonomiya kapîtalîst a modern û netewe derxistiye ser dika dîrokê. Dîsa heman herêm ji wan herêmane ku herî dereng çanda neolîtîkê girtine. Em di navbera cografya û çandê de timî têkiliyekê dibînin ku weha ye: li devera ku çanda kevn bi reh û kok e, pêkhatina çanda nû gelek zehmet e. Çanda kevn a nû bi hêsanî qebûl nake. Xwe diparêzeku ev jî tê fêmkirin. Li Rojhilata Navîn çanda şaristaniya berê bi tenê herêma hundir a nîvgirava Erebistanê têra xwe dagir nekiribû. Ev valatiya cografî, cografya civakî ya Îslamêpêkanî. Ev cografya nebûya wê Îslam jî nebûya.

Bakurê Ewrûpayê û du welatên din ên li seriyê wê Ingilîstan û Hollanda ji bo şaristaniyên berê erdên bakîr bûn û beyar bûn. Têgîna welat bi maneya sînorên neteweyî di vê demê de hînê nû derdikevin holê. Ji lewra jî tovek li ser van erdan were danîn hema yekser wê zîl bide û serî bigire bi sedema vê xisletê ye. Dikare kok û rehên xwe kûr berde erdê û mayînde bibe.

Ev tovê ekonomiya kapîtalîst hatiye danîn û xwe baş girtiye. Warisê dawiyê yê çanda Ûrûkê ye ku ji peravekî derbasî peravê din bûye. Barhilgirên vê mîrateyê her tim bazirgan bûne. Tê gotin, bazirgan ew kes in ku deverên kar jê tê xweş dibînin. Ez bi girîngî destnîşan dikim ku ya kulmozên hêzê nikarîbûn pêşbîniya wê bikin û bifikirin, rewşa wan a herêmê ya marjînal û avantaja wan a rêyên dirêj, hişt ku şensa wan di warê erênî de tecellî bike. Bi tevahî hebûnên kapîtalîstîk ên bajarên Îtalyayê û rêyên cografî yên armadayên Spanya û Portekîzê ew keşif kirin bi awayekî

korsanwarî desteserkirin û bi vî awayî şensê pêşengiyê xurttir kirin. Ya dikirin, asîmîlekirina zimanê wan bi xwe bû. Li Ewrûpayê şerên mezin ên navxweyî pêşî li tehlûkeyên ji der ve bên digirtin, li hundir jî berdariya ekonomiya nû (hêza kar û maddeya xam a erzan) di dawiya sedsala 16. de ji bo hilatineke serketî û mayîndebûna li vê cografyayê têrê dikir.

Di nava van herdu hêzan de bi tenê hin cudahiyên şiklî hebûn. Bi hevgirtina herdu hêzan ekonomiya nû li çarnikarê cîhanê temsîl kirin. Ekonomiya nû, hişt ku dewlet jî xwe nû bike û ber bi dewleteke berdar û serketî ve biberide. Serdestiya ekonomîk bi kêra serdestiya siyasî û eskerî hat. Yekdestdariya bazirganiyê cara pêşî bi yekdestdariya dewletê re şirîkatî danîn (mînak Kûmpanyayên Hind ên Rojava û Rojhilat in) û bi vî awayî bûn hêzeke nîv fermî. Desteserkarên şaristaniyê yên timî xwe di dehlîz û serê quncikan de vedişartin cara pêşî bûn ew giregirên rewa yên li ser wan guftûgo neyê kirin.Tevahiya pûlikên berê yên arîstokratîk bi destê qral û qralîçeyan bi xwe vekirin. Çawa ku di dema xwe de şêrê Ûrûkê taqeta xwe tinebû li ber ‘Gilgamêş’ rawestiya, warisên herî dawî jî taqeta wan tinebû li ber dirindeyên (em şêr nebêjin) Amsterdam û Londonê jî rawestiyana. Eger rawestiyana jî mîna Gilgamêş bi stûyê şêr girtiye, zehmet nîne bi stûyê wan bigire û bixeniqîne.

Xwedawend Înanna hewl dide 99 vedîtinên berhemên hunerî ji destê xwedayê pêşî yê mêr ê xasûk û zordar (mêrê serwer ê kirin xweda) û parêzvanê bajarê Erîdûyê Enkî rizgar bike. Destana behsa vî şerê di navbera xwendawend Înanna û Enkî de dike, ya rastî destana pêşî û herî bi bandor e. Qralîçeyên Ingilîstan û Hollandayê yên warisê wê têne hesibandin mîna fîgurên sembol ên wê jinê bin ku pêjna tevahiya krêtiyên mêrê xasûkî û zordar jê tê. Ev yek jî weke ku tevahiya serhatiya şaristaniyê xulase tîne ziman.

### E- Kapîtalîzm û Şaristaniyên Civakî-Dîrokî

Dema weke çalakiya şikildayîna civakan em rola sektora kapîtalîst beramberî hev şîrove bikin, em ê bi awayekî berçavtir nêzî pirsgirêka şiklên civakan bibin. Ez hewl didim bersiva vê pirsê bidim: gelo şêweyê civak û ekonomiya kapîtalîst mecbûriyeteke civakî û dîrokî bû? Weke bersiv vî beşê parêznameya min nîşan dide ku ne mecbûriyeteke civakî-dîrokî bû. Şaşî û jirêderketineke mezin a şîroveya Marksîst a materyalîzma dîrokî (materyalîzma çor) ew e ku îdîa dike; di pêşketina civakî-dîrokîde mecbûriyetek heye. Dîsa şîroveya bi tehlûketir ew e ku şêweyên civakan li pey hev bi heman têgihîştinê têne rêzkirin û ev yek bi navê îdealîzma materyalîst a Hegel tê pêşkêşkirin. Ev jî ji bûyîna tureveke Hegelparêziyê wêdetir tu mane nade. E. Kant li hemberî vê yekê bi şermokî be jî hewl dide li dijî têgihîştina objektîv hêza sûbjektîv ango rola exlaq weke tercîheke azadiyê diyar bike. Ji aliyê exlaqê azadiyê ve Marksîzm ji Kantparêzan jî bêhtir paş ketiye. Jixwe hewce nake mirov behsa têgihîştinên din ên rastgirên lîberal bike. Ew, derketina kapîtalîzmê ne bi tenê mecbûriyet, weke gotina dawî ya dîrokê dinirxînin.

Ev kapîtalîzma ku ji paşverûtiya dîn jî tehlûketire û dînperestiya pozîtîvîst daye pişta xwe heta rast neyê binavkirin û rûyê wê rast neyê nîşandan, wê ti şensê tercîha azadiyê tinebe. Jixwe dîroka dused salî ya sosyalîzmê û sosyalîzma reel nîşan dide ku ji aliyê çepgiriyê ve palpiştiya kapîtalîzmê kirine û ji vê jî wêdetir neçûne. Mesele ew nîne ku mirov derxe holê ka şaşî di ku de hatiye kirin. Mesele ji vê jî wêdetire. Paradîgma bi xwe şaş e. Di navê de hebûna çend şaşî yan jî rastiyan, ji aliyê paradîgmatîk ve encamê zêde naguherîne. Di ser xeteke dûz rasterast a pêşketinê re nêzî civakê dibin û li gorî rêzê mîna ku her tişt di Lewh-î Mehfûzê[2] de hatiye nivîsandin (li cem xwedê ji zû ve hatiye diyarkirin) tê

[2] Lewh-î Mehfûz: Pirtûka li qatê Xwedê her tişt têde berê hatiye diyarkirin.

nihêrtin. Xewta wan hatibe bi cih tên. Guftûgoyên di serdema navîn de li ser îradeya kullî û cuzî jî di ser nêzikatiyên materyalîst-pozîtîvîst ên bi vî rengî re ne. Ji bo sosyalîzmê têkoşîneke mezin hat dayîn û di têkçûna wê de para diyarker a vê nêzikatiya paradîgmatîk der barê civakê de heye.

Diyar e ku di bin sernavê berî niha de nêzikatiyên min bi nav kirin bi temamî li derveyî van nêzikatiyan e. Bihêle ku kapîtalîzmê weke qonaxeke mecbûrî ya civakî bibîne, nêzikatiyeke bi vî rengî bi xwe yan bi zanebûn an bi nezanî yan jî bi awayekî serwextnebûyî dikeve bin bandora vê sîstemê û dibe destikê propagandaya wê. Gotina ez ê dawî bibêjim, ez hema niha pêş bibêjim: kapîtalîzm nabe ku bibe şiklekî civakê. Dixwaze bandorê li civakê bike, bandorê jî dike, lê nikare bibe şiklekî civakê. Dikare were pirsîn; ma çarsed sale şêweyê bi tenê yê li cîhanê serwer nîne? Serwertî tiştek e, şikilbûyîn tiştekî din e. Dîrok sê şiklên civakan an jî şêwazê wan nas dike: civaka klan a destpêkê, dewleta çînî yan jî civaka şaristaniyê û civakapirengî ya demokratîk. Nêzikatiyên dîrokê weke xeteke dûz digirin dest û pêşketina li ser vê xetê bi navê civaka destpêk, koledarî, feodal, kapîtalîst û sosyalîst kategorîze dikin jî zêde dogmatîk in. Bi gotineke din nêzikatiyên bi vî rengî îdealîst û qederwarî ne. Ya girîngtir jî, li gorî binavkirina min hersê şêweyên civakê jî li ser xeteke dûz pêş nakevin. Ev nêzikatiya me nêzî sîstemekê ye ku li dora xwe hûrûkûr û berfireh digere. Tevî ku ez fonksiyona diyalektîk qebûl dikim jî divê ez bi aşkereyî destnîşan bikim ku şîroveya dibêje du serî hevdu tine dikin û pêşde diçin rast nabînim. Nêzikatiya fonksiyonên bingehîn ên gerdûnê bi rêbaza tez, antî-tez û sentezê şîrove dikin dikarin zêdetir bibin mentiqekî kêrhatî yê ravekirinê. Lê belê têkiliya simbiyotîk a hev xwedîkirinê ku cihêtî û dewlemendiyê mumkin dike, weke şêwazekî têkiliya diyalektîkî yan jî têgihîştinê nêzî rêveçûna diyalektîka xwezayê ye. Yan jî xwedî xisletên ravekirinê ye.

Divê mirov ji bîr neke û hay jê hebe ku di gerdûnê de ji pirtikên piçûk heta yekparebûna di asta kozmosê de, dualîteyên pêkhatinêmumkin dikin û ya ji bandor û têkiliya van dualîteyan derdikeve holê, herduyan jî di hinavê xwe de dihewîne, lê ji yekparebûna herduyan wêdetir şêwazê pêkhatineke cuda esas e, gerdûnî ye. Em di bingehê tevahiya veguherîn û pêşketinê de vî şêwazê pêkhatinê dibînin.

Civak jî li derveyî vî şêwazê pêkhatinê hebûnek nîne. Xwediyê heman şêweyê zimanê pêkhatinê ye. Bi kurtî, dualîteyan timî pêk tîne. Ji ber vê jî herduyan di hinavê xwe de dihewîne, lê ji yekparebûna herduyan wêdetir jî derfetê dide pêkhatinên nû. Bi vî awayî serwextbûna me li diyalektîka veguherîn û pêşketina civakan, me hewcedarî zêdetir agahiya berçav dike. Em kengî bi vê têgihîştina diyalektîk nêzî rastiya civakîyên ji parçeyên herî piçûk heta yê yekpare pêkhatî bibinez dikarim diyar bikim ku hingî hêza me ya hiskirin û şîrovekirinê, xisletên me yên mirovane ango potansiyela me ya mirovê azad wê hînê zêdetir bikevin nava tevgerê. Em dikarin civakê di ferd de berçav bikin hem ferdê azad ê bi berpirsiyarî pêş bixin, hem jî em dikarin civaka ji ferdên azad bi tesîr bûyî zêdetir azad bikin. Derfetên azadbûnê herî zêde xwedî şensê wekheviyeke baş û potansiyela demokratîkbûnê ne.

Ez divê dubare bînim ziman ku wexta ez dînamîzma sêalî ya rastiya civakî destnîşan dikim ez keşfeke nû nakim. Ez bi tenê hewl didim kirasê dînamîzma pêkhatina gerdûnî li civakan bikim. Eger were pirsîn ka çima dînamîzmên sêalî, ez ê bibêjim; ji ber HEBÛNê. Eger ji hebûnê re jî weke pirs bersivekbivê, wê wextê divê em pirsa 'em çima hene' bikin. Lê li gorî min hebûn nayê guftûgokirin. Eger hebûn tinebûya, jixwe hewce bi vê pirsê û pirsên din nedima. Ji tiştekî tine re cih tineye. Di rewşa tinebûnê de bi tenê pêknehatin heye ango mirov dikare behsa ne tiştekiyê bike, ev bi xwe jî ew tiştê em jêre dibêjin beredayî ye, tewş e.

Eger em hebûn, çêbûyînê qebûl bikin, wê wextê manedar e ku em behsa şêweyê çêbûnê bikin. Yên li ser bi tevahî maneya jiyanê, bi tevahî pêşketina fikrê sekinîbûn pê hisiyabûn ku ji guherîn û pêşketinê ji pêkhatinê ye. Li ser vî hîmî, ji kategoriyên fikrê yên zanistî, felsefî, dînî û mîtolojîk kulliyateke mezin pêk anîne. Ma em dikarin van kulliyatan înkar bikin. Di bingehê meseleyê de bi tevahî hemûyan xwestiye bersiva çêbûn û hebûnê bidin. Ji bo vê hin ji wan serî li rêbaza mîtolojîk û hinan ji wan jî serî li rêbaza dînî daye, van jî têra wan nekiriye, kategoriyên zanist û felsefeyê di hewara wan de hatine. Fonksiyon yek e, lê bersivên wan cihê ne. Li sedemên çêbûna hebûnê, çawa çêbûye û armancên wê her tim hatiye pirsîn û her kategoriyê li gorî disîplîna xwe hewl daye bersivan biafirîne. Weke disîplîna herî bi îdîa zanistê dînamîzma sêalî ya pêkhatinê bi piranî rohnî kiriye. Wexta ku em di asta mekanîka kûantûmê de (hem teorîk hem jî bi ezmûnî) li dualîteyên madde-enerjî û pêl-parçik binêrin, em ê bibînin ku timî rê li ber pêkhatinan vedikin. Û encama ku berhema van pêkhatinan e her tim şopa dualîte ku jê derketiye dihewîne. Jixwe tevgerên vê dualîteya madde-enerjiyê gerdûnî ne. Herdu dualîte xwe di nav a sêyemîn de bi veguherînê dewam dikin, veguherîn bi awayekî pêşketinê yan jî berevajî bi paşketinê xwe dewam dike ango dînamîzma hebûnê piştrast kiriye ku ev şêwaz karekterê wê yên bingehîn e. Jixwe hewce nake ku mirov ji nû ve piştrast bike.

Em li xwe binêrin. Zaroka dê û bav, gelekî dişibe dê û bav, ji herduyan digire û dewam dike, lê ev yek cihêwaziyeke nû û bi şêweyekî nû temsîl dike. Ev cihêwazî gelekî hêdî dibe û ev yek di her bûyera xwezayê de bi vî rengî ye. Ev rewşa mirov weke çêbûna zereyeke ezelî jî dikare were şîrovekirin. Ya rastî çêbûn bi vî şêwazî dikare di şerê hebûnê de bi ser bikeve. Çiye şerê hebûnê? Mirov çawa mana xwe misoger dike? Mayîn, xwe bi guherînê dewamkirin e. Çima? Dibe ku ji bo piştrastkirina hebûna xwe be.

Yan jî bi guhertinê temaşekirina li xwedayetiya, îhtişama hebûnê be!

Ya bi serê mirov nakeve û dûrî aqilan ev e: diviyabû em bi çavdêriya li tiştên çêbûne yên li nêzî xwe, bibin xwedî mentiqekî, lê çima em ji van heqîqetên bingehîn evqas dûrketin an jî hatin dûrkirin?

Eger em vê rewşa beredayî û dûrî aqilan zelal bikin, em ê wê wextê karibin bên ser meseleya bingehîn. Ez behsa karekterê rêveçûna diyardeya civakî dikim ku hînê ji destpêkê ve bi vegotinan li hev hatiye alandin, sernuxumandin û piştperdekirin. Civakbûnê çima hewcedarî bi van veşartin û piştperdekirinan dît? Mejî li hemberî van bûyeran çima weke hisî û analîtîk bi du awayan dabeş bû? Fonksiyonên wan çi bûn? Bi bersivên rast ên em bidin, em ê karibin civakbûyîna xwe weke heyî yan jî weke em dixwazin şîrove bikin û biguherînin. Mirov weke kirdar DIKARE ŞÎROVE BIKE Û ÇAWA DIXWAZE DIKARE BIGUHERE. Lewma mirov hebûneke xwediyê vê qabîliyetê ye. Şîrove û daxwaza guhertinê, bi gotineke din fikirkirin, pêhisîn û xwestek çiqasî li gorî dînamîzma pêkhatinê be, wê şensê pêşketina şêweyê nû jî ewqasî zêde be. Çendîn jê dûr bikevedi civakîbûnê de yan muhafezekarî yan jî paşveçûn ewqas çêdibe. Pêşketina mejiyê hisî û analîtîk li dora van pirsan pêk tê.

Divê em li vir dawiyê li vî beşê ku em têde êpê bi nav felsefeyê de çûn, bînin. Ez ê zêdetir di Sosyolojiya Azadiyê de hewl bidim li ser van xisûsan rawestim.

Civakbûna em weke klan bi nav dikin, bêguman hebûneke sekan nîne. Cinsê mirov xwe ji prîmatên mirovane vediqetîne û ev yek herwisa pêşketina civaka klan e. Pirsgirêka bingehîn man e. Bi giştî jî pirsgirêka civakekê (civaka bi hezaran koman) man e û karibe li ser lingên xwe bisekine. Li hemberî wan hêzên ku dixwazin wê ji civakbûnê derxin, hebûna xwe diparêze. Her dem û li her deverê pirsgirêkên civakan ên bi vî rengî hene. Ev parastin

hin caran li dijî tehlûke û rîskanbi şêweyê xweparastinê xwe li hedefa parastina hebûna xwe kilît dike. Carnan hin hebûn û rewşên bikêr ên derfetê didin pêşketineke danûstendinê, ên simbiyotik û berdar derdikevin holê. Hingê li wir jî pêşketineke pozîtîf bi lez dibe. Cins, klan an jî civak ji aliyê maddî û manewî ve dewlemend dibe. Di van demên dawiyê de yek ji têgîna civaknasiyê dualîteya 'ez û yên din' e. Eger em vê dualîteyê bidin ser hev û bînin ziman; li hemberî yên din ên dibin tehlûke û rîsk 'ez' ê xwe biparêze. Yan wê yên din têk bibe, pêşketina xwe dewam bike, yan bikeve weznekê û hebûna xwe biparêze lê pêşketina wê hêdî pêk bê; yan jî wê bi bin bikeve, li gorî asta binketina xwe wê hebûna xwe qismî yan jî bi temamî ji dest bide. Hingê weke hebûn ew êdî bi xwe nîne. Dibe objeya tiştekî din. Yan jî wê bê asîmîlekirin, weke yê din hebûna xwe dewam bike. Di vê rewşê de hingê jî kategoriyên weke mirov wan, çeloxwarî yan jî riziyayî bi nav bike, pêk tên.

Em bi awayekî berçavtir bînin ziman, civaka ku bixwaze hebûna xwe biparêze, ji têkoşîna manê ya civakê mînakên asta hêsan bidin, em ê bibêjin: ji bo xwe ji heywanên dirinde û şertên bahewayê, ji kêmxwarin û nexweşiyan biparêzin mirov timî li beramberî şert û mercên xwezayê têkoşiyane. Tehlûke gefê li hebûnê dixwin, derfetên rê didin jiyanê û şertên erênî jiyanê xweş dikin, pêşde dibin. Ev serhatiya beşekî wê yê mezin li Efrîkayê û mîlyoneke sala dawî jî li Ewrûpa û Asyayê derbas bû, dixelekên wê yên bingehîn de jî hatine rohnîkirin. Ev civakîbûna ji komên ji sed kesî nabihure, dişibin hevdu û hînê xwe negihandine zimanê nîşanan. Di vê civakbûnê de bi piranî xisletên biyolojîk bi bandor in, lê zêdetir jî kom bi tevger û pratîka xwe li dora jin-dayikê dicive, pêk tê. Zimanên pêşî yên bi daçeka mêbûnê vê rastiyê piştrast dikin. Divê mirov karektera civakê ya dayiktiyê piştguh neke. Pir girîng e ku mirov dayikê weke şefekê, otorîteyekê nebîne, ew bi ezmûn, tecrûbe û xwedîkirina zarokan stûneke hêzê ya

‘rêveber’iya xwezayî ye. Li cihûwarên dişibin pergala malbatê bêhtir mirovan li dora xwe dicivîne û balkêş dibe.

Têgîna bavtiyê gelekî paşê weke têkiliyeke civakî derdikeve holê, lê civak di qonaxên dûrûdirêj de vê têgînê nas nake. Piştî ku saziya mîrasê û nîzama milkiyetê derket holê girêdayî sîstema baviktiyê pêş dikeve. Aîdiyeta zarokan û xalên wan, ango birayê dayikê ji wan têgînan e ku zû derketine holê. Berhevkirina pel û pincaran û bi sînor be jî nêçîrvanî ji şêweyên tedarik û debara maddî ne. Endambûna klanê ewlehiya herî girîng a jiyanê ye. Bi îhtîmaleke mezin kesek li derveyî civaka klan bihata hiştin an jî bi tenê bimana wê di dawiyê de bimira. Ya rast ew e ku mirov klanê weke sîsik an jî kakilekî tekûz ê civakê bibîne. Şêweyê herî resen ê civakê ye.

Piştî qonaxên pêşketinê yên dûvdirêj bi saya cografya xêrûbêr mirovan gav avêtiye civaka neolîtîk û me gelek caran anî ziman ku sîstema çiyayên Toros-Zagrosê derfet û îmkan dane da ku ev der weke çemekî sereke yan jî mezin biherike. Me gelek caran anî ziman ku di vê qonaxê de civaka dayikê derdikeve asta herî jor û ji bo berhemê zêde derfet û îmkan çêdibin. Piraniya sosyolojiyê civaka dayikê weke nîzama komin a destpêkê, serdema berê û nû ya kevir û nîzama hov bi nav kirine. Li gorî min mirov ji vê serdemê re bibêje ‘civaka dayikê ya komin’ manedartir e. Ev qonaxa em behsa wê dikin, qonaxek e ku ji tevahiya dema jiyana civaka mirov ji sedî nodûnehê wê digire. Divê mirov piçûk nebîne. Zehmet nîne ku mirov fêm bike, ji nava civaka dayikê ya ku tê de berhemê zêde û danehevên din ên çandî kom bûne derketine û li beramberî vê, zilamê bihêz û xasûk ê li ber serê wê aware aware geriyaye, hin caran bi awayekî serketî nêçîrvanî kiriye û bi van seferên nêçîrvaniyê her çûye bi hêz bûye û cara pêşî çavê xwe berdaye serweriya nîzama civakê. Gelek nîşaneyên antropolojîk û belgeyên arkaeolojîk, ev çavdêrî û danaberhev, vê îhtîmalê bi hêz dikin.

Dîsa me gelek caran anî ziman ku civaka bavik ji şaman + şêxê kal ê bi tecrûbe + zilamê fermandar ê esker pêk hatiye. Ya rast ew e ku mirov di vê pêşketinê de li prototîpa şêweyê civaka nû bigere. Ango mebesta me ji civaka nû ew e ku klan bi hiyerarşî dibe. Hiyerarşiyê bi awayekî mayînde rê li ber çînîbûn û rêxistiniya şêwazê dewletê vekir û ev dabeşbûn vebirî kir. Civaka dewlet û çîn nas kiriye diyar e ku xisletên wê guherîne. Berhemê zêde êdî weke diyarî nayê dayîn, li bazarê weke malê guhertinê nirxekî metabûnê digire û ev kirîn û firotina li bazarê dînamîzma bingehîn a bihevguhertinê ye. Kengî di civakê de bazar-bajar-bazirganî weke sê hêmanên mayînde ketin dewrê dewletbûn û çînîbûn hînê jî pêş dikevin. Ji ber ku me di nava şertên zeman û mekan de behsa vê pêşketinê kiribû, ez ê dubare nekim. Bi vegotinên cihê gelek sosyolojiyan ev civaka nû weke civaka çînî, civaka bajêr, civaka dewletdar, koledar, feodal û kapîtalîst bi nav kirine û hewldane ku bi têgînên wiha bersivê bidin. Çînîtî, bajartî û dewletdarî xisletên eşkere û mayînde ne. Ji lewra ji van pêvajoyan re ‘şaristanî’, ‘medenî’ hatiye gotin. Bi ya min, mirov dikare li gorî naveroka wê gotina ‘civaka şareza’ bi awayekî kurt weke ‘şaristanî’ bi kar bîne.

Lê bala me dikişîne ku wexta em şaristanî dibêjin li gorî etîka civakê em behsa mezinkirin, bilindkirin û pêşketinê nakin, em wê weke serberjêrçûyînê û zordestiyê şîrove dikin. Civaka şareza li gorî nirxên berê yên dayika komin di warê exlaqî de serberjêrçûyînê îfade dike. Di zimanê herî kevin de ku emdizanin, di Sumerî de ev yek bi awayekî balkêş tê îfadekirin. Gotina amargî hem tê maneya azadiyê û hem tê maneya vegera li dayik û xwezayê. Pêhisîneke rast e ku di navbera dayik, azadî û xwezayê de têkiliyeke wekhev a balkêş û rast hatiye danîn. Civaka Sumer a cara pêşî civaka şareza nas dike, bi gotina amargî hesreta xwe ya ji bo civaka komin a dayikê îfade dike ku hînê ji wan nirx an jî civaka berê ya komin dûr neketiye. Di orjînalîteya Sumerê de mirov vê serûbinbûnê hem dikare bibîne, hem jî balkêş e û mirov jê hîn dibe.

Wezna di têkiliyên navbera jin-mêr de li dijî jinê xira bûn. Rewşa vê bûyerê di diyalogên navbera Înanan-Enkî de (xwedawend û xwedayê diparêze ya Ûrûk û Erîdûyê) xuya dike. Ev diyalog weke ceribandineke destanê ya pêşî hatiye çêkirin. Destaneke berî Destana Gilgamêş e. Şerê navbera nîzama komin a dayikê an jî civakê û civaka hiyerarşîk a bavik (civaka derbasî şaristaniyê dibe) de tîne ziman. Pir eşkere ye ku pêvajo bi awayekî zêde neadil û bi têkoşîn dimeşe. Li gorî daneyên dîrokî jî, civaka Sumerê di qonaxa pêşî de pêvajoyek e ku mirov dikare wê weke demokrasiya destpêkê bi nav bike dîtiye. Civata rûsipiyan hînê wernegeriyaye nîzameke bavikan. Guftûgoyên gelekî gur û geş têne kirin îşaret bi şiklekî demokrasiyê dike. Têgînên mîna fermana Xwedê hînê çênebûne. Jixwe ev têgîn pîvaneke pergala eskerî despotîk a yekalî ye ku çavkaniya wê tîpekî bi maske ye yê ku zilamê bihêz û xasûk li xwe kiriye. Şêwazê hevpeyvînê di Destana Înanna de gelekî geş e, û di civakê de çi diqewime tîne ziman; behsa bêedaletiyê û ya bi ser jinê, danehevên wê û zarokên wê de hatiye, dike. Eger zêdetir belgehebûna, me yê karîbûya bidîtanayan jî haya me wê jê bibûna ku bi îhtimaleke mezin ji demokrasiya Atînayê ya çîna koledar gelekî wêdetir, gihîştine qonaxeke demokrasiyê.

Ji aliyê teorîk ve em dikarin têderxin ku derbasbûna civaka şareza di heman demê de bi derbasbûna civaka demokratîk re di zikhev de pêk hatiye. Guftûgoyên dijwar ên pêşî li civatên rûsipiyan, reprepa hatina dengê piyê demokrasiyê ne. Li cem tevahiya civakan di heman qonaxan de em dualîteyên bi heman rengî dibînin: dualîteya civaka şareza û civaka demokratîk. Eger bi awayekî berçavtir em bînin ziman, em ê bibêjin dualîteya dewlet û demokrasiyê. Li her devera ku dewlet heye pirsgirêka demokrasiyê heye. Li her devera demokrasî hebe jî rîskeke dewletbûnê heye. Demokrasî şêweyekî dewletê nîne, her weha

weke demokrasî jî têgîna dewletê şaş e. Divê mirov baş bala xwe bide ser xisletên têkiliya di navbera herdu dualîteyan de.

Di tevahiya dîrokê de dualîteyeke ku fenûfût li ser hatiye kirin jî ev e. Ya ji nava civaka berê derketiye û pêşketiye, demokrasî ye yan jî dewlet e, vê yekê rê li ber berevajîkirin û guftûgoyên mezin vekiriye. Ev yek jî nîşan dide ku pêvajoya ku demokrasî û dewlet di zik hev de bûne bi gelek şeran, xwelihevrakişandin û pevçûnan derbas bûye. Di mînaka Îslamê de ku em baş dizanin, pevçûn û guftûgoyên li ser demokrasî-cumhûriyet û seltenatê de balkêş û zelal in. Muqaweleya Hz. Muhammed a Medîneyê mîna Peymana Civakî ya J.J. Rousseau ye. Mirov vê yekê bi hêsayî dikare di Quranê û hedîsan de bibîne. Lê arîstokrasiya eşîran a li ber serê wan bi hêz bûyî, nemaze nîzama hiyerarşîk a qebîleya Qureyşiyan pir eşkere li seltenekteke mîna ya Bîzans û Sasaniyan digere. Hînê di dema Hz. Muhammed de ev pevçûn heye. Jixwe maneyeke pevçûna di navbera Mekke û Medînê de ev e. Pevdiçin gelo nîzama nû wê cumhûriyet be (bi Erebî tê maneya demokrasiya gel) yan jî wê seltenat be (nîzama monarşîk a ji bav derbasî kur dibe). Vê pêvajoya bi pevçûn bi reva Hz. Muhammed ji Mekkeyê di sala 622'an P.Z. de destpê kir, bi kuştina Hz. Elî li Kûfeyê di sala 661'ê de bi şîddeteke bi heman rengî li cihê îro şer li ber serê wî diqewime dewam kir û klîka Muawiye ya alîgirê seltenatê ji vê pevçûna pêncî salî serketî derket. Di wê demê de nîzama bi hêz a hiyerarşîk a eşîrê rê nade cumhûriyetê, ya rastî şens neda demokrasiyeke destpêkê jî. Ji vî alî ve jî Îslamiyet bi sosyolojiyeke rastî were lêkolîn wê gelekî encamên balkêş derxîne holê!

Dîrok mînakekî din ê balkêş di dema avabûna Împaratoriya Îran a Pers de pêşkêş dike. Persan mîrasa Konfederasyona Medan piştî guftûgo û pevçûnên dûvdirêj veguherandin împaratoriyê. Di vê de binemalaAxamenît bi roleke diyarker rabû. Gelek nîşane hene ku bi berxwedanên bi pêşengiya rahibên Mediyan ji salên 560 B.Z. heta salên 520'an demeke pir dijwar derbas bûye. Kambîzê

sexte ji bo vê mînakeke balkêş e. Damezrandina berê ya Konfederasyona Medan mînakeke tîpîk ê demokrasiya destpêkê ye. Dîroka Heredot di vî warî de vegotinên balkêş pêşkêş dike.

Demokrasiya Atînayê dîsa yek ji wan mînakan e ku baş tê zanîn. Çi bi Qraltiya Spartayê, çi jî bi Makedon û Persan re şerê kirin, bi awayekî din gelo şerê demokrasî, împaratorî yan jî qraltiyê bû? Destpêk be jî li ser hîmê çînî be jî guftûgoya civakeke demokratîk e, yan jî civakeke şaristaniyê ye, hatiye kirin û li ser her pevçûne. Li Romayê di şerê li ser cumhûriyet û împaratoriyê hat kirin de, di serî de Sezar kesên herî navdar jî dikarin di van şer û pevçûnan de bêne kuştin ango ev pevçûn hebûna dualîteyeke bi şer û şîddetê nîşan dide. Em dikarin van mînakan zêde bikin. Heta ji bo em eleqeya xwe ya ji mijarê re xurt bikin û hêza têgihîştina xwe mezin bikin, em dikarin Şoreşên mezin ên Fransî û Rûs jî di vê çarçoveyê de bi nav bikin.

Şoreşa Franseyê (1789) li dijî monarşiya mutleq destpêkir. Bi cumhûriyetê bi encam bû. Ango bi demokrasiya civakî ya radîkal bi encam bû. Di pêvajoyeke pir dijwar re ango dema terora şoreşger re derbas bû. Piştî Triumvira bi Împratoriya Napolyon dewam kir. Piştî demên derbasbûnê yên curbicur heta roja me ya îro dîroka Franseyêşahidî li îlankirina pênc cumhûriyetan kir. Ya şeşan jî tê guftûgokirin.

Di Şoreşa Rûs a Mezin de (1917) perde bi demokrasiyeke radîkaltir vebû (dema şûrayan, Sovyet). Di şerê navxweyî de dîktatoriya şoreşgerî nas kir. Di dema Stalîn de dîktatorî mayînde bû. Di 1989'an de di salvegera dusedsaliya Şoreşa Franseyê de ji nû ve li demokrasiyê vegeriya. Hînê jî dixwaze demokrasiya xwe pêşde bibe. Di dema modernîteya kapîtalîst de bi sedan mînakên bi heman rengî hema bêje her sal têne dîtin.

Min ev vegotina dûvdirêj a bi mînakên kurt ji bo du têkiliyên li hev geriyayî, nakokiya di navbera demokrasî û şaristaniyê de, rewşa bi pevçûn û tengezar nîşan bidim, pêşkêş kir.

Xusûseke din a girîng a ku divê em bala xwe bidinê ew e ku herdu civakan jî dixwest li ser civaka komin hebûna xwe dewam bikin. Weke me berê jî anîbû ziman, civaka komin hînê jî dewam dike, di tevahiya şaneyên civakan de weke dewijmê hebûna xwe dom dike. Şaneya dayik e, dest jê nayê berdan ku ji bo mayîndebûna cinsê mirov divê guman jê neyê kirin. Di wicûd de çawa ku şaneyên dayik ji bo bunyeyê xwedî bikin şaneyan tamîr dikin û wexta hewce bike wan ji nû ve çêdikin, civaka komin a dayikê jî di tevahiya civakên dualîte de hebûna xwe bi şêweyekî bi vî rengî dewam dike. Ez gelek caran dibêjim; civaka komin a dayikê wê bi civakên şareza û demokratîk ên ji nava xwe derxistîre şer bike, tengezar bibe û carnan jî bi wan re li hev bike, dîsa jî tine nabe û wê nebe. Bi vî awayî mirov rewşa civaka komin a dayikê destnîşan bike sedem û encamên xwe yên girîng hene. Wexta ku cihê wê bê, ez ê dîsa jî timûtim behs bikim.

Ez timî behsa şerê di navbera civaka şareza û civaka demokratîk de dikim. Ev nayê wê maneyê ku ew li hev nakin. Berevajî di navbera van herdu civakan de lihevkirin esas e. Ya rastî diviyabû esas bûna. Sedema viya ya di serî de tê jî weke encama feraseta diyalektîkê jî du seriyên dijber, hevdu tine nakin,ji lewra civaka demokratîk û civaka şareza bê hev nabin. Hebûna yekî bi yê din e. Berê jî min gotibû, şaristanî û demokrasî herdu jî ji civaka komin a dayikê tên. Demokrasî zêdetir li bêbextî, zordestî û mêtinkariya tebeqeya jor a hiyerarşîk rast hatiye û ji xwe re piraniya jêr û piraniyan esas digire, şaristanî jî zêdetir tebeqeya jor a hegemonya îdeolojîk, mêtinkarî û zordestiyê dewam dike, dixe bingehê xwe. Lê ev alî weke du beşên bi kêrê ji hev hatine kirin û ji civaka komin a dayikê qut nînin. Di zikhev de ne, lê cudahiya wan ji hev têra xwe pêşde çûye.

Di vê nuqteyê de divê em bi tevahî têgihîştina li têgîna civakê di ber çavan re derbas bikin. Hem jî bi şertê ku em lê serwext bibin û timî ji bîr nekin. Weke çînîbûnê, di her çînê de bi hezaran komên

jêr, bi mîlyonan malbat, gelek cureyên koman ên nebûne çîn û li hemberî çînîbûnê li ber xwe didin, bi qasî yên globalbûne komikên herêmî bûne, bi hezaran cure têkilî û nakokiyên dîn, ziman, siyasî, ekonomî, eşîr, netewe, navneteweyî, kaos û nîzamên tengezar, cangiran, bi şer û bi piştgirî ketine nav hev, ne bi şêweyê yek bi tenê bi hezaran ên bi tenê bi tevahî yekpareya yekparebûnekê; divê civak werin fêmkirin. Di nav vê germoleya mezin de demokrasî û dewlet çiqasî hev di weznekê de bigirin, pergaleke nêzî aştiyê pêk tê. Ji bo bi tevahî aştî bibe, divê dewlet nemîne, herçiqas em vê yekê weke teorîk bifikirin jî di warê pratîkê de em hînê ji vê gelekî dûr in.

Jiyaneke demokratîk a demdirêj bi tevahî civakê û heta civaka dewletê dikare bigihîne aştiyeke temam. Di momenta dîrokê ya heyî de li gorî wezna hêzên qala wan tê kirin ango hêzên dewlet û demokrasiyê bikevin pêvajoya şernekirinê mirov dikare behsa aştiyê bike. Eger demokrasî bixwaze bi tevahî dewletê daqurtîne, di momenta dîrokê ya heyî de zêdetir wê xisletên kaotîk xwe nîşan bidin. Ezmûnên li gelek welatan vê rastiyê nîşan didin. Eger dewlet timî rewşeke demokrasî têde tine ferz bike wê sîstemên dîktatorî û despotîk pêk bên ku di momenta dîrokî ya heyî de encam dîsa kaos e. Şaristaniya jêre pêvajoya dîrokî tê gotin pênc hezar sal in dewam dike. Mafê jiyanê kêm bi destê demokrasiyê ket. Lê piraniya civakê û piranî her tim li benda demokrasiyê man. Ji bo wê têkoşiyan. Belkî jî bi hezaran sal derbas bibin jî û bi heman awayî nebe jî bi awayekî,dewlet û demokrasî wê di zikhev de bijîn û dewam bikin.

Xisûsa ku bûye pirsgirêk ew e ku bi qasî mirov dewlet û demokrasiyê ji hev bike divê karibe pîvanên sîstematîk ên pê karibin bi hev re bimînin û hev înkar nekin, diyar bike. Belkî jî divê mirov destûrên nû yên bingehîn çêke. Di nav hev de bûna dewlet û demokrasiya heyî bi temamî xapandinek e. Mîna pelên mêwan e ku pê eybên hev vedişêr in. Heta ji vê rewşê neyê bihurandin, guftûgoyeke hevgirtî ya demokrasî û dewletê nayê kirin. Du

şoreşên herî modern ên Rûsya û Franseyê bihêlin ku van mijaran pêşde bibin û zelal bikin, alozî mezintir kirine. Teoriya siyasetê, divê herî kêm dewleta li demokrasiyê vekirî ango dewleta demokrasiyê qedexe nake û xwe naxe şûna wê û demokrasiya dewletê înkar nake ango demokrasiya xwe bi lez nake dewlet û dewletê weke sazûmaneke timî divê ji holê were xirakirin nabîne, pêwîst e ku bi lez ji aliyê naverok û şêweyê ve demokrasiyê rast diyar bike. Bi rastî hewcedarî bi teoriyê heye; lê hewcedarî bi teoriya bersivê bide pratîka naverastê tevlîhev dike, heye. Ez bawer dikim ku mirov dikare dewlet û demokrasiyê bîne astekê ku kêm şer bikin û hev bêtir berdar bikin. Şêweyên bi vî rengî yên dewlet û demokrasiyê hem hewce ne, hem jî mumkin in. Siyaseta pêdivî pê heye jî mirov dikare li ser vî hîmî pêşde bibe. Dewletên heyî demokrasiyê bi awayekî cewherî qebûl nakin. Dewletên heyî gelekî cangiran û xwedî wicûdekî dêw in. Demokrasî jî mîna karîkaturekî dewletê ne ku çeloxwarî û bêkêr in. Bêguman meseleya bingehîn a felsefeya siyasetê û pratîka wê ev e.

Divê ez dubare bînim ziman ku ez ê van xusûsên di wan de gelek tespîtên nû hene di pirtûka Sosyolojiya Azadiyê de bi firehî guftûgo bikim.

Haya min ji min heye ku min di çarçoveya teoriyeke bingehîn de paradîgmayek ji paradîgma sosyalîst û ya rêûresma lîberal cudatir pêşkêş kiriye. Ez ê hewl bidim hinekî din jî naveroka wê tijî û xurt bikim. Min di çarçoveya vê vegotina kurt de hewl da bersiv bidim ka em dikarin kapîtalîzmê weke ‘şêweyekî civakê’ di ku de û çawa bi cih bikin. Eşkere, ez kapîtalîzmê ne weke şêweyekî ekonomiyê û ne jî weke şêweyekî civakê dibînim.

Beriya her tiştî,em hewl bidin têkiliya jêre ekonomiya kapîtalîst dibêjin, di nava yekparebûna civaka şareza de bibînin. Ekonomiya kapîtalîst jêre ekonomiya bihevguhertinê jî tê gotin. Bi şêweyê vê ekonomiyê metabûn çêdibe. Di vê ekonomiyê de yekdestdariyek heye ku ji têkilî û reqabeta di bazarê de keysê

dibîne, bi buhayan dilîze û ji cudahiya di navbera deveran de sûdê werdigire. Girîng e ku mirov vê xusûsê baş fêm bike. Li gorî vê binavkirinê jî divê mirov baş zanibe ku ne sektorek e ku nirxê guhertinê diafirîne. Bi giştî pir hindik bi jiyana ekonomîk re têkildar e. Lê belê ji ber pozîsyona xwe ya stratejîk hindikayiyeke diyarker e. Di destê hindik kesan de nirxekî mezin ê guhertinê yê ketiye ser hev e. Ji lewra jî bi serdestiyeke stratejîk dikare hem bi ajotina mal a bazarê û hem jî bi xwesteka ji bo wê bilîze. Divê neyê jibîrkirin ku ev serdestiya heta wê rojê, di destê dewletan de jî nîne. Çêbûna vê serdestiyê û şêweyê bikaranîna wê balkêş e. Kêm zêde, mirov çêbûna wê fêm dike. Lê şêwazê çêbûna wê, ji ber ku xwe dispêre timî mezinbûna sermayeyê, gelekî bi bandor e û dikare civakê serûbinî hev bike. Eger mirov ji vê rola wê re bibêje şoreş e, ev bi civakê re îxanet e. Nexasim jî bi civaka dîrokî û demokratîk re!

Zanista ekonomî-polîtîk wê kengî li xwe mikur bê ku xwemezinkirin û bikaranîna sermayê talanek e ku kirasek lê hatiye kirin û ev gelekî hûrûkûr tê kirin. Jixwe supermenên ekonomiyê siyasetvanên ekonomiyê ji navê pîroziya qanûnê sûdê werdigirin û ev jî qanûna navdar a karê ye ku wê cîla dikin û pêşkêş dikin. Ez ji zilamê bihêz û xasûk re çima kapîtalîst nabêjim? Ji ber ku desteserkirina wî xwe dispêre hêz û şerê eşkere, ji ber wê. Bêguman em ji bîr nakin ku şer dafik e. Hewce nabîne kirasê huqûq û dîn lê bike. Lê pêwîst e ku mirov heqê ekonomiya kapîtalîst di vê nuqteyê de bide: têkiliya ekonomî-dewletê ya beriya wê bi desteserkirina bi darê zorê bû. Rêûresma huqûqa hiyarerşiyê dînê bi ser ve bû rêzika wê ya ‘malê kafiran helal e’ eşkere weke heqekî destûrê dide desteserkirinê. Ango zilamê bihêz û xasûk êdî dibû dewlet. Ekonomiya kapîtalîst di vê nuqteyê de ji dewleta klasîk vediqete. Ez nabêjim dijberê wê ye. Asta pêşketina civaka şareza ji ber ku talaneke mîna xenîmetê berdar nabîne, li vê sektorê pêşî vedibe. Jixwe wexta dewleta koledar û feodal bêber bû (dema

xespa eşkere, mafê xenîmetê yê ku talan e berdar nebû, xwîna civakê dimije û tîne sînoreke wisa ku êdî nikare berhema zêde hilberîne)  ji wê kêliyê û pêve ew li ser kar e ku ev jî cudahiya wê nîşan dide. Jixwe bi vî awayî derfetê dide xwe ku navê sîstemeke nû ya ekonomiyê li xwe bike.

Yekdestdariya dewleta koledar di serdemên pêşî de gelekî berdar e. Em wexta li qebrên Firewnan pîramîdan dinêrin, em li bermahiyên bajarên Greko-Romen dinêrin ev rewş bi eşkereyî xwe nîşan dide. Sektora kapîtalîst di vê demê de jî heye, lê gelekî bi sînor e. Berdarbûna yekdestdariya dewletê rê nadiyê ku di wê sektorê de pêş bikeve yan jî hindikî rê didiyê. Kengî nîzama xebatê ya koledar bêber dibe, em dibînin nîzama xebatê ya feodal belav dibe. Mijara me nîne ku em analîz bikin bê ka şaristaniya koledar çima bêber bûye. Lê di vî warî de em bi kurtî dikarin qîma xwe bi gotina çend hevokan bînin. Ev şaristaniyê bi têgihîştina xwe ya jiyan û xebatê ya demeke dirêj (B.Z. 4000-P.Z. 500), bi belavbûna xwe ya li mekanekî fireh, bi mesref û lêçûna zêde, bi darê zorê girtina yê zêde, ji ber ku sînorên wê yên kolekirinê yên peydakirina mirovan bi dawî bûn, ji ber ku ji derve û hundir bi hezaran serhildan û berxwedanên bi karektera azadîxwazî û demokrasîxwaziyê li dawiyê ma.

Civaka şaristaniyê ya hat avakirin û zêdetir ji aliyê Îslama Rojhilata Navîn û Xirîstiyantiya Ewrûpayê ve hat temsîlkirin, li gorî şaristaniya Greko-Romen a mîrasa wê wergirt û ji şaristaniya ew jî li ser hatin avakirin ji şaristaniya Sumer û Misrê cuda xwe spart şêweyekî meşrûiyet û mêtinkariyê. Herdu dînan zemînekî xurt ê meşrûiyetê danê. Li gorî kole bi gundiyê serf ku yê wê ye, civaka şareza karîbû xwe nû bike. Bêguman dema dirêj a Xirîstiyantiyê bi qasî sêsed salan bû wicdanê xizanan û têkoşîna azadîxwazî û wekhevîtiyê, ya di bin perdeya mezhebên cihê yên Îslamê de dewam kir, ango hewldan û lêgerînên li civaka demokratîk, bi roleke sereke kirin ku şaristanî hem xwe nû bike û hem jî xwe

dewam bike. Weke îdeologên şaristaniyê îdîa dikin, ev yek ji mezinbûna şaristaniyê û pêşketina wê ya bi rûmet nîne. Herçend hin destketiyên wê hebin jî ya rastî bi saya bermahiyên civaka komin a berê, bi saya hezaran berxwedan û serhildanên xizanan, reva koleyan, qewman û eşîran xwe gihandiye vê astê.

Di civaka şareza de zordestî û mêtingeriyê xwe bi amûrên nû yên rewakirinê nû kirin, bi vê re amûrên wê yên bingehîn çîn, bajar û dewlet jî veguherîn û nû bûn. Di nava têkiliyên nû yên serf-senyor, bajar-bazar û dewlet-evd de pêşketina hêmanên kapîtalîst hêsan bû. Bajarên ji Çînê heta Okyanûsa Atlasê li dora bazarê çêbûn, kirin ku hilberîna metayê zêde bi lez bibe, bihevguhertina mal hûrûkûr û berfireh bibe. Buhayê cihê ya di navbera bazaran de kir ku kara yekdestdariya bazirganan bigihîje asteke nedîtî. Bi vî awayî cara pêşî bû ku bajaran keys dît bi gundan re bikevin weznekê. Şaristaniya Îslamê ya di navbera Rojhilatadûr û Ewrûpayê de bi awayekî, şaristaniyeke bazirganiyê bû. Ji aliyê bazirganiyê ve ji Ewrûpayê re çi hewce dikir, pêşkêş kir. Çi ji aliyê çanda maddî, çi jî ji aliyê çanda manewî ve. Amûrên din ên bingehîn ên şaristaniyê jixwe ji serdemên destpêkê ve dihatin pêşkêşkirin. Barkirina bajar, çîn û dewletê bi Îslamê re bi dawî dibe. Di vê de bêguman rola Ereb û Cihûyan sereke ye. Karên ku Greko-Romenan di serdema antîk de nîvco hiştibûn, zanyarên Ereb û Cihûyan, pîşesaz û bazirganên wan temam kirin.

Kêmasiya girîng a bi tenê ya şaristaniya Rojhilata Navîn ew e ku sektora kapîtalîst nikarîbû ji bajaran bibihure û di nava mekanê welatekî de bi roleke sereke rabe; ango ya Amsterdam û London têde bi serketibûn, ew nikare têde bi ser bikeve. Di vê de ji rejîmên mutleqiyetê yên Ewrûpayê wêdetir otoriteyeke navendî ya despot diyarker bû. Avahiyên siyasî yên li Çîn û Hindistanê di warê navendîbûn û asîmetrîkbûnê de ji seltenatên Rojhilata Navîn serdesttir bûn. Japonya hinekî di şêweyê siyasî yê feodal ê mîna Ewrûpayê de ma.

Em dema tên digihîjin sedsala 16., em dibînin êdî taqeta şaristaniyên Asya qedîm nemaye ku gaveke nû biavêjin. Seferên Tîmûr û Cengiz, koçên ezbetên tirk û êrîşên wan bi tenê bûn sedem ku ev şaristanî hinekî din temenê xwe dirêj bikin û bibin xwîneke teze. Çi bibûya wê li Ewrûpayê bibûya ku weke nîvgiraveke li serê rojavayê Asyayê disekinî. Ji ber ku laboratûara nû ya şaristaniyan ew der bû.

Tevî şaristaniyê wexta bazirganî û sektora kapîtalîst barkirin Ewrûpayê, li pêşiya xwe erdên bakîr û beyar, bajarên nû avabûne û feodalîteyeke nûgihîştî ya xam a Ewrûpayê dîtin. Mirov ji wan re nikarîbû şaristanî jî bigota. Li Ewrûpayê Xiristiyantiyê ya heta dawiya sedsala dehan kir, dayîna morala manewî bû. Eger şaristaniyeke qedîm a mîna li Rojhilata Navîn, li Ewrûpayê pêk bihata, zehmet bû ku şaristaniya kapîtalîst lê pêş biketa. Şaristaniyên nû li erdên bakîr û beyar çêdibin. Mirov vî alî jî di warê şaristaniyan de li ber çav bigire, dikare baş hîn bibe. Di meyandina şaristaniya Ewrûpayê de em dibînin ku valatiyeke gelekî balkêş heye. Ji ber ku dewamkirina bi ya berê zehmet e û ya nû jî xam e (feodalîte) ev yek dihêle ku ya sêyemîn karibe ji navê derkeve. Mînak di ser Spanyayê re Ereban, di ser Balkanan re Osmaniyan, di başûrê Sibîryayê re êrîşên qewman û herî dawî jî eger milekî êrîşên Moxolan li Ewrûpayê bi şêweyê berê împaratoriyek ava bikira, gelo wê dîrokê bi ku ve biçûya? Wer xuya ye ku li Ewrûpayê şens jî hêmanekî girîng e.

Bi tevahî van spekulasyonan em li ser şaristaniyê dikin, ji bo em çêbûna sektora kapîtalîst û karektera hegemonîk zelal bikin. Em dibînin ku ji bo pêşketina xelekeke şaristaniyê jî nîşane xuya nakin. Komeke mezin a spekulator, baziganên mezin, bi bandora hêza hezar tesadufî, li herêmên marjînal û telşên şaristaniyên qedîm, di ser bazaran re û li dijî wê bi lîstikên peran û bi rêyên dûr ên bazirganiyê û ji talanên mêtingeriyê bi zêdeyî yên para xwe girtî, di ser du bajarên Ewrûpayê yên herî bê îdîa, pêşî li Ewrûpayê

paşê li tevahiya dinyayê karîbûn hegemonya xwe deynin û bi dijwarî bi kar bînin.

Bi tevahî lêkolîn nîşan didin ku ev koma spekulator gelekî muhafezekar e, ti fikreke xwe ya afirîner û vedîtineke xwe nîne. Karê herî baş dizane bike ew e ku bi peran, peran bi dest bixe. Di dema tinebûn û şeran de dizane ji kurtêlan bi dest bixe, li gelemperiya dinyayê ji cudahiya di navbera buhayan de her bêhtir bi dest bixe, hînê zêde pereyan bi dest dixe û ev qadeke civakî ye ku herî zêde têde dizane tevbigere. Yek ji xisletên balkêş ên Ewrûpaya di serê sedsala 16. de ew e ku pere gihîştiye wê astê, dikare hukim li her tiştî bike. Fermandar û rêveberê rastî bûye pere. Pere li cem kê be, hêz li cem wî ye. Bêguman di vê de sedemê bingehîn ew e ku her tişt zêde bûye meta, bûye bazar û bûye bajar.

Ti hêza desthilatdariya Asyayî ya qedîm, siltan an jî împarator û heta ti împaratorê Romayê ti pirsgirêka wî bi hikumkirina pereyê berhemê metabûnê ye û bi peran rêvebirina desthilatdariyê tinebû. Hebe jî gelekî bi sînor bû. Hebe xezîneyên dinyayê ji mêj ve biribûn qesrên xwe. Sektora kapîtalîst wexta serketin li pey serketinê bi dest dixist, qralên Ewrûpayê di rewşekê de bûn, parsa deynan jê dikirin. Têkiliya hêza pere û desthilatdariyê êdî ketiye qonaxeke nû. Desthilatdariya siyasî cara pêşî ye ku li ber peran çongên wê dişkên. Ev rastî jî piştrast dike ku pere hêza fermanê girtiye û ev yek nîşan dide ku çend bi hêz bûye. Napolyon wexta der barê artêşê de digot ‘Pere! Pere! Pere!’ ev rastî dianî ziman.

Di dîroka şaristaniya dinyayê de, di bingehê nûbûnê de giraniya bandora pere heye û ev jî di şaristaniyê de rê li ber nûbûnê vedike. Lê di xisletên wê yên bingehîn de ti guhertineke bi kok çênabe. Jixwe şaristanî, pere, bazar, bajar, bazirganî û heta banke û senedê hînê nû nas nake! Ev hemû jîamûrên bi hezaran sal berê hatine vedîtin in.

Xisûseke din a girîng ew e ku sektora kapîtalîst di destpêkê de têkiliya xwe bi hilberînê re tinebû û heta têkiliya wê bi bazirganiya

piçûk re jî tineye. Di têkiliyên bingehîn ên aboriyê de ti keşfek an jî tiştekî nû kiriye nîne. Hêza afirîner a guhertin û metayê jî nîne. Ji hezarên salan ve guhertin û metabûyîn dewam dike û tê. Eger ille hewce dike ku em behsa qabîliyeteke sektora kapîtalîst bikin, divê em bibêjin ku hêza pere baş keşif kiriye, dizane bi kar bîne, dizane pere bike sermaye ango dizane ji pereyan, pereyan bi dest bixe. Di vê pîşesaziyê de hoste ye. Baş dizanibûn li kîjan bajar û welatan dikarin pere qezenç bikin, rê û bazaran bişopînin, di vê mijarê de ostayiya wan gelek bû. Yên di vê sektorê de cih digirtin pisporên pere û gera mal a li bazarê bûn.Eger mirov di serê sedsala 16. de ketina Ewrûpayê ya bin fermana pere bi tenê bi hostatiya vê komê ve girê bide ev yekê bibe tengavkirina rastiyan. Bi tevahî rastiyên em tînin ziman nîşan didin ku di pêşketina şaristaniyê de, rola ev kom pê rabûye, gelekî bi sînor e. Pere û bazar mecbûr nebûn ku sektora kapîtalîst derxin holê. Ji ya li Ewrûpayê gelekî zêdetir hêza pere û bazarê li cem şaristaniyên Asyayê hebû. Eger yekser têkilî bi vana re hebûya wê berê pêşî li wan deran derketiya holê. Bi giştî tê qebûlkirin ku mirov nikare têkiliya zanist, huner, dîn û felsefeyê jî bi derketina kapîtalîzmê re deyne, ji ber ku ew li gorî prensîbên disîplîna xwe ya manewî bi guman û dijber nêzî vê derketin û çêbûnê dibin. Ev nêrîneke ku bi giştî tê qebûlkirin.

Mijareke min timî hewl daye bi bîr bixim. Hêzeke mîna jinê, çawa bû ku li ber destê mêr ê ti xisleta wî ya afirînerî û hilberîn nîne kete rewşeke ev çend belengaz û bû mehkûmê ber destê wî? Bêguman bersiv rola zorê ye. Piştî ku aborî jî ji destê wê girtin êdî ji bo jinê êsîriyeke xeternak ferz dibe. Mêrekî zarok jî deyne ser serê wê, çil salî wê karibe pîrektiyeke piçûkketî jêre bike. Ewqasaew ji kesayetiya xwe bûye ku deng jî jê dernayê. Jixwe pîrektiya ji zilamê bihêz re hînê jî xeternak e.

Ez bawer dikim ku em hêza pere weke sermaye li ser civakê bi vê mînakê re bidin ber hev wê ji bo hînbûnê gelekî bi kêr bê. Jixwe piştî ku pere gihişt hêza fermandanê, ya rastî êdî bûyer meseleyeke

aborî nîne. Dîroknasê hoste Fernand Braudel wexta dibêje; ‘kapîtalîzm dijberê bazarê ye, ango li dijî aboriyê ye û heta li dijî ekonomiyê ye’ rastiyeke gelekî manedar tîne ziman. Ji ber ku ekonomî bi diyardeya bazar û guhertinê daye destpêkirin, hukmê wî gelekî giranbuhaye. Min jî timî dixwest bînim ziman ku kapîtalîzm her tiştê xwe di nava ekonomiyê de dadike, dixeniqîne, lê ya rastî ti têkiliya xwe bi ekonomiyê re nîne û heta dijminê wê yê sondxwarî ye. EZ ÎDÎA DIKIM: KAPÎTALÎZM EKONOMÎ NÎNE, DIJMINÊ WÊ YÊ SONDXWARÎ YE. Di beşên pêş de ez ê vê mijarê bi awayekî berfireh bigirim dest û li ser rawest im. Gelo fînans, ekonomî ye? Ma fînansa global, ekonomî ye? Qey felaketa hawîrdorê ekonomî ye? Ma bê karî pirsgirêkeke ekonomîk e? Banke, sened, kûr (course)û faîz ekonomî ne? Ji bo kara mîna kansêrê mezin dibe  hilberandina metayê ekonomî ye? Lîsteya pirsan dirêj e. Bersiveke bi tenê ji bo hemûyan heye ew jî NA ye. Formul ev e: Pere, sermaye bahane = desthilatdarî şahane! Pere-sermayeyê bi lîstikên heta dawî hîlekar ne şêweyekî nû yê aboriyê afirandine, ne jî şêweyekî civaka kapîtalîst û heta mirov dikare behsa şêweyekî şaristaniyê yê bi navê şaristaniya kapîtalîst bike. Li naverastê lîstikek heye ku bi şêwazekî di ti dema dîrokê de nehatiye dîtin û bi vê lîstikê civak bi dest xistine. Ne bi tenê hêza aboriyê, bi tevahî hêza siyasî, eskerî, dînî, exlaqî, zanistî, felsefî, hunerî, bi tevahî çanda maddî û manewî hatiye bidestixistin. KAPÎTALÎZM DESTHILATDARÎ Û SERWERIYA HERÎ BERFIREH E.

Em li çarsed salên dawî yên mirovatiyê binêrin ku jêre serdema kapîtalîzmê jî tê gotin. Di civakê de gelo devereke neketibe bin serweriyê û heta bi rehên civakê yên zîro, şaneyeke desthilatdarî li ser nehatibe danîn maye?

Civaknasê xasûk ê Ingilîz Antony Giddens behsa sê domnekirinên modernîteyê dike: şêweyê hilberînê yê kapîtalîst, dewleta netewe û îndustrî. Giddens wexta modernîteyê bi van sê lingan bi nav dike, rast xuya dike. Lê bawerdikim ku haya wî jê

heye; bi vê paradîgmayê teorîsyeniya qonaxeke nû dike ku pê têdikoşe û dixwaze kapîtalîzmê ji welatê wê yê esasî rizgar bike. Lîberalîzma bi şêweyê rastgir teoriya bi guhertinê kapîtalîzmê domdar bibe dikir ku ev jî îdeaya dawiya dîrokê bû, lîberalîzma bi şêweyê çepgir jî bi îdeaya 'dîroka bêserûbinî' careke din dixwaze mutleqiyeta kapîtalîzmê bixe mejiyên mirovan. Vê jî bi pêngava dawî ya kapîtalîzma global re dikin.

Ez ê şîroveya der barê kapîtalîzmê de ji vir û pêve li ser hîmê analîzên modernîtiyê dewam bikim. Nemaze di çarçoveya dewleta netewe û îndustriyalîzmê de. Lê ez ê hewl bidim wê bi xwe jî li biryargehên desthilatdariyê bişopînim. Min ji sernavê 'li mala kapîtalîzmê' ya F. Braudel îlham girt, lê min ew kêm dît, ji lewra bi temamî ne wisa, lê weke xwedayê xasûk ê Sumeran Enkî, mîna Hadesê Helenan di qesrên li bin erdê de, ango li deverên ku lîstikên desthilatdariyê, yên kiriye xuya nekin li wan tên lîstin. Lewma eger sernavê me bibe 'Li Qesra Qralê Tazî û Xwedayê Bêmaske' wê hînê manedartir be. Ez ê bi tevahî şêweyên vegotinan sentez bikim û nîşan bidim ku ji serî ve çawa kapîtalîzm xwesteka xwe ya sîstemeke desthilatdariya global hebûye û bi dewleta netewe û îndustriyalîzmê çawa xwestiye di vê xwesteka xwe de bi ser bikeve. Ji ber ku parçekirina şêweyên van vegotinên mezin yek ji karên pêşî yên vî Levîathanê nû ye. Eger em vegotinan bi hev ve nekin wê vegotin kêm bimînin. Bihevkirina vegotinan dike ku rexne bikeve xizmeta armanca xwe. Dibe ku ji rêbaza min lome bêne kirin, lê ez bawer dikim mirov digihîne şîroveyeke xurt a têkiliyên civakî ango mirov xweş serwext dike. Ez ê dabaşa dawî ya nirxandina xwe bi sernavê 'Dijminê Sondxwarî yê Ekonomiyê Kapîtalîzm' temam bikim. Xebata min a piştî vê jî wê bi sernavê 'Sosyolojiya Azadiyê' be ku ez ê têde civaka demokratîxwaz, azadîxwaz û wekhevîtîxwaz analîz bikim.

## 3- KAPÎTALÎZM NE EKONOMÎ, DESTHILATDARÎ YE

-Xwedayê Bêmaske, Qralê Tazî û
Pere-Fermandar Li Qesra Xwe-

Di nava gel de tê gotin. Dibêjin eger tu bixwazî xebereke rast bigirî biçe 'xeberê ji zarokan bigire'. Weke erkeke rêzgirtinê ji bo tevahiya zarokan û ji bo ez careke din dakevim çavkaniya xebera rastî divê ez pêjn, xeyal û bîranînên xwe yên zarokatiyê ji nû ve şîrove bikim.

Wexta ku min bihîst zarokê cîranê me Emîn 'îlmîhalê' dixwîne, eleqeya minji mizgeft û Îslamê re zêde bûbû. Piştî ku min çend dua ji ber kirin, min karîbû li sefê pişt melle Muslim cih bigirim. Piştre min bihîst melle Muslim gotiye 'Abdullah wer biçe wê bifire'. Min ev gotina wî hîç ji bîr nekir. Wer xuya ye ku min rast dest bi gavavêtinê kiriye. Dîsa hînê di bîra min de ye; min xwe li qurmê dara zeytûnê ba dabû û min ji hevalê xwe yê dibistana seretayî Ezîz (piştre min bihîst bûye muhendîs û mudîrekî tapûyê yê ji rêzê) pirsîbû û guftûgo kiribû ka dibistan û mamoste divê tiştekî çawa bin. Dibistan li ber çavê min mîna pêjna cinawirekî modern ango Levîathanê modern hatibû. Di vê de jî ez nexapiyabûm. Ji ber ku li dibistanê xwedayê nû dewleta netewe didan jiberkirin. Piştre gelek dem derbas bû, min di felsefeya Hegel de xwend ku xwedayê nû weke dewleta netewe daketiye ser rûyê erdê û bi şiklê Napolyon dest bi meşê kiriye û wexta min fêm kir ku vê yekê bi rahib-mamosteyan li dibistanên seretayî didin jiberkirin, ez lê hayil bûm ku min ji zarokatiya xwe xeber rast girtiye. Bi destpêkirina dibistanê re li cihê ku Xwedayê melle Muslim pirnisî, Xwedayê mamoste Mehmed ê Çorimî bilind û mezin dibû. Şofêrê kamyonê yê ji gundê Argilê Heyder hebû. Çend caran ber destî şeveqê bi kamyona xwe di ber xaniyê me re derbas bûbû.

Lampeyên mekîneya wî ji ser xaniyê me ve xuya dikirin. Wexta min serê xwe ji bin lihifê radikir û bi çavên xwe yên li xewê li rohniya lampeyên makîneyê temaşe dikir, ew sêhra makîneyê weke pêjna nîvxwedayekî baş dawerivîbû hinavê min. Makîneyaxwedayê nû mewzû behs bû. Paşê gelek dem di ser re derbas bû, min fêm kir ku îndustriyalîzm yek ji şax an jî navê herî xurt ê Levîathanê nû ye û bi vî awayî min careke din bawer kir ku min ji xeyalên zaroktiya xwe xeberên rast girtine.

Ez divê yekser li vir bibêjim ku ti xwedatî bi qasî îndustriyalîzmê cinawir nebûye. Gundê me bi qasî pêncî kîlometreyî ji sînorê Sûrî dûr bû. Wexta şewqa projektorên rohnîkirinê yên sînor mîna brûskekê li çavên min dixistin û dikuskusandin, pêjneke têkel a mîna dewlet-xwedê dihat. Ez vê jî weke xebereke sêyemîn a zaroktiya xwe timî hewl didim bi bîr bînim.

Komara Tirkiyê yek ji mînakên pêşî ye ku wergerandin dewleta netewe û modernîteya kapîtalîst ew kir nîv-mêtingeh. Komara Tirkiyê di damezrandina xwe de xwedî xisletên Komara Franseyê ye. Weke wê di destpêkê de dewlet û demokrasî di zikhev de ne. Mîna Komara Îslamî ya Îranê, Komara Îslamê ya pêşî li Medîneyê û heta mîna Yekîtiya Komarên Sovyeta Sosyalîst YKSS. Bi demê re hêmanên demokratîk pejinandin û ev cûmhûriyet weke şêweyê desthatdariya kapîtalîst wergerandin dewleta netewe ya çor û hişk. Ez ê hewl bidim van mijaran di beşên pêwendîdar de bi firehî analîz û guftûgo bikim. Cûmhûriyeta Tirkiyê belkî jî yek ji van mînakên pêşî ne. Mînakên pêşî divê mirov bi baldarî şîrove bike. Min dixwest formên xwe yên cumhûriyetê, cihê û weke çîrokeke dirêj û romanê bianiya ziman. Lê ez bi tenê bi hevokekê dixwazim bibêjim; min wexta li dibistana Cumhûriyetê ya neqane, Fakulteya Zanistên Siyasî (Mekteba Dewletê ya Milkiye) dixwend û ez diketim sala wê ya dawiyê, mejiyê min ê analîtîk û hisî tevizî bû, min ti tişt his nedikir û fêm nedikir, min his dikir ku ez bi temamî

serkorî kiribûm û Levîathanê nû weke ku ez kiribim mîna tenekeyekê û bi zorê deng ji min derdixîne û bûme weke nezanekî kor ku ez ê piştre bi vê rewşa xwe bihesiyama.

Bandora dînê berê yê li gund piştî gelek salan min bi tiştên li dibistanên mezhebên sosyalîzma pêkhatî karîbû bişkînim. Ez divê bêjim ku di van salan de ez ketibûm nav rewşeke septîk û şikê. Her ku ez difikirîm ez noq dibûm û mîna ku bifetisim li min dihat. Piştî gelek salan, kengî ez li xwe hayil bûm ku çi di rengê Komara Tirkiyê de, çi jî di rengê Sosyalîzma Pêkhatî ya Sovyetê de ya xwe li ser min ferz dike Levîathanê modern e, hingê ez bi ser xwe ve hatim. Ji tevahiya xwedayê dînan ez bi xwedayê dînê modern ji xwedayê hemû dînan xetarnaktir re rûbirû bûm. Pût û formên wî yên bêhejmar dor li min girtibûn. Min derketin û serweriya vî dînê modern fêm kiribû û min zanîbû ku ev dîn û xwedayê wî li gorî min nîne. Min his û fêmkiribû ku ez çiqasî xwe ber bi bayê vî dînî nexim û xwe ji rê dernexînim wê ew qas hilbijêrka min a jiyaneke azad pêşde biçe. Cara pêşî bû ku mejiyê min ê analîtîk û hisî destê xwe dabûn hevdu û ez bi ser xwe ve anîbûm. Ez bi van xetan hewl didim vê pêvajoyê şîrove bikim.

K. Marks û F. Engels wexta 'Sosyalîzma Zanistî' ango civaknasiya xwe şîrove dikin weha dibêjin: 'Me ji ekonomî-polîtîka Ingilîz, felsefeya elman û sosyalîzma Fransî sentezek çêkir.' Ev her sê ekol, hewl didin analîzên teorîk ên modernîteya ku hewl dide hukim li tevahiya Ewrûpayê bike, pêşde bibin. Ekola ekonomîk-polîtîk a Ingilîzan hewl dide ya diqewime weke serketina ekonomiya nû piştrast bike yan jî weke dînekî nû bide bawerkirin, felsefeya elman dibêje; divê aktorê sereke dewleta netewe (şêweyê nû yê qral-xwedê) esas were dîtin.Sosyalîzma Fransî jî li ser navê tevahiya civakan (weke yekîtiya demokrasî û şaristaniyê) radibe û dibêje; vegotina dînî ya berê xwe vekişandiye û civaka laîk-pozîtîvîst ango dînê nû yê sîstemê bi ser ketiye û hewl dide vê teorîze bike.

Şoreşa fikrê ya ji sedsala 16. ve pêş ket, di hîmê wê de bandora serûbinker a yekdestdariya kapîtalîst heye. Wexta mirov vê şoreşê bi nav bike divê mirov timûtim çend mînakên dîrokî yên bi heman rengî bîne ber çav. Mînaka me ya pêşî perestgeha dewleta rahib e. Li vir zîggûrat malzaroka dewletê ye. Li ser berhemê zêde rêxistiniya bi navê dewletê bi şoreşa fikrê re tê nirxandin. Berhemê zêde bi kîjan amûrî dikare bê kontrolkirin? Amûrên bingehîn ên rewakirinê wê çawa bêne pêşdebirin, sererastkirin; ango çawa baweriya civakê bi sîstema nû bidin anîn ? Çareyên hatin dîtin ev in; dewlet wê were bi rêxistinkirin û weke mînaka pêşî ya tevahiya dînên şaristaniyan xwedayên nû bêne avakirin. Bersiveke pir dijwar hatiye dayîn. Dewlet cara pêşî weke rahib- qral tê birêxistinkirin. Ekonomî cara pêşî weke sosyalîzma dewletê û di zik dewletê de tê birêxistinkirin û kontrolkirin. Hêzên hiyerarşîk ên ji rêûresmê jî weke xwedayên nû yên ezmên, erdê, hewa, av û bajaran têne avakirin û maskekirin. Kolekirina mirovan cara pêşî di destana afirandinê de tê dîtin. Di vê destanê de xweda dibêjin wan mirov ji pîsiya xwe afirandine. Bûyer û diyardeyên bi vî rengî hemû li zîggûratê têne vedîtin. Zîggûrat weke perestgehê, qatê wê yê jor panteon e, ango cihê otorîteyên tebeqeya jor a hîyarerşîk, cihê yekîtiya xwedayan e, qatê li binya wan ê rahib-qralan e, ango rêveberên hegemon ên pêşî yên afirînerên sîstemê ne, qatê herî jêr jî ji kole û pîşesazên nirxê zêde û berheman diafirînin re hatiye veqetandin. Wexta em dibêjin perestgeh malzarok û prototîpa pêşî ya bajar, dewlet û çînane, em sîstematîka formula tevahiya şaristaniyan jî diyar dikin. Modela wê herî dawî Ewrûpa jî di nav de, em li ser tevahiya şaristaniyan şopa wê dibînin. Ji lewra jî rast e ku mirov mînaka Sumer weke çavkaniya orjîn bibîne. Ez dibêjim; ti versiyon nikare bi qasî orjînê balkêş û bi tesîr be.

Versiyona sêyemîn Ionya-Grek e. Versiyona duyemîn a Sumeran, Hûriyên çavkaniya xwe Mezopotamya Jêr in û şaristaniya Hîtîtan a di nava wan de ye. Cudahiya Grekan ew e ku ji

vegotina mîtolojîk a klasîk bihurîne û şêweyê felsefîk ava kirine. Sedema bingehîn a avakirina wan a felsefeya civak û xwezayê ew e ku dewletên bajaran ên derketine holê û hînê jî pêşketine êdî bi vegotina mîtolojîk nikarin rave bikin û bidin bawerkirin. Herçiqas di tebeqeyên jêr de hêza rewakirinê ya vegotina mîtolojîk dewam bike jî ji bo kesên bi pirsgirêkên berçav ên rêveberiyê re mijûl dibûn hewcedariyavegotineke razîker her diçû xwe ferz dikir. Pratîka jiyana civakî bi sedema pirsgirêkên bajaran rê li wan vekiriye, şêwazê ravekirina felsefî ferz dike. Lê panteona xwedeyan Olympos a bi Zeûs destpêkir hînê jî bi bandor e. Sokrates di berdêla helwestên xwe yên pêşî yên gumanbar de canê xwe da, lê ji şagirtên wî hat doktrîna wî ya hînê pêşnûme, bikin bingeha çavkaniya felsefeyê. Nexasim mirov ji Eflatûn û Arîsto re bibêje şahê felsefê ne, şaş nîne.

Mirov dikare Ibraniyan weke qebîleya pêşî ya ji mîtolojiya Sumer û Misrê derbasî vegotina dînî ya yekxwedayî bûye, bi nav bike. Versiyonbûna ji milekî din e. Di serî de Zerdeştî û felsefeya Yewnan gelek şaxên din jî jê diçin û Mûsewîtî, Îsevîtî û Muhammedî jê zêde dibin.

Daneheva çandî ya maddî û manewî ku di sedsala 16. de li Ewrûpayê gihîşt hêzeke mezin, ya rastî xwe dispêre vê dîroka orjîn û versiyonên wê. Jixwe bêyî vana mirov bifikire û bi Ewrûpayê bide destpêkirin, bi tenê bi vedîtina mîtolojî û dînên nû yên ku ji serî ve diyar e ku wê kes jê bawer neke. Pozîtîvîzm, laîktî, lîberalîzm û heta sosyalîzm weke xebatên fikrê xwedî xisletên nû bin jî di bin bandora giran a çavkaniya sereke ya dîrokî de hatin çêkirin. Têgîn û naverokên wan bi piranî ji aliyê versiyonên beriya wan ve hatine çêkirin. Ne bi tenê huqûq, huner, zanist û felsefeya Greko-Romen, xwe nespêre mîrateya Misr û Sumeran, ravekirina dema Ronesans, Reformasyon û Rohnîbûnê mimkun nabe.

Hemin di vê de kêrhatina Ewrûpayê heye. Jixwe bi sedsala 16. re destpê dike fêkî û ber digire. Di serî de Francis Bacon,

Montaigne, Machiavelli û Kopernik bi vegotinên zanistî, felsefî û dîn têkel versiyona nû diyar dikin. Şaristaniyê bi tenê bajar, dewlet, çîn, bazirgan, pere û bazar pêşkêş nekirin; felsefe, dîn, zanist û hunerê jî pêşkêş kirin. Ewrûpayê xwe îspat kir ku dikare çanda maddî û manewî ya dîroka qedîm herî zêde bigire û di hinavê xwe de bi nazenîniya laboratûarekê lêbikole û qabîliyeta sentezkirinê nîşan bide. Şaristaniya Hind û Çînê nikarîbûn di vê yekê de bi ser bikevin. Şaristaniya Rojhilata Navîn jî nikarîbû bibe xwedî hêz da ku karibe gava dawî biavêje. Min sedemên vê timûtim anîn ziman.

Wexta ez dibêjim di dîroka şaristaniyê de Ewrûpa versiyona sêyemîn a mezin e, mirov van rastiyên dîrokî ji nû ve bi bîr bîne wê gelekî jê hîn bibe.

Antony Giddens, kêrhatinên Ewrûpayê li şaristaniyê zêde kirine, bi gotina 'nedomker' kiriye têgîn. Bi vê jî hewl dide ya orjîn destnîşan bike. Bêguman orjînalên şaristaniya Ewrûpayê hene. Lê ev nedomkerên Giddens kapîtalîzm, dewleta netewe û îndustriyalîzm hinekî be jî vê îspat dikin. Civaknasiya Giddens tê maneya rizgarkirina kapîtalîzma di roja me ya îro de ku ez ê di beşên pêş de hewl bidim li ser rawestim. Lê belê sê mijarên bingehîn ên behsa wan kiriye divê mirov hûrûkûr analîz bike. Ji lewra têkilîdanîn gelekî girîng e.

Em ji nû ve li sê çavkaniyên girîng ên Marksîzmê vegerin. Ji aliyê anîna ser hev a çavkaniyên fikrê yên Ewrûpayê ve ev sê dabeşkirin manedar in. Lê Giddens nikariye wekheviya di navbera hersiyan de zevt bike. Ji ber ku zevt bikira wê xwe jî bida dest. Marksîzm jî di navê de ya ku ekonomîk-polîtîka Ingilîz, felsefeya elman û sosyalîzma Franseyê hevpar dike, îdeolojiya Rohnîbûnê ye. Ya divê were çareserkirin esas ev îdeolojî ye. Li dinyayê hînê jî ya serwer û bi bandor dîsa ev îdeolojî ye. Civaknasî herçiqas weke zanistwere pêşkêşkirin jî li derveyî çarçoveya heman îdeolojiyê tiştekî nû nagire nava xwe. Ez şaş nebim, civaknasê navdar ê

DYE'yê E. Wallerstein, Marksîzm jî di navê de wexta fikra Ewrûpayê şîrove kiriye, bi vî awayî li xwe mikur hatiye: 'Em wexta dipeyivin, azadî û sosyalîzmê guftûgo dikin, ez fikaran dikim ku îlahê li me bêne xezebê. Ji ber ku me hemûyan ji heman çavkaniya bijehr vexwar.' Fikra behsa wê tê kirin, îdeolojiya Rohnîbûnê ye. Mikurhatina navdar a nûnerê bihêz ê Dibistana Felsefeya Frankfûrtê Adorno jî weha bûye: 'Jiyana çewt rast nayê jiyîn.'

Nietzsche û peyrewên wî îdeolojiya Rohnîbûnê hînê eşkere rexne kirin. Nietzsche dibêje, Rohnîbûnê bi tevahî têgînên xwe ji dîn girtine. Carl Schmitt kokên dînî yên tevahiya têgîn û feraziyên felsefeya siyasetê, rohnî kirin. Lîteratureke dewlemend û lîsteyeke dûvdirêj a kesayetên mînak hene ku nîşan dide, Ewrûpa di şêwazê fikra xwe de ketiye şik û gumaneke kûr.

Rewşa şaristaniyê li Ewrûpayê gelekî tevlîhev e û mirov dibizdîne. Ne tenê bi mêtingeriyên xeternak, şerên netewe û dîn ên emperyalîst, bi kontrolkirina ekonomiyê û rê dayîna wê, bi desthilatdarî û dewletkirina wê bi qasî ku di ti dema dîrokê de nehatiye dîtin, gihîştiye mezinahiyan. Di vê nuqteyê de gelek 'nedomdariyên' wê nayên înkarkirin. Û heta ji gelek aliyan ve kapîtalîzm, îndustriyalîzm û dewleta netewe, bêguman gelek 'nedomdariyên' girîng pêşkêş dikin.

Lê di serî de îdeolojiya Rohnîbûnê ev vegotin hemû nikarin 'nedomdariya' şaristaniya Ewrûpayê rave bikin. Bi zanebûn jî nebe, çawa ku her dîndar propagandaya dînê xwe dike, li gorî analîzên dawî em dikarin bibêjin, vê îdeolojiyê weke dînekî qebûl dikin û xwediyên vegotinan di rewşa dîndariyê de ne. Ez divê bi bîr bixim ku timî îstîsna hene û ev yek ti carî hukmê giştî xira nake. Şêweyê fikra Ewrûpayê ya ku kokên wê diçin kûrahiya dîrokê, di çend versiyonan re derbas bûye, di nava şaristaniyeke maddî ya tevlîhev de ku orjînên wê ne, pêk hatiye û divê mirov xisleta dînî ya metafizîk a vê pêkhatinê ti carî ji nedîtî ve neyê. Weke her dînî, berpirsiyar e ku şertên xwe yên çanda maddî biparêze û ebedî

bike. Belavkirina wê ya li tevahiya dinyayê wezîfeya wan a stratejîk e. Ji rahibên wê yên destpêkê,tevahiyazanîngehên wê yên fermî, dibistan û akademiyan, ji dibistanên seretayî heta qişleyê, ji fabrîkayê heta navendên mezin ên firoşgehan, ji medyayan heta muzeyan, heta bi bermahiyên dînên berê, ji hepisxaneyan heta bi nexweşxaneyan, xwecihî û global heta bi goristanan, nemaze di qada neteweyî de zêhniyeta civakê bi tevahî fetih dike, bi teknîkên desthilatdariya polîtîk û zora eskeriyê weke zirxekî xwe li tevahiya civakê badaye. Bi tevahî civakê 'Di qefeseke hesinî de digire.'

Dîn û fikrên şopa dîn li ser wan hene, çendîn fermî bibin, dibin îdeolojî. Îdeolojî jî bi awayekî berçav bernameyek e ku ji rêzikan pêk tê, komên mirovan û berjewendiyên wan diparêze. Fikir an jî dînê Ewrûpayê yê li gelemperiya dinyayê fermî bûye, êdî îdeolojiyek e. Weke şaristanî neçare tebeqeya xwe ya jor biparêze, ebedî û serwer bike. Ji bo şaş neyê fêmkirin ez divê destnîşan bikim ku ez van rexneyan ne tenê li mirovên Ewrûpî dikim; li xwe, herêm û dinya min jî di navê de li tevahiya mirovatiya hatiye fetihkirin, dikim.

Îdeolojiya Rohnîbûnê çima evqasî bi tesîr e? Ev pirseke li cih e. Ev îdeolojî weke dînekî kozmopolît ê herî pêşketî ye. Bang li tevahiya mensûbên dînên beriya xwe dike. Neteweyî ye; weha kirine ku mirov nikaribe li neteweyîbûnek û civakîbûneke ne perestê dewleta netewe be, bifikire. Wisa kirine ku mirovê bê dewleta netewî mirovê bê dîn e. Îdeolojiya dewletparêziya netewedi rewşa dînekî herî qels de ye. Ji lewra qebûlkirina vê îdeolojiyê bi qasî qebûlkirina dînên berê zehmet nîne. Xwe bi zanistiyê timî xwedî dike. Şêweyê jiyana maddî bi awayekî kiriye rîtueleke dînî. Amûrên çanda manewî, di serî de organên medyayê timî propagandaya wê dikin. Jiyana ekonomîk û siyasî bi temamî di kontrola wê de ne. Globalbûyî ye.

Haya min ji min heye ku ez wexta rewşê bi îfadeyên giştî tînim ziman, ez pêjna dinyayeke mirov nikaribe ji nav derkeve

diafirînim. Ez divê yekser bibêjim, şaristaniyeke bi vî rengî xwe pêşkêş dike, dişibe dema dawî ya Împaratoriya Romayê ku baweriya wê bi wê nemabû. Herçiqas bi heybet û bi hêz xuya bike jî bi tevahiya piraniyên di nava civakê de hilweşandiye û parastina ekolojîk a hawîrdorê re ji zû ve têdikoşe. Bi qasî împaratorbûyîna şaristaniyê konfederasyonbûyîna demokrasiyê jî dewam dike.

### A- Kapîtalîzm ne Ekonomî, Desthilatdarî ye

Mirov îdîa bike ku kapîtalîzm ekonomî nîne, fikrek e ku herî kêm bi qasî pirtûka Das Kapîtal a Marks encamên xwe hene. Ez hema berê pêşî bibêjim ku fikra ez hewl didim qala wê bikim, têkiliya wê bi reduksiyontiya desthilatdariyê nîne. Her weha ez rexneyê li xwe qebûl nakim ku kapîtalîzmê weke ekonomî bi dewletê re têkildar bikin. Ez dibêjim, ya weke têgîn kapîtalîzm, kapîtalîst û ekonomiya kapîtalîst tê gotin, pêkhatina klîk û hêzeke polîtîk e ku ekonomiyê kontrol dike. Ev hêz cara pêşî di sedsala 16. de li Ewrûpayê bi tesîr bûye, li Hollanda û Ingilîstanê bi navên me behskirî bi xwe bûye serwerê polîtîk ê van welatan. Bikaranîna wê ya ekonomiyê nîşan nade ku ew ekonomîk e. Mirov dikare bêje, Fernand Braudel dîroknas-civaknasekî hêja ye ku cara pêşî haya wî ji vê rastiyê çêbûye. Lê belê nikarîbûye fikra xwe sîstematîze bike. Herçiqas haya wî jê hebe ku bi tevahî fikreke Ewrûpayê ya weke amentûyê xira kiribe jî pir zêde nikarîbûye vê bîne ziman. Belkî jî di vî warî de nikarîbûye fikra xwe pêşde bibe. Pir eşkere dibêje; kapîtalîzm dijberê bazarê ye, talana yekdestdariyêye û ji derve tê ferzkirin. Wê wextê divê mirov bipirse: tiştê ku xwe ji derve ferz dike, dijberê bazarê ye û ne ekonomî ye, çi ye? Bersiva mirov dide vê pirsê kêm e. Hêzeke polîtîk e, dîn e, yan jî dibistaneke fikrê ye?

Li deverên fikra teorîk dikevin nav hev lêkolînkirina bûyerên pratîk dikare hînê encamên mirov jê hîn bibe bide. Em mînaka xwe li ser Venedîkê bidin û em dest pê bikin lêbikolin. Di sedsala 13. de li Venedîkê komeke mezin a bazirganan heye. Lê ev kom di heman

demê de li ser rêveberiya bajêr jî serwer e. Bi hevrikên xwe re şer dike. Keştiyên wan ên şer hene. Ango Venedîkeke bi hêza eskerî jî heye. Her weha palpiştiya Ronesansê jî dike. Li ser civak û ekonomiyê kontrola wê xurt e. Ev têkilî bi tevahî di zikhev de ne û bi hêsanî mirov dikare bibêje pere weke zamqekê wan bi hev ve dike. Naxwe kîjan têgîn dikare yekparebûna van têkiliyan îfade bike? Xusûsên mirov dikare wan rave bike ev in; Venedîk bi koma ku weke bazirganên mezin bi nav dike ekonomiyê di bin destê xwe de digire û beşekî mezin ê nirxê zêde vedidize. Ji bo vê jî erka polîtîk bi xwe yan jî kontrola wê di destê xwe de digire. Wexta pêdivî bi zorê dibîne hêza artêşê bi kar tîne.

Eger mirov baş dêhna xwe bidiyê, mirovê bibîne, yek kêm yek zêde, tevgera komple ya komê xuya dike. Di nava komê de herçend hin nav biguherin jî herî kêm li Venedîkê komeke di pozîsyona diyarker de heye. Dubare em vê komê bi nav bikin. Yekdestdariya bazirganan e, dewlet e, artêş e, burokrasî ye. Palpiştê cemawera huner û dêrê pêş in. Komek e ku ji dewletê wêdetir, ji derve xwe li ser ekonomiyê ferz dike, lê ekonomî nîne, hegemonyayeke ji dewletê wêdetir li ser civakê ferz dike. Mirov ji vê komê re bêje desthilatdariyeke şidandî, heta wê yekser weke desthilatdariyê bi nav bike, şîroveyek e ku aliyê wê yê rastiyê xurt e. Eger ev kom li tevahiya Îtalyayê bi tesîr bûbaya, me yê jêre bigota desthilatdariya neteweyî ye. Eger xwe li tevahiya beşên civakê belav bikirana, me yê navê dewleta netewe lê bikira. Ekonomiya welat bixista bin destê xwe, me yê jêre bigota desthilatdariya ekonomîk. Vê rewşê xwe li tevahiya Ewrûpayê û ji wir jî li dinyayê belav bikira, me yê jêre bigota împaratoriya dinyayê ye.

Di çarçoveya van feraziyan de em li cografya sedsala 16. a Hollanda û Ingilîstana îro binêrin. Bûyera diyarker ew e ku ev her du welat timî ji aliyê qraliyetên Franse û Spanyayê ve têne tengavkirin. Ev qraliyet dixwazin xwe weke împaratorî îlan bikin Ingilîstan û Hollandayê jî weke eyalet bi ser xwe ve bikin. Lê prens

û qralên van welatan dixwazin serxwebûna xwe ya siyasî biparêzin û pêşde bibin. Ji lewra gelekî zû pêdiviya wan bi hêzê heye. Naxwe her kêlî dibe ku bêne daqurtandin. Hêza hewcedarî jî pê heye, siyasî, eskerî, pereyî û entelektuelî ye. Fikirdar û hunermendan vedixwînin. Descartes, Spînoza, Erasmûs li wan deran in. Serrafên Cihûyan weke xwediyên peran diherikin wan deran. Hîmê artêşeke nû tê danîn. Ev artêşeke profesyonel e, bi disîplîn, bi perwerde û teknîka nû ye. Ji bo destek û piştgiriya civakê girîngiyê didin azadiyê. Şerên siyasî yên navxweyî çareser dikin. Ya girîngtir jî li Ewrûpayê ji bo ekonomiyeke berdar a girîng hostatiyeke ekonomîk nîşan didin. Wexta mirov li van sedem û bandoran gişan bi hev re difikire, mirov dibîne Hollanda û Ingilîstan li beramberî hevrikên xwe baş xwe diparêzin. Ji vê jî wêdetir di dawiya sedsalê de keysê dibînin xwe bikin hegemon. Yên ku kêm zêde pê dizanin ku xeta sereke ya bûyeran a di pratîkê de bi vî rengî ye, wê wê qebûl bikin.

Hingê em pirsên xwe ji nû ve bikin. Em ê bi tevahî van têkilî û pêwendiyên di zikhev de çawa bi nav bikin? Em weke sîstemeke çawa bi nav bikin? Bi tevahî van pêşketinanji aliyê ekonomiyê ve çîneke afirîner a nû pêk anî? Li naverastê aboriyeke berdar heye. Kê ev afirand? Bi hezaran reng pîşesaz, cotkar, karker, bazirganên piçûk, dikandar, bazar, pere û senedên çerxê bi lez dikin. Ya girîngtir, ev ekonomiya berdar nirxê zêde mezin dike. Kî para zêde distîne? Herhal yên ekonomiyê bi hêza siyasî-eskerî û pere di bin destê xwe de digirin. Ji ber ku pere nebe, firotin nabe. Ew nebe jî berdarî nabe. Hêza siyasî û eskerî jî nebe wê welat bê dagirkirin, hingî jî dîsa berdarî wê kêm bibe. Naxwe, tevî ku di diyarkeriyê de bandora pere û tiştên weke wî yê jê peyde bûyî hene jî ew bi tenê dikarin ekonomiyê bînin asta kontrolkirinê û di berdêla wê de jî ji bo ku karibin nirxê zêde yê mezin dibe desteser bikin vê kontrolê dewam dikin. Muhtemel e ku ev beş têkiliyeke xwe ya xurt bi erka siyasî û eskerî re heye. Prens û qral serê artêşê ne. Hewcedariya

wan jî bi pereyan heye. Ji lewra îhtimaleke mezin e ku bi kesên nirxê zêde berhev dikin yan di heman komê de ne, yan jî bi wan re di nav têkiliyên gelekî baş de ne. Di vê navberê de, têkiliyên xwe bi tevgerên fikrî û hunerî re jî xweş digirin. Li hesabê wan jî tê ku li Ewrûpayê weke prens û qralên girîngiyê bi azadiyê didin, bêne naskirin. Tevgerên muxalefetê yên hevrikên xwe jî destek dikin û xwe ji vê paş ve nadin. Em careke din bipirsin: em vê tevgerê bi tevahî çawa dikarin bikin têgîn? Eger em bibêjin ekonomî ye, li naverastê kesekî xweşik bi ekonomiyê re mijûl dibe tineye. Ew, yên hene nirxê zêde desteser dikin. Ev kî ne? Ji derve xwe li ser ekonomiyê ferz dikin. Nirxê pere di nava çerxê de bi lez dikin û pê pereyên xwe zêde dikin. Weke deyn didin dewletê. Belkî jî di berdêlê de dibin hevparê dewletê.

Em dibînin ku hêmanên em ji wan re kapîtalîzm, kapîtalîst û ekonomiya kapîtalîzmê dibêjin, ew kes in ku ekonomiyê ne yekser kontrol dikin, lê ya rastî bi xwe di navê de cih nagirin. Ev kes esas bi çi mijûl in? Têkiliya wan bi yekdestdariya desthilatdariyê re heye. Yekdestdariya xwe ya ekonomiyê bi yekdestdariya desthilatdariyê re dikin yek. Şer dikin; dema li welêt di şer de bi ser bikevin di nava welêt de jî hêza wan zêde dibe. Maneya vê jî hînê pir nirxê zêde ye. Wexta di şerê li beramberî derve de jî bi ser dikevin, maneya vê destketiyên mêtingeriyê û hegemonyayê ye. Bi vê re jî talana yekdestdariyê tê.

Eger em mînakaIngilîstan û Hollandayê li zeman û mekan belav bikin, bûyerê hînê berçavtir bibin. Hevgirtina xwe pêşî ji bo hegemonya xwe ya Ewrûpayê bi kar tînin. Di dawiya sedsala 16. de serweriya Împaratoriya Spanyayê şikiya û li Ewrûpayê armancên ji bo împaratoriyê derbên xedar xwarin. Di dawiya sedsala 17.de monarşiya Franseyê têkçûye û daxwazên wê yên hegemonîk li ser Ewrûpayê derbeke xedar xwariye. Li hemberî Awûsturyayê bi destekdana Prûsya Elmanyayê derbeke xedar li daxwazên împaratoriyê yên binemala Habsbûrgê xistine. Bi Şerên Sîh Salan

re dawî li serdema şerên dînan hat, di 1649'an de bi Peymana Westphaliayê di nava xetên xwe de li gorî wezna dewletên netewe hîmê sîstemê danîn. Bersiva ku Franseyê bi Şoreşa 1789'anda vê, di şexsê Napolyon de bi têkçûna hegemonya stratejîk bi encam bû. Di heman deman de şerên mêtingehan bi ser ketin û bi şoreşa îndustriyê ketin sedsala 19'an. Şoreşa îndustriyê hegemonyadariya Ingilîz misoger kiriye, ji xwe re derî li împaratoriya dinyayê vekiriye. Dêwê Elman di şexsê Prûsyayê de dereng hişyar bû, piştî serketina di 1870'yî de li dijî Franseyê, ji bo bibe hegemonyadarê Ewrûpa û dinyayê bi du şerên cîhanê gelekî xirab têkçû û şikestin xwar. Weke Ingilîstana duyemîn DYE ji du şerên cîhanê serketî derket û ji Şerê Cîhanê yê Duyemîn ve hêza hegemonîk a cîhanê ye. Împaratoriya Sovyet a Rûsyayê ku xwest rola Elmanyayê dubare bike ji şerê hegemonyayê têkçûyî derket. Êdî Emerîkayek heye ku bi rola Împaratoriya Dinyayê radibe, ji bo pêşî li hilweşînê bigire hema bêje bi şerekî parastinê temenê xwe dirêj dike.

Berê desthilatdariyê bi xetên xwe yên sereke bi vî awayî ye. Çemê desthilatdariyê ji sîteya Ûrûkê dest pê dike diherike, bi hezaran rûbarokan tevlî xwe dike û li peravên bajarê New Yorkê yê DYE'yê êdî di nava avên okyanûsê de wenda dibe. Peravekî din a tê texmînkirin biherikê peravên okyanûsa Çînê ye, lê ev niha bi tenê feraziyeyek e. Îhtimala wê ya xwe bigihîne wir, ji îhtimala xwe negihînê qelstir e. Civaka şaristaniyê ji hev de bikeve îhtimaleke hîn mezin e. Li gelemperiya dinyayê pirsgirêkên hawîrdorê û yên civakî yên ku gelekî mezin bûne, kirine ku civakên demokratîk bikevin dewreyê û berî her tiştî şaristaniyên xwe ava bikin. Ev yek êdî yek ji îhtimalan e. Li şûna kulta îm-paratoriyan a ji sîstemên dewletên berê mayî, yekîtiya konfederatîf a demokrasiyan şensê xwe zêdetir heye bi pirsgirêkên global re serî derxîne.

Em van feraziyan dikin ji bo ku em kapîtalîzmê li cihekî rast deynin. Yanî em di warê fikrî de li asoyan li gerûgeştê ne. Çemê mezin ê şaristaniyê li rawestgeha xwe ya li Hollanda û Ingilîstanê

piştî ku dibe gerînek û gerdaveke kûr dewam dike. Bi lez û rengekî nû li rêya xwe diçe. Bi gerînekê re nedomdarên tevlî çemê mezin dibin, reng û lezeke nû didin herikîna çemê şaristaniyê. Dewleta netewe weke versiyona nû ya ji rêûresma dewleta berê, dîsa piştî şoreşa neolîtîkê weke şoreşa herî mezin a ekonomiyê îndustrî, du çemên bi hêz in. Ev du bandor rêûresma şaristaniyê bi lez û reng dikin.

Dîsa pirsa ez timî dikim tê pêşberî me. Kapîtalîzm li ku ye? Kapîtalîzm li ku dera dewleta netewe û îndustriyê ye? Ez van pirsan di çarçoveya ekonomiyê de dikim. Tevî ku ez timî di nava ekonomiyê de li bersiva wê digerim, tewş e, timî ez dubare dikim, ez bersivê di nava ekonomiyê de nabînim.

Dibe ku seyr xuya bike, lê li gorî min, tevî hewldanên dagirkerî û mêtingeriyê hemûyan, xwediyê rastî yê ekonomiyê jin e. Eger em bixwazin ekonomiyê ji aliyê sosyolojiyê ve bi awayekî manedar bigirin dest, helwesta herî rast ew e ku em weke hêza bingehîn jinê bibînin; ew zarok di zikê xwe de hildigire, piştî zayîneke bi zehmet, heta li ser piyan bisekine bi awayekî pir zehmet xwedî dike. Pîşesaza xwedîkirinê ya malê jin e. Wê demê divê em qebûl bikin ku jin hêza herî bingehîn e. Bersiva min sosyolojîk e ku ji rastiyê re bi hurmet e. Ji sedî sed ez têkiliya mijarê ji aliyê biyolojîk ve li ber çavan digirim. Jixwe tevî rola wê ya di şoreşa cotkariyê de bi berhevkirina pincaran a bi milyonan sal û ne tenê di hundirê malê de di gelek qadên ekonomiyê de jin ew hêz e ku hînê jî çerxê digerîne. Yewnanên antîk xwediyê anora danîna hîmê zanistan in; yewnanan ji ekonomiyê re qanûna malê, qanûna jinê digotin. Vê yekê jî ev rastî beriya bi hezaran salan piştrast kiriye.

Di rêza duyemîn de kategoriya kole, serf û karkeran heye. Hêzên şaristaniyê ew weke hunerekî sereke ji bo desteserkirina berhemê zêde û nirxê zêde bi rêbazên bêrehm û dewamî di bin destê xwe de xebitandine. Di rêza sêyemîn de hinekî din ên azad, her cure pîşesaz, bazirganên piçûk, dikandar û cotkarên xwediyê

erdên hindik hene. Em li van hunermend, mîmar, muhendis, bijîşk û erbabên pîşeyên din zêde bikin, kêm zêde em ê tabloyê temam bikin. Bêguman yên tevahiya dîrokê çerxa ekonomiyê gerandine, ev kom an jî çînên civakî ne. Dîsa di nava wan de kapîtalîst, senyor, axa û efendî tinene. Ev,pir eşkere hêzên ekonomîk nînin, ev li ser mirov û keda wî her cure mêtingerî, dagirkerî, mêtinkarî û asîmîlasyonê ji derve û bi yekdestdarî ferz dikin. Ev hêzên dagirker, mêtinger, mêtinkar û asîmîlasyonkar in. Ne bi tenê kapîtalîst e, yê ku xwe ji derve ferz dike û ne ekonomî ye. Bazirganên mezin, pîşesaz û weke kapîtalîst bankevan, ji bilî wan senyor, efendî, siyasetvan, esker û entelektuelên şaristanîparêz, hêzên ne ekonomîk in, xwe ji derve li ser ekonomiyê ferz dikin.

**B- Daneyên Dibêjin Kapîtalîzm Ekonomî Nîne**

Dane û agahiyên li ber destê me têra xwe balkêş in, ne bi tenê dibêjin kapîtalîzm ekonomî nîne, ya hîn xeternak jî dibêjin; kapîtalîzm dijberê ekonomiyê ye.

1- Daneyên destpêkê krîzên ekonomîk in. Koma rahib a 'pozîtîvîst-zanistkar' ku hewl dide ispat bike kapîtalîzm sîstemeke ekonomiyê ye, li pirsgirêka krîzan jî çewt serwext dibe û dike. Mirov krîzên ekonomîk tenê dikare bi awayekî rave bike. Ew jî kapîtalîzm di nasnameya dijminê sondxwarî yê ekonomiyê û dijberê wê de ye. Hinek caran tê gotin; ji ber hilberîna zêde krîz çêdibin. Li aliyekî dinyayê mirovê ji birçîna bimirin, li aliyê din jî wê hilberîna zêde hebe! Dijberiya kapîtalîzmê ya ekonomiyê herî zêde di van rewşên bi zanebûn çêkirî de, ispat dibe. Sedem gelekî eşkere ye: Kara yekdestdariyê.Ji ya ku hema bêje belaş hildiberîne, para ku ji hêzên kedkar re hiştî, dema têra kirînê nake, xwedêgiravî pêsîrtengî çêdibe. Ya rastî, çêdikin. Di vê rewşê de kîjan rahibê sexte, ya rastî kîjan qaşo ekonomîst di hewarê de tê? John Maynard Keynes! Çi dibêje? Dewlet bila lêçûnan zêde bike. Çawa? Hêza kedkaran a kirînê zêde bike! Krêtiya lîstikê bi tevahî

çawa derdikeve holê? Ji aliyekî ve tu yê bi destê xwe bêrîka wî vala bikî, ji aliyê din ve jî dîsa bi destê xwe bêrîka wî ya din tijî bikî! Ev bi her awayî polîtîkaya ji bo kedkar û hemû civaka li derveyî şaristaniyê mirinê nîşan bide û bi tayê razî bike.Eşkere, em li vê derê bi têkiliyeke polîtîk re rûbirû ne. Ji bo çalakiya hêzên demokratîk li hemberî şaristaniyê were şikandin van hêzan pêşî birçî dihêlin. Piştre kengî lava dikin, zikê wan têr dikin. Em bi taktîkên berê yên şer re rûbirû ne: eger tu dixwazî gelekî, bajarekî teslîm bigirî, divê pêşî tu dor lê bigirî, tu yê birçî bihêlî! Paşê di berdêla teslîmgirtinê de tu yê zikê wî têr bikî!

Ez bi sedan mînakî dikarim rûyê sexte yê teoriya krîzê ya kapîtalîzmê ispat bikim. Eger em tenê pêsîrtengiya navdar a 1930yî analîz bikin, em ê mentiq bi tevahî ji hev derxin. Di vê demê de çi diqewime? Yekîtiya Sovyetê ya ku hegemonya Ingilîstanê qebûl nake bi awayekî mayînde û serketî dibe rejîmek û hem jî bi gefxwarina li dinya ji xwe re kapîtalîst digot. Di nava Ewrûpayê de bi şertên giran peymana teslîmiyetê li ser Elmanan û yên pêre, tê ferzkirin. Lê ew bi çepgir û rastgirên xwe li ber xwe didin.Mao, li Çînê serhildaneke mezin a gundiyan bi rêve dibe. Di serî de Anatolya, li dijî hegemonyadariya Ingilîz welatên mêtingeh û nîvmêtingeh li gelemperiya dinyayê bi têkoşînên riz-gariya neteweyî serî radikin. Bersiva hegemonyadariya dinyayê ya Ingilîz da van, di 1929-30’yî de pêsîrtengiyeke bi zanebûn bû. Li aliyekî mal weke lod û gidîşan ketine ser hev, li aliyê din jî kedkar û gel ji birçîna dimirin. Dermanê Keynes ê Ingilîz her tiştî eşkere dike: bi qasî li ser piyan bimînin wê kurtêlan bidin gelan û kedkarên dinyayê. Xwedêgiravî ev polîtîkayên dewleta civakîye. Ev ‘polîtîkayên dewleta civakîya kapîtalîst’ encamên wê çi bûn? Civaka demokratîk a dinyayê ya bi Serhildana Sovyetê ya Cotmehê destpêkir, li hemberî hêza nû ya hegemon a şaristaniyê gav bi gav paşve hat şikandin, berevajîkirin, asîmîlekirin; di sala 1990’î de sîstema Sovyetê bi polîtîkayên berê hatibûn destpêkirin ji hundir

ve hat hilweşandin û bi awayekî fermî jiholêrabûna wê hat îlankirin. Di salên 1930'yî de polîtîkayên Stalîn ên antî-demokratîk ango dîktatoriya wî: Çima? Ji bo ku bandora pêsîrtengiya 1929-30'yî bidin aliyekî bû. Baş e, kî dan aliyekî an jî têkçû? Stalîn û klîka wî û ekonomiya Sovyetê. Dewletên rizgariya neteweyî ji naveroka xwe ya civakî ango civak û şoreşa demokratîk hatin kirin û întegreyî sîstema kapîtalîst a hegemonîk hatin kirin. Evrewşên pêsîrtengiyê bi tevahî ji bo armanca sereke ne. Bi polîtîkayên dewletan ên bi zanebûn hebûna sîstema hegemonîk dewam kiriye û bi vî awayî xwe gihandine vê armancê, herî kêm qonaxeke nazik li dawiyê hatiye hiştin.

2- Em krîzên tinebûn û xelayê jî dikarin di heman kategoriyê de bigirin dest û li ser rawestin. Bi zanebûn mal nayê hilberandin an jî li hemberî afat û nexweşiyan ji neçariya mirovan hêviyê dikin. Teknîkên heyî bixin tevgerê nabe ku nexweşî û birçîbûnên girseyî bên fikirîn. Wexta ku armanc parastina hebûna sîstema hegemonîk be, serî li van krîzên lihevçêkirî didin, nexweşî û afat weke sîleheke gefxwarinê têne bikaranîn. Em careke din cîhazê bi navê 'civak û ekonomiya kapîtalîst', têkiliya wî bi awayekî fermî bi hêzên şareza yên hegemonîk re pir zelal şîrove dikin. Heman rêbaz e: birçî bihêle, rewşa wî ya nexweş û felaketê bi kar bîne! Bi ser de jî bi vê jî wê karibe nîşan bide melekê xelaskar e û heta xweda ye. Bila evd û bendên te têra xwe malavahiya te bikin!

3- Divê mirov baş fêm bike ku kapîtalzîm ne bi tenê dijberê ekonomiyê ye, di heman demê de dijberê civakê ye jî. Ji mêj ve Rosa Luxemburg hewl dabû bi awayekî teorîk ispat bike ku nabe civak bi tevahî bibe kapîtalîst û ev yek îmkana xwe nîne. Bi ya min hewcedarî bi teoriyên hûrûkûr nîne. Eger her kes, her civak, weke karker û kapîtalîst dabeş bibe, bi armanca karê tu nikarî mal hilberînî! Ez mînakeke hêsan û besît bidim: fabriyeke sed karker lê dixebitin bifikirin. Bila ev sed maşînî çêkin. Bila civak bi yek zêde ji sedî 1 + 100 pêk bê. (Ji ber ku civak ji kapîtalîst û karkeran pêk tê.

Civaka saf kapîtalîst jêre dibêjin jî ev e. Jixwe ev şaşiya beşekî mezin a Marksîstan e.) Em sed maşînî ji destê xwe derxin ji bo em karê bikin. Em bêjin sed karkerî bi heqdestê xwe maşîn kirîn. Ji patron re çi ma? '0' (sifir). Bi vê analîza min a sîstemê, 'civaka demokratîk a dijberê şaristaniyê' ya nabe kapîtalîst, divê her tim hebe ku civaka şaristaniyê jî karibe dewam bike. Weke hêza hegemon a nû 'şaristaniya kapîtalîst' jî weke şaristaniyên din bi dijbertiya civaka demokratîk, di dema çalakiyan de bi awayekî çavsorane bi dijminatiya civaka demokratîk dikare hebe: yan bi şeran an jî bi aştiyê. Mîna di tevahiya dîroka şaristaniyê de, di dîroka şaristaniya kapîtalîst de jî bi qasî ku neyêne jimartin gelek bûyer û şer hene ku vê vegotinê piştrast bikin.

4- Bêkarî ji bo nîşan bide kapîtalîzm ne ekonomî ye daneyeke din e. Kapîtalîzm weke sîstem ji bo ji nirxê zêde rêjeya kara digire mezin bike timî neçare artêşeke yedek a bêkaran di destê xwe de bigire. Eger tinebe jî neçar çêdike. Bêkarî pêvajoyeke ku bi zanebûn tê çêkirin. Heywan û nebatên ji rêzê jî bi kêr tên, çawa dibe ku hebûneke mîna mirov bêkêr were hiştin û bêkêr were kirin? Mînak morî bêkar dibe? Eger morî jî bêkar nabe, gelo hebûneke mîna mirov pêşketî çawa bêkar dibe? Di gerdûnê de ji têgîna bêkariyê re cih tineye. Lê weke berhemeke ji rê derketî ya mejiyê analîtîk, fena çalakiyeke herî hov a jiyana civakî, bêkariyeke lihevçêkirî tê afirandin û di rojevê de aktîf tê hiştin. Ti bûyer bi qasî 'bêkariyê' nikare rûyê dijmintiya dijwar a sîstema kapîtalîst li hemberî jiyana ekonomîk derxe holê. Di rejima firewnan de ku em gelekî rexne dikin de jî, cih ji têgîna 'koleyê bêkar' re nîne. Çawa ku firewnê bêkar nabe, kes li koleyê bêkar jî nafikire. Koleyek her tim nirxekî xwe û karekî xwe hebûye. Bi tenê di kapîtalîzmê de bêkarî, ango dijmintiyeke yeman a ekonomiyê heye.

5- Kapîtalîzm dijminê teknîka ekonomiyê ye. Bi asta teknîk û zanista heyî, çi civakeke em jêre bibêjin 'civaka bextewer' çi jî em jêre bibêjin 'civaka li bihuştê', çi civak dibe bila bibe, hem sîstema

siyasî weke şêweyê civaka demokratîk dikare hebûna xwe bi hêsanî dewam bike, hem jî weke ekonomî dikare pirsgirêkên xwe çareser bike. Ji bo ev asta zanist û teknîkê optîmûm (şêweyê herî berdar) bersivê bide pêdiviyên mirov 'qanûna karê' ya sîstema kapîtalîst rê nadiyê û dibe asteng. Eger qanûna karê nebe, asta teknîk û zanista heyî, di wê kapasîteyê de ye ku bi ekonomiyeke li gorî pêdiviyên xwarinê yên mirov were birêkûpêkkirin, her çareseriyê wê bi hêsanî bibîne. Berevajî destûr nayê dayîn ev kapasîte tam were bikaranîn; timî krîz, bêkarî û bi werimandinên civakî afirandin û dixwazin şaristaniya kapîtalîst bi vî awayî dewam bikin. Di vê çarçoveyê de em dikarin bibêjin; kapîtalîzm ne tenê dijminê ekonomiyê ye, bi teknîk û zanista ku di asta optîmal de dikare ekonomiyê rêve bibe jî dijmintiyê dike.

6- Kapîtalîzm dijminê yek ji prensîba bingehîn a ekonomiyê exlaq û nirxên manewî ye. Mirov bi tenê dikare bi pîvanên exlaqî pêdiviyên xwe yên ekonomîk bi rêkûpêk bike. Naxwe dikarin mîna moriyan zêde bibin, wê wextê deh dinyayê din jî têra wan nakin. Eger exlaq nebe, civak dikare bibe 'civaka şêran' û wê li dawiyê heywan û dewarên bêne xwarin nemînin. Hingê ji şêr re jî dinya wê nemîne. Eger kapîtalîzm neyê bisînorkirin û rawestandin, yan wê civakê bike 'civaka moriyan' (mîna rewşa Çîn û Japonyayê) bîne ber hilweşînê, yan jî wê bixe rewşa 'civaka şêran (mînak civaka DYE). Eger her civak bibe mîna civaka DYE, Çîn û Japonyayê, eşkere ye ku wê şensê dewamkirina civaka mirov kêm bibe. Ya esasî, li vir kapîtalîzmê pîvana exlaqê kiriye qurbanê qaşo 'ekonomiya kapîtalîst'. Wextekî zarok jî, bi sedemazêde ne keçik jî dikirin qurban. Eger hebe, bi tenêbi exlaqekî bi vî rengî, mirov dikare insên bike qurban û civakê dewam bike. Eger em li tevahiya şerên mohra kapîtalîst li ser wan, weke 'merasîmên dînî yên qurbankirina mirovan' binêrin, em ê hingê fêm bikin ku em bi 'pîvaneke ekonomiya kapîtalîst' yan jî bêexlaqiyeke çawa re rûbirû ne. Ev bêexlaqî şaneyên sosyal ên hundirê civakê bi tenê

hilnaweşîne, gefê li tevahiya jiyana zindiyan dixwe. Ma ji vê mezintir bêexlaqî û dijmintiya zindiyan dibe?

7- Kapîtalîzm dijminê jinê ye ku jin hêza sereke û afirînera ekonomiyê ye. Me di tevahiya analîza xwe de hewl da ku ispat bikin; cihê jinê di jiyana civakî de û nirxê wê yê ekonomîkli asta bilind û yekemîn e. Çawa di tevahiya dîroka şaristaniyê de jî wisa bû, di qonaxa şaristaniya kapîtalîst de rastiya, 'jina ji ekonomiyê hatî kirin' ji jiyanê hatiye qutkirin, dema herî bê rehm dibîne. Ev yek veguheriye nakokiya civakî ya herî kûr û balkêş.Piraniya jinan bê kar hatine hiştin. Tevî ku karên malê, karên herî zehmet in, pênc quriş nirxê karê malê tineye. Dîsa zarokanîn û mezinkirin karên herî zehmet in, ne tenê qîmeta xwe nînin, her wisa weke bela têne dîtin. Jin hem karkera erzan e, bêkar e, makîne ye zarokan tîne û bi hezar zehmetiyîwan mezin dike, hem jî heqdest nagire û bi ser de jî gunehkar e! Di tevahiya dîroka şaristaniyê de jin li zemînê herî jêr hatiye bicihkirin. Lê ti sîstemê li ser jinê, bi qasî civaka kapîtalîzmê nikarîbû bi awayekî sîstematîk hêza îstîsmarê pêşde bibe. Vê carê jin ne bi tenê di zemînê jêr de li tevahiya qatan objeya newekhevî, neazadî û nedemokrasiyê ye! Ya hînê xeternak ew e ku sîstema kapîtalîst bi awayekî bi ti dema dîrokê re qiyasa wê nebe, bi dijwarî û şîddeteke nedîtî desthilatdariyeke civaka cinsiyetparêz ava kiriye,vê desthilatdariyê heta bi organên mahrem ên mirov daxistiye, zêde kiriye, jin kiriye îndustriyeke seksê, êşkence li tevahiya tebeqeyên civakê belav kiriye û 'civaka serwer a mêr' di vê dema şaristaniya kapîtalîst de mezin kiriye, mîna ku ji 'ekonomostanê' ji kirdara afirîner a ekonomiyê tolê hilîne, dijmintiya xwe ya jin û ekonomiyê li her dever û mekanî ispat dike!

8- Kapîtalîzm li asta herî jor di qonaxa dawî ya globalbûna ekonomiyê de bi lîstikên pere-kaxizan ên mîna 'borsa, sened û faîzê' yên xistine piyaseyê, dijmintiya xwe û bêeleqitiya xwe ya bi ekonomiya rastî re, fena ku di çavê tevahiya civakê re rake, piştrast dike. Di ti dema dîrokê de ekonomî ev çend bi lîstikên kaxizan

veneguherîbû sîstemeke feraziyeyê. Ekonomî weke şaneya herî nazik a civakê hatiye qebûlkirin û timî pîroz hatiye pejirandin. Jixwe peyva pîroz-*qûtsî* heta dema civaka Sumeran diçe û têkiliya xwe bi gotina 'qût' re heye. Pirsgirêka qût weke pirsgirêkeke pêştirîn hatiye dîtin û her hewl dane wê çareser bikin. Di tevahiya dînan de tefsîreke xwe dispêre ewlehiya ekonomîk heye. Cejn û roşan weke demên bi bereket an jî derketina ji krîzan têne bîranîn. Weke K. Marks jî bi awayekî mafdar gotiye, ekonomî ew çend girîng e ku giş xisletên bandorê li tevahiya qadên civakê bike, îfade dike. Lê dikin ku wê ji qada mejiyê analîtîk û hisî derxînin, bi lîstikên pere-kaxizan ve girê didin, dikin qadeke ji jiyana rastî qut û dihêlin ber destê mejiyê analîtîk-spekulatîf ê bêberpirsiyarî û ev yek xisleta rastî ya ekonomiya kapîtalîzmê nîşan dide. Bêyî kedê bide, bi lîstina buhayên sened, faîz û nirxên peran, di nava saetan de li qada global bi milyaran dolar (pereyê global) dest diguherîne. Mirov nikare sîstemeke ev çend li dijî ekonomiyê tesewir bike, ango transfera peran bi vî rengî dijberiya ekonomiyê ye. Di demekê de ku nîviyê mirovatiyê li sînorê xizanî û birçîbûnê ye, ev têne kirin. Ji vê qonaxa dawî ya kapîtalîzmê re serdema fînansê jî tê gotin. Wexta mirov vî rûyê wê jî dibîne, mirov dikare bi hêsanî bibêje ku çiqas sîstemeke bêkêr e, hewce nake, li derveyî ekonomiyê ye û dijminane ye. Jixwe ev jî têra xwe tê dîtin.

9- Kapîtalîzmê dest avêtiye du qadên bingehîn ên ekonomiyê qadên hilberandin û serfkarî, bi vî awayî pêdiviyên rastî yên civakan mîna xwarin, lixwekirin, cihûwar û gerê bi polîtîkayên hîç eleqeya xwe nîne tenê ji bo kara xwe maksîmîze bike dimeşîne û weke me berê gotî bi krîzên lihevçêkirî yên hilberandin û serfkariyê rastiya van herdu qadan ji binî ve xira dike. Keda mirovatiyê li hin qadan tê dayîn ku ti têkiliya xwe bi hilberandin û serfkariyê re tineye yan jî weke hewcedarî lezgîn û pêştir nînin. Berevajî, gelek ji van ji mirovatiyê re bi tehlûke ne. Eger mirov ji van çend mînakan bide, em ê pêşî behsa sîlehên nukleerî bikin ku

gihîştine asteke gelekî bi tehlûke, razandina sermayê ya çavkaniyên enerjiyên karbonê derdixînin ku ji ber kara zêde hawîrdorê dibin felaketê, cotkariya genetîka wê hatiye guhertin, teknolojiya fezayê, razandina sermayê ji bo çûnûhatina deryayî, bejahî û hewayî tevî ku gelekî buhane, herweha rê li ber qirêjbûnê vedikin, ji ber dînîtiya modeyê sermaye tê razandin û ji heman malî bi sedan versiyonên wî bê hed û hesab têne hilberandin, di vê mijarê de tenê çend mînak in ku mirov dikare bide. Li aliyekî, li qadên bêkêr û dînîtî ne, komên mezin ên alavan ji ber tinebûna pereyan nayên kirîn û di cihê xwe de dirizin, li aliyê din, komên mirovan ên nikarin bikirin ji birçîbûn û nexweşiyê dişkên. Artêşên bêkartiyê! Şêweyê ekonomîk ê jêre dibêjin kapîtalîzm, xirabî û dijminatiya ti şer û felaketa xwezayî di dîrokê nekirî, bi civakên mirovan kir. Hem jî dema ev kir pê li rehên ekonomiyê yên can didin wê kir, ew tengav kirin, qetandin û rehên li hevçêkirî pêve kirin.

Me der barê kapîtalîzmê de ku qonaxeke şaristaniyê ye, neh sernav jimartin. Bêguman ji bo van sernavan bi cildan analîzên piştrastkirinê hewce dikin. Ji ber ku ya ez hewl didim bikim, di asta parêznameyê de diyarkirina tezê ye, min vegotineke bi vî awayî kin tercîh kir. Bi beşa dawî re û li bin du sernavên ji niha û pêde ez ê hewl bidim mijarê ji hin aliyên din ve rave bikim û ji hev derxînim.

### C- Kapîtalîzm Di Nava Rastiya Civakî û Şaristaniyê de Li Ku û Çi Demê Cih Digire?

Hingê ev sîstema hem ekonomî nîne û hem jî dijberiya wê ya ekonomiyê eşkere ye, em çawa dikarin bi awayekî serketî û hosteyî maneyê bidinê û şîrove bikin, di nava rastiya civakî û şaristaniyê de li ku û çi demê bi cih bikin?

Ji bo mirov der barê kapîtalîzmê de bigihîje encameke manedar divê mirov di tevahiya dîroka şaristaniyê de binêre hêz û

sîstemên şaristaniyê çalakî û şerên di nav û navbera xwe de; li aliyê din li şer û pevçunên bi hêzên dijberê şaristaniyê re tehlîl bike, mirov dikare bigihîje encameke manedar.

Haya min ji min heye ku ez gelek caran mijarê destnîşan dikim û gelek caran dubare dikim. Li min negirin, ez ê lêborîna xwe bixwazim û careke din tûra me ya balkêş û zêhn vedike bi xetên stûr û bi awayekî yekpare neçar pêşkêş bikim.

### 1- Serdema Komin a Destpêkê (Ji mirovê destpêkê heta dawiya serdema qeşayî ya çaremîn, heta 20.000 sal berê):

Di pergala dayikê ya komin a destpêkê de hîmê çanda ekonomiyê tê danîn. Qût û zadê bi pincar berhevkirinê û nêçîrê têne bidestxistin yekser têne bikaranîn û ji çerm û rehikên wan sûd tê wergirtin. Bi giranî jin-dayik otorîteya plansaziyê ya klanê ye. Bi awayekî mirov dikare jêre bibêje hegemona dayîk a pêşî ye. Nakokî û têkiliya dayika civaka klanê di nava şert û mercên xwezayê de ji kesên bibin sedema rîskê xwe diparêze, ji kesên derfetê kêrhatin û xwedîkirinê didin sûd werdigire. Di van şert û mercan de nasnameya klanê ji bo kesan man û nemane û dest jê nayê berdan. Têgîna zilam-pîrektiyê çênebûye. Diya ku dizê tê naskirin, lê partner, ango mêrê pêre têkel dibe, bi qasî neyê naskirin pirnisî û bintûte ye. Civaka mirov heta niha ji sedî 98.5 jiyana xwe bi vî awayî dewam kiriye. Şêweyê herî demdirêj ê civakê ye. Ji ber ku di vê dem û dewranê de kevir têne verotin û niqirandin û weke amûran têne bikaranîn, ji vê dewranê re dema verotina kevir (the Paleolithic Age) jî tê gotin. Ji aliyê sosyolojîk ve jêre ‘pergala komin a detstpêkê’ tê gotin. Zimanê îşaretan tê bikaranîn. Li keviyên gol û çeman, li şikeft û holikên li ser qazoxan hatine çêkirin dihewin. Tê texmînkirin ku bi qasî du milyon salan bi tenê li Efrîkayê, ji milyonek salê û vir ve jî li parzemîna Asya û Ewrûpayê bi vî awayî jiyane. Têgînên welat, sînor û milk hînê çênebûne. Aîdiyet li gorî klanê ye. Ji ber ku klan jî sembol e, bi

objeyek an jî totemekê tê temsîlkirin. Herçiqas di nava xwe de hin qonaxan bibihure û asta wan a pêşketinê kêm zêde hebe jî mirovatî bi vî şêweyê pergalê dawiya dema qeşayê ya çaremîngav diavêje dema neolîtîk.

**2- Serdema Neolîtîk (B.Z. 15000-4000):**

Piştî bidawîbûna dema qeşayê ya çaremîn, li gorî texmînan bi qasî 17 hezar sal berê piştî dema mezolîtîk hatiye jiyankirin (dema kevir a navîn) cara pêşî li ser milê sereke li qûntara sîstema çiyayê Toros-Zagrosê kevirênbaş hatine verotin û obsidyen hatiye bikaranîn, ji vê demê re neolîtîk (dema kevir a nû) tê gotin, lê ya rastî ev qonax şoreşa cotkarî û gund îfade dike û qonaxeke gelekî dîrokî ye ku gav tê avêtinê. Li gorî belgeyên arkeolojîk ev civak 10 hezar sal berê hebûna wê tê ispatkirin û li qûntara çiyayê Toros-Zagrosê ji nebat û heywanên kêrhatî sûdê werdigire û dikare gaveke mezin biavêje. Derfet û îmkanên xwe xwedîkirinê zêde dibin. Tevn têne danîn. Ji şikeftan derbasî jiyana gundan dibin. Nebat û heywan di çarçoveya çanda gundan de têne kedîkirin. Li derdora 6000 sal B.Z. gîzik û dîzik têne çêkirin. Nexasim ji keviyên çiyayên Rojhilatê Derya Spî heta Zagrosan li vê herêma mîna kevanekê, gav tê avêtinî dema çandeke gelekî bi têkiliyên xurt û di nav hev de ye. Ji vê çandê re çanda Til Xelef jî tê gotin.

Qada sereke Mezopotamya Jor e. Civak gelek amûrên hilberandinê û vedîtinên nû peyda dike. Bi awayekî mirov dikare bibêje dema neolîtîkê di dema xwe ya îndustriyê de ye. Di nava vê çandê de jin-dayik derdikeve mertebeya dayik-xwedawendê. Bi îhtîmaleke mezin rola wê ya di avakirina civaka nû de diyarker e. Nîzama dayikê pir baş mohra xwe li civaka klan dide. Nakokiya wê bi zilam re hino hino destpê dike. Zimanê sembolan tê bikaranîn. Komên çermreş ên navê Semîtîk girtine ji başûr di ser xeta sereke re êdî weke berê bi hêsanî nikarin koçî Asya û Ewrûpayê bikin. Heye ku di pêkhatina çanda Semîtîk de vê sedemê bandoreke

girîng kiribe. Komên em dikarin ji wan re çermsor û çermzer bibêjin ji bakur nikarin bi hêsanî derbasî herêmê bibin. Milek van koman texmînî di salên 12000-7000 B.Z. di tengava Beringeyê re derbasî parzemîna Emerîkayê bûye, yên din jî zêdetir li Çîn, Asya Navîn û Rojhilatê Ewrûpayê kom dibin. Koma Hind-Ewrûpî ya çermspî ku li qada navîn e, ji ber şert û mercên bahewa û xwedîkirinê bi rola hegemonîk a sereke radibe. Nexasim koma li Kevana Bi Bereket komeke hegemon e. Demeke dirêj heta qonaxa şaristaniyê wê vî sifetê xwe biparêze.

Çanda Kevana Bi Bereket a di dîrokê de cara pêşî mayînde bû, li derdora 6000 salî B.Z. derbasî Mezopotamya Jêr, di salên 5000'î de newala Misr-Nîlê, Balkanan, Îran û stepên Bakurê Derya Reş, di salên 4000'î de bar dike tevahiya Ewrûpa û Çînê. Herçend behsa neolîtîkeke Çînê ya bi hêzên hundir pêş dikeve tê kirin jî li gorî texmîna min neolîtîka Çînê bi giranî xwe dispêre çanda ji derve hatiye. Xwedîkirina dewar û bikaranîna obsidyenê[3] vê tezê bi hêz dikin. Bi xwezayî wexta behsa demên dirêj were kirin, her herêmeke sereke şensê xwe heye ku neolîtîka xwe pêşde bibe. Lê bi tevahî nîşane, îşaret bi Kevana Bi Bereket dikin ku navenda sereke ya derketina çandî ye. Di vê belavbûnê de mêtingerî û dagirkerî mewzûbehs nîne. Berfirehbûna qadên vala cih nade têkiliyên bi vî rengî. Agahiyeke sosyolojîk û fikrekî dîrokî bi giştî tê qebûlkirin e ku tevgera pêşî ya global a mezin a li dinyayê şopên mayînde hiştin û bandora wê hê jî dewam dike, li ser vî hîmî pêşketiye.

[3] Obsidyen: (obsidian) Cureyekî camê ye ku bi rêyên xwezayî ji lavên volkanan çêdibe. Ji serdema kevir ve mirovatiyê jê sûd wergirtiye. Mirovatiyê di demên kevin de ji vî kevirî gelek amûr çêkirine; serê riman û neynik hin ji wan in.

### 3- Serdema Şaristaniya Sumer (B.Z. 4000-2000):

Di salên 5500'î B.Z. de li Mezopotamya Jêr çanda jêre El Ubeyd tê gotin heye. Ev çanda behsa wê tê kirin, tê texmînkirin ku heta salên 3800'î B.Z. dewam dike. Tevî ku çanda li vir xwe dispêre çanda li Kevana Bi Bereket, nexasim jî ya Til Xelef, çi rê ji derbasbûna civaka bavikî re vekirin û çi jî di teknîka çêkirina dîzik û gîzikan de jî pêşketina wan, bi qîmetbûna bazirganiyê, çi jî ji aliyê seferên pêşî yên dagirkeriyê û destpêkirina serdema koloniyan, dihêle ev dem û çanda wê ji aliyê dîrokî ve girîng bibe. Mirov dikare jêre çanda proto-Ûrûk jî bibêje. Nemaze bi sedema ku tê maneya pêş şaristaniyê û derketina civaka bavikî girîng e. Çanda dayik-xwedawendê êdî dest bi wendakirina qîmetê dike. Jin neçar tê hiştin ku serdestiya vebirî ya mêr qebûl bike. Rêveberiya hiyerarşîk gelekî pêş dikeve. Avahiya sêalî ya rêveberiya şaristaniya ji rêûresmê weke pêşnûme di vê çandê de cara pêşî bi awayekî bi tesîr xwe îlan dike. Di vê demê de rahibê ku bi awayekî Şaman e, rêveberê civakê yê xwedî ezmûn Şêx û xwediyê hêza fizîkî, şefê eskerî reprepa dengê lingên wan ên êdî bi hêz tê. Li çanda Rojhilata Navîn a dîn, polîtîka û eskerî şopên xurt ên vê demê hene.

Ev çandek e ku xwe ispat kiriye. Di salên 4500'î B.Z. de bandora xwe li Mezopotamya Jor nîşan dide. Çanda Til Xelef dike bin kontrola xwe. Bi şêweyekî dike kolonî. Belgeyên arkeolojîk piştrast dikin ku koloniyên pêşî di salên 4000'î B.Z. de heta bi Meletî û Elezîza îro belav dibin. Xanedantî, çanda em jêre malbata berfireh dibêjin jî belav dike. Di çanda berê de ev hêman tinene. Mirov şopên wê yên texrîbker dibîne. Kavilê hin gundên hatine şewitandin, li dagirkerî û hilweşandineke bi zanebûn şahidiyê dikin. Çanda bazirganiyê êdî misoger dibe. Di dîrokê de belkî jî hegemonyadariya ciddî ya pêşî bi vê çandê re pêk tê.

Weke rêûresmekê, ji dema 4000-3000 B.Z. re dema çanda Ûrûkê tê gotin. Çanda Ûrûkê li ser şopên çanda El Ubeydê pêş

dikeve. Bi awayekî ji wê cihê, dewleta pêşî ya bajêr û çînî, ango şaristaniyê û dîroka nivîskî dide destpêkirin.Xwedî vê îmtiyazê ye. Bêguman veguherandina çanda bavik a çanda şaristaniya pêşî, ji aliyê dîrokî ve gelekî girîng e. Bahewaya Mezopotamyaya Jêr avdaniya bi destan ferz dike di vê de xwedî roleke bingehîn e.Ji bo avdaniyeke bi vî rengî hewcedarî bi hejmareke zêde ya mirovan heye. Her weha amûrên avdaniyê jî şertên pêş ên bajarbûnê ne. Bi carekê xebitandina hejmareke mezin a mirovan di heman demê de çareserkirina pirsgirêka debarê hewce dike, amûrên avdaniyê jî pîşesaziyê hewce dike. Di rewşeke bi vî rengî de jî hewcedarî bi cihûwarekî bi qasî bajêr mezin dibe. Ev yek jî rêveberiya bajêr û çareserkirina pirsgirêkên rewabûna rêveberiyê ferz dike. Ji aliyê din ve, êrîşên qebîleyên talanker ji mêj ve destpêkirine û xweparastina ji wan hewce dike. Wexta ev hemû dibin yek, sêbendiyeke temam a rahib + qralê rêveber + fermandarê eskerî derdikeve holê. Destana Gilgamêş a ji boqralê pêşî yê Ûrûkê hatiye nivîsandin, vê bûyera dîrokî bi tesîr û bi awayekî balkêş nîşan dide.

Bajar bi serê xwe binesaziyek e ku zorê dide mentiqê pêşketinê. Ji ber ku rê li ber gelek pirsgirêkan vedike. Pirsgirêk mentiq dixebitînin, ango difikirînin, fikir jî amûrên nû yên hilberandinê pêşde dibe. Piştre jî rêveberiya ekonomiyê pêşde diçe, ew jî bi xwe re rêveberiya eskerî û polîtîk dimeşîne. Pêşketina çînayetiyê jî mirov dikare zêdetir weke berhemekî bajêr bihesibîne. Civaka bajar civakeke ji komên qebîle û xanedanan bihuriye. Her weha rêveberiyên bavik û hiyerarşîk li gorî xwezaya xwe ya nakok, mirov dikare texmîn bike ku hejmareke zêde şêniyan di bunya xwe de ranagire. Li bajaran mirov bi nanozikê be jî dikare debara xwe bike, ji lewra ji bo şêniyên qut dibin cihekî balkêş e. Ji ber sedemên cûrbicûr kesên ji eşîr û xanedanan qutbûyî wê di bin rêveberiya bajêr de beşê xebatkar û rêveberan pêk bînin, êdî dema çêbûna çîn û tebeqeyê hatiye. Têkiliyeke civakî ango

çînayetî, di çanda Ûrûkê de, hêmanekî girîng e. Weke encama tevahiya van têkiliyên li bajêr dewlet ava dibe.

Rêveberiya bajêr, ne derfetê dide rêveberiya qebîleyê, ne jî dide ya xanedaniyê. Rêveberiya bajêr ji têkiliyên xizmtiyê wêdetir rêveberiyeke profesyonel e. Dîsa ji bo rewakirinê jî hewcedariyê bi baweriyê dibîne. Ji bo vê jî ya di hewarê de tê, yê cara pêşî pêşnûmeya dewletê bi gewde kir rahib e û bi awayekî makêta pêşî ya bajêr perestgeh e. Weke sazî, karê bi awayê zêhnî avakirina bajar, dewlet û çînayetî yê karekî hilberandina mîtolojîk û dînî ye. Bandora çanda maddî li ser çanda manewî di çanda Ûrûkê de balkêş e. Berevajiyê wê jî bi tesîr e. Û heta mirov dikare bibêje; çanda maddî ya pir zêde di bin tesîra çanda manewî de bi qasî bê îmkan be, zehmet e, were fêmkirin. Çanda maddî bi rêya avakirineke mezin a îdeolojîk, kiriye ku neyê dîtin. Bi hezaran sala vê avakirinê dewam kiriye û ji aliyê naverok û ziman ve di zêhnan de wer bi cih kiriye ku şertên maddî nayên dîtin. Ev karekî sereke yê îdeolojiya dewleta nû ye. Di civaka Sumer de ev fonksiyon xwe bi awayekî balkêş eşkere dike. Dewlet weke saziyeke xwedayî tê binavkirin, çîna xebatkar jî weke evdên wî yên hatine afirandin têne nîşandan. Navbeynkarê di nava dewlet û yên tên rêveberin de diçe û tê jî bi têgîna 'melek' bi gewde dibe. Otorîteya herî mezin a rêveberiyê weke xwedayê sereke tê nîşandan, alîkarên wî jî weke xweda di dereceya duyemîn de panteon ango rêveberiya dewletê ya asta jor û nîzama civînê temsîl dikin. Nifşê xwedawendan ê berê, xwe weke nifşê berî bajêr û pêjna jinê, hînê bi bîr dixin. Bi tevahî têkiliyên civakî bi zimanekî nîv-mîtolojîk û nîv-dînî têne wergerandin, di nava dinyayeke cihê ya metafizîk de, di nava şênî û koman de cihê xwe yê rewa digirin. Bajar-dewlet-çîn weke îdeolojî ji nû ve têne afirandin.

Ji nû ve afirandin bi îdeolojiyê, weke çandeke manewî ya gelekî kêrhatî wê bibe şîroveya her cure pêşketina maddî û heta ya xwezayê. Di çarçoveya vê de, nexasim weke zimanê esasî yê vê

îfade bike, wê maneyên nû bêne çêkirin, mirovan bi van bidin bawerkirin û wê jiyanê di nava vê cîhana rewa de pîroz bikin û bijîn. Bi îdeolojîkî li hemberî jinûve bûyînê, pirsa gelo jinûvebûyîna maddî heye yan tineye jî li ber van bûyeran hema hema wê maneya xwe wenda bike, manedar were dîtin jî wê bi awayekî din bê formulekirin. Şoreşa Ûrûkê bi qasî şoreşa cotkariyê, şoreşeke bajêr a pêşî û girîng e. Jêder û çavkaniya şaxê çemê mezin e. Çavkaniyên din ên paşê tevlî dibin rûbarok û golên piçûk in, ew jî bi saya çemê mezin û sereke dikarin biherikin, bilivin. Rast e, li Çînê jî şoreşeke bajêr heye. Li Emerîkaya Navîn jî heye. Lê ev, weke çemekî mezin û sereke neherikîne, li cihê jê derketine miçiqîne, yan jî çandeke mehellî ne ku mîna goleke sekan destûr didin kêm kesan ji wan sûdê bigirin. Ji bo bibe şaristanî, bibe çemê mezin û sereke, yan jî tevlîbûna wî divê weke şertê pêş were fêmkirin. Şaristaniyên saf û xwerû tinene.

Jixwe li pişt çanda Ûrûkê mîraseke deh hezar salî ya neolîtîkê heye. Ango bi zembîlê ji ezmên nehatiye xwarê. Ji vê çanda nû re şaristanî ango medeniyet jî tê gotin. Mirov dikare weke bajarîtiyê jî tercume bike û ev jî rast e. Wexta em pêkhatina wê ya maddî û manewîû xuyabûna wê li deverên din bi vî awayî bi nav bikin, ya rastî em bi awayekî,bi tevahî şaristaniyê bi nav dikin.

Çanda Ûrûkê li gorî rengê xwe yê pêkhatinê belav dibe. Li bajaran berhem zêde dibin û ev yek jî bajar zêde dike. Ji ber ku şêniyên bajaran gelekî zêde dibin, li pey hev bajarên cîran ava dibin. Çanda gund a li Kevana Bi Bereket jî bi vî awayî zêde dibe û xelek bi xelek zincîrwarî rê li ber avabûna gundan vedike. Gundên weke nifşên pêşî li Newala Çorê li Ûrfa-Swêregê li keviyên Firatê, li Çayonu li Amed-Erxaniyê li keviya ser milekî Dîcleyê, ji wir jî Çemê Hallanê li nêzî Çemê Batmanê ye, bi vî awayî rêzek gund heta jêr Kerkûkê ji salên 10 hezarî B.Z. ve têne avakirin. Bûyera em jêre dibêjin kulîlk vekirina çandan, ev e. Çanda Ûrûkê jî di rêyeke bi heman rengî de meşiyaye. Bajarên zêdebûne rê li ber reqabeta

zêde dibe vekirine. Ji ber ku bajar di heman demê de bazar e, çanda nû jî hêmana reqabetê bi xwe re hildigire. Bazirganî ji niha ve bûye pîşeyekî qîmet pê tê dayîn. Ji bo cotkarî û çûnûhatinê pîşeyekî îndustriyê peyde bûye jî. Pevçûna di nava bajaran de bi awayekî xwezayî pirsgirêka hegemonyayê dixe rojevê. Ji bajarê dewlet gavavêtina ber bi împaratoriya destpêkê ve, wê xwe ferz bike. Di vê rewşê de bajarên heyî wê ji aliyê heman kes an jî xanedanî ve were rêvebirin.

Hewcedariya Ûrûkê ya bi bazirganiyê wê qada neolîtîkê pir zû bixe pêvajoya şaristanîbûn û kolonîbûnê. Gelek dane û agahiyên di dest de hene, li pey tebeqeyên koloniyê yên xwe dispêrin çanda El Ubeyd, xebatên kolonîkirin û qadên belavbûnê yên hînê berfirehtir ên Ûrûkê piştrast dikin. Nexasim li keviyên Firatê koloniyên gelekî pêşketî yên Ûrûkê hatine dîtin. Belgeyên arkeolojîk piştrast dikin ku li hemberî tevgera koloniyan a Ûrûkê ya ji salên 3500'î B.Z. ve pêşket, çanda Mezopotamya Jor a ji çanda Til Xelef ve mezinbûna xwe ranewestandibû hem li ber radibû, hem jî pêre xwediyê meyleke danûstendinê bû. Gelek girikên hatine kolan nîşan didin ku herêm bi hêzên xwe yên hundirîn ên gelekî bi hêz ji salên 3000'î B.Z. ve dest bi bajarbûnê kiriye. Dane û agahiyên her roja diçe zêdetir dibin, mirov difikirînin ku çanda bajêr çawa barkiriye Misr, Elam û Harrapayê û her weha ji herêma çavkanî jî barkiriye Mezopotamya Jêr. Nemaze di demeke nêz de erdkolana li wargeha Gobeklîtepe ya li nêzî Ûrfayê agahî û daneyên dide, dikare fikrên heyî yên dîrokî biguherîne. Wargeha behsa wê tê kirin, ispat bûye ku 10.000 sal B.Z. destpêkiriye. Berî gundbûnê, li gorî dema xwe xwedî çandeke gelekî mezin e. Heye ku ev çand a perestgehan be. Kevirên tîk ên heyî maneya wan bi tevahî nehatibe analîzkirin jî vebirî çandeke pêşkêtî îfade dikin. Lêkolînên nû yên bêne kirin, heye ku îşaret bi navendên çandî yên nû bikin.

Min cih da vê paragrafê ji bo ku ez bibêjim; li dijî belavbûna Ûrûkê bi tenê çandeke bi hêz dikare bersivê bide. Çanda li herêmê

li hemberî çanda berê dest pê kiriye (texmînî salên 5000'î B.Z. çanda El Ubeyd) hem li ber xwe dide û hem jî di çanda xwe de israr dike. Û heta di tevahiya dema mezolîtîk û neolîtîk de li hemberî koçên ji başûr û bakur pêl bi pêl dihatin timî li ber xwe didan û ev yek jî ji mayîndebûna avahiya çanda herêmê ya heyî tê fêmkirin.

Ev rastî, ango asîmîlebûna çanda Ûrûkê di nav çanda xwecihî de û ev jî hêza çanda dijber nîşan dide. Ya rastî ev pêvajoyeke ku heta îro dewam dike. Serdestiya Ûrûkê ji hêza wê ya hilberîn û şêniyan e. Dewleta Ûrûkê jî pişta xwe dida vê hêzê. Em wê mîna prototîpiya pêşî ya Hollanda û Ingilîstanê bibînin.

Li gorî şîroveya min a şexsî, li hemberî belavbûna pêşî ya çandên Misr, Elam (başûr-rojavayê Îran a îro) û Mezopotamya Jor bi awayekî serketî bersiv dane belavbûna destpêkê ya El Ubeyd û Ûrûkêû çanda xwe ya bajêr afirandine. Jixwe her roja diçe gelek belge û daneyên arkeolojîk zêde dibin û piştrast dikin ku ji salên 3000'î B.Z. ve li van sê navendên dîrokî pêşketina bajaran bi lez dibe û şaxên xwe berdidin ser çemê mezin ê şaristaniyê.

Li gund û bajarên nêzî Ûrûkê çi diqewime, ev hînê girîngtir e. Em ji dîrokê dizanin ku serdema çanda Ûrûkê di salên 3000'î B.Z. de bi dawî dibe û bi Xanedaniya Ûrê ya Yekemîn demeke nû dest pê dike. Heye ku ev bûyer encama şerên zêde yên bajaran be. Jixwe ji xwendina kevalan, bûyerên bi vî rengî zelal têne fêmkirin. Awaza 'Şîna Nîppûrê' û 'Laneta Agadeyê' der barê encama bajarên hatine xirakirin û şewitandin de ne. Çawa dişibe bûyerên îro li Bexdayê û derdora wê diqewimin! Demên I. û II. yên Ûrê digihîje heta salên 2350'î B.Z. Ji salên 2350-2150 B.Z. bi rêveberiya Sargonê navdar demeke xanedaniyê dest pê dike. Sargonê ku mirov dikare weke împaratorê pêşî jî bi nav bike, bi fort û pesnan behsa şerê xwe yê xwînrij ê li tevahiya Kevana Bi Bereket dike ango behsa hukmê împaratoriya xwe dike. Hovîtiyên mezin, weke çalakiyên şan û şerefê vedibêje. Em dikarin van bûyeran ji çavkaniyên nivîskî bişopînin. Bi belgeyan piştrast dibe ku Agade kiriye paytext û bi

koka xwe Amorît e, jixwe Sumeran navê Amorît ango "zilamêngemarî, tozgirtî" li qebîleyên ji çola Erebistanê wê demê êrîş dikirin, kiribû. Vê carê jî di salên 2150'î B.Z. de yên bi koka xwe ji Zagrosan bi pêşengiya Gudea (Xweda) Agadeyê bi erdê re dikin yek û xanedaniyeke nû ava dikin. Li derdora salên 2050 B.Z. ev xanedanî jî hildiweşe. Li şûna wê Xanedaniya Ûr a Sêyemîn jî bi tenê dikare sedsalekî li ser piyan bimîne.

Dîrok nîşan dide ku di salên 1950yî B.Z. de serdema bi heybet a Babîlan dest pê dike. Di pevçûna bajaran de dualîteyeke balkêş derdikeve pêşberî me. Civaka sereke û dayik a şaristanî afirandiye, Sumer e. Ez wexta dayik dibêjim ez bi maneya çavkanî bi kar tînim. Dibe ku koka wan pir ji zû ve ji çanda Kevana Bi Bereket hatibe û êdî li van deran weke gelekî cîwar bûbin ango civakeke welê tînin hişê mirov. Zimanê wan ji zimanê du cîranên wan ên nêz Amorît û Gûtiyan cihê ye. Lê gelek gotinên ketine zikhev hene. Nexasim zêdetir nêzî koma zimanê Aryen e. Pir eşkere ji koka Semîtîk cihê ye. Êrîşên qebîleyên Semîtîk-Amorît zêde ne. Jixwe bajarê Agade, xanedanê wê û Sargon bi koka xwe Semîtîk-Amorît in. Û heta îhtîmaleke mezin e ku Sargon fermandarekî li qesrên bajarên Sumeran mezin bûyî be û di rêveberiyê de cih girtibe. Destan îşaret bi vê yekê dikin. Gûtî zêdetir weke hevgirtiyan nêzî Sumeran dibin. Kokên wan li Zagrosê ne û Aryen in. Nuqteya gelekî balkêş ew e ku li Iraqa îro jî tabloyeke bi heman rengî xuya dike.

Weke encam heta serê salên 2000'î B.Z. çêbûn û pêşketina sîstema şaristaniyê bi pir bi xwîn, mêtinkarî, bi avakirina bajaran û xirakirina wan, bi hevgirtin, kolonî û bi karektera hegemonîk dibe. Li nava erdên avî, bi nanozikê kole dihatin xebitandin, tevî vê cotkariyê bazirganiya bi bajarên cîran û herêmên neolîtîkê re dihat kirin û pîşekariya pêş diket berhemê zêde yê mezin hildiberîne. Ev hilberandin, ango sîstema şaristaniyê ya li ser çanda maddî tê ava-kirin, çandeke manewî ya bi heybet ava dike û koma rêveberên xwe dike xweda, koleyên xwe yên dixebitin jî

weke ji pisiyê xwedayan hatine çêkirin bi nav dike û wan piçûk dixe. Divê baş were fêmkirin ku di efsaneyên çêbûnê de jiyana maddî bi vî awayî tê nîşandan û ev yek zelal e. Dayik-xwedawend a afirîner jî ji parsûyên rastê yên mêr tê afirandin. Efsane têra xwe seyr in û bi awayekî balkêş nîşan didin ku jin-dayik jî vebirî pêve tê girêdan. Jiyan jî êdî wê bi zimanê van efsaneyan were fêmkirin û şîrovekirin.

Jiyana maddî ya rastî jî heta roja me ya îro nikarîbû ziman û şîroveya xwe biafirîne, bi tenê hin caran bi 'zimanekî Ezop'[4] dixwaze behsa hin rastiyên berê bike, lê belê ji ber ku kesek nikare wî zimanî jî fêm bike, di nava bê zimanî û bê manebûnê de ye. Em ji bîr nekin ku hînê zimanê rastiyê û qabîliyeta vegotinê nehatiye afirandin!

**4- Serdema Şaristaniya Asûr û Babîl (B.Z. 2000-300):**

Serdema van herdu şaristaniyên karîbûn xwe cihê û xweser bikin, herçiqas di nava wan de ji aliyê zeman û mekan ve cihêtî hebe jî di warê derketina wan a ser dika dîrokê û weke desthilatdarî veqetîna wan a ji xanedanên Sumeran de hemzeman in û ji aliyê çandê ve eşkere hê dişibin hev. Ji aliyê kokêve çavkaniya wan Amorît-Semîtîk e û îhtimaleke mezin e ku bi Xanedaniya Akad re şaristaniyeke muşterek parve kiribin. Ziman û çanda wan a dişibe hev û her weha gelek çavkaniyên nivîskî di wê astê de ne ku vê yekê piştrast bikin.

Serdema dawî û herî bi heybet a Sumeran li bajarê çandê Nîppûrê bû. Mirov dikare wî weke bajarê pêşî lê perwerdeya

[4] Ezop: Aisopos çîrokbêjekî Yewnan e. Tê gotin, BZ di sedsala VI. de çêbûye. Çîrokên wî fabl in. Ango wexta merama xwe dibêje yekser nabêje. Gotinê gelekî virde wirde di devê xwe de dibe û tîne. Hin kes dibêjin çîrokbêjê Yewnan kole bûye lewma jî timî merama xwe bi awayekî her kes fêhm neke aniye ziman.

akademîk hatiye dayîn, destanîşan bike. Bi îhtîmaleke mezin, piştî ku bajar ji aliyê xanedanên Akad ve hatiye xirakirin, li nêzî wî, bajarê Babîlê bi giraniya ziman û çanda Akadê rabûye û mirov dikare vê yekê weke destpêka serdema şaristaniyeke nû bi nav bike. Jixwe piştî dema xanedanê dawî yê Sumeran Ûrê III. ji serê salên 2000'î B.Z. ve bi pêşengiya xanedanên nû yên Babîlan serweriya bajaran li pey hev tê stendin û ev yek jî rewşa nû diyar dike. Zimanê Akadî weke zimanê nû yê şaristaniyê girîng dibe. Weke zimanê bazirganî û serweriya siyasî li tevahiya herêmên şaristaniyê xwe nîşan dide. Paşê bi navê Aramî weke zimanê hevpar ê tevahiya gelên şareza tê bikaranîn. Ango bi roleke mîna Ingilîziya îro radibe. Çanda Akadî ji aliyê şaristaniyê ve naveroka xwe ji mîrasa çanda Sumeran digire. Veguherîna wê ya mîtolojîk di weke xweda bilindbûna xweda Mardûk de xwe nîşan dide. Ennûma Elîş destana herî girîng e ku ji wê demê maye. Mardûk serxwedayê çandekê ye ku gelekî bi xirabî behsa dayik-xwedawendê dike, çanda mêrê serwer sembolîze dike û wê çandê dike xweda. Di çanda Yewnan de Zeûs, di çanda Romayê de Jupîter, di çanda Hind-Ewrûpayê ya çavkaniya xwe Aryen de Gudea (Gotên Germenî û Xweda Got ji heman kokê tên, dîsa di kurdî de Xwedê jî ji heman kokê tê), di çanda ereb de Ellah, li cem Hindiyan Brahman û li cem Çîniyan Tao ji nifşên heman xwedayan in.

Qonaxa şaristaniyên hevpar û çandên dişibin hev, di vê demê de weke sembolên bingehîn herî zêde xwe bi xwedayên nûneriya civakê dikin, nîşan didin. Xweber nîne ku weke nav jî hemû texmînî di salên 2000'î B.Z. de derketine holê. Ev yek ji çanda hevpar û kûr a di bingehê wan de ye. Bi şêweyê kirin sembol (jin-dayîk û ekonomiya wê ya malê êdî ji aliyê mêrê zordar û xasûk ve hatiye desteserkirin), çanda mêrê serwer îlahî dikin. Dayika xwedawend a sereke ya bi Aryenî navê wê Star, bi Sumerî Înanna, bi Hîtîtî Kîbele, bi Semîtîkî Îştar, bi Hindî Kalî ye, her diçe vedimirin û xwedayên mêr ên navbuhurî mezin dibin. Di salên 2000'î B.Z. de

kengî jin di warê civakî de kişandin jêrzemînê têkçûn û piçûkxistina wê jî di warê çand û ziman de xwe da der. Di çanda maddî û manewî ya şaristaniyê de ji koletiya mêr û qebîleyan pêştir, weke cins koletiya jinê tê. Ya rastî, weke koletiya li jêrzemînê civakê, koletiyeke hûrûkûr li ser jinê hatiye ferzkirin û mehkûmî statuyeke têkçûyî, piçûkxistî, bêhnlêçikandî, lanetlêkirî û mirdarî hatiye kirin. Pîrektî û weke mêr-zilamê li ser wê xwedî erkên bê sînor, li ser vî zemînê çandî mezin û bilind dibe. Statuya jinê ya li cem Ereban û civakên li Rojhilata Navîn zemînê heman çandê parve dikin,ev yek hînê dewam dike û vê vegotina me jî piştrast dike. Bi navê namûsê kuştina jinê ji hêmanên piçûk ên vê çandê ne.

Serdema Babîlan ji serdema Asûran pêşdetir e. Di vê de weke mekanê cografîk gav bi gav xwe vekişandina ber bi Bakurê Mezopotamyayê ve roleke girîng pêk tîne. Babîl gelekî li başûrê Bexdaya îro diket, bajarê ku navê heman xwedayî girtiye Asûr jî li nêzî bajarê Mûsila îro bû. Paşê weke Nînovayê qonax bihurandine.

Bajarê Babîlê bi hin xisletên xwe di dîrokê de balê dikişîne. Berê pêşî bi tevahî çanda Nîppûrê ya bajarê dawî û çandî yê Sumeran dawerivandiye hinavên xwe. Diyar e ku di qonaxa împaratoriyê de bi tevahî danehevên çandî yên civakên hemdem û pêşengên wan birine Babîlê. Birca Babîlê ya Navdar ku 'axaftina heftêûdu zimanan' lê heye efsane nîne, xuyaye ku rastiyek e. Yan jî bi gotineke hînê rasttir, rastî kirin efsane. Dema 1900-1600 B.Z. serdema şaristaniya Babîl a herî bi heybet e. Li tevahiya herêmên şareza hukmê hêza xwe ya împaratoriyê pêk tîne. Împaratorê wê yê herî navdar Hemmûrabî, piştî Sargon di dîrokê de împaratorê duyemîn ê tê zanîn e. 'Qanûnên Hemmûrabî' yên li ser navê xwe îlan kirin, herçiqas dewama rêûresma qanûnîkirinên berî xwe be jî di warê tesîr û şophiştina li dîrokê de xwediyê girîngiyeke li herî pêş e. Di çanda şaristaniyê de hem li ser 'qanûnên Xwedayî', hem jî li ser 'qanûn huqûqê' şopên dema Hemmûrabî vebirî hene. Bajarên

demê bi tevahî piştî şerên xwînrij, kirin bin serweriya xwe. Her weha mirov fêm dike ku li ser çandên qebîleyan ên di nav sînorên wan de û li ser cîranan serweriyeke bê eman ferz kiriye. Di dîroka herêmê de qral-xwedayên Misrê weke 'firewn' hatine binavkirin, qral-xwedayên Asûr û Babîlan jî bi giranî weke 'nemrût' hatine binavkirin.

Di Ahdî-Atîk de (Kitêba Pîroz a Cihûyan a kevntirîn) rev an jî derketina Hz. Brahîm ji bajarê Ûrê (Ûrfa ya îro) wer tê fêmkirin ku ji nêz ve têkiliya xwe bi zordestiya Nemrûtên Babîlê re heye. Dîrok dinivsîne ku li derdora salên 1700-1650'yî B.Z. Hemmûrabî hukim kiriye. Em wexta hîcreta Hz. Brahîm jî di heman demê de difikirin, em nakokiya Brahîm-Nemrût gelekî baş fêm dikin. Brahîm serekê qebîleyekê ye. Qebîleya wî yek ji gelek qebîleyên li derdora Ûrfayê ye ku bi cotkarî, xwedîkirina heywên û bazirganiyê re mijûl dibe. Civakên têper ên di bin bandora du çandên kokên wan aryenî û semîtîk de, weke îro li herêmê gelek hebûn.

Qîmeta sembolîk a çîroka Brahîm û qebîleya wî ya nîv-mîtolojîk û nîv-dînî tê zanîn. Ji ber ku Hz. Brahîm kalê sê dînên yekxwedayî tê hesibandin û li dinyayê hema bêje dînê bandor lê nekiribe nehiştiye, ev yek jî girîngiya wî û dînê wî destnîşan dike. Nemrûtên Babîlan bi Hemmûrabî serdema xwe ya herî otorîter nîşan dan. Giregirên herêman û yên di nava burokrasiya Babîlan de ji Nemrûtan têne hesibandin. Diyar e ku nemrût navek e, li rêveberên Babîlan ên herêm û bajaran hatiye kirin. Ji ber otorîteya wan a dijwar, heye ku gelek qebîle û bajar li ber wan rabûbin. Qebîle heta gund û bajarên hê di bin bandoreke xurt a nîzama komin de ne, di bin kîjan navê xwedayî (li ser navê Ellah) de were kirin bila were kirin, eşkere ye ku wê li beramberî ferzkirina împeretoriyê li ber xwe bidin û serî rakin. Civakên hînê nizanin koletî çi ye, pir bi zehmetî koletiyê qebûl dikin. Li şûna bibin kole, carnan dikarin tev bi hev re kom bi kom xwe tine bikin. Em ji dîrokê bê hejmar mînakên di vî warî de dizanin.

Dînê Hz. Brahîm û çîrokên der barê wî de, ya rastî, bi giştî vê çanda berxwedanê ya dijnemrût temsîl dikin. Çavkaniya yekemîn a vê çandê, zeman û zemînê împaratoriya Babîl di salên 1700'î de ye. Çavkanî û milê duyemîn jî çîrokên Hz. Mûsa ne ku piştî salên 1300'î B.Z. li ber Firewnên Misrê radibe. Ango li dijî çanda ku otorîteya Firewnên Misrê tesmîl dike, li ser heman xeta berxwedanê ya Brahîmîyan jî weke wê radibe. Ev rêûresma Brahîmî ya nîvkole û dixwaze rizgar bibe ya çanda berxwedana civakên têkoşer e. Pirtûka Pîroz bi tevahî ji çanda vê rêûresmê pêk tê.

Di dema xwe de Nemrût û Firewnan xwe weke qral-xwedayan û du hêzdaran kire nîşan, rêûresma dûrûdirêj a li ber wan rabû bi demê re xwe weke çandeke nû li hev çêkir û piştî Hz. Mûsa bi rahibên (vê rêûresma bi birayê Mûsa Harûn destpêkir bi Samûelê I. û II., Îşa û gelek pêxemberên din dewam kir) hînê bi hêz xwe temsîl kir û paşê jî di salên 1020-900 B.Z. de bi Hz. Dawid û Hz. Silêman li ser erdên Îsraîl-Filistîna îro qraliyeteke bi hêz ava kirin. Qebîleya Ibranî vê rêûresmê temsîl dike. Ji lewra em meş û bandora vê qebîleyê di nava dîrokê de bi baldarî şîrove nekin, em nikarin dîroka şaristaniyê û her cure serhildan û berxwedana li dijî wê hatine kirin fêm bikin, ji hev derxînin. Em wexta dibêjin her cure, mebesta me jê her cure tevgerên îdeolojîk, mîtolojîk, felsefî, dînî, siyasî, fizîkî, ekonomîk, huqûqî, qebîleyî û neteweyî ne.

Em di salên 1596 B.Z. de dibînin ku Kassîtên bi koka Hûrrî û Hîtîtî dema Babîlan a yekemîn bi dawî dikin. Li vir a balkêş û girîng hevgirtina ku ev bi nasnameyê Hîtît û Kassîtan di nav hev de ava dikin. Dîroknas pir kêm li ser vê dabaşê radiwest in, lê ji bo em dîroka gelên herêmê hîn bibin girîng e. Diyar e, ne hêsan e ku rêûresmeke xurt a eskerî, siyasî û çandî ya mîna Babîlê têk bibinû ji bo vê jî pêdivî bi çandeke xurt a dijber heye. Jixwe tiştê ku rêûresma Brahîmî timî dikehîcret e, ya rastî timî direve. Lê wexta keysê dibîne yekser dibe erka siyasî.

Di dema Ûrûk û Ûrê de qebîleyên Zagrosan federasyon bûn. Mînaka wan a dawî Qralê Gûtiyan Gudea (Balkêş e, bi xwedayê herî mezin ê Aryenan re hemnav e. Mirov fêm dike ku bi awayekî ketiye pêvajoya dijşaristaniyê ) bû ku di sala 2150'yî B.Z. de hukmê ezbeta Akadan bi dawî kir. Ji lewra analîzkirina vê rêûresma ku li Toros-Zagrosan pêk hatî, gelekî girîng e. Pir balkêş e ku dîrokê yan pir kêm an jî hîç behsa van rêûresman nekiriye, ji lewra qadeke gelekî girîng e ku divê mirov li ser rawest e, lêbikole.

Çi li dijî çanda koloniyên El Ubeyd, çi jî li dijî kolonitiya bazirganî û siyasî ya Ûrûk û Ûrê zêdetir çandeke mayînde ya cotkariyê afirandiye, têkiliyên heta bibêjî xurt ên gundan ava kirine, xwe gihandiye ber bajarbûnê, belkî jî berê bûye bajar (Daneyên li serê girikê perestgehên mezin ên li Gobeklîtepeya Ûrfayê nîşan dide ku ev mumkin e. Yên di salên 10.000'î B.Z. de ev çand afirandin ji Ûrûk û Ûrê gelekî pêşdetir dikarin çanda bajaran ava bikin. Mîmarî û mîtolojiya wan vê nîşan dide), ji ber ku îhtîmaleke mezin e, komên qebîleyan ên di nav toreke berfireh de qûntarên çiyan û geliyan bi hev re bi kar tînin, li hemberî tehlûkeyan bi hev re li ber xwe didin, dibin federasyon û paşê jî yekîtiyên siyasî yên hîn mayîndeava dikin.

Ev komên mirovan ên em behsa wan dikin, di salên 3000'î B.Z. de Sumeran bi giştî navê Hûrriyan li wan dikir. Di salên 1650'yî de van komên mirovan û civakan du yekîtiyên siyasî yên bi hêz ava kirin. Yek jê Hîtît bû ku li bakur navenda wan Kanîş û Hattûşaş bû. Ya duyemîn jî Mîttanî bûn ku navenda wan Waşûkanî (Xweşkanî, Serêkaniyê ya îro dikeve nava sînorên Sûrî) bû. Mîttaniyan ji Zagrosan heta bi Kerkûkê, ji Til-Alal heta bi Amanosan sînorê xwe fireh kirin, gelek belgeyên dîrokî jî nîşan didin ku di salên 1400'î B.Z. de tevî Misrî û Hîtîtiyan ji aliyê çandî û siyasî ve hêza sêyemîn in. Bi Hîtîtiyan re ziman û çandeke muşterek parve dikin. Di nava wan de têkiliyên xurt ên xizmtiyê hene û di nava wan de zewacên siyasî çêdibin. (Împaratorê Hîtît Şûpîlûlîûma ji prensê Mîtanî

Matîzava re weha dibêje: ‘Min qîza xwe da te, weke zilaman em herêmê bi hev re rêve bibin.’ Di hiyeroglîfiyên Misrê de hêza Mîtaniyan tê nîşandan. Li qesrên wan gelek bûkên wan ên Mîtanî hene. Nefertîtiya navdar yek ji wan e.

Dayik-xwedawenda navdar a Hîtîtiyan Pûdûhepa jî bi eslê xwe Hûrrî ye. Di çanda li herêmê de weke nûnera dawî ya jinê xuya dike. Berê Gûtî û Kassît, weke avahiyeke siyasî ya nû bi navê Mîttanî şaxên jêr ê Hûrriyan îfade dikin. Gotina Hûrrî ji aliyê etîmolojîk ve bi zimanê Sumeran tê maneya ‘çiyayî’ ku heta roja îro jî car caran tê bikaranîn. Ji vê jî girîngtir, hemû nîşaneyên xurt nîşan didin ku bi tevahî qral û prensên dewleta bi navê Hîtît navê Hûrriyan li wan in, jinên bi wan re zewicî jî timî ji keynikên Hûrriyan in. Li gorî şîroveya min a şexsî; wexta Mîttanî bi giranî li Kevana Bi Bereket li qûntara rêzeçiyayên Toros-Zagrosan li kevana başûr yekîtiyeke siyasî yan jî şiklekî mîna konfederasyonê bûn; milekî duyemîn ê civakên Hurrî li bakur heta bi çiyayên Derya Reş û li tevahiya torosên bakur jî bi navê Hîtîtan birêxistin bûne, weke dewleteke bi awayekî bihêztir û heta weke împeretoriyeke destpêkê tên temsîlkirin. Mirov dikare, bingehê çandî, xizmtî, têkiliyên dîplomatîk û ji van gişan girîngtir jî hevgirtina Hîtît û Kassîtan weke belgeyên piştrastkirina van gotinan pêşkêş bike û nîşan bide.

Em bi hêsanî dikarin bibêjin ku ev berxwedana çandî ya li bakur û yekîtiya siyasî ya di dawiyê de çêbû dawî li dema yekemîn a Babîlê anîn. Babîl di dema xwe ya duyemîn de (1600-1300 B.Z.) yan di bin serweriya vê yekîtiya siyasî de ye, yan jî bi awayekî pêre lihevkirî tê rêvebirin û zêdetir jî hebûna xwe wê demê weke bajarekî navendeke mezin a çandî û bazirganiyê dewam dike. Ango bi awayekî weke Parîsa roja me ya îro ye.

Çanda Babîlê hûrûkûr bandora xwe li hersê Pirtûkên Pîroz kiriye. Gelek şop li pey xwe hiştine. Mirov dikare wê weke kewara bazirganiyê, bazara herêmê û bajarê zanîngehê bi nav bike. Bi

hêsanî mirov dikare bibêje; di dema xwe de bi rola navenda şaristaniya navneteweyî rabûye. Yan jî ji vê rastir, bi rola navbera mezheb û qewman rabûye. Bi tevahî lîstikên siyasî, bazirganî û îstîxbaratî li Babîlê têne pêşdebirin. Ango navenda komployan e. Teswîrên di Pirtûkên Pîroz de gelekî balkêş in. Bi kurtî mirov dikare bibêje; rola xwe ya navenda şaristaniyê bi heqî bi cih tîne. Bi vî aliyê xwe gelekî dişibe Londona îro.

Dema Babîl a sêyemîn (610-330 B.Z.) bi hevgirtina wan a bi Medan re, bi rakirina ji nexşeyê ya Nînovayê di sala 612'an de dest pê dike, bi fetha herêmê ya Skender a di salên 330'yî B.Z. de bi dawî dibe. Bi împaratoriya Nebûqednazarê navdar tê bîranîn. Împaratoriya mezin a dawî ya Mezopotamyayê ye. Mezopotamya piştî vê dîrokê rola xwe ya navendbûna sereke hêdî hêdî ji dest dide. Li geliyên Dîcle û Firatê, li şaxên wê, di nav qûntarên çiyê û deştên di nav rûbarokên wê debi qasî 15 hezar salan navenda sereke ya dîrokê bûn, çanda mirovatiyê hate stran û li tevahiya parzemînan hat belavkirin, piştî vê îro bi awayekî pir westiyayî û hêvîdar xwe ji demeke nû re amade dike.

Serdema Asûran jî bi heman awayî mirov dikare dabeşî sê deman bike. Di dîroka qedîm de ji hêzên eskerî, siyasî û bazirganî yên bi hêz e. Di nava şaristaniya Sumer û şaristaniya Greko-Romen de bi rola xeleka navberê radibe. Di şaristaniyê de bi xwînrijandin, zordarî û afirîneriya xwe ya bazirganiyê tê bîranîn. Hilweşîna wê ji aliyê tevahiya gelên Rojhilata Navîn ve (gelê wê bi xwe jî) weke cejn û roşanê tê pîrozkirin. Ji ber ku despotiyeke mîna ya firewn û nemrûtan bi dawî dibe, gelên herêmê bi cejn û roşanê radibin.

Dema yekemîn (2000-1600 B.Z.), dema mezinbûna arîstokrasiya bazirganiyê ye. Bi awayekî balkêş erka siyasî û bazirganî timûtim li cem kesekî di bin yekdestdariyê de temsîla xwe dibîne. Mirov dikare bibêje; yekdestdariya hêza siyasî û bazirganî cara pêşî ji aliyê civakên Asûrî ve hatiye damezrandin. Em bi hêsanî dikarin bibêjin ku pişta xwe dane mîraseke mezin a

dîrokî, danehevên bazirganiyê yên El Ubeyd-Ûrûk-Ûr-Babîlê bi kar anîne, li ser şopa wan çûne, ji salên 2000'î B.Z. ve bi tevahiya qadên şaristaniyê û gundên cîran ên neolîtîk û komên koçer re bazirganî pêşde birine, li navendên sereke yên diyar koloniyên bazirganiyê ava kirine, cara pêşî weke kapîtulasyonên serbixwe xebitîne, bûne xwediyê tevnên karwanên li qadeke gelekî berfireh. Di warê bazirganiyê de şaristaniya herî serwext e, ji bo van têkiliyên stratejîk bi tevahî misoger bike bi awayekî bê rehm hêz û şîddet bi kar aniye. Nînova bi şiklekî weke Amsterdama Hollandayê di nava dewlemendiya zêr û zîv de xenê dibe. Navenda cawên herî bi kalîte û giranbuha ye, qesrên herî navdar êdî li Nînovayê û bajarên nêzî wê ne. Mîna hevrikiya Amsterdamê bi Parîsê re, hevrikê Nînovayê (Asûr) jî Babîl e. Ji bo bandorê li hev bikin û ji bo yek hegemonyayê li ya din bike gelekî hewl didin. Şerên ekonomîk, bazirganî, siyasî û eskerî ji ber berjewendiyan li beramberî hev ti carî kêm nabin. Herçiqas car caran yek serdestiyê li ya din bike jî di dawiya dawî de yek ji wan jî nikare serdestiyê li ya din bike.

Dema duyemîn jî (1600-1300) di bin serweriya hevgirtina Mîttanî û Babîlan de derbas dibe. Rola xwe ya bazirganiyê dewam dikin.

Dema sêyemîn (1300-600) hêza xwe ya eskerî û siyasî bi rêûpêk dikin û hêza wan di dema xwe de digihîje asta herî xeternak. Welatê Ûrartûyan û Misr jî di navê de ti devera dagir nekin û jê xûkiyê nexwin, namîne. Yek ji demên qewm û qebîleyan herî zêde êş kişandine, ev dem e. Mirov ji vê demê re dikare bibêje, dema herî xwînrij a şaristaniyê. Weke nîşaneya mezinahiya xwe bi pesindan qala kele û bircên ji serê mirovan çêkirine dikin. Ji bilî qewm û qebîleyên hatine kolekirin yên din bi tevahî hatine kuştin. Şaristaniyeke mîna Misrê jî nikare xwe ji dagirkeriya Asûr (670 B.Z.) xilas bike. Qraltiya Qudsê bi erdê re dikin yek. Hêzeke dinyayê ye ku dişibe DYE ya îro ye. Her împaratorî bi şêweyekî egoîzmê yê pêşketî dijî. Çanda lihevkirin û bi hev re jiyanê ya di nava aştiyê de

nas nakin. Di afirandina rêûresma împaratoriyê de para wan kêm nîne.

Di hilweşandina Asûr de xwediyên rola diyarker ên bi koka xwe Hûrrî bûn. Em dizanin ku Mîttaniyan demeke dirêj hîç rehetî nedan wan û nehiştin ew çavên xwe vekin, bêhna xwe bidin(1600-1300 B.Z.). Hilweşandina wan a Mîttaniyan berxwedana yên bi koka Hûrrî bi dawî nekir. Komên eşîran ên bi navê Naîriyan (bi zimanê Asûrî tê menaya 'Xelkê Çem') li Botana îro yekîtiyên bi şêweyê konfederasyona eşîran ava dikin (1200-900 B.Z.) demeke dirêj li hember Asûran li ber xwe didin. Ji vê demê û pêve yekîtiya siyasî ya bi navê Ûrartû dikeve dewrê. Berxwedana wan a li hemberî Asûran ji salên 870 B.Z. ve heta hilweşîna sala 610 B.Z. dewam dike. Ev berxwedana ku bi qasî sêsed salî dewam kir, li navend Wan a îro wergeriya pêkhatineke bi hêz a navenda siyasî û di dîrokê de şop hişt. Dibe ku li avahiya jor a siyasî pêkhatineke têkel hebe. Di destpêkê de bandora Asûrî serdest e. Lê tê texmînkirin ku zimanekî têkel ê ji Hûrrî, Ermenî û Qefqasî hatibe bikaranîn. Ev rengê ziman mozaîka berxwedanê jî nîşan dide. Mirov wer fêm dike ku gelên li herêmê yên têkel dijîn, li hemberî tehlûkeyan dibin yek û hebûna xwe bi pêkhatinên bi hêz ên siyasî diparêzin. Skîtên bi koka xwe Qefqasî di vê demê de dikevin dewrê. Ûrartû di hesinkariyê de têra xwe hosta ne, tê zanîn ku ji misê zer (bronz) gelek sîleh û firaq çêkirine.Di serî de keleh di mîmariyê de serdest in, gelek caran di warê eskerî de Asûr têk birine. Wexta mirov van li ber çavan bigire, girîngiya wan wê baştir were fêmkirin. Herçiqas bi temamî Asûriyan têk nebiribin jî di hincirandin û hilhilandina wan de Dewleta Ûrartûyan xwediyê pareke mezin e. Şopeke dîroka şaristaniyê ye ku zehmet e, jê biçe.

Bi temamî têkçûna Asûran, piştî dîplomasiya demeke dirêj Babîlan veşartî meşand û mijûliya dirêj a rahibên Medan ên bi navê Magî (Magî bi kurdî, kuçika agir), bi hevgirtina Konfederasyona

Med û dewleta bajêr a Babîl di sala 612’an B.Z. de pêk hatiye. Li herêmê dema Medan û dema sêyemîn a Babîlan dest pê dike.

Encama herî girîng a mirov dikare ji pratîka şaristaniya Asûr derxe ew e ku ketina zikhev a yekdestdariya bazirganî û yekdestdariya siyasî û têkiliya wan a bi şer re ye. Asûr di dîroka şaristaniyê de ji aliyê yekdestdariya siyasî û bazirganiyê ve qonaxeke girîng e. Mirov dikare bibêje; beriya împaratoriya Persan, di navbera şaristaniya Misr, Çîn û Hindê deyekdestdariya bazirganiya Asûr xeleka sereke ya navendî daniye. Dinyayeke bazirganiyê afirandine. Bi awayekî globalbûna demê mewzûbehs e. Dîsa derdikeve holê ku yekdestdariya ekonomiyê nîne, bi rejimeke terorê ya kêm hatiye dîtin ji derve li ser ekonomiyê wê ferz dikin, danehev, berhemên bi hezar zehmetî hatine berhevkirin û mehsûlên qebîle û gelan desteser dikin. Pir eşkere ye ku dewlet nebe, wê yekdestdariya bazirganiyê nemeşe. Yekdestdariya siyasî ya berê bi tevahî bi şêweyê koledar ê cotkariyê re têkildar bû, lê di vê demê de cara pêşî ye ku bazirganî bi cotkariyê digihîje weznekê. Eger em yekdestdariya bazirganiyê weke kapîtalîzmê bi nav bikin, ji yekdestdariya siyasî ya berhemê zêde yê cotkariyê desteser dike wêdetir bi hêzeke bêhtir mêtinkar di şaristaniyê de cihê xwe digire. Împaratorî şêweyekî rêvebirinê ye ku ji cotkariyê bêhtir bazirganiyê ew tehrîk kiriye. Bazirganî pêdiviya xwe bi ewlehiya rêyên dirêj heye. Vê yekê jî bi tenê împaratorî dikare bike. Zêdebûna şîddetê jî têkiliya xwe bi şêweyên nû yên ekonomîk ên têne ferzkirin heye ku bi berxwedaneke dijber re rûbirû dibe û pêş dikeve, mezin dibe. Ev yek ewqasî eşkere ye ku hîç hewcedarî bi guftûgoyê nîne.

Diyare ku ji bo ekonomiyê cotkarî, bazar, bazirganiya piçûk, pîşekarî û gelek beşên taybet ên serbixwe jî wê bi kêr bên. Li tevahiya van qadan hilberîneriya keda mirov di warê pêşdebirinê de qîmeta xwe piştrast kiriye. Zehmet nîne ku mirov tespît bike, yekdestdariya siyasî, eskerî û bazirganî-ekonomîk hewce nakin.

Ma Asûr nebûya ekonomî wê rawestiya? Berevajî, atmosfereke aştiyane wê jiyaneke ekonomîk a cihê û erênî mumkin bike û ev jî tê fêmkirin. Dewlet weke rêveberiya dijberê demokrasiyê ne bi tenê hewce nake; hêzek e ku bi burokrasiya derdixe holê, bi şerên rê li ber wan vedike û bi desteserkirinê, civak û ekonomiyê xira dike. Ez li vir girîngî û pêdiviya bi bajêr û tebeqebûnê guftûgo nakim; ez têkiliya hêzeke zordar bi şaristaniyê re dixim ber lêpirsînê. Hêza behsa wê tê kirin, bi kiras û qilifê îdeolojîk xwe dinixumîne û dora xwe bi dîwarekî eskerî û siyasî lê dike. Ez dubare dibêjim, di warê aliyên erênî yên bajar de eger şaristaniyek be jî ev çawa hatiye qirêjkirin, bi astengkirineke muhafezekar û paşve dixîne tê neyînîkirin. Koordînasyona rêveberiyê tiştekî din e, yekdestdariyên zordar û desteserkar jî tiştekî din in.

Ez dibêjim; yekdestdariya siyasî, bazirganî û ekonomîk di zikhev de ye û ev yek bi tenê xweserî kapîtalîzmê nîne, tevî bajartî û xanedantiyê ji destpêka şaristaniyê ve heman xisletên xwe pêkanîne, ev her sê yekdestdarî weke zincîrên ji hev qut nabin aliyên erênî yên şaristaniyê û çalakdariya demokrasiyê pelixandine, xwe lê gerandiye û heta roja me ya îro hebûna xwe dewam kiriye. Em naskirina xelekên zincîrê dewam bikin.

### 5- Şaristaniyên Misr, Hind, Hitît û Fenîke

Ji bo mirov karibe kêrhatina şaristaniyên Misr, Hind û Çînê ji çemê mezin re rohnî bike pêdivî bi xebateke mezin heye. Ev der cihê vê yekê nîne. Lê mirov dikare lêbikole ka çima bi giranî cotkarbûne û nebûne xwedî wê hêzê ku karibin ji sînorên herêmên xwe bibihurin. Dibe ku mirov ji lêpirsîneke bi vî rengî hîn bibe. Serî li yekdestdariya ekonomîk û nemaze yekdestdariya bazirganiya li qadên berfireh nedane û ez yeqîn dikim ku ji ber vê, demeke gelekî dirêj li ser piyan mane û di nava xwe de gelekî pêşketî ne. Hersê jî hema bêje bazirganiyeke wan a derve nîne. Wer xuya dike ku di nava bazirganî û cotkariyê de jî zêde rê nadin yekdestdariyê.

Yekdestdariya siyasî ya heyî çiqasî ji yekdestdariya ekonomîk dûr disekine ewçend jî temenê wê dirêj dibe. Hêza eskerî û siyasî li dijî tehlûkeyên ji derve tên û di warê pêşîgirtina kaosa hundir de li kêm dengên nerazî rast tên. Ji lewra jî temenê wan dirêj dibe. Li gorî analîza dawî, ev yekdestdariya kurtêlxuriya aborî ye. Lê mirov fêm dike ka çima heta bi qirikê bi nava yekdestdariya ekonomîk de neçûne.

Misrê çiqas bandor li çanda Greko-Romen kiriye ewçendê jî ji şaristanî û çanda Ewrûpayê re kêrhatî bûye. Ji bo Efrîkayê di rewşeke welê de ye ku mîna hîç li wir nebûye. Dest neavêtiye bazirganiyê. Xwe ji Rojhilata Navîn şûştiye. Belkî jî bi destê dewletê mînaka pêşî ya sosyalîzmê ye. Ji mînakên mîna wê yek jî bi qasî Misrê bi tesîr nîne. Misr bi tevahî, Hind û Çîn jî hinekî di ser Rojhilata Navîn re tevlî şaristaniya serdema navîn bûne. Îslamiyetê hemû herikandine hawiza xwe û di pêşkêşkirina wan a Ewrûpayê de bi roleke sereke rabûye.

Ji bo Hîtîtan hewce nake em sernavekî nû deynin. Weke hevgirtiyê Hûrrî-Mîtaniyan şaristanî li Anatolyayê belav kirine. Bi bandora xwe ya li peravên Egeyê herî kêm bi qasî Misr û Fenîkiyan di pêşketina şaristaniya nû ya li Nîvgirava Yewnan de bi kêr hatiye. Belavbûna Misrê ya li Sûrî rawestandiye. Di rawestandina belavbûna Asûr û berê jî ya Babîlan de bi tesîr bûye.

Qada bazirganiya riyên dirêj a Misriyan nekir û vala hişt, qewmê bi navê Fenîkiyên li Rojhilatê Derya Spî bi cihbûyî dagirt û ev bazirganî kir. Li her aliyê Derya Spî Fenîkiyan koloniyên pêşî yên bazirganiyê ava kirin. Yên cara pêşî çanda Misrê û Rojhilata Navîn li Ewrûpayê belav kirin jî dîsa Fenîkî bûn. Di warê alfabe û hunerê çêkirina keştiyan de jî aliyekî balkêş ê şaristaniyê ne. Wan alfabe hînî Yewnaniyan kirin. Benderên pêşî wan ava kirin. Di barkirina çanda manewî de rola wan girîng e. Di dîroka şaristaniyê de herî kêm bi qasî Ûrartûyan gaveke bi tesîr in.

Bandora Qraliyeta Îsraîlê zêdetir di warê manewî de ye. Ya ji vê girîngtir jî ew e ku rêûresma Ibraniyan dînên yekxwedayî afirandin. Mîna ku li hemberî dewleta maddî ya Misr û Sumerê hinceteke wan a dîrokî ji bo avakirina dewleta manewî heye. Divê mirov di pencereya teng a Cihûtiyê de li rêûresma Ibraniyan nenêre. Bazirganên Cihû li ser vê rêûresmê zêdetir di milê pere-maddî de mezin dibin, lê di warê manewî de pêxember, nivîskar, rewşenbîr û entelektuel hene. Ji ber ku di herdu waran de jî bi tesîr bûne, bandoreke hûrûkûr li dîroka şaristaniya dinyayê kirine. Ji bo bi tevahî naskirina şaristaniyê divê rêûresma Ibranî, Sumer û Misrê ji her aliyî ve were analîzkirin. Ji vî alî ve eger em li mijarê temaşe bikin û em Ewrûpayê bi tenê bi çanda serdema navîn û hinekî jî bi çanda antîk a Greko-Roman rave bikin, wê şêweyê vegotina me gelekî kêm bimîne. Ev, şêwe û şêwazekî gelekî kêm û çewt e. Ez ê paşê hewl bidim guftûgo bikim ku kêmasiyên bi vî rengî rê li ber encamên çawa xeternak vedikin.

**6- Serdema Med-Pers (700-330 B.Z.) :**

Bandora Medan li şaristaniyê kirî hînê bi temamî nehatiye zelalkirin. Xisletên wan ên herî girîng û têne zanîn ew in ku li Zagrosan jiyane û bi koka xwe qewmeke Hûrrî ne, bi Farisan re xizmtiya wan heye û weke qebîleyên Aryen bûne mil û şaxek. Di bin zexta zêde ya Asûran de bûne xwediyê nasnameyeke têkoşer. Weke rêxistinkar û perwerdekarên wan ên bingehîn rahibên bi navê Magî hene. Mirov dikare bibêje ku rahibên behsa wan tê kirin demeke dirêj li rêveberiyê mane. Ber bi salên 700 B.Z. ve yekîtiyeke konfederatîf ava kirine û li herêma Medyayê li Rojavayê Îrana îro û li sêgoşeya sînorên Îran, Iraq û Tirkiya îro jiyane. Bi Skîtên ji Qefqasan daketine carnan dost bûne, carnan jî şer kirine. Di sala 612'an de kengî Asûran têk dibin, navê wan belav dibe û pêşî li wan vedibe. Tê zanîn ku di 585 B.Z. de li peravên Kizilirmakê Frîgiyan têk dibin. Di vê navberê de ji nava Magan

zanyarekî hoste bi navê Zerdeşt derdikeve. Dîndariyeke bi giranî ji exlaq pêk tê ava dike. Ne bi temamî dîn, ne jî felsefe ye. Tevî ku ji rêûresma Ibranî cihê ye jî beramber û dualî bandor li hev kirine. Nexasim wexta împaratorê Babîlan Nabûqednazar Kurênîsraîliyan di sala 595 B.Z. de êsîr girtin birin Babîlê bandorên Zerdeşt çêbûye. Şaristaniya Yewnan, Medan di ser Persan re dihesibîne û girîngtir dibîne. Di Dîroka Herodot de herî zêde behsa Medan tê kirin. Di sala 559 B.Z. de bi bêbextiyeke navxweyî Axemeniyên Persî li textê pêkhatina siyasî ya Medan rûdinên. Damezrînerê wan Kîros li qesrên Medan mezin bûye. Pers û Med hêmanên hevpar ên damezrandina împaratoriyê ne. Ji lewra bi navkirina împaratoriyê weke Pers, binavkirineke kêm e.

Împaratoriya Pers-Medan li derdora sêsed salî ji Misrê heta hundirê Hindistanê (515 B.Z.) fetih kir, li qadên ji sînorê Çînê heta Nîvgirava Yewnan yekîtiya siyasî ya herî berfireh a demê pêkanî. Dabeşî bîstûdu eyaletan bû û bi vî awayî nîv dewletek ava kir. Di hin mijaran de bi kêra şaristaniyê hat; burokrasî, sîstema posteyê, rêyên baş û artêşeke mezin a bi heybet ava kir. Girîngî daye rêûresma exlaqî.

Şaristaniya Yewnan gelek hêmanên xwe yên çandî ji Pers û Medan girtiye. Di vê demê de rojhilat-rojava bi aweyekî diyar ji hev cihê bûne. Herdu jî gelekî bandorê li hev dikin. Gelek Yewnanî li qesrên Persan wezîfedar in û bi hezaran ji wan jî eskerên bi peran in. Ji ber ku dewlemendiyeke mezin danehev û bi qasî dused salan serweriya herêma Egeyê kirine di asta xwestek û arezûyê de Yewnanî weke lehiyeke dijber her rûyê wan li Medyayê ye. Mîna armanceke neteweyî her çavê wan li Persan e. Hem dixwazin zora Persan a li ser xwe bişkînin, hem jî dixwazin dewlemendiyên wan zevt bikin. Xweber nîne ku weke Herkulê nû Skender derdikeve holê. Skenderê ku ji vê dubendiya  para xwe girtiyeperwerdeya taybet a Arîsto dîtiye. Di felsefeya Yewnan de jî nîşaneyên têkoşîna bi pirsgirêkên vê zordariyê re xuya dikin. Jixwe ji aliyê mîtolojîk ve

gelekî dikevin bin tesîrê. Bi awayekî, çanda berxwedanê hatiye çêkirin. Ezmûnên Medan li hemberî Asûran Yewnan jî li hemberî Persan ceribandine. Zarokê çanda Yewnan Skenderê Makedonî împaratoriya Persan weke qesrên ji kaxiz û hêkan pelixand û ev hêza xwe jî ji çanda berxwedana bi sedsalan digirt û nemaze ji senteza ruhê azad ên qebîleyên Makedon û rohnîbûna felsefî.

**7- Şaristanî û Çanda Greko-Roman:**

Şaristanî û çanda Greko-Roman bi şaşî weke destpêka çanda Rojava tê şîrovekirin. Li Rojava ango Ewrûpayê çandeke bi vî rengî û şaristanî derneket ku şaristanî û çanda Ewrûpayê were hesibandin. Serdema navîn a Xirîstiyantiyê jî di navê de, li Ewrûpayê di qada çandî de bûyerên qewimîn, şaristanî û çanda çavkaniya xwe Rojhilata Navîn e (Mezopotamya û Misr) bi derengiyeke manedar heta sedsala 15. P.Z. barkirine vê derê. Xisûsa kuez hez dikim bînim ziman ew e ka çawa çandek di nava 'demeke dirêj' a bi qasî 15 hezar salan û ji 'mekanekî diyar' derketiye weke xelekên zincîrwarî mîna çemekî mezin û sereke herikiye Ewrûpayê.

Xeleka Greko-Romen a şaristaniyê herçiqasî li ser erdnîgariya Ewrûpayê çêbûbe jî her tiştê xwe ji vê mîrasa ku pêve girêdayî ye, girtiye. Piştî sedsala 16. weke çanda maddî û manewî tu nûbûneke ciddî û 'nedomdariyek' di vê pêvajoyê de çênebûye. Ya em weke nûbûn dikarin bifikirin felsefe ye ku em li wê jî bêyî çanda ji Babîl, Misr, Hîtît, Ûrartû, Med û Persan hatiye girtin, nikarin bihizirin. Eflatûn jî li xwe mikur tê ku ji salên 600'î B.Z. ve di serî de Solon, Pîsagor û Thales, zanyarên Yewnan di serî de Babîl bi salan li navendên zanyariyê yên Rojhilat geriyane û fikrên xwe yên felsefîk çawa çêkirine. Mîtolojiya Yewnan û Romayê jî ji bilî binavkirinên wan ji aliyê cewherî ve versiyonên çaremîn û pêncemîn ên mîtolojiyên Sumer û hinekî jî yên Misrê ne (Sumer + Babîl + Hûrrî-Hîtît-Mîtanî + Yewnan + Roma). Jixwe weke çanda maddî ya

neolîtîkê di salên 4000'î B.Z. çanda Misr û Sumer di salên 2000-1000'î B.Z. de gihîştiye tevahiya deverên jiyanê yên Ewrûpayê.Senteza di dawiya salên 2000'î B.Z. de li nîvgirava Yewnan destpêkir, di salên 1600-1200'î B.Z. de piştî ceribandinên xwe yên pêşî encax ji salên 1000'î B.Z. ve di serdema antîk de berhemên xwe dan. Homeros û Hesîdos berhemên destpêkê yên vê dane. Li nîvgirava Îtalyayê jî di salên 1000'î B.Z. de bi Etruskan meyiya, di salên 754'î B.Z. de qraltî û di salên 510'î B.Z. de bi cumhûriyetê bi encam bû.

Pêvajoya hezar salî ya di salên 500'î B.Z. û 500'î P.Z. de xwedî xisletên girîng in. Piştî Ûrûkê xelekên bajaran hene ku hêjane mirov ji wan re bibêje Ûrûka duyemîn in. Bajarbûna Greko-Romen bêguman di warê estetîk de qonaxeke girîng e. Çînayetî û şêweyê wan ê rêveberinê di heman weznê de nebe jî bi gelek xisletên xwe beriya bi hezarên salan pêk hatine. Hêmanên maddî û manewî yên weke bazirganî, bazar, pere, alfabe, zanist, felsefe (zanyartî), moral û mîtolojî bi hezaran sal berê pêk hatibûn. Mirov dikare bibêje ev hemûversiyoneke duyemîn a gelêkî girîng pêk anîne. Lê heta mîrasa kutê gotin nebe, mîna gihayê ji erdê şîn dibe mirov bibêje çanda maddî û manewî ya Ewrûpayê ji van herdu nîvgiravan ji bin erdê derketine, manedar nîne. Di dîroka Rojava de nêzikahiya ji mijara kok û rehan re demeke dirêj kêmasiyên pir cîddî û şaşiyan hewandiye. Di dema postmodernîteyê de şîroveyên hînê rasttir têne kirin.

Yek ji xweseriyên çanda Greko-Romen ew e ku rejîmên dewletê yên weke qraliyet, cumhûriyet, demokrasî û împaratorî li pey hev û di zikhev de pêkanîn. Di destpêkê de demokrasî û qraltî di zikhev de bûn, lê di demên dawî de jî împaratorî û cumhûriyet di zikhev de ne; beriya jihevdeketinê weke şêwazê şikilgirtina dawî împaratorî girîng bûye. Mîna ku sîstema şaristanî û çanda herî berfireh a her kesî himbêz dike û sîstema dawî ya koledariyê pêk anibe. Jixwe împaratoriya Romayê bi hilweşînê veguheriye. Bi

şaristaniya Greko-Romen re qonaxeke demdirêj a dîrokê piştî dema xwe ya stewiyayî dît, ket krîzeke kûr û asê. Hilberîna li gund xwe dispêre cotkariyê û li bajêr jî xwe dispêre pîşekariyê rê li ber berhemê zêde vedike. Pirbûna berhemê zêde bingehê rêxistiniya şêwazê dewletê ye. Di cewherê meselê de berhemê zêde bi keda bi nanozikê dixebite û dibe xwedî qabîliyet, têkildar e. Pêşkêşkirina kedê bi şêwazê koledarî û bikaranîna wî şêweyekî sereke ye. Yekdestdariya dewleta ji sêberiya eskerî, polîtîk û îdeolojîk pêkhatî,li ser kedê tê avakirin. Ev sîstem bi bajarbûnê re di zikhev de pêş dikeve, bi pêşketina pîşekariyê re kar dabeş dike û pêşde dibe û bi vî awayî pêkhatina zincîra metabûn-bazar-pere bi cih tîne. Di vê xelekê de yekdestdariya bazirganiyê dikeve dewrê û ji bo desteserkirina beşekî berhemê zêde derfet û îmkanan dide. Di nava dewletê yan dewletan de ji aliyê cewherî ve du yekdestdariyên li ser desteserkirina berhemê zêde yê bi cotkarî û pîşekariyê çêdibe, her diçe şer dikin û dikevin nav pêşbaziyê. Ev herdu yekdestdarpir bi xetên zelal ji hev cihê nebin jî ji bo mirov karibe gelek têkilî û şerên eskerî û siyasî ji hev derxîne, ev têgîna herdu yekdestdaran xwedî roleke kilît e.

Em van hêzan bi awayekî hişkeber dikarin weke klîkên yekdestdar ên bazirganî û cotkariyê bikin têgîn. Ev hêz kakilê amûrên li dora bajêr zêde dibin ên îdeolojîk, polîtîk û eskerî pêk tîne. Em dikarin sîstema (şêweyê) civakê ya ji yekpareyên çandî yên maddî û manewî pêk tê weke şaristaniyê bi nav bikin. Ji ber ku keda tê îstîsmarkirin bi şêweyekî serdest ê koledar tê kontrolkirin, dibe ku manedar be, mirov ji van sîsteman re bibêje ‘şaristaniyên koledar’. Tevahiya dîroka şaristaniyê em dibînin reqabet û şer di nava du bendan de ne: yek jê, yekdestdarên şaristaniyê di nava xwe de dikin, nemaze jî yekdestdariya bazirganiyê di nava xwe de dikin; ya duyemîn jî tevahiya hêzên civakê (çîna bindest, qebîle, eşîr, xelk, pîşekar) yên nakokiya wan bi sîstemên şaristaniyê re hene dikin. Xwezaya şeran hêza xwe ji van du bendan digire, ji bo

serketinê divê çanda maddî û manewî timî di nava reqabet û şerên zêde de were meşandin. Di dîroka şaristaniyê de reaksiyonên em ji wan re zincîrwarî dibêjin, destpê dikin pêk tên.

Ev pêvajoya ku me heta dema Greko-Romen bi kurtî rave kir, pêvajoya reaksiyona zincîrwarî ya bi krîz e. Ji ber ku ji ber hin sedeman cotkarî û bazirganî li hin qadan qels dibin û têk diçin, krîz her li ser kar dimînin. Şertên bahewayê, zêde hilberandin, şerên derve û hundir, koçberiyên derve û hundir, şêwazên berdar ên hilberandinê, di warên eskerî, siyasî û îdeolojîk de rêxistinî û sîstemênhîn pêşketî (felsefe) sedemên diyar ên krîzan in. Klîkên yekdestdar ên naxwazin tine bibin û beşên wan ên zêdebûna para xwe ferz dikin, şer û pevçûnan weke amûrên hilberandinê bi kar tînin. Ji ber ku ew yekdestdarên li ser aboriyê ne, ev yek bi vî awayî ye. Nexasim şaristanî û dewletên zêdetir li ser hîmê bazirganiyê rabûne, ji ber zêdebûna krîzên bazirganiyê timûtim rê li şer vedikin. Şaristanî û dewletên li wan yekdestdarên cotkariyê serwer in û xwediyê şert û mercên bi rêkûpêk ên avdaniyê û bahewaya xweş in, zêdetir di nava aştî û aramiyê de ne, ev nahêle ku krîz timûtim bikevin dewrê. Wexta ku em ji vê awirê ve li mijarê binêrin, em ê hîn baştir fêm bikin ka çima Misr, Hindistan û Çînê, ji bilî hin serhildanên koleyan yên li hin herêm û bajaran, pir kêm şer kirine. Bi giştî şaristaniyên bi koka xwe Mezopotamyayî timî belav dibin û şer dikin. Mirov vê yekê dikare ji têkiliya wan a zêde ya bi bazirganiyê refêm bike. Şaristaniyên El Ubeyd, Ûrûk, Ûr, Babîl, Asûr û Pers timî kolonî çêdikirin, belav dibûn û şer dikirin. Ev yek bi rola bazirganiyê re ya di pêvajoya hilberandinê de ji nêz ve têkildar e.

Şaristaniya Greko-Romendi dema hem pêşengiya Atînayê hem jî ya Romayê de di derya û erdê re, di nava seferan û şer de bû. Ev yek jî ji ber giraniya bazirganiyê ya di dinya Derya Spî de bû. Bivê nevê, giraniya bazirganiya di vê qadê de nedibû bihata piştguhkirin. Ji qonaxa avabûna şaristaniyê ve Mezopotamya her

dergûşa cotkarî û bazirganiyê ye. Ji salên 600'î B.Z. ve li rojhilat Pers, li rojava Grek û Romayî hem li herêmên xwe yên hilberandinê û bazirganiyê yên sereke, hem jî hewcedariya wan bi cotkarî û bazirganiya Mezopotamyayê, kir ku li ser Mezopotamyayê 'şerên hezar salan' bidin meşandin û ev hemû jî ji ber heman sedeman in.

Bazirganiya Mezopotamyayê û bazirganî nebin, şaristanî nabe. Yan herdu bi hev re yan yekê bikeve yan jî wê herdu hev di weznekê de bigirin. Yên bi serketine û bi binketine çêbûne. Mana di weznekê de, demên herdu jî bi serneketine ango demên tevketûtevrabû hînê dirêjtir ajotine. Eger em dîsa mînak bidin, El Ubeyd û Ûrûk hem şerêhev kirine û hem jî di weznekê de mane. Beriya wê jî herduyan jî bi civaka Mezopotamya Jor re hem şerkirine û hem jî di weznekê de mane. Di navbera xanedaniyên Ûr û Akad de şerên xeternak çêbûne. Lê di navbera wan de weznek jî heye. Piştre di dîrokê de herdu jî ji holê rabûne. Akad û Gûtiyan şerên hev tinekirinê meşandine û carnan ketine pêvajoyên weznekê. Babîl û Asûran jî hem şer kirine û hem jî ketine weznekê. Bi tevahî Hûrrî (Hîtît, Mîtanî, Kasssît, Med û Ûrartû jî di navê de) bi Babîl û Asûran re şerên xeternak kirine û demên wan ên di weznekê de gelek caran çêbûne. Di navbera Misrî û Hîtîtiyan de jî demên şer jî hebûn û demên di weznekê de jî man hebûn. Di encamê de 'hezar salan' (550 B.Z. – 650 P.Z.) şerên Greko-Romen û Pers-Sasaniyan qewimîn. Klîkên hundir ên şaristaniyan û şer û aştiyên di navbera wan de bi vî awayî ne.

Wekî din kategoriyeke din a sereke heye. Ew jî gel, qebîle, kole û bajarên (pîşekar) in ku dixwazin wan bi darê zorê bi desteserkirina bazirganî û koletiyê ango şaristaniyê ve girê bidin, lê berxwedan û serhildanên wan ên dawî lê nayên hene. Şaristanî ne bi tenê nirxê zêde yê kapîtalîzmê (sermaye), sîstemeke koledar a xwînrij, mêtinkar û êşkencekar eku li ser hîmê berhemê zêde (sermaye) yê pênc-şeş-heft hezar salî rûniştiye.

## 8- Îslamiyet û Xiristiyantî

Îslamiyet û Xiristiyantî bêguman şaristanî ne. Di navbera herduyan de aliyên cihê û wekhev balkêş û girîng in. Tevî ku der barê rewş û bandora wan a di dîroka şaristaniyê de gelek tişt hatine gotin û nivîsandin jî şîroveyên di asta zanistî de kêm in. Di vê de para kesayetiyên di bin bandora wan de çêbûne diyarker e. Li derveyî Îslamiyet û Xiristiyantiyê çêkirina paradigmayê, di demên pêş de dibe ku ev yek bibe wezîfeyeke serketin jêre divê. Şîroveyên pozîtîf ên laîk bi xwe dînekî weke pûtperestiya çor e, bi giştî dînan, bi taybetî jî Cihûtî, Xiristiyantî û Îslamiyetê nikare analîz bike û nikare ji wan bibihure. Jixwe ji vê naverokê bêpar e.

Reformasyon û Rohnîbûn xweşkirina Xiristiyantiyê li gorî kapîtalîzmê temsîl dikin. Jixwe tê zanîn ku Ronesans li dijî Xiristiyantiyê tênekoşiyaye. Rohnîbûn ji qabîliyeta dijbertiya dîn û Xiristiyantiyê û 'jê bihurînê' bêpar e, di mijara dîn de ji rexnekirin û şîroveyeke hevgirtî jî dûr e.

Îslamiyet jî ji aliyê endamên xwe ve ji rexnekirinê jî wêdetir pir zû di nava şerê mezheban de hişk bû. Bi qasî Xiristiyantiyê jî bi awayekî felsefî nehatiye şîrovekirin. Ronesans, reformasyon û rohnîbûna xwe hîç pêk neaniye. Hewldanên 'jinûve îslamtî' weke tevgerên provokasyon û reaksiyonekê, di nava şertên kapîtalîzmê de ji têgihîştina desthilatdariya faşîst û milletgiriyê wêdetir ti maneyê îfade nake.

Em dikarin Îslamiyet û Xiristiyantiyê weke qonaxa duyemîn a şaristaniyê şîrove bikin. Di sedsalên 4. û 5. P.Z. de krîza giştî ya împaratoriya Romayê ketiyê, krîzeke şaristaniyê bû. Şaristaniya koledar a temenê wê li derdora 4000 salî, bi giştî di van salan de jihevdeketina wê bi lez dibe. Dîroknasan ev dused sal weke 'sedsalên tarî' bi nav kirin. Mirovatiya di bin nîrê civaka şareza de hewcedariyê bi rizgariyeke mezin û amûrên wê yên zêhnî û maddî dibîne. Li her deverê gera li armanc û amûran heye. Mirovatî di

rewşeke welê de ye mîna ku ji xeweke bi kabûs hişyar bûbe. Roj ê hilê, lê diyar nîne wê çawa be. Baweriyên kevn û sembolên pûtwarî li bazaran pênc quriş nakin. Împaratorên Romayê bi xwe jî wer li wan hatiye êdî serekî li perestgeha Jupîterê nadin. Di vê demê de ku hewldanên di warê zêhnî û baweriyê de têra xwe xurtbûne, Xiristiyantî, Manîtî û Îslamiyet derdikevin. Ji lewra jî derketin û hilatina wan dabaşeke, tê fêmkirin.

Li vir pirsa hînê dijwartir ev e: hem Xiristiyantî hem jî Îslamiyet tevî ku ji sedî sed tevgerên siyasî ne jî çima bi israr xwe weke tevgerên 'îlahî' û 'teolojîk' ango weke dîn pêşkêş kirin? Em divê bersiva vê pirsê bi qasî taybetiyên derdora me behskirî, mirov di lêgerîna întelektuel û rizgarîxwaziya wê demê de bigere ev şêwe wê me zêdetir hîn bike. Têgihîştina wan a rêxistin, bername, guftûgo û fikrê, wê li ser mînakên berê şikilgirtî bimeşe.

Rêûresma di vê de rola herî girîng dilîze rêûresma pêxembertiya Brahîmî ye. Cara pêşî pêxemberê xeberê ji rizgariyê bidin. Bêyî bibe pêxember kes li pey milîtan an jî rewşenbîrekî ji xwe re bibêje 'ez rizgarîxwazim' naçe. Ji ber ku rêûresmeke gelekî bi kok e, şensê hilbijêrkeke din, çênabe. Jixwe Manîtiyê hewl da rêûresmeke hinek cihê biceribîne. Tevî ku naveroka wê xweş û rohnîtir bû jî ji ber rêûresmên kevn bi temamî bi ser neket. Ji lewra tevgerên bi koka xwe Rojhilata Navînî, ji ber vê rêûresma dîrokî kirasê dînî li xwe dikin.

Ji lewra wexta mirov Îslamiyet û Xiristiyantiyê şîrove bike, divê mirov ji bîr neke ku rasterast du tevgerên siyasî ne ku kirasekî dînî li wan hatiye kirin. Me di vê nirxandina xwe ya kin de jî anî ziman rêûresma dînî ya Brahîmî heta formên dînî û mîtolojîk ên perestgehên rahibên Sumer û Misrê diçe û bi giranî teolojîk e. Bi têgîna Xwedê û îbadetên wî ve têkildar e. Ji bo şîroveyeke ji rîtuel (îbadet) û xwedayên Misr û Sumeran cihê bikin, gelekî hewldane. 'Şîroveyên kêrhatî' yên li ser navê pêxemberên navdar her pêşxistine. Mûsa, Samuel, Dawid, Silêman, Hezekîel, Îşaya û

gelekên din ji van kesan in. Lê em dizanin ku ev kes di dema xwe de ji bo ji rejîmên despotîk xelas bibin xwedî mîsyoneke mezin a rizgarîxwaziyê ne.

Sedema wendabûna şopa Manîtiyê ew e ku li pêşî û pişta wê rêûresmeke tekûz a bi vî rengî tinebû. Lê rêûresma Brahîmî tevî ku 1500 sal rabirdûya xwe hebû jî heta dema Mesîh Îsa xwediyê serketineke bi sînor e. Nikarîbû ti şaristaniya bi koka xwe Misr û Mezopotamyayî têk bibe. Qraltiya piçûka li Qudsê ava kir jî nikarîbû temendirêj û bi tesîr bibe. Serketina wê ya herî mezin jî ew e ku ji bo mirovên bindest û yên li rizgariyê digeriyan timî dizanîbû bibe dengekî hêviyê. Bû navend û wicdanê xizanan, bi tevahî bindestan û yên ji ber nemrût û firewnan êş dikişandin û kesên dixwestin li pey îdealan bibezin.

Eger em bûyera Hz. Îsa di vê çarçoveyê de deynin em ê baştir lê serwext bibin. Împaratoriya Romayê ji zû ve Qraltiya Qudsê jî fetih kiriye. Wexta kahînên hevkar jî bi rêveberên Romayî re tevgeriyan, ji bo pêxemberê nû rewşa guncaw çêdibe. Her weha ji nava civakên Rojhilata Navîn a koledariya Romayê ew tîştîşî kir, ref bi ref 'koleyên bêkar', ango komên proleter derketin. Gelek terîqet û pêxember çêbûne. Dibe ku Îsa Mesîh yek ji van kesan be ku li çarmîxê hatiye xistin. Ya rastî, gelek kes bi vî awayî hatine cezakirin. Îsa Mesîh (xilaskar) bi tenê dibe navekî sembol û nîşan. Dibe navê hevpar ê tevgera xizanan. Mirov dikare tevgera Îsevî weke tevgereke sosyalîst a destpêkê qebûl bike. Ji sedî sed destpêkê tevgera koleyên direvin û xizanan e. Tevgera dawî ya kesê bi navê Îsa, meşa fethê ya Qudsê ye. Ango li pey qraltiyeke nû ye: Qraliyeta xizanan. Mîna Spartakusê Romayî ye. Lê ya wî bê şer e. Tevger piştî 12 hewariyan, nemaze piştî pêşnûmeyên pêşî yên Incîlê (materyalên îdeolojîk) û komikan dibe girseyî.

Saint Paul û hin hewarî gelekî çalak in. Împaratoriya Roma û Sasaniyan dişopînin. Grekî weke koma sereke ya du sê gelan li Anatolya Navîn û Rojava, li rojhilat Asûrî li herêmên Sasaniyan û li

Bakur-Rojhilatê Anatolyayê Ermenî bi awayekî girseyî tevlî bûn. Di serî de Saint Paul, rewşenbîrên Cihûyan gelekî çalak in. Împaratoriyên Roma û Sasaniyan ji bingehên wan ên civakî ve dihejînin. Bi temamî dibin tevgereke siyasî. Piştî ku Bîzans (Kostantînopolîs) weke Romaya Rojhilat cihê bû, li pey wê Xiristiyantî dibe dînê fermî. Nakokî di vir de ye. Doktrîna weke li ser hîmê dijbertiya Romayê derket, dibe dînê fermî yê beşekî mezin ê Romayê, dibe îdeolojiya wê. Ev rewş hem parçebûnê bi lez dike, hem jî împaratoriyê vediguherîne û temenê wan dirêj dike.

Dîroka Romaya Rojava û Rojhilat tê zanîn. Diyare ku ev pêvajo di navbera rêveber û giregirên Xiristiyan de rê li ber guftûgoyeke mezin û cihêbûnê vedike. Gelek mezheb çêdibin. Guftûgo li gorî ku dixuyê teolojîk e (Monofîzît, Dîofîzît), lê di cewherê xwe de bi temamî siyasî ye. Beşekî mezheban dîsa xwe vedikişîne nav xebatên bin erdê ango xebatên veşartî, lê beşekî mezin di nava herdu Romayan de dibin hevparên xurt ên siyasî û ekonomîk. Ji maskeya îdeolojiyê siyaset û ekonomî tê xwarê. Xiristiyantî ji dîn derdikeve, vediguhere şaristaniyê. Di dîroka Ewrûpayê de cara pêşî bi kirasê dîn,mirov gav diavêjin şaristaniyê û ev yek jî encama çalakiya siyasî û teolojîk a Xiristiyantiyê ye ku min bi kurtî anî ziman.

Xiristiyantî di sedsala 10. P.Z. de kengî derbasî Bakur û Bakur-Rojhilatê Ewrûpayê bû, mîsyona xwe ya dîrokî ya pêşî bi awayekî serketî temam kir. Piştre nemaze bi pêvajoya jêre ‘kapîtalîstbûyîn’ tê gotin xwe li pêngaveke nû ya dinyayê radikişîne. Xiristiyanên li Anatolya û Mezopotamyayê jî ango gelên Grek, Armenia û Asûriyayê jî berê li ser hîmê şaristaniya Bîzansê, paşê jî li dora dêrên serbixwe dikevin pêvajoya şaristaniyeke aliyê wê yê manewî zêde; ji ber ku ‘gelên Xiristiyan in’ ev yekê bi awayekî stratejîk bandorê li çarenûsa wan bike. Nexasim ji ber ku dibin hedefa Îslamê, gelek encam û bûyerên trajîk diqewimin.

Çîroka derketina şaristaniya Îslamê jî bi rêûresmeke bi heman rengî dest pê dike. Bajarê Mekkeyê li cihekî welê ye, rêyên bazirganiyê yên sereke yên Derya Sor-Xelîç, Yemen, Hebeşîstan û Şamê lê digihên hev. Rêveberiya arîstokratîk û hiyerarşîk a qebîleya Qureyş a ereb pêk hatiye. Qebîleya Qureyş bi temamî bazirgan e, pûtperest e. Sermayeyeke bazirganiyê ya diyar, çêbûye. Tevî Cihûtî, Zerdeştî û Xiristiyantiyê gelek aqîdeyên din jî li derdor û Navînê hene. Kurê Hz. Brahîm ê ji Hacerê Simaîl (yên ji qebîleya Ibraniyan qutbûyî) li dora bîra Zemzemê xaniyekî piçûk an jî holikekê ava dike. Li Mekkeyê perestgeha pêşî ev e. Lê paşê pût di hundirê wê de têne bicihkirin. Di dema Hz. Muhammed de sê pûtên girîng hene: Laat, Menaat û Ûzza. Di Ayetên Şeytanî de wan dikin çîrok: Hz. Muhammed ji qebîleyeke xizan a Qureyşiyan di nava malbateke xizan de tê dinê.

Bi giştî welatên xwe misilman dihesibînin Îslamiyetê, nemaze jî jiyana Hz. Muhammed nikarin bixin ber lêkolîneke sosyolojîk û ji vê dûr digirin. Mîna ku hin tiştên jê ditirsin hene. Şêweyekî jiyana civakî yan jî fikrekî di dîn de nekeve ber lêkolîneke sosyolojîk, rohnîbûneke rastî çênabe. Eger ev neyê kirin, wê wextê Rojhilata Navîn wê her tim meydanek be ku DYE û hevgirtiyên wê hespên xwe lê bibezînin. Dîsa ji bo mirov Hz. Muhammed baş fêm bike, rêya herî baş lêkolînên civakî ne. Civak bi helwesteke bi vî rengî naxisire. Ewrûpa di mijara Xiristiyaniyê de ji ber ku bi helwesteke bi vî rengî rabû, lê rohnîbûn çêbû. Rojhilata Navîn heta bi destê xwe, xwe rohnî neke wê nikaribe şoreşa fikrê bike. Analîzkirina Hz. Muhammed dikare bibe yek ji gavên pêşî yên şoreşa fikrê. Dem, kesayet û çalakiya wî ji bo vê yekê li cih e. Ebdulmenaf ji qebîleya Haşimî ye, bavê wî Ebdullah e. Di karwanê bazirgana jin Xetîceyê de bi berdêla pargirtina ji karê diçe seferên Şamê. Dikeve bin tesîra rahibên Suryanî. Bi giranî rola Cihûyan di bazir-ganiyê de heye. Bi Cihûyan re nakokî hê ji destpêkê ve hene.

Zewaca Muhammed a bi Xetîcê re rewşeke nû diafirîne. Li dordorê dîsa gotina 'pêxemberê axir zeman' digere. Dîsa namzetê vê yekê gelek in. Û heta namzetên jin jî hene. Li gorî min, Hz. Muhammed ji Xetîceyê gelek tiştan hîn dibe. Ji ber ku ji bo bibe bazirganeke jin û dewlemend hewcedarî bi hostatiyê heye. Bi îhtimaleke mezin; dibe ku cara pêşî wê bi ber guhê wî xistibe da ku bibe pêxember. Yekîtiya di navbera herduyan de ji sedî sed gera li desthilatdariyeke kakil e. Arîstokrasiya Qureyş ji ber rêûresmên xwe yên paşverû (pûtan) di wê rewşê de nîne ku bibe dewlet. Cihû û Xiristiyan bê bandor in û nayên qebûlkirin. Her weha di navbera wan de nakokiya maddî jî heye. Çîroka Hacer-Simaîl çîrokeke Ereban e; îlhamê dide wî. Terîqet û baweriyên li dewrûbera xwe nas dike. Gelekî baş dibîne ku wê yek ji wan nikaribe armancên xwe bi cih bîne, ango wê nikaribe di çarçoveya Erebistanê de yekîtiyeke siyasî ava bike. Bi handan û teşwîqa Xetîceyê bi vê rolê radibe û ji bo wê dibe namzet. Weke rêûresma îdeolojîk milê Ereb ê rêûresma Brahîm jixwe li ber serê wî ye, zehmet nîne yê mayî jî ji rahibên Suryaniyan ên jêhatî hîn bibe.

Wehiya der barê pêxembertiya wî de cara pêşî di sala 610 P.Z. de tê. Di demeke welê de wehî tê, şerê di navbera Bîzans û Sasaniyan de gelekî dijwar e. Ev rewş ji bo nîvgirava Erebistanê weke şensekî tê dîtin. Li pêşiya wî du astengî hene; Qureyş û koloniyên Cihûyan. Pêxembertî ji destpêkê ve tê maneya lîdertiya siyasî. Jixwe bi awayekî din jî ne mumkin e. Bi tevahî peyamên têne dayîn li gorî dewletmendan e. Gava tê avêtin ber bi împaratoriyeke nû ya Rojhilata Navînve ye. Îdeolojiya Cihû ya têra xwe hatiye nûkirin û aktualîzekirin bi pêşengiya Ereban li tevahiya gelan tê vekirin û bi vî awayî tengasî li dawiyê tê hiştin. Jiyana nû bi şêwazên nû yên îbadetê tê sembolîzekirin; bi taktîk û stratejiyeke baş li çar aliyê dinyayê belav dibe. Mirov dikare Îslamiyetê weke tevgereke berfireh a pêşî ya enternasyonalîst jî bi nav bike. Bi kurtî, bi îdolojî, bernameya siyasî, rêbertî, stratejî û taktîkên

xwe,weke tevgereke siyasî ya şaristaniyeke mînak wê gav bi gav mohra xwe li dîrokê bide û pêşde biçe.

Balkêş e, navê Îslamê maneya xwe aştî ye. Hz. Muhammed dibe ku pêşbîniya pêvajoyeke gelekî bi şer dike, ji lewra jî aştiyê li pêş digire. Divê berê xwe bide sê hedefên bingehîn: arîstokrasiya Qureyş, împaratoriyên Sasanî û Bîzansê. Li Mekkeyê berê xwe dide hedefa pêşî û ev jî bi nefiyê (Hîcret) bi encam dibe (622 P.Z.). Li Medîneyê hevpeymana civakî ya pêşî amade dike. Ji bilî çend arîstokratên qebîle û eşîran ev hevpeyman bi giranî li hesabê piraniya qebîleyan tê. Cenneta soza wê hatiye dayîn milkê Bîzans û Sasaniyan e, cehennem jî şêwazê berê yê jiyanê ye. Jixwe jiyana li çolê piranî cehennemê tîna bîra mirov. Piştî ku êrîşên pêşî yên Qureyşiyan dişkînin (Bedir, Ûhûd, Xendeq) encam diyar dibe. Derketina cumhûriyeta (demokrasî) pêşî ya ereb li ser hemana ye. Guftûgo û civîn (mizgeft, komê tîne bîra mirov) zêde ne. Berevajî tê zenkirin,mizgeftên pêşî ne cihê îbadetê, lê cihê civîn, hatina cem hev û guftûgoyê ne.

Arîstokrasî û serekê wê Muawiye ku ji bo demekê desthilatdarî ji destê wan hatibû derxistin, bi manewrayên nû (pir normal e ku gelekî bûne hoste) piştî wefata Hz. Muhammed (632) gav bi gav ji nû ve desthilatdarî xistin destê xwe. Bi kuştina mirovê bawermend û xwedî pîvan Hz. Elî, rêya siltantî (qraltî) li Muawiye û silaleya wî vedibe. Bi kuştina Hz. Husên bi awayekî trajîk li Kerbelayê wê silaleya pêxember girîngiya xwe ya polîtîk kêm bibe. Lê klîkeke nû ya bazirganên ereb wê ne bi tenê li nîvgiravê, li ser tevahiya mal û milkê Bîzans û Sasaniyan wê heq îdîa bike. Tevgera mezin a fethê wê li pey hev bibe xwediyê serketinan. Cihû û Xiristiyanên li nîvgiravê ji wan kesan in ku wê herî pêşî têk biçin. Di salên 650 P.Z. de tevahiya erdê Sasaniyan, beşekî mezin ê Bîzansê û Bakurê Efrîkayê hatibû fetihkirin û êdî hatibûn ber deriyên Konstantînopolîsê.

Em vî şêwazê fetihkirina bi lez dikarin bişibînin şêwazê Skender. Çawa ku wî jî ruhê qebîletiya Makedon û felsefeya Yewnan kir yek û pê bi bayê brûskê fetih kirin û di encamê de rê li ber çandeke maddî û manewî vekir. Mêrxasiya qebîleyên Erebistanê ya xwe dispêre mîraseke bi kok bi ruhê baweriya dînê nû sentez dibe û bi hêza fethekê mezin di şerên fethê yên Skenderwarî de bi ser dikevin. Qonaxa duyemîn milê herî girîng ê şaristaniyê pêk tîne. Di pêngava herî mezin û dawî ya şaristanî û çandî ya Rojhilat de bi ser dikeve.

Di çîroka Îslamê de ya balkêş ew e ku cudahiya wê ya ji Xiristiyantiya sêsed sal piştî derketinê bû desthilatdarî, bi îlan û belavbûna wê re bi desthilatdariyê re ket zikhev û weke desthilatdariyê derket holê. Bi vî awayî bindest, xizan û kedkarên ji bo pêşketina Îslamiyetê keda rastî dane wê bi lez ji desthilatdariyê bêne dûrkirin; bi ruhên birçî, teze û qebîleyên asî ku li dora mizgeft û qesrên cennetwarî hatine rêxistinkirin,bi dewleteke bi qudret ji bo avakirina şaristaniyekê gav wê bê avêtin. Klaneke bazirgan a bajarekî piçûk di demeke pir kin de (640 –650P.Z.) bû împaratoriyek, ji lewra di çarçoveya siyasî de ji aliyê zanistî-civaknasî ve û bi perspektîfeke dînî analîzkirina vê bûyerê wê gelekî mirov hîn bike.

Li gorî şîroveya min a şexsî, demeke dirêj tinebûna desthilatiyê li nava Erebistanê, kaosa civakî (şerên qebîleyan), împaratoriyên Sasanî û Bîzansê xwedî xisletên qonaxa yekemîn a şaristaniyê û xisletên kesayeta Hz. Muhammed dikarin vê çîroka desthilatdariyê rave bikin. Ango dikarin rave bikin ka çawa bi lez Îslamiyet bûye desthilatdarî. Bi tevahî deverên şaristaniya rêûresmî ya Rojhilata Navîn fetih dike, heta bi Asya Navîn, hundirê Qefqasyayê, keviyên Başûr-Rojhilatê Asyayê (Endonezya, Malezya), li du nîvgiravên girîng ên Başûr-Rojava û Başûr-Rojhilatê Ewrûpayê Îberîk û Balkanan belav bû.

Tevî ku evçend tevgereke mezin a eskerî û siyasî ye, gotineke dînî weke Îslamê vê tevgerê baş rave nake. Rastiyê dinixumîne, wê piştperde dike. Îslam navekî sembolîk e. Têgînên weke pêxember û Ellah ji zû ve ji aliyê Ibraniyan ve hatine çêkirin. Cihûyên Medîneyê rexne dikirin û digotin 'Dînê me ji me didize, li dijî me bi kar tîne'. Ez yeqîn dikim vê rexneyê Hz. Muhammed gelekî zivêr û hêrs kiriye. Ji aliyê sosyolojîk ve mezinkirina qral û alîkarên wî mirov weke kok dikare bibe heta mîtolojiyên Sumer û Misrê. Lê naveroka Hz. Muhammed daye têgîna Ellah têra xwe ew cihê kiriye. Ellah tiştekî welê ye, mîna enerjiya gerdûnê ye. Mefhûm û têgîneke pêşketî ye. Lê di vî warî de alimên Îslamê nikarîbûne şîroveyên sosyolojîk bikin. Di Îslamê de şertên Îmanê mîna rêzik û pîvanên teorîk in. Bi îbadetan jî girêdana bi Îslamê tê xurtkirin û zindî tê hiştin. Bi van, bersiva beşekî mezin ê pêdiviyên huqûqî û exlaqî yên demê hatiye dayîn. Ji bo berdariya cotkarî û bazirganiyê huqûq hatiye danîn ango ilmê fiqhê pêşketiye. Bi awayekî pir dijwar bi ser şêwazê jiyanê yê îdeolojîk de ê ji qonaxa yekemîn a koledar mayî, çûye. Kafirtî têgîneke welê ye, bi maneya 'yê din' e ku divê were tinekirin. Piranîtiya îdeolojîk mafek e ku bi tenê ji bo rêûresma Brahîmî tê qebûlkirin.

Îslamiyet li gorî Xiristiyantiyê zêdetir deriyên wê li laîktiyê vekirî ne. Bi awayekî objektîv ev welê ye. Lê belê şerekî dijwar ê li dijî şêwazê jiyana kevn bi xwe re encamên gelekî neyênî anîne. Çandên dîrokî yên gelan û baweriyên wan kirine bahane, (tevî Xiristiyantiyê) bi vî awayî yan ew asîmîle kirine, yan jî tine kirine: mînak weke Zerdeştî û Manîtiyê. Jiyana nû ya aniye rê li arîstokrasiya feodal vekiriye. Li şûna dualîtiya Qral-Xwedê dualîtiya Xwedê-Siya Wî Siltan cih digire. Di encamê de siltanên despotîk bivê nevê çêbûne. Îslam weke dîn qabîliyeta wê ya pêşîgirtina li despotîzmê tineye. Û heta mirov dikare vê yekê, zêdetir ji bo Xiristiyantiyê jî bibêje. Bi qasî ku li monarşiyê vekiriye, rahibtî jî kiriye hevparê desthilatdariyeke pêşketî. Herdu

dîn jî weke dewlet beşên li derveyî şaristaniyê ji asta koletiya klasîk siviktir, lê ji hin aliyên xwe ve ji berê neyênîtirserftî û evdîtiyê di asta qûltiyê de bi hostayî girtine. Herdu dîn jî bi temamî li dijî koletiyê nînin. Xisleta herduyan e, hem desthilatdariya hiyerarşîk û hem jî ya dewletê bi awayekî xurttir diparêzin. Herdu dîn jî xwediyê wê naverokê ne ku pêşketina qewmî han didin û teşwîq dikin.

Ji aliyê zeman û mekan ve, tevî ku di qonaxa duyemîn de tevlî çemê sereke yê şaristaniyê bûne jî, herdu dînan jî (Cihûtî jî di navê de)ne ji pirsgirêkên di navbera klîkên yekdestdar ên serdest de çareser kirine, ne jî ji pirsgirêkên dad û azadiyê yên hêzên civakên demokratîk ên li derveyî şaristaniyê re çareserî dîtine. Berevajî, qonaxa duyemîn pirsgirêkên şer, azadî û dadê girantir kirine.

a- Li kulmozên desthilatdariyê yên yekdestdar ên nû zêde bûne, li beramberî vê berdariya cotkarî û pîşekariyê zêde nebûye. Aliyên li ser berhemê zêde şer dikin zêde bûne. Mîregtî (prenstî) bi qasî siltanan (monark) bûne hêmanên yekdestdariyê. Xanedan zêdebûne. Li gorî qonaxên berê yên para xwe dixwazin têra xwe pirbûne. Mîna çîna navîn, wexta para xwe negirtiye timî şer derxistiye. Li Ewrûpayê, li Rûsyayê şerê derebegan gelekî çêbûye. Monarkan burokrasî berfirehkirine û bi vî awayî pirsgirêkên xwe yên hatina aboriyê mezin kirine.

b- Yên bi armanca dad, azadî û rizgariyê ketibûn herdu dînan, kengî negihîştin hêvî û bendewariyên xwe, bi mezhebên cur bi cur her tim li ber xwe dan.

c- Li şûna ku çanda manewî were xurtkirin û pêşdebirin, çanda berê ya jêre digotin ‘tarîtiya serdema navîn’ tine kirin û ya nû jî dananîn şûna wê, di dewsa vê de bi guftûgoyên bê dawî yên teolojî û mezheban ji aliyê zêhnî ve ji dinyayê û dîrokê (dîrok daxistin asta çîrokên dînî) qut bûn, mîna îrade tine were hesibandin, mirov ji xwe wêdetir, bûn mîna siya xwe. Mirovên bûn êsîrê pêjnên cennet û cehennemê, ketin rewşekê ku xema wan

dinya nebû û jiyan jî bêkêr dîtin. Lê klîkên yekdestdariyê ji avakirina qesr û kelhên cennetwarî paşve neman. Felsefe û çanda bajêr li gorî ya berê paşve ma.

d- Ya herî xeternak jî ew bû ku bi slogana li ezman xwedayê bi tenê, li jêr jî siltanê bi tenê li rûyê erdê ji bo belavkirina tevahiya desthilatdariya xwe bi navê 'fetha cîhanê' şerên serdema destpêkê jî li dawiyê hiştine. Şerê li ser navê xwedayan, ji şerê xwedayan zêdetir xira kiriye û talan kiriye. Ji qonaxa pêşî qat bi qat zêdetir belavbûne û mêtingehên xwe fireh kirine. Şerên ji bo ummetê li gorî serdema destpêkê hînê sîstematîkî û domdar bûne. Şerên mezhebî ketine rewşekê, êdî derketina ji navê zehmet bûye.

### D- Dema Kapîtalîzm Derket Rewşa Ewrûpayê

Di qonaxa koledar de bi pêvajoya hilweşîna Împaratoriya Romayê re krîza dawî ya kûr bû, ne Xiristiyantiyê û ne jî Îslamê jêre çareserî dît. Sîstema wan a bi navê 'Nîzama feodal' an jî 'şaristaniya serdema navîn' ji reçeteyên rahibên Sumer û Misrê pir zêde cihê nebûn, bi reçeteyên metafizîk ên bi zehmetî têne fêmkirin hem bi bernameyên siyasî, hem jî bi çalakiyan civak xistin 'tarîtiya serdema navîn' û jê wêdetir ne tiştekî din. Gelek çandên di serdemên destpêkê de hebûn, tinebûn. Krîza Romayê ji aliyê mîrasgirên wê ve hatiye mezintirkirin. Civakên di qada şaristaniyê de weke 'taîfeyên cennet û cehennemê' di dora xwe de rawestiyayî û bi vê armancê ji bo şer bikin ref bi ref rêzgirtine, weke pêjnên dikin reprep û dimeşin, disekinin, hema bêje ev dinya me li derveyî jiyana zindî hatiye hiştin.

Li gorî vê tabloya ku min ji aliyê teorîk ve bi xalên sereke rêz kir, di rewşa berçav de em çi dibînin?

a- Weke qewmên ku pêşî Xiristiyantî qebûl kirin Grek, Ermenî û Asûrî, bi fethên Îslamî re beşekî mezin qadên wan ên dîrokî-çandî ji destê wan derketin. Hînê hewl didan û dixwestin bi awayekî hem li hemberî Romayê nasnameya Grek, hem jî li

hemberî Bîzans û Sasaniyan nasnameya Ermenî û Asûriyan mayînde û xurt bikin, ketin berpêla fethê ya Îslamî û van gelan ji ya di destê xwe de beşekî mezin dan, ketin rewşeke gelekî trajîk û qadên çanda manewî û maddî yên hezar salan ji dest dan. Yên weke qewm bûn xwedî gelek desketî û belav bûn qewmên Ereb û Tirk bûn. Kurd û Farsan bi tenê karîbûn hebûna xwe biparêzin. Li miqabilîvê, bi saya Xiristiyantiyê yek ji qewmên herî zêde bi ser ket Rûs bûn. Li hemberî Rûsan Tirk, Tatar, Moxol û heta Çîniyan bûne aliyê binketî.

b- Qebîleyên Ewrûpayê bi rêya Xiristiyantiyê kara xwe û destketiyên xwe xistine weznekê. Di nasnameyên qewmî de bi sedema baweriya hevpar hin pêşketin çêbûne û bûne sedem arîstokrasiya rahiban û piştre jî çanda kevn a derebegan beşekî mezin ê zindîtiya xwe ji dest bidin. Serî li aliyên serdest ên neolîtîkê hatiye tewandin û asîmîlasyon li ser hatiye ferzkirin. Lê rastiyeke dîrokî ye ku cara pêşî di vê demê de hêmanên neteweyî bi awayekî mayînde derdikevin holê.

c- Xwecihên Efrîka, Emerîka û Awûsturalyayê nikarîbûn çanda xwe ya resen biparêzin, li hemberî Xiristiyantî û hinekî jî li hemberî Îslamtiyê demeke dirêj nasnameyên xwe ji dest dane. Çanda Hindê jî li aliyê binketiyan cih digire. Li hemberî van dînan, Çînê newêrîbû belav bibe.

Şaristaniya serdema navîn bi gotina min qonaxa duyemîn a şaristaniyê, li şûna krîzê çareser bike rê li ber encamên wê kûr bike vekir û bi vî awayî Ewrûpa bûye xwediyê rewşeke stratejîk. Ewrûpa di şerê şaristaniyê de têk biçe wê bi temamî têk biçe, lê wexta bi ser bikeve jî wê serdestiya wê ya stratejîk misoger bibe. Bêguman şerê şaristaniyê di navbera du hêzên stratejîk ên serdema navîn, li Ewrûpa û li ser Ewrûpayê şerê Misilmantî û Xiris-tiyantiyê ye. Ji texmînan wêdetir rewş gelekî tevlîhev e.

Em wexta tên digihîjin sedsala 15. Xiristiyantiyê li tevahiya Ewrûpayê belavbûna xwe temam kiriye, ketiye dema qraltiya pîroz

û derebegtiyê. Împaratoriya Roma-Germen di wê îdîayê de ye ku mîrasa Romayê dewam dike. Lê belê hevrikên wê yên li ber radibin hene. Qraltiya Franseyê di serê van hevrikan de tê. Xanedaniya Habsbûrgê ya Awûsturyayê weke hêzeke nû mezin dibe, bi heman îdîayê radibe. Çartiya Rûsyayê ji zû ve xwe weke Romaya Sêyemîn (piştî ketina Stenbolê) îlan kiriye. Qraltiya Polonyayê weke çandeke nû bûye Xiristiyan, ji bo pîroztiyê bi destê kesî ve bernede herî li pêş e. Ingilîstan û Franse di nava şerê sedsalê de ne. Xiristiyanên Spanya û Balkanan di rewşa xweparastinê de ne. Bajarên Îtalyayê dibin kapîtalîst û li aliyê din jî ji Ronesansê re pêşengiyê dikin. Çav ne li rê ye ku bajarekî mîna Romayê mezin bibe, yekîtiya xwe çêke û di nava Ewrûpayê de bibe mînak. Bajarên Îtalyayê heta bi qirika xwe bi hev re ketine nav hevrikiya bazirganiyê. Xwelihevrakişandina wan dijwar e. Bi tenê di warekî de kêrhatî bûn; di nava dused salên dawî de ji bajarbûyîna Ewrûpayê re pêşengî kirin û kapîtalîzma bazirganiyê li Ewrûpayê belav kirin û derfeteke stratejîk amade kirin. Bi îhtimaleke mezin ev derfeta stratejîk ji Ewrûpayê re wê bibe şensekî mezin. Sedsala 16. wê vê yekê piştrast bike. Şerên Xaçperestan weke hêvî ji wan dihat kirin bi encam nebûbûn. Diyar nîne ka Ewrûpa wê bibe çi.

Tam di vê demê de Erebên Misilman hînê di ser Spanyayê re bi awayekî stratejîk gefan dixwin. Carekê ketine Franseyê bi zor û zehmetî ew derxistine. Eger ew bereyê ji dest bidin Ewrûpaya Xiristiyan wê bibe mîna mêtingehekê û bi temamî tine bibe. Împaratorên Osmanî di ser Balkanan re bi bayê birûskê gihîştine Awûsturya-Macaristanê û gihîştine ber deriyên Polonyayê. Eger neyên rawestandin, weke Romayê dibe ku hebûna çandî û siyasî ya Ewrûpayê jî biqedînin. Tirkên Osmanî û Erebên Endulusdizanin ku li hemberî Ewrûpayê serketineke temam bi dest nexin, ji sedî sed wê gav bi gav berepaş bikevin pêvajoya têkçûnê. Dewleta Altinordû ya dewama Moxolan e, di ser Derya Reş re her kêlî dibe ku êrîşê bibe ser Ewrûpayê.

Çend xisletên Ewrûpayê yên rehê xwe kûr hene. Rêûresma demokrasiya qebîleyan hînê teze ye. Gelên Ewrûpayê pir zêde neketin nav sîstema koledar a şaristaniyê. Seresere li Xiristiyantiyê serwext bûne. Zêhna wan bi tevahî nehatiye fetihkirin. Nexasim xeta bakur bi vî rengî ye. Têkiliya wan bi jiyana xwezayî re xurt e. Dema herî teze û bi lez a bajarbûnê dibînin. Bajar ji ber ku împaratortî û qraltiyê zêde nas nakin, aliyê wan ê demokratîk bi hêz e. Li cem wan hemûyan rêveberiyên nîvdemokratîk hene û ev rêveberî di nava xwe de konfederasyonan ava dikin. Ser-weriyên din û yên li derveyî îradeya xwe bi hêsanî qebûl nakin. Bi tevahî derebegî û qraltiyên têne damezrandin teze ne. Ezmûn û qabîliyetên wan ên ji bo temsîla Ewrûpayê kêm e. Di Seferên Xaçperestan de piraniya wan daweşiyane.

Li hemberî vê şaristaniya Îslamê xwedî ezmûn û tecrûbe ye. Li pişt wê dinya berê ya şaristaniyê heye. Pirsgirêkên desthilatdariyê baştir nas dike. Ji xwe gelekî razî ne. Ji ber ku bawer dikin, dîn û pêxemberê axir zeman temsîl dikin hînê zêdetir dogmatîk in. Di Seferên pêşî yên Xaçperestan de têk neçûn û rêyên bazirganiyê hînê di bin destê wan de ne. Di bazirganiyê de jî hînê serdest in.

Dema mirov di çarçoveya van rastiyan de binêre, mirov ê bi hêsanî bibîne ku Ewrûpa pir kûr di nava krîza şaris-taniyê de ye. Tehlûkeya Îslamê ango tehlûkeya Tirk û Ereban roj bi roj mezintir dibe. Konstantînopolîs ketiye destê Osmaniyan, Fatih Siltan Mehmed esker kişandiye başûrê Îtalyayê bajarê Otrantoyê. Îslam bi xwe weke dîn û qewmên bi xwe re dimeşîne bi temamî ji bo Ewrûpayê veguheriye kabûsekê. Xiristiyantî şêweyekî şaristaniyê yê karibe serî bi vê kabûsê re derxîne nîne. Jixwe timî têk diçe û wenda dike. Ji bo şer xeta bi tenê Viyana maye. Eger ew jî bişkê êdî rawestandina Îslamê û Tirkan gelekî zehmet e.

Di vê rewşê de gelekî manedar e ku bajarên Îtalyayê bi awayekî awarte xwe bi bazirganiya kapîtalîzmê digirin û Ronesansê datînin holê. Herdu tevger jî ji bo Ewrûpayê di heman

demê de pirsgirêka man û nemanê ne. Ji ber vê yekê, bûyerên li nîvgirava Îtalyayê diqewimin di asta çarenûsê de diyarker in.

Du hêzên krîzê çareser bikin ango Xiristiyantî û Îslam bi îdeaya mirovatiyê ji tarîtiya hilweşîna Romayê rizgar bikin û bigihînin ronahiyê rabûn, lê çi di nava xwe de çi jî bi helwestên wan ên li beramberî hevdu krîz mezintir kirin û ji nû ve rê li ber pirsgirêkên rizgarî û rohnîbûnê vekirin. Ewrûpa yan wê krîza ku du hêzên temsîla qonaxa duyemîn a şaristaniyê girantir kirî û xistiye himbêza wê, çareser bike, yan jî wê weke Romayê hînê bêtir noqîtariyê bibe.

Tam di vê nuqteyê de divê em bipirsin 'kapîtalîzma' ku me derketin û hilatina wê ya di sedsala 16. de xistiye ber lêpirsînê, dibe ku bi kêra çareseriyê bê. Ev pirs bi dijwarî dikeve rojevê. Xisletên derketin û hilatina kapîtalîzmê dibe ku ji krîzên Îslamiyet û Xiristiyantiyê yên serdema navîn a derengmayî re (sedsala 14. û 15. P.Z.) bibe şensekî çareseriyê. Ya rastî, ezmûna sedsala 16. a Hollanda û Ingilîstanê şensê çareseriyê rohnî dike. Lê wexta ku em van xisletan ji nêz ve hûrûkûr dikolin, em dibînin û me hewl dabû nîşan bidin ku vê carê di qonaxa sêyemîn a şaristaniyê de rîsk heye ku krîz ji krîza du qonaxên pêşî yên şaristaniyê hînê kûrtir bibe û li tevahiya dinyayê belav bibe. Kapîtalzîmê karîbû di warê şer, siyaset û ekonomiyê de xwe weke yekdestdar bibîne û ev jî sedema krîza bingehîn a tevahiya dîroka şaristaniyê ye. Hem berhema krîzê ye, hem jî krîzê bi xwe hildiberîne. Dikare krîzê li zeman û mekanê belav bike. Lê ev nabe çareserî. Bûyerên ji sedsala 16. heta sedsala 21. diqewimin gotinên min bi zêdeyî piştrast dikin.

Ji niha û pêve wê du sernavên me Dewleta Netewe û Îndustriyalîzm bin. Kapîtalîzmê di dîrokê de cara pêşî weke hêmanên bingehîn ên çareseriya pirsgirêkên civakî ev amûr kirin dewrê, ji lewra em ê van amûran bixin ber lêpirsînê û di beşa encamê de ez ê hewl bidim guftûgo û hukmên xwe der barê krîza rejîmê, krîza şaristaniyê ango kapîtalîzmê de deynim holê.

## 4- LEVÎATHANÊ MODERN: DEWLETA NETEWE

-Xwedayê Daketiye Rûyê Erdê-

Ji bo mirov 'moderníteya kapîtalîst' bike têgîn bi ekonomiyê destpêkirin hem kêm dimîne, hem jî ji aliyê rêbazê ve berevajî dike,ji têgihîştina cewher û têkiliyê dûr dixîne û rê li ber encam û hukmên şîlo vedike. Bi analîz û binavkirinên heta niha me hewl da der barê kapîtalîzmê de bikin, me piştrast kir ku di qada ekonomîk de ew hêzeke yekdestdar e, xwe ji derve ve ferz dike. Ji lewra mirov weke cewher li cihekî din li kapîtalîzmê bigere ji aliyê rêbazê ve jî dibe ku me bigihîne daneyên rast. Em ê gera xwe ya li kapîtalîzmê li qada dewletê dewam bikin, ji ber ku ev qad hewl dide wê veşêre, vedize û wê pir baş piştperde bike.

K. Mrks di qada ekonomiyê de li Kapîtalîzmê geriya. Tevahiya amadekariyên wî yên metodolojîk, felsefî, dîrokî û civakî îşaret bi avahiya yekdestdar akapîtalîzma xwe bi sîstemeke krîza zêde karekterîzekirî dike. Marks encama sîstema krîza zêde jî weke erênî tesbît dike. Hukimkirina li ekonomiyê nayê wê maneyê ku mirov dibe ekonomîk. Li ser ekonomiyê ferzkirina şêweyên avahiyan jî ekonomî nîne. Li bazarê lîstina bi buhayan û ji bo danaserhev a sermaye-karê pircure bikaranîna pereyan, ji aliyê sosyolojîk ve mirov nebe desthilatdar nabe. Mirov heta bi tevahî desthilatdariya siyasî û karektera wê ya zorê ji hev dernexîne, bi analîzên sûbjektîv ên ekonomîk-polîtîk kapîtalê bike têgîn, timî mirovan pê serwext bike, bi zanîn an jîbi niyeteke baş ketina rêbazeke çewt wê mirov bike qurbanê paradîgmaya kapîtalîst.

Beriya dest bi analîzên berfereh bikim, ez bêjim ku ez bi tehlûke û kêmasiyên rexnekirina bi tezên seresere û erzan dizanim. Nexasim helwestên dogmatîk-pozîtîv ên xwe Marksîst dihesibînin, ji ber ku ji mirîdtiyekê wêdetir naçin, guftûgokirina wan îdeayên dugêsinkirî û zivêrker pêşde nabin. Bi ezmûna teorîk-

pratîk a sedûpêncî salî, sed carî ispat bûye ku 'Kapîtal' bi rola totemekî nû rabûye û ev yek hîç bi kêra karkeran nehatiye. Li gorî min sedema bingehîn a vê çewtiyê ev e; tevî ku kapîtalîzm ne ekonomî ye, di nava zeviyên ekonomiyê de li kapîtalîzmê digerin û ya ekonomîk nîne jî di nava mijarên bingehîn ên ekonomiyê de dibînin.Tevî polîtîkayên dewletê yên yekdestdar û bi tevahî xisletên wê yên li derveyî ekonomiyê, ez danîna wan ya serê quncikê weke kevirê çarqozî şîlokirineke zêde ji bo zêhnê mirov dibînim, di heman demê de kapîtalîzmê vedişêre û ji aliyê polîtîk-îdeolojîk ve rê li ber encamên trajîk ên xeternak vedike û bi awayekî berevajî bike 'rohnî' dike.

Ez pisporê Hegel û Marks nînim. Min pir zêde jî nexwendiye. Ji bilî fikrên sereke ez der barê wan de xwedî agahî nîn im. Ez yeqîn nakim ku ev yek hewce jî dike. Lê ez girîng dibînim û yeqîn dikim ku mafê şîroveyê wezîfeyeke azadiyê ye. Belkî jî bi sedema ku gelekî bandor li civaka moderrnîteya kapîtalîst kirine, ez têkiliya wan bi wezîfeya azadî û wekheviyê re datînim. Marks û Engels wexta weke yek ji çavkaniya sosyalîzma zanistî Felsefeya elman destnîşan dikirin, herhal Hegelê ku gelekî jê bi tesîr bûbûn li ber çav digirtin. Ji rexneyên wan mirov dikare vê yekê têderxîne.

Ji aliyê îdeolojîk ve Hegel lûtkeya metafizîkê û nûnerê hemdem ê herî mezin ê diyalektîkê ye. Fîlozofekî rastî yê elman e. Mebesta min ji vê ew e ku bavê fikra milletgiriya elman e. Marks û Engels wexta asta paşvemayî ya kapîtalîzma elman ango bûrjûwaziya elman hûrdikolan rewşa bûrjûwaziyê ya di felsefeya elman de jî hûrdikolan û di vî warî de li ser rêyeke rast in. Di destpêkê de mirov vê helwesta wan di Rexneya Felsefeya Huqûqa Hegel de dibîne. Li pey vê, xebatên wan ên di avakirina Lîga Kominîst û Manîfestoya Kominîst de kirine weke pratîk rewşa wan tekûz dike. Di Şoreşên 1848'an de bendewariyên wan pêk nehatin û ez yeqîn dikim ku cara pêşî ji binî ve şikiyan û di vir de nîşaneyên pêşî têne dîtin ku berê wan dikeve aliyê ekonomiyê. Ez guftûgo nakim ka

çima rola sereke dane ekonomiyê û ez nabêjim ku hewce nake mirov li ekonomiyê bikole. Ez nabêjim lêkolîna Marks a bi navê 'Kapîtal' şaş e û ji lewra rexne nakim. Nuqteya bingehîn a ku ez wan têde rexne dikim ew e ku wan jî têde Hegel rexne kiribûn. Ew jî ew e ku Hegel çima mijara dewlet û huqûqê li pêş girtiye. Bi ya min, Hegel ji nuqteya hewce dike fikra xwe pêşde dibe. Ango ji cihê hewce dest bi fikrê dike. Yên şaşiya dîrokî dikin Marks û Engels bi xwe ne; ango bi ekonomiyê ji rê derketine. Ji yeqînan jî wêdetir, ev jirêderketin sedema bingehîn e ku ji sedûpêncî salî zêdetir e sosyalîzm ango têkoşîna azadî û wekheviyê û têkoşîna civaka demokratîk nagihîje serketina ku her kes bendewarê wê ye.

Ez wexta dibêjim Hegel a rast kiriye, nayê wê maneyê ku ez xeta wî ya teorîk-çalakiyê qebûl dikim. Rastiya wî ew e ku zanîbûye ji ku ve dest pê bike. Ji bo şaş neyê fêmkirin ez vê xusûsê dubare dikim.

Li Ewrûpayê pirsgirêk giştî ye. Bi pirsgirêkên desthilatdarbûyînê ya Ewrûpaya ku dibe dewlet re eleqedar e. Levîathanê modern wê çawa şikil bigire? Ya Hobbes û Grotius destnîşankirine, navendparêzî û hewcedariya mutleq a bi dewletê ye. Ya wan kirî, teorîsyentiya mutleqparêztiyê ye. Ji serdema feodal derbasbûna serdema kapîtalîst modela dewletê ya weke mutleqparêziya modern gavavêtineke bingehîn û amûrekî çareseriyê dibînin.Lê ev amûrê çareseriyê krîzê bi temamî çareser nake. Pirsgirêka dewletê bi tevahî giraniya xwe dewam dike. Kapîtalîzm li Hollanda û Ingilîstanê rola sereke dilîze û ev herdu welat bi hegemonyadariya xwe ya mezin dikin, Elmanya û Franseyê dihejînin, bandorê li wan dikin. Franse di têkoşîna ji bo hegemonyayê de li pey hev têk diçe. Elmanya hînê di doza jêre dibêje 'yekîtiya neteweyî' de bi ser neketiye. Jixwe bi tevahî namzetên din ên Ewrûpayê yên li benda 'îqbalê' bi pirsgirêkên dewletê re heşrûneşr in. Qraltî û mutlaqiyet van pirsgirêkan bi temamî nikarin çareser bikin. Mînaka Franseyê li naverastê ye.

Mutleqiyetdariya Luis ê 14. yê bi Heybet 'Qralê Rojê' li hemberî hevgirtina Hollanda û Ingilîstanê bi ser nakeve û di hundir de pirsgirêkên dewletê her mezin dibin. Ma yên din çi dikarin bikin? Nakokiyên wan ên berjewendiyan û rewşên wan ên çanda maddî û manewî jî rê nade ji bo bi pey modela dewletê ya Hollanda û Ingilîstanê bikevin.

Bûyera jêre Şoreşa Franseyê tê gotin di vê rewşê û li hemberî van pirsgirêkan de qewimî ye, encama derketiye holê li pirsgirêka dewletê pirsgirêkên şoreşê jî zêde kirine. Lenîn badilhewa nabêje 'Dewlet û Şoreş'. Pirsgirêka desthilatdariyê bi temamî di rewşeke krîzê de ye. Hegemonya kapîtalîst a bi armanca çareseriyê ji krîza feodal re çareseriyê bibîne pêş ket, krîz hînê zêdetir kûr û giştî kir. Mutlaqiyet hildiweşe, cumhûriyet tê îlankirin, dema teroreke dijwar dest pê dike û li pey hev pêşnûmeya împaratoriyeke dîn û împaratorî mîna ji ezman hatibe, tevahiya Ewrûpayê dihejîne. Fransewî bi awayekî kes li bendê nebû naverastê bi galgal û çalakiyan, bi gotineke hînê kibar bi teorî û şer dixeniqînin. Ma jixwe ew giyotîn çi ye?

Şîroveya Hegel kirî şahane ye. Di şexsê Napolyon de ji bo dewletê vê tespîtê dike: 'Halê xwedê yê daketiye ser rûyê erdê'. Ji bo Napolyon jî weha gotiye: 'Xwedayê li ser rûyê erdê dimeşe'. Di jiyana min de ev yek ji şêweyê ravekirinê ye ku min gelekî jê sûd wergirtiye û ez li hemberî wê matmayî mame. Hevokeke mîna vê mukemel û bêqusûr a ku hem dewleta kevn û hem jî dewleta nû rave bike, zehmet e ku mirov bibîne. Bîr biriye ku bi hevokekê ya bi hezaran pirtûkên pîroz û laîk xwestine bînin ziman, bêje. Ya rastî bi vê hevokê felsefe kiriye. Ez dikarim vê bibêjim: Ingilîz ekonomiyê, Fransî civakê û Elman jî felsefeyê baş dikin. Lê ez dibêjim, bi tehlûke ye ku mirov senteza van bike.

Ez yeqîn dikim ku Napolyon ji bo mutleqiyetparêziya Ewrûpayê ya li dora xwe belav bike, di 1802'an de modela em dikarin jêre bibêjin 'dewleta netewe' bi lêv dike. Dixwaze Fransewî

bi tevahî bibin dewlet, rabin ser piyan û Ewrûpayê bînin ser rêya xwe. Di vê de bi ser jî dikeve. Napolyon şaristanîparêzekî feodal nîne. Jixwe dixwaze wê li ser hîmê şoreşê di nava tofanê de bixeniqîne. Dilê xwe dibijîne împaratorên Romayê Sezar û Skender. Lê zeman rê nade vê yekê. Ji bo bibe împatorekî bi vî rengî atmosfera çandî ya maddî û manewî tineye. Ingilîstan jî li hemberî wî bi dizî, xasûkî û li gorî 'ekonomî-polîtîkê' hunerê hegemonyadariyê bi hostayî dimeşîne. Napolyon ketiye rewşekê hema dîn nebûye. Ji nefîkirina  xwe ya Girava Elbeyê hîç ders negirtiye. Ders girtibe jî Napolyon hînê bi bez çargavan diçe. Pir dijwar şer dike, lê li Waterlooyê têk çûye û gelekî şerpeze û perîşan e. Li Girava Saint Hellen a li nava Okyanûsa Atlasê piştî nefiya pênc salan li ber sikratan (1821) gotinên wî yên dawî weha bûn; 'Franse! Artêşno! Josefînê!'. Ev gotin, bi awayekî mukemel û bêqusûr çalakgerekî dewleta netewe xulase tînin ziman.

Li ser navê Elmanan Hegel dest diavêje teoriya wî. Kulliyateke mezin a îdeolojîk çêdibe. Bêsedem negotine îdeolojiya elman. Di pratîkê de Dewleta Prûsyayê gav bi gav tê avakirin. Bilind û mezin dibe. Ingilîstan ji bo dewletên Franse û Awûsturyayê (di serî de ji bo împaratoriyên wan) paşve bixîne destekê dide Prûsyayê. Piştî serketina Sedanê ya di sala 1870'î de û bi damezrandina yekîtiya Elman, Prûsya weke hêza hegemonîk a duyemîn derket pêşberî Ingilîstanê. Ji parvekirina bêedalet a dinyayê nerehet e. Para xwe dixwaze. Bi Şerên Cîhanê yê Yekemîn û Duyemîn ew jî weke Franseyê têk diçe û îdeaya xwe ya hegemonîk ji dest dide.

Ji Şoreşa Franseyê heta 1945'an ispat bûye ku krîza kapîtalîzmê çiqas kûr e. Ango krîzeke demekê nîne û domdar e. Di Şerê Cîhanê yê Duyemîn de Fuhrerê (lîder) Elman Hîtler e. Nazîzîm bi xaça gamayî tê temsîlkirin. Gelek analîzên faşîzmê hatine kirin. Di serî de Marksîst, analîzên ji aliyê lîberal, muhafezekar û anarşîstan ve hatine kirin jî tê de, hemû jî pir xirabdixapînin. Ti ji wan jî bi awayekî durist û têrtijî xwedî wê hêzê nînin rave bikin û

her weha xwedî wê niyetê jî nînin. Cihûyên ku bûn qurbanê qirkirinê jî întelektuelên wan di serê van xapînokan de tên. Ji ber ku Hîtler pîsîtiya hevpar a întelektueliya hemûyan û 'verîşiya' hevpar a pratîka siyasî ya tevan e. Dibêjin; 'Li ber dilê qirakê çêlika wê mîna Teyrê Sîmir e.'Ma qey ti kes ji wan ji aliyê îdeolojîk û çalakiyan ve wê bibêje 'ya ez verîşiyam pîsîtî bû?'

Fîlozofê elman ê bi koka xwe Cihû Adorno jî bi heman awayî nebe jî hukmekî wî yê bi kurtî bê vê maneyê heye ku gelekî manedar dibînim. Min hukmê wî yê yekemîn ê der barê modernîteya kapîtalîst de gotibû û weke gotineke manedar weha gotibû, 'Jiyana çewt rast nayê jiyîn.' Bi hukmê xwe yê duyemîn jî îşaret bi kampên komkujiyê kiribû, maneyên wan ji hev derxistibûn û gotibû: 'Li ser navê tevahiya îlah û pîroziyan ti mafê gotinê yê benîadem nemaye.' Dibe ku gotin bi gotin bi vî rengî nebe, lê min cewherê gotina wî welê rave kir. Dixwaze bibêje qirkirin bi ti awayî nayê ravekirin. Maskeya şaristaniya me ji rûyê wê ketiye xwarê,mafê wê yê axaftinê nemaye. Li ser şopa rastî ya Dibistana Felsefeyê ya Frankfûrtê ye. Lê ji ber ku bi guneh lewitî ne, entellektuelên endamên vê ekolê dilşikestî ne, bi mikurhatinên xwe xemgîn û xeydokî ne. Îdeolojiya Cihûyan a ku em di Benjamin û Adorno de dibînin para wê a di vê de bê fêmkirin ûli xwe mikûr (xeydokî, melankolîkî) bê girîng e. Yekîtiya Ewrûpayê (YE) bi rewşa xwe ya heyî, tevgerek e ku ser vê pîsîtiyê digire. Ez yeqîn nakim ku bin xwe paqij kiriye. Mezinbûn û kûrbûna krîzê dewam dike.

Pêngava mezin a sêyemîn a globalbûnê (globalbûna serdema fînansê), krîzê bi kûrahî li zeman û mekan belav dike û bi vê pratîkê dixwaze kontrol bike. Sîstema Sovyetê kengî di sala 1989'an de bi awayekî fermî ji hev de ket, hem xisleta wê ya dewleta netewe û hem jî rola wê ya domdar di krîzê de hatibû îtîrafkirin. Piştî sala 1945'an hêza nû ya hegemon DYE, weke hêza serketî ya şerê sar, herêma sereke ya krîza sîstemê lê herî demeke

dirêj dewam kir Rojhilata Navîn weke herêma şerê stratejîk îlan kir. Weke Louisê 16. ê dewleta netewe li Rojhilata Navîn darvekirina Serokdewletê Iraqê Sedam Hûsên bi awayekî sembolîk çi tîne ziman?

**A- Pêşketina Netewe, Diyardeya Netewe**

Wexta ku civak weke civaka komin a destpêkê, civaka dewletê û civaka demokratîk di nava xwe de tê dabeşkirin, ev bi pirsgirêkên rêveberî û çînîbûnê re têkildar e. Dabeşbûna di çarçoveya rastiya netewe de zêdetir bi bûyerên siyasî, huqûqî, çandî û ziman diyar dibe. Ne bi tenê şêweyekî netewe, mirov dikare behsa şêweyê gelek neteweyan bike û ev manedartir e. Ne neteweyên li ser heman hîmî avakirî, lê belê mumkin e ku mirov behsa yên li ser hîmên gelekî ji hev cihê avabûne, bike.

Em wexta hewl bidin maneyê bidin kategoriya netewe, diyardeyeke giştî ya civakî heye ku divê mirov timî li ber çav bigire. Dema em wê li ber çav bigirin em ê karibin jê gelekî hîn bibin. Di serî de klan bi tevahî komên mirovan pirsgirêka wan a 'ew bibin ew' heye. Ango ez civakek an jî komeke çawa me? Fena ku nasnameya xwe dixe ber lêpirsînê. Çawa ku her mirovek navek û pênasekî xwe heye, ji bo civak an jî koman meseleya nav û nasnameyan jî ji pêdiviyekê wêdetir mecbûriyet e. Bi qasî ku di çavên mirov re biçin, li naverastê gelek civakên bi xisletên cihê hene, ji lewra pir xwezayî ye ku îfadeya vana a nasnameyê jî hebin. Naxwe wê bibin mîna endamên malekê yên nav û nasnameyên hev nizanin û bi vî awayî hewl bidin têkiliyê deynin. Jixwe mirov şêweyekî bi vî rengî nikare ji bo civaka klan jî bifikire. Bi hêsanî kesek ji yê-ya din re bêje 'were' ev yek bê navhildan nabe. Jixwe gelek xisletên xweser û cihê yên civakan hene, bê navhildana wan û bê navlêkirinê, têkilîdanîn, ketina nav zanîn û çalakiya civakê, tewş e ku mirov behsa pêşketinê bike. Di rewşeke welê de civakeke bê ziman tê hişê mirov ku ev yek li cem heywanan jî nîne.

Ê wan jî zimanekî wan ê sembolan heye. Pir ziman, pir çand, pir siyaset û pir huqûq mumkin in. Lê ev rewş divêtiya nav û nasnameyê ji holê ranake. Neteweyeke bi du ziman, çand, siyaset û huqûqê dibe ku hebe; lê ev jî pêdiviya bi nav û nasnameyê ji holê ranake. Ji bo bi hev re man û jiyana pir nasname û rengên cihê, hilbijartina rêbazên rast hewce dike. Jixwe wekî din jî civak pêk nayên û nikarin bên rêvebirin.

Klanek xwe bi totemekê îfade dike û ev yek jî nîşan dide û piştrast dike ku ev rastî çiqasî kevn e. Ji bo totem, mirov bi awayekî besîd dikare bibêje ku nasnameya klanê ye. Mirov vê têkiliyê dikare hînê jî li cem hin klan û qebîleyanbibîne.

Civaka Sumeran xwe bi nasnameya perestgehê îfade dikir û bi vê jî têkiliya di navbera bawerî û navlêkirinê de nîşan dida. Perestgeh formeke tevna têkiliyan e. Ji bo civak maneyê bide xwe, gihîştiye asteke analîtîk. Wexta mirov li tevahiya têkiliyên di perestgehê de binêre, ango li nasnameya wê binêre, têrê dike ku mirov bi giranî wê civakê nas bike. Di roja me ya îro de gelek nav û paşnavên sembolîk û muccered hînê berfireh in û hebûna civakê bi giranî nîşan didin. Perestgeha bajêr, xweda û xwedawendên bajêr, gelek nîşaneyan didin me ku civak xwediyê çiqas hêzê ye û xwediyê kîjan têgînan e. Hînê jî gelek qîmetê bi mekanên pîroz didin, ev jî ji ber nirxê nasnameya wan e. Bi vî awayî dikarin xwe bibînin. Jixwe têgihîştina em jêre dibêjin cewherî jî ev e. Nasname têgihîştinê îfade dike. Têgîna herî bi serwextî û têgihîştî ya der barê hebûna xwe de ye.

Di dînên yekxwedayî de nasnameya civakê dîn û xwedê bi xwe ne. Civakeke bê dîn, dînekî bê civak kes nikare tesewir bike. Weke encama vê têkiliyê mirov dikare dîn û xwedayê wî, weke bûyera serwextbûna civakê li hebûna xwe bi nav bike. Ji bo mirov civakên Îslamî nas bike divê mirov binêre çendîn li têgihîştina dînî serwext bûne. Bêguman aîdiyetên wan ên din jî hene. Mînak weke nasnameya cinsî, nasnameya siyasî, nasnameya qebîleyî, nas-

nameya çînî, nasnameya entelektuelî û hwd. Lê li van bi tevahî mohra giştî ya dînî heye. Atîna û Roma bi serê xwe nasname ne. Ez behsa serdema antîk dikim. Welatîbûna Atîna û Romayê nasnameyeke neqane bû. Bi hêsanî nedidan her kesî. Ev jî dibe nîşan ku bajar çiqasî xwedî şexsiyet û rûmet e. Nasnameya Grek û Îtalîk hînê gelekî pirnisî û bintûte ye.

Di serdema navîn de qewmiyet pêş dikeve. Dîn di vê mijarê de bi fonksiyon û kêrhatiyeke girîng radibin. Mînak, Îslam di heman demê de bilindbûn û têgihîştina Erebtiyê ye. Mûsewîtî bi Cihûtiyê re yek tişt in. Xiristiyantî ji bo Ermenî, Suryanî û Grekên pir zû bûn Xiristiyan nasnameyeke girîng a qewmî jî îfade dike. Di zikhev de hev xwedî dikin. Fonksiyoneke girîng a dînên yekxwedayî ew e ku ji nasnameya eşîr û qebîleyê dibihure. Bi qasî nasname û têgihîştina netewe nebe jî têgihîştina qewmî bi giranî li serdema navîn, li Rojhilata Navînpêkhatineke civakî ye ku pêşketina dînên yekxwedayî têde bitesîr bûn. Wexta mirov têkiliya dînan bi qewmiyetê re deyne, mirov dikare wan weke proto-milletgirî (pêş) bi nav bike. Li cem Tirkan dîn amûrekî girîng ê nasnameyê ye. Eger Îslam nebûya, li Rojhilata Navîn wê qewmiyeta tirk û ereb bi îhtimaleke mezin hînê pirnisîbûya. Mînak mirov vê rastiyê dikare bi tirkîtiya Xezarê ya Mûsewî û Erebên Xiristiyan bibîne. Ji bo her gel û qewmî têkiliya wan a bi dîn re encamên cihê dane.

Li Ewrûpaya di serdema navîn de belavbûna Xiristiyantiyê bi giranî bi pêşketina qewmî re di zikhev de pêk hatiye. Têgihîştina qewmê hevpar mîna li cem komên qebîleyên berê li cem qebîleyên Tirk û Ereban jî çawa hat dîtin gelekî qels bû. Xiristiyantî beriya modernîteyê di têgihîştina qewmî de bi roleke tesîrê bike rabûye. Ango civaka çûyê ji wan re negotiye 'Hûn Fransewî ne, yan jî Elman in'.Lê bi heman têgihîştina dînî nêzî tevahiya qebîleyên elman û fransî bûye û di çarçoveya nasnameya hevpar de ji bo pêşketina qewmî bûye gavavêtineke mezin. Gava duyemîn jî pêşketina siyasî ye ku bi awayê qraltiyan pêk hatiye. Di qebîleyan de ji bilî dînên

wan ên hevpar qraltiyeke wan a hevpar jî pêk hatiye û ev yek bûye gavekî mezin ku ber bi netewebûnê ve biriye. Ev rewş ji bo Franseyê xweser e.

Bi pêşketin û xurtbûna bazarê re têkiliyên civakî zêde bûn û bi vê re em dikarin behsa çêbûn û derketina netewe bikin. Li Ewrûpayê derketina neteweyan destpêkê li gorî vê modelê pêk hatiye. Li gorî vê yekê netewe; têgihîştina qebîleyê + têgihîştina dînî + otorîteya siyasî ya hevpar + tevahiya têkilî yan jî diyardeyeke civakî ye ku li dora bazarê çêdibe. Mirov ji vê re bibêje civaka netewe belkî manedartir be. Netewebûyîn û dewletbûyîn heman tişt nînin. Mînak Qraltiya Franseyê hilweşe jî weke neteweya Franseyê wê bimîne û hebûna xwe dewam bike. Eger mirov netewe bi terîfeke giştî bi komên çand û ziman ve girê bide belkî mirov karibe bêtir jê hîn bibe. Lê eger mirov bibêje bi tenê bi çand û ziman netewe diyar dikin wê ev yekê bibe nêzikbûneke gelekî kêm û teng. Gelek çavkanî hene ku netewe û netewebûyînê pêk tînin. Diyardeyên weke siyaset, huqûq, şoreş, huner, nexasim wêje, muzîk, bazara ekonomiyê hemû di netewebûyînê de rol digirin. Têkiliya neteweyan yekser bi sîstemên siyasî û ekonomîk re nînin. Dikarin tesîrê li hev bikin.

Netewe mijarek e ku têra xwe şîlo ye. Ji lewra gelekî girîng e ku mirov der heqê vê mijarê de hişyar û bi tewazun be. Civakên roja me ya îro bi piranî civakên netewebûyî ne. Herçiqas komên marjînal ên nebûne netewe hebin jî bi piranî civak netewe ne. Hema bêje ferdekî neteweya xwe nebe nemaye. Divê mirov netewebûyînê weke rewşeke xwezayî ya civakê bifikire. Tevahiya dîroka şaristaniyan netewe weke krîz bi tenê di sîstema kapîtalîst de qîmeteke xwe ya mezin çêbûye. Ya rastî, li ser navê netewe spekulasyonên xeternak ên ku hatine derxistin, felaketên mezin amade kirine.

Pir zêde destnîşankirin û balkişandina ser hêmanên ku neteweyê pêk tînin destpêka felaketane. Eger em mînak bidin, em

ê bibêjin; têkiliya di navbera netewe û siyasetê de hêmana sereke ye ku di pêkhatina îdeolojiya milletgiriyê de rol digire. Rawestgeha dawî ya siyaseta neteweyî wê desthilatdariya faşîzmê be. Netewetiya wêje, dîn û ekonomî sor dike wê heman encamê bide. Yekdestiya kapîtalîst li ser navê çareserkirina krîzan, rêya herî hêsan hildibijêre û bi tevahî hêmanên netewe pêk tînin ango ekonomî, dîn, huqûq, huner, spor, dîplomasî û li ser navê welatparêziyê çi hebe bi netewebûyîneke xurt digihîne yekparebûneke bi rêkûpêk û bi vî awayî faktoreke bi tenê ya civakê nahêle ku neke desthilatdar û li gorî her neteweyî dikare bihesibîne ku ew ê herî xurt e. Encamên vê gelekî bi tehlûke û xeternak bûne. Ewrûpayêveguherandine gola xwînê, li tevahiya dinyayê rê li ber şeran û encamên di dîrokê de nedîtî vekiriye. Ev çalakî netewebûyîn nîne; ev dîndarkirina neteweyê ye. Ev jî dînê milletgiriyê ye. Bi awirêsosyolojîk milletgirî dîn e. Ez ê di sernavê pêwendîdar de li ser vê mijarê rawestim.

Dîn bi xwe jî ji ber ku tehlûkeya qewmiyetgiriyê dizanin, bûne xwedî helwesteke hevgirtî û enternasyonalîst ango helwesteke ummetparêz. Di vê mijarê de dema herî kirêt a dîroka şaristaniyê dema kapîtalîzmê ye.

Ji bo neteweyan modela herî kêrhatî modela neteweya demokratîk e. Pir girîng e ku mirov fêm bike, di mijara netewe de civaka demokratîk di warê çareserkirinê de ew civak e ku dikare vê modelê pêşde bibe. Netewe, herî baş dikarin di sîstema civaka demokratîk de çêbibin û pêş bikevin. Weke amûra şer û pevçûnê na, bi têgihîştina dewlemendiya çandî piştgiriya hev bikin dibe û heta dikarin neteweyê netewan (neteweyê jor) weke qonaxeke dîrokî pêk bînin. Ji bo netewe nebin sedema şeran, di nava piştgirî û aştiyê de weke dewlemendiyeke çandî bi hev re bijîn hewcedarî bi sîstema demokratîk heye. Ji ber ku mijar gelekî girîng e, ez hêvî dikim ku her cara wextê wê hat, bi berfirehî guftûgo bikim.

Ji bo rizgarbûna ji pirsgirêkên neteweyê; divê mirov neteweyê înkar neke, faktorên ku wê pêk tînin zêde netewî neke, neteweyê bi faktorên ku wê pêk tînin rave neke, nexasim divê mirov wan bi rêya siyasî zêde neke destikê desthilatdariyên milletgir û li hemberî vê jî divê mirov têgihîştinaneteweya demokratîk û pêkanîna wê pêşde bibe. Rêbazeke bi vî rengî wê çareserker be.

**B- Binavkirina Dewletê**

Di dîrokê de û di roja me ya îro de têgîna dewletê têgîna herî zêde hatiye bikaranîn e. Lê dîsa têgîna herî kêm tê naskirin û binavkirin e. Têgînek e ku di nava tariyên kûr de hatiye hiştin. Der barê dewletê de cehalet û nezanîneke mezin heye. Bi qasî ku mirov dîrokê û roja me ya îro ji hev derxîne, dîsa ji bo rewşa civaka bi krîz li dawiyê bihêle, divê têgîna dewletê rast bi nav û şîrove bike. Ya herî xeternak jî ew e ku yên xwe dewlet dizanin amûra lê siwar bûne nizanin çi cure ye û yên li derve wê jî mane ango yên li pey wê diçin dewletê şaş bi nav dikin, nexasim mînaka viya ya berbiçav sosyalîzma pêkhatî ye ku di vî warî de felaketeke mezin e. Wexta rewş ev be, diyaloga di vî warî de dişibe ya kerr û koran. Yan jî dişibe aloziya piştî ku Birca Babîlê ya bi ser komên bi heftêûdu zimananên cuda dipeyivîn de ketî. Parabêhtir mirov dewletê weke qadekê difikirin ku lê pirsgirêk têne çareserkirin. Bûyîna di nava dewletê de bi rizgarbûna ji tevahiya pirsgirêkan re yek tişt tê dîtin. Jixwe gavek ji vê jî wêdetir dewlet weke dewlet-xweda tê tesewirkirin.

Têgihîştineke hûrûkûr a sosyolojîk wê nîşan bide ku tevahiya dîroka şaristaniyê xwedayetî û dewletdarî di zikhev de pêşketine. Fonksiyona rahib a di dewletbûyînê de sedema bingehîn a dizikhevdebûna dewlet-xwedê de ye. Wexta rahiban dewlet ava kirin, nexasim panteona xwedayan a di nasnameya perestgehên Sumeran de weke hêmaneke îdeolojîk cih girt, ji sedî sed weke maskeya îdeolojîk a rêveberên siyasî hat bikaranîn. Gaveke pêş a

qral-rahib qral-xwedê ye. Heta bi împaratoriya Romayê têgînên qral-xwedê yan jî împarator ên bi koka xwe ji perestgehên Sumeran hatin bikaranîn. Dînên Brahîmî ev têgîn weke xwedê-pêxember yan jî xwedê-qasid bi karanîn û bi vî awayî xwestin hinekî fîgurên insanî tevlî bikin. Di vê yekê de bi ser jî ketine.

Rewşeke balkêş, di mîtolojiya Yewnan de (versiyona sêyemîn a mîtolojiya Sumeran) cihêkirina ji hev a mirovtî û xwedayetiyê ye. Hesiodos di sîstema panteonê ya ku bi asta têgihîştina xwe çêkirweke ku têkilîdanîna xweda bi mirov re qedexe kiribe, xuya dike, şerm dibîne. Bi israr têkiliya xweda-xwedawendan weke kastekê digire. Kasta li cem Brahmanên Hindîdi vê mijarê de hişktir e, mîna pêjneke pirnisî ya qral-xwedayan e. İnsanbûyîna xwedê, têkilîdanîna bi însan re bi hêsanî qebûl nakin. Eger em bi zimanê zanistê bibêjin; di asta îdeolojîk de (di mîtolojî û dînan de eşkere, di felsefeyê de jî hinekî) xwe nadin ber ku qebûl bikin dewlet ji alî mirov ve hatiye avakirin. Hewl didin, dewletê qat bi qat piştperde bikin, dixwazin wê di rewşeke îlahî de bihêlin û bi vî awayî wê bi baweriyeke hişk û mezin biparêzin. Ji lewra têgînên weke dewlet mezin e, pîroz e, amûra bingehîn a rizgariyê ye û hwd. koka xwe ji rahibên Sumeran ên pêşî dewlet avakirin, digire. Di malzaroka perestgehê de hatiye avakirin ku min berê hewl dabû bi awayekî berfireh analîz bikim.

Eger em di çarçoveya ravekirina li jor de dewleta netewe ya ku Hegel bi Napolyon dayî destpêkirin û weke 'daketina xwedê ya rûyê erdê' destnîşan kir û dîsa di şexsê Napolyon de ew weke 'meşa xwedê' sembolîze kir, bibînin, em ê karibin gelekî jê hîn bibin. Dewleta netewe, şêweyê herî dawî yê dewleta xwedê ye. Di heman demê de şêweyê herî bi tehlûke yê dewletê ye.

Şîroveya zanistî ya sosyolojîk jî hînê nû hewl dide vê kulmoza têkiliyan (dewletê) bi nav bike. Ez yek ji wezîfeyên xwe yên bingehîn dizanim ku demeke dirêj li ser vê mijara biponijim, bi guftûgokirinê parve bikim. Ez hêvî dikim ku zêhnê mirov rohnî

bike. Eger mirov dewletê di çarçoveya deshilatdariyê de bi nav bike, heye ku bibe destpêkeke baş. Mirov dikare ji tevahiya şêweyên desthilatdariyê yên bûne huqûqî re bibêje dewlet e. Desthilatdariya di nava yekparebûna saziyên bi rêzikan diyarkirî û çarçoveya ku wan danî de xurt bûye, ji aliyê huqûqî ve dewletê baş rave dike. Lê dîsa jî têrê nake. Ji ber ku naverokê rave dikin û bi şêwe temam dikin, dîsa ji ber ku berfirehî û şêwe bi hev re digirin dest, hînê perspektîfeke temamkertir pêşkêş dike. Em kengî vê helwestê bi pêşketina dîrokî-civakî re bigihînin hev, em dikarin xwe bigihînin mane û vegotineke giranbuha û berfireh a binavkirinê. Haya min ji gelek binavkirinên dewletê heye. Dubarekirina klîşeyên demeke dirêj hem di kampa sosyalîst, hem jî di ya lîberal de hatine jiberkirin hînker nînin. Beriya her tiştî divê ez diyar bikim ka dewlet çi nîne.

a- Bêdengkirin an jî di tewazunekê (Status) de hiştina şerê çînî nîne. Weke amûrekî zextê yê çînî tê binavkirin û ev yek weke aliyê wê yê zêdetir derdikeve pêş tê nîşandan, lê ev têgîn pêşde nabe.

b- Rakirina ji holê ya rewşa kaosê nîne. Îdeayên wê yên der barê ewlekarî û nîzamê de ji rastiyê dûr in.

c- Qada çareserkirina pirsgirêk û hedefan hîç nîne. Berevajî platformek e ku pirsgirêkan dike kangren, dixe krîzê û wan dewam dike.

d- Têkiliya wê ya bi pîroztî û xwedatiyan re bi tenê mîtolojîk û îdeolojîk e.

e- Weke hêza rêveber û pêkhêner a çand, dîn û netewe ti tiştî îfade nake.

Pênasekirinên dewletê yên ku em bi van xalên hînê jî dikarinzêde bikin îfade dikin, bi giranî tevahiya wan propaganda ne. Dewlet bi rewşên behsa wan têne kirin re mijûl dibe. Lê dîrok nîşan dide ku bi tevahî dewletan naverast kiriye selexane, asîmîle kirine, civakên kesland afirandine û mirov kirine ehmeqê eqlê

spekulatîf. Ji van û wêdetir jî ti rola bingehîn pêk neanîne. Ez pozîsyona dewletê ya di rêveberina civakê de înkar nakim. Ez binavkirineke dewletê ya weke anarşîstan û şêweyê bê dewletbûnê, manedar û awayekî bi cihanînê nabînim. Mîna sosyalîstan, rastiya wan a derketiye holê ew e ku bi pratîka xwe ya sedûpêncî salî bi ser neketine. Di mijara dewletê de gelek rastî gotine, lê ev yek çewtiya wan a bingehîn ji holê ranake. Gotina lîberalan a ku dibêjin 'herî kêm dewlet'ji aliyekî ve manedartir e. Haya Lîberalan jê heye ku dewlet yekdestdariyeke ekonomîk e, xwe ferz dike. Lê ji ber ku bi heraret tînin ziman ku kapîtalîzm ekonomiya herî berdar e, eşkere dibe ku ew derewkerên mezin in û ji tevahî hêzên ku dewletê şaş binav dikin jî wêdetir pênaseyên wan ên dewletê tewş in.

Di çarçoveya maneyeke teng de mirov dewletê weke yekdestdariyeke ekonomîk a li ser berhemê zêde û nirxê zêde avabûyî bi nav bike zêdetir raveker e. Dewlet ji bo berhem û nirxê zêde ji civakê vedize, ji amûrên îdeolojîk bigire heta amûrên zorê, xwe li ser civakê mîna saziyeke avahiyeke jor rêxistin dike û dike yekdestdar. Eger em di çarçoveya vê binavkirina teng de li dewletê binêrin, li gorî analîzên dawî, polîtîkazanî û siyaseta dewletê koordînasyoneke hunerê rêveberiyê ye ku pê berhem û nirxê zêde bi dest xwe ve tîne. Eger em bi formulasyoneke hişkeber îfade bikin, em ê welê bibêjin; DEWLET = BERHEM Û NIRXÊ ZÊDE + AMÛRÊN ÎDEOLOJÎK + AMÛRÊN ZORÊ + HUNERA RÊVEBERIYÊ. Em dema dewletê di nava tevahiya pêşketina wê ya dîrokê de bigirin dest, em ê bibînin ku ev hêman hemû li ser kar in. Ji bilî van hêmanan an jî faktoran ne weke yekparetiyê, ne jî yek bi yek amûrbûnê mîna dewletê binavkirin, dikare derfetê bide ji bo guloka têkiliyan a bi navê dewletê ji hev derxîne.

1- Gotina dewlet desteserkirina berhemê zêde ye, rast e, lê binavkirineke gelekî kêm e.

2- Ji aliyê îdeolojîk ve bi awayekî xwedayetî, pîroztî yan jî weke siya xwedê ya li rûyê erdê (zîllûlah) û şêwegirtina wî bi awayekî berçav dîtin, ji kiras lêkirina îdeolojîk a li her cure zordariyê wêdetir, ti encamê nade.

3- Mirov dikare ji dewletê re bibêje zordarî ye, lê ev gotin hêmanên din di nava xwe de nahewîne, ji lewra pêşhukmekî exlaqî ye ku qîmeta wê ya zanistî gelekî kêm e.

4- Têgihîştinên ku dewletê weke hunerê rêveberiyê û îdarekirinê şîrove dikin, herî kêm bi qasî şîroveyên exlaqî hêmanên din ên dest ji wan nabe ji nedîtî ve tên, rûyê dewletê yê rastî vedişêrin û ji lewra jî şîroveyên bi tehlûke ne.

Bêguman her hêmanê hat diyarkirin di hebûna dewletê de cihekî xwe yê girîng heye, lê her yek ji wan bi serê xwe nabe ku weke dewletê bêne binavkirin. Şîroveyên di vî warî de têne kirin, hin ji wan hin hêmanên dewletê pêk tînin derdixin pêş û bi vî awayî yek ji ya din cihê dibe.

Mirov dikare dewletê bi awayê ku di tevahiya dîrokê de tê dîtin li gorî dabeşbûnên wê tasnîf bike.

a- Li gorî çînên civakî yên ku berhem û nirxê zêde ji wan tê vedidizîn:

1- **Dewleta Koledar**: Şêweyekî dewletê ye ku mirov ne tenê bi keda xwe bi tevahî hebûna xwe bi efendiyên xwe yên dewletdar û dewletê ve girêdayî ne û bi nanozikê dixebitin. Şêweyê bingehîn ê mêtinkariya serdema pêşî yê şaristaniyê ye.

2- **Dewleta Feodal**: Şêweyek e ku koletî bi sînor hatiye nermkirin. Cihêtiya serf ji koleyê kevn mafê wî yê malbat avakirinê ye. Herçiqasî di pratîkê de bicihanîna wê zor be û bi gelek şertan ve hatibe girêdan jî ji ber ku derfet daye berhem û nirxê zêde şêweyekî dewletê ye ku di şaristaniya serdema navîn de hatiye ceribandin.

3- **Dewleta Kapîtalîst**: Şêweyekî dewletê ye, xwe dispêre çîna civakî ya keda karker li keda bazarê weke mal difiroşe. Jêre

şêwe gotin pir li cih nîne, mirov jêre bêje beş an jî avahî duristir e. Dewleta serdema şaristaniya kapîtalîst e.

b- Şêwazekî din ê dabeşbûnê der barê hebûna etnîk a beşê rêveberan de ye:

1- **Dewleta Rahib**: Ji ber ku ji aliyê koma rahiban ve hatiye damezrandin bi vî navî tê hildan. Têgînên weke perestgeh, dewleta pîroz an jî dewleta xwedê di nava kategoriyê de cih digirin.

2- **Dewleta Xanedan**: Li gorî xanedanê di rêveberiya wê de cih digire tê binavkirin. Mirov dikare jêre bibêje dewleta ezbet û silaleyan e. Şêweyekî dewletê yê rêveberiyê ye ku di tevahiya serdemên şaristaniyê de û heta di nava dewletên roja me ya îro de jî gelekî bandora xwe heye. Dewletek e ku ji koma malbat an jî xanedanekî pêk tê.

3- **Dewleta Qewm an jî Eşîrê**: Dewleta ku zêdetir di bin bandora qewm an jî eşîrê de ye. Nexasim di serdema navîn de wexta têgihîştina qewm an jî eşîrê pêş dikeve xwe nîşan dide. Dewleta li cem gelek dîn û qewmên weke Xiristiyan, Îslam, Cihû, Hind, Çîn û hwd. dikarin di nava vê de bêne binavkirin. Di vir de dîn bi rola qewmkirinê radibe.

4- **Dewleta Neteweyî**: Di bingehê wê de civakên netewebûyî hene. Di çarçoveya maneyeke teng de dewleta serdema nû ye. Ne bi tenê serdema kapîtalîst, serdema demokratîk jî wê dixe bingehê xwe yan jî ya rastî rewşa dewletê ya welê ye ku pêre di çarçoveya dewlet + demokrasiyê de li hev dike û bi vî rengî di rêveberiyê de rol digire. Wexta herdu bi hev re dibin, ango rejîma dewlet + demokrasiyê bi hev re dimeşe jî mirov dikare jêre bibêje dewleta neteweyî. Ji dewleta netewe cihê ye. Ji ber ku di dewleta neteweyî de gelek netewe dikarin cih bigirin.

5- **Dewleta Netewe**: Di nava wê de neteweyeke bi tenê heye. Bi tevahî endamên netewe li ser hîmekî milletgiriya dînî xwe bi dewletê re yek dihesibînin. Weke dewlet û netewe bûbin yek. Şêweyê bingehîn ê dewleta şaristaniya kapîtalîst e. Dewleta faşîst

di heman demê de ji dewleta netewe re dibêjin. Di demên li dijî şoreşan an jî rejîmên krîzê yên domdar de di kapîtalîzmê de reng digire. Mirov herduyan nikare ji hev bike.

c- Şêwazekî din ê dabeşbûnê jî di warê neqandin û tayînkirinê de ye, ango ji bav derbasî kur dibe yan jî bi zorê diçe serê rêveberiyê:

1- **Dewleta Monarşîk**: Kesek weke sembol rêveberiyê temsîl dike. Di vir de dewlet û rêveber dibin yek. Ev rêveber dikare monark, qral an jî împarator be. Dibe ku ji bav derbasî kur bibe yan jî dibe ku bi darê zorê derbasî îdareya monarşiyê bê kirin. Di tevahiya serdemên şaristaniyê de ev hatiye dîtin. Ev yek di heman demê de qelsiya bisazîbûna dewletê nîşan dide.

2- **Cumhûriyet**: Koma sereke ya rêveberiyê bi hilbijartinê diçe ser kar. Kesek jî dikare were hilbijartin, hezar kes jî ev girîng nîne. Girîng be jî cewher naguherîne. Carnan cumhûriyet û demokrasî tê tevlîhevkirin. Ev şaşiyeke mezin û bi tehlûke ye. Cumhûriyet şêweyekî dewletê ye. Hilbijartin, ji bo rêveberiyên saziyên dewletê yên bi awayekî xurt hatine sazkirin, tê kirin. Naxwe weke rêveberiya gel ji bo demokrasiyê nayê kirin. Demokrasî sîstemeke pir cihê ye. Şêweyekî rêveberiyê ye ku di şêwazê dewletê de nîne. Hemin saziyên demokrasiyê jî hene. Ji bo van saziyan jî hilbijartin tê kirin. Lê dewlet û demokrasî weke cewher ji hev cihê dibin. Marksîst jî di navê de bi tevahî entelektuelên ronakbîr ev rewş tevlîhev kirine. Li cem Lenîn jî tevlîhevkirin heye. Di navbera şaristaniyên fermî yên kakilê dewletê pêk tînin û rewşa demokrasiyê de cudahiyên xisletan heye.

Ji lewra girîng e ku mirov rêveberiya demokratîk û rêveberiya dewletê (li cem herduyan hilbijartin bibe nebe) tevlîhev neke. Jixwe dewlet weke esas rêûresmeke rêveberiyê ye. Rêveberiyeke sazîbûyî ye ku xwe disipêre hezar salan. Fonksiyona hilbijartinê di rêveberiyê de gelekî bi sînor e. Ya rastî, ya bi hilbijartinan dibe ew

e ku KLÎKÊN YEKDESTDAR ÊN CURBICUR DI NAVA DEWLETÊ DE (klîka yekdestdar a cotkariyê, klîka yekdestdar a bazirganiyê, klîka fînansê yan jî îndustiriyê û hwd.) li gorî rewşa xwe ya hêzê yek serdestî ya din dibe. Kîjan klîk xurt be ew tê hilbi-jartin. Naxwe rewşek e ku bi navê demokrasiyê yan jî serketina demokrasiyê li naverastê tineye.

Di her demokrasiyê de jî şert nîne ku her kes mutleq bi hilbijartinê were wezîfedarkirin. Di demokrasiyê de kesên nehilbijartî jî dikarin di rêveberiyan de rol bigirin. Lê ya girîng ew e ku civaka demokratîkji bo şens bide, pêşketin û berdariyên cihê, afirînerî, maf, azadî û wekheviyan rêveberiya xwe, bi navberên kurt û bi hilbijartinan diyar bike.

d- Şêweyekî din ê dabeşkirinê li gorî komên nirxê zêde vedidizin e:

1- **Dewleta Cotkar**: Wexta ku ev dewlet cara pêşî hat damezrandin weke rêveberiyeke berhemê zêde yê cotkariyê desteser bike xwe bi rêxistin kir û ji lewra jî mirov fêm dike ka çima bi vî navî hatiye hildan. Tevahiya dîrokê gelek dewlet an jî klîkên cotkar ên li gorî hêza xwe di nava dewletê de cih girtin mirov dikare wan weke dewleta cotkar bi nav bike.

2- **Dewleta Bazirgan (Dewleta Merkantîlîst)** : Dewletek e ku bi rêya rêxistiniya bazirganiyê berhem û nirxê zêde bi rêbaza vedizînê desteser dike. Mînak di dîrokê de dewletên Asûr û Fenîkeyê ji vî cureyê dewletê ne. Di roja me ya îro de hînê jî dewletên klîka wan a bazirganiyê bi hêz, hene.

3- **Dewleta Fînansê**: Dewleta ku xwe dispêre hêza pereyan. Ji bo vê em dikarin Swîsreyê mînak nîşan bidin. Ji vê jî girîngtir, ji ber ku serdema dawî ya global a kapîtalîzmê weke serdema fînansê jî tê qebûlkirin, mirov dikare bibêje; di roja me ya îro de klîka fînansê ya malî û yekdestdariya wê di nava tevahiya dewletan de bi hêz dibe û li ser rêveberiyê dibe xwedî hêzeke diyarker.

4- **Dewleta Îndustriyê**: Nexasim bi şoreşa îndustriyê re hilberîna îndustriyel di ekonomiyê de bi roleke sereke rabû û ji lewra gelek dewlet hene ku bi vê xisletê têne binavkirin. Di sedsala 19. de ji bo gelekan îdeal bû ku bibin dewleta îndustriyê. Ji ber ku îndustrîbûyîn û dewlemendbûyîn hemnav bûn. Tevahiya dewletên dihatin avakirin dixwestin demekê berî demekê bibin dewleteke îndustriyê. Ji lewra klîka dewletê ya herî bi hêz ji îndustrîvanan pêk dihat. Di sedsala 18. de bazirganên mezin (merkantîlîzm), di sedsala 19. de sanayîvan (îndustriyalîzm), ji sedsala 20. heta roja me ya îro bi giranî maliyevan (fînansvan) klîkên bingehîn ên yekdestdar in, di nava dewletê de hêlîna xwe çêkirine. Guloka têkiliyan a jêre dewlet tê gotin, ya esas ji aliyê van klîkan ve tê rêvebirin.

e- Weke şêweyekî dabeşkirinê yê balkêş;ji bo sergirtin û veşartina yekdestdarên dewletên kapîtalîst bi rola amûrekî îdeolojîk ê sergirtin û veşartinê radibin,weha binavkirinên sexte yên dewletê hene. Bi van dewletên sexte dikin ku dewlet nabe êdî were binavkirin. Ev modelên qaşo dewletê ji avahiyên îdeolojîk pêk tên. Ji lewra mirov van modelan di ber çav re derbas bike, heye ku mirov ji wan hîn bibe. Ji ber ku atmosfera rojane bi van têgînan hatiye dagirkirin.

1- **Dewleta Lîberal**: Têgîna populer a îdeolojîk a ekonomîvan-polîtîkvanan e. Wergera vê; dewleta azad e, lê têgîna azadî û dewletê bi ti awayî li hev nakin, berevajî û dijberê hev in. Dewlet bi xwe tê maneya bisînorkirina azadiyan. Tevahiya dîrokê yek ji pirsgirêkên mezin;li hemberî dewletê parastina mafên kom û kesan e; ev têkoşîn di serê şerên huqûqî û siyasî yên bingehîn de hatiye. Her weha weke dewleta herî kêm li ekonomiyê mudaxele dike tê binavkirin. Lê ya rastî, dewlet tenê dikare bi yekdestdariya li ser aboriyê hebe. Ji lewra gotina 'dewleta herî kêm mudaxele dike' gotineke beredayî ye. Ev yek bi cewher û nasnameya dewletbûnê re li hev nake. Belkî jî bi vê têgînê weke dewlet, tê

xwestin pêşî li yekdestdarên ekonomiya kapîtalîst bê vekirin, para wan bê zêdekirin.

2- **Dewleta Sosyalîst**: Ev têgîna nexasim di kampa sosyalîzma pêkhatî de gelekî tê bikaranîn herî kêm bi qasî têgîna dewleta lîberal beredayî ye. Jixwe carek ti têkiliya sosyalîzma rastîn bi dewletê re nîne. Dewlet herî kêm bi qasî bi demokrasiyê re bi sosyalîzmê re jî li hev nake û dijhev in.

Gunehê herî mezin ê oportunîzmê ye ku dewleta ji tevahiya klîkên yekdastdar ên mezin ên ekonomîk ên dîrokî pêk hatî weke rejîma wekheviyê bi sosyalîzmê re tevlîhev kiriye. Diyardeya em behsa wê dikin weke 'Sosyalîzma firewnan' jî tê binavkirin û di roja me ya îro de berdêla vê gotinê dewleta sosyalîst e. Ji ber ku bi awayekî eşkere şêweyekî dewleta kapîtalîzmê ye bi proto-faşîzmê re jî gelekî têkildar e: ji lewra di sosyalîzma pêkhatî de berdêla dewleta netewe (faşîzm) tê. Dewleta netewe hem karektera rastî ya lîberalîzmê û hem jî weke sosyalîzma pêkhatî (sosyalîzma dewletê) karektera rastî ya sosyalîzmê ye, ji lewra gelekî girîng e ku mirov têkiliya wê bi faşîzmê re (di çarçoveya otorîtarîzm û totalîtarîzmê de) binirxîne û bi vî awayî mirovê karibe ji vê gelekî hîn bibe. Mirov dewleta lîberal û civakî yan jî sosyalîst di riya ber bi faşîzmê de weke pro-faşîzmê binirxîne, mirovê karibe gelek tiştan jê hîn bibe.

Yên alîgirên sosyalîzmê ne, divê baş zanibin ku ne bi tenê ya rêûresma kapîtalîst a çarsed salî, saziya sereke ya vedizîna berhem û nirxê zêde ya rêûresma şaristaniyê ya pênc hezar salî dewlet bi xwe ye û bi destê dewletê avakirina sosyalîzmê, eger bi zanebûn bê parastin ev yek faşîzm e, bi nezanîn bûbin destikê vê, xeflet û xiyanet e. Ez hêvî dikim ku van mijaran di parêznameya xwe ya bi navê Sosyolojiya Azadiyê de bi berfirehî guftûgo bikim.

3- **Dewleta Faşîst**: Têgînek e ku zêde maneya wê nîne. Di cewher de dewleta netewe û faşîzm yek in. Entelektuelên xwe lîberal û sosyalîst dihesibînin, faşîzmê mîna îstîsnayekê û fena

tiştekî li derveyî sîstema kapîtalîzmê bi nav dikin, ev yek bi rastî belengazî û perîşaniya wan a herî mezin e. Kapîtalîzm, dewlet û şaristaniyê weke dewleta netewe, ango her tim faşîzmê li ber derî digire û bi awayekî sîstematîk vê îfade dike. Faşîzm rêzik û pîvan in, bi avahiya demokratîk a ku îstîsna ye re lihevkirin e!

4- **Dewleta Demokratîk**: Me gelek caran diyar kir ka çima dewlet demokratîk nabe. Dewlet ji demokrasiyê ji aliyê zêhniyet, pêkhatina civakê û şêwazê rêveçûn û cewher ve cihê ye ji lewra dewleta demokratîk nabe. Di tevahiya dîrokê de weke faktoreke bingehîn, lê di roja me ya îro de ji ber ku şaristaniya kapîtalîst her diçe krîza wê ya pêkhatinê mezin dibe dewlet, neçar dimîne bi sîstema şaristaniya demokratîk re li hev bike. Ango dewlet bi serê xwe nikare rêve bibe. Hatiye rewşeke wisa ku bi hêzên demokratîk re ji neçarî rêveberiyê hevpar bimeşînin. Ji lewra lihevkirin mumkin in. Di dîrokê de jî gelek mînakên vê hene. Şêweyê wê çi dibe ew dizaneeger dewlet bi avahî û prensîbên demokratîk re li hevpariyê bigere û pêre şirîkatiyê deyne, mirov dikare bibêje ev dewlet li demokrasiyê vekiriye û têgîna dewleta demokratîk manedar bibe. Li gorî min binavkirina viya ya herî rast dewlet + demokrasî ye. Min berê diyarkiribû ku yek ji wezîfeya rojane (lezgîn) a felsefeya siyasetê ew e ku divê li ser şêweyên dewletê raweste. Ji ber ku bi mentiqê klasîk êdî civakên roja me ya îro mumkin nîne bêne rêvebirin. Bi vê sedemê rêxistinên civaka sivîl ketine dewrê lê têrê nakin. Rewşa heyî ya van rêxistinên civaka sivîl nîşan dide ku nikarin valatiya di rêveberiyê de tijî û parve bikin.

Avahiyên civaka demokratîk ên xwe bi awayekî radîkal rêxistinkirî û saziyên dewletê yên berdarkirî dikarin li hev bikin û ev bi tenê weke rêya derketina ji nava pirsgirêkan xuya dike. Eger di qonaxa dîrokî ya heyî de (kes nikare texmîn bike ku wê çend salan dewam bike) were gotin şaristaniya demokratîk bi tena serê xwe yan şaristaniya kapîtalîst bi tena serê xwe yan jî sîstema

sosyalîst bi tena serê xwe dikare bibe rêya derketina ji nava pirsgirêkan, divê em bi bîr bixînin ku gotinên bi vî rengî bi pratîkên bi gewde bûne encamên trajîk dane û îflas kirine. Ya bi bin dikeve civaka mirov e. Bi tenê temenê êş, xwînrijandin û mêtinkariyê tê dirêjkirin. (Ev mijar ê di Sosyolojiya Azadiyê de bi berfirehî wê bên guftûgokirin.)

Li ser dewletê hin têgînên din jî hene, ji vana ya di serî de tê têgîna dewleta huqûqê ye. Jixwe dewlet weke yekdestdariya ekonomîk berhemê zêde desteser dike û ji lewra di cewherê xwe de nikare adil an jî huqûqî bibe. Lê ji ber ku ji endam û welatiyên xwe re di çarçoveya rêzik û pîvanên diyarkirî de, li gorî qanûnên berê hatine destnîşankirin, bi qanûn û wekhev nêzî wan dibe jêre dewleta huqûqê tê gotin. Bêguman li gorî dewletên padîşah û despotan ên her gotina wan ferman e, an jî rojane qanûnan li hev çêdikin, mirov dikare vê erênî bibîne. Lê ji aliyê cewher ve şêweyekî cihê yê dewletê pêk nayne. Mînak, pênasekirina dewleta dîn zêde manedar nîne. Ji ber dewleta rahib, di tevahiya dîrokê de timî kirasê pîroztiyê li dewletê hatiye kirin û pêşkêşkirin. Dîn, mîtolojî, felsefe û heta ‘zanist’ amûrên îdeolojîk ên dewletê ne û binavkirinên bi vî rengî zêdetir di çarçoveya propagandayê de têne kirin. Dewleta laîk jixwe weke beramberê dewleta dînî fikirîne ku xwediyê heman maneyê ye. Bi armanca îdeolojîk ravekirinin dewletê yên weke dînî yan jî laîk ji propagandayê wêdetir nirxekî cîddî îfade nakin.

Weke encam em dikarin bibêjin; weke şaristanî û kakila dîroka şaristaniyê dewletê heta roja me ya îro xwe zêde kiriye û hatiye. Bi şêweyên bê hêjmar re li hev kiriye, timî xwe kamûfle kiriye û ji bo vê bi hostayî hewl daye. Di serdema şaristaniya kapîtalîst de tevî berevajîkirinên îdeolojîk hemûyan cara pêşî ye ku şens û derfet heye, dewlet di çarçoveya fonksiyona xwe ya rastî de were binavkirin. Ev binavkirin di encama hewldanên mezin ên zêhnî û çalakî de destketiyeke manedar a têkoşîna li dijî kapîtalîzmê ye. Li

vir pirsgirêka dijwar ew e ku di çarçoveya rohniya vê binavkirinê de bi şêwe û naverokên manedar (bi rêxistin û çalakiyan) serketin û pêşketina şaristaniya demokratîk hînê mezintirkirin û mayindekirin e.

### C- Îdeolojiya Şaristaniya Kapîtalîst (Modernîte) û Dînîkirina Wê

Şaristanî li ser hîmên avahiyên îdeolojîk û di demên dirêj de pêk tên. Pirsên weke 'Gelo pêşî çanda maddî tê yan jî çanda manewî piştre pêş dikeve?' ji bilî tevlîhevkirina mijarê pêve ti maneyê îfade nakin. Eger ez ji alema fizîkî mînakeke gerdûnî bidim mijar ê zelaltir bibe. Pirsa parçik an jî pêl pêşdatir e demeke dirêj rê li ber guftûgoyê vekir. Di encamê de bi giştî hat qebûlkirin ku di cewherê gerdûnê de dualîteya pêl-parçik ne tineker e,li ser esasên bi diyalektîkeke pêş dikeve rê li ber pêkhatinan vedike pêş dikeve. Di xwezayeke cihê de be jî dualîteya çanda maddî-manewî jî bi roleke bi heman rengî radibe. Ev, ne li dijî hev in, bandorê li hev dikin û hev temam, têr dikin. Hevdu cihêwaz dikin û diwelidînin. Her parçik an jî çanda maddî bi rêvekirin û livandina pêlokekê hêmanekî çanda manewî pêk tîne, hêmanekî çanda manevî û pêlokek jî hêman û parçikekî maddî pêk tîne. Bi giştî di sîstema şaristaniyê de ji rêderketinazêhnekî analîtîkheye. Ev jî ji ber sîstema wan a bi avantaj a ku ava kirine: bi rêzikên naguher in, bi qanûnên her kes divê guh bide wan, pêşdetirî û ebedîbûna xwedayan, mukemeliyeta mûtleq û îdealan, demborîbûna fenomenan, cewherê naguhere û şêweyê bi ber bayê dikeve diçe dualîteyên afirandî ne, ji bo ku berjewendiyên xwe sîstematîze û mayînde bikin. Ev, helwestek e ku bi diyalektîka pêkhatina gerdûnî re çep dikeve.

Di civakê de guftûgoyên li ser avahiyên jêr û jor têkiliya xwe ji nêz ve bi van avahiyên jirêderketî yên avahiyên şaristaniyê re

heye. Hegel sîstema xwe berê pêşî ji avahiya jor ango ji huqûq û dewletê dest pê dike. Çawa ku sîstema gerdûnî jî bi mejiyê mutleq (Geist) dide destpêkirin. Marks jî berê pêşî cih dide têkilî û hêzên hilberînê ku wan weke avahiya jêr bi nav dike. Herçiqas ew bibêje 'Min ew li ser lingên wê danîn' jî Hegel jî heman mentiqî parve dike. Ew jî çi ye? Dibeje; yek hêmaneke bingehîn e, ya din jî duyemîn e, yan jî ya diyarkirî ye. Ev mentiqekî çor ê cihêkirina ji hev a obje û sûbje ye. Herçiqasî berevajiyê wê îdea bikin jî zêhniyeta şaristaniya kevn dane dewamkirin. Tê pirsîn çima sosyalîzma Marks bi ser neket, bersiva wê di vê mentiqê de veşartî ye. Hem binavkirina wî ya ekonomiyê gelekî tevlîhev e, hem jî bi tevahiya amûrên maneyê yên şaristaniya klasîk dide rê. Herçend qehremanî bêne kirin û gotinên rast bêne gotin jî encam nîşan dide ku rastî hîç weke hatiye şîrovekirin nîne.

Şaristaniya kapîtalîst wexta xwe ava dike, wisa bi hosteyî xebatên avakirinê yên îdeolojîk dimeşîne û sîstematîze dike ku rahibên Sumeran li ber wan bi qasî sîsikê û nişûkê ne. Mirov dikare bibêje; berî şêwazê dewletê, bi îdeolojiyê ji gelek qonaxan bihuriye. Mîna ku ti şaristanî ji destê bi xwedayekî tenê derneketiye, lê xwe wisa rave dike, dide ravekirin. Ev hevok girîng in. Weke mînak em Hz. Muhammed lêbikolin. Di Quranê de ayetên pêşî û yên dawî ji aliyê naverokê ve cihê ne. Têgîna Xwedê timî pêşde dibin. Xwedayê pêşî bi tenê got 'bixwîne' paşê sîstem pêşde biriye. Ayetên parçe bi parçe sîstemê pêk tînin, ya rastî bingeha sîstemê bi wan tê danîn. Piştre kulliyateke mezin a îdeolojîk tê çêkirin. Avakirina sîstemê bi sedsalan girtiye.

Eger em heta ji her aliyî ve li sîstema modernîteya kapîtalîst serwext nebin em nikarin amûrên wê yên zêhnî analîz bikin û ji hev derxin. Modernîteya kapîtalîst bi tevahî têgîn, feraziye û kirinên xwe bi xwe ava nekirine; li ser mîrateya hezar salan rûniştiye. Bi vê mîrasê, gotin li cî be naverok û nîzamekî nû yê mîmarî dide mala xwe. Pêşî çîna xwe, paşê jî yek an jî bi çend

dewletên çînî yên weke xwe, avakirina îdeolojîk temam dike. Ji modeya xwe heta felsefeyê, ji kontrola hilberandina xwe heta bikaranînê û kontrola siyasetê avakirina xwe temam dike. Piştre vê yekê li parzemînan û her diçe bi awayekî global pêk tîne. Eger em bi awayekî hişkeber vê rêzê destnîşan bikin:

1- Di serî de R. Descartes û F. Bacon, avakerên îdeolojîk,di sedsala 16. de bi pêkhatinên xwe dan hiskirin, pîvanên nû yên mentiq û utopya ava kirin. Pir hêsan xuya bike jî xistina rojevê ya dualîteya ruh-beden, pêre wê dualîteya obje-sûbje bîne fikrên weke reaksiyoneke zincîrwarî pişrte hatin avakirin, heta bi pêşengiya 'kapîtalîzm, bûrjûwaziyê' ve birin. Bi qasî ku ji mentiqê feodalîzmê qut dibin, mentiqekî nû yê çîneke nû û her cure çalakiyên wê têne avakirin. Her weha ji vê jî girîngtir, li gorî çînên berê û nû yên ku wê çîna serwer a nû rêve bibe, pêşdetir bi ev avakirinên îdeolojîk tê bidestxistin. Lîstikeke berê ye, lê gelekî hatiye nûkirin û ji nû ve tê lîstin. Navê çîna nû ya rahiban zanyar û fîlozof in. Ji elba feodal û heta ji ya koledar timî têgîn û teoriyên nû têne girtin. Li gorî rewşê ev têgîn û teorî yan têne pînekirin yan jî ji wan modeleke nipînû (lê pîvan naguherin) tê çêkirin.

Eger em bi tenê Descartes analîz bikin, ma dibe ku em li hêmanên balkêş ên avakirina îdeolojîk hayil nebin. Descartes pêşî ji her tiştî şik û gumanê dike. Mirov şîfreya wî wisa dikare ji hev derxe: Dixwaze bibêje; zirxê îdeolojîk ê çîna feodal ango desthilatdariya wê divê li dawiyê bimîne û mirov jê bibihure. Eger viya eşkere bibêje; li hemberî wî engîzîsyon heye; tehlûkeya şewitandinê heye û ev wî diricifîne. Ji lewra jî neçare mîna ava bin kayê felsefeyê bike. Paşê dibêje; 'Ez difikirim wê wextê ez heme'.Bi vê îşaret dike ku amadekariyên îdeolojîk hatine kirin û wê hêmanên vê amadekariyê li pey hev bikevin dewreyê. Bi vî awayî ji her kesî re dibêje; 'Ji her tiştî gumanê bikin, hûn tenê bi fikrên bi hêz dikarin ji hebûna xwe piştrast bin'. Pir zehmet nîne ku mirov şîfreya wî welê ji hev derxe: Şêwazê ku jiyana feodalîzm ferz dike,

ti qîmeta xwe nîne. Jiyana nû hûn dikarin bi fikrên xwe yên bi hêz ava bikin. Bi dualîteya beden-ruh girîngiya vê dinyayê bi dengekî nizm bi bîra Xwedê û dinya din dixe. Xwedê piştî ku pêşî dilivîne û dileqîne, gerdûn timî xwe bi xwe bi awayekî mekanîk tevdigere. Eger em şîfreya vê hevokê jî ji hev derxin, em ê weha bibêjin; tevî ku afirînerên şaristaniya kevn esas in, şaristaniyeke nû ya dikeve navatevgerê heye, xwe bi xwe dikare şaristaniyeke nû ava bike. Eger em wergerînin zimanê tebeqeyî, çîneke nû derdikeve holê. Xwediyê wê hêzê ye ku bifikire; dikare dinya xwe bi tevger û qanûnên xwe yên çalakiyê bi rêkûpêk bike.

Eger bi kurtasî em hinekî analîza F. Bacon jî bikin, em ê bibînin ku di mentiqê wî de ceribandin esas e. Ya bi ceribandinê tê piştrastkirin weke rastiyeke giştî tê qebûlkirin. Fikra neyê ceribandin nabe zanist û ti qîmeta xwe nîne. Mirov şîfreya vê jî weha dikare ji hev derxe: mirov her tiştî bi pratîk û çalakiyê hîn dibe; ji fikrên berê yên beredayî bawer nekin, zanist hêz e; fikrên hûn bi ceribandin û çalakiyên xwe hînbûne yan jî neçarî hînbûnê, dikarin we bi hêz bikin. Şîfreya wê ya çînî jîmirov dikare weha ji hev derxe: ji hêzên nû re yên bi rêbazên yekdestdar ên kapîtalîst li ser berhemê zêde pêk tên, dibêje; 'Ne li gorî zêhniyeta berê, bi rêbertiya kara xwe her tiştî biceribînin, encaman pêşde bibin û giştî bikin; bi zanînê hûn ê bi hêz bibin û hûn ê mala xwe û dinya xwe ava bikin.'

Bêguman rast nîne ku mirov artêşa zanist û felsefeyê ya ji sedsala 16. û pêve mezin bû, weke hêza pêşeng a yekdestdariya kapîtalîst binirxîne. Em baş dizanin ku kesên di nava sê tevgerên dîrokî de cih girtine ango di nava Ronesans, Reformasyon û Rohnîbûnê de cih girtine, piraniya wan û ji nav wan ên ji aliyê kalîteyê ve bi giranî exlaqdar û zanyarên zêhniyeta azad bûn, ji lewra van kesan ji sîstemeke weke kapîtalîzmê ya hê ji derketina wê encamên wê diyar, ji klîka wê ya rêveber û şêwazê jiyana wê nefret kirine. Bêguman, şoreşa zêhniyetê ya li Ewrûpayê teqiya

nirxekî mirovatiya dinyayê ye. Piraniya pêşengên vê şoreşê humanîst bûn. Ji dîn û milletgiriyê dûr disekinîn. Jixwe xebatên zanist û felsefeyê bi xwe şoreş in. Şik têde nîne, eger wê ev bibin malê beşekî civakê, wê ne bin yên bi nirxên şaristaniya klasîk re heşrûneşr bûne, wê li cem yên hewcedariya wan bi azadî, wekhevî û demokrasiyê re hene, cih bigirin.

Ez wexta van rêzan datînim jî em minetdarên wan in. Pirsgirêk ev nîne. Çawa ku berhemê zêde ji xwediyên wan vedizîn weke hêzeke rêveber a çîneke nû ya civakî di avakirina xwe de bi kar anîn, berhem û nirxên zêde yên zêhniyeta vê çîna nû jî bi heman awayî desteserkirin û di avakirina zêhniyeta xwe de bi kar anîn. Ji vê çalakiyê re em bi hêsanî dikarin bibêjin diziya zêhniyetê ye. Bûrjûwazî jî ji her alî ve zanîbûn modernîteya nû li gorî berjewendiyên xwe yên çînî ava bikin. Divê mirov vê xisleta klîkên dewletên yekdestdar zanibe. Gotin li cî be ew ji cihê deh bê, nehan didin. Tengasiyên wan bi hostayî bi kar tînin (tengasiyên ekonomîk, civakî û siyasî) pêşengên zêhniyeta nû dikişînin cem xwe û çawa ku zanîbûn kesên li jêr ekonomî afirandin îstîsmar bikin, ew jî îstîsmar kirin. Gelek hunermend, zanyar û fîlozof kirin bin destê xwe û heta tevlî amûrên xwe yên desthilatdariyê kirin û bi vî awayî îstîsmara xwe meşandin. Dîsa baş dizanîbûn ku yên li ber wan rabin bi heman rêbazên ekonomîk, civakî û siyasî bê tesîr bikin. Em baş dizanin ku çi anîn serê yên mîna Erasmus, Galileo û Bruno.

Çawa ku bi yekdestdariya dewletê li ser ekonomiyê ji nû ve hakimiyet çêkirin, bi tevgera yekdestdar a îdeolojîk jî bi heman awayî bi bandor bûn. Serhildan hem di qada îdeolojîk, hem di qada siyasî û hem jî di qada ekonomîk de bi çalakiyên berfireh hatin tepisandin. Dema gihîştin dawiya sedsala 18.ne bi tenê li bereyê yekdestdariya ekonomîk (pîşekarî), li bereyê siyasî (Şoreşa Franseyê) û li bereyê îdeolojîk jî (milletgirî û dewleta netewe) têkoşîn bi ser ketin. Yên têkçûn Katolîzma Xiristiyantiyê, şêwazên

berê monarşî, împaratorî û humanîzm bû. Ekonomî çawa ji aliyê dijberên xwe ve hat daqurtandin, dewletên netewe û milletgiriyê jî tevgerên demokratîk û netewe xistin pêvajoya daqurtandinê. Ya para arîstokrasiyê, Dêra Katolîk û tevahiya Xiristiyantiyê dikeve jî bi qasî berê muteber nebe jî bi efendiyên xwe yên nû re hevgirtinê teze bike û bi qasî mumkin bibe di şertên berdar de li hev bike. Ango heta bi sedsala 19. serketin a yekdestdarên ekonomiya nû (bazirganî, pîşkekarî û malî) nîne. Serketina îdeolojîk jî herî kêm bi qasî wê girîng bû û têde bi serketibûn.

2- Şêwazê avakirina dîn a şaristaniya feodal ji hev dikeve. Protestanî encama vê bû. Dêra Katolîk rewşa wê ya bi heybet ji dest diçe. Exlaqê protestaniyê yê dixin şûnê, têra xwe li gorî kapîtalîzmê ye û jixwe Max Weber vê yekê bi awayekî bêqusûr nîşanî her kesî dide. Laîktî têgîna vê demê ye û serketineke îdeolojîk e ku divê ji hev were derxistin. Cîhana Xiristiyantiyê ku hînê piraniya wê qebîleyên azad bûn, bi dogmatîzmeke giran bi ser zêhnê gelên Ewrûpayê ve kumişî bû. Nakokiya wê ya bi dinyayê re eyan û beyan bû. Wexta giraniya xwe ya siyasî û ekonomîk nedima zehmet nebû ku ji aliyê îdeolojîk jê bibihurin. Ji vê girîntir jî ew laîktiya sosret bû. Herçiqasî weke gotin bê maneya 'derketina derveyî dîn' jî lê yek ji wan gotinêbi rastî çiqasî li derve û çiqasî di nava dîn de ye, şîlo ye. Burjûvaziyê diyardeya bi navê pozîtîvîzmê himbêz kir. Li gorî ku pozîtîvîzmê xwe weke dînê nû yê dinyayê îlan kir, gelo laîktî çiqasî li derveyî dîn bû? Dînê nû dihat çi maneyê?

Pozîtîvîzm xisleta xwe ya dînî ji pozîtîvîstiyê digire. Ji aliyê cewherî ve ji bo pozîtîvîzmê diyarde rastiya herî bingehîn e. Rastiya ne diyardeyî nîne. Jixwe bi tevahî lêkolîn û felsefe nîşan didin ku diyarde û hiskirin heman tişt in. Hiskirin jîfonksiyona herî hêsan a zêhn e. Di encama çavdêriya objeyê de pêk tê, bi awayekî herî seresere rêbaza zanînê ya hişkeber e. Ango şêwazekî ne zanistî ye û para xapandinê têde gelekî zêde ye. Mirov diyardeyê

bike pozîtîvîzm, mirov rola rastiya bingehîn dide objeyê. Di bingehê paganîzmê (pûtperestiyê) de jî heman fikir heye: objeyê dike mijara perestinê. Di vê rewşê de di serî de dîn, pozîtîvîzm çiqasî êrîş bibe ser metafizîkê, ew bi xwe jî ji ber heqîqetpariziya objeyê ketiye rewşa dînekî materyalîst ê herî hişk; ango di modernîteyê de şêweyekî nû yê pûtperestiya objeparêz e û weke nûnerê metafizîkê ye. Hem jî yê herî seresere ye. Nietzsche jî di heman qenaetê de ye. Ez ê vê mijarê di Sosyolojiya Azadiyê de bi awayekî berfireh guftûgo bikim.

Pozîtîvîzmê herî kêm bi qasî teolojiya serdema navîn zêhnê mirov xira kir. Haya xwe ji cîhana mezin a manewî ya civaka mirovan nebûn. Gotin dawiya cîhana metafizîk hat û bi yek carê pîroziyên mirovatiyê yên di encama mîlyonan salan de ketibûn serhev avêtin çopê û ser sergo. Bitemamî tevgereke nezan û cahilan bû. Gotin an jî navê Hz. Muhammed li Ebû Cehîl kir bi temamî ji bo van pozîtîvîstan li cih e: ji aliyê civaknasiyê ve Ebû Cehîlên hemdem in. Divê mirov baş fêm bike ku derketina derveyî dîn (laîkos) û tevî pozîtîvîzmê (felsefeya pozîtîvîst an jî dîn) materyalîzma çor (‘Zêhnê mirov mîna neynikê ye, bi tenê nîşan dide’) tevnên îdeolojîk in ku têkiliya xwe ji nêz ve bi yekdestdarên kapîtalîst re hene. Bi temamî ji demeke ji çarsed salan ve ye ku bi ev hersê versiyonên îdeolojîk civaka nû, dinyaya manewî ya civakê dihincirînin û tevgereke terorê li ser didomînin.

Eger civaka ku bi hezaran salan bi çanda manewî ango exlaqê hebûna xwe diparast ji hev neketa, kapîtalîzmê nikarîbû serketina xwe di warê çanda maddî de îlan bikira. Ji lewra serketina îdeolojîk hewce dikir. Dijberiya wan a dîn jî ji ber aliyê dîn ê exlaqî bû. Ev hersê felsefe di hilweşandina exlaqê civakê de gelekî bi bandor bûn. Civakên ji aliyê exlaqî ve pûç dibin an ji rê derdikevin an jî bi hêsanî teslîm dibin. Ya bû jî ev bi xwe bû. Laîktiyê bi derketina derveyî dîn, fazîleta exlaqî ya di dîn de hilweşand. Pozîtîvîzmê rê li ber pûtperestiya nû vekir. Civaka zêde dixwe, bi çavsorî bi kar tîne

û mîna serê xwe li ber eşya bitewîne bi dildarî dixwaze bibe xwediyê wê, mirov ji vê re dikare bibêje pûtperestiya modern. Bi vî awayî jî exlaq gelekî herişandin û pûç kirin.

Dijbertiya metafizîkê yek ji êrîşên herî cahilane yê pozîtîvîzmê ye. Metafizîk ji roja çêbûye ango ji roja çêbûna mirov û vir ve ji bo mirovatiyê hewcedariyek e. Ne bi tenê ji bo şaristaniyên li dora dewletan çêbûne, ji bo tevahiya mirovan û heta ji bo heywanên zêhnê wan pêşketî jî pêdiviyek e. Ti mirov bi temamî bi zanînê, de em bi zimanê pozîtîvîstan jî bibêjin; bi temamî bi zanistê, ne berê, ne jî di roja me ya îro de xwedî wê qabîleyetê nîne xwe ava bike. Ev bê îmkan nebe jî hêza mirov a zêhnî têra vê nake. Hûn cîhana wî ya metafizîk jê bistînin an jî jê bişon, wê meytê wî li Navînê bimîne. Yan jî wê mirovên harbûyî (Civaka Rojava têra xwe li vê diyardeyê şahidî kir) yên li ti pîvanê guhdarî nakin derkevin holê. Dîsa ya bû jî ev bi xwe bû. Jixwe diyarde bi tevahî her tiştê rastiyê nîne, bi tenê aliyê wê yê giştî teşkîl dike.

Kûantûm û kozmolojiyê hînê gotina xwe ya dawiyê negotin. Jiyan hînê ji hev nehat derxistin û hînê hay ji sirra wê çênebûye. Ji ber vê yekê, mirov ji pozîtîvîzmê re bêje cehaleta modern, heq dike. Materyalîzma çor jî ji wê cihê nîne. Pirsgirêkên zêhn û jiyanê ti carî nabe ku bi teoriyên neynikê bêne ravekirin. Ji ber ku ew gerdûnên welê ne ku zanist bi xwe jî her roj di wan de li mûcîzeyên nû rast tê. Jiyana civakî ji wan tevlîhevtir e. Kengî hat fêmkirin ku ev tevgerên cehaletê ne ku zû derketine holê û wê nebin navendên cazîbeyê, du sentezên sergirtî yê hersê felsefeyan xistin dewrê: mîna bi hev re nakok xuya dikin, lê di cewherê xwe de hevdu temam dikin. Ew jî milletgirî û enternasyonalîzma bûrjûwayê ne.

3- Globalbûyîn an jî Enternasyonalîzma Bûrjûwa: Di dîroka şaristaniyê de avakerên îdeolojîk bal û guhê xwe didin du tiştan: yên li qatê jor û sembolên nirxên hevpar. Ev di rewşeke welê de ne, sembola berjewendiyên hevpar îfade dikin. Îdeolojî her tim xwedî xisleteke sembolîk in. Ya girîng ew e ku berjewendiyê kê û çi tê

sembolîzekirin. Konseya xwedayan a li jorê Zîggûratê sembolek bû. Dîsa En, Enlîl û Mardûk desteya jor a hiyarerşiya bi sazî û mezin dibe, nîşan didin. Hemin em nizanin ev çiqasî bi zanebûn an jî xweber pêk hatiye. Lê rêûresmeke berê ye û xwediyê xisletên giştî ye. Ev bûyera sembolîzekirinê heta roja me ya îro hînê zêdetir tevlîhev dibe, vediguhere û tê dewrkirin. Ji bo yên li qatê herî jêr sembolên koletî û evdîtiyê têne çêkirin. Ji bo konseya xwedayên pîroz bi wan re neyê tevlîhevkirin sînorêngelekî eşkere û tûj têne danîn. Evd divê evdîtiya xwe bike û ti carî têkilî karê xwedayan nebe. Mirov xwe nagire û dipirse; mirovan, civakan bi van çîrokan çi ji dest dan û çi bi dest xistin.

Konseya yên li qatê jor a îro çi veşartî çi jî eşkere li deverên mîna Davosê bi rêkûpêk dicivin. Lê ev vebiriye: hêmanên tebeqeya jor ên roja me weke rewşa yên li qatê jor ê Zîggûratê rûdinên bêmaske û tazî ne û carcaran dikevin nava mirovan. Rahibên wan ên wezîfedar û hosta di van civînan de bi nazenînî tînin ziman ku hewce nake mirov ji wan bitirsin, rewşê timî di bin kontrolê de digirin, têra xwe amadekariyên wan ên şerkirinê hene û ji bo vê pêdiviyên xwe hilanîne û têkçûna wan divê ti carî neyê fikirandin. Di dawiya civînê de encama herî bi xêr ji bo her kesî tê derxistin. Rahibên neqane li gelek mekanan, ev îdeolojiya enternasyonalîst bi kanalên medyayê yên pêşketî, bi awayekî nedîtî zêde empozeyî zêhn û hisan dikin. Zanîngeh, mizgeft û dêr di vî warî de li paş mane. Serdema ragihandinê di heman demê de serdemaglobalbûnê ye. Kêf û şahiyên wan, zêde xwarin û bikaranînên wan, li gorî serdema dawî ya tevahiya şaristaniyan çawa hatiye wer dewam dike. Ya rastî cara pêşî ye ku hawîrdora ekolojîk tê tinekirin, lê dîsa jî naxwazin çilkek jî li nîzama dinya wan bikeve û qusûrek bê ser wan. Tevî ku civak, bajar, gund û demografya naqosan lê didin ku êdî bi vî awayî nikarin dewam bikin jî ji ber îdeolojiya wan a enternasyonalîst çavên wan kor bûne û guhên wan ker bûne. Seks-spor-sinaetê ku nava wan hatine

pûçkirin, bi awayekî har bi bikaranîna wan, ti civaka nikaribin bitevizînin hema bêje nemaye.

4- Milletgirî: Herçiqas berevajî xuya bike jî enternasyonalîstên qatê jor ji bo qatên jêr bitevizînin xwe hişk bi milletgiriyê ve digirin û weke amûrekî stratejîk ê dînekî nû yê ‘parçe bike û rêve bibe’ bi kar tînin. Hem ji ber pirsgirêkên amûrên îdeolojîk ên weke pozîtîvîzm, laîktî, materyalîzma çor û zanistiyê derxistî holê, hem jî ji bo kêmasiyên wan ji holê rake, amûrekî wê yê îdeolojîk ê bi tesîr e ku modernîteya kapîtalîst nikare bê wê bibe. Beriya her tiştî tek dînê bi tesîr ê dewleta netewe ye. Her serdema şaristaniyê li gorî xwe baweriyên wê yên bi tesîr hene. Ew nebin nikarin gavê bavêjin. Milletgirî qalibê baweriyê yê modernîteyê yê herî bi tesîr e. Avakirina wê gelekî hêsan e: Divê tu her hêmanê netewe pêk tîne bikî pîroziya baweriyê. Tu yê li tevahiya dibistan, mizgeft, dêr, malbat û xebatên din ên civakê wer li ser hûrûkûr rawestî wê bi namûsê re bikî yek û pê ferdê herî xemsar jî bi heyecan û çavsorî bikî. Ha wê demê te dînê herî bi tesîr êdî afirandiye. Weke tê yeqînkirin, dîn ne ji bo axretê, amadekariyên dinya din û baweriyê hatine avakirin. Ew bernameyên siyasî û stratejî ne. Weke îbadet jî amûrên perwerdeya rojane ne.

Tevî ku ser gelekî hatiye girtin jî meşandina analîzên dînî bi vî awayî yek ji fonksiyona bingehîn a sosyolojiyê ye. Naxwe wê sosyolojî ji şaxekî jêr ê zanistê pêve nikaribe bi ti rolê rabe. Jixwe pîroziyên dînan hene û gelekî girîng in. Derxistina holê û eşkerekirina van jî wezîfeyeke gelekî girîng e. Eger dîn bi rastî kiribin rewşekê ku bi pîroziyên xwe re îxanetê bike (pir eşkere dike) û eger kiribin amûrekî çor ê îdeolojîk, wê wextê weazkerên wê bi xwe yên nû ew xistine rewşekê ku bi minafiqiyê rabe. Bi kurtî mirov dikare bibêje di dîn de di roja me ya îro de milletgirî yek ji wan amûran e ku herî zêdê serî lê tê dayîn: ango amûrê amûran e. Di du mijarên ji niha û pêde ez ê li ser pêvajoya vê

pêkhatin û bikaranîna dîn rawestim, ji lewra ez niha bi tenê qîma xwe tînim bi nav bikim û jê bibihurim.

Modernîteya kapîtalîst bi qasî yekdestdariya ekonomîk bi sedsalan bandora amûrên wê yên îdeolojîk li ser zêhn, fikir û çalakiya azad heye. Hêsan nîne ku mirov zêhn, fikir û çalakiya azad ji bandora van amûrên îdeolojîk xilas bike, lê wezîfeya herî bingehîn a modernîteya demokratîk e. Ji ber ku bi awayekî bi tesîr modernîteya demokratîk ji aliyê îdeolojîk ve nehatiye avakirin, di serî de Marks û Marksîst, me anarşîst, utopyager, gelek terîqetên biratiyê heta bi sosyal-demokrat û rizgarîxwazên neteweyî bi tundî rexne kirin. Eşkere ye ku Marks û Marksîstan xwestiye li ber yekdestdariya kapîtalîst rabin, têbikoşin û helwestdar bin. Mirov meylên demokratîk ên din jî nikare piçûk bibîne. Lê wexta mirov bi roja me ya îro re li ber hev bigire dibîne ku kêm in, çewt in û bê çalakî ne; ev ji çi diyar e? Ev ji rewşa krîzê ya kûr û domdar a ku modernîteya kapîtalîst ketiyê, li gorî civakê rewşa wê ya ji rêderketî, felaketên wê yên bi serê hawîrdorê de anîne, xizanî û bêkariyê rê li ber vekiriye. Tevî van hemûyan jî dema xwe ya herî xweş li ser textê xwe, di vê demê de derbas kiriye.

Bereya şaristaniya demokratîk divê mîrasa rabihuriya xwe di tevahiya serdeman de baş di ber çavan re derbas bike, pêdiviya wê bi çi heye bigire, ya kêm jî divê bi rewşa berçav a rojane bi analîzê temam bike û gava xwe ya îdeolojîk serketî biavêje û ji vê lezgîntir û pîroztir wezîfeyeke din nîne.

### D- Ji Bo Bîranîna Qirkirina Cihûyan

-Çîroka Qebîleya Ibraniyan-

Ji ber ku min cih ji beşekî welê re vekiriye, heye ku hûn matmayî bimînin. Lê ez yeqîn dikim ku tam cihê wê ye û pêdivî pê heye. DERKETINA derveyî welat, girtina min û têkiliya qirkirina cihûyan bi milletgiriya dînê modern ê bi kapîtalîzmê re hincetên

girîng in ku em vê çîrokê bikin dabaşa vê parêznameyê. Wekî din ji ber ku entelektuel qirkirina cihûyan bu têrûtijî îzah nekirine, nexasim jî îdeologên Cihûyan divê der barê mijarê de bi awayekî samîmî rexne li xwe bigirin an jî rexne li xwe girtine û min nedîtiye ku bixwînim. Ji lewra jî ev sedem dikin ku ez weke parçeyekî girîng ê parêznameya xwe behsa vê çîrokê bikim. Ez hêvî dikim ku ez ê îzahên hûrgilî yên der barê mijarê de bi awayekî berfireh di parêznameyên xwe yên çar û pêncan de binirxînim û guftûgo bikim. Ez ê parêznameya xwe ya çaran bi navê LI ROJHILATA NAVÎN KRÎZA ŞARISTANIYÊ Û ÇARESERIYA MODERNÎTEYA DEMOKRATÎK û ya pêncan jî bi navê PIRSGIRÊKA KURD Û ÇARESERIYA NETEWA DEMOKRATÎK amade bikim.

### 1- Cihû û Şaristanî

Her entelektuelê bi dîroka şaristaniyê re eleqedar dibe, bi hêsanî dikare tespît bike ku rola Cihûyan nebîne wê nikaribe nirxandineke bi hostayî bike. Di parêznameyên xwe yên berê de bi saya agahiyên xwe yên bi sînor ez carnan di asta pêşnûmeyê de li ser mijarê rawestiyabûm, ji lewra ez ê niha qîma xwe bi xulaseyekê bînim.

Hz. Brahîm bavikê dînê Brahîmî tê qebûlkirin û agahiyên der barê nasnameya wî de weke nasnameya Hz. Îsa û Hz. Mûsa bi tayên mîtolojîk ve rêsayî ne. Ji lewra ji bo rastî baştir were dîtin hewcedarî bi lêkolînên berfireh ên sosyolojîk hene. Bi tevahî nîşane didin xuyakirin ku kesê bi navê Brahîmî tê bi navkirin bi rêveberê Ûrfaya îro yê ji Nemrûtên Babîlan re (fena walîyê eyaletan) dikeve nava nakokiyeke paradîgmatîk an jî ji ber hin sedemên din hebin jî nelihevkirin wer tê nîşandan. Brahîm ji bo nîşan bide ku pûtên li panteonê nikarin bibin xweda wan dişkîne, paşê ji bo wî biavêjin agir ji kelha Ûrfayê bi mencenîqê divirvirînin nava agir, lê agir vediguhere avê û Gola Masiyan a îro çêdibe. Çîroka mîtolojîk bi vî awayî dewam dike.

Xeta Ûrfa-Qudsê bi îhtîmaleke mezin di navbera du hêzên mezin ê wê demê de ango di navbera şaristaniya Xanedaniya Nû ya Misrê û Xanedaniya Babîl a Hemmûrabî de herêmeke tampon e. Bazirganî di dîrokê de cara pêşî ye ku weke sektoreke ekonomîk mezin dibe. Belkî jî bazirganiya di navbera herdu şaristaniyan de li ser siyasetê bi rolekê radibe. Çûnûhatina bazirganan bi lez dibe. Dema bi heybet a bazirganiya Asûran jî li vê dewrê rast tê. Her weha ji serdemên pêşî ve (ji derketina neolotîkê û ji demên avakirina bajarê destpêkê ve) Ûrfa-Quds-Şam-Heleb xeteke girîng a koçberî, bazirganî, dagirkerî û ji van jî girîngtir xeteke danûstandina dînî ye. Qadên em behsa wan dikin, xweber cihê derketina Hz. Brahîm û deverên pêşî yên koçberiyê nînin. Dîsa baş tê zanîn ku di derketina pêşî ya Îslamiyet û Xiristiyaniyê de jî ev xet bi rola xwe radibe. Ez bi hevokekê jî dixwazim behsa navê Brahîm bikim. Ev nav bi îhtîmaleke mezin navdanîneke Misriyan e. Kesên di Çola Sînayê re diçûn, ji ber gemar û toza li wan datanî Misriyan ji wan re 'Apîrû' digotin. Bi îhtîmaleke mezin navên Ibranî û Brahîmî ji navê Apîrû zêdebûne û veguherîne. Em ji cihê mayî dewam dikin. Brahîm berê dixwaze li nêzî Qudsa îrobi cih û war bibe. Desthilatdarên herêmê bi hêsanî destûrê nadin vê. Tê gotin; li wir hinek milk kiriye û li wir miriye. Çîrokên bi Sara, Hecer, Smaîl, Îshaq û Yaqûp dest pê dikin bi Hz. Mûsa, Îsa, Muhammed û bi xelekên sedan pêxemberên di navberê de dewam dikin. Her kesê bixwaze dikare van çîrokan di Pirtûkên Pîroz de (Ahdî Atîk, Ahdî Cedît û Quran) bibîne. Mirov dikare ji bi hezaran çîrokên ji van şaxê wan diçin, bi roman û pirtûkên dîrokê yên hatine nivîsandinpir tiştan hîn bibe. Bi awayekî giştî, têra min dike ku ez armanca xwe bi çendan deman rave bikim.

a- Dema yekemîn, çîroka Brahîm a li Ûrfayê û derketina wî ya ji Ûrfayê ye. Muhtemel e ev dem salên 1700-1600 B.Z. be. Brahîm bazirgan û serekê qebîleyê ye.

b- Dema esareta li Misrê. (1600-1300 B.Z.)

c- Derketina bi pêşengiya Hz. Mûsa. (1300-1250 B.Z.)

d- Bicihbûna li ser erdên soza wan hatî dayîn. Dema Fermandar û Pêxember Hz. Yeşû(1250-1200 B.Z.).

e- Dema Hakim û Pêşengan. 1200-1000 B.Z. Heta bi Qralê pêşî Saul dema pêşengên dînî (kahin) û laîk ên hînê nebûne qral û pêxember.

f- Dema Qralên Cihû û Îsraîlê. Dema bi Saul, Dawit û Silêman dest pê kir û bi Hezekîelê (dagirkeriya Asûrê) bi dawî bû.(1000-700 B.Z.)

g- Dagirkerî, îstîla, tehakum, berxwedan û derketina dîasporayê. 700 B.Z.-70 P.Z. (Dema hakimiyet û dagirkeriya Asûr, Babîl, Skender û Romayiyan).

Di vê demê de Qraltiya Cihûyan an jî Îsraîliyan hildiweşe. Li şûna wê du kom derdikevin. Yek hevkar e, ya din jî li ber xwe dide. Koma hevkar, nexasim weke alîgirê Grek û Persan bi du komên sereke derdikeve holê. Piştî Ûrfa û Misrê cara sêyemîn nefîkirina wan di dema Qralê Babîlan Nebûqednazar de pêk hatiye û bi qasî çil salan dewam kiriye (535-495 B.Z.). Hukmên di Pirtûka Pîroz de cih digirin û eşkereye bi bandora Zerdeştiyê ne, di vê demê de hatine girtin. Gelekî heyranên Persan in. Ji ber ku nefîkirina wan a çil salî dewam kiriye, bi dawî kirine. Nusxeyên nivîskî yên pêşî yên Tewratê di vê demê de ango di salên 700 B.Z. de hatine tomarkirin. Ango li derdora şeşsed salan (1300-700 B.Z.) di dest de ti nusxeyên nivîskî yên Pirtûka Pîroz tinene. Ev jî tê wê maneyê ku beşên pêwendîdar ên di hersê pirtûkên pîroz de xwe disipêrin vegotinên devkî yên şeşsed salî. Homeros û Hesiodos di heman demê de berhemên bi navê Îlyada û Teogonia'yê ji çîrokên bi heman rengî nivîsandine. Li derdora salên 70'î B.Z. û salên 70'î P.Z. Romayiyan Perestgeha Silêman du caran hilweşandin û vê yekê rê li ber berxwedanên mezin vekir. Xiristiyantî rêûresma berxwedanê ya beşê herî xizan e. Berxwedanên tebeqeya jor jî weke mînak a Makabiyan bi navûdeng in.

Bi dîasporayê, ango bi derketina derve, belavbûna qewm an jî qebîleyê piştî salên 70'î P.Z. zêdetir dibe. Belavbûn li cem yên di nava çanda Asûr, Ermenî û Grekan de dijîn pêk tê û zêdetir jî li du qadên Împaratoriyê yên Roma û Îranê têne dîtin. Ji vê dema dirêj re di heman demê de Dema Nivîskaran jî tê gotin. Ango Tewrat timî tê şîrovekirin û tomarkirin. Pêxember jî derdikevin. Lê nivîskarî hînê girîngtir dibe. Ji vê diyar e ku asta bilind a entelektueliyê di çanda Cihûyan de ji rêûresmeke girîng a dîrokî tê. Pîşeyekî din ê girîng jî herhal bazirganî û mijûliya bi peran re ye. Ji ber ku derfet û îmkan nedîtine li ser erdên cotkariyê debara xwe bikin, bi tevahî hêza xwe li ser bazirganiyê û amûrê bi tesîr ê bazirganiyê peran sekinîne ku ev jî ji nêz ve bi rewşa wan re têkildar e. Ji lewra mirov dikare bibêje; cihê Asûran girtine, li Rojhilata Navîn êdî yekdestdariya bazirganî û pereyan kontrol dikin. Ev rewş wan li bajarên serdema navîn û li dergûşa kapîtalîzmê li Amsterdam û Londonê gelekî bi tesîr dike û wan dike xwediyê kareke mezin, di heman demê de ev yek nîşan dide ku sermayedariya wan a mezin xwe dispêre rêûresmeke dîrokî ya dûrûdirêj. Tê texmînkirin ku li derdora Qudsê kêm mane û piraniya wan li dîasporayê belavbûne. Di çîroka belavbûna vî qewmî de wê du rêûresmên girîng ên çandî weke dîasporaya Rojhilat û Rojava derkevin holê.

h- Bi dîasporayê re êdî qebîle nînin. Ji ber ku weke gelek qebîleyan belavbûne. Ji lewra ji qebîlebûnê derketine û di asta çandî de weke komên çandî xuya dikin. Di vê çarçoveyê de mirov ji Cihûyan re gotina 'qewm' bi kar bîne wê bêtir li cih be. Nexasim li herêmên Erebistan, Îran, Kurdistan, Misr û Helenîstanê kom dibin û bi awayekî xwe bispêrin çanda qadê komên Cihûyan çêdibin. Dibin xelkekî xwedî du çand: ya bingehîn çanda Ibranî û ya din jî çanda civakên li cem wan bi cih dibin. Ev rewşa wan wê bandoreke erênî û girîng li ser qabîliyeta wan a entelektuelî bike. Ji ber ku bi tevahiya çandên herî qedîm ên dîrokê re dikevin têkiliyê.

Bi derketina Îslamê re demeke nû ya trajîk dest pê dike. Ereb bi Îslamiyetê neçarin gav biavêjin şaristaniya bazirganiyekê. Lê belê yekdestdariya bazirganî û peran li gelek herêmên Erebistanê bi piranî di destê bazirgan û serrafên Cihûyan de ye. Tê gotin ku Hz. Muhammed gotiye 'Divê Cihû li Erebistanê nemînin'. Herçiqasî guman li ser vê hedîsê hebin jî manedar xuya dike. Dijminatiya Ereb û Cihûyan heta kûrahiya dîrokê diçe. Hecer û kurê wê Smaîl weke du kesên nayên xwestin dişînin devera Mekke lê ye û ev yek jî nakokiya wê demê di navbera qebîleyên Cihû û Ereb de îfade dike. Berjewendiyên Cihûyan bi berjewendiyên bazirgan û şêxên Ereban re ji wê demê ve timî têne dijberî hev û di roja me ya îro de jî bi şerê di navbera Ereb-Îsraîlê û Filistîn-Îsraîlê de zêde dibe. Ev nakokiya ku kok û rehên xwe ji çavkaniya dîrokê ya li derdora 3500 salî digire di roja me ya îro de bi temamî veguheriye şerekî şaristaniyan.

Li herêmê reqabeteke dijwar di navbera yekdestdarên bazirganiyê de normal e. Sedema Îslamiyetê girîngî bi bazirganiyê daye, têkiliya Xetîce û Hz. Muhammed jî ji ber vê yekê tê fêmkirin. Di encamê de Cihû wê yan xwe li asîmîlasyonê biqewimînin, bikin hevkarên sûdewar (muhtedî)û li qadê bimînin, yan jî wê nefîkirina xwe ber bi qadên nû ve qebûl bikin. Herdu rewş jî derdikevin holê. Beşekî wan ê girîng hînê di dema Împratoriya Romayê de koçberiya ber bi Ewrûpayê dest pê dike zêde dikin û vediqetin, yên mayî jî weke muhtedî û nîvêsîr bi xûkiyê ve têne girêdan û jiyana xwe welê dewam dikin. Di serdema navîn de di dema şaristaniya Îslamê de, nexasim li herêmên Îran û Endulusê (Spanyayê) bi rola xwe ya dîrokî radibin ango bi rola xwe ya katiptî, bazirganî û serrafiyê radibin û hînê zêdetir bi navûdeng dibin. Derfeta wan çêdibe ku bi gelek hêzên siyasî re bixebitin. Pênaseya xwe ya entelektuel û bazirgan-serrafteqez didin qebûlkirin. Ji ber vê yekê jî li xezeba entelektuel û bazirganên li tevahî herêmên lê ne û herêmên din rast tên. Ev tê wê maneyê, dijminatiya bi Cihûyan re

ya ji dîrokê ve tê, sedemên xwe yên girîng ên maddî, çandî û dîrokî hene.

i- Di destpêka serdema nû de ji ber sedemên me destnîşankirî pêleke nefretê, gefxwarin û nefîkirinê wê li ser Cihûyan bi lez zêde bibe. Ji ber ku kapîtalîzm şaristaniyek e ku di malzaroka yekdestdariyabazirganî û pereyan de çêdibe. Her kesê di vê de zirara xwe hebe, wê entelektuel, bazirgan û serafên Cihû li pêşiya berjewendiyên xwe weke asteng nîşan bide. Cihû bi paradokseke xeter re rûbirû ne. Yekdestdarên bazirgan û serrafên neteweyên din ku berjewendiyên wan li cem pêşketinên kapîtalîst in, wê hêmanên Cihû li pêşiya xwe weke asteng bibînin. Pîşekar û cotkarên berê yên neteweyên ku berjewendiyên wan bi pêşketinên yekdestdarên kapîtalîst re dikevin nakokiyê jî wê bi hêsayî karibin Cihûyan weke tehlûkeyeyeke mîstîk nîşan bidin. Ji ber ku girêdayî sîstemê ne û hewceyî wê ne, li hesabê întelektuelan jî tê ku Cihûtiyê weke Qutiya Pandorayê ya tevahiya xirabiyan nîşan bidin. Bi van bandor û sedeman sedsalên 15. û 16. ji bo Cihûyan weke di dîrokê de hate dîtin dîsa dibe destpêka pêvajoya şaristaniyeke nû ya nefîkirinên nû û pogromên Cihûyan (komkujiyên Cihûyan) ên dijwar.

Di vir de ya seyr ew e ku hêza bazirgan-serraf û entelektuelên Cihû di avakirina vê şaristaniyê de çawa ku hêmanekî girîng in, lê di heman demê de herî zêde jî ew li xezeba vê şaristaniyê rast hatine. Paradoksev e. Di sala 1492'an de ne bi tenê Misilman, Cihû jî bi awayekî girseyî ji Spanyayê hatin avêtin. Ma ne ew bûn ên Îsa li çarmîxê xistibûn. Bahane amade û bi tesîr bû. Lê sedemên rastî weke ku me gotî ne. Li Polonya û Çartiya Rûsyayê jî pêvajo-yeke bi heman rengî diqewime. Li hemberîvan rewşan li welatên nû dicivin û di serê van welatan de Hollanda û Ingilîstan tên. Bi tevahî bazirgan, serraf û entelektuelên Cihû yên bi bandor ref bi ref diçin van welatan. Qismek ji wan wê koçîÎmparatoriya Osmanî ya bi monarşiya Ewrûpayê re di nava şer de ye bikin. Nexasim ji bo di

yekdestdariya bazirganî û serrafiya siltaniyê de cih bigirin, wê bêne qebûlkirin û ne tenê qebûlkirin wê bang jî li wan bihata kirin. Koçberiya ber bi Parzemîna Emerîkayê jî hêdî hêdî dest pê kiriye. Li bajarên Elmanyayê yên nû pêş dikevin, wê rewşa xwe ya di nava yekdestdariya bazirganên entelektuel û serrafan de roj bi roj xurtir bikin. Li vî welatî pir bi kok bi cih dibin û melezbûnek pêk tê.

Herçend hin entelektuel kapîtalîzmê bi Cihûtiyê ve girê bidin jî ev îdeayeke pir zêde nepixandî û mezinkirî ye. Bandorên wan hene. Kokên diyarkeriyê bêguman şertên civakên bi cihbûyî ne. Lê mirov nikare rola hindikayiyan a di sorkirin û handana mijaran de piçûk bibîne. Çi di pêşketina rewşa entelektuel a li Ingilîstan û Hollandayê de û çi jî di derketina kapîtalîzmê weke hegemonê sîstema nû de bandora banker, bazirgan û fîlozofên Cihû li van welatan têra xwe girîng e. Spinoza yek ji wan kesan e ku serdema nû di warê zêhnî de daye destpêkirin. Yek ji laîkên Cihû yên pêşî ye (Em vê laîktiyê weke kesên derketine yan jî derxistine derveyî sînegogê bi kar tînin). Yek ji fikirdarên mezin ên azadiyê ye. Felsefeya 'Fêmkirin Azadî ye' gelek tiştan deyndarê wî ye. Bazirgan û bankerên Cihû gelek deyn dan dewletên Ingilîstan û Hollandayê. Ev deyn di serketina şeran a van dewletan û bi hêzbûna wan de bi roleke mezin radibin. Li Parzemîna Emerîkayê, nemaze li Bakurê Emerîkayê di şerê serxwebûnê yê eyaletên Ingilîstanê de bi heman rolan radibin. Baş tê zanîn an jî divê were zanîn ku di pêkhatina DYE'ya îro de di serê hêzên bingehîn ên bi bandor de banker, bazirgan û entelektuelên Cihû tên.

## 2- Îdeolojiya Cihûyan

Ez divê di serî de eşkere bibêjim; li gelemperiya dinyayê pêşengiya îdeolojîk hînê jî di destê entelektuelên Cihû de ye. Reh û rîşên vê pêşengiyê yên kûr ên dîrokî hene.

a- Di demên destpêkê de di çêbûna çanda Cihûyan de şopên xurt ên du çandên mezin ên dîrokî, çandên Sumer û Misrê hene.

Ahdî Atîk, Tewrat nîşan didin ku qebîleya Ibraniyan ev herdu çand bi ziman û wicdanê qebîleyê dawerivandine hinavên xwe. Nîşane pir eşkere xuya dikin. Ji versiyonên pêşî yên van herdu çandan in. Ji çîroka Adem-Hawa bigirin heta bi afirandina dinyayê di nava heft roj û heft şevan de, ji têgîna Ellah bigirin heta bi têgîna pêxember ev her wisa ye. Em ji bîr nekin ku tofana Nûh efsaneyeke Sumeran e. Efsaneyên pêxember Eyûb û Îdrîs jî her wisa ne!Têgîna dînê yekxwedayî cara pêşî di dema Firewnê Misrê Eknaton de weke reformeke mezin xwestine biceribînin. Her weha Ûrfa navenda herî kevn a çanda Neolîtîk e. Îdeolojiya neolîtîk a ku hatiye veguherandin çavkaniyeke din a gelekî girîng e ku tesîra wê ji sedî sed divê mirov li ber çavan bigire. Li pişt îdeolojiya cihû du kom û zimanên mezin hene: Aryanî û Semîtîk. Mirov nikare rola van herdu çavkaniyên sereke di çanda Ibraniyan de piştguh bike.

b- Di dema pêşî ya nefîkirinê de bandora çanda Babîl û Zerdeşt (Pers-Med) gelekî eşkere ye. Gelek çîrokên wan ji ber vê çandê hatine tomarkirin.

c- Çanda Greko-Romen sêyemîn çavkaniya mezin e. Nexasim di pêşdebirina felsefeya dînî de bandora dema Greko-Romen diyarker e. Ango felsefekirina dîn, dînîkirina felsefeyê ya di naveroka Îslam û Xiristiyantiya serdema navîn de heye, bingehê wê di serî de Arîsto, Eflatûn û weke ekol di serî de Staoparêz xwe dispêre ekolên felsefê yên serdema helenîstîk.

d- Eşkere ye ku Xiristiyantî û Îslam, weke du mezhebên dînê Mûsewî yê Ibranî li gorî civakên Greko-Romen û Ereb çêbûne. Diyar e ku ji heman çavkaniyê tên. Nakokiya van herdu mezheban bi Mûsewîtiyê re ji ber xisleta xurt a qebîletiya Mûsewîtiyê ye. Mûsewîtî cara pêşî weke civaka qebîleya Ibranî, ji serê serdema navîn û pêve jî (tevî dîasporayê) weke dînê millî yê qewmê Cihû reng girtiye. Ya rastî, li pêşberî me rewşeke di zikhev de heye: qebîleya Ibranî = dînê Ibranî = Ibranî yan jî qewmê Cihû. Îdeolojiya cihû ji destpêkê ve xwedî naverokeke dînî ye û ew jî bi temamî

xwedî xisletên qewmî û qebîleyî ye. Îslam û Xiristiyantî jî li gorî pêdiviyên çanda manewî û maddî yên civakên qewmên ji nêz ve nakokî û têkiliyên xwe bi Cihûtiyê re hene, hatine avakirin. Her weha Xiristiyantî û Îslam hem gelekî ketine bin tesîra Cihûtiyê û timûtim jî pêre şerkirine.

e- Îdeolojiya Cihûyan di heman demê de ji aliyê çandeke hûrûkûr a maddî ve şikil girtiye. Me dît ku di vê çanda maddî de şaristanî çawa hatin binavkirin. Ji lewra îdeolojiya Cihûyan li herêma Rojhilata Navîn bi têkiliyên ji nêz ve yên tevahiya şaristaniyan şikil girtiye û îdeolojiyeke şaristaniyan e. Belkî bi formuleke em deynin em dikarin hînê baştir hîn bibin: Îdeolojiya Cihûyan cewherê senteza tevahiya şaristaniyan hildigire. Hêza xwe jî ji vî cehwerî digire. Di vê de rola nivîskar û pêxemberên Cihûyan ku tevahiya dîrokê pê rabûne, diyarker e. Dîsa ji ber van sedeman civakên pêwendîdar bi şaristaniyên xwe re çiqasî bi nakok û têkildar bin, ew çend jî bi Cihûtiyê re bi nakok inû pêre têkildar in. Encameke din a mirov dikare jê derxe ev e: Cihûtî ne tenê dîn û qewm e, mirov dikare wê weke şaristaniyê weke senteza şaristaniyê (weke bi ser wan ve bûyî) bi nav bike. Eger em rola îdeolojiya Cihûyan a bi hêzkirina avahiyên entelektuel ên şaristaniyan li ber çav bigirin, em ê baştir fêm bikin ka çima li gelemperiya dinyayê hînê jî bi hêza pêşeng radibin.

f- Îdeolojiya Cihûyan bi serdema nû re parçe bûye. Li ser xeta dînî û laîk veqetiyane, du şax berdane. Spînoza (1632-1677) serê şaxê laîk dikişîne. Bi heman awayî gelek fîlozofên bi koka xwe Cihû wê şaxê laîk timî xurt bikin. Jixwe cihê guftûgoyê ye ka laîktî çiqasî dînekî nû ye, yan jî çiqasî li derveyî dîn e. Ez hema yekser bibêjim; ez hilberandina fikirên dînî û fikrên li derveyî dîn weke xebateke îdeolojîk û civakî manedar nabînim. Ya divê mirov ji hev cihê bike, divê ev nebe. Xebateke bi vî rengî rohnî nake, gelekî bi sînor mirov hîn dike û heta têra xwe xisletên berevajîkirin û çeloxwarîkirinê di hundirê xwe de dihewîne. Mîtolojîk, dînî, felsefî û zanîna zanistî

her yekî ji wan berdêlekî wan ê civakî heye. Lê bi xebateke civaknasî mirov dikare rola wan, bingehê nakokî û têkiliyên wan ên civakî û siyasî bi hev re ji hev derxîne û zelal bike.

g- Di îdeolojiya Rohnîbûnê de bandoreke mezin a Cihûtiya şaxê laîk heye. Ev îdeolojiya ku em dikarin wê weke 'zanistiyê' bi nav bikin, li ser xeteke felsefî bi pozîtîvîzmê re hevser e. Ev ekola îdeolojîk a mohra xwe li serdema nû xistiye, bi navê zanistî û pozîtîvîzmê her çûye bûye baweriya dînî ya modernîteya kapîtalîzmê. Ez divê pir bi girîngî bibêjim ku pozîtîvîzm bi kirasekî nû yê cihê dînekî kevn e yan jî heman kiras e, kirasê dîn e, berevajî hatiye kirin. Di navbera têgihîştina qanûnan a zanistiyê û têgihîştina qanûnan a dîn de yekîtiyeke zêhnî heye. Ne dîn weke tê yeqînkirin têgihîştineke 'uxrewî' ye, ne jî laîktî têgihîştineke sekulerî 'dinyewî' ye. Di vir de cihêkirinek heye, li hev hatiye çêkirin. Dîn hemû bi dinyewîbûnê re têkildar in, girêdayî civakbûnê ne. Têgihîştinên ji wan re dinyewî tê gotin beriya her tiştî dinyewî nînin, bi civakbûnê re têkildar in. Têgînên uxrewîtiyet û dinyewiyetê nakokiyên ciddî yên civakbûnê vedişêrin û ji bo şer sergirtî dewam bike xizmetê dikin. Îdeolojiya Rohnîbûnê weke zanistî û pozîtîvîzmê her xwe bi sîstem kir, bû îdeolojiya fermî ya dewleta netewe ya nû. Ev jî dihat wê maneyê ku pir bi lez vediguherî îdeolojiya milletgiriyê.

### 3- Milletgiriya Cihûyan

Bazirgan û serrafên Cihû yên ji rêûresmekê tên di sîstema kapîtalîst de weke çîna bûrjûwayê rengekî modern digirin. Bûrjûwazî weke çîneke nû ya civakî îdeolojiya xwe ya fermî bi pozîtîvîzmê dibîne û têgihîştina li dewletê jî milletgiriyê bi xwe re tîne û ev yek jî têra xwe tê fêmkirin. Hem weke afirînerê netewe, hem jî îdeolojiya xwe ya nû bi vê rewşê baş bi hev datîne. Piştî ku bi tevahî hêmanên netewe pêk tînin neteweyî dikin bi yekdestdariya dewletê êdî zehmet nîne wan transferî

yekdestdarên ekonomiya serwer bikin. Yekdestdariya bi lez li cem her neteweya Ewrûpayê pêşket bi milletgiriyê karîbûn bi tevahiya netewe bidin daqurtandin. Çawa îdeolojiya Sumeran bi ser ket, em jî bi rewşeke bi heman rengî re rûbirû ne. Netewe weke hêmana herî bilind tê îlankirin (xwedayê herî kevn e yan jî li şûna xwadeyê herî kevn tê danîn). Dewleta di nava netewe de yekdestdariya li ser jiyana maddî zevt dike. Dibe hêza herî mezin a civakê. Wexta herdu digihîjin hev, dewlet-netewe weke dewleta berê ya qral-xwedê derdikeve holê. Ji bo bibe malê civakê jî pêdivî bi mîtolojiyan, di serdema kapîtalîzmê de pêdivî bi felsefeyê heye, pêdivî bi şêweyên wê yên vulger heye ji bo bibe malê tevahiya civakê. Ango hewcedarî bi şêweyên wê yên çor, hêsan û yên ji rêzê heye da ku karibe dakeve wê astê xîtabî hisan bike. Milletgirî bi awayekî mukemel bersiva vê pêdiviyê dide. Bi vî awayî civakên Ewrûpayê weke civakên neteweyî di lêgerîna xwe ya îdeolojîk a çarsed salî de digihîjin îfadeya xwe ya fermî. Milletgiriya netewe, netewa milletgir, dewletherduyan, dewlet jî yekdestdariya ekonomîk xwedî dike û bi vî awayî dinya nû misoger dibe. Bêguman di nava demboriya xwe de pêk tê. Wexta ku serdema milletgeriya bi heraret bi pêş ket li her alî ji hev cihêbûneke mezin a neteweyî pêk tê û bêguman îdeolojiya cihû hem wê gelekî jê bi tesîr bibe û hem tesîrê lê bike.

Têkiliya îdeolojiya cihû ji destpêkê ve bi awayekî berçav bi qewm û qebîleyê ango bi qewmtî û qebîletiyê ve bi hêsanî tê fêmkirin. Di çarçoveya milletgiriya qewm û qebîleyê de milletgiriya herî kevn e û ev yek xisleteke bingehîn û xwezayî ya îdeolojiya cihû ye. Di qonaxa bûrjûwabûyînê de yek ji wan îdeolojiyan e ku bi hêsanî vediguhere. Em dîsa bi paradoksekê re rûbirû ne. Hem tu yê ji îdeolojiya milletgiriyê re bavîtiyê bikî, hem jî yên nû zêde dibin wê te red bikin: çawa ku di qada maddî de, di qada manewî-îdeolojîk de jî ev paradoks pêşket. Bi tevahî milletgiran dest pê kir diranên xwe li bavê xwe (sedemên maddî yên îcbarî, bêguman ji

aliyê tercîheke kapîtalîst ve îcbarî) qirçandin. Milletgirên di her neteweya Ewrûpayê de ji pirsgirêk û astengiyên li pêşiya xwe yên weke îdeolojî, çanda maddî û netewe-qewm Cihû berpirsiyar dîtin. Çawa ku Xiristiyantî û Îslamiyet li pêşiya xwe astenga sereke Cihûtiyê dibînin, tevî ku bi koka xwe Mûsewî ne. Di vir de xusûseke di bingehê şaristaniyê de rol lîstiye û teza min piştrast dike heye. Ew jî ew e ku weke kakilê şaristaniyê dewlet yekdestdariyeke ekonomîk e. Li her devera ku lê dewletên nû têne avakirin di nava yekdestdariyên nû û kevn de pevçûn an jî şer neçar çêdibe. Yek heta ya din tine bike, teslîm bigire yan jî heta bê qîmet bike, neçare şer dewam bike.

Çawa ku ji bo qebîleya Cihû beriya 3500 salan meseleya 'erdên soza wan hatiye dayîn' hebe, di serdema milletgirî û netewe ya Ewrûpayê de jî heman pêdivî xwe bi dijwarî nîşan dide. Neteweyeke nû ya cihû tê maneya erdekî nû. Li gorî ku Ewrûpa timî li dijî Cihûyan e, ekoleke xwe dispêre 'erdên soza wan hatiye dayîn' neçar e ku derbikeve holê û bi pêş bikeve. Milletgiriya bûrjûwa ya Cihûyan ku jêre siyonîzm tê gotin bi vî awayî weke mînakeke bi tesîr a serdema milletgiriya sedsala 19. çêdibe.

Çîrok ji vir û pêve dikeve dîrokê. Ya divê mirov di vê mijarê de bi kurtî bibêje ev e: ji bo pirsgirêka cih û war çareser bikin pêdivî bi du dewletên gelek bi hêz ên demê heye: Elmanya û Ingilîstan. Franse ketiye rêza sêyemîn. Milletgirên Cihûyan di her bazk û şaxî de jî pir dixebitin. Tê zanîn çawa dewletên Ingilîstan û Hollandayê bi hêz kirine. Li Elmanyayê jî sermayedarên Cihû bi heman fonksiyonê rabûn û li ser kar bûn. Entelektuelên Cihû jî di çêkirina sermaya entelektuel de (îdeolojiya elman) gelekî kêrhatî ne. Împaratorê Elman bi saya van destekan du caran diçe Qudsê û eleqeya xwe ya ji bo tevgera nû ya welat nîşan dide. Eger Elman û Osmanî ji Şerê Cîhanê yê Yekemîn bi awayekî serketî derketibûna, Cihû wê bi parastina wan hînê zûtir û li ser hîmên hîn qehîmtir li Filistînê yan jî erdên berê vegeriyabûna. Bazkê herî bi hêz Îttîhad û

Teraqiyê elmangir bû û têkiliya wan bi Cihûyên Selanîkê û sermayedarên wan re hebû. Jixwe giraniyeke wan a bi awayekî rêûresmî li ser baskê Londonê hebû.

Em dîroka siyasî li hêlekê bihêlin ku mijareke gelekî berfireh e. Hîtler ji têkçûna Elmanan ji sedî sed Cihûyan berpirsiyar dibîne. Ew baş dibîne ku serdestiya Londonê ji milletgirî û îdeolojiya Cihûyan serbixwe nîne. Îxaneteke mezin li Elmanyayê hatiye kirin. Berpirsiyar jî Cihû ne. Bi vî awayî her neteweyê ku xwediyê heman pirsgirêkan e (Li Franseyê bûyera Dreyfus), dibe dijberê Cihûyan. Lê dibe ku berevajiyê vê were ispatkirin. Lê çima ev îdea hînê li tevahiya dinyayê weke mînak ji aliyê serokê dawî yê Komara Îranê Ehmedînejad ve jî tê pêşkêşkirin? Ev yek bi fonksiyona milletgirî û îdeolojiya Cihûyan a li dinyayê ve têkildar e. Hînê jî îdeolojiya pêşeng e, çawa ku di yekdestdariyênsermayê de pêşeng e.

Nabe ku Hîtlergirî were parastin. Qirkirin gunehê herî mezin ê mirovatiyê ye. Ev rastiyên civakî û însanî ne, nabe ku li ser wan bê axaftin. Rola rewşenbîrên Cihûyan di têkoşîna civaka demokratîk, wekhevî û azadiya bi esil a mirovatiyê de nabe ku piçûk bê dîtin. Em pêxemberan bidin aliyekî, di serdema nû de rewşa gelek şoreşger û entelektuelan a bi Spînoza dest pê dike û bi Marks, Freud, Rosa Luxemburg, Trostky, Adorno, Hannah Arendtû Einstein dewam dike diyar e. Aliyê sosyalîst demokratîk ê entelektueliya Cihûyan pir bi hêz e û haya min jê heye. Ez ê hukmê Adorno dubare nekim. Lê di qirkirinê de rewşa berçav a Cihûyan hem di qada maddî û hem jî di qada manewî de wê kengî bigihînin encameke çareserker û polîtîk û wê kengî rexne bikin, rexneyê li xwe bigirin û di pratîka wê de gavan biavêjin? Weke hêzeke îdeolojîk, hem ji ber rewşa wê ya pêşeng, heta milletgiriya cihû rast ji hev neyê derxistin, ne bîranîna qurbanên qirkirina Cihûyan wê weke ku hêja ye bê nirxandin, ne jî wê pêşî li qirkirin û komkujiyên nû bê girtin. Milletgiriya Cihûyan milletgiriya neteweyeke piçûk nîne, milletgiriya dinyayê ye. Bavê tevahiya milletgirî û

dewletgirên neteweyan e. Cihê xemê ye ku mexdûr û qurbaniyê herî mezin ê miletgiriyê bi awayekî di dîrokê de kêm tê dîtin, Cihû bi xwe ne.

Cihûtî weke pirsgirêk gelekî hatiye guftûgokirin; ji aliyê rewşenbîrên Cihû yên weke Marks û Freud ên li rêza pêş tên ve. Lê tevî vê, ev pirs bê bersiv e: çawa heta bi qirkirinê hatin? Eger bîranîna qurbanên qirkirinê bi nebûna hin qirkirinên din ve girêdayî be, ev yek ê çawa pêk bê?

Di parêznameya xwe de bi tevahî encamên ez gihîştimê li ser hîmê mînaka Cihûyan dikarim wisa formule bikim: Qebîleya Cihûyan dilê xwe bijand şaristaniya Sumer û Misrê. Berdêla vê dilbijandinê nefî û surgûn bû. Ev qebîleya piçûk û bi rik mîna ku ji tevahiya qebîleyan re pêşengiyê bike û ya wan nekiriye bi cih bîne, bi çavnebariyekê rabû û îdeolojî an jî dînê qebîleya xwe ava kir. Qraltiya Qudsê damezrand. Qraltiya ku damezirand hate hilweşandin. Rika xwe hinekî din jî zêde kir; li tevahiya dinyayê belav bû. Berê ji qebîleya xwe re paşê jî ji qewmê xwe re li cihekî geriya. Cih nedanê, nefî kirin. Ji bo têk neçin heta bi atomê daket, heta bi ezmanan çûn. Qebîle vê carê jî bi dewleta netewe ya piçûk bi pêşengiya şaristaniyê radibe. Belkî jî bi tevahî Rojhilata Navîn û heta dewlet û şaristaniya dinyayê ya ku jêre pîriktiyê dike, dikare hilweşîne. Lê wê wextê ew bi xwe jî namîne. Ji ber ku şaristaniya piçûk a Cihûyan cewherê şaristaniya dinyayê ye. Bêyî şaristaniya Cihûyan şaristaniya dinyayê, bêyî şaristaniya dinyayê jî şaristaniya Cihûyan nabe. Dersa herî mezin a ji qirkirina Cihûyan were girtin ev e.

Zanyaran ji mêj ve gotiye; tu nikarî agir bi agir vemirînî. Ji agirê şaristaniyê vêxistina agirên piçûk ên şaristaniyê (dewletên netewe, bi giştî yekdestdarî) rizgariyê nayîne. Tevahiya dîrokê pêşengên qebîle, qewm, xizan, mezlûm û koleyan ên li dijî şaristaniyê şer kirin an hatin kuştin an jî bi ser ketin. Yên hatin kuştin bîranîna wan nayê jibîrkirin. Lê yên bi ser ketin, ya pêşî

kirin ew bû ku xwe kirin şaristanî. Ji ber ku wekî din rê nizanîbûn. Pêşengên sosyalîzma zanistî yên bi ser ketin jî nikarîbûn nebin mînakeke qefesa hesinî ya modernîteya kapîtalîst. Yên li qirkirinê rast hatin jî ti carî nefikirîbûn ku ev yek ê bi serê wan de bê. Lê hat.

Di vê nuqteyê de ji sedî sed dilê min ji kesê ku xwe herî zêde antî-jenosîdvan dihesibîne zêdetir qurbanên jenosîdê fêm dike. Çima bi qasî ku ti Cihû fêm nake, ez fêm dikim? Ji ber ku heman sîstemê ez jî xistibûm nava çerxa xwe ji wê bonê. Bêguman, hêza ku çerxa sîstemê digerand jî dîsa hêza cihû bû. Ma gelo şerê desthilatdariyê yê wê îdeolojiyê, hêza wê ya afirandina şaristaniyê nebûya Xiristiyantî, Xiristiyantî jî nebûya Hitler wê bibûya? Milletgiriya elman a ku Hitlerî afirand çawa di îdeolojiya elman de her weha di nava îdeolojiya Rohnîbûnê de (pozîtîvîzm û biyolojîzm)kokên xwe dibîne, îdeolojiya cihû ku di Rohnîbûnê de rol digire û têkiliya wê bi milletgiriya cihû re bi vê wesîleyê (koka hevpar a Rohnîkar) di nava têkiliyeke diyalektîkî de ye. Ango qebîletî û qewmîtiya cihû çawa ku kokên milletgiriya cihû pêk tînin, qebîletî û qewmîtiya elman jî kokên milletgiriya elman pêk tînin. Bûyerên di zikhev de yên li Elmanyayê, ji ber yekdestdarên siyasî û ekonomîk ên di nava wan de rê li ber têkiliyên li hev geriyayî vekirine. Ev bûyerên dîrokî-civakî hemû têkiliya di navbera van herdu milletgiriyan de baş rave dikin. Ev herdu milletgirî heta li dawiyê neyên hiştin, qurbanên qirkirinê bi awayekî manedar wê nikaribin bên bîranîn û mirovatî wê nikaribe xwe ji qirkirinê bi vî rengî rizgar bike.

Bi heman awayî mirov dikare milletgirî û îdeolojiya ereb, milletgirî û îdeolojiya cihû bide ber hev. Encamên wê diyalektîk û balkêş in. Ew nebûna Îslam, Îslam nebûna ma wê Hz. Mihemed bibûna? Ew nebûna Baas, Baas nebûna wê Seddam Husên hebûna? Belkî bê gotin “tu totolojiyê dikî”. Lê ez van gotinên xwe li serada xwe ya analîzên şaristaniyê dixim. DYE hêza dinyayê ye, hegemon e û heta dikare bibe împarator jî. Niha ji bo Îsraîlê li Rojhilata

Navîn şer dike. Belkî sibê bi Îranê re jî şer bike. Dîsa tehlûkeya qirkirinê heye. Vê carê wê sîlehên atomê jî bêne bikaranîn. Pêşîgirtina li şerê nukleerî bi nukleeran! Kes nikare înkar bike ku ev tehlûke li ber derî ye. Jixwe Hîroşîmayek bes e! Analîza min rast e. Dema şaristanî dihat avakirin, gotin xwedayên li ezmanan wê diparêzin. Wexta hildiweşe xwe diavêjin bextê atomê. Qelpê wê hezar carî li şûna yê rast tê tercîhkirin. Ez behsa qralên tazî û xwedayên bêmaske yên li ser rûyê erdê dimeşin dikim û behsa brûska wan a atomê dikim.

Ez yek ji wan kesan im ku herî zêde dixwaze, weke mirovên gelekî zane li Rojhilata Navîn cihê Cihûyan hebe. Ji bo demokratîzekirina çanda Rojhilata Navîn, ji bo konfederatîfeke demokratîk a Îsraîl-Filistînê, Levîathanê bûye dêwekî global nikare bibe hêza çareseriyê. Ev cinawirê Cihûyan nav lê kirî çavkaniya rastî ya qirkirinê ye.

Çareserî bi şaristaniya demokratîk a Rojhilata Navîn dibe. Rojhilata Navîn bê Cihû çawa xirbe ye, Cihû jî bê Rojhilata Navîn her tim mehkûmê qirkirin û nefiyan e. Dîrok têra xwe bi dersan tijî ye. Rewşenbîrêncihû êdî baş hay ji xwe hene ku pirsgirêka wan ango ev pirsgirêk, pirsgirêka dinyayê ye. Divê mirov li Rojhilata Navîn li çareseriyê bigere. Divê em ti carî ji bîr nekin ku Rojhilata Navîn a demokratîk xeyal nîne, bi qasî nan û avê pêdiviya me pê heye. Divê Cihû baş zanibin ku hem ji bo bîranîna qurbanên qirkirinê û hem jî ji bo careke din neyên qirkirin divê rêya şaristaniya demokratîk a Rojhilata Navîn bibînin; bi tevahî gelên Rojhilata Navîn jî divê zanibin bê Cihû Rojhilata Navîn demokratîk nabe û lihevkirineke demokratîk a dîrokî rêya bi tenê ya çareseriyê ye û ji lewra jî divê bi her çar lepan li wezîfeyên avakirina civaka demokratîk xwedî derkevin.

### E- Di Moderníteya Kapîtalîst de Desthilatdarî

Têgînênên şaristanî, desthilatdarî û dewletê, çi di nava xwe de, çi jî ji ber rewşa wan a di nava hev de ji wê kategoriya têkiliyên civakî ne, ku analîza wan zehmet e. Şaristanî mijarek e ku guftûgo li ser binavkirina wê hînê jî dewam dikin. Desthilatdarî binavkirineke hînê pirsgirêkeke tevlîhevtir e; tê guftûgokirin; li ku dest pê dike, li ku diqede, kengî û çawa çêbûye û divê çawa bi dawî bibe. Di zimanê rojane de bi qasî av û hewaya mirov dide û distîne, behsa navê wê tê kirin, lê dîsa jî yek ji wan mijaran e ku mirov herî kêm li ser hemfikir in. Ev yek, ne bi tenê ji ber ku mijarên pir bi sir û tevlîhev in wilo ye, ji ber ku li ser wan gelek xebatên îdeolojîk têne meşandin û hez dikin ew her welê bimînin, wisane. Ji bo mirov ji tiştekî bêne tirsandin şertê pêşî ew e ku divê ew tişt pir bi sir û tevlîhev bê kirin. Eger rûyê wan ê rastî derkeve holê her kes ê henekê xwe bi wan bike. Ew êdî nabe faktorekî tirsê. Bi vî awayî wê armancên komên ku ser berjewendiyên wan digirin jî têk biçin. Di nava gel de li ser vê mijarê gelek çîrok têne gotin.

Pêşî bi çîrokên wê yên mîtolojîk şaristaniyê didin destpêkirin. Yekdestdarên berhemê zêde yan jî klîkên berjewendîparêzbêyî di nava van çîrokan de cih bigirin, bi darê zorê bi tenê çend caran dikarin talanê bikin. Ji bo bêne qebûlkirin û mayînde bibin, ji sedî sed pêdiviya wan bi mîtolojî, dîn û huqûqê heye. Di roja me ya îro de tevî van hêmanan hemûyan, sê S'yan ango seks, spor û seneatê populer dikin, bi medyayê pêşkêş dikin, civakan ji aliyê zêhnî û hisî ve çawa dixwazin welê ber didin wan, bi vî awayî hewl didin xwe bidin qebûlkirin û mayînde bikin û vê yekê misoger bikin.

Min hewl da, dîroka şaristaniyê dabeşî sê demên sereke bikim û her demê weke pêşnûmeyê pêşkêş bikim. Min bi hostayî anî ziman ku ez zêde guh nadim rêbazên 'zanistiyê', lê bi şertê bi sînor bê bikaranîn, ev rêbaz dikare bi feyde bin û çi qasî bêne dogmatîzekirin ewqasî gefê li şensê jiyana azad dixwin. Min bi hostayî hewl da rêbaza şîroveya sosyolojîk (bi zanistî, bi

pozîtîvîzmê) bêyî dogmatîze bikim bi cih bînim. Şîroveyên min bi xetên sereke û gelek mînakan li her cure guftûgoyê vekirîne û bi vî awayî hatine pêşkêşkirin. Ez gelekî dubare dikim, tevî vê jî eger zêde hewce neke, ez ê bi baldarî rabim da ku weke hîn bûme dubare nekim.

Tevî ku min hewl da modernîteya kapîtalîst (şaristanî, bi medeniyetê re bi heman maneyê) weke modernîteya (hemdem) serdema nû (ji sedsala 16. P.Z. û heta roja me ya îro) ya fermî û serketin bi dest xistî analîz bikim, min hewl da serdema me bi temamî nekim malê kapîtalîzmê û di warê antî-modernîteyê de jî min rexneyên berfireh kirin. Tevî ku ez binavkirina modernîteyê ya civaknas Atony Giddens qebûl dikim jî ez şîroveya wî ya di warê ‘sê nedomdaran’ de bi temamî parve nakim. Sê nedomdar kapîtalîzm, dewleta netewe û îndustriyalîzm bûn. Min bi gelek mînak û şîroveyên berfireh pêşkêş kir ku reh û rîşên hersê nedomdaran heta bi destpêka şaristaniyê diçin û bi pêşketina xwe ya ji wê demê ve bi modernîteya kapîtalîst gihîştin halê xwe yê herî bi hêz. Di vî beşî de tiştê ez ê zêdetir bikim ev e; ez ê modernîteya fermî, (modernîteya ne fermî ye, hemdemiyê weke modernîteya demokratîk, medeniyet, şaristanî an jî weke hemdemî bi nav dikim. Hemû di heman maneyê de ne.) têkiliyên desthilatdarî û dewletê, hîn berçavtir çawa şêwe û şikil didê rohnî bikim.

1- Civaknasên pozîtîvîst (A. Giddens û yên weke wî) di her dema dîroka şaristaniyê de û di tîpa xwe ya tekane de şaristaniyên xwe bê hemta şîrove dikin û yeqîn dikin ew jî sosyolojiyê dikin. Mînak ji bo şaristaniya Ingilîz û dewleta wê weke şaristanî û dewleteke xweser bi nav dikin û ji bo vê jî xwe ji kirina hezaran lêkolîn û analîzî paşve nadin. Di deryayê de çiqas xîçik hebin li cem van jî ewqas lêkolîn hene! Ya rastî, di vê xebata bi navê zanistê de bi şê-weyekî, ava bin kayê, berevajîkirina zanistê heye. Eger em vê rewşê bişibînin rewşekê, em ê bibêjin; bi daran dikin ku daristanê wenda bikin! Em bi mîlyonan daran bixin ber lêkolînê em nikarin

daristanê bi nav bikin. Ji serî ve, diyar e ku ev rêbaz nagihîje encameke rast. Lê belê bi deh hezaran ciwanî bi kar tînin ku ew bawer dikin civaknasiyê dikin û bi vî awayî karektera rastî ya sîstemê piştguh dikin û ya rastî ev jî polîtîkayeke xirab nîne. Zanistên civakî yan jî bi giştî mirov dikare weke sosyolojî bi nav bike, naveroka wê bi vî awayî pûç û bê mane dikin.

Ya rast ew e ku dewleta Ingilîz, desthilatdarî û şaristaniya wê jî nûnerekî hegemonîk ê şaristaniya çemê mezin û sereke ye; ji pênc hezar salan bi pêşketineke bi xisletên xwe yên bingehîn (çîn-bajar-weke yekdestdariyeke ekonomîk dewlet) ên kategorîk ve girêdayî ye; ji sedsala 10. ve çîna li dora bajarên ji nû ve geş dibindestpêkê weke arîstokrasî û qralan, ji sedsala 16. ve jî yekdestdariya dewlet û ekonomiyê weke bûrjûwayê xwe li hev ba didin, xwe bi gelek kirasên îdeolojîk dinixumîne, xwe dike sir û dike ku neyê dîtin an jî xwe bi hezaran sembolan dixemilîne û dike ku bi zehmetî were fêmkirin. Dewlet û şaristaniya Ingilîz ya ku mînaka destpêkê ye an jî yek ji mînakên destpêkê ya vê pêşketinê ye jî yek ji temsîlkarên hegemonîk ê çemê sereke yê şaristaniya heta roja me hatiye. Ez yeqîn dikim ku bi vê hevoka bi navkirinê, mirov dikare têkiliyên lihevgeriyayî û badayî yên Ingilîz ji hezaran lêkolînê çêtir rave dike. Rahibên Sumeran bi hezaran kevalên wan hene ku li ser wan bi tevgerên stêrkan civakê şîrove dikin, ma di cewherê xwe de çi cudahiya van ji şîroveyên deh hezaran rahibên zanistê yên modernîteya kapîtalîst heye. Ango di warê komên berjewendîparêz ên sereke de ku vedişêrin, di navbera wan de ti cudahî nîne. Bi tenê ji aliyê rêbazên lêkolînê, zeman û mekan ve cihê ne.

Me eşkere û bi girîngî anî ziman ku cihêtiya zeman û mekan ji aliyê gerdûnî ve tê maneya çêbûna pêşketin û veguherînê. Civak jî di çarçoveya cihêtiya zeman û mekan de pêş dikevin û vediguherin. Hin caran dibe ku civak berepaş jî biberidin û biçin. Ez rewşên xweser rexne nakim; di gerdûnê de pêşketin û veguherînên xweser

nînin. Her veguherîn tê maneya xweseriyê. Bi heman awayî xwe dubarekirin bi tenê qîmeteke xwe ya baweriyê ya dogmatîk heye. Di tevahiya bûyerên xwezayî de 'heman dubare' ya gotinan lîstikeke ziman e ku maneya wê nîne.

Di çarçoveya vê maneyê de bêguman xweseriyên gelekî girîng ên modernîteya kapîtalîst hene. Ev xweserî li gorî binavkirinên Antony Giddens di sê qadên girîng de pêk hatine. Bi vî awayî wê weke 'nedomdar' binavkirin an jî weke têgîn anîna ziman, dibe ku mirov hîn bike. Me kapîtalîzm di nava xweseriyên wê de bi taybetmendiyeke wê şîrove kir û mînak da, lewma ez ê dubare nekim. Lê mijara dewleta netewe ku bi awayekî berçav û huqûqî têgîna desthilatdariyê îfade dike, wê gelekî me hîn bike ku em bi cewherî û xulase bînin ziman.

2- Me gotibû, yek ji mijarên zanista civakî herî zêde behsa wê dike û di berevajîkirina cewherê wê de pêşbaziyê dikin, desthilatdarî ye. Ya hatî gotin rexneyeke li ser qestê nîne. Yek ji xisletên herî xweser û qabîliyetên modernîteya kapîtalîst ew e ku bi qasî ti şaristaniyê bi awayekî berfireh nekiribe, kiriye ku her ferd xwe xwedî desthilatdarî bihesibîne û bibîne. Mijara herî zêde divê mirov li ser raweste, ev e. Civaknasê Fransewî M. Foucault herî zêde serê xwe li ser vê mijarê êşandiye, lê dîsa jî bi temamî ji heqê wê nehatiye der. Lenîn di berhema xwe ya bi navê 'Dewlet û Şoreşê' de xwest dewletê pênase bike. Lê hînê li ser xwe bû, fêm kir ku mijara herî zêde têde xapiyaye dewlet e. Jixwe nexwest desthilatdariyê nas jî bike. Ev 'kevirê avzûnkirî' yê zilamê bihêz û xasûk bi maskeyên cûrbicûr ên şaristaniyan heta roja me ya îro anî, di avakirina sosyalîzmê de bi kar anî. Ew sosyalîzma diviyabû ku bi temamî bi modernîteya demokratîk bihata avakirin, ev xebata bingehîn a civakî ji destpêkê ve bi 'desthilatdariya sosyalîst' hat pûçkirin û Lenîn ev fêm nekir.

Ez gotineke M. Bakunin a tê vê maneyê gelekî manedar dibînim: 'Zilamê herî demokrat, taca desthilatdariyê deynin serê

wî, wê di nava bîstûçar saetan de bibe dîktatorekî rezîl' yan jî 'wê exlaqê wî xira bibe'.Divê mirov sosyolojiya desthilatdariyê bike û ev kar hînê weke wezîfeyeke bingehîn a zanistî ji bo analîzkirinê li pêşiya me ye. Gelo desthilatdarî çi ye, gelo hewce dike, nake? Ev mijarên civakî ne yên ku herî kêm tên zanîn. Li gorî hin zêhniyetan û komên feydeya xwe di bin zêhniyeta xwe de vedişêrin, desthilatdariya mutleq çareseriya mutleq e. Wer xuya ye ku fikra Asûr ev e: bi tevahî standina canê hedefê. Yên desthilatdariyê bi tevahî weke nexweşiyekê dibînin jî hene. Nexasim anarşîst û pasîfîst bi vî rengî li dabaşê dinêrin. Li gorî wan mîna mirov ji şewbê û webayê bireve divê ji her cure hêz û otorîteyê bireve. Ya rastî, ev têgihîştin şêweyê berçav ê radestbûna desthilatdariyê ye.

Çareserî û binavkirina sîstema şaristaniya demokratîk ji aliyê wesifkirinê ve cihê ye. Mafê parastinê yê her koma civakî pîroz e. Li hemberî her cure êrîşa li ser hebûna komekê û nirxên bi ser hebûna wê ve hebûna hêza parastinê, ji bilî mafekî dest jê nayê berdan, sedemeke hebûnê ye. Ez bawer dikim ku bi maneya klasîk wê ji hêza parastinê re desthilatdarî neyê gotin. Belkî jî li cih be ku mirov bibêje hêza parastina demokratîk yan jî otorîteya wê. Gul bi stiriyan xwe diparêze. Wexta mirov vê li ber çav bigire, ez hez dikim ku ji vê paradigmaya otorîteya demokratîk re bibêjim 'teoriya gulê'.

a- Mirov desthilatdariyê di çarçoveya şaristaniyê de weke her cure xebatên civakî yên ji bo bidestxistina berhemê zêde û pirkirina wî fonksiyonel bike bi nav bike, ev binavkirineke li cih e. Ji xebatên îdeolojîk heta bi xebatên eskerî, ji çîrokên mirovan pê dixin xewê heta bi qirkirinan, ji lîstikên kêfê heta rîtuelên dînî bi tevahî tevgerên civakî eger bi kêra vedizîna berhemê zêde û nirxan tê di çarçoveya analîzên dawî de mirov dikare wan weke xebatên desthilatdariyê bi nav bike. Desthilatdarî di çavçoveya vê maneyê de qada xebateke berfireh a civakî ye. Nexasim di civakên

şaristaniyê de desthilatdarî timî bi berfirehî û kûrahî li gorî zêdebûna rêjeya berhemê zêde bi meyla mezinbûnê radibe.

Eger em têgînên berhemê zêde û nirx zelal bikin, çarçoveya desthilatdariyê wê baştir bê fêmkirin. Eger em çalakiya bi darê zorê ya desteserkirinê û bi sazîbûna wê ya li ser destketî, sermiyanê maddî û manewî û bi tevahî nirxên çandî yên kes û koman weke 'hunerê desthilatdariyê' bibînin, wê 'yê bi dest dixe' û 'yê bi dest dikeve' bi awayekî berçav zelal bibe. Tevî ku yê wê nîne, desthilatdarî timî hin tiştan bi darê zorê bi dest dixe, yê xwe dihesibîne, asîmîle dike, dike milkê xwe, dike welatiyê xwe û di rewşên berevajî de dîsa bi darê zorê diavêje, surgûn dike, bê cih û war dike, bê kar dihêle, bê mal dihêle, bi awayekî giştî ji aliyê maddî û manewî ve huner û çalakiya bê qîmetkirinê ye. Eger mirov vê yekê bi tenê bi çalakiya desteserkirina nirxan û berhemê zêde bi sînor bike, wê ev bibe helwesteke teng. Di vê mijarê de bi destxistin esas e. Lê li ser vê rêyê bi hezaran nirxên din jî têne desteserkirin ku mirov ji van re bi giştî bibêje desthilatdarî, rastir e.

Fonksiyona bingehîn a otorîteya demokratîk jî ew e ku yekser an jî ne yekser êrîş li hebûn û hebûna kom û kesên pêwendîdar hatibe kirin divê nirxên wan ên maddî û manewî biparêze, çavên xwe li bidestxistina wan negire, dîsa li wan vegerîne. Ango ji her aliyî ve bi fonksiyoneke pozîtîv a hewce, mafdar û dest jê nabe re têkildar e. Otorîteya demokratîk di çarçoveya vê naverokê de hunerê ketina nava çalakiyê ye. Di cewherê xwe de jî mirov jêre weha bibêje rastir e: pêşîgirtina li bidestxistinê û hunera çalakiya wê ye. Di warê bidestxistina welat û çalakiyên ji bo pêşîgirtina bidestxistina welat de ji aliyê bi karanîna hêzê û hunerê wê (artêş-şer) ve cihêtiyeke ontolojîk (hebûnî) heye. Herdu jî têgînên dijberî hev in. Di nava civakê de rewşên bi vî rengî bi têgînên bingehîn ên dualîte yên weke qencî-xirabî, xêr-guneh, rast-çewt, heq-neheq, xweşik-krêt têne îfadekirin.

b- Li gorî nêrînên li desthilatdariyê mirov wê dikare ji gelek aliyan ve dabeş û tasnîf bike.

1- **Desthilatdariya Siyasî**: Şêweyekî desthilatdariyê ye ku herî zêde tê bikaranîn. Fonksiyona birêvebirin û rêveberiya dewletê û yên li ser şopa wê (mînakên dewletê yên partî û civakên sivîl esas digirin) îfade dike. Di dîrokê de herî zêde ev şêweyê desthilatdariyê hatiye bikaranîn, gelekî li ser hatiye rawestîn û herî zêde diyarker e.

2- **Desthilatdariya Ekonomîk**: Çalakiya bi rêvebirin û bidestxistina nirx û berhemê zêde ya hêzên yekdestdar îfade dike. Di tevahiya dîrokê de gelek şêweyên wê hatine meşandin.

3- **Desthilatdariya Civakî**: Rêûresm û çalakiya hêzê ya beşên bingehîn ên civakê li ser hevdu ava dikin, îfade dike. Di vê de malbat, çîn, cinsiyet, koka etnîk û gelek cudahiyên din ên girîng hene. Divê mirov hinan ji wan cihê bigire dest û li ser bisekine. Di malbatê de bav, di çînayetiyê de yê berhemê zêde bi dest dixe, di cinsiyetê de mêr, di etnîsîteyê de etnîsîteya serdest desthilatdariyê temsîl dike.

4- **Desthilatdariya Îdeolojîk**: Bi maneya zêhniyeta rêveber e. Kes û komên di têkiliyên çand û zanistê de pêşketî ne, xwediyê desthilatdariya îdeolojîk in.

5- **Desthilatdariya Eskerî**: Saziya herî zêde li rêza pêş bi desthilatdariyê re wekhev tê dîtin e. Di vî şêweyî de herî zêde desthilatdarî heye, herî zêde dijberê civakê ye, herî zêde dijberê mirovatiyê ye. Diya tevahiya desthilatdariyan e, ya rastî ew bavê tevahiya desthilatdariyan e.

6- **Desthilatdariya Neteweyî**: Di çarçoveya netewe de desthilatdariya navendî îfade dike. Bi hostayî û nazenînî hewl dide xwe weke yek û parçe nabe îfade bike. Mirov dikare jêre bibêje serweriya neteweyî ye.

7- **Desthilatdariya Global**: Împaratorî yan jî pozîsyona modernîteya hegemon û şaristaniya serdest îfade dike. Di roja me

ya îro de modernîteya kapîtalîst di rewşeke welê de ye, vê desthilatdariya xwe bi pêşengiya DYE'yê bi yekdestdariya ekonomîk a global û dewletên netewe dimeşîne. Gelek şêweyên bi vî rengî yên desthilatdariyê mirov hînê jî dikare dabeş bike.

3- Desthilatdarî tevahiya têkiliyên dîrokî-civakî û saziyan e. Bi awayekî dîrokane li ser qad û şaneyên civakî yên sedema man û nemanê ne, bi cih dibe û hewl dide xwe bike rêûresmeke domdar. Rêûresm tê maneya bisazîbûnê. Desthilatdarî pir girîngiyê didin sazîbûnê û heta qadeke welê ye; têkiliyên civakî bi protokolê ve hatine girêdan. Pêwendîdarên wan, ew gelekî fonksiyonel kirine, ji lewra jî şêwe û bisazîbûnê pir baş bi protokolan ve girê didin, ji ber ku temsîliyet û domdarî xwedî girîngiyeke man û nemanê ne. Mînak di avakirina desthilatdariyên siltanan, destguhertin, teslîmkirin û bidestxistina wan de xeml, sembol û protokolên mezin hatine lidarxistin. Ji cil û bergên wan heta bi xwarinên wan, ji zewacên wan heta bi mirinên wan her têkiliya wan beriya bi hezaran salan ji şêweyekî rêûresmê tê. Ji lewra jî her kes weke dixwaze bi hêzekê nikare bibe desthilatdar. Wê ji wan re bibêjin bû eşqiya yan jî despot. Ya rastî, rûyê herî xuya û rûyê eşkere yê desthilatdariyê eşqiyatî û despotîzm e. Lê ev saziya desthilatdariyê gelekî pîroz û bilind kirine, ji ber ku nexwestine bê gotin; 'kum ket xwarê serê keçel xuya kir'. Ji lewra jî ji bo rêzdarî û domdariya bisazîbûyî ya desthilatdariyê bi dijwarî li ber van şêweyên desthilatdariyê radibin. Serwext in ku bi giranî bi saya van sembol û rêûresman desthilatdarî rewa dibe.

Min di parêznameyên xwe yên berê de desthilatdarî şibandibû guloka berfê. Ez niha vê teşbîha xwe ji nû ve bi bîr dixim. Yekdestdarên berjewendîperest ên civakên şaristaniyê yên xisletên dîrokî bi destxistine û li hev badayîne, ji serê çiyê mîna gulokeke berfê digindirin her diçe mezin û dijwar dibin. Ev desthilatdariyê îfade dikin. Dîrok jî xwedî pergal û nîzamekê ye ku bi vî awayê me destnîşankirî diherike.

4- Eger mirov desthilatdariyê bişibîne nexweşiyeke vedigire wê baştir were fêmkirin. Ango desthilatdarî mîna şewbê yeû vedigire. Ev nexweşiyeke civakî ye; di destpêkê de 'zilamê bihêz û xasûk' bi serê xwe nêçîr, paşê danehevên jin-dayikê desteserkirin. Ev nexweşî; pêşî di nîzama hiyerarşîk a bavik de rahib (kesê xwediyê maneyê) + rêveber (kesê bi tecrûbeyên xwe civakê rêve dibe) + fermandarê eskerî (kesê xwediyê yekdestdariya hêzê) hat sazîkirin. Bi avabûna çîn û bajêr jî xwe kirin dewlet. Lê hema yekser divê ez bibêjim; çawa ku tê yeqînkirin, bi avabûna desthilatdariya dewletê re nîzama hiyerarşîk a bavik ku ji aliyê zilamê bihêz û xasûk ve hatibû avakirin, ji holê ranebû.

Vê carê em dikarin desthilatdariyê weha formule bikin: desthilatdarî = zilamê bihêz û xasûk + baviktiya hiyerarşîk + dewlet. Ev sê saziyên bingehîn, civaka desthilatdariyê îfade dike. Vê nîzamê ku ji gelek avahiyên qatê jêr û jor pêk hatiye, weke kategorî bi giştî em navê şaristaniyê lê dikin. Li qatê zemîn ekonomî heye, li qatê jor jî konseya xwedayan heye. Sumeran şaristanî bi vî awayî ava kirin. Şêwe guherî, lê cewherê wê xwe her xurt kir û maneya xwe parast. Li qatê zemîn, tevahiya dîrokê di serî de karker, serf û kole, mirovên di berhemê zêde de hatin bikaranîn hene. Kesên xwedî pîşe yên weke cotkar, pîşekar û pîşesazên serbest jî li vî zemînî xwediyê çalakî û îcrayê ne. Li qatê jor jî xwedayên mîtolojîk, xwedayên bi tenê (carnan siltanên siya wan an jî pêxemberên qasidê wan, carnan jî şaman û rahib rûdinên), qanûn û fikrên rêveber (îdeaya Eflatûn) cih digirin.

Di serdemên destpêkê û navîn de desthilatdarî bi van saziyên bingehîn û xisletan bi şêweyêdewletê xwe îcra dikir, lê di serdema modernîteya kapîtalîst de tevahiya civakê li desthilatdariyê gerandin. Bi gotineke din; tevahiya civakê bi nexweşiya xwe desthilatdarî dihesibîne xistin. Bi rêya saziyên Antony Giddens ji wan re dibêje; 'nedomdar' desthilatî hat belavkirin û ev her çiqasî nexweşiyek be jî ya rastî xweseriyeke modernîteya kapîtalîst e. Di

vê mijarê de hin îdeolojî û sazî bi roleke diyarker radibin. Ez ê van xusûsan di beşê ji niha pê de bigirim dest û li ser rawestim.

Bêguman wexta desthilatdariyê bi tevahî civakê dixin, ev nayê wê maneyê ku gelekî bi hêz bûye. Di heman demê de tê wê maneyê ku gelekî neçar e, belengaz e, di pêvajoya jihevdeketinê de nêzî qonaxa dawî û leza dawî bûye. Di her tiştî de wexta tişt digihîje hedê xwe du tişt diqewimin: ya/yê pêwendîdarî wî-wê di rewşa dawî de yan divê pê bike dike; yan jî yê-ya pêwendîdarî wî-wê tiştekî neke û ew tişt ê birize. Mînak wexta sêv gihîşt û baş sor bû, ya divê mirov bike ew e ku wê ji çiqlê wê bike. Eger ev neyê kirin, piştî demekê sêv ê birize, kurmî bibe, pûç bibe û biqede. Mînak belkî çor bû, lê ji bo desthilatdariyan li cih e. Jixwe diyardeya desthilatdariyê wexta hat avakirin nexweşiyek bû, bi modernîteya kapîtalîstgihîştiye asta rizînê,bêhn pê ketiye, genî bûye. Bi gotina Bakunîn dest-hilatdarî ewçend riziyayî ye ku bi qasî bikaribe mirovê herî bi exlaq û saxlem jî nexweş bixe riziyaye.

Bi temamî weha tê gotin: ‘Wexta mirov taca desthilatdariyê deyne serê mirovê herî demokrat wê di nava bîstûçar saetan de wî bike dîktatorekî herî rezîl.’ Ev rast e. Ev desthilatdariya dirize weke tacekê deynin serê jina herî bindest, ew ê jî di nava bîstûçar saetan de bibe dîktator. Ji bo mirov pêşî li vê rizîn û nexweşiyê bigire bi tenê rêyek heye, ew jî avakirina sîstema modernîteya demokratîk e.

### F- Modernîteya Kapîtalîst û Dewleta Netewe

Têgîna dewleta netewe bi qasî ku di tariyê de hatiye hiştin ewqasî jî yek ji wan têgînan e, herî zêde hatiye berevajîkirin. Bi israr ji diyarkirina rola wê ya sereke û fonksiyona wê ya rastî direvin. Mirov dikare bibêje; zêdetir bi armancên propagandatîf tê bikaranîn. Bi taybetî hewl didin têkiliya wê ya ontolojîk bi faşîzmê û milletgiriyê re xuya neke. Çawa ku hewl didin têkiliya tenik û zirav a modernîteya fermî bi faşîzm û milletgiriyê re ji nedîtî ve

bên. Ev helwest bi tenê xweserî bûrjûwayên lîberal nîne. Sosyalîst jî di mijara dewleta netewe de yan parêzvan xuya dikin, yan jî mîna ku gelekî bê qîmet e, bi gotin û peyvên besît pênase dikin û dibihurînin. Ya rastî, ji bo guhertin û têgihîştina li serdema me, têgîna dewleta netewe têgîneke kilît e. Di vê mijarê de herçiqas ez Antony Giddens kêm bibînim jî ji ber ku girîngiya dewleta netewedaniye holê, ez vegotinên wî yên di vî warî de yên mijarê rohnî dikin qebûl dikim.

Heta vir min gelek mijar pêşkêş kirin. Bi awayekî mirov dikare wan ji bo pênasekirin û fonksiyona dewleta netewe weke pêşamadekarî qebûl bike. Mirov sedemên derketina kapîtalîzmê, têgînên modernîte, netewe û dewletê di asta pêşnûmeyê de be jî bi nav neke, wê diyarkirina rola dewleta netewe zêde bi kêr neyê. Min mijara Cihûyan jî bi xetên sereke û weke pêşnûme hewl da pêşkêş bikim bi sedema ku têkiliya wê bi dewleta netewe re heye. Ji bo jihevderxistina pirsgirêkên civakî yên roja me ya îro çawa ku analîzkirina dewleta netewe têgîneke kilît e, her weha ji bo jihevderxistina mijara dewleta netewe jî mijara Cihûyan di çarçoveya şaristaniyan de weke dîrokî-civakî qet nebe divê bê binavkirin û ev yek têra xwe hîn dike û weke mînak xwedî qîmetekê ye. Bêyî ku mirov dewleta netewe û mijara Cihûyan ji hev derxîne, qurbanên qirkirina Cihûyan bi bîr bîne û maneyê bidê, ev yek ê gelekî kêm û çewt, her weha wê gelekî ne rast be. Trajediya Rojhilata Navîn a îro têra xwe analîzên têne kirin piştrast dike.

1- Dewleta netewe formê pêkhatina yekdestdariya kapîtalîst e. Li Hollanda û Ingilîstanê hînê di sedsala 16. de ji bo şikandina armancên împaratoriyên Franse û Spanyayê formekî dewletê yê pêdivî pê hebû, şêweyê pêş dewleta netewe bû. Prenstiya Hollandayê û Qraltiya Ingilîstanê wê ber bi dewleta netewe ve biberidin û hewl bidin serdestiyê bi dest bixin. Bi Konsensusa Westphalia ya 1649’an hêmanê neteweyî di navbera dewletan de derket pêş û bi vî awayî gavên ber bi dewleta netewe ve têne

avêtin bi lez dibin. Dewletan weke ekonomî-polîtîka merkantîlîzm kire esas û ev bû hêmanekî ku faktora bazara neteweyî bi hêz û bi lez bike. Zimanê neteweyî, huner û xebatên dîro-kê êdî di yekdestdariya dewletê de dest pê kir hînê zêdetir cih girtin. Wer lê hat ku hin aloziyên di qada navneteweyî de û şer bêyî milletgirî û desthilatdariyên tîpa dewleta neteweyê, ne mumkin bûn bêne meşandin. Şerên Napolyon di vê de bi roleke pêşeng rabûn. Bêyî ku Franseyê bike dewleta netewe nikarîbû şer bimeşîne. Îdeologên elman ên pêvajo ji nêz ve dişopandin, bi tevahî benên serê meselê ne û ji milletgiriya elman û dewleta wê ya netewe re hewce ne, di şexsê Napolyon de keşif kiribûn. Milletgiriya elman a bi lez pêşde birin, demekê berî demekê di yekgirtina Elmanya û avakirina dewleta modernîteyê de bi rola qeraseyekî rabû. Di serê sedsala 19. de gavên pêvajoya wêpaşê Hîtler biafirîne yên destpêkê bihatina avêtin.

Ya rastî mijar zêdetir hûrûkûr e. Bi hîmên modernîteya kapîtalîst re (şaristaniyê) têkildar e. Ev tevgera ku di navenda xwe de lêgerîna li serketinê ya yekdestdarên ekonomîk dihewîne, wê ne bi tenê pêşketina netewî berevajî bikira; neçar wê bi tevahî hêmanên netewe dikin netewe bikirana milletgir. Bêyî ku dîn neteweyî bibe, zehmet bû ku serdestiya bazarê ya yekdestdariya ekonomîk pêk bihata. Neteweyîkirina huner û çandê jî bi heman awayî bi pozîsyona yekdestdaran re têkildar e. Neteweyîkirina şeran jî wê bibûya hêmana herî dawî û girîng. Neteweyîkirina van hêmanan hemûyan ruhê neteweyî derxist holê û ev jî bi milletgiriyê bi encam bû. Xebatên îdeologan ên li ser netewe û dewletê ji mêj ve hîmên fikrî yên hewce dikirin, amade kiribûn. Pir eşkere bû ku ev hêman hemû ku li ser bazara neteweyî û li ser bazarê şerekî mezin dimeşand û xwe li ser dikuşt û ferz dikir berhema kapîtalîzma yekdestdar bû.

2- Şoreşa îndustriyê ev pêvajo bi tevahî bi lez kirin. Piştî bazirganiya mezin, pîşesaziyê bêhtir berhemê zêde çêkir û bi vê

xisleta xwe mijara netewekirina bingehîn ava kir. Pîşesaziya neteweyî di çarçoveya netewe de ji bo kapîtalîstan hemûyan dihat maneya bêhtir karê. Sedsala 19. ji vî aliyî ve diyarker e. Îndustriyalîzm weke îdeolojiyekê ji nêz ve bi netewebûyînê re têkildar e. Milletgirî di sedsala 19. de îdeolojiya herî nadîde û hêza çalakiya siyasî bû û mirov nikare îndustriyalîzmê ji vê cihê bifikire. Bûrjûwaziya bazirgan weke hecm bi serê xwe nikare neteweyekî rake û hilgire. Merkantîlîzm bi serê xwe wesfê wê yê ekonomiya yekdestdar a karibe netewe li pey xwe bibe nîne. Bûrjûwaziya bi îndustriyên yekdestdar weke hecm gelekî berfireh bûbû, êdî weke heqê xwe didît ku li ser navê neteweyê bipeyive. Dîroka xwe ji nû ve nivîsî. Meyla xwe ya felsefî zelal kir. Çanda neteweyî kir parçeyekî dîrokê. Mohra xwe li artêşa neteweyî û perwerdeya neteweyî xist. Bi bûrjûwaziya pîşesaziya neteweyî, serdestî û serkeftina ku kapîtalîzm li ser neteweyê bi dest xist mayînde bû.

Têgîna jêre şoreşa bûrjûwaziyê tê gotin, ji ber ku van pêvajoyan hemûyan di nava xwe de dihewîne, manedar e. Naxwe bi serê xwe bi tenê şoreşên Ingilîz, Franse û yên weke wan berevajiyê tê gotin şoreşên bi plan ên bûrjûwaziyê nînin. Tiştê bûrjûwaziyê kir ew bû ku zanîbû van şoreşan li gorî berjewendiyên xwe bi kar bîne. Ji lewra şaş e ku mirov şoreşa îndustriyê weke serketineke çîna bûrjûwaziyê bibîne. Ev şoreş jî encama daneheva mezin a dî-rokê ye.

Bûrjûwaziya yekdestdar û egoîst çawa ku di her qadê de kir ev qad jî desteser kir û xwe û kara xwe ferz kir. Çawa ku ekonomî qadeke civakî ye û hewcedariyê wê bi bûrjûwaziyê nîne, pîşesazî jî qadeke ekonomiyê ye û hewcedariyê wê bi bûrjûwaziyê nîne. Ya yekdestdarên bazirgan kirin ew bû ku li gorî bazirganiyê bi awayekî dîrokî dest danîn ser vê qada ku hînê zêde karê tîne. Xwediyên ti şoreşên rastîn bûrjûwazî nînbûn. Çi teorîk, çi jî pratîk di amadekariyên şoreşa îndustiriyê de bûrjûwazî nînbûn. Şoreşa îndustriyê ew e ku ekonomî di nava pêşketina rîtma dîrokî-

ekonomî de yek ji gavavêtinên mezin û girîng e. Mîna şoreşa cotkariyê ya di dema neolîtîkê de ye. Di her dema dîrokê de hilberandina ekonomiyê pêş ketiye, cewherê wê yekdestdariya ekonomiyê dewlet û hevkarên wê li ser deverên bi bereket dibin yekdestdarên nû yên çavsorî, çavkorî û bi îhtîras wexta hewce bike bêperwa hêzê bi kar tînin. Dewleta netewe esas di nava van yekdestdaran de wê hîmê xwe yê maddî bibîne,nedîta jî wê çêbikira.

3- Nava salên sedsala 19. qonaxeke werçerxê ya dîrokê ye. Yan dewleta netewe ya navendî ya bûrjûwaziyê wê bi ser bikeve yan jî tevgera konfederatîf a demokratîk a bi tevahî beşên civakê yên li derveyî yekdestdarên nû û arîstokrasiyê dimînin himbêz dike. Di Şoreşên Ingilîz ên sala 1640 û 1688 û Şoreşa Franse ya sala 1789’an de di nava hêzên serhildanê de cihêtiyeke berçav xuya nake, lê ev herdu meyl û ekol bi rola esasî radibûn. Komingerên di Şoreşa Franseyê û Levelên di Şoreşa Ingilîz de nûnerên meyla demokratîkbûn. Ev meylên behsa wan tê kirin paşê wê bihatina tesfiyekirin. Şoreşên 1848’an bi temamî şoreşên gel bûn. Xebatên K. Marks û F. Engels ên heta 1848’an yên Lîga Kominîst û Manîfestoyê li cih in û gavên dîrokî ne. Kengî şoreş li bêbextiya bûrjûwaziyên ku bi her cure hêzên paşverû re li hev kirinrast hatin, ev têkçûna wan a pêşî ya stratejîk bû. Bihara gelan kurt ajot û dîsa zivistana reş bi ser wan de hat. Şoreşgeriya bûrjûwaziyê jî bi berjewendiyên wê yên kêliyê ve girêdayî bûn. Bi ser ketibûya, wê desthilatdariya siyasî pir zû bikira yekdestdariya ekonomîk. Li şûna ku her tiştî ji dest bide, zanîbû yê di destên xwe de biparêze û qîma xwe bi destketiyên bi sînor bîne. Alîgirên berê yên qraltiyê û arîstokrasî jî negihîştibûn hêviyên xwe. Mîna hêzeke tewazunê dewleta netewe di vê pêvajoyê de wê bi hêz bibe. Navenda yekdestdarên ekonomîk û siyasî di mijara dewleta netewe de hev digirin û ev yek jî pêvajoya paşê diyar dike. Salên 1861 û 1871’ê bi

awayekî fermî salên îlankirina dewletên Îtalî û Elman in. Paşê jî wê dor bihata îlankirina dewletên netewe ên din.

Pêla şoreşa nû kengî weke hêvî dikirin nemeşiya, Marks xwe vekişand Londonê. Kapîtala wî xistin ber lêkolînê. Ceribandina wî ya Enternasyonalê xebateke komeleyê bû. Kominîstên elman di navê de Marks û Engels jî kengî dewleta netewe ya navendî kirin esas, hingî bi awayekî objektîv têkçûn qebûlkirin. Bi teoriyên krîz û pêsîrtengiyê li gorî ketina kapîtalîzmê bername avakirin, rêxistin avakirin, stratejî û dersên taktîkî pêş xistin her çûn li dijî civakêbi kapîtalîzmê re di nava qalibên heman moderniteyê de (rewa dîtina endistriyalîzm û dewleta netewe) li hev kirin û bi vî awayî veguherîn tevgereke welê ya para xwe ji yekdestdariya ekonomîzm jêre tê gotin bigirin. Maneya ekonomîzmê qebûlkirina bernameya dewletên netewe û ekonomiya yekdestdarên pîşesaz e. Şoreşa Sovyetê jî weke yên beriya xwe nikarîbû nebe destikê bernameya dewleta kapîtalîzmê ya yekdestdar + dewleta netewe. Jixwe Şoreşa Çînê jî piştî demeke dirêj a aloziyê nikarîbû xwe ji heman aqûbetê xilas bike û li ser heman rotayê dewleta netewe ya Çînê + kapîtalîzma yekdestdar a Çînê + bi yekdestdarên global re lihevkirin.

Şoreşên rizgariya neteweyî ku bi zêhniyeteke modernîst a hînê zêde re têkildar in, pîşesazî û dewleta netewe weke bernameyên xwe yên azamîdiyar kiribûn. Herçiqas di nava wan de gelek mînakên sosyalîzma pêkhatî hebin jî bernameya wan yek tişt bû. Tevgera sedûpêncî salî bi navê sosyalîzma zanistî hat meşandin, sedema serneketina wê ew bû ku nikarîbû bibe xwedî wê hêza ji moderniteya Rohnîbûnê bibihure û li şûna wê moderniteya demokratîk bi teorîk, programatîk, stratejîk û taktîk pêk bîne. Ya rastî, ev niyeta wê jî tinebû. Bi tevahî nîşane didin xuyakirin ku ev tevger xwedî karektereke bûrjûwaya piçûk e, asoyê wê teng e, bi qasî ku bi serketinê serxweş dibe bi xisletên ku wê bi hêsayî radestî sîstemê dike, dibe yek.

Anarşîstan ev pêvajo protesto kirine. Lê nexasim, tevî ku Bakunin, Proudhon û Kropotkin rexne û pêşniyarên girîng ên bernameyê kirin jî ji ber ku li ser vê bingehê xwe bi rêxistin nekirin, ji aliyê îdeolojîk ve teng bûn û civak seresere nas kirin, her weha ji ber têgihîştinên wan ên çalakiyên ferdî nikarîbûn bibin alternatîfa siyasî. Destwerdana wan a li pêvajoya dîrokî serketina çav li rê bû pêk were, neanî. Herdu ekol jî qelsiya wan ew bû ku felsefeya Rohnîbûnê weke hebû qebûlkirin û bi awayekî dogmatîk bi zanista pozitîvîst ve girêdayî bûn. Serneketin zêdetir bi sedema îdeolojîk ve girêdayî bû.

Murray Bookchin dibêje; heta bi salên 1850'î li Ewrûpayê meyla kedkarên gund û bajaran zêdetir ber bi konfederasyoneke demokratîk heye, lê ji ber ku sosyalîstan xwe radestî têgihîştina dewleta netewe ya navendî kirin ev şens bi tevahî ji dest çû. Bookchin bi van gotinên xwe wer xuya dike ku bûyerên di qada civakî de diqewimin zêdetir nêzî rastiyê teşxîs kirine.

4- Wexta dewleta netewe ya elman di sala 1870'yî de hat îlankirin, yê pêşî ev tehlûkeya mezin dît fîlozofê mezin Nietzche bû. Ji lewra mirov Nietzsche weke pêxemberê muxalif ê serdema kapîtalîst bi nav bike, li cih e. Di demekê de ku sosyal demokrat jî di navê de ji vê bûyerê re li çepikan didan, wî şerma mezin a mirovatiyê têde didît. Ez ne şaş bim, xulaseya şîroveyên wî weha bû: 'Dewleta dibe Xwedê, ferd û kedkarên dibin morî, civaka xesandî û pîrekî.'

Rexneya Proudhon a li welatîbûnê hînê balkêştir e. Mîna ku ferdê roja me ya îro hê ji mêj ve dîtiye. Max Weber civaka di bin bandora modernîteyê de weke 'civaka li pişt caxên hesinî hatiye girtin' bi nav dike. Binavkirin û şibandinên hînê xeternak di dinya romanan de hatine kirin. Kengî civak di feqa dewleta netewe de tê asêkirin şîroveyên bi heman rengî zêdetir dibin. Lê belê ev rexne û pêşbînî hemû ji bernameyeke berçav a çareserî û azadiyê dûr in. Ji sedsala 16. heta dawiya sedsala 20'an gelan û rewşenbîran bi

awayekî di dîrokê de ti carî neyê muqayesekirin, li ber xwe dan. Gelek serketinên demborî jî bi dest xistin. Lê hegemonya global a di serdema yekdestdarên fînansa kapîtalîzmê de hînê bi tevahiya heybeta xwe li ser piyan e û ev yek jî nîşan dide ku meyla modernîteya demokratîk a ku kêmasiyên mezin ên çareseriyê jiyan dike, li ser xeta bername, stratejî, rêxistin û çalakiyê ji çewtî û kêmasiyên xwe rizgar nebûye.

5- Divê mirov sê hêmanên sereke yên modernîteyê bi giraniyeke yekastê çareser bike û li ser vî hîmî hêmanên sereke yên modernîteya demokratîk bi entelektuel û rohnîbûneke mezin û her cure tevgerên civakî bide meşandin û ev yek wezîfeyeke her dema şaristaniyê ye ku paşve nayê xistin û dest jê nayê berdan. Rexnekirina kapîtalîzmê ji hedê xwe zêdetir kêm hatibe kirin jî ji ber ku hatiye kirin, divê mirov berê tîran bide dewleta netewe û bi rexnekirina îndustriyalîzmê temam bike û ev yek di serdema sêyemîn a fînansa yekdestdar de giraniya xwe ya di têkoşîna civaka demokratîk, wekhev û azad de diparêze. Em jî ya para me dikeve pêşkêş dikin.

Çi di pêkhatina dewleta netewe de, çi jî di domdarkirina wê de fonksiyona zemqê ji aliyê her cure milletgiriyê ve tê bicihanîn û êdî zehmet nîne mirov vê tespîtê bike. Di vê rewşê de ez dixwazim balêbikişînim ser vê mijarê ku em milletgiriyê weke hêmanekî îdeolojîk ê rola xwe ya xweser heye digirin dest. Dibe ku rastir be, mirov jêre bibêje, îdeolojiya pozîtîvîst-laîk kirine dînî. Di qonaxa derketina sîstemê de nêzikbûnên pozîtîvîst û laîk herçiqasî ji zêhniyeta modernîteya demokratîk dûr bin jî ji bo bihurîna ji dogmatîzma kevneşopiyêbi roleke erênî rabûn. Di pêşketina şîroveya zanistî de para wan heye. Lê belê ji ber ku ji nîvê sedsala 19. û pêve li aliyekî serketina xwe ya siyasî û aborî pêk anîbû û li aliyê din tehlûkeya çalakiya demokratîk dewam dikir;weke ku li cem her şaristaniyê hatiye dîtin, sîstem ji aliyê îdeolojîk ve ber bi dînîbûnê ve çû. Milletgiriyê jî bi zêdeyî bersiva vê pêdiviyê dida.

Piştî van daxuyaniyên pêş ên weke destpêkekê der barê dewleta netewe de, li ser girîngiya mijarê ceribandina analîzên hînê berçavtir û bi detaytir gelekî hewce ye û mirov dikare gelekî jê hîn bibe.

a- Eger em bi awayekî berfireh bi nav bikin, em dikarin bibêjin; di dema modernîteya kapîtalîst de amûrên desthilatdariyê yên li tevahiya civakê belavbûne û di çarçoveya huqûqî de ji yekîtiya ferdên bi navê welatî re em dikarin bibêjin dewleta netewe. Di vir de têgîna diyarker, diyardeya desthilatdariyê ye ku li tevahiya civakê belav bûye. Rewatiya tevahiya dewletên berê bi saziyên wan û kadroyên wan ve bi sînor bû. Di dewleta netewe de ev sînor tên derbaskirin. Yên ku jê re welatî tên gotin an jî kesên ku dewlet hewl dide li gor berjewendiyên xwe yên îdeolojîk, sazûmanî û ekonomîk çêke, weke ku endamên dewletê yên xwedî heq û wezîfeyan bin, wan dike dewletî, ev cewherê dewleta netewe ye. Yek ji mijarên sereke yên dewleta netewe girîngiyê pê dide çêkirina welatî ye.

Ji bo vê yekê jî hewl dide ji gelek hêmanên weke îdeolojî, siyasî, ekonomî, huqûqî, çandî, cinsiyetparêzî, eskerî, dînî, perwerdeyî û medyatîk sûdê werbigire.

1- Amûrê herî bi tesîr ê îdeolojîk milletgirî ye. Di asta dînekî nû de ye. Milletgirî nirxekîwelê yê pîroziyekê bi dewleta netewe dide ku wê weke 'Hebûna Xwedê ya li rûyê erdê' bi nav dike. Yek ji erk û wezîfeya dînê nû ew e ku divê mirov wer bi dewletê ve bê girêdan ku karibe xwe di rêya wê de bide kuştin û wê weke nirxê herî bilind qebûl bike.

2- Bandora hêz û balkêşiya desthilatdariya siyasî ji bo ferd bike welatî gelekî tê bikaranîn. Nexasim partiyên siyasî bi roleke bi vê armancê radibin. Rêya herî kurt ji bo ferd diçe rêzdarî û ewlehiyê ew e ku divê bibêje; 'Dewlet a Min e'. Bi vê xwe dikare nêzî desthilatdariyê bike û xwe pê xweş bike.

3- Xisleta yekdestdariya ekonomîk a dewletê bi şoreşa pîşesaziyê hînê berfireh dibe û ji ber ku yekdestdariya pîşesaziyê gelekî pêş dikeve, hema hema nîviyê civakê li saziyên dewletê weke karker-karmend têne bicihkirin. Ev rewş bi serê xwe, dike ku beşekî mezin ê civakê ji bo bibe endamê dewleta netewe ango bibe welatî bikeve nava pêşbaziyê. Zehmet e ku mirov yekdestdarên ji wan re taybet têne gotin ji yekdestdarên dewleta netewe cihê bike. Di navbera herduyan de yekîtiyeke xurt û hevpariyek heye. Zehmet e ku mirov diyar bike, yekdestdariya dewletê ji ku dest pê dike û li ku diqede û di nava vê de zehmet e ku mirov cihê yekdestdariya taybetî tespît bike. Yekdestdarên taybet ji nîvî zêdetir karê didin dewletê, lê dewlet jî mîna îltîzamên modern derfet û îmkanên bêsînor dide wan û ji wan re hêsan dike. Ji lewra şêweyê welatîkirina ferd a yekdestdarên taybet hin caran ji dewletê paşverûtir e. Ji ber ku bi gefxwarina bêkarhiştinê çawa dixwaze werê dikare bi hêsanî perwerde bike. Sendîka jî di demên xwe yên dawî de bi awayekî muhafezakar dewleta netewe parastin û ev jî têkiliya xwe bi van bûyeran re heye. Karker bi sosyalîzma pêkhatî re kirin ku bibe milîtanekî dewleta netewe.

4- Têkiliya welatîbûnê bi huqûqê re pir berçav e. Her ferdê dixwaze karê xwe bimeşîne pêdiviya xwe bi nasnameyeke şêniyan heye. Jixwe nasname bi serê xwe tê maneya welatîbûna dewletê. Bi awayekî sembolîk endambûna dewletê îfade dike.

5- Serwextbûna li dewlet û desthlatdariyê ku tevahiya dîrokê zindî hatin hiştin ango rêûresma wan, eşkere ye ku di şêwegirtina welatîbûnê de gelekî bi kêr hatine.

6- Di nava malbatê de bav weke nûnerê dewletê tê hiskirin û ev yek jî bandora cinsiyetparêziyê nîşan dide. Di nava malê de her mêr li hemberî jinê tê maneya dewletê. Bi vî awayî hiskirinê ji aliyê tevahiya civakê ve jî, mirov dikare qebûl bike. Dewleta netewe bi vî awayî hiskirinê hînê zêdetir perwerde kir û hewl dide kirasê wê li gorî xwe bibirre.

7- Saziya eskertiyê yek ji saziyên sereke yên dewletê ye. Li vê saziyê nirxên bingehîn ên dewleta netewe weke nasnameya ferd li mejî û hisên wî têne kolan û niqirandin û ji nû ve tê çêkirin. Her saziya weke vê ya dewleta netewe xwedî heman fonksiyonê ye. Lê yek ji wan jî nikare xwe bigihîne rola saziya eskertiyê.

8- Di pêvajoya dewleta netewe de dîn ji wan amûran e ku milletgiriyê ew herî zêde bi kar aniye û yekser ew veguherandine dînê dewleta netewe. Ji ber ku dîn hem neteweyî dikin, hem jî milletgirî dikin, di dema dewleta netewe de weke saziyeke civakî herî zêde bi cewherê xwe re nelihev dibe. Beşê civakê yê li derveyî milletgiriya sekuler dimîne bi milletgiriya dînî, bi hebûna nû ya xwedayê berê bi zanebûn an jî xweber bi evdîtiya wî re dikin yek û bi awayekî îxaneta xwe ya hundirdijî. Şerê dîn û laîktiyê ji nêz ve bi vê îxanetê re têkildar e.

9- Perwerdeya ji dibistana seretayî heta zanîngehê ferd weke welatî amade dike û perwerde saziya herî bi bandor a modernîteyê ye. Bi saziyên eskerî re di vê mijarê de pêşbaziyê dike. Hedefa pêşî ya van saziyan ew e ku welatiyekî ji bo modernîteya kapîtalîst bi awayekî herî ehmeq bigihînin, nirxên wê yên bi cihêwazî di tevahiya dîrokî-civakî, guherîn û veguherînê de pêkhatine, pêşî di parzûnkê dînî paşê jî di yê milletgiriyê re derbas dikin û dawiyê jî di teşta îdeolojiya fermî de distrên. Sofîtiya di vê mijarê de gelek ji skolastîkiya serdema navîn bihuriye.

10- Ji bo mejî û dil şûştinê, medya amûra herî bi hêz a modernîzmê ye. Ev cîhazên behsa wan tê kirin, ji derfetên teknolojiya ragihandinê sûdê werdigirin û ji bo gihandina welatiyê dewleta netewe dixwaze rê xweş dikin. Nexasim sê S'yan, seks, spor û sinaetê populer dikin, naveroka wan pûç dikin û ji civakê re wan pêşkêş dikin, bi vî awayî di çêkirina welatiyê efyonkêş, herî ehmeq û rezîl de medya bi roleke sereke radibe. Ev rêbaz û amûrên ku em hînê jî bi sernavên sereke dikarin hejmara wan zêde bikin, bi awayekî di ti dema dîrokê de nehatiye dîtin, tîp û şêla

welatiyekî gihandine. Hedefa bingehîn a jiyanê erebeyek + malbat (peydakirina pîrek an jî zilamekî û çêkirina çend zarokan) + bibe xwediyê xaniyekî ku karibe rojane standart bixwe û vexwe. Maneya civakbûyînê ji bo xwestekên ferdî yên besît û rezîl bi hêsayî li aliyekî din tê hiştin. Ji ber ku ji bîr û hafizeyêhatiye kirin, ji dîrokê jî qut dibe. Tiştê ku divê qey dîrok e, klîşeyên neteweyî yên milletgiriyê ne. Bê felsefe ye, yan jî ji bilî feyde û sûdên herî piçûk, bawer nake ku felsefeyeke bextewariyê hebe. Modern xuya dike, lê nava xwe pûç e, hundirê xwe vala ye, 'keriyekî welatiyan' yê ji bo armancên herî tarî (faşîzmê) baz bide hatiye amadekirin û ferdê 'civaka girseyî' yan jî ya herî rast NE FERD li naverastê ye.

Di çûna ber bi faşîzmê de der barê rola vê tîpa welatî de gelek romanên hêja hatine nivîsandin. Di vê mijarê de gelek nivîskarên navdar hene. Nexasim ev romanên ku xwe dispêrin analîza qirkirinê mirov gelekî ji wan hîn dibe. Di demên dawiyê de bi bandora postmodernîzmê rexneyên li ser 'welatî' hatine kirin jî gelekî kêrhatî ne. Di serê astengiya bingehîn a li pêşiya modernîteya demokratîk de welatiyên bi vî rengî yên dewleta netewe û civaka wê ya wan hildiberîne, tên. Ji lewra yek ji wezîfeya sereke ya demokratîkbûyînê ew e ku vê dewleta netewe û civaka wê ya ferdê ne ferd diwelidîne ji hev derxîne û şaristaniya demokratîk a ferdên demokrat, azad û wekhev ango welatiyên azad bigihîne, ava bike.

b- Pir girîng e ku mirov têkiliya ontolojîk a di navbera faşîzm û dewleta netewe de bibîne. Di mijara faşîzmê de yek ji çewtiya bingehîn ew e ku têkiliya sîstematîk a bi dewleta netewe re yan hîç nabîne, nikare rave bike, yan jî wexta hew tê veşartin bi du gotinên nivîsî yên seresere jê dibihure. Lê ev analîza me ya di asta pêşnûmeyê de jî têrê kiriye ku xizimtiya bi kok a îdeolojiya Rohnîbûnê (îdeolojiyên pozitîvîst laîk jî di navê de) bi faşîzmê re eşkere deyne holê. Şêweyê bingehîn ê desthilatdariya modernîteya fermî dewleta netewe ye, dînê wê yê nû jî milletgirî ye. Civa-kên li

parzûnkê milletgiriya dewleta netewe hatibin xistin, ew civak in ku amade ne, timî faşîzmê hilberînin. Mirov nikare faşîzmê bê dewleta netewe bifikire. Hemin mirov nikare dewleta netewe jî ji yekdestdariya ekonomîk a zêde xurtbûyî (bazirganî + pîşesazî + fînans) cihê bifikire.

Zehmet nîne ku mirov kok û rîşên faşîzma Hîtler di îdeolojiya elman de bibîne. Ji bo bûrjûwaziya elman rêya bi tenê weke dewleta netewe xurtkirina yekdestdariyê bû. Tevahiya sedsala 19. hem di warê îdeolojîk hem jî di warê maddî de îdeolog û bûrjûwaziya elman ji bo vê tîpa dewletê hilberînin gelekî xebitîn û ev yek tevahiya sedsala 19. karê wan ê herî girîng û serketina wan bû. Çîroka wê dirêj e. Ez di wê rewşê de nînim ku behs bikim. Bêguman di vê de para îdeolog û sermayedarên cihû divê piçûk neyê dîtin. Li Elmanyayê di navbera Cihû û Cihûtiyê, milletgiriya elman û faşîzma wê de têkiliyeke diyalektîk bi sedan lêkolînî piştrast kiriye û helwesta me ya teorîk jî hebûna vê têkiliyê ispat kiriye.

Modela elman paşê ji tevahiya tevgerên dewleta netewe û milletgiriyan re bûye îlham. Di serî de sosyalîst, qelsiya tevahiya antîfaşîstan ew bû ku nikarîbûn têkiliya sîstematîk a di navbera dewleta netewe + yekdestdarî (yekdestdariya dewlet û taybet) + faşîzmê de bibînin. Ji vê jî wêdetir, nikarîbûn pêwendiya ontolojîk a di navbera modernîteya kapîtalîst û faşîzmê de ji hev derxin.

c- Meseleya Yekîtiya Sovyetê û dewleta netewe mijareke din e ku hînê girîng e û li benda çareseriyê ye. Hînê di dema Marks û Engels de çarçoveya têkoşîna bingehîn a ji bo çîna karker dewleta netewe ya elman a navendî hatibû qebûlkirin û ev yek jî maka tevahiya şaşiyan bû. Li Elmanyayê heta nîvê sedsala 19. serhildanên gund û bajaran ên ji bo pêkhatinên konfederatîf ên demokratîk paşverû hatin dîtin û piştgiriya dewleta netewe ya navendî hat kirin ku ev bi xwe di nava fikrên Marks û Engels de cih digirin. Di vê mijarê de fikir û rexneyên Bakunin û Kropotkin hînê

qîmeta xwe ya aktuel diparêzin. Ev tespîtên Marks û Engels sedema bingehîn in ku Enternasyonala Yekemîn û Duyemîn weke ber biavêje pêk tên. Bi objektîfîhevgirtineke bi bûrjûwaziya pîşesaz a elman re hatî kirin, heye. Jixwe ev xusûs bi awayekî pir eşkere hatiye nivîsîn. Encam, di nava dewleta netewe de helîn e. Çîroka sedûpencî salî ya Marksîzmê çîroka qurbanbûna vê şaşiyê ye.

Ezmûna Sovyetê û Çîna roja me ya îro mînak in ku vê piştrast dikin. Rûsya jî hînê negihîştibû salên 1920'î rengê demokratîk ê Sovyetê bi dawî bûbû. Li dawiyê bi tenê rêyek mabû ew jî bi modela dewleta netewe avakirina sosyalîzmê bû. Ji bo vê jî bi tevahî muxalif hatin tesfiyekirin, gundîtiya ku hêza sereke ya demokratîk bû hat tinekirin û rewşenbîr hatin bêdengkirin. Bi vê re ya derket holê 'Sosyalîzma Firewnan' bû. Modernîteya demokratîk nehatiye hişê mirovan. Ya rastî hatiye astengkirin. Mijara behsa wê tê kirin di demokrasiyê de dîsa bi awayekî beravêtî di salên 1990'î de ji nû ve dikeve rojevê. Ez rast nabînim ku li hemberî faşîzma demê ya Hîtler bibêjim faşîzma Stalîn. Ew du tevgerên cihê ne ku ji çavkaniyên cihê tên. Lê mînaka Yekîtiya Komarên Sovyeta Sosyalîst YKSS ezmûneke sosyalîzmê nîne û sosyalîzmeke bingehê xwe li ser şaristaniya demokratîk daneyne wê pêk neyê û ev ezmûneke dîrokî ye ku vê rastiyê bi bandor li pêş çavan radixîne.

Mao bi demokrasiyê re mijûl bûye. Rexneyên wî yên li ser Sovyetê girîng in. Şoreşa çandê ya li Çînê piştrast dike ku hin tişt rast nameşin. Lê belê ne asta têgihîştina Mao, ne jî amûr û rêbazên xwe spartibûnê di wê astê de nebûn ku ji ezmûna Sovyetê û nuqteya Marksgir pê xapiyabûn, bibihure. Çîn a îro di vê mijarê de gelek tiştan rave dike.

Tevgerên Rizgariya Neteweyî ku piraniya wan li ser xeta sosyalîzma pêkhatî meşiyan, hînê ji serî ve bernameya xwe bi giranî dewleta netewe hesibandine. Ev modelên pêkanîn, bi tenê bi hevkariya DYE, YE, IMF, Bankeya Cîhanê û yekdestdarên kapîtalîst

ên sereke li ser piyan man, wexta mirov vê rastiyê li ber çav bigire, divê mirov li rewşa wan a her çû antîdemokratîk û muhafezekarbû, matmayî nemîne.

Mînaka herî xemgîn sosyalîzma Baasî ya Seddamî bû. Ji bo yên dixwazin fêm bikin mînakek e ku bi buhayê zêr e. ‘Dewleta xweşhal’ a sosyal-demokratan bi ti awayî ji dewleta netewe cihê nîne. Dîsa di vê mijarê de sosyal-demokratên elman ên ji dinyayê re pêşengiyê dikin, bi ekonomîzma xwe bi qasî zirara Hîtler dayî dewleta wan a netewe, jê zêdetir karê ji welatê xwe re tînin û bi vî awayî hînê cihê xwe yê zexm diparêzin. Lê di berdêla vê de jî tevgera demokratîk a dinyayê ‘dixesînin’ û dixin yedeka bûrjûwaziya xwe!

d- Yek ji encamên xeternak ên ku dewleta netewe rê li ber wan vekir jî tevgera asîmîlasyon, tesfiye û hilweşandinê ya li ser mîrateya çandî ye ku di dîrokê de bi awayekî nedîtî kiriye. Yek ji xisleta herî zêde dewleta netewe destnîşan dike ew e ku xwe dispêre etnîsîteyeke serdest û bi tevahî etnîsîteyên din tevî çanda wan a hezar salan (yek ziman, yek netewe, yek welat û yek dewlet slogana sereke ya Hîtler bû) tine dihesibîne û bi vê re wan tesfiye, asîmîle dike û hildiweşîne. Di dîrokê de ti hêza îdeolojîk û zordest serî li tevgerên bi vî rengî nedaye û ev yek bi şêweyê pêkhatina dewleta netewe ve têkildar e. Polîtîkayeke çandê ye, ji dîsgotinên weke ‘yek dewlet, yek millet, yek ziman’ dest pê dike, welatî û saziyên hemû dişibin hev, ji yek rengî ne, yan bi tevahî ripîreş in, yan jî afirandina çoleke çîlî spî ne. Xwestine Darwînîzmê, ango biyolojîzmê li ser civakê bi cih bînin. Yek ji gunehê xeternak ê pozîtîvîzmê kirî jî di vê qadê de ye. Weke hewcetiya rêzika beridandinê qebûl dike ku çandên herî bi hêz divê hemû çandên din bihelînin. Bêguman wexta ev jî bê kirin wê beridandina mîlyon salan a mirov tine bê hesibandin an jî wê bê tinekirin.

Di roja me ya îro de her ku diçe çand pûç dibin, heybeta xwe namînin, cazîbeya xwe kêm dibin û êdî îlham nadin, ev bi tevahî ji

ber tevgera dewleta netewe weke bûldozerekê li ser rêûresma çandî dimeşîne, pêk tê. Bi hezaran ziman, bi deh hezaran qebîle, eşîr, qewm, mîrateyên arkeolojîk, şêweyên cihê yên jiyanê ango çand hemû bûn qurbanê vê polîtîka yek çandê ya qirkirinê. Diyar jî nîne ku wê ev qirkirina çandê li ku bisekine. Civaka netewe, ferdê netewe û dewleta netewe ya ji yek reng û şêweyî wê ne bi tenê faşîzmê hilberînin; wê jiyanê jî bikin mîna çolê û wê bijkevin pêvajoya cinawirbûneke ku timî li hedefeke pêre şer bike, bigere. Encam şerê dîn, ziman, etnîsîte û çandên din e ku kes nikare ji navê derkeve. Roja me ya îro bi van şeran diçelqe û tevlîhev dibe. Hîtler destpêka vê çanda şer e û sembola wê ye. Di roja me ya îro de rastiya vê sembolê di pratîkê de tê jiyankirin. Dîsa ji bo yên dixwazin hîn bibin mînaka Iraqê di buhayê zêr de ye û bûyerên li vî welatî diqewimin li ber çavan e.

Dewleta netewe tevgereke şer a eskerî û siyasî nîne ku mîna di Şerê Cîhanê yê Duyemîn de tenê bi dewlet û çandên derketine pêş re têbikoşe. Li dijî tevahiya rêûresma civakî-dîrokî, her pêkhatina nû yaji bo pêşerojê hêviyê bide û cihê yetevgereke şer a girseyî ya civakî ye. Di mentiqê damezrandina dewleta netewe de, di hedefa wê ya ekonomîk, civakî û siyasî de yek netewe, yek dewlet, yek ziman û yek welat heye. Ev yekên hene wê timî hebûna xwe bi awayekî yek dewam bikin, carnan eşkere carnan veşartî, carnan bi awayekî xwînrij carnan jî bi awayekî demagojîk wê li her bereyî weke şerekî mayînde dewam bike û ji vê bêtir jî maneyeke xwe ya din nîne!

e- Dewleta netewe di qada siyasî de jî girîngiyê dide yek tîp û şêweyî. Di dewleta netewe de çawa ku ji nasnameyên neteweyî yên cihê re cih nîne, ji pêkhatinên siyasî yên cihê re jî cih tineye. Mebest ji dewleta navendî, bi gotineke din mebest ji dewleta weke avahiya unîter tê binavkirin ew e ku yek ji şertê bingehîn ê demokratîkbûnê li ser hîmê cihêwaziyên xwe meşandina siyasetê bê derfet û îmkan dike. Ji ber ku vê yekê ji bo yekparebûna dewletê

tehlûke dibîne. Di asta herî nizm de qebûlkirina erkan ji bo rêveberiyên xwecihî di vê çarçoveyê de bi şik û guman dibîne. Burokrasiya navendî hêza wê ya sereke û qurmê wê pêk tîne. Dewleta netewe ew dewlet e ku ji aliyê burokrasiya modern ve hatiye afirandin. Tevahiya civakê di qefesa ji caxên hesinî de di bin çavan de digire. Di mijara partî û civakên sivîl de şertê wê yê bingehîn ew e ku divê tevgerên wan bi polîtîkayên dewletê re wekhev bin. Ji lewra di çarçoveya pîvana demokrasiyê pluralîzmê de ku dest jê nabe, pêşketina rêxistiniyên cihê yên ekonomîk, çandî, civakî û siyasî timî sedema tehlûke dibîne û di bin çavan de digire, dişopîne. Rê nade ku bibin alternatîf û bi vî awayî derfet û îmkanê nade ku di rêveberiyê de cih bigirin. Dewleta netewe, ji ber xisleta xwe ya pêkhatinê li dijî pluralîzma siyasî ye û ji ber vê yekê antî-demokratîk e. Di çarçoveya dewleta netewe de têgihîştinên demokrasî û sosyalîzmê ango sosyalîzma pêkhatî û yên din bi ti awayî pêş neketina wan û tesfiyebûna wan, me berê diyar kiribû ku yan ji ber parastina wan a dewleta netewe yan jî ji radestbûna wan a dewleta netewe ye. Eger dewleta netewe û demokrasî weke du avahiyên cihê bi awayekî bi pîvan li hev bikin, mirov dikare behsa avahiyeke li demokrasiyê vekirî bike.

f- Dewleta netewe ne bi tenê yek tîp ferd diafirîne; di tevahiya yekparebûna civakê de jî yek tîp dinyayeke his û zêhniyetê empoze dike. Bi vî awayî desthilatdariya xwe hem li tevahiya civakê belav dike, hem jî civaka tek tîp û civaka dewleta netewe diafirîne. Hedefa wê avakirina civakeke korporatîf[5] e, ango

---

[5] Korporatîf: Sîstemeke aborî, siyasî yan jî civakî ye ku tê de komên korporat ên mîna cotkar, pîşesaz, etnîk, kedkar, eskerî, patron (karsaz), zanyar yan jî dînî tên cem hev û saziyeke yekpare ava dikin û di nava wê de komên cihê hene ku ji bo çêkirina siyasetên ji bo berjewendiya gelek koman hevdîtinan dikin. Gotina Korporatîzm ji peyva latînî *corpus* ango beden, gewde tê. Ev mane û maneya neyênî ya îro di gotina **korporatîzm** de heye nepêwendîdarî hev in, lewra **korporatîzm** polîtîkayên korporasyonên pîşesaziyê serdestî ne tîne ziman. Korporatîzm civakê weke bedeneke organîk dibîne, di vê bedenê

modela civaka faşîzmê ye. Divê mirov desthilatdarbûna civakê şaş fêm neke. Berevajiya wê rast e. Dewleta netewe sazî û kesayetên xwe yên sîxur di tevahiya çaviyên civakê de bi cih dike û bi vî awayî hewl dide bi berfirehî û kûrahî desthilatdariya xwe xurt û zêde bike. Civaka weke keriyan tê ajotin bi vê rêbazê tê çêkirin. Ango belavbûn û bi cihbûna desthilatdariyê li civakê tê wê maneyê ku li dijî tevahiya civakê şer tê îlankirin. Naxwe nayê wê maneyê ku civak bi xwe dibe desthilatdar. M. Foucault bi xwe girîngî dide vê mijarê. Mêrtiya li ser pîreka xwe serwer, weke saziyeke sîxurtiyê bi vê rolê radibe. Civaka cinsiyetgir bi polîtîkayên seksê weke nexweşiyeke weba û vedigire li tevahiya civakê belav dibe û bi civakê re şer dike. Nexasim jin bi awayekî hûrûkûr tê kolekirin. Wexta ku yeqîn dike mêrbûyîn azadî ye wê wextê jintî têk çûye. Hem jî têkçûneke hûrûkûr!

Di civakê de huner û spor jî ji aliyê fonksiyona wan ve êdî di xizmeta dewletê de ye û saziyeke sîxur e ku bi civakê re şerekî dijwar dimeşîne. Nexasim bernameyên spor û çandê yên populer bi vê armancê bi awayekî berfireh têne bikaranîn. Sermayedarên global bi zanîn qadên seks, spor û sinaetê pûç kirine û ew bi awayekî bi tesîr kirine saziyên civakê yên sîxur û bi vî awayî di demên dawiyê de kirin ku qadên behsa wan tê kirin li hemberî civakê bibin tevgerên şer ên bi bandor û bi tesîr. Em wexta vê nirxandinê dikin, bêguman em çalakiyên cinsî, sportîf û hunerî bi hebûna wan a cewherî mehkûm nakin. Berevajî, qadên em li ser disekinin divê ji bo bexteweriya civakê di çarçoveyeke berfireh de li ser hîmekî etîk di xizmeta civakê de bêne bikaranîn û ev yek jî ji wezîfeyên bingehîn ên şaristaniya demokratîk e.

---

de her koma korporat ji bo civak rast û baş bixebite weke endamekî pêdivî pê heye tê dîtin. Li welatên bi vî rengî dewlet bi xurtî mudaxelekar e.

Spor ji bo civakeke bi sihet amûrek e, lê di çarçoveya dewleta netewe de kirine amûrê şan û şerefa dewletê. Mîna ku di şer de bin, spor bi tenê kirine amûrekî şerê desthilatdariyê yê serketin û binketinê. Nexasim spora fûtbolê ji bo dewletên netewe weke yekdestdariyeke desthilatdariyê tê bikaranîn. Spor hem veguherandine dewleta netewe, hem jî li dijî civakê wergerandine qadeke şer a bi tesîr.

Hem dewlet, hem yekdestdarên taybet, hunerê di warê civakî de weke qadeke duyemîn a şer dibînin. Nexasim çanda populer û çanda erebeskê di êsîrgirtina çanda şabûnê ya civakê de bi roleke bi bandor radibin. Mîna ku artêşeke staran civakê gulebaran dike. Hunerê klasîk bêqîmet dikin, çanda gel populîze dikin û bi vê yekê wê ji fonksiyona wê ya esas a hezarê salan dûr dikin û di tinekirina xwe bi xwe de wê dikin amûrekî bi roleke berovajî radibe. Seks an jî seksualîte bi qasî ku di ti dema dîrokê de nehatiye dîtin, kirine objeyeke bi civakê re şer dike. Ti amûr bi qasî seksualîteyê nikare di şer de li ser civakê bi tesîr bibe.

Ez hêvî dikim ku vê mijarê di parêznameya xwe ya bi navê Sosyolojiya Azadiyê de bi berfirehî guftûgo bikim, lê ez niha bi tenê dixwazim di nava kevanekê de têbîniyekê deynim û bibêjim; ji bo her zilamî çalakiya cinsî veguherandine çalakiyeke desthilatdariyê. Çalakiya cinsî ji fonksiyona wê ya biyolojîk a ji bo dewamkirina cins dûr xistine yan jî berevajî kirine û di qada civakî û siyasî de veguherandine fonksiyona belavbûn û zêdebûna bêsînor a serweriya desthilatdariya mêr. Çalakiya cinsî veguherandine çalakiya desthilatdariyê. Di tevahiya şêweyên têkiliyên cinsî yên homoseksuel û heteroseksuel û hwd. de têkiliya desthilatdariyê bi roleke diyarker radibe. Tevî ku bi awayekî berfireh bingehê xwe yê dîrokî heye jî di ti şêweyê dewlet û civakan de bi qasî dewleta netewe û civaka wêbi awayekî sîstematîzekirî, pirbelav û bi armanca desthilatdariyê (ango bi armanca kolekirinê) bi kûrahî û

berfireh zêde nehatiye bicihanîn. Cinsparêziya civakî bûyer û têkiliya desthilatdariya civakî û siyasî ye.

Dewleta netewe bi polîtîkayên seksualîteyê yên hem li hundir û hem jî li derveyî malbatê bi temamî dibe sedema jirêderketineke desthilatdariyê. Jinê xwe weke metayeke seksê dibîne, mêr jî xwe dike amûrekî desthilatdariya cinsî û bi vî awayî hem xwe û hem jî civakê dixin nava buhraneke exlaqî û hem xwe, hem jî civakê dikin qurbanê şerê desthilatdariyê.

Medya di van sê qadan de jî amûrê herî bi bandor ê şer e. Bi qasî medya di bin destê yekdestdaran de ti amûr di şerê li hemberî civakê de bi roleke hilweşîner ranebûye. Bêguman wexta ji aliyê şaristaniya demokratîk ve jî were bikaranîn wê weke amûrekî pir bi tesîr ê demokratîkbûnê bi rola xwe rabe.

Dewleta netewe polîtîkayên xwe yên nexweşxane û girtîxaneyan jî bi hostayî datîne û ji bo bi hêzkirina desthilatdariya xwe ya hundirû êsîrkirina civakê di roleke bi tesîr de wan bi kar tîne. Kesên ketibin ser rêya nexweşxane û girtîxaneyan, li hemberî desthilatdariyê ji aliyê maddî û manevî ve bi rewşeke welê re rûbirû ne ku dikarin gelek nirxên xwe ji dest bidin.

Wexta ku dewleta netewe heta bi rehên zîro desthilatdariya xwe ferz dike, ya rastî êdî bi vê li xwe mikur tê ku gihîştiye dawiya dawiyê. Desthilatdariya ku gihîştiye vê astê, rê li pêşiyê tine wê êdî li bin guhê erdê bikeve. Ya hewcedarî pê heye ew e ku divê mirov têgihîştina şaristaniya demokratîk a demokratîkbûnê, rêxistin û çalakiyê li tevahiya yekparebûna civakê ango tevahiya qadên wê belav bike, bi cih bîne.

g- Dewleta netewe ya esas xwe disipêre çîna navîn. Ya navîn dixe hîmê çînayetiya xwe. Herçiqas bi awayekî din ji aliyê teorîk ve pêşketina wê mumkin be jî di pratîkê de pêk nayê. Dewleta netewe xwedayê modern ê çîna navîn e. Çîna navîn di xwestek û zêhniyeta xwe de timî xeyal dike ku wê rojekê bigihîje vî xwedayî û bijî. Bêguman wexta vê dike wezîfe û berjewendiyên xwe jî tedarik

dike. Çawa ku di serdema berê de civakê bi rûyê rastî yê xwedayan nizanîbû û ji wan re îbadet dikir, çîna navîn a modern a roja me ya îro jî ya rastî xwedayê xwe ango modernîteya kapîtalîst nas nake. Lê hay jê heye ku ji bilî wî ti rêyek din li pêşiyê tineye. Di nava burokrasiya wê de yan jî di nava yekdestdarên wê de wezîfegirtin (di çarçoveya pîşeyan de) tê maneya rizgarbûnê.Çîna navîn civakê bi tevahî ji xwe dihesibîne. Çîneke gelekî egoîst e. Lîberal jî çîna navîn weke yek ji şertê bingehîn ê demokrasiyê dihesibînin. Lê belê berevajiya vê rast e. Çînên navîn ne demokrasî, mîna kewareke faşîzmê ne ku lê alavên xwe dide ser hev. Çawa ku têkiliya faşîzm û dewleta netewe ji rengê avabûnê ye, têkiliya faşîzm û çîna navîn jî ji rengê avabûnê ango strukturel e. Şêweyê avabûnê yê têkiliya faşîzmê bi yekdestdariya kapîtalîzmê re vî hukmê der barê çîna navîn de naguherîne. Hebûna îstîsnayan bi tenê meyla esas piştrast dike.

Wexta ku demokrasiya lîberal a esas xwe disipêre çîna navîn, di lîstika herî mezin a demokrasiyê de li hemberî hêzên demokratîk bi ser dikeve û armanca wê ew e ku demokrasiyê pûç û nava wê vala bike. Bûrjûwaziya lîberal, demokratên lîberal di rewşa pêşketinên bi hêz ên demokratîk de dikarin weke bazkekî çepgir bi awayekî erênî rol bigirin. Xisûsa divê haya mirov jê hebe jirêderketina çîna navîn e. Li dijî têkoşîna civakê ya demokratîkbûyînê, kapîtalîzm di warê bikaranîna çîna navîn de têra xwe bûye xwedî tecrûbe û ezmûn.Tawîzan dide, xeyalan hişyar dike û bi vî awayî timî li hember zemînê jêr ê civakê ditirsîne û bi vî awayî polîtîka hundir dimeşîne. Di vê çarçoveyê de dewleta netewe şerê dijwar ê çîna navîn e. Dîsa di çarçoveya heman maneyê de dewleta netewe îlahê şer ê çîna navîn e. Wer fêm dike, wer xeyal dike, wer jêre îbadet dike. Li hemberî vî xwedayî û şerê wî yê zêde kiriye, hêzên demokratîk jî neçar in çalakî û zêhniyeta xwe biafirînin, wekî din jî ti rêya wan nîne. Li

hemberî vî xwedayî rêya bi tenê ya mirov karibe pêde biçe ew e ku divê jiyana azad xwe bike rê û alternatîfa bi tenê ya pîroz!

h- Wexta ku em dewleta netewe digirin dest û li ser radiwestin, wê gelekî bi kêr bê û me rohnî bike ku em modelên wê yên cihê yên di nava wê de nas bikin û em wê bi hin şêweyên dewletan re bidin ber hev. Gelekî girîng e ku mirov weke sazî û têgîn dewleta netewe bi cumhûriyetê re yek negire. Her cumhûriyet dewleta netewe nîne û heta qraliyet jî dikarin bibin dewleta netewe. Ji cumhûriyetan hin dikarin veguherin dewleta netewe. Cumhûriyet zêdetir li demokrasiyê vekirî ye. Têkiliyên wê bi civakê re bi şêwazê dewleta netewe nînin. Ji yekdestdaran zêdetir dûr disekine. Cumhûriyet rejîmeke hevgirtin û lihevkirinê ye, lê rejîma dewleta netewe yekalî xwe li ser civakê ferz dike û çawa bixwaze dewletê welê li hev çêdike. Rejîma cumhûriyetê di warên îttîfaqên xwe û tewazuna civakê de hay ji xwe heye û guh dide wan, lê rejîma dewleta netewe her cure îttîfaq û tewazunê hildiweşîne, yekbûnê ferz dike û otorîteya navendî her xurt dike; têgihîştin û nirxên cihê yên siyasî, civakî, ekonomîk û çandî dike hedefa xwe û hewl dide wan bihelîne. Cumhûriyet dikare parve bike. Gelek fikrên cihê, çand, etnîsîte, pêkhatinên siyasî, rêvebe-riyên xwecih û herêmî dikarin di bin banê cumhûriyet û komarê de cih bibînin, lê dewleta netewe weke pêkhatin û zêhniyetê li dijî van şêwe û rengên cihê û yekparebûnan e.

Di modelgirtina dewleta netewe de bêtir behsa sê mînakan tê kirin.

Mînaka Franseyê modela pêşî ya dewleta netewe ye. Dewleta netewe li Franseyê ji dayik bûye. Afirîner û xwedayê wê Napolyon e. Nasnameya siyasî esas digire. Bi xurtkirina qada siyasî û huqûqî, di xala ku ber bi faşîzmeke tîpa elman ve neçe de nêzikahiyeke wî ya hîn kevneşopî heye. Di warê etnîsîte û nijada serdest de zêde çavnebar nîne. Her kesê çand û zimanê Fransî parve dike, dikare di

nava dewleta netewe ya Franseyê de cih bigire. Tirkan ji vê modelê îlham girtiye. Li dinyayê yên dane ser vê rêyê hene.

Modela elman çandê esas digire. Çanda xweserî neteweya elman hem şertê welatîbûnê û hem jî yê dewleta netewe ye. Li ser vî hîmî mezinbûna dewleta netewe ya elman ji ber ku zêdetir meyldariya wê ber bi faşîzmê ve heye. Bandora xwe li dinyayê kiriye. Tirk jî ji vê pratîkê bi tesîr bûne. Elman ji vê modelê dibihurin.

Mînaka Ingilîz nermtirê wan e. Ingilîz ne weke Fransiyan li pey yekîtiya siyasî diçin, ne jî weke Elmanan yekîtiya çandî esas digirin. Di warê dewleta netewe de mînakeke welê pêşkêş dikin ku zêdetir li pêkhatinên siyasî û çandî vekirî ye.

i- Ji bo mirov karibe pêşketin û veguherîna dewleta netewe fêm bike, girîng e ku ji aliyê zeman ve bigire dest û li ser rawest e. Tevî ku me gelek caran destnîşan kir ku forma dewletê ya bingehîn a moderníteya kapîtalîst e û ji lewra mirov wê di nava rêveçûna dîrokê de negire dest nikare rola wê bi temamî fêm bike.

Hollanda û Ingilîstan ji bo armancên Spanya û Franseyê yên împaratortiyê bişkînin li dewletên hînê bi tesîr geriyane û vê lêgerînê jî bi xwe re tîpa dewleta netewe xistiye rojevê. Hem ji aliyê siyasî û malî ve, hem jî nexasim ji aliyê jinûve avakirina artêşê ve, dewleta netewe li hemberî avahiya berê ya eskerî û siyasî serdestiya wê her ku çû zêdetir hat piştrastkirin. Berê pêşî di warê deryayê de serdestî bi dest xistin. Di dawiya sedsala 16. de serdestî ango hegemonya li deryayan ket destê Hollanda û Ingilîstanê. Di serê 1700'î de li Spanyayê bi Franseyê re di şerên xanedaniyê de serdestiya xwe piştrast kirin. Lê belê Franse û Awûsturyayê armancên xwe yên der barê împaratoriyê de bi ti awayî nediterikandin û vê yekê zirareke mezin li wan kir. Şensê xwe yê ji bo bibin dewleta netewe ji dest didan. Her weha ji aliyê malî ve pêkhatinên dewletê bi berdêlên giran li ser wan rûdiniştin.

Hollanda û Ingilîstanê li hemberî xwestek û armancên ji bo împaratoriyê destek dan avakirina dewleta netewe. Nexasim polîtîkayeke gelekî bi bandor bû ku Dewleta Prûsyayê weke dewleteke netewe ya xurt derxistin pêşberî Awûsturya û Franseyê. Polîtîkayeke din a bi bandor ew bû ku hemû hêzên muxalifên Ewrûpayê û di vê navberê de yên li ser şopa dewleta netewe timî palpiştiya wan kirin û bi vî awayî hevrikên xwe hilhilandin, bêtaqet kirin. Ji ber ku hema hema bê îmkan bû ku hevrikên wan bi dewletên netewe karîbûna. Peymana Westpahaliyayê encama van bûyeran bû. Ewrûpaya dewleta netewe li hemberî Ewrûpaya împaratoriyê zemînê xwe berfireh dikir û serdestî bi dest dixist. Di Şoreşa Franseyê de armanca Ingilîstanê ew bû ku qralê pêre li hev nedihat bixîne û dîsa muxalifan bixe rojevê. Destek dan her kesê ku bi qral re nakokiya wî hebû. Bi awayekî din mirov dikare bibêje ku Şoreş di çarçoveyeke din de bi temamî nebe jî komployeke Ingilîstanê bû. Lê qraltiyê paşê bi Cumhûriyet û Napolyon hesabên der barê derbasbûna dewleta netewe de xira kirin. Ingilîstan ji Napolyon hema hema xilas bû. Her weha polîtîka Prûsyayê jî bi heman encamê re rûbirû bû.

Em mînakeke dişibe ya Napolyon di avakirina Komara Tirkiyê de dibînin. Wexta ku Ingilîstanê li hemberî Îttîhadiyên elmangir destek da muxalifên alîgirê Ingilîzan, hema mînaka Napolyon xwe dubare bike, Mistefa Kemal Paşa karîbû xwe ji navê derxe. Hem alîgirên Elmanan û hem jî alîgirên Ingilîzan bi bin ketin. Gelek ezmûn û tecrûbeyên polîtîk ên Ingilîstanê yên bi heman rengî hene. Divê mirov van ezmûneyan hûrûkûr lêbikole. Her weha divê mirov ji bîr neke ku bi Masonan re polîtîkayên xwe dimeşîne.

Di çarçoveya Ewrûpayê de di sala 1861’ê de li Îtalyayê û di sala 1871’ê de bi yekîtiya neteweyî ya Elmanyayê re bi hilatina van herdu dewletên neteweyî, serketina dewleta netewe misoger bû. Vê carê jî şerê hegemonyayê ket navbera Ingilîstan û Elmanyayê. Salên di navbera 1870-1914’an de ango çilûpênc salan herdu alî li

îttîfaq û hevgirtinê geriyan. Şerê Cîhanê yê Yekemîn derbên mezin li armancên hegemonîk ên Elmanyayê xistin. Şerê Cîhanê yê Duyemîn mîna şerekî tolhildanê bû. Encam bi awayekî dil û kezebşewitî hilweşîna dewleta netewe ya Elmanyayê bû.

Rûsyayê bi Şoreşa Cotmehê di sala 1917'an de xwest valatiya hegemonyayê ya bi têkçûna Elmanyayêderketiye holê dagire. Ji ber vê yekê, Sovyet bi lez veguherandin dewleta netewe. Lê belê hevgirtina Ingilîstana xwedî ezmûn bi DYE'yê re, xwestekên Rûsyayê yên hegemonyayê mîna yên Franse û Elmanyayê pûç kirin. Bi awayekî fermî jihev-deketina Sovyetê di sala 1989'an de dihat wê maneyê ku Sovyetê dev ji îdîaya hegemonyayê berdida. Hegemonya Ingilîstanê ya sêsed salî bi salên 1945'an re di berdêla bibe hevgirtiyekî piçûk ê DYE'yê de ev hegemonyadariya xwe dewr kir. Yekîtiya Sovyetê li dijî hegemonyadariya DYE'yê tevgerên rizgariya neteweyî destek kir û ev polîtîka encama şerê sar ê di navbera salên 1949-1989'an de bû. Dema şerê sar ê di navbera DYE û YKSS'ê de ji bo dewletên netewe serdemeke zêrîn bû. Tengezariya di navbera wan de kir ku gelek gelek dewletên netewe peyde bibin. Pêvajoya dewletên netewe di sala 1914'an de li Ewrûpayê û di serê salên 1970'î de jî li gelemperiya dinyayê temam bû. Şerê Cîhanê yê Duyemîn krîza pêşî û ciddî ya dewletên netewe yên Ewrûpayê bû. Yekîtiya Ewrûpayê weke berhema vê krîzê derket holê.

Mijareke din a divê bê rohnîkirin ew e ka modernîteya kapîtalîst çima dewleta netewe weke model pêşde biriye. Tevî ku vegotinên me ji bo ravekirina van sedeman bû, sedemek jî; vê modelê bi hêsanî firsenda pêşketinê nedida şêwazên mîna împaratoriyê. Eger împaratorî bi ser keta, dibe ku şensê yekdestdarên kapîtalîst weke serdemên navîn bûna. Ji ber vê sedemê, ziravê xwe kirin devê xwe û li dijî çar armancên mezin ên împaratoriyê li ber xwe dan. Spanya di navbera salên 1500-1600'î de, Franse di navbera salên 1600-1870'î de, Elmanya di navbera

salên 1870-1945'î de û Rûsya jî di navbera salên 1945-1990'î de bi armanc û daxwaza împaratoriyê rabûn, lê bi polîtîkayên dewleta netewe hatibûn pûçkirin. Divê mirov împaratoriyên Osmanî û Awûsturyayê jî li van zêde bike.

Herçiqasî navê bûrjûwaya neteweyî hêjayî dewletên neteweyî bê dîtin jî rastiya xuya dike ew e ku dewleta netewe berhema yekdestdarên kapîtalîst e yên ku bi pey sîstemeke dinyayê ya navneteweyî ketine. Mînaka Tirkiyeya ku xwe neteweparêzeke hişk dihesibîne jî bi erêkirina Ingilîstanê û hevgirtina DYE'yê hat meşandin. Bêyî sîstema kapîtalîst a navneteweyî, pêşketin û hilatina dewleta netewe mumkin nîne. Dewletên netewe yên Sovyet û Çînê jî di nava vê de ne. Di damezrandin û li ser piyan mayîna wê de yek ji sedemên sereke ew e ku bersiva herî baş a polîtîk, garantiya karê ya sermayeyê, didin. Kengî ev xisletên xwe ji dest dan, hingî hêdî hêdî hatin veguherandin û hewl dan hebûna xwe pêşî di bin hegemonya Ingilîstanê de û paşê jî di bin ya DYE'yê de dewam bikin. Bê polîtîka sîstema dinyayê ango modernîteya kapîtalîst û hegemonyadariya wê, ti dewleta netewe nikare demeke dirêj li ser piyan bimîne. Rewşeke berevajî wê bi mentiqê sîstemê re li hev nekira. Ya pêre li hev neke jî yan wê pir bi zehmetî bijî yan jî wê hilweşe. Yek ji mînakan ku vê gotina me piştrast dike ew e ku Sovyet û Çîn bi xwe jî ji bo karibin li ser piyan bimînin hewcedar bûn bi DYE'yê re li hev bikin.

Di vê rewşê de em dikarin dawiya trajîk a Seddam Husên jî baştirfêm bikin. Sîstem nas nekir an nexwest nas bike. Ji bo li ser piyan bimana bi tenê şensekî wî hebû, ew jî diviyabû Iraq veguherandana sîstemeke berfireh a demokratîk. Ji ber baweriya xwe ya xurt a bi xwedayê dewleta netewe, ev şensa xwe bi kar neanî. Wexta li ber sêdarê bû û Qurana ku gotinên xwedayê berê têde nivisandîbûn di destê xwe de digirt jî, bi awayekî xemgînane eşkere bûbû ku li hemberî xwedayê nû yê sîstemê xwedayê wî yê berê di hewara wî de nedihat û hêza xwedayê wî têrê nedikir wî

rizgar bike. Lê xwedayê sîstemê jî ango Levîathan di nava çirava Iraqê de têra xwe diperpite. Li tevahiya cografya Rojhilata Navîn di rewşeke zehmet de ye.

Ewrûpa ji xwe re li xwedayekî nû digere. Heye ku ji xwe re xwedayekî hînê aştîxwaz û huqûqparêz ava bike. Ewrûpayê di tevahiya dîroka xwe ya dewleta netewe û netewebûyînê ya çarsed salî de gelek şerên xeternak dîtin û di serî de şerê herî dawî Şerê Cîhanê yê Duyemîn weke nerazîbûna ji tevahiya şerên dîtine hewl dide Yekîtiya Ewrûpayê pêşde bibe. Aliyên gelekî texrîbker ên dewleta netewe ku derketin holê, bi rêbazên beridandinê li ser hîmê welatîbûneke nû ya Ewrûpayê di qada ekonomîk, civakî, siyasî û dîrokî de bi sazî, bawerî û fikrên nû hewl dide li pey xwe bihêle. Ev bi awayekî helwesta rexne li xwe girtinê ye. Ev pêvajoyek e ku divê mirov bi baldarî bişopîne û nikare ji destpêkê ve pêşbîniya wê bike ka wê çawa bi encam bibe. Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê DYE li Iraqê helwesta xwe ya li dijî dewleta netewe ya bi kêra wî nedihat bi awayekî hişk nîşan da; Seddam ê mîna Louisê 16.[6] ê şaristaniya dewleta netewe û rejîma wî xira kir. Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê dibe ku bi şêwazê xwe yê fedaratîf li şûna dewleta netewe, Iraqê ji nû ve ava bike.

DYE di navbera hegemonya û împaratoriyê de asê bûye û ev yek jî piştrast dike ku di pêvajoyeke zehmet re derbas dibe. Îdarekirina dewletên netewe bi hegemonyayeke lawaz zehmet e. Mînak têkiliyên wê yên bi Tirkiyê re vê piştrast dikin. Heye ku weke împaratorî tecrîd bibe. Hilweşîna Romayê nehatiye jibîrkirin. Lê ji ber ku ji bilî wê hêzeke din nîne xwe li împartoriyê biceribîne, ev jî şensê wê zêde dike. Her tişt tinebûna rêyekê nîşan didin. Bi hegemonya dewleta netewe ya klasîk dikarîbû heta serê sedsala 21. bi zor û zehmetî hebûna xwe dewam bike. Yekîtiya Ewrûpayê YE gaveke pêşî ye, lê gavek e ku hînê tê avêtin, hînê pêk tê. Siberoja

[6] Louis ê 16'an: Di Şoreşa Franseyê de bi giyotînê hat kuştin.

wê diyar nîne. Sîstema Neteweyên Yekbûyî NY mîna dayika wê be, tengavbûn û asêbûn dewleta netewe nîşan dide. Ne cihê çareserkirina pirsgirêkan e, mîna ku cihê mezinkirina wan be. Nayê texmînkirin ku yekîtiyên din ên herêmî û parzemînî dewleta netewe ya bûye asteng li dawiyê bihêlin, lewma derfet û îmkanên çareseriyê hema bêjin xuya nakin. Dewleta netewe hem ji bo pirsgirêkên hundir û hem jî ji bo yên derve, êdî ji mêj ve modeleke çareseriyê nîne. Di dema damezrandina xwe de li dijî dagirkerî û danehevên pêşî yên sermayeyê modelên li cih bûn. Tevî vê jî di roja me ya îro de bi sedan mînakan derketiye holê ku hem pirsgirêkên siyasî, femînîstîk, hawîrdor, etnîk, çandî, dîrokî û civakî yên di hundir de ditepisînin ji nû ve serî radikin, îspat dike ku ne hêza çareserkirinê ne, hem jî modeleke welê ne ku li hemberî pirsgirêkên navneteweyî bi rola asêkirinê radibin.

Ji vî aliyî ve, ji pirsgirêka Îsraîl-Filîstînê gelek ders hene bêne girtin. Herdu jî bi modela dewleta netewe ya hişk ve girêdayî ne. Ji bo çareserkirina pirsgirêka Qudsê yan divê bajêr parçe parçe bikin an jî divê heta dawiyê bi hev re şer bikin û hevdu tine bikin. Ji vê mînakê çêtir mînak nîne ku aliyê kor û çareserneker ê sîstemê nîşan bide. Jixwe rewşa wê ya li Iraq, Afganistan û Libnanê li ber çavan e. Heye ku di dorê de Îran û yên din hebin. Ji ber ku ne adil û insanî, ne jî siyasî û demokratîk e, roj bi roj derdikeve holê ku şensê vê modelê tineye.

Dewleta netewe di salên 1970'î de bi qasî ku mezin bibe mezin bû û nexasim kengî Yekîtiya Komarên Sosyalîst ên Sovyetê YKSS ji hev belavbûn, ket krîzeke kûr. Krîza wê û ji ber ku bersiv neda pirsgirêkên sîstemê û dîsa ji ber ku her çû li pêşiya sîstemê bû kelem, li cem yekdestdariya kapîtalîst qîmeta xwe ya berê nema. Modela Yekîtiya Ewrûpayê hewldana ji bo krîz bi beridandinê ango qonax bi qonax li dawiyê bimîne zêde hêviyê nade. Ev rewş bi krîza giştî ya global a modernîteya kapîtalîst re têkildar e. Rojhilata Navîn ew qad e ku rewşa bi krîz lê werdigere kaosê. Ya diqewime

bi qasî Şerê Cîhanê yê Sêyemîn heye. Yekîtiyeke Ewrûpayê ya diduyan û Projeya Rojhilata Navîn a Mezin li gorî rastiya herêmê di wê rewşê de nînin ku bersivê bidin û bibin çare. Heye ku rewşa kaosê dirêj bajo. Dibe ku sîstem bi kirasekî sexte yê demokrasiyê dewleta netewe ji nû ve li herêmê ava bike. Hêzên demokratîxwaz, azadîxwaz û wekhevîtîxwaz bi pêşdebirina şaristaniya demokratîk dikarin bersivê bidin vê yekê û ev bersiveke li cih e.

Ez ê di parêznameya xwe ya bi navê **Li Rojhilata NavînKrîza Şaristaniyê û Çareseriya Moderníteya Demokratîk** de hewl bidim projeya Konfederasyona Demokratîk a herêmê guftûgo bikim.

j- Eger mirov dewleta netewe weke paradîgmayeke pir bi kok, aliyê wê yê epîstemolojîk (zanista zanînê)guftûgo neke, wê gelekî kêm bimîne. Binavkirinên heta niha nîşan didin ku dewleta netewe ji dewletekê wêdetir xwe dispêre paradîgmayeke cihê. Xebatên Thomas Kuhn der barê epîstemolojiyê de girîngiya paradîgmayê nîşan didin. Xusûsa di vê mijarê de dixwazim der barê paradîgmayê de bibêjim; hêza mezin a dewleta netewe der barê berevajîkirinê de ye. Kesekî di nava rewşa civakî ya dewleta netewe de gihîştibe, wê nêrîna wî ya zanistî li rastiyan ji sedî nod dijber be. (Hemin ev texmîneke min a hişkeber e.) Sedema vê yekê ya bingehîn ew e ku paradîgmaya dewletgir a neteweyî di şêweyê xwe yê avakirina welatiyan û xweberdana tevahiya çaviyên civakê de, têgihîştina xwe ya dîrok û civakê serwer û ava dike. Nemaze di pêkanîna dîroka netewe û dewletê de (herduyan di zikhev de ava dike) çawa ku awirê giştî yê li dîrokê înkar dike, dîroka civak, dewlet û neteweyên din jî bi piranî înkar dike yan jî berevajî dike û ji bo pêkanîna dîroka xwe bi kar tîne.

Welatiyekî ji vê paradîgmayê nebihure, nikare bibe zanyar ango nemumkin nebe jî nikare xebatên zanistiyê bike, eger bike jî wê berevajî be û ji bo şîroveyên manedar bike wê nikaribe bibe xwedî hêz. Ya yekemîn, fanatîk e; di çarçoveya dewleta netewe de

li her tiştî dinêre. Bi tevahî diyarde di şablona wî ya milletgir de bi cih nebin manedar nabin. Jixwe îmkan nîne ku civaknasiyê fêm bike. Perspektîfa şoven a netewe îhtîmala bidestxistina za-nistê kêm dike û bi tenê wexta dikeve çarçoveya wê dikare fêm bike. Ti diyarde, têkilî û bûyera naxwaze nikare jiberkirina wî xira bike. Texrîbata milletgiriyê weke dîn bi temamî di vê nuqteyê de derdikeve pêşiya me. Tiştekî ji milletgiriya wê re xizmetê neke bi ti awayî jêre manedar nîne. Eleqeya xwe jêre nîn. Rewşa wê ya derûnî û zêhnî lê girtî ye. Lewma rastiyên civakî yên li derveyî diyardeyên dewleta netewe îfade bikin, weke dijberê wê xuya dikin. Ji ber vê, her tişt ê di qada rastiya civakî de divê bi berçavkên dewletgiriya netewe xuya bikin. Ev berçavka hespan be jî wisa ye. Ev berçavk nikare li felsefî û dîrokê objektîf binihêre. Di wê rewşê de nîne ku li zanistê jî serwext bibe. Hişkbûna zêhn jî bi serê xwe astengek e.

Li derveyî civaka dewleta netewe nikare civakên din bifikire. Di vê mijarê de hişkbûyîn yan çavdêriya objektîv berevajî dike, yan jî ber bi nêrîneke bê eleqe ve dibe. Ji ber ku ji dîndarê herî muhafezekar zêdetir bi paradîgmaya herî muhafezekar li yê din dinêre, yan wî nabîne, yan jî weke dijmin lê dinêre. Cîhana dewleta netewe ji ber vê sedemê timî şer diafirîne. Heye ku mînaka Hîtler di vî warî de mînakeke balkêş be. Yan Ewrûpa û dinya wê weke ew dibîne bibe yan jî wê nebe, tine bibe. Zehmet nîne ku mirov îspat bike, ev paradîgma çawa vediguhere şîddetê.

Şerên dînî jî eşkere ye ku bi paradîgmayên cuda re têkildar in. Şerên çavkaniya xwe milletgirî ne, gelekî zêdebûna wan bi paradîgmaya dewleta netewe ango bi nêrîna bingehîn a dewleta netewe serwerkirî re têkildar e. Mirov zanist û agahiyê rast fêm neke, ev yek ê, bi awayekî pir xwezayî rê veke ku mirov bibe xwedî agahiyên şaş û çewt. Ev yek jî wê bi xwe re biryar û bicihanînên şaş bîne.

Kîjan zanyarê hûrûkûr xwediyê nêrîna (paradîgma) dewleta netewe be, di serî de civaknasî (em ji bîr nekin ku bi tevahî zanistên din kokeke wan a civakî heye) mirov nikare li bendê be; ew bibe xwediyê wê hêzê ku karibe şîroveyeke manedar bike.

Ev zêhniyeta ku hewl dide her tiştî bi 'ez' îfade bike, dibêje; 'sînorên min', 'civaka min', 'welatê min' û di her tiştî de 'ez', bi vî awayî di nava egoîzmê de ango di nava ezeziyeke mezin de noq dibe, xwe dinepixîne û mezin dike. Ji lewra em dikarin fêm bikin ku ji vê kesayetê ti biryar, têkilî û hêza çalakiyê ya tekûz çênabe. Ji ber ku dewlet û civaka wî, bi aso û dîroka wî re, bi xwestek û berjewendiyên wî re dibin yek, di warê neteweyî û navneteweyî de hêviya aştî û piştgiriyê jê nayê kirin.

Me hewl da vê paradîgmayê weke pêşnûmeyeke hişkeber pêşkêş bikin, heta ku em dernekevin derveyî fikra dewleta netewe ya vê paradîgmayê, nikarin bigihên zanistê, her weha şensê me wê nebe ku em bibin xwediya biryar û têkiliyeke rast. Nîşane hemû didin xuyakirin ku atmosfereke demokratîk ji bo şoreşeke zanistî derfet û îmkanan dide. Em ji agahiya dema 6000-4000 B.Z. (Kevana Bi Bereket) bigirin, heta bi Îyonya û Atînaya demên 600-400 B.Z., Ronesans, Reformasyon û Rohnîbûna ji sedsala 15. û pêve li Ewrûpayê dest pê kir, em ê bibînin ku demên di wan de zanist herî bi lez pêşketine, têkildarî asta azadiyê ya civakan in. Tevî desteketiyên wê yên mezin ên ku bi mirovahiyê daye qezençkirin, eger Ewrûpa hînê li dinyayê gelekî tê rexnekirin, ev ji ber egoîstiya wê ya berjewendîperest a dewleta netewe ye. Ji ber egoîstiya berjewendîperest a dewleta netewe, modernîte nikare ji pirsgirêkên roja me ya îro re çareseriyan bibîne. Çawa ku li tevahiya şerên girîng ên dûrî aqilan ên di van çarsed salên dawî de rê vekir.

Bi têgihîştina şaristaniya demokratîk hilberandina zanistê şensekî gelekî mezin e. Nexasim di atmosfera krîz û kaosê de pêdiviya bi zanisteke nû bi tenê bi serdestiya paradîgmaya civaka

demokratîk safî dibe. Bêyî çareserkirina pirsgirêkên epîstemolojîk wê çareseriyên pratîk pêş nekevin, eger ev wisa ye, hingî divê paradîgmaya dewleta netewe were hilweşandin û paradîgmaya modernîteya demokratîk bi serkeve, ev yek wê mirov bigihîne hêza çareseriyê.

## 5- ZEMANÊ MODERNÎTEYA KAPÎTALÎST

Mirov dîroka şaristaniyê weke serdema destpêkê, navîn û nû dabeşî sê beşan bike çewt nîne. Zêdetir îxtilaf li ser binavkirina naverokê ne. Ez yeqîn dikim ku naverok û şêweyê vegotinê yê ku ez di parêznameya xwe de esas digirim rohnî dike. Cihê nîqaşê ye ka mirov kapîtalîzmê weke şaristanî bigire dest an na. Di hîmê guftûgokirina min a şaristaniyê de şaristanî yekpare ye û weke 'çemê sereke' yan jî 'çemê mezin' diherike. Li guhera sêgoşe ya bajar, çîn û dewletê tevdigere. Şêweyê ev sêgoşe digire şêweyê şaristaniyê jî diyar dike. Em dikarin şaristaniya Sumer û Misriyan weke şêweyê pêşî yê klasîk, dema Grek-Romen, Îslam û Xiristiyantiyê weke dema stewînê, dema şaristaniya Ewrûpayê jî weke dema jihevdeketin û kaosê bi nav bikin.

Aliyekî din ê divê ez cihê bikim, aliyê Şaristaniya Demokratîk e. Tevî ku di nava çemê sereke yê şaristaniyê de cih digire jî mirov nikare weke heman rengî bigire dest û yek bihesibîne. Jixwe yekparebûna şaristaniyê têra xwe yekparebûneke nakok e. Nakokiya bingehîn di navbera şaristaniya dewletê ya yekdestdar û şaristaniya demokratîk a civaka nebûyî dewlet de ye. Nakokiya di navbera şaristaniya dewletdar û şaristaniya demokrasîdar de herî baş em di dema serdema antîk de di navbera du bajarên Grek de dibînin: ango bajarê Spartayê yê bi qraltiyê dihat rêvebirin û bajarê Atînayê yê bi demokrasiyê dihat rêvebirin. Di dema pêşketina şaristaniya Ewrûpayê de gelek nakokiyên bi vî rengî çêbûn, qewimîn. Ji sedsala 14. heta nîvê sedsala 19. gelek şerên di navbera dewlet û demokrasiyên bajaran de, ya rastî di navbera şaristaniyên demokratîk û dewletan de diqewimin.

Yek ji kêmasiyên girîng ên Marksîzmê ew e ku vî şerî di çarçoveyeke teng a çînî de dibîne. Şerê yekser ê çînan analîtîk e. Şerê berçav di nava gewdên civakî de pêk tê: di nava civaka dewletê û civakên demokratîk de diqewime. Encamên nêrîna di çarçoveyeke teng a çînî de têne zanîn. Jixwe di nava çînan de ti carî

sînorên mutleq nabe ku bêne danîn û her roj di nava çînan de çûnûhatinek heye, ya girîng rewşa wan a têgihîştinê û çanda ku tê de dijîn e. Çîna ku şristaniya xwe nas neke yan jî nikaribe wê pêk bîne, jixwe di rewşa tinebûnê de ye. Têkoşîna çînî ya bê şaristanî nabe. Ji ezmûna Sovyetê jî bi eşkereyî hat dîtin ku teza têkoşîna du çînan a di nava şaristaniyekê de çiqasî çewtiyeke xeternak e. Ji ber ku nikarîbû qalibên şaristaniya dewleta Ewrûpayê bişkîne, nikarîbû şaristaniyeke xweser a Sovyetê pêk bîne. Ji ber ku bi giranî qalibên modernîteya kapîtalîst kiribûn esas, di dawiya dawî de nikarîbû ku nebe weke wan û li heman aqûbetê rast neyê. Di dîrokê de gelek rewşên bi vî rengî qewimîne. Eger tu bi sîlehên kesên din şer bikî (şêwazê jiyana şaristaniyê), tu yê jî bibî mîna wan. Ji ber ku şoreş nikarin şêweyên xwe yên şaristaniyê diyar bikin, rewşên bi vî rengî derdikevin holê.

Di çarçoveya vê maneyê de şaristaniya kapîtalîst têgîneke teng e. Lê mirov şaristaniyeke mîna ya Ewrûpayê ku di nava xwe de gelek hêmanên xurt ên demokratîkbûnê dihewîne mîna ku şaristaniyeke hevpar a du çînan (karker-kapîtalîst) nîşan bide, ev yek ê gelek şaşiyan bigire nava xwe. Li şûna şaristaniyeke bi tenê ya Ewrûpayê, mirov weke Ewrûpaya demokratîk û kapîtalîst ji hev cihê bike, dibe ku mirov zêdetir jê hîn bibe.Hewl didin Yekîtiya Ewrûpaya îro di navbera van herdu şaristaniyan de pêşde bibin. Ev Ewrûpaya şaristaniyên lihevkirî ye. Ezmûneke balkêş a hêjayî lêkolînê ye. Neçarmayîna Ewrûpayê şaristaniya dewletê ya hişk bi rêûresmên gelekî bi hêz ên demokratîk bi hêzên gelekî nerm ên mîna huqûq û mentiqê dixe weznekê û ev yek bi binavkirina me ya derbarê dema dawiyê (rewşa şaristaniyê ya bi krîzan di zikhev de ye) ya şaristaniya bi dewletli hev dike. Pirbûna şerên di çarsed salên dawî de îspateke din a avahiya bi krîz e. Ji bo gelek guftûgoyên der barê sîstemê de mirov sîstema Sovyetê jî weke mînakeke piştrastkirinê dikare qebûl bike. Avahiya Yekîtiya Ewrûpayê, guftogoyên der barê siberoja wê de bi serê xwe bê

biryardariya moderníteyê û rizgarnebûna wê ji krîzê nîşan bide têr dike.

Şêweyê avahiya yekdestdariya kapîtalîst sedema bingehîn e ku em dibin xwediyê hukmekî bi vî rengî. Çawa ku Marks di Kapîtalê de piştrast kiriye, krîz bi sermayeyê, ango ji aliyê yekdestdariyê ve bi avabûniya wê ve têkildar e. Daneheva sermayê û kar bê krîz bi sernakevin. Çawa ku sermaye wexta karê neke nikare bisekine herwisa bê krîz jî natebite. Şoreş, demokratîkbûn û mafên mirovan her di rojevê de cih digirin, ev ne bi tenê ji ber pirsgirêkên hundirin, ya rastî ji ber pêdiviya lêgerîna bersiveke ji bo krîzê ye. Sedema wê; rewşa dinyayê ya nayê rêvebirin e. Di her dem û dewrana xwe de sermaya global tenê dinyayê rêve nebir; bi dinyayê re şer kir. Ji ber krîza di xwezaya wê de li gelemperiya dinyayê şer belav bûn. Bi derketina şaristaniyê re artêşa profesyonel a pêşî û şer her hebûn. Şaristaniya dewletê ji ber cewherê xwe serwerî civakê nebe, nikare pêşde biçe û mezin bibe. Serwerî jî desthilatdarî ye. Desthilatdarî jî bê serdestî, ew jî bê zor nikare pêk bê. Ji ber vê, Hegel dîrok şibandiye 'selexaneyekê'.

Herdu şaristaniyên beriya kapîtalîzmê ji aliyê hejmara avahiyên bajar, çîn û dewletê ve cihê ne. Bajar piçûk in, çîn bi sînor in, dewlet hindik û piçûk in. Ji lewra şer hindik û demkurt bûn. Lê dîsa jî şîddet di karekterê avahiya şaristaniyê de hebû. Lê di kapîtalîzmê de bajar, çîn û dewletê bi tevahî civak daqurtandiye û bi vê jî nemaye, hawîrdorê, binerde û sererdê jî dadiqurtînin. Rewşên kaotîk hem xwe li civakê û hem jî li hawîrdorê ba didin. Wallerstein dibêje; kapîtalîzm piştî salên 1970'yî ji ber şêweyê pêkhatinê ketiye krîzê û hukim dike ku ev krîz ê 25 heta 50'î salan dewam bike. Wexta dibêje; encam ê bi kalîteya zanist + rêxistin + çalakiyê diyar bibe, beşek ji diyarde û têkiliyan tîne ziman. Xuya ye ku hê xwe ji têgihîştina buhranê dewrewî ya Marksîst xilas nekiriye. Li gorî min a rast ew e ku mirov tevahiya demên kapîtalîzmê bi buhran bibîne. Di vî beşî de bi kurtayî ez ê hewl

bidim demên kapîtalîzmê dabeş bikim, hem şêweyê pêkhatina wê, rewşa wê ya bi krîz, hem jî pirsgirêkên wê yê veguherînê, di asta pêşnûmeyê de guftûgo bikim.

### A- Kapîtalîzma Bazirgan a Yekdestdar

Qada herî kevn a sermayê bazirganî ye. Di dîrokê de li dora sîteya Ûrûkê di dema 4000-3000 B.Z. de mirov dikare behsa serdemeke bazirganiyê bike. Em dizanin ku Asûriyan ji Anatolyayê heta bi Hindistanê koloniyên bazirganiyê ava kirine. Fenîkeyî qewmê pêşî ye ku karîbû koloniyên bazirganiyê yên pêşî li her devera Derya Spî ava bike. Di dema împratoriya Persan de ji aliyê bazirganiyê ve berfirehbûn û ewlekarî di çarçoveya globalbûna herî berfireh de ye. Di şaristaniya Greko-Romen de bazirganî bi awayekî xurt bandora xwe dewam kiriye. Bêyî bazirganiyê li ser piyan mayîna bajarên mezin zehmet e. Bajarê mezin tê maneya bazirganiya mezin. Şaristaniya Îslamê ya li Rojhilata Navîn hêzeke mezin a global e, li ser rêya ber bi bazirganiya Rojava ve diçe qonaxa dawî ya herî mezin e. Tevahiya rêûresmên ji bo bazirganiyê hewce ne, mîna ku temam bûne. Hêmanên mîna pere, krêdî, banke, sened, bazar û çûnûhatinê, di şaristaniya Îslamê de weke argumanên kevn û nû, bûne sektorên herî zêde giraniya wan heye. Bajarên bazirganiyê yên Îtalyayê ya esas rêûresma bazirganiya Îslam û Bîzansê wergirtine.

Di sedsala 13. de serdestiya di bazirganiyê de bi destê Îtalyayê derbasî parzemîna Ewrûpayê bû. Bajarên bazirganiyê yên Îtalyayê di salên navbera sedsala 13. û 16. de serdestiya xwe ya di bazirganiyê de dewam kirin. Ji sedsala 16. û pêve serdestî ket destê bajarên yekdestdar ên Hollanda û Ingilîstanê. Serketina bazirganiya kapîtalîzmê bi giranî ji vê sedsalê pêve bi destê paytextên van welatan London û Amsterdamê pêk hatiye. Di ser Atlantîkê û Pozê Hêviyê re (Cape of Good Hope) keşfa Emerîkayê û Başûr-rojhilatê Asyayê û tevlîbûna wan a nava rêyên bazirganiyê,

yek ji şoreşên herî mezin ên bazirganiyê ye. Bi van rêyên nû re rêyên bazirganiyê yên Rojhilata Navîn ên weke rêûresmekê ji Rojhilat heta Rojava û ji Bakur heta Başûr dirêj dibûn û serdestiya wê li ser hebû, ji sedsala 16. û pêve derb xwar û qîmeta wê ya berê nema. Şaristaniya Rojhilata Navîn ji sedsala 16'an ve her tim bi paş ket û têkiliya vê ji nêz ve bi vekirina van rêyên nû yên bazirganiyê re heye. Bi şoreşa îndustriyê re derba herî stratejîk xwar û heta roja me ya îro careke din hêz û taqeta wê nebû bi ser xwe ve bê.

Daneheva pêşî ya sermaya herî mezin a Ewrûpayê di sedsalên 15. û 18. de bi roleke sereke radibe. Ji sedsala 10. pêve pîşekariya bajêr mezin bû û hegemonya xwe ya pêşî li ser cotkariyê çêkir. Tevgera pîşesaziyê cara pêşî bi awayekî ciddî weke manîfakturê bû yekdestdar û belav bû, têkiliya vê mezinbûna wê ya hecmî têkiliya wêbi hegemonyadariya yekdestdar a bazirganiyê re çêbûye. Di dema xwe de şîrketên herî mezin ên bazirganiyê yên Hollanda û Ingilîstanê Kûmpanyayên Rojhilat û Rojavayê Hindê pozîsyona xwe ya pêşeng demeke dirêj dewam kirin. Amûrên bi tesîr ên sermayê weke banke, sened, krêdî, kaxiz, pere, muhasebe û fûarvanî di vê demê de bi aweyekî xurt bi sazî dibin.

Di vê demê de em careke din dibînin ku di nava yekdestdariyên bazirganiya taybet û yekdestdariya dewletê de yekîtiyeke ba di ber re naçe heye. Ya rastî, mumkin nîne mirov bêyî dewletê behsa yekdestdarî, nexasim jî bi serê xwe behsa yekdestdariya bazirganiyê bike. Ji serdema destpêkê ya bazirganiyê heta serdema bazirganiya Ewrûpayê, yekdestdariya dewletê her tim pêşeng bû. Ji bilî dewletê lîberalîzm dereweke mezin e. Maneya bingehîn a lîberalîzmê ew e ku dewletê bi temamî bixe xizmeta yekdestdariya ekonomîk û bi vî awayî dewleta siyasî bike dewleta ekonomîk. Lîberalîzma bêdewlet mîna baxçeyê bêxwedî ye. Di vê demê de giraniya bazirganiyê li ser dewletê, bi gotineke hînê rasttir; têkiliyên wê bi yekdestdariya bazirganiyê re bi roleke sereke radibin.

Ji ber vê sedemê, ji vê dema navbera sedsalên 15. û 18. re dema merkantîlîst tê gotin. Ya rastî, dewlet bi saya bazirganiyê bi ser xwe ve tê û sedema vê jî ew e ku pê budçeya xwe zêde dike. Mirov dikare ji vê re milletgiriya bazirganiyê jî bibêje. Ji ya digire zêdetir difiroşe û bi vê rêyê dibe dewleta herî serdest. Dewleta neteweyî weke dema mezinbûna monarşiyê jî tê zanîn. Di warê civakî de arîstokrasî dest diavêje bazirganiyê û arîstokratbûyîna bazirgan bi vê re di zikhev de çêdibe, bûrjûwazî weke çîna modern a nû di vê serdemê de dibe xwediyê rêûresmekê. Em ji îdeolojiya bûrjûwayê bigirin heta şêwazê jiyana wê, ji têgihîştina wê ya modeyê heta mîmariya bajêr, di gelek waran de reformên bi kok têne kirin.

Reformasyon û Rohnîbûn di vê serdemê de bûne. Lê mirov dema Reformasyon û Rohnîbûnê weke tevgerên bûrjûwaziyê bifikire, mirov ê gelekî bixape. Reformasyon di cewherê xwe de neteweyîkirina dîn e; ango şaxberdana neteweyî ye. Têkiliyeke wê ya xwe disipêre sedeman bi bûrjûwaziyê re nîne.Armanca wê ew e ku fikra dînî ya ku di dogmayan de fetisiye û dema xwe temam kirî, di nava şertên demê de nû bike. Tevgerek e ku dîn li gorî demê bi rêkûpêk dike. Ew jî parçeyekîşoreşa fikrê ye. Rohnîbûn şoreşeke fikrê ya berfirehtir e. Paradîgmayên fikrê yên berê bi giranî li dawiyê têne hiştin û paradîgmayên nû mohra xwe li demê dixin. Şêwazên fikrê ji her alî ve bi nû ve dibin. Pêşketinên di du qadên girîng de tên jiyankirin, bi şoreşa zanist û felsefeyê ve jî têkildar in. Rasthatina li serdema bazirganiyê xweber e, lê ji ber karekterê çînî yê bûrjûwaziyê mirov dibîne xwedî lê derdikeve û dike malê xwe. Her-du qadan jî ji xwe re dike sermaya entelektuel. Girîngiyeke mezin a vê tevgera wê heye. Di berdêlê de navnîşaneke çînî ya rewa bi dest dixe. Karektera yekdestdaran a kurtêlxur piştguh hatiye kirin, di vê de herî kêm bi qasî arîstokrasî û mutleqiyetê rola fikirdarên Rohnîbûnê jî heye. Ji ber ku bûrjûwazî çîneke nû ye pêk tê, zêde li ser encamên wê rê li ber veke nefikirîne. Ji lewra jî bi

tevahî kêmasî û neyênî kirine malê çînên berê. Karektera çîna navîn mohra xwe li serdemê dixe û di vê de bûrjûwazî bi rola sereke radibe.

Bûrjûwazî, ji aliyê îdeolojîk ve destekê dide milletgiriyê û vê jî ji bo li ser bazara neteweyî bibe yekdestdar dike. Ji bo reqîbên xwe tesfiye bike milletgirî bi roleke bi tesîr rabûye. Ji bo xwediyên sermayê yên ji milliyet û neteweyên din li derve bihêle; bûye hîmê her cure dijminatiya nijadperestî, neteweyî û dînî. Milletgiriyên beramberî hevdu sor kirine. Li gelemperiya dinyayê li dijî Cihûtiyê hisên nefretê bi vê sedemê zêde bûne. Cihû êdî sembola xerabiyê ne û li pêşiya armancên neteweyî êdî di rewşa astengeke herî ciddî de ne. Cihûyan li dijî vê bi şêweyekî parastina navneteweyî û xurtkirina dostaniyê, ji bo dijminên xwe tesfiye bikin rêxistiniya masontiyê çêkirin. Herçend koka Masontiyê bigihîje serdema navîn jî rola wê ya esasî di vê demê de girîng bûye. Di nava gelek tevgerên serhildêr de pareke girîng a Masontiyê çêbûye. Pêşiya Siyonîzma ku Milletgiriya Cihûtiyê ye vekiriye.

Têkiliya bazirganî û kolonyalîzmê mirov dikare bi serdema derketina kapîtalîzmê re deyne û pêşketina wê ya piştre wexta mirov li ber çav digire, di dema kolonyalîzma merkantîlîzmê de mirov dikaribû hêvî bike ku bi şêweyê çipkirinê pêşbiketa. Kolonyalîzma vê demê weke mêtingeriyê derdikeve pêşiya me. Du parzemînên di dîrokê de hîç kolonî nas nekirine, Emerîka, Awûsturalya û bi hezaran girav di vê demê de mêtingeriyê nas dikin. Bi tevahî parzemînên berê yên dinyayê, di serî de Efrîka û Asya, ji bo ku her yekê ji wan veguherînin parzemînên mêtinkariyê hema bêje ji nû ve keşif kirin. Bi vê armancê, xebatên mîna oryantalîzm (zanista şerqiyatê) û antropolojiyê (zanista mirov) dest pê kirin. Mirov dikare vê weke mînakeke baş ji bo têkiliyên di navbera civaka nû û zanistê de bihesibîne. Teoriyên der barê nijada jor de derfetên pêşketinê di vê demê de bi dest xistine. Xwestine Darwînîzmê li ser civakê biceribînin. Xebatên dîrok û

cografyayê bi paradîgmaya nû bi dest xistine û ev yek jî di çarçoveya heman armancan de hatiye kirin. Ev xebatên keşfê mîna dinyayê li kapîtalîzmê vekin hatine kirin.

Kolonîtî yan jî mêtingertiya encamên wê yê hînê sîstematîk hene, ya esas polîtîkayên belavbûnê yê yekdestdarên bazirganiyê ne. Ango şêweyên hînê modern ên talanê ne. Kapîtalîzma bazirganiyê ya Ewrûpayê bi giranî li ser hîmê talana mêtinkariyê pêk hatiye. Wexta ku zîv û zêrên Emerîkayê dihatin talankirin, berhemên tevnê yên erzan bi buhayên nehatiye dîtin bûne amûrên girîng ên vê talanê. Ne bi tenê pêkhatina buhayên bê tewazun, -bazirganiyê gelek demên, buha yekalî hatiye destnîşankirin jî dîtine. Kolonîtî ji aliyê yekdestdarên bazirganiyê ve di empozekirina buhayan de û di bedestxistina kareke zêde de bi rola sereke rabûye. Jixwe di hîmê kara bazirganan de ev rastî hene: yan newekheviyên buha yên di navbera bazaran de bi kar tînin yan jî bi rêbazên cûrbicûr ên mîna hilanîn û kêmkirina mal, bi xwe vê newekheviya buha çêdikin.

Fernand Braudel dibêje, di pêkhatina kapîtalîzmê de roleke diyarker a tevgerên spekulatîf ên bazirganiya mezin heye. Diyar dike ku li bazarê ti rola bihevguhertina ji rêzê nîne û ev xebatên ekonomîk ên normal in. Ekonomiyê bi pêşketina bihevguhertinê dide destpêkirin. Hilberandina malê bi armanca bikaranînê, ekonomî nahesibîne. Kengî tê ber pêvajoya bihevguhertinê êdî ekonomiyê dest pê kiriye. Li vê qadê kara bê kirin tineye. Di bihevguhertinê de mirov dikare behsa kara aliyan bike. Li vir spekulasyon tineye. Ya rastî, spekulasyon li qadên mezin ên bazirganiyê ne. Jixwe weke mala kapîtalîzmê tê binavkirin. Cudahiya di nava buhayan de bi lîstina bi buhayan tê çêkirin. Her wehaBraudel viya ekonomî nahesibîne, weke 'tiştekî' ji derve hatibe ferzkirin dibîne û weke ku naxwaze deşîfre bike. Ji vir û pêve zêde binav nake û ev jî weke kêmasiyeke mezin bi mirov re pirsan çêdike.

Haya F. Braudel ji cudahiya di navbera dewlet û desthilatdariyê de heye. Bi qasî Marks nebe jî ango fonksiyona dewlet û desthilatdariyê bê qîmet nîşan nede jî nikare diyar bike ku çiqasî bi tesîr e. Di Marksîzmê de wexta dewlet weke ekonomiya zêde û mezin tê binavkirin, dikare bê gotin ku zêdetir nêzî rastiyê ye. Lê ev destnîşankirineke giştî ya neberçav e. Ya rastî dewlet û desthilatdarî 'ekonomiya neekonomî' ne.Ango ekonomiyê weke qadeke lê berhemê zêde û nirx têne vedizîn dibîne û li vê qadê yekdestdariya xwe datîne. Di çarçoveya vê maneyê de qada di ser ekonomiyê re ye. Gelekî têkildar e. Bi tevahî mekanîzmayên wê ji bo bi rêbazên cûr bi cûr bi destxistina berhemê zêde û nirxan e. Cotkarî, bazirganî û pîşesazî di serê wan qadan de tên ku yekdestdariya xwe lê datîne. Di serê rêbazan de jî bacgirtin tê. Mînak bacên ne yekser têne girtin weke yekdestdariya bazirganiyê têkiliya dewletê ya dikeve nava tevgerê ye. Di vir de dewlet bi temamî bazirganek e. Li vir ji gotina ekonomiya gelekî zêde û mezin wêdetir, yekser bazirganek e. Para van bacan weke tê zanîn ew par e ku ji nîvê hatina wê dibihure.

Dewlet her weha gundikên cotkarî û heywan xwedîkirinê, bazarên cotkaran û buhayên berhemên wan destnîşan dike, ji lewra dewlet bi temamî yekdestdariyeke ekonomîk e. Di lîteratura ekonomiya Ewrûpayê de têkiliya ekonomiyê ya dewlet û desthilatdariyê timî şîlo tê hiştin. Hem sosyalîst hem jî lîberal tevî ku bi deh hezaran cild pirtûk nivîsîne jî hînê di wê rewşê de nînin ku vê qadê rohnî bikin. Marks dest neavêt vê qadê yan jî temenê wî têrê nekir ku ev jî bêşansiyeke mezin e. Di vê alozî û tevlîheviyê de para vê kêmasiyê mezin e.

Em divê li xwe mikur bên ku di xwegihandina serketinê ya serdema bazirganiyê ya navbera sedsala 15. û 18. de rola bingehîn a mekanîzmayên li derveyî ekonomiyê bû. Baş e, wê wextê ekonomî nîne, çi ye? Bi giştî ji bilî desthilatdariyê, bi taybetî jî dewleta weke îfadeya wê ya huqûqî ye, bêîmkan nebe jî zehmet e

ku hêzek vê qadê li gorî dilê xwe bi kar bîne. Belkî jî mirov dikare behsa klîkên hêzê yên yekdestdar ên cûrbicûr bike. Lê di encamê de ev hêz jî neçar in bi desthilatdariyê yan jî bi dewletê re ya îfadeya berçav a desthilatdariyê ye, têkildar bin. Carinan mirov dikarin ji vê qadê re bibêjin qadeke pereyî ye. Pere êdî ji amûrekî bihevguhertinê yê nirxê derketiye, ya rastî, herî kêm bi qasî şûr dikare bi rola hêzê rabe. Napolyon bê sedem di warê artêşê de negotiye 'pere, pere, pere'.Lê ev kîjan pere ye? Ev, ew pereyê ku bûye amûrê bihevguhertina nirxê nîne; ev ew pere ye ku ekonomî nîne. Ev pereyê bazirganiya mezin e, pereyê amûrê spekulasyonê ye. Pere di van qadan de bi temamî fermandar e, rêveber e. Bûrjûwazî ji ber ku li vê nuqteyê baş serwext bûye roleke girîng dide pere. Ji bo pere bibe fermandarê dewamî yê hêza civakê, kirine ku civak bi kêra selexanevan hatibe parçeparçekirin. Civak û heta dewlet xistine halekî ku bê pereyan nikarin bijîn, nikarin dewam bikin.

Anîna pere ya vê qonaxê belkî jî şoreşa rastî ya bûrjûwaziyê ye. Dewlet û civaka hewceyî pereyan tê wê maneyê ku êdî ketine bin fermana bûrjûwaziyê. Ji vê rewşê re ku mirov dikare bibêje şoreşa pereyan jî di dîrokê de cara pêşî di vê dema Ewrûpayê de pêk hatiye. Mînak, êdî hewce nake ku karkerek weke kole û serfekî bê girêdan. Jixwe wexta yewmiya xwe negire wê birçî bimîne. Birçîbûn wê wî mehkûmî pereyan bike. Karker xistine rewşekê ku ji bilî teslîmbûna pereyan ti çareya wî nîne. Ji lewra, ji bo peydakirin û rêvebirina karkeran, hewce nabînin weke xwediyên berê yên feodal û koledariya klasîk tevbigerin. Jixwe bi vî awayî hem mesref zêde diçe, hem jî zêde berpirsiyariyê dixwaze. Kapîtalîst jî hêza pere nîşan dide û bi vî awayî çawa dixwaze karkeran bi dest dixe û bi kar tîne.

Di mijara emtîayê de jî mirov dikare xusûsên bi heman rengî diyar bike. Emtîa weke mal, kirine ku bê pere nikaretevbigere. Her cure tevgera emtîayê têkildarî pere ye. Hilberandin, barkirin û

bikaranîna emtîayê bê pere mumkin nîne. Ev jî şoreşeke mezin a kapîtalîzmê ye: ango ekonomiyê dixe bin fermandariya mutleq a pere. Ekonomî êdî di destê pere de mîna lîstokekê ye. Di ti serdemê de ekonomî evçend bi pere ve nehatiye girêdan. Li vir pere bi temamî mîna dewletekê ye. Ne bi tenê mîna wê, dewlet bi xwe ye! Û heta dewlet jî bi vî awayî bi pereyan girêdayî ye. Dewleta bê pere, karkerê bê pere xistiye rewşa mal û emtîayê. Nakok xuya bike jî dewleta dewletê ya rastî pere ye. Anîna dewletê ya vê rewşê, vedîtineke sedsala 16. a Hollanda û Ingilîstanê ye. Dewleta bi hêz hatiye afirandin. Lê ev ew dewlet e ku bi pereyan ve hatiye girêdan. Dîroknas dibêjin; Franse ji ber ku di vî warî de bi serneketiye li hemberî Ingilîstan û Hollandayê di şerê hegemonyayê de têkçûye. Di serdema fînansê de em mijara pere hinekî din guftûgo bikin, wê bêtir zelal bibe.

Di pêşketina şaristaniya navbera sedsalên 15.-18. de bûrjûwaziya bazirgan weke aktorê herî girîng derdikeve holê û mirov dikare bandora wê li ser tevahiya civakê bi firehî guftûgo bike. Xisletên civaka bazirgan têne zanîn. Weke kesên zêde pere û faîzxur, tefekar û banker bi awayekî gelekî neyênî di bîra mirovahiyê de cih girtiye. Rexnekirina van hêmanên ku derba herî xedar li exlaqê xistine, di serî de wêje, di van sedsalan de herî zêde huner li ser vê mijarê sekinî. Mîna vîrusek ketibe civakê. Ev vîrus her civakê dikeritîne. Ji asta dejenerebûna giştî ya civakê berpirsiyar tê dîtin. Ew pereyê ku ji asta jirêderketinê ya giştî ya civakê berpirsiyar e têkiliyên berê yên germ û insanî li ser rûyê xwe yê sar dicemidîne. Yên pereyên wan tinebin di şerê ji bo jiyanê de weke ku têkçûbin. Her weha ji bo xwe mezin nîşan bide mîna berê hewcedarî bi textên zêr, sêniyên zîv, qesrên neqişandî, îhtîşam, nîşandana hêza xwe, kincên rengîn û sofreyên luks nîne. Bila bi tenê cihekî te yê tu têde pereyan veşêrî hebe, bes e. Êdî yê herî mezin tu yî. Hatina vê astê, pêşketina mirovatiyê nîne. Navê wê serdema nû be jîtiştekî nû pêşkêş nake. Hebe nebe tenê dikare

bibe destpêka krîza şaristaniyê. Ji bo kesekî hurmeta xwe ya li hemberî civakê heyî, ji vê rewşê xirabtir rewşeke krîtîk û piçûk bixîne tineye.

Sermaya bazirganiyê di vê demê de ji bo qadên din zêde xwedî xwestek xuya nake. Rêjeya kara wan têra wan nake. Ti qadeke din nikare bi kara bazirganiya mezin re serî bikişîne. Cotkarî û manîfaktur kengî nêzî kara bazirganiya mezin karê dikin, dibin ji wan sektorên hînê bi wan re mijûl dibin. Ango derfeteke bi sînor a pêşketinê dibînin.

Ji aliyê dîroka siyasî ve, dema em behsa wê dikin gelekî tevlîhev û aloz derbas bûye. Ji bo bibin dewama Împaratoriya Mezin a Romayê Spanya, Franse û Awûsturya pir dijwar xwe li hev radikişînin û ji ber ku meylên wan ên şêweyê împaratoriyên berê hene, wê nikaribin xwe ji têkçûnê xilas bikin. Di vê de têkiliya pere-dewletê bi roleke girîng rabûye. Li pey hev a ku Hollanda û Ingilîstanê gihandiye hêza hegemonyayê hêza fermandar a pereyê bazirganiya mezin e. Wexta ku ev dewleta xwe bi krêdiyên bazirganan bi hêz kirin, dewletê bi xwe jî weke bazirganan tevgerandine. Dewlet û siyaseteke di warê karê de gav avêtiye heye. Hêza fermandar a pere, nexasim di avakirina artêşa deryayî û artêşên nû de ispat kirine. Di ekonomiya wan de serketina kapîtalîzmê hilberandina erzan e. Hilberandina erzan tê maneya serdestiya bazirganiyê. Bi vê jî reqîbên xwe (ango dewleta ku bixwazin) di qada navneteweyî de têk dibin. Jixwe bi piranî jî di qada eskerî de têkçûne. Hollanda û Ingilîstanê bi şêweyê komplowarî destwerdane şoreşan û vê yekê jî serdestiya wan a siyasî piştrast kiriye.

Di van hemû qadan de serdestî hevrikên xwe bûn eşkere ye ku wê ev, serdestiya hegemonîk be. Vê serdestiya xwe bi bidestxistina mêtingehên berê yên Spanî û Portekîzî piştrast kirin, li Asya û Efrîkayê jî bi destguhertinên bi heman rengî serdestiya wan a di bazirganiyê de li pey hev hatiye. Bi îttîfaqên li parzemîna

Ewrûpayê Fransî bê tesîr kirin, xwesteka Awûsturyayê ji bo avakirina Împaratoriya elman şikandin û zanîn ku çawa bixwazin Çartiya Rûs bi kar bînin. Ji împaratoriyên bi hêz ên wê demê Împaratoriya Osmanî xistin pêvajoya nîv-mêtingehbûnê. Li hemberî şêweyê dewlet û hilberandina kapîtalîst serdema Osmaniyan weke xanedanên din derbas bûbû. Aqûbeta li benda Împaratoriyên Çîn û Hindê jî mêtingeh û nîv-mêtingehbûn bû. Pêvajoya bi lez tesfiyebûna şaristaniyên berê di rojeva dîrokê de bû. Tevî ku baş nedihat zanîn ya nû çi ye jî li ser navê pêşketinê her tişt bû. Mîna di her dînê nû de girêdan bi îmanê bû. Dînê xwe bazirganî, xwedayê xwe jî pere bû.

### B- Serdema Îndustriyalîzmê û Şoreşa Pîşesaziyê

Bi piranî pêvajoya îndustriyê û şoreşa pîşesaziyê wekhev tên dîtin. Lê tevahiya dîrokê îndustrî her hebû û heta verotina kevirê pêşî jî îndustrî yan jî pîşesazî ye. Keşfa cotkariyê di qada xwe de şoreşeke pîşesaziyê ye. Zenaetkarî pîşesaziyek e. Der barê hilberînê de vedîtina her amûr, agahî û rêbazê di pîşesaziyê de pêşketinek e. Bi tenê cinsê mirov ji bo têrxwarin, cilûberg û vehewînê, (bicihûwarbûnê) hilberandinê bi amûran pêk tîne. Pîşesazî, ango bi amûr hilberandin xweserî mirov e.

Di dawiya sedsala 18. de li welatê hegemonîk ê Ewrûpayê Ingilîstanê diyardeyek pêk hat, ya rastî ji vê diyardeyê re pêşengî dihat kirin. Ev diyarde xelekeke girîng a nûbûnan e ku demeke dirêj dewam dikin. Gerandina çerxa makîneyan bi enerjiya bi hilm û dûkelê îfadeyeke sembolîk e. Naxwe hêza makîne û hilmê ji mêj ve dihat zanîn, dihat bikaranîn. Li Hollanda û Ingilîstanê pêşengiya di warê manîfaktur û cotkariyê de berê hatibû bidestxistin. Hilberandina herî erzan û girseyî dihat kirin. Ev jî şoreşa pîşesaziyê dihat hesibandin. Destpêkê de Franse û Îtalya di îndustriyê de ne kêm bûn. Hilberandina erzanû girseyetî avantajek bû. Di bingehê hegemonyadariyê de ev diyarde heye. Girîngiya

pîşesaziyê ku di sedsala 19. de gava mezin avêt, kar bû, ango ji bo sermaye bi dest bixe û karê bike, li rêza pêş cih girt. Bûyera jêre şoreş hat gotin jî ew bû ku li gorî qezenc an jî kara ji bazirganî û cotkariyê dihat, kara ji hilberandina pîşesaziyê hat bi lez mezin bû. Di dîrokê de hilberandina di warê pîşesaziyê de cara yekemîn pêşengî bi dest dixist. Di cewherê şoreşê de ev diyarde heye. Li gorî rêûresmê cotkarî û dezgeya tevnê qadên hilberandinê bûn. Bazirganî li ser hilberandina zêde ya van herdu qadan bi şêweyê kirînûfirotina metayê dihat kirin. Tevgera jêre ekonomî jî dihat gotin di cewherê xwe de ev bû.

Eger em bi tenê ji aliyê hilberandinê ve binêrin em nikarin zêde tiştekî ji şoreşa pîşezasiyê fêm bikin. Çi ji aliyê cûrbicûriyê ve, çi jî ji aliyê piraniyê ve em bi diyardeya hilberandinê re rûbirû dibin. Û heta ku mirov dikare bibêje; mirovatiyê ji şoreşa cotkariyê mezintir şoreş nedît, ji aliyê dem û girîngiyê ve ti şoreş negihîşt şoreşa cotkariyê. Ji lewra girîngiya şoreşa pîşesaziyê di cihekî din de ye. Ne di cihekî de di gelek cihan de ye.

1- Di dîrokê de cara pêşî hilberandina bajaran ji ya gundan dibihure.Pîşekarê hezar salan weke hilberînerekî bi koka xwe bajarî timî weke alîkarê hilberînerê gundan bû. Bi gundan ve girêdayî bû. Ew nebûya jî gundan dikarîbû xwe dewam bikira. Şoreşa pîşesaziyê ya sedsala 19. piştî hezarê salan rêveçûna pêvajoyê berevajî kir. Eger em sedsalên 15. û 19. di weznekê de bihesibînin, sedsala 19. ev wezin bi timamî li aliyê pîşesaziyê giran kiriye. Ev rewş nû ye û wê gelek encamên girîng bi xwe re bîne.

2- Nûbûneke hînê girîngtir di qada civakî de ye. Civaka bajêr dikeve pêşiya civaka gundan. Civakên bajaran berê bi awayekî besît bi ser civaka gundan ve bûn, lê şoreşa pîşesaziyê hêza civaka bajêr bi awayekî nedîtî zêde kiriye. Civaka gundan êdî bi tevahî avahiyên xwe yên jor û jêr diket bin hukmê civaka bajêr. Mîna ku şêweyekî diyalektîka mêtingehkar a bajêr li ser gundçêdibû. Civaka bajêr destpêkiriye êdî civaka gund dike mêtingeh. Ji qada îdeolojîk

bigirin heta qada amûrên hilberandinê, ji exlaqê wê bigirin heta bi qada hunerê bajar gund bi awayekî eşkere ji xwe re dike mêtingeh. Şoreşa zêhniyetê bi lez rê li serdestiya bajêr a li ser gund vedikir.

3- Ji aliyê çînî ve jî mirov dikare behsa veguherînên dîrokî bike. Bi şoreşa pîşesaziyê re bûrjûwazî tê astekê ku serdestiya xwe ya li hemberî tevahiya çîn û tebeqeyan îlan dike. Bûrjûwaziya ku çîna karker jî kir yêdeka xwe, li hemberî dema feodal û beşên ji pîşekariyê mayî weke xwediyê paradîgmayê, yê dizane modern bijî, xwediyê bi tenê yê rastiyan û yê herî pêşketî bû; bi mîtolojî, dîn, felsefe û zanista xwe, ew civak, netewe û dîrok bi xwe bû. Yên din jixwe bûbûn mazî û yên mayî jî weke nirxên divê li muzeyan bimînin bûn.

4- Zanist cara pêşî bi şoreşa pîşesaziyê re bi plan beşdarî hilberandinê dibe. Teknîkên zanist û hilberandinê berê bi awayekî cihê bûn, her yek di cihoka xwe de diherikî, pêş diket. Bi şoreşa pîşesaziyê re cara pêşî dest dan hevdu. Zanist êdî ne armanc bû, ketibû rewşa amûrekî. Kengî zanist kirin amûr hingî bi awayekî ciddî ketin û serberjêrçûna civakê jî pêre dest pê kir.

5- Kara ji pîşesaziyê ji rêjeya kara qadên din gelekî bihurî. Aktorên nû yên civakê pîşekar bûn. Pîşesazî di her qadê de dihat menaya serketina stratejîk û yê ev sîleh di destê xwe de digirt, kesî nikaribû pişta wî bîne erdê. Bazirganî jî serdestiya xwe ji dest dabû. Cotkar jî êdî ketibûn rewşa rencberan.

6- Encamên şoreşa pîşesaziyê hînê girîngtir bûn. Ev şoreş ji aliyekî ve rê lidewleta neteweye vekir, li aliyê din jî ber bi derve jî çûna ber bi emperyalîzmê ve dest pê kir. Li gorî mêtingeriyê li ser rûyê dinyayê meşeke bêhtir sîstemkirî heye. Welat an jî welatên pîşesaz ên bi rola kilît radibin êdî wê duyemîn pêngava mezin a global li ser dinyayê ferz bikin. Mêtingerî ku pêngava yekemîn bû, tevî ku bi zehmetiyan re rûbirû bû jî rêbazeke berhemdar a serdestiyê nebû. Mêtingerî bi îxraca sermayeyê bi hevkarên

xwecihî dihat teqwiyekirin. Emperyalîzma kapîtalîzmê li ser hîmê şoreşa pîşesaziyê xwedî îmkan xuya dikir.

Çawa ku tê dîtin, encamên şoreşa pîşesaziyê gelekî berfireh bûn. Encamên siyasî û civakî yên şoreşê herî kêm bi qasî encamên wê yên ekonomîk bi tesîr bûn. Ya serketina şaristaniya Ewrûpayê vebirî kir pêngavên pêşîsaziyê yên di sedsala 19. de bûn.

Di girtina dest a şoreşa îndustiriyê de rexnekirina hin têgihîştinan girîng e. Ya pêşî ew e ku şoreşa îndustriyê bi kapîtalîzmê re yek tê dîtin. Mîna ku îndustrî yekser weke encameke kapîtalîzmê tê fêmkirin. Divê mirov vê têgihîştinê bişkîne. Weke Ronesans, Reformasyon û Rohnîbûnê şoreşa îndustriyê jî pêvajoyeke xwe ya xweser a dîrokî û civakî heye. Ango encameke ketî ser hev a civakî-dîrokî ye.

Bi giştî yekdestdariya dewletê, bi taybetî jî yekdestdarên kapîtalîst ew sazî neku timî hûrûkûr li ser nirx û berhemên zêde radiwestin. Li çi deverê daneheveke zêde hebe, mîna qirakên berateyan yekser bêhna wê dikin û li ser dipiçikin. Divê mijarê de bêvla wan gelekî nazik e û baş bêhnê dike. Ne mumkin bû ku nehatana dîtin, çawa enerjî û makîne xwe bi xwe dixebitin û di warê hilberandinê de rê li çavkaniyeke mezin a karê vedikin. Di mijara pîşesaziyê de ya sermayê kir ew bû ku ev herdu diyarde bi qadên berhemdar ên karê ve girê da.

Enerjî cara pêşî bû ku ji hêza milan rizgar dibû. Makîne têra xwe techîzkirîbûn ku bi rola milan rabin. Di warê çavkaniyên enerjiyên nû de ji bilî hilmê, ji komir, petrol, elektrîk û avê jî enerjî hat bidestxistin û ev yek şoreşeke rastî bû. Kengî sîstema makîneyan a xwe bi xwe dixebite bi cureyên nû yên enerjiyê re gihîşt hev, êdî binhega hilberandina mîna goleke biteqe zêde bû. Ev şêweyên makîne û enerjiyê yên heta roja me ya îro tevî bi mîlyonan celebên xwe, civakê û xwezayê hê jî bi lezeke mirov tê dernaxe wê heta bi ku biçe, bi giranî bandorên neçê dike, ji hev dixe, dide parçekirin û belavkirin. Sermayeyê ev yek weke

firsendeke mezin a dîrokê nirxand û şêweyên mezin ên nedîtî yên desthilatdariyê li serê civak û xwezayê gerandin û pêk tîne. Civak û xweza bi êrîşên nedîtî yên sermayê re rûbirû ne. Parastina civak û xwezayê ji çînayetî û têkoşîneke civakî wêdetir veguheriye pirsgirêkeke ontolojîk ango pirsgirêkeke man û hebûnê. Em bi çend mînakên bûyeran dikarin van tezên xwe berçav bikin.

a- Bajar bi kansêr dibin, gund hildiweşin. Dualîteyên civak û xwezayê, hem di nava xwe de, hem jî di navbera xwe de ji şêweyekî jiyanê têne derxistin. Em bi bûyereke welê re rûbirû dibin ku civaka nexweşketî û xwezaya ekolojîk êdî nabe ku dewam bikin. Ji şêweyekî hebûnê ango ontolojîk ê mirov têde dijîn wêdetir civakê vediguherînin parçeyekî dezgeha makîneya sîstema tehakum û mêtingeriyê. Bi şêwazekî ku di ti dema şaristaniyê de nehatiye dîtin, ferd, civak û xweza berdan hevdu, xwezaya têde wezna di navbera ekolojî û ferdiyetê de xira bûye weke tesîra êrîşên dijber ji civak û ekolojiya hawîrdorê tolê hiltîne. Ji aliyê bijîşkî ve bi sedan mînakan piştrast bûye ku kansêra ferdî bi koka xwe bûyereke civakî ye. Em di vî warî de dikarin behsa cixarê bikin. Cixareya ku tenê veguheriye hînbûyîneke civakî yek ji sedemên bingehîn ê kansêrê ye. (Modernîte cixare kişandinê sor dike û sektora tûtinê yek ji çavkaniya karê ya kapîtalîzmê ye) Em wexta vê li ber çav bigirin, em dikarin behsa kansêrbûna civakê bikin û wê bê fêmkirin ku ev têgîndanîneke rast e. Êdî kirine ku civak çarçoveyeke jiyanê nebe.

Gefa herî mezin a îndustriyalîzmê ango îndustriyalîzma bi tenê ji bo karê tevdigere, gihîştiye asta dijberiya civakê bike. Yek ji mijarên Marksîzm têde kêm maye jî ev mijar e. Marksîzm ji ber şêweyê pêkhatina wê ya pozîtîvîst, civaka îndustriyê weke diyardeyeke îdeal nîşan dide û bêyî îttîraz bike qebûl dike û heta dixe şûna xwedê. Ji ber ku wer dihesibîne; çîna karker bêyî wê nabe û nikare bibe. Di cewherê teorîk de ev heye. Rexneyeke piçûk li îndustriyê nake, li hemberî vê, tevna fabrîke û makîneyan

bêsînor mezin dike. Mirov bi hêsayî dikare bibêje; di avakirina dînê bi navê îndustriyalîzmê de para Marksîstan jî herî kêm bi qasî ya kapîtalîstan heye. Îndustriyalîzm herî kêm bi qasî Levîathanê dewleta netewe, niha ji mêj ve bûye Levîathanekî global.

Bajar bingehê tevîneka şaneyên kansêrbûna civakî pêk tîne. Em li ser dîrokçeya damezrandin û pozîsyona bajaran rawestiyabûn, lê tevî vê jî em neçar in têkiliya bajaran bi pêşketina civakî re timûtim bigirin dest û li ser rawestin. Herçend bajar şêweyekî civakê be jî diyardeyeke çînîkirinê û biryargeha dewletbûnê ye. Bi giştî tê qebûlkirin ku ev sê diyardeyên bingehîn têne maneya şaristanîbûnê ango civakên çînî, dewletî û bajarî têne maneya şaristaniyê. Bê sedem ji şaristaniyê re ‘medeniyet’ negotine. Gotineke erebî ye û tê maneya bajarî, ya xweserî bajar û jiyana bajar. *Civilisation* jî nêzî vê maneyê ye.

Li aliyê din, mirov bajar bi tenê weke diyardeyeke şaristaniyê bibîne, ev yek ê nêzikbûneke teng be. Ne lazim e bajar şaristanî û mekanê şaristaniyê be. Çawa ku gund diyardeyeke dîrokî ya damezrandina civakî ya jiyanê ye, mirov dikare bajêr jî di heman çavçoveyê de şîrove bike. Bêguman,ne dibe ku civak timî dişikeft û berqefan de bihewiya, ne jî neçar bû ku ji gundan derneketa. Diviyabû jiyaneke ji şikeft û gundan bibihure û mekanên wê bihatana avakirin. Bajar di encama van lêgerînan de di dîrokê de cihê xwe dît. Di pêşketina mejiyê analîtîk de rola bajêr girîng e. Bajar weke mekanê civaka têkiliyên wê tevlîhev û zêde di zikhev de mejiyê analîtîk ferz dike. Neçar dike. Pirsgirêkên civakê zêde dibin û divê çareseriya wan bi mejî bibe, ji lewra jî mirov fêm dike ka çima beşê pêwendîdar ê mejî bi şêweyê analîtîk pêş ketiye. Jixwe civak bi xwe vî cureyê mejî ferz dike. Bajar jî wî derdixîne asta jor. Mirov dikare bajar weke mekanê hewcedariya hevbeş ê komên gundan jî bi nav bike.

Ev xusûs gelekî girîng e. Em felsefeya damezrandina bajêr di vê diyardeyê de dibînin. Em nikarin bajaran weke avahiyên bê

gund bifikirin. Em dikarin vê têgihîştina ku gelekî belav e û hînê nav lê nehatiye kirin weke Urbanîzatîon (bajarîtiyê) binirxînin. Di cewherê wê de bajar li dijî gund bi cih dike. Felaket jî bi vê têgihîştinê re têkildar e. Bicihkirina bajar li dijî gund, ji têgihîştinekê wêdetir meylek e ku em di nava pêşketina dîrokî de wê nas dikin: bajar weke diyardeyeke li dijî gund nîşan dide û bi vî rengî dinirxîne. Ya rastî, di felsefeya damezrandina bajar û hîmê wê yê dîrokî de meyla çîneke teng û têgihîştina dewletdaran heye. Ev helwesta li dijî gund tê maneya berhemê zêde û desthilatdariyê ku di kûrahiya şaristaniyê de cih girtiye. Di tevahiya dîrokê de ji ber helwesta vê têgihîştinê, gund piçûk hatiye dîtin, piçûk hatiye xistin, nezan, bêîdrak, ji nazikbûnê bêpar û çor hatiye binavkirin. Dewlet û bajar li hemberî gund û jiyana li derveyî wan, ango bi piranî li dijî eşîr û qebîleyên li derveyî bajaran weke ku hevdu girtine xuya dikin. Nakokiyên di navbera civaka gund û bajar de bi awayekî neheq û bi awayekî bajar ji felsefeya rastî ya damezrandina wî dûr bixe, berevajî bike û bi pirsgirêk bike anî heta roja me ya îro.

Ya rastî mirov dikare bajar û gundan weke mekanên hevdu xwedî dikin (simbiyotîk), weke qadên jiyanê yên dest ji wan nabin, di weznekê de û li hev ava bike. Nemaze mirov dikaribû di navbera herduyan de, bi giştî wezneke ekolojîk di navbera şêniyên civaka bajar û şêniyên civaka gund de bidîta û ev yek ê herî îdeal bûya. Yek ji texrîbatên herî mezin ê şaristaniyê ew e ku bajar li dijî gundan mezin kiriye, weke navend û mekanekî mêtingeh û serdestiyê hiştiye. Li ser vî hîmî rola bajêr berevajî kiriye. Ango bajar ji kêrhatina wan a rastî anîne xwarê. Bi serê xwe ji bo ev qad jî bigihîje felsefeya xwe ya rastî ya damezrandinê hewcedarî bi çalakiyeke mezin a civakî heye.

Encameke din ku em karin ji dîroka bajêr derxînin ev e; bêyî ku li têkiliya xwe ya bi hawîrdorê re binêre mîna ûra kansêrê belav û mezin dibe. Bersiva pirsa ka ‘divê sînor û mekanê wê heta bi ku

be’ nade. Mentiqê bajêr ê hatiye berevajîkirin û şaristaniyên di bin vî mentiqî de gihîştine, berevajiyê tê zanîn, ne berhemekî aqil, ên bê aqiliyê ne. Ya rastî, berhemên aqlê analîtîk in ku têkiliya xwe ji his û jiyanê qut e û dişibe dengê ji tenekeyê tê. Ast û şaxên felaketê, bi awayekî muhtemel pêşî li wan nayên girtin îro hînê baştir têne fêmkirin. Bajar dîsa jî di serdemên pêşî de avahiyên bi heybet bûn. Mirovan aqlê selîm hînê ewçend ji dest bernedabûn. Di şaristaniya Sumer û Misrê de nakokiyên bi civaka gund û xwezayê re hînê kûr nebûbûn. Giraniya weznê hînê li aliyê civakên li derveyî bajaran bûn. Bajarên li derve û hundirê kelhan mezin dibûn ji aliyê zemînê xwe ve bi cotkariyê re yekpare bûn. Şêniyên wan kêm caran ji sed hezaran dibihurîn. Belkî jî bi tenê çend paytext karîbûn bigihîjin wê astê. Qirêjkirina hawîrdorê di wê astê de nebû ku bibe pirsgirêk. Mîmariyeke wan a manedar hebû. Bi awayekî organîk hevdu temam dikirin. Di şaristaniya Greko-Romen de perestgeh, bazar, meclîs, holên şanoyê û jîmnasyûm bi mîmariyeke bi pîvan û bi heybet bûn. Sekû, bernig û baxçe, bi nîzama malê re bi awayekî yekparebûnê temam bikin li hev dikirin. Bermahiyên van bajaran hînê jî heyecan û aramiyeke kûr diafirînin. Diyar e ku mekanê behsa wan tê kirin, xwedî maneyeke felsefî û naverokeke pîroziyê bûn.

Di serdema navîn de herçend yekparebûna bi bazirganiya ku zêde dibe re xira bibe jî dewam kir. Bandora çanda manewî ya giraniya xwe hebû mîmariya dînî derxist pêş. Hecm û şêniyên wan ti carî negihîştin wê astê ku gefan li jiyanê bixwin. Bi jiyana li derve û ya gundan re timî nêzî weznekê bûn. Bi giranî hevdu temam dikirin. Girîngiya cotkariyê, pîşekariya bajêr jî kir karekî pêşketî. Pîşekar hewcedarî gundiyan, gundî jî hewcedarî pîşekaran bûn. Ji nakokiyê wêdetir di navbera wan de yekparebûneke organîk hebû. Rîska wan a pê re rûbirû bûn bi tenê felaketên weke erdhej, hişkesalî û şer bûn. Nîzama wan a kele û bircan heybeta xwe dewam dikir. Bazirganiya mezin hînê di wê astê de nebû ku

pîşekar û gundan daqurtîne. Bazirganî weke sektoreke ekonomiyê normal li ser rêya xwe bû. Di navbera sedsalên 13. û 16. de bajarên Îtalyayê yên ku bandora Ronesansê dijîn jî nûnerên dawî yê vê demê bûn. Venedîk, Cenova û Floransa mîna ku di navbera şaristaniya klasîk û şaristaniya serdema nû de bi rola pirê radibin û digihînin hevdu.

Bi serdema nû re bajartiyê dest pê kir maneyên nû di nava xwe de hewandin. Serweriya bazarê li aso xuya dikir. Bazirganiyê her ku diçû giraniya xwe nîşan dida. Wezna dîrokî hêdî hêdî ne li aliyê gund û jiyana li derveyî bajaran giran dibû. Mîmariyeke bajêr a li gorî pêdiviyên bazirgan derdiket pêş. Têkiliya di navbera jiyan û hawîrdorê de ji dest diçû, zêhniyeta karê her tişt destnîşan dikir. Di serî de Parîs, London, Amsterdam û Hambûrg bajarên dihatin avakirin mohra serdema nû û merkantîlîzmê li ser wan hebû. Bajarên serdema bazirganiyê hem ji têgihîştina bajarên klasîk cihê dibûn, hem jî nakokiyên xwe yên bi civaka gund û xwezayê re bi lez didan der. Bajar weke baregeha bingehîn a Levîathanê modern pençên xwe dirêjî tevahiya civak û qadên hawîrdorê dikir. Serdema îndustriyalîzmê mirina bajêr e. Aliyê herî balkêş jî ew e ku nexweşiya kansêrê ya biyolojîk jî bi giranî nexweşiyeke bajêr e. Ji sedî sed têkiliya kansêrê bi bajar re heye, bajarê ku civaka xwe nexweş dike.

Şoreşa pîşesaziyê ya bi sedsala 19. re bi lez pêş ket, pêşî li civakê ango li navenda lê ji dayik bûyî da. Avahiyên mezin ên pîşesaziyê li bajaran kom bi kom zêde bûn, ev zêdebûna wan ne ku ji ber hewcedariyê bû, bi tenê ev ji hewcedariya bi karê bû. Li keviyên bajaran avahiyên bê serûber ji bo mayîna koleyên modern proleteran bûn. Bajar xerîbê van meskenan bûn. Mêtingehbûna civakên li derveyî bajaran û gundan temsîl dikirin. Ji tevgera kolonîkirinê ya serdema bazirganiyê xeternaktir weke kolonîkirineke hundirîn bajarên bê serûber û li keviyan dihatin çêkirin. Çi xwedî kar, çi jî bê kar, deverên behsa wan tê kirin ji

îndustriyê re kewarên kedê bûn. Ji bo bazirgan kewar çi be, ji bo pîşesazan jî keviyên bajaran û kolanên xizanan heman tişt in. Girêdayî vê diyardeyê gelek diyardeyên din ên ne li rê bi vê re çêkirin. Ji bo fabrîkeyan, fabrîkokan bajar dagir dikirin. Têgihîştin û modela serdema klasîk hat jibîrkirin. Bajar bûn navendên daqurtandina civakê. Di dawiya sedsala 19. de polîtîka bajêr a îndustriyalîzmê di bin tebeqeya mijê de bi zor û zehmetî bêhn dida û distend. Di dîrokê de cara pêşî bajarên bi mîlyonan bêne îfadekirin bejna xwe nîşan didan. Kesên ji mîmariyê fêm bikin, baş dizanin ku ne mîlyon, bajarên di ser nîv mîlyonê re jî wê kêrhatî nebin. Wexta ku bajar bû mîlyon an jî jê wêdetir çû, êdî asta krîza nexweşiyê derketiye holê.

Diyardeya jêre kansêrbûn tê gotin ew e ku şaneyek, bi şêwazekî tevahiya bunyeyê zevt bike, mezin dibe. Di rewşeke bi vî rengî de ji ber ku organên din ên hucreyê bi kêr nayên, nexweş dimire. Mezinbûna bajêr jî ji bo civakê encamên bi heman rengî bi xwe re tîne. Aliyên civakî û dîrokî yên diyardeyan jî heye. Kengî aliyek weke aşûtê mezin bibe û bê, wê wextê kansêrbûnê dest pê kiriye. Bajarên bûne mîlyon û tew ji bajarên ji deh mîlyonan bihurîne êdî ji civakbûnê derketine; civaka girse jêre tê gotin êdî bûye civaka keriyan. Çawa ku kerî gov û axuran tijî dikin, gotina herî baş a ku wê civaka mirov a li bajarîfade bike jî axur e. Mirovên dibin mîna keriyan, axur û govan tijî dikin. Ji mêj ve mirov razî kirine ku tenê bibin kesên ji rêzê yên dixwin û vedixwin. Di axuran de jî kerî bi heman rengî ne. Wekî din jî li ber serê wan keriyekî bêkaran danîne. Bi vê jî têne aşkirin. Têgînên weke Navenda Rêveberiyê, qesrên taybet û xaniyên bi baxçe, li gorî ruhê bajêr li cih nînin. Mirov dikarin navenda rêveberiyê li serê çiyê jî ava bikin. Xaniyên bi baxçe û bi koşk hewcedariya xwe bi bajêr nînin. Li her deverê dibe ku bêne avakirin.

Eger wisa be, wê wextê ji bajêr çi dimîne? Perestgeh, şano, meclîs, jîmnasyûm û bazarê ji zû ve şûna xwe ji mînakên sîmûltane

re hiştine. Rastir e ku mirov ji deverên wisa re bibêje; deverên lê nefesa sexte tê stendin. Di vê rewşê de siberoja bajar diyar nîne. Ji bo xwedîkirina bajarekî ku deh mîlyon şêniyên wê hene, divê civaka ekolojîk a herêmekê bimire. Bi tenê ji bo xwedîkirina vî bajarî, komkujiya civak û hawîrdorê divê. Çend bajarên pênc deh milyonî têra kuştina welatekî dikin. Trafîk hewayê qirêj dike, ev bi serê xwe têra mirina bajarekî dike. Piştî ku bajar ji rêjeya xwe bihurî maneya xwe jî nemaye. Li cihekî mane jî nemîne mirov nikare behsa jiyanê bike. Lê helbet em bêhn dan û stendinê jiyan nahesibînin.

Bajar berê ew dever bûn ku li wan rastî dihatin keşifkirin û felsefe dihat avakirin. Niha li bajarên îndustriyalîzmê yên hildiweşin jî sê S ; seks, spor û sinaet tevahiya naveroka wan hatiye pûçkirin û bajar kirine mîna axurên golikan. Ma ev mirina bajêr nîne çi ye?

b- Aliyekî din ê îndustriyalîzmê ku tine dike, êrîşali ser têkiliya jiyan û hawîrdorê ye. Bajar zêdetir ji hundir ve civakê kansêr dike, lê îndustriyalîzm bi tevahî êrîşê dibe ser hawîrdora jiyanê. Polîtîka îndustriyalîzmê ya dewleta netewe ku hînê jî qîmeta wê kêm nebûye hewce dike ku bi tevahî çavkaniyên civak û welat peyrewên îndustriyê bin. Dewleta netewe jî weke rê û polîtîkayeke welat pê radibe û pêş dikeve dibîne. Ya rastî, bi vê polîtîkayê ne welat radibe, pêş dikeve û dewlemend dibe, ne jî ti têkiliya wê bi hêzbûnê re heye. Sedema bingehîn a vê yekê ew e ku sermaye di vê qadê de rêjeya herî zêde ya ‘KAR’ê bi dest dixe. Îndustriyalîzm tevgereke rêveberiya karê ye. Bi têgînên weke sermayerazandin û pêşketinê armanca bingehîn vedişêrin. Eger kar hebe sermayerazandin û pêşketin jî çêdibe. Naxwe bi serê xwe sermayerazandin û pêşketin tiştekî îfade nakin. Îndustriyalîzm, bi hezaran carî ji milkiyetê zêdetir, diziyeke mezin e. Hem jî ev dizî ji tevahiya welat û xwezaya wî tê kirin.

Ez ji serî ve bibêjim ku em sermayerazandinê bi serê xwe naspêrin hilberandina fabrîkeyê. Mirov dikare modeleke fabrîkeyê û sermayerazandinê her tim li ser hîmê qenciya civak û hawîrdorê bi cih bîne. Ev bi serê xwe xirabiyê belav nakin. Kengî dikevin bin fermana karê, rê li kansêrbûnê vedikin. Îndustriya ji bo karê ji bo pêdiviyên civakî nîne. Pîvana kara zêde ji hewcedarî û pêdiviyê nîne. Ew bi xwe mentiqê xwe heye. Eger qada pêdivî pê heye karê bike, pêre eleqedar dibe. Naxwe wê qadê bi destê mirinê ve berdide. Teknolojiyên heyî rast bêne pêşdebirin û bicihanîn, ne bêkarî û xizantî, ne jî nexweşî û bêperwerdeyî weke pirsgirêkên civakî namînin. Ji van jî girîngtir, ji bo çavkaniyan hewce nabe ku hawîrdor bi fabrîke û teknîkê bê xirakirin.

Bi hezaran qadên ku bi hêsanî dikarin bersivê bidin pêdiviyên ji bo jiyanê girîng hene, lê belê ji ber ku li van qadan karê nabînin, wan bêkêr dihêlin. Ji bo karê carnan çavkaniyên bi mîlyonan salî bi zor û zehmetî beridîne û heta roja me ya îro hatine, bêyî ku li encamê bifikirin diqedînin. Polîtîkayên petrol, derya, daristan û kanan ji ber karê hawîrdor kirine qadên man û nemanê. Ti diyarde bi qasî komkujiya hawîrdorê nikare rûyê hov ê karê nîşan bide. Bi destxistina karê bi vî awayî dewam bike, ne çend sedsal, çend deh salên din wê felaketa hawîrdorê be. Jixwe bi hezaran zanyar vê yekê piştrast dikin.

Îndustriyalîzm ji bo mejiyê analîtîk serketineke super e. Lê bi awayekî xeternak jî têkçûna mejiyê hisî ye. Îndustrıyalîzm, ji nû ve hatina wehya herî kevn a xwedayî ye ku tevahiya ruhberan xistiye xizmeta insên. Gotineke şaş e, mirov bibêje; xistin xizmeta insên. Ji bo komikekê ku bi hêrsa karê radibe, bi tevahî ruhber têne qurbankirin. Di vê rewşê demirov bi xwe kengî mîna qurban bê pêşkêşkirin dibe meseleyekê demê. Ji bo ku mirov gotina xirab a di Pir-tûkên Pîroz de bi awayekî li cih rave bike, ti mînak bi qasî îndustriyalîzmê nabe emsaleke baş û li cih.

c- Divê mirov îndustriyalîzmê weke pirsgirêkeke hilberandinê nebîne. Yekdestdariya sermayê û hilberandina li ser karê hatiye avakirin, maneya rastî didin. Îndustrî heta nekeve xizmeta yekdestdarên karê, mirov dikare pêdiviyên bingehîn ên civakî û şertên hawîrdorê li ber çav bigire, li gorî derfetên zanist û teknolojiyê her tim hilberandinê ango polîtîkayeke sermayerazandinê bihûne. Di cewherê meselê de zêde ferq nake ku bi mekîneyan an jî bê mekîne bê kirin. Bi tenê yek jê bi lez hildiberîne ya din jî hêdî, ewqas. Jixwe li vir a diyarker ew e ku şert bi pêdiviyên civakî, hawîrdor û ekolojiyê re li hev bikin. Lez û hêdîbûn bi serê xwe armanc nînin. Ango di hilberandinê de pêvajoya makîneyan bi serê xwe çê û xirab nîne. Ji sedsala 19. heta roja me ya îro armanca karkirinê her mohra xwe li diyardeya bi navê îndustriyalîzmê, bi makîne û bê makîne, bi lez û hêdî, li tevahiya pêvajoyên sermayerazandin, hilberandin û bikaranînê xist, weke encam jî her tişt dibe pirsgirêk û kangren. Ji lewra bajar anormal mezin bûn. Sîleh bi awayekî xeternak pêşketin. Artêşên dêw hatin avakirin. Li dinyayê şerê dijwar û xeternak qewimîn. Hawîrdor hat talankirin. Cinawirê jêre dewleta netewe tê gotin hat afirandin. Jiyan bi tevahî hat pûçkirin. Polîtîka hat tinekirin. Wexta ku kapîtalîzm weke yekdestdariyê mohra xwe li hilberandina bi makîneyan da, cinawirê bi navê îndustriyalîzmê bi awayekî nerewa jê çêbû. Nuqteya esas jî ev e.

Yekdestdariya dewletê berê di cotkariyê de, paşê jî di bazirganiyê de berhemê zêde zevt kir. Bi sedsala 19. re bi awayekî nedîtî bi hilberandina pîşesaziyê re, bêguman bi vedîtina makîne û enerjiyên nû yekdestdarî ava bû, kara di ti dema dîrokî de bi dest nehatiye xistin hat bidestxistin, bi gotineke din weke berdêla berhemê zêde, sermaye hat bidestxistin. Wexta ku kar li ser îndustriyalîzmê tê ferzkirin her tişt ji rê derdikeve. Wê wextê karkirina bi îndustriyê û îndustriyalîzm, têgînên gelekî ji hev cihê ne. Her weha îndustriyalîzm ekonomî jî nîne; yekdestdariya

ekonomiyê ye; ya li ser hilberandina pîşesaziyê tê ferzkirin, dewlet an jî taybet ferq nake, yekdestdarî ye. Civak bi hezarê salan e ku bi keda destê xwe, bêyî ku bibe xerîbê xwe weke xebatên ekonomîk li qadên hilberandinê çi fabrîke, çi dezgedar, çi gundikên cotkariyê û çi jî manîfaktur xebitiye û ev ne yên guftûgokirinê ne. Pirsgirêk hilberandina li van qadan nîne. Dîsa pirsgirêk bihevguhertina li bazarê jî nîne. Kengî yekser dewlet an jî hin kesên li ser navê dewletê tevdigerin, ji derve van qadên ji bo pêdiviyên mirovan dixin destê xwe û bi rêbazên bacgirtin, talan û karê zêdeyiyê didizin, ha hingî pirsgirêkên mezin û ciddî yên ekonomîk û civakî derdikevin holê. Ji sedsala 19. heta roja me ya îro hilberandin piştî dema em jêre dibêjin şoreşa pîşesaziyê bi awayekî anormal bû qada karê û bi vê re di encama ferzkirina yekdestdaran de bi awayekî dijwar di serî de şerên neteweyî û çînî derdikevin, civak hem di nava xwe de, hem bi civakên li derveyî xwe re û hem jî bi xwezayê re şerekî hûrûkûr dike. Civak bi qasî ku ti carê nebûye, dibe xwediyê desthilatdariya ku hukim dike. Herkes bi qirika herkesî digire. Bi awayekî din mirov bibêje; ev cinawirê Levîathan ê ku Hobbes di berhema xwe ya bi heman navî de behs dike ‘şerê herkesî bi herkesî re’ bi dawî nake. Berevajî vediguhere ‘şerê herkesî bi herkesî re’ şerê li dijî xwezayê û bi xwe re. Ango civak dibe cinawir, cinawir dibe civak an jî ev dibe qonaxa dawiyê.

d- Têgîna civaka pîşesaziyê jî bi serê xwe manedar nîne. Wexta yekdestdarên pîşesaziyê têne avakirin, civak hînê zêdetir bi emtîabûn, bi hilberandina pevguhertinê ve, hilberandin jî bi pîşesaziyê ve tê girêdan. Maneya kapîtalîzma pîşesaziya yekdestdar ew e ku qadên hilberandinê yên mayî bi pîşesaziya yekdestdar ve têne girêdan. Di vê çarçoveyê de civaka pîşesaziyê dikare weke qonaxeke din a şaristaniyê manedar bibe. Mirov bibêje; qonaxeke bi vî rengî ya şaristaniyê mohra xwe li sedsala 19. xistiye, rastir e. Ji ber ku ji her demê zêdetir di vê demê de derfet û îmkanê vedizîna karê dîtin, mirov dikare ji vê demê re bibêje;

serdema herî bi heybet a kapîtalîzmê. Di vê serdemê de hêrsa ji bo karê xwe li tevahiya civakê digerîne. Kapîtalîstbûyîn dibe armanca jiyanê û dikin şêwazê xwezayî yê jiyanê. Ha di vê çarçoveyê de civaka pîşesaziyê cara pêşî ye diqewime. Di asta herî jor de kapîtalîstbûna civakê ye. Qral êdî tazî ye, ango cara pêşiye ku kapîtalîstên li rêza pêş ên nû, lê ji yên berê cudatir, bi xeml û kincên xwe yên ji rêzê, komeke qral in, xwe weke welatiyan pêşkêş dikin. Qral jî pir dibin, xwe ji rewşa xwe ya bi heybet û xemilandî dikin û bi awayekî ji rêzê êdî hene. Civaka pîşesaziyê di çarçoveya vê maneyê de civakeke qralên tazî ye.

Karkerê bi heqdestiyê ve hatiye girêdan di vê civakê de zêde dibe. Ji awirekî din mirov binêre, ev çînek e ku ji civakê hatiye cihêkirin. Cudahiya xwe ji koletiya klasîk ew e ku bi koletiya heqdestiyê ve hatiye girêdan. Ji aliyê etîk ve rast nîne ku mirov bibêje kîjan rast e, yan jî çewt e. Yek ji şaşiyên girîng ên Marksîstan ew bû ku di vê civakê de bûrjûwaziya pîşesaz û çîna karker pêşketî îlan kirin û mohra paşketî li beşê mayî yê civakê xistin. Herçî berevajî ya rast e. Yekîtiya çîna karker û pîşesaziyê dibe ku xisleteke modernîteyê be; lê ji aliyê wekhevîtî, azadî û demokratîkbûnê ve di çarçoveya dewleta yekdestdar de ne. Xwediyê helwestekê ne ku zêdetir nêzî antî-civakîbûnê ye. Qewlê rewşenbîran bi vê hevgirtina çînayetî re, li ser navê sosyalîzmê jirêderketineke bê şens e. Civaka yekdestdarên pîşesazkaran weke têgîn timî civaka xwedî şer îfade dike. Bê sedem dewleta netewe nebûye şêweyê dewletê yê vê demê.

e- Dewlet û siyaseta yekdestdariya pîşesaziyê dewleta netewe ye. Li ser hîmê milletgiriyeke herî zêde, bi tevahî civaka neteweyî bi dewletê ve tê kelandin. Dewleta netewe herî zêde di vê demê de hatiye îdealîze û realîzekirin. Sedema bingehîn a vê yekê, kara zêde ya sermayê û belavbûna wê ya li civakê ye. Ji bo kara xwe zêde bikin divê tevahiya civakê bi yekdestdarên pîşesaziyê ve girê bidin. Ev jî şerê navxweyî ye. Lê bi dewleta netewe ya bi milletgiriyeke

zêde û dîsa bi desthilatdariyeke şidiyayî barkirî, ev şerê hundir tê tepisandin û bi vî awayî nîzama kara zêde tê danîn. Di vê demê de weke sîstem hêdî hêdî pêşketina faşîzmê bûyereke xweser nîne. Bi milletgiriyeke bibe dîn, civak dibe kerî û desthilatdarî heta şaneyan belav dibe.

Modernîteya Rojava ya ji sêberên îndustrî, dewleta netewe û kapîtalîst pêk tê, ji ber vê naveroka xwe dibe şaristaniya herî xwînrij a vê serdemê. Modernîteya ku xwe spartiye sêbera ketiye zikhev; hem di nava civakê de şer ango faşîzm, hem jî di navbera dewletan de şerên neteweyî, herêmî û cîhanî pêk tîne. Em timî dubare dikin, di bingehê vê de şêweyê pêkhatin û parvekirina karê heye. Wexta ku dewleta netewe hedefa xwe ya sereke weke îndustriyalîzm destnîşan dike, rengê xwe yê kapîtalîstbûyînê yan jî xwesteka xwe ya ji bo wê dixe rojevê. Kapîtalîst wexta hedefa xwe ya siyasî weke dewleta netewe diyar dikin, dizanin ku dewleta netewe bi milletgiriyê bihevkelandina netewe mumkin dibe û eşkere dikin ku ev jî ji bo sîstema karê nîzamekî dewletê ye ku herî zêde hewcedarî pê heye. Kengî pîşesazî hem ji bo dewletê, hem jî ji bo kapîtalîzmê bû hedefa sereke, wê wextê çarenûsa sedsala 19. û 20. diyar dibe. Pîşesazî jî weke cotkariyê, weke manîfakturê serdemeke hilberandinê ye. Xwe dispêre mîrateya şaristaniyê. Lê ti serdema hilberandinê bi qasî serdema pîşesaziyê kar û zêdekirina hêza desthilatdariyê nedaye yekdestdariya kapîtalîst û dewletê. Ji ber vê yekê, dewlet û kapîtalîst di pîşesaziyê de dikevin pêşbaziyê. Ne ku pir zêde li ferd û civakê difikirin an jî ji netewe re pir bi hurmet in, ji ber derfet û îmkaneke dîrokî ya karê bi destxistine, evçend bi çavkorî dibezin.

Civaka pîşesaziyê ji aliyê dîrokî ve ji nêz ve bi îdealên hegemonya û şer ve têkildar e. Franseyê çendîn zor da hevgirtina Hollanda û Ingilîstanê, van dewletan jî ji bo statuya xwe ya hegemonîk ji dest nedin dîsa xwe avêtin dawa hilberandina erzan. Dîrok nîşan dide, eger pêşengiya şoreşa pîşesaziyê nebûya,

hegemonya Ingilîstanê, heye ku di serê sedsala 19. de, nexasim li hemberî Napolyon têkbiçûya. Li ber serê Franseyê Çartiya Rûsyayê û DYE hino hino nû mezin dibin û tê gotin şensê wan ê hegemonyayê heye. Piştre jî Elmanya wê beşdarî vê pêşbaziyê bibe. Şens û belkî jî çareya bi tenê ya li ber Ingilîstanî şoreşa pîşesaziyê ye. Ev rewş careke din nîşan dide ku zarûret zorê dide afirîneriyê. Makîneyên bi dûkelê dixebitin û pêşketina makîneyên tevnê careke din çerxa dîrokê li gorî dilê Ingilîstanê gerandin. Vedîtinên nû yên eskerî û siyasî bi hilberandina nû ya pîşesaziyê re bi lez û bi hêz dibin. Ev jî bi xwe re li pey hev serketinên eskerî tîne.

Wexta ku xelekên zincîrê hevdu temam kirin, êdî qetandina wan zehmet e. Têkçûna Napolyon tevî hin sedemên din, bi îhtîmaleke mezin encama şoreşa pîşesaziyê ye. Hegemonya Ingilîstanê bi vê şoreşa pîşesaziyê ji bo bibe împaratoriyeke mezin a cîhanê, gava xwe diavêje sedsala 19'ê. Sedsala 19. sedsala bi heybet a Ingilîstanê ye. Di vê sedsalê de Ingilîstan cara pêşî navnîşana 'Împaratoriya Roj Lê Naçe Ava' bi dest dixe. Ev împaratoriyeke klasîk nîne. Weke Roma û Osmaniyan nameşe. Gelek pêkhatinên siyasî yên di asta dewletan de di bin bandora wê de hene û ev ji bo împaratoriya wê kêmasiyek an jî zirarek nînin. Weke modeleke xweser ku gelek pêkhatinên siyasî di nava xwe de dihewîne, herçend her biçe qels bibe jî karîbûye heta roja me ya îro bi navê Koma Neteweyên Ingilîz (British Commonwealth of Nations) hebûna xwe dewam bike.

Şewazê îxrackirina şoreşa pîşesaziyê ya li dinyayê, di şêweyê her şaristaniyê de bi heman awayî pêş dikeve. Piştî ku xwe ispat dike, pêşî li Ewrûpaya Rojava û di dawiya sedsala 19. de li tevahiya Ewrûpayê belavbûna xwe dewam dike. Di serê sedsala 20. de gavavêtina xwe ya li tevahiya dinyayê bi lez dike. Yekdestdarên Ingilîstan û Elmanyayê pêşengiya hevrikiya di navbera yekdestdarên pîşesaziyê de kirin û ji ber gavavêtinên bê tewazun,

du şerên mezin ên cîhanê û gelek şerên herêmî û xwecihî qewimîn. Careke din em dibînin ku kara pîşesaziyê yekdestdarî ye, yekdestdarî jî dewleta netewe ye, dewleta netewe jî şer e. Eger em ji bîr nekin, tevahiya dewletên netewe bi şer hatine avakirin, mirov dîroka karê û bi destxistina herêmên îxraca pîşesazî û pîşesazîbûnê bi şêwazekî bi tesîr di van şeran de bibîne. Eşkere ye ku di cewherê şer û dewletgiriya netewe de bidestxistina karê heye.

Dema pîşesaziyê weke emperyalîzmê tê bimanekirin û ev jî bi îxrackirina wê ya derve re têkildar e. Pîşesazî dikare li mêtingeh û nîv-mêtingehan, li qadên girêdayî û hewce jî hinekî pêş bikeve û dikare bibe sedema destpêkirina şerê hundir an jî derve. Şerên rizgariya neteweyî ku diyardeyeke xurt a sedsala 20. bûn di cewherê xwe de bi bernameya pîşesaziyê ya li qadên mêtingeh û nîv-mêtingeh re têkildar e. Statuya wan a pêşengiyê çi dibe bila bibe, hemûyan dewleta netewe, dewletên netewe jî pîşesazî kiribûn serê bernameya xwe û ev jî yek ji kevirê çarqozî yê çûna ber bi kapîtalîzma dinyayê ve bû. Di vê çarçoveyê de Şoreşên Çîn û Rûsyayê bi analîzên dawî şoreşên pîşesaziyê û dewleta netewe ne. Bûyer vê pêvajoyê bi awayekî bi tesîr piştrast dikin. Şerên rizgariya neteweyî ku bi rêbazên cihê hatibin meşandin jî herçî sedsala 20. bi giranî serdema pîşesaziya derveyî Ewrûpayê ye.

Ev serdem bi xetên sereke heta çaryeka dawî ya sedsala 20. bi tevahî giraniya xwe bi cih tê. Qonaxa piştre tê ew e ku Ewrûpa pîşesaziya jêre dibe bargiranî û zêde karê nayne (qirêjiya hawîrdorê û heqdestên zêde) îxracî dinyayê dike. Pêşî mal, di sedsala 19. de mal û sermaye, di sedsala 20. de jî mal, sermaye û pîşesazî bi mekanîzmeyeke sêber îxracî dinyayê hat kirin. Hema bêje ti herêmeke dinyayê ya pîşesazî nas nakiribe, nemaye. Bi vî awayî em dikarin bibêjin ku serdema pîşesaziyê giraniya xwe ya esas nemaye, ya rastî pîşesazî bi sermaya fînansa pîşesaziyê dewam dike. Şaristaniya Ewrûpayê ya ku serdema xwe ya pêşî bi

bazirganiyê û ya duyemîn jî bi şoreşa pîşesaziyê meşand, weke qonaxa sêyemîn û dawî, di serdema xwe ya fînansa global de ye. Serdema fînansê bi giranî piştî salên 1970`yî destpêkiriye, bi rola xwe ya pêşengiyê rabûye. Serdema fînansê mijara beşa ji niha û pêve ye.

Her serdem a beriya xwe ji holê ranake, dixe dereceya duyemîn. Bazirganiyê di sedsala 19. de dewam kir. Lê li gorî pîşesaziyê di warê karbidestxistinê de hêza xwe ya berê nema û di dereceya duyemîn de ma. Serdema fînansê berî niha bi gelekî hîmê xwe danîbû. Komarên bajaran ên Îtalyayê şêweyekî komarên fînansê bûn. Gelek qraliyet bi fînansê bi xwe ve girêdan. Di serdema bazirganiyê de jî di warê karûbarên pereyan de, di warê deyndayîn û stendinê de bi lez bûn û çûnûhatina wan zêde bû. Ji bo debarê, krêdî gelekî baş bû. Lê di warê karê de sektorek bû ku li rêza sêyemîn cih digirt.

Rexnegîr û rexneyên li pîşesaziyê, kengî talankirina hawîrdorê bi awayekî berçav hat dîtin û rîskên vê talanê gihîştin asteke global, zêde bûn. Felaketên îndustriyalîzm rê li wan vedike êdî gelekî têne guftûgokirin ka mirovatî dikare çawa serî bi wan re derxîne. Felaketên behsa wan tê kirin, derketine asteke welê ku êdî nakokiyên wan bi jiyanê re ji holê nayên rakirin. Zanist û teknîk bi awayekî wisa bê berpirsiyarî tên bikaranîn êdî tê guftûgokirin ku mirov dikare weke qiyametê binirxîne.

Di bingehê tevahiya pirsgirêkan de têkiliyên karê û pîşesaziyê hene. Wexta ku herdu bê dezgîn digihîjin hevdu, bihêlin pêşketinê, hatiye dîtin ku veguherîne guloka pirsgirêkan. Ji ber ku pîşesazî li tevahiya qadên civakê hukim dike û qadeke civakî ya veneguherandibe mijara emtîayê nehiştiye, pirsgirêkên civakî gihandin asteke nedîtî. Gelek pêşketinên çavkaniya xwe pîşesazî ye bi qasî ku bi xwezaya civakan re li hev nake, bi hawîrdorê re jî li hev nake. Hema hema bi tevahî gund û pêkhatinên li derveyî bajaran daqurtandine û em niha nû bi encamên wê re rûbirû dibin.

Dîsa encamên veguherîna dijberê bajêr hîna nû têne dîtin. Ji bilî guftûgoyan, der barê alternatîfan de tiştek li naverastê nîne. Hemin civak wê bê pîşesazî nikaribe bijî. Lê wê nikaribe yên li ser navê pîşesaziyê têne kirin jî rake. Antî-îndustriyalîzm her biçe dikare bi hêz bibe. Xebatên der barê bajar û hawîrdorê de gelek ekolên di vî warî de girtine nava xwe. Di ketina qada siyasî de jî her diçe cih dibînin. Ev hewldan ji sînorê reforman nabihurin, ji lewra mirov nikare li bendê be ku ev hewldan tewazuna xirabûyî ya herdu xwezayan ji nû ve ava bike, naxwe bendewariyeke bi vî rengî wê safiktî û bergî nedîtin be. Heta ku di paradîgmaya heyî ya şaristaniyê de bin, wê nikaribin ji guhertinên şiklî wêdetir encamekê bidin.

Neyêniyên ku şaristaniya pênc hezar salî bi xwe re tîne, belkî jî serdema pîşesaziyê bi tenê çend qatên din zêde kiriye. Ev fikrek e ku bi tevahî çavdêr li ser hemfikir in. Germbûna hewayê bi tenê yek ji wan mînakan e. Talan û hilweşandin ji texmînan jî wêdetir kûr û berfireh e. Ne bi tenê rexnekirina serdema pîşesaziyê, rexnekirina tevahiya şaristaniyê divê. Marksîstan û muxalifên din pirsgirêk yan xistine çarçoveyeke teng a ekonomîzma çînî yan jî xistine kategoriyên weke hawîrdorparêzî, çandparêzî û femînîzmê û vê yekê rê li ber hin encamên erênî vekiriye. Lê xwe nikarîbûne bigihînin bernameyeke siyasî û çalakiya wê, ev jî herhal bi kêmasiyên wan ên bi kok ve têkildar e.

Her ku li ser alternatîfa şaristaniya demokratîk diponijim, ez dibînim ku ev hilbijartineke bi îsabet û li cih e. Lê alternatîfên şaristaniya demokratîk ên bi kok bi bername û rexneyên berfireh, herî kêm bi qasî wan bi rêxistin û çalakiyan bibe yek û kengî me bi paradîgmaya civaka demokratîk, wekhev, azad li jiyan û xwezayê temaşe kir, em ê karibin bi rêya xwe de bimeşin.

**C- Serdema Fînansê - Fermandar Pere**

Pere li ser civakê bû xwediyê hêza fermanê û bêguman ev yek bûyereke girîng e. Ev rewş ji hev neyê derxistin, neyê vejinandin, wê fêmkirina civakê kêm bimîne. Pere belkî jî ji bo enerjiya di bedenê de pêk bîne mîna xwîna di demaran de diherike, nirxek e, di jiyanê de ekonomî pê ditamije û hînbûyê. Fenomeneke ciddî ya civakî ye ku divê bê fêmkirin ka çawa gihîştiye vê astê û çi ye. Ev amûrê ku nayê înkarkirin gelek qirêj pêve heye, di encama kîjan sedemên civakî û dîrokî de gihîşt vê astê? Bi rastî di civakê de çi pêk tîne? Bi kê û kîjan kes û koman dide qezenckirin û bi kê dide wendakirin? Bêyî wî dibe, nabe, çi dikare li şûna wî cih bigire? Mirov dikare pirsan zêdetir jî bike.

Weke amûrê bihevguhertinê pere, mirov dikare amûrê karekî besît fêm bike. Dîsa jî divê mirov bi baldarî tevbigere. Yên bi hev tên guherandin çi ne? Di navbera du guherbaran de gelo pere weke amûrekî pîvanê dikare bi roleke adil rabe? Eşkere ye ku hînê di destpêkê de gelek zehmetiyan di nava xwe de dihewîne. Di meseleyeke besît a danûstendinê ya sêv û hirmiyekê de em bibêjin em ê yekê bi dudiyan bikin: ango sêvek bi du hurmiyan. Em bibêjin bila pere bi roleke bi vî rengî rabe. Çima yek bi dudiyan be, bi sisiyan an jî çima ne yek bi yekê be? Hingî bi awayekî besît ked ê bikeve nav meseleyê. Dibe ku pirsên nû li pey hev bên. Ya nirx dide kedê çi ye? Weke bersiv mirov dikare bibêje kedeke din û bi vî awayî pirsan heta hetayê dugêsinî bike. Eşkere ye ku di mijara kirîn û firotinê de zehmet e pere bibe pîvaneke adil û li cih. Bi îhtîmaleke mezin wê hêz û îtîbara xwe ji vê bigire. Ji ber ku welê tê qebûlkirin tê pejirandin. Tewş e ku mirov di hîmê wî de li pîvanên weke dad û nirxê bigere. Yên di zeman û mekan de amade bûne, ji bo ku karê xwe hêsan bikin gotine, em navbeynkarekî hilbijêrin. Ji objeya weke navbeynkar dîtî re gotine pere. Em bi vê kurteçîrokê hewl didin pere bidin naskirin. Lê em bi amûrekî welê yê

navbeynkar re rûbirû ne ku wexta dev ji statuya xwe ber dide û bi hin rolên din radibe, her tişt dikare tevlîhev bibe.

Em bi mînakekê bikin ku rewş bê fêmkirin. Li gorî civakê, jinek bi mêrê xwe ve girêdayî be û li malekê bi awayekî tê gotin bi namûs bijî, tê qebûlkirin. Eger jin ji vê rewşê derkeve ango gelek mêran bîne mala xwe, yan jî berevajiyê wê zilam gelek jinan bîne malê, gelo rewş ê çawa be? Herhal bi gotineke herî ji rêzê mirov dikare bibêje, rewş ê tevlîhev bibe. Di meseleya pere de rewş hinekî din jî tevlîhevtir e. Em bi mînaka xwe dewam bikin. Ji ber ku jin der-dikeve derveyî pîvanên giştî yên têne qebûlkirin, bi avêtina wê ya derve dikarin çareseriyekê bibînin. Lê di meseleya pereyan de dibe ku rewş evçend hêsan nebe. Yê pere di destê xwe de digire, eger bi namûs nebe, çiqas pere bikeve ser pereyê wî dikare bibêje; min qebûl e. Mîna di meseleya jinê de, herçî civak e, di vê qebûlkirinê de pere nekiriye amûr. Bi îhtîmaleke xurt karîbûye bibêje; dayîna ser hev a pereyan bênamûsiya herî mezin e.

Li gorî bîrûbaweriya min, mesele heman bi vî awayî qewimiye. Di nava zeman û mekanekî gelekî bi sînor de ji bo hêsanî be, ev amûr hatiye qebûlkirin û ti carî nehatiye qebûlkirin ku li tevahiya zeman û mekan belav bibe. Li vir bûyereke mezin a sûîstîmalê ango bikaranîna xirab heye. Civak dikare bibêje;‘ez ti carî qebûl nakim’. Lê wê wextê jî mumkin e weke meseleya ‘heta Xidir xemilî dawet betilî’ bibe. Ango ‘heta malxwê pê bihese mêvan binê beroşê bialês e.’ Ha wê wextê jî hukmê xwe têrê nake. Ji lewra pere dikare bibe mîna fahîşeyeke nedîtî ya karibe li gorî rewşê bilîze û dekûdolaban bigerîne. Dikare xwe ji yekî re bi yekê û ji yekî din re bi hezar dolarî bide bi kirê. Êdî li pêşiyê ti hêz nîne wê rawestîne. Çawa ket vê rewşê? Em hinekî jî bi zimanê ekonomiyê hewl bidin vê rewşê bidin fêmkirin.

Ekonomiyê bi pevguhertinê didin destpêkirin, ev vegotin herçend zêde xwedî mane nebe jî bihevguhertin bi xwe hêmanekî girîng ê ekonomiyê ye. Du tiştên bi hev têne guhertin ji wan re mal

an jî meta tê gotin. Civakê ji nirxa bikaranînê wêdetir hînê ti nirx nas nedikir, guhertina tiştekî bi tiştekî demeke dirêj weke exlaq rast nehat dîtin. Bi sîstema ku em jêre ekonomiya xelat û diyarîdayînê dibêjin ve girêdayî ma. Tiştekî hildiberandin an jî objeyeke pir qîmet pê didan, weke diyarî didan. Çanda diyarî û xelatê mezinbûnê îfade dike. Tiştê tê mezinkirin û bilindkirin, diyarî pêşkêşî wê-wî tê kirin. Bi vî awayî nirxê ya bi nirx tê piştrastkirin û bi rûmet dikin. Objeyên mayî di jiyana rojane de têne bikaranîn. Bi çavekî baş li danehevê nanêrin. Komên mirovan karîbûn mîlyonan sal bi vî awayî debara xwe bikin. Bêyî bihevguhertina mal, wicdan û exlaqê civakê bi ti awayî razî nedibû ku mal bi mal an jî bi pereyan biguherîne. Ji ber ku nedifikirî ku wê buha û berdêla nirxê hildiberîne hebe. Li wê fikirîn jî ji aliyê exlaqî ve rast nedidît. Belkî jî bi hestyarî û têgihîştina xwe ya exlaqî ev weke rêyeke bi hîle dihesiband.

Eger gava pêşî ya bihevguhertinê gava pêşî ya ekonomiyê be, wê wextê wê ev gavavêtineke baş a nava ekonomiyê neyê hesibandin. Ji ber ku bêyî rêûresma resen gav hatiye avêtin. Mirov dikare weke feraziyê bihevguhertinê weke nirxekî bingehîn ê têkiliyên ekonomiyê bihesibîne. Lê li gorî bîrûbaweriya min rast nîne mirov bi tenê weke nirxeke ferazî bihesibîne. Mirov dikare ji bilî bihevguhertinê ekonomiyê bi sedemên din zanistî bike yan jî ji vê rastir mirov dikare ji bihevguhertinê cihê û heta mîna pereyan mirov dikare hin şêweyên bihevguhertinê yên xwe naspêrin navbeynkariyê ku bêne qebûlkirin, peyda bike. Teorîkî û di piratîkê de di warê peydakirina van şêweyan de têra xwe rê dide afirandinê. Ya ji bihevguhertinê girîngtir meseleya emtîa ya bûye mal. Nirxê bikaranînê kengî dibe mijara pevguherandinê ev yek weke emtîabûn, malbunê tê binavkirin. Di civakê de çêbûna diyardeya emtîayê nêzî pêvajoya demên şaristaniyê ye. Sedema bingehîn a qebûlkirina bazirganiyê emtîa ye. Emtîa bi xwe, di wê kêliyê de ku kesê destpêkê wî digire, ji dest derdixîne, pêk tê.

Wexta ji destderxistina wî qebûl dike, emtîa jî dest pê dike. Wexta ji aliyê din ve jî di berdêlê de tiştekî din digire, pêvajoya emtîayê temam dibe.

Em dîsa mînakekê bidin. Em bifikirin ku yekî xezalekê bi salan xwedî dike û bi bizineke ku yekî din bi salan xwedî kiriye diguhere. Ti carî nayê ispatkirin ku ev bihevguhertin adil û wekhev e. Ji ber ku wê ti carî neyê zanîn, çiqasî ked hatiye dayîn. Ji vê jî girîngtir, bizin û xezal ti carî wekhev nabin. Bêguman em van analojiyan (mînakdanan) ji bo jihevderxistina nakokiyên mentiqê bihevguhertinê didin. Û nakokiyên bi vî rengî her tim hene.

Eger em di çarçoveya qebûlkirina van nakokiyan de ji nû ve li mijara pere vegerin, em ê hînê baştir li hîleyên di nava wî de dihewin, hayil bibin. Wexta mirov civakan nas dike, nuqteyek heye divê mirov baş fêm bike, ew jî ew e; diyardeyên civakî diyardeyên fizîkî nînin. $H_2O$, ji sedî sed nebe jî di şert û mercên dinyayê de timî molekula avê ye. Wekî din maneya xwe nîne. Civak jî pakêtek e ku mirov ji diyardeyan ava kiriye. Herçiqas di navê de gelek tiştên nediyar hebin jî. Civak dikare ya ku ava kiriye biguherîne û ji nû ve ava bike. Wê wextê ev pîvan peyde dibe: RASTIYÊN CIVAKÎ RASTIYÊN AVAKIRÎ NE; ango rastiyên xwedê û xwezayê dayî nînin. Eger wisa be mirov dikare bibêje; wê wextê pere jî rastiyek e ku hatiye avakirin. Mijara guhertin û emtîayê jî rastiyên feraziye ne ku hatine avakirin. Dayîna xwedê û xwezayê nînin.

Yek ji gunehên herî mezin ê pozîtîvîstan ew e ku rastiyên civakî weke diyardeyên fizîkîbi wesfê diyardeyan di heman kategoriyê de bi cih kirine. Wexta ku hûn diyardeya civakî bi rastiyên naguherin re yek bigirin, hûn ê derî heta ser piştê li paradîgmayên civakî yên di nava xwe de gelek nuqteyên mirov pê bixape dihewîne, vekin. Dema mirov ji vî alî ve bi awayekî pozîtîvîst li ekonomiyê binêre, ne mumkin e ku van nuqteyên divê mirov ji wan dûr bisekine nebîne. Wexta mirov milletgiriyê weke îfadeya rastiya objektîv fêm bike, herçiqas di rewşên cihê de bin jî

ji aliyî felsefî ve Hîtler û Stalîn yek in û hûn ê bikevin rewşa wan. Ev herdu jî ango pozîtîvîst hemû û materyalîstên çor jî rastiyên di civakê de weke rastiyên mutleq dinirxînin û nikarin xwe ji vê xilas bikin. Sedema ku mijara pere gelekî nazik û girîng dike têgihîştina bi vê helwesta pozîtîvîst nêzî civakê dibe ye: ango pere bi temamî rastî dihesibîne. Ji lewra bi rêya wî destguhertin her diçe, dihêle ku weke rastiyeke temam bê fêmkirin.

Bi pevguhertinê ketina pere ya nava ekonomiyê û di tevahiya dîrokê de pêşketina wî mijara me ya lêkolînê nîne. Lê belê di ekonomiyê de her ku diçe pere dibe tiştekî welê ku dest jê nabe û maneya vê jî ew e ku tehlûkeyên di hinavê xwe de dihewîne mezin dibin. Em kengî bi nakokiya yek bihevguhertinê bi tenê di hinavê xwe de digire rûbirû bibin, em ê bibînin ku hêza bihevguhertinê ya bêsînor a pere bidestxistiye çiqasî rê li rewşên bêyom û bi tehlûke vedike. Hêsan nîne ku tiştek bibe rewşeke berçav a hezaran nakokiyan. Bi vê rewşa xwe ya bi nakok di nava ekonomiyê de rêûrê tê, digihîje serdema fînansê û wexta tê digihîje serdema fînansê jî bi tevahî rewşeke xeternak rû dide û heta mirov vê rewşê bi tevahî nebîne û rabe civakê rave bike, mirov ê xwe bixapîne. Ya em jêre dibêjin rewşa xeternak ew e ku pere bi tehlûkeyên di hinavên xwe de gihîşt serdema xwe ya herî pêşketî. Ev rewş û sicîlek welê ye, mîna ku mirov zordarekî xirab bike fermandarê artêşekê. Ev amûrê em behsa wî dikin, di destpêkê de kesên di civakê de amade ji bo kêliyekê wî qebûl dikin û ev amûrê bi guman rewşa wî ya demborî her diçe diguhere û wî derdixînin mertebeya xwedê. Her weha hêza herî bi tesîr a fermanê jî di destê xwe de digire.

Heye ku gelekî balkêş be, mirov dîroka pêşketinê ya pere lêbikole. Tê gotin ku di dîrokê de pûlên zêrîn cara pêşî ji aliyê Kreuzûsê Lîdyayî ve hatine çêkirin. Tê gotin li bajarê Manîsayê Sardê yê ku hê jî gera zêran lê bi pirsgirêk e, rûdinişt û ti belaya bi serî de nehatiye nemaye. Pere tiştekî wisa ye, ne bê wî dibe, ne jî bi

wî ango xwedî rewşeke zehmet e. Ya tê zanîn ew e ku bihevguhertina emtîayê û perebûnê dest dane hev pêşketine û weke kevirê çarqozî yê ekonomiyê cih girtine. Ji sedan cureyên pûlan ên gihîştine heta roja me ya îro diyar e ku şaristaniya Pers û Greko-Romen pere gelekî bi kar anîne.

Di şaristaniya Îslamê de Riyal herî kêm bi qasî siltanan gihîştibû statuyeke muteber. Li bajaran textê pere qehîm û tekûz bû. Nexasim serrafên cihû gelekî bi qîmet bûbûn. Serraf û bazirganên Ermenî û Cihûyan ji Ewrûpayê heta Hindistanê li ser rêyên bazirganiyê tevî bajaran xeteke yekdestdariyê ya pere û bazirganiyê danîbûn. Tevî serweriya siyasî ev xeta kapîtal gelekî bi bandor bû. Siltan û mîreg gelekî bi xwe ve girêdabûn. Bandora wan a li Ewrûpa û Asyayê her ku diçû zêde dibû. Weke qewm ji Cihû û Ermeniyan nerazîbûna civakê her diçe zêde dibe û heye ku di vê de para vê rastiyê hebe. Wexta ku mirov pogromên (qirkirinên wan) Cihû û Ermeniyan lêbikole divê yek ji xusûsên mirov bi girîngî li ber çav bigire ev be.

Bajarên Îtalyayê ber bi nîvê sedsala 13. ve pêşengtiya pere û bazirganiyê ji cîhana Îslamî wergirtin. Nexasim Venedîk, Cenova û Floranse weke mûcîzeyeke rastî ya bazirganî û pereyan pêk hatin. Bajarên behskirî heta sedsala 16. di serî de Ronesans ji her alî ve di pêşengiyê de ji Ewrûpayê re bajarên mîna stêrkan bûn. Bajarên Îtalyayê ne bi tenê Şoreşa Ronesansê kirin; ji mîmarên girîng ên şoreşa pere ne. Herçiqas peyrewên xwe yên pêşî di cîhana Îslamî de dîtibin jî gelekî bi kêr hatine. Bi tevahî argumanên pere yên ku destê modernîteyê ji wan nabe yên weke pereyê kaxizî, banke, sened, krêdî û muhasebe ji aliyê van bajaran ve hatin pêşdebirin û bisazîkirin. Di dîroka pere de rola van bûyer û pêşketinan gelekî heye. Di pêşketina bazar û bazirganiyê de bi rola şoreşekê rabûn. Emtîatî û peretiyê leza xwe belkî jî sed qat zêdetir kirin. Di pêşketina serweriya pere de kevirê çarqozî bûn.

Civak hêdî hêdî ji tehekuma van amûran re amade dikirin. Bi qasî ku xuya dikir, yên dihatin kirin danûstendineke besît a teknîkî bû. Banke wê bûbûna cihê daneheva pereyan. Sened perçeyên kaxizê bûn ku diketin şûna pereyan. Pereyê kaxizî jî bi şêweyekî seneda giştî bû. Sivik bû, karûbar pê hêsan dibûn û bi lez dibûn. Krêdî jî ji bo muşteriyên di tengasiyê de pereyekî deyn bû ku di berdêla faîzeke munasip de dihat dayîn. Wê jî karûbar bi lez dikirin, pêşî li valamayînê digirt, nedihişt eleqedarê wê bi keslandî rûnê, ji bo deynê xwe bide ew bi lez dikir û dixebitand ango bi roleke bi xêr radibû. Ew ji bo karên muhasebê învanterên zelalkirina kar-zirarê, lêçûn-hatinê dokumanter bûn. Mîna neynikê weke demî rewşa şîrket û kesan nîşan dida. Ev besît bûn, lê bi encamên xwe yên mirovan matmayî bihêlin şoreş bûn. Di serî de Sevîlla, Lîzbon, London, Amsterdam, Hambûrg, Lyon, Anvers û Parîsê, bajarên Ewrûpayê ev berhemên şoreşê yên bajarên Îtalyayê tevî berhemên Ronesansê bi lez veguhestin welatên xwe, li tevahiya parzemîna Ewrûpayê belav kirin û mezin kirin.

Me bi awayekî pêşnûme pêşkêş kiribû ka çawa bi sedsala 16. re Hollanda û Ingilîstanê berê di cotkarî û bazirganiyê de, paşê jî di pîşesaziyê de bi alîkariya van berhemên şoreşê ber bi şoreşeke giştî ya kapîtalîst veguherîn. Kapîtal, kapîtalîst û kapîtalîzm pêlikên pêş ên seltenata pere ne. Her yek ji wan qralê rastî ne, xwe di ser van pêlikan re çip dikin: ango qralên tazî ne. Serdema bazirganiyê bi leza wê ya mezin re kara xwe ya gihîşt rêjeyeke mezin bi giranî deyndarê van amûrên pere û perebûnê bû. Serweriya pereyan bêdeng û gelekî di binî re pêşde diçû. Ne bi tenê bi qraltiyê bi xwedatiyê jî radibû. Hem jî yekem car bêmaske û bi zatê xwe. Serdema îndustriyê hem gelek tiştan deyndarê wê ye, hem jî gelek firsendên mezin danê. Di civakê de bazar, bajar, emtîa û bazirganî zêde nebûya, şoreşa pîşesaziyê wê nebûya. Pere jî nebûya ev pêvajo bi tevahî pêk nedihatin. Bi lezbûna pere û perebûnê bi rola xwîna di demarên mirov de digere radibûn. Eger ew qut bûbûna

organ ê nexebitiyana û wê ji kêrhatina xwe bûbûna. Ev jî bi mirina wan re hemwate bû.

Eger em têkiliya fabrîkeyê û karker ji hev derxin rewş ê baştir bê fêmkirin. Mumkin nîne ku mirov fabrîkeyê bi koleyê berê û gundiyê serf bixebitîne. Tu heta mirovî ji efendî, senyor û axê qut nekî karkertî çênabe. Bi temamî karkertî bi heqdestekî mutleq dibe. Heqdest jî nirxek e ku pere nebin nayê dayîn. Ji sedî sed karker êdî mehkûmî pereyan dihat kirin. Pere êdî di wê astê de bû ku bêyî efendî û senyor dikarîbû koleyê nû bixe bin serweriyeke mutleq. Di desthilatdarbûnê de ev gaveke gelekî mezin bû. Bi vê rêyê, civaka nû ya pîşesaziyê, cara pêşî dibû civaka herî mezin a serweriya pere bi temamî nas dikir. Ti civakên berê yên şaristaniyê serdestiya pere evçend nepejirandibûn. Di civaka îndustriyê de pere êdî çandek e. Her tiştên li dora wî dibe xwedî mane. Bi qasî ku rê li xeyalên mezin vekir, her weha bêyî pereyan jî nedibû ti proje dest pê bike. Her malbat di warê pêdiviya bi pere ya mutleq de serwext e. Ji gundekî li quncikeke dinyayê heta bi bajarê herî pêşketî tevahiya malbatan bi vê dizanin. Her kes dibîne; ji bo karibe pêlavekê ji zarokê xwe re bikire û lampeya mala xwe vêxe, pêdivî bi pere heye. Her kes ji bo pereyan bi dest bixe neçar mabû çi hewce be ji xwedayê xwe yê nû re pêşkêş bike.

Bi qasî xuya dikir, nirxa pîroz ked dihat firotin. Ev rewşek bû ku pere rê lê vedikir ûmirov bi awayekî tîpîk pê dixapiya. Ya bi peran dihat firotin an jî mirov ji destê xwe derdixist bi tenê ked nebû. Beriya her tiştî ji bo mirov ew bi dest bixista hewcedarî bi bedeneke tenduristiya wê baş, ji bo bedeneke tenduristiya wê baş jî hewcedarî bi dayikekê û ji bo dayikekê jî hewcedarî bi jinekê heye. Ev 'ji bo' heta bi hetayê diçin. Her weha diviyabû ked kêrhatî bibûya. Ew nebûya nedihat firotin. Ji bo wê jî hewcedarî bi hoste, dezgehdar; hewcedariya wê jî bi ezmûna kar a hezar salan û keda wê heye. Heqdestekî besît (ziktêrkirin û hinekî zêdetir) lîstikek bû ku ji bo ku ev nirxên pîroz bi tevahî ji dest bêne derxistin. Dîrok û

civak dihat firotin. Mirov û ferd bi vî awayî kiribûn amûr. Heta niha ti xwedayê civakî evqas li ser evdên xwe serdestî nekiribû.

Di dîroka pere de yek ji qonaxên girîng jî ew e ku madenên bi qîmet ên weke zêr û zîv êdî ji berdêlnîşandanê xilas dibûn. Ev şoreşa mezin ango şoreşa pereyê reş di sala 1970'yî de pêk hat. Êdî pere bi temamî azad bûbû. Azadbûna yekemîn, wexta bajarên azad ên Îtalyayê ew bi înstrumanên weke krêdî, sened û kaxizê ve girêdabûn pêk hatibû. Şoreşa mezin a duyemîn jî kengî Dolarê DYE'yê ji zêr û zîv hatibû qutkirin pêk hatibû.

Bi vê şoreşê bi awayekî fermî serdema fînansê dest pê kir. Di binê pêşketina dîrokî de ku jêre pêngava mezin a sêyemîn a globalbûnê tê gotin, ev diyarde heye. Çawa ku tê zanîn, pêngava mezin a kapîtalîzmê ya globalbûnê cara pêşî di serdema bazirganiyê de (sedsalên 15.-18. P.Z.) tevgerên mêtingehkirin û nîv mêtingehkirinê bûn. Duyemîn tevgera mezin a globalbûnê di serdema pîşesaziyê de ango bi hesabekî kêm-zêde ji serê sedsala 19. heta çaryeka dawiya sedsala 20. dema pêngava emperyalîzmê û şerên neteweyî û çînî yên ji ber wê rûdane. Van demên behsa wan tê kirin li derdora çarsed salan dewam kirine û bêguman yek ji aktorên sereke yên van deman, pere ye. Mirov bi tevahî ji van deman re bigota dema pere, wê şaş nebûya. Xwedayê mezin ê moderniteya kapîtalîst (Zeus, Jupîter) dewleta netewe bû, xwedayê şer û desthilatdarî (Ares û Mars)pere jî xwedayê nû yê ekonomiyê û serdema nû ye ku di dîrokê de bi giştî hemtayê wî nîne. Vî xwedayê hegemonya xwe daniye û xwedayên qedîm hemû tepisandine!

Xisleta bingehîn a serdema fînansê ew e ku saziya pereyan bi tevahî înstrumanên xwe hemûyan, bû hêza sereke. Bi temamî yekdestdariyên bazirganî û pîşesaziyê xistibû kontrola xwe. Dewlet jî weke yekdestdariyê nexasim jî dewleta netewe gelekî baş bi xwe ve girêda, tamijand. Qatên bingehîn ên ekonomiyêplatformên hilberandin-pevguherandin û bikaranînê bi

temamî kete bin destê pere. Di vî warî de amûrên hatin bikaranîn IMF, Bankeya Cîhanê, Rêxistina Navneteweyî ya Bazirganiyê; bi tevahî bankeyên navendî yên dinyayê, bankeyên global, senedên krêdiyan ên curbicur, piyase û borsa; bono û senedên tehwîlê, kartên bikaranînê, qûrên dovîz û faîzan lîsteyeke dirêj a înstrumanan in. Bi saya van saziyan êdî pere bûye mîna xeyaleteke li naverastê. Ya rastî, li gorî hiyarerşiya berê, ketiye şûna rêveberê malbata têde bav xwedî erk e û li şûna wî ev saziyên xeşîm jî bi rola ewladê wî radibin. Lê bi tevahî jî tovên kalên xwe ango pereyan hildigirin û ev jî rastiyek e.

Saziyên behsa wan tê kirin, di nava xwe de xwediyê tevneke xurt in. Heta dawiyê organîzekirî ne. Saniye bi saniye haya wan ji hev heye. Bandorê li hev dikin. Tevgerên wan weke kin, navîn û dirêj têne birêkûpêkirin. Li gorî modeyê mirov ji tevgerên wan ên dema kin re bibêje 'pereyê germ' ji yên dema navîn re bibêje 'bono û tehwîl' û ji yên dema dirêj re jî bibêje 'senedên demdirêj' wê rastir be. Timûtim dikarin nav û demê biguherin. Li gorî rastiya wan a avakirina civakî, ev yên herî bi lez tên pêkanîn in. Amûrê bingehîn ê muhasebeyê Dolar û Euro ye. Ev diravên DYE û YE'yê ne. Tevî ku hînê jî hewl didin sîstemê jêhatî bikin jî ya rastî ev pêvajo temam bûye. Baş e, armanca bingehîn kar wê di nava sîstema nû de çawa pêk bê?

Bi tevahî nakokî û têkiliyên dinyayê yên siyasî, civakî û ekonomîk bar kirin nava vê sîstema nû ya ferazî ye. Ne bi tenê ev; argumanên îdeolojîk, akademîk û çandî jî ji wan dinyan e ku ketine nav pençê vê sîstemê. Eger em hînê ji nêz ve li van rastiyan temaşe bikin, em ê karibin hêza xwe ya maneyê xurt bikin.

Diravê bingehîn ê muhasebeyê dolar e (di yêdekê de Euro heye) maneya vê çi ye? Qadên lê dolar dikevin serhev û guhertinên qûran di navbera pereyên neteweyî de; bono û tehwîl, tevgerên di bazara senedê hîsseyande, guhertinên faîz û buhayan nakokî û têkiliyên kîjan dinyaya berçav ango kîjan şer û tifaqan nîşan didin?

Gelo, heye ku ew Şerê Cîhanê yê Sêyemîn ku gelekî behsa wî tê kirin, bi giranî di nava vê dinyaya sembol û feraziyan de diqewime? Şerên rastî yên em li rûyê erdê dibînin jî gelo cîhana feraziye carnan weke erdheja di terkên fayan ên dinyayê de xwe nîşanî me didin, nebin?

Bi giştî herkes hemfikir e ku DYE piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn bûye hêza hegemon. Diravê wê Dolar giraniya xwe ya li dinyayê encama vê hegemonya wê ye. Ya balkêş ew e ku kengî ev hegemonya derket asta herî jor, Dolar ji berdêlbûyîna zêr xilas kir. Eşkere ye ku ev yek bi awayekî, bêberpirsiyariya hegemonya dinyayê ya bêhesêb nîşan dide. Baş tê zanîn ku DYE'yê ji salên 1980'yî ve qat bi qat ji trîlyonan zêdetir bê berdêl Dolar berda dinyayê. Ev bûyereke xeternak e. Ev tê wê maneyê ku bi tenê bi xebitandina çapxaneya banknotan salekê bêberdêl dibe xwediyê trîlyon dolaran. Di ti dem û serdemê de pere evqasî xwe bi xwe mezin nekiriye. Ma ti amûrekî din heye ku bi qasî vê diyardeyê mikur bê û nîşan bide hegemonyadariyê xwe bi pereyan nîşan daye yan jî pere bi xwe hegemonyadar e? Eger em rewşa deyndar a tevahiya dewletên netewe li ber çav bigirin (pir seyr e, dewleta netewe ya herî mezin a deyndar DYE bi xwe ye), em ê hêza xwe ya fêmkirinê careke din zêde bikin ka çima pere bi temamî hegemon e. Lîstina pir hindik a bi pereyan (tevgerên kêmkirin û zêdekirina faîz-buhayan) ji aliyê Bankeya Navendî ya DYE'yê ve dinyayê bi dijwarî dihejîne û ev jî nîşan dide ku sîstema fînansê gelekî baş hatiye danîn û cih girtiye. Ango diyardeyên hêza pere nîşan bidin gelekî zêde bûne.

Têkiliya krîzan bi sîstemê re jî gelekî balkêş e. Krîzên li Asya, Rûsya û Emerîka Latîn bi awayekî zincîrwarî weke demî û belawela pêk tên, bi temamî di qada pereyan re derbas dibin. Piştre xwe di ekonomiya reel de nîşan didin. Krîzên berê jî li cîhana reel dest pê dikirin û li cîhana pereyan bi encam dibûn, lê krîzên serdema fînansê berevajiyê vê yekê diqewimin. Ekonomiya reel ji

bo herî dawiyê tê hiştin, lê çawa ku serwerêcîhana fînansê dixwazin ew welat an jî blokên welatên din kengî stû ditewînin, hînê pir giran nebûye bi dawî dikin. Eger mirov weke mînak li Rûsyayê binêre mirov dikare gelekî jê hîn bibe. Yekîtiya Komarên Sovyeta Sosyalîst YKSS'ê bi awayekî fermî di sala 1991'ê de ji hev belav bû, lê piştre her ku çû ew xistin pêvajoyeke giran a krîzê ya fînansê. Di 1998'an de krîz derxistin asta herî jor û bilind.

Pir balkêş e; di vê demê de, tê zanîn di çarçoveya bûyerên derketina min a ji Şamê de ez jî li Moskovayê bûm. Rayedarên Rûsyayê dixwestin ez bi lez ji Rûsyayê derkevim û ji bo min derxin digotin, çi ji destê wan tê wê bikin. Şefê wan ê herî mezin ê Îstîxbaratê weha digot: 'Eger piştî 6 mehan bûya, her tişt ê hêsan bûya. Me jî bi te re bi vî awayî nedana û nestandana.' Erê, krîza 1998'an Rûsya teslîm girtibû û rayedarên xwedî gotin ê vî welatî bi devê xwe li vê rastiyê mikur dihatin. Gelekî baş tê bîra min. Serokwezîrê Îsraîlê Ariel Şaron û Wezîra Karê Derve ya DYE'yê Madeline Albraight ku operasyona der barê min de dimeşandin, bi lezûbez hatibûn Moskovayê û di berdêla deh mîlyon Dolar deynî de ez ji Rûsyayê dabûm derxistin. Bi vê armancê bi IMF'ê re peymanek hatibû morkirin. Her weha di navbera Tirkiyê û Rûsyayê de jî di berdêla min ji Rûsyayê derxin de peymana enerjiyê 'Xeta Şîn' hatibû mohrkirin. Yek ji şertê Rûsyayê jî îmzekirina vê peymanê bû. Tevî ku DYE li ber rabûbû. Piştî ku Rûsya ket xeta neolîberal a hegemonîdarê sîstemê dixwest, hêdî hêdî ji rewşa xwe ya bi felc xilas bû û bi sîstemê re bû yek.Di serdema dijşoreşên fînansî û ferazî de dijşoreşek jî bi vî awayî pêk dihat!

Eger mirov rêvebirina dinya reel ji aliyê serdema fînansê ve ji hev derxe mirov dikare gelekî tiştan jê hîn bibe.

a- Serdema fînansê dinya ekonomîk a reel rêve dibe û me gelek caran anî ziman ku têkiliya vê bi hêza pere ya bûye fermandar re heye. Para bêtir projeyên ji polîtîkayên sereke yên

hegemonyadar re xizmetê bikin, esas têne dîtin. Ekonomiya dinyayê li gorî serdema fînansê wê çawa were dîzaynkirin?Kîjan herêm wê li ser hilberîna kîjan malan bisekine? Wê para wê çi be? Siyasetên bingehîn ên welatan wê çawa bêne birêkûpêkkirin, avahiyên wan ên civakî û siyasî wê çawa bêne nûkirin, deynên wan çawa bêne dayîn, divê çavkaniyên xwe çawa bikarbînin? Her weha welatên ji wan re asî û çete dibêjin wê çawa serî li wan û ekonomiya wan bê tewandin? Welatên bloka berê ya YKSS'ê, Çîn û welatên din ên ji wan re dinya sêyemîn tê gotin, wê çawa bi ser sîstema hegemonîk ve bikin? Bi Îsraîlê re têkilî wê çawa bêne danîn û sererastkirin? Bi tevahî weke dinya,welat, dewlet û gelên wan wê bi kîjan parametre û pîvanên giştî yên serdema fînansa nû yên neolîberal re li hev bikin, wê li gorî vê projeyan deynin pêşiya welat, şîrket, dewlet û kesan. Kengî li gorî van projeyan gelek şertên eskerî û siyasî jî pêve danîn wê fînansman û înstrumanên pereyî jî tekûz bikin. Yên guh nedin jî wê krîz li ser wan bê ferzkirin heta biçin ber îflasê. Jixwe wexta serdema fînansê tê gotin, mebestjê serdema bi şertan ji bo projeyan bi destxistina krêdiyê ye.

Sîstem li ser vî hîmî tê xebitandin. Ev kurtepêşnûmeya me pêşkêşkirî jî pir eşkere nîşan dide ku di serdema fînansê de kapîtalîzm ekonomî nîne. Lîstikên bi kaxizan bi qasî ku ne ekonomî ne, mirov dikare piştrast bike ku ew amûrên li ser ekonomiyê hatî ferzkirin in. Di asta herî jor de karkirina yekdestdaran bi van kaxizan dibe. Ma ji vê zêdetir dij-ekonomînebûnek heye? Ti sektor û dem, nikare bi qasî serdem û sîstema fînansê rave bike ku gelekî di ser serdema pîşesazî û bazirganiyê re belaş kar tê kirin. Di berdêla kûponên piçûk de hem her kes tevlî karê tê kirin û bi vî awayî her kesî dikin hevparê gunehê sîstemê, hem jî sîstem bi vî awayî xwe xurt dike û rizgar dike. Serdema Fînansê ji serdema îndustriyalîzmê zêdetir ne ekonomî ye û li derveyî wê ye. Şêweyekî civakê ye û çandê wê ye.

Eşkere ye ku em di asteke jor de bi yekdestdariyeke pereyan re rûbirû ne. Em li qonaxeke welê ya yekdestdariya super in ku dewletan û heta weke dewlet DYE'yê jî di nava xwe de dihelîne. Gihîştiye hêzeke welê, bi tevahî pêvajoyên desthilatdariyê kontrol dike, pêşde dibe, xira dike û ji nû ve ava dike. Cewherê globalbûna nû ev e. Çawa ku tê zanîn serdema globalbûnê ragihandin nîne. Ekonomî û siyaset û yekdestdariya siyasî bi awayekî ti mînakên wan nehatine dîtin di asta globalbûnê de ketine zikhev û ev yek cewherê serdema fînansê pêk tîne. Bi tevahî îradeyên xwecihî, neteweyî, siyasî û ekonomîk dikevin kontrola hêzên super ên yekdestdarên global û serdema fînansê vê îfade dike. Ev rewşeke nû ye û divê mirov gelekî hûrûkûr li ser raweste.

b- Bandora wê ya li ser realîteya civakî bi temamî bi armanca fetihkirinê ye. Hedef civakeke pere û ferazî ye. Rêya herî bi tesîr a ji bo kapîtalîzekirina civakê, bi însturamanên weke bono, repo, tehwîl û senedên para tevlîkirina wê ya karê ye. Bi vî awayî, nexasim di serî de çîna navîn, bi tevahî civak bi cîhana fînansê re dibe yek. Di berdêla kareke piçûk de wê dike hêza parastina pergalê. Refleksên wê yên dijberî pergalê para bêhtir têne şikandin. Bi civaka xure, krediya ji bo xureyan, krediya mîkro, bi hezaran awayên krediyê, dixwazin civakê zevt bikin û teslîm bigirin. Rêbaz gelek hêsan e. Pêşî krîzan ferz dikin û bi vî awayî dinyayeke nû ya bêkaran li dinya bêkaran zêde dikin. Çîna navîn hildiweşînin û dikin ku li ber wan bigere. Birçîtî û xizantiyê heta bi sînorê mirinê ferz dikin. Kaos û aloziyê kûr dikin. Piştre di berdêla şertan de ji bo ji nû ve avakirina civakê, wê bi krêdiyan ve girê didin.

Berê hewl didan civakan bi şoreş û tevgerên rohnîbûn-çandî veguherînin. Niha bi rêbazên fînansê yên hînê komple ne, bi pîlan in, destê xwe nadin agir û bi maşeyê encamê jê digirin an jî hewl didin pê bigirin. Dixwazin tevahiya civakan bi homojenî û yekrengiyeke global, ji bo civakeke kerî û girse ava bikin di

hawênekî yekçandê de dikutin û dikin ku bi qasî misqalê zerre jî li ber sîstemê ranebin, bi vî awayî ji nû ve avakirin di dewrê de ne. Projeyên civakê bi awayekî li şûna şoreşên berê û utopyayan datînin. Êdî hewcedarî bi utopya û şoreşan nîne. Her tişt dikare bi proje bibe. Her weha fînansor jî amade ne. Xuya ye ku civaka dijber, civaka sîmulakr, civaka ferazî û civaka yek zêhniyet ev e. Gelo ya ferz dikin faşîzm nîne? Gelo ya ferz dikin, bi maskeyeke nû, di asta global de projeya pêkanîna faşîzmê û dinya wê nîne? Divê mirov civaka serdema fînansê ji her alî ve nas bike û bi nav bike.

c- Polîtîkayên siyaset û dewletê yên serdema fînansê bi yên serdema îndustriyê re xwedî hinek nakokiyan e. Îndustriyalîzm, a esas li ser polîtîkayên milletgirî û dewleta netewe dimeşe. Dixwaze yekdestdaran biafirîne. Hewcedariya serdema fînansê bi globalbûnê, dibe sedem ku van yekdestdaran asteng bibîne. Kapîtalîzma ku bû weke sîstem û dinyayekê jî, ev yek bi xwe jî nikare heta dawiyê yekdestdariya dewleta netewe destek bike. Yekdestdarên dewleta netewe zêdetir xwe li hundir digirin û li pêşiya yekdestdarên dixwazin di asta global de tevbigerin dibin asteng. Nexasim serdema fînansê di asta global de înstrumanên xwe bi kar bîne, dikare kara xwe zêde bike. Lê di vê rewşê de dewleta netewe li pêşiya wê kelem û astengeke ciddî ye. Yan wê li gorî rewşa nû xwe bi rêkûpêk bike, yan jî wê hilweşe. Dewletên netewe yên weke Koreya Bakur, Lîbya, Sûrî, Îran, Iraq û hwd. Dema Lîbyayê qebûl kir xwe li gorî rewşa nû bi rêkûpêk bike hebûna xwe dewam kir. Kengî Iraqê qebûl nekir, bi awayekî bibe êbret li xezeba serdema fînansê rast hat. Ji lewra divê ya nû bê avakirin. Bi tevahî xira nake. Nexasim welatên mîna Brezîlya, Tirkiye, Arjantîn, Çîn, Hindistan û Rûsya yên ku dewleta netewe li cem wan gelekî xurt e, dixwazin wan bi krîzan terbiye bikin û ji nû ve wan entegreyî sîstemê bikin.

Ji vê jî girîngtir, yek dewleta netewe ya stendarta tekparêz, li pêşiya globalbûnê bi kûrahî asteng e. Globalbûn bi tîpa dewletên

netewe yên xwedî unîteyên siyasî yên xwecihî razî nîne, bêtir bi tîpên dewletên qîma xwe bi desthilatiyeke girêdayî û çarçoveya xwe bi sînor tînin, razî ye. Dewletên di asta navîn de mezin in, dixwaze bi unîteyên xwecihî veguherîne. Globalbûna serdema fînansê û dewleta netewe wê demeke dirêj nakok bin. Di bunyeya wan de hêmanên antî-kapîtalîst ên bi sînor vê mecbûr dikin. Bi giştî dewleta klasîk û bêhtir jî kêmasiyên kûr ên dewleta netewe, dixwazin bi civaka sivîl ku di cewherê xwe de bi temamî civaka sivîl temsîl nake, bi sîstemeke tampon wan li dawiyê bihêlin û ji wan bibihurin. Civaka sivîl ji naveroka wê ya demokratîk tê kirin û ji bo nakokiya dewleta netewe kêm bikin, hewl didin lîberalîzmê bi kar bînin. Civaka sivîl ew qad e, ku şaristaniya klasîk û şaristaniya demokratîkxwe li ser li hev radikişînin. Demokratîkbûna civaka sivîl pirsgirêkeke prensîbwarî ye û divê ji hev bê derxistin û yek ji wezîfeyên bingehîn ê siyaseta demokratîk e ku divê li ser xebat bê kirin.

Di serê mijar û pirsgirêkên serdema fînansê ji aliyê îdeolojîk ve anî rojevê de ev hene; şerê şaristaniyan, radîkalîzm, terorîzm, jinûve avakirina dewletê, globalîzm û bilindkirina nirxên mîna dîn.

Teza şerê şaristaniyan ji du aliyan ve girîng e. Mirov dikare li bendê be kuhêza hegemon a sîstemê, şaristaniya endamê wê ye, ferz bike. Çawa ku tê gotin an jî hin derdor dibêjin, şaristaniya spî, Anglo-Sakson Xirîstiyan nîne. Bi sosyalîzma reel xwestin şaristaniya sosyalîzmê biafirînin, lê vê nikarîbû ji modernîteya kapîtalîst bibihure û nikarîbûn taybetmendiyên bihurandinê jî nîşan bide, ji lewra jî ji nû ve bi ser sîstemê ve bû û vê rewşê kir ku krîzeke şaristaniyê ya mîna heyî xuya dike, li dawiyê were hiştin. Ji ber ku şerê di nava herdu blokan de şerê di navbera du şaristaniyan de nebû, herdu hêzên hegemonîk heman modernîte temsîl dikirin û ev yek bi jihevdeketina YKSS û kapîtalîstbûyîna Çînê derket holê.

Tevî ku ji qada dinya Îslamê re tê gotin qadeke şaristaniya kevn e û statuya wê ya milletgiriya herêmî û her weha nakokiyên wê bi Îsraîlê re pirsgirêka şaristaniyan xistiye rojevê. Rojhilata Navîn di hersê serdemên kapîtalîzmê de jî bi ti awayî bi sîstemê re yekpare nabe. Dewleta netewe bihêlin ku çareseriyê bîne, berevajî pirsgirêkan asê dike. Ji ber ku milletgiriya dînî hem li Erebistana Suûdî, hem jî li Îrana Şîî tê mezinkirin û ji ber ku şîddet bi tevahî dijwariya xwe li ser kar tê hiştin û ji ber bandorên mayînde yên pirsgirêka Îsraîl-Filistînê, guftûgoyên li ser şaristaniyê piralî dibin. Ev aliyê pirsgirêkê yê di nava şaristaniyê bi xwe de ye. Aliyê din jî daxwazên gelên herêmê bû ku dixwestin hebûna civakên xwe yên mozaîk, nasnameyên xwe yên çandîbiparêzin,xwe ji dewleta faşîst a despotîk û aloziya dewleta netewe xilas bikin. Ji awirekî din mirov dikare bibêje ev şerê di navbera şaristaniya demokratîk û şaristaniya despotîk a klasîk de li herêmê xwe nîşan dide. Wexta ku mirov ji vî awirî ve meseleya av û petrolê jî bibîne, eşkere ye ku mirov dikare li Rojhilata Navîn behsa pirsgirêkeke ciddî ya di navbera şaristaniyan de bike.

Radîkalîzm, di cewherê xwe de li dijî globalbûna serdema fînansê nerazîbûneke dewletgira netewe ye. Gavavêtinên îdeolojîk-polîtîk in, armanca wan ew e ku bi rengên dînî û nijadî dewleta netewe zêdetir di nava xwe de be. Di her qadê de mînakên wê hene. Yên weke Îslam, Xirîstiyanî, Hindû û dînên anîmîst yên Efrîkayê, dîn û hêmanên rastgir yên milletgir û nijadperest ên di nav her dewleta netewe de hene, bazkê din ê radîkal pêk tînin. Mînak hene gelek caran herdu alî digihîjin hevdu. Li dijî globalbûnê şêweyê paşverû yê xwecihtiyê temsîl dikin. Li aliyê din, li dijî globalbûnê ekolên demokratîk, çandî û femînîst ên xwecihî û çepgirên nû, nexasim bi kêmanî be jî li platformên mîna Forma Sosyal a Dinyayê têne cem hev û dikarin hêza xwe ji bo guftûgokirina şaristaniya demokratîk nîşan bidin. Bi îhtîmaleke mezin terorîzm tevgereke provakatîf a sîstemê ye. Gelek îşaretên

bi hêz hene ku ji bo rewakirina desthilatdariya serdema fînansê hincetên bi vî rengî bi zanebûn têne afirandin. Mînak El Qaîde hînê jî xisleta xwe ya mîna sirrê dewam dike. Serdema fînansê bi xwe xwediyê xisletên bi hêz ên terorîstî ye.

Têkiliyên civakî yên pere wan xira dike, bi serê xwe pirsgirêkeke mezin aterorîzmê ye. Ti teror bi qasî hegemonya pereyan nikare civakê ji kokên wê yên kûr, dûr bixîne û bi tesîr bibe. Piraniya xebatên sîstem dike, ji bo ku hebûna xwe di tevahiya qadên ekonomîk, civakî û siyasî de ava bike û dewam bike, di çarçoveya terorê de ne ku di dîrokê de mînakên wê kêm hatine dîtin. Dixwaze terora mezin bi hêmanên provakatîf veşêre. Bidestxistina pereyan ji pereyan li derveyî ekonomiya reel bi giranî pêk hatiye û ev yek bi destê xasûk û bi hêz ê di dîrokê de tîmî derketiye pêşberî me, hatiye kirin û ev destê behsa wî tê kirin xwe kiriye sîstem û li ser serê civakê rûniştiye. Diziyên Çil Heramiyan ji mîlyarê yekê diziyên yekdestdarên serdema fînansê nake. Diziyên evçend berfireh bi temamî di sîstemên terorê de dikarin bêne kirin. Di vê çarçoveyê de diyardeya bi navê serdema ragihandinê bi tenê ji bo veşartina terora fînansê hewce bû. Belkî jî bi vê armancê têgîna em jêre terora medyayê dibêjin tê pêşxistin, bibe xwedî mane. Kurtûkurmancî, sîstem bi xwe di dîrokê de terorîstê herî mezin e ku hatiye dinyayê û siberojê dîsa wê yê herî mezin be.

Mezinkirin û bilindkirina dîn di çarçoveya piştperdekirin û sergirtina mêtingeriyê de dikare maneyek xwe hebe. Şêwazê mêtinkariyê pêdiviya xwe weke dîn bi hêza rewakirineke bilind heye. Civak, ji hilberandina ku berê di çarçoveya pêdiviyên civakî de dihat kirin li derve hatibû hiştin û ev pêvajo bi serdema fînansê gihîşt asta herî jor. Bi awayekî girseyî bê kar hene. Bi zanistê zehmet e ku bê ravekirin, ji ber ku ev rewş ne yên qebûlkirinê ne, dîn dikare rewşê nerm bike û bide qebûlkirin û ya dibe jî ev bi xwe ye. Ya behsa wê tê kirin, çanda dîn a ku di bin zordestiyê de tê hiştin nîne; bûyera divê em nav lê bikin ew e ku ji nû ve dînîkirin e.

Wexta ku dibe muhafezekar rastiya îdeolojîk a ku her serdem dikevê navê ev e. Bi vî awayî civak, bi xelekên mîna kurtêlên ekonomîk, bi civaka kerî, bi şerên şaristaniyê, bi terorê û bi muhafezekariya dînî hişkehişk tê girêdan. Kengî bi sîstema qefesa hesinî û gelekî binçavkirinan civak neyê kontrolkirin, hêmanên îdeolojîk ên bi vî rengî bi ser ên berê ve têne kirin û wan dixin dewreyê.

Bi qasî ku xuya dike serdema herî bi hêz a kapîtalîzmê serdema fînansa kapîtal tevî xisletên xwe hemûyan hilweşînê îfade dike. Wer xuya dike ku potansiyela ji bo dewamkirina sîstemê qedandiye. Serdemek çiqasî ji wateya xwe bê kirin, ewqasî hewcedariya xwe bi muhafezekariyê his dike. Ev hêza hewcedariyê nîne, ev bêhêzbûnê îfade dike. Hilberandin xebata bingehîn a mirov û civaka wî ye ku bêyî nikare bijî û debara xwe bike. Serdema fînansê jî serdemeke welê ye, mikur tê ku di vê serdemê de debara mirov nabe. Sîstemek e ku nikare hilberîne, ew sîstemeke bêkar e. Ya em dibînin jî ev e. Sîstemek evçend bi xebat û hilberandinê re nakok e, ji bo karibe bijî bi tenê rêyeke wê heye, ew jî teror e ku vê têgînê jî têra xwe berevajî dike û bi provakasyonan dimeşîne.

Di serê salên 1980'î de Reagan û Thatcher ên li serê du hêzên hegemon ên sîstemê DYE û Ingilîstanê bi êrîşên terorê yên li ser Nikaragua û Giravên Malvînas (Falklandê) pêla terorê rakirin. Li Pakistan û Tirkiyê desthilatdariyên bi derbeyên leşkerî hatin ser kar jî alîkarên wan ên herî nêz bûn. Emerîka Latîn bi tevahî hatibû terorîzekirin. Bi pêşbaziya sîlehçêkirinê, şerê stêrkan dewam kiriye û di encamê de Rûsya ji hêzeke hegemonîk daketiye xwarê. Li Çînê reformên Deng Siao Ping tawîz bûn, dabûn sîstemê. Tawîzên bi şerê rizgariya neteweyî û dewleta refahê hatibûn bi destxistin jî bi dawî kirin û bahoza terorê ya serdema fînansê li her qadê rakirin. Clinton ev yek hînê nerm lê bi polîtîkayên hînê bi tesîr meşand.

Rojhilata Navîn mabû ku bi temamî nehatibû fetihkirin. Ew jî veguherandin qadeke weke girêkeke kor a pirsgirêkên çavkaniya xwe dîn, teror, radîkalîzm û şaristanî. Eger sîstem naxwaze paşve bikeve bi vî awayî yan jî bi awayekî din diviyabû fetha xwe temam bikira. Her weha pirsgirêka petrolê heye ku bi qasî jiyanê girîng e. Petrol yek ji wan sektoran e ku serdema fînansê herî zêde li ser wê prîm dike. Tespît kiribû ku bi qasî sedsaleke din hew-cedariya sîstemê pê hebû. Pirsgirêka Ereb-Îsraîlê mîna şûrê Demokles li ser serê sîstemê dihêjiya. Îran a şîî jî hînê weke tehlûkeyeke mezin li cihê xwe bû.

Herêm ku bûbû guloka probleman ji Ingilîstan û Franseyê mîras mabû. Ya rastî Şerê Cîhanê yê Yekemîn li herêmê neqediyabû. Darbe, serhildan, şerê hundirînû gerîlla bi tevahî nîşaneyên vê rewşê bûn. Bi tenê ji bo zêdekirina probleman sînor bi cedwelan hatibûn xêzkirin. Mirov dikarîbû texmîn bike ku DYE ji ber van pirsgirêkan demeke dirêj li pey projeyekê bû. Şerê sar, YKSS, Emerîka Latîn û pirsgirêkên bi Ewrûpayê re nebûna wê ji zû ve neçar bibûya dest werde herêmê. Pirsgirêkên navbuhurî, bi temamî nebin jî di serê salên 1990'î de ji bo sîstemê hinekî bi serûber dibûn. Pirsgirêka Rojhilata Navîn jî her diçû kangren dibû û dewam dikir. Yan wê bi temamî destê xwe jê bikişanda yan jî wê bi temamî destwerdanayê. Eger dest jê bikişanda petrol û Îsraîl wê ji dest biçûna û wê şens bidiya Îranê ji bo bibe hêzeke hegemon. Jixwe Seddam Husên hewesa wî hebû bibe Bismarckê Ereban.

Serdema bazirganiyê bi şerên mezin ên talanê yê mêtingeran hatibû meşandin. Serdema pîşesaziyê jî du şerên mezin ên cîhanê û ji bilî şerên çînî yên navxweyî bi şerên rizgariya neteweyî têrûtijî derbas kiribû. Fînans kapîtal jî veguherî şerê desthilatdariyê yê tevahiya civakê bi civakê re. Yekdestdarê herî dawî yê şaristaniyê, eger bi tevahî Rojhilata Navîn ji dest bidaya, heye ku di binê kaosa avabûn û struktural de bimaya. Jixwe rewşa diqewimî jî nêzî vê bû. Êdî şensê serkeftinê yê sîstemê bi giranî li gorî bûyerên li herêmê

biqewimiyana wê diyar bibûya. Ji ber vê û ji ber şertên xweser, bûyerên diqewimîn Şerê Cîhanê yê Sêyemîn bû. Jixwe bûyerên piştre rûdidan ev yek piştrast dikirin.

Ez yeqîn dikim ku têkiliya stratejîk û krîtîk a vê pêvajoyê bi min re, di demên pêş de wê hînê eşkere were fêmkirin. Jixwe mijar her ku diçe zelal dibe. Min bihîst ku wexta lîderê bi tesîr ê Sûriyê Hafiz Esed bi lîderê bi tesîr ê DYE'yê Clinton re du caran hevdîtin pêk aniye, nîviyê rojeva wan der barê min de bûye. Hatibû fêmkirin ku ez rewşê asê dikim. Di nava Projeya Rojhilata Navîn a Mezin de roleke stratejîk a demdirêj dane Kurdan. Di çareserkirina pirsgirêkên herêmê yên bi fînans kapîtalê re Kurd û Kurdistan wê weke beştê pê deriyê kelhê tê şikandin, bêne bikaranîn. Di hin dem û dewranan de Ermenî û yên din jî (Helen, Asûrî û heta Cihû, Ereb û Filistînî) ji bo van armancan hatibûn bikaranîn. Hêzên statukoparêz, dewletgirên zêde netewe, yên li şûna ku pirsgirêkên sîstemê çareser bikin li pêşiya wê dibin asteng û dev ji hewesa xwe ya hegemonyadariya herêmê bernadin, heye ku bi çoyê Kurd tesîr li wan bê kirin û ji hev bêne xistin.

Wer tê fêmkirin ku ev pîlan ji salên 1970'yî ve hatiye amadekirin û ez jî weke hêmanekî li bendê nebûn, lê weke hêmanekî rewşê asê dike, ketim navê. Yan min ê guh bida gotinên wan û bi temamî bibûma eskerekî wan, yan jî ez ê bihatama avêtin aliyekî din. Ez xwediyê wê kesayetiyê nebûm ku bibim eskerê wan. Ji lewra mirov dikare fêm bike ka çima weke hêmanekî pêşî ku herî hêsan dikare were beralîkirin dihatim dîtin. Şerê Cîhanê yê Yekemîn kengî milîtanekî Sirp welîtextê Awûsturyayê kuşt dest pê kiribû û hînê bi dijwarî wê dewam bikira. Lê weke Şerê Cîhanê yê Sêyemîn wê dewam bikira. Berevajî berê vê carê bi pîlana tevahiya hêzên rêxistinkirî yên sîstemê ez ê weke qurban bihatama hilbijartin.Di vê derê de rewş dişibin hev û dîrok xwe bi nûkirinê dubare dike. Min di parêznameya xwe de ku ji doza min a li Dadgeha Îstînaf a Atînayê re şandibû, weha gotibû: 'Xweda Zeûs û

alîkara wî Xwedawend Athena, bi destdana hev a Hades û Ares , Prometheus li zinarên Qefqasyayê li zincîrê xistin û neviyên wan ên mirovez jî mîna wî li zinarên Girava Îmraliyê zincîr kirim.’ Wer tê fêmkirin ku ev nirxandin û şîroveya min jî hinekî kêm e.

Ji vê analîza min baş tê fêmkirin ku xwedayekî rastî ez zincîr kirim. Ev çêlika piçûk a xwedê, di dehlîzên dîrokê de bi dizî hêdî hêdî mezin bû, dewlemend bû û bû xwedî pere, bi serdema kapîtalîzmê re jî derket ser rûyê erdê. Xwe wisa da qebûlkirin, bi tevahî xwedayên serdemên berê ji naverastê rabûn, winda bûn. Qral bi erdê re hatin kaşkirin û serê wan hatin jêkirin. Ji her demê zêdetir xwîn rijiya û mêtinkariyeke heta bi mûyê serê mirov hat ferzkirin.Ser û binê erdê qirêj kirin, giş tevlîhev kirin. Bi rastî mirov û li derveyî wî, bêhejmar ruhber tine kirin.

Xwedabûna pere, diyaredeyeke welê ye ku ji rastiya xwe xeternaktir e. Eger bi van rêzên nivîsê min karîbûya karekterê ku ev sîstem xwe dispêriyê hinekî bînim ziman, ew diyardeya jêre bextewarî tê gotin belkî jî xelatek e ku bi tenê para min ketiye. Spînoza gotibû: ‘Mane azadî ye.’ Ez jî bawer dikim ku li derveyî vê, azadî nîne. Bi qasî fêmkirinê azadbûn, ji bo jiyanê hêza min e. Xwedayê herî mezin ê serdema fînansê, tevî alîkar û xasûkên xwe hemûyan, ez bi zinarên Îmraliyê ve girêdam. Di berdêla vê de wê li serê çiyayên Zagros û Torosan, cihên ku textê tevahiya xweda û xwedawendên dîrokê bû, kesên ku meşaleya azadiyê ya ku êdî wê hîç venemire lê vêxistî, bibînin.

Apollon xwedayê parastin û rohniyê bû. Hinekî kêfa min jêre tê. Dionysos xwedayê eşq, şahî û şerabê ye. Kêfa min ji çanda wî re jî tê. Ev herdu sûretên xwedayên kevn ên bi koka Zagros-Toros in ku derbasî Anatolyayê bûne ne. Eşkere ye ku nasnameya gelan a ji hezarê salan dadiwerive û tê îfade dikin. Rohnî û şahî îfadeyên herî xweş ên jiyanê ne. Du xwedayên qedîm ên herêma me Gudea û Ellah jî ez li ser wan diponijim û hewl didim ji hev derxim. Ez dixwazim hîn bibim ka çima gelên me li hemberî Ellahpere bê

rohnî û parastin û di nav êş û xwînê de hiştine û bi vê rewşê razî bûne. Ez gelekî kêfxweş im ku weke zarokekîbengî yê herêmê, min gelên me ji bextê xwedayê pereyan ê kor, hîlekar û qelpezan re neterikandine. Ez timî bawer dikim ku dostên min û civaka ku aydî wê ne, wê bi min re heta hetayê bextewar bimînin.

## 6- ENCAM

## GELO ŞARISTANIYA DEWLETDAR DIKARE BI ŞARISTANIYA DEMOKRATÎK RE LI HEV BIKE?

Ez ê hewl bidim xulaseya vê beşa parêznameya xwe weke encamên kurt pêşkêş bikim.

1- Eger em pêkhatina desthilatdariyê ya ku di tevahiya dîrokê de derdikeve pêşberî me ji hev dernexînin em nikarin xebateke baş û tekûz a sosyolojîk bikin. Zanistên civakî yên dixwazin bi têgihîştina zanistên pozîtîvîst ango bi paradîgmaya wê pêşde bibin, bi temamî asê bûne. Heta em vê rastiyê qebûl nekin em nikarin diyardeya mêtinkarî û şer a ev çend mezin bûye rave bikin. Nabe ku zanyarek herî kêm bi qasî alimekî dînî û exlaqparêzekî berpirsiyar nebe. Eger zanist li gorî mîtolojî, dîn û felsefeyê zêdetir xwediyê hêza maneyê ye û tevî ku şoreşa xwe di sedsala 17. de kiriye û serketina xwe îlan kiriye, çima nikarîbû vê serdestiya xwe li hemberî diyardeyên şer û mêtinkariya nedîtî nîşan bide? Mirov dikare di desthilatdarbûna zanistê de vê yekê weke sedem nîşan bide. Zanista bibe desthilatdar azadiya xwe ji dest dide.

Eger em zanistê weke şîroveya pêşketî ya maneyê bi nav bikin, em ê ev çend bi lez yekbûna wê bidesthilatdariyê re yan li ser navê zanistê weke têkçûnê yan jî em ê weke pirsgirêkeke ciddî ya bi navkirina zanistê fêm bikin. Min xwest ez têkiliya vê pirsgirêkê bi pozîtîvîzmê re deynim. Tevî ku ew bi xwe metafizîk û dîn gelekî rexne jî dike, pozîtîvîzm ji dîn û metafizîkê jî paşdetir bi materyalîzmeke çor di zikhev de dîn û metafizîkek e û ev yek xwe di asta bêberpirsiyariya wan de bi awayekî eşkere nîşan da. Nîşanên bêberpirsiyariya wan ev in; li dijî mêtingerî û şer ti tişt nekirin, ew mîna pirsgirêkên xwe jî nehesibandin û paşê jî bûn zanista desthilatdariyê. Ji vir encama divê em derxin ew e ku zanist hewcedarê şîroveyeke nû ya maneyê ye. Zanist hewcedariya xwe

bi şoreşeke nû ya paradîgmatîk heye. Min hêza xwe ya şîroveyê weke bicihanîna qabîliyeta xwe ya maneyê di vê xebatê de ceriband. Encam bi vê ceribandinê re têkildar in.

2- Divê mirov desthilatdariyê weke rêûresmekê bifikire. Yek ji rêûresmên herî qedîm e. Bi tevahî yekparebûneke çalakiyan nîne ku rojane dertê û li ser civakê hukmê xwe dike. Divê mirov baş fêm bike ku desthilatdarî bi serê xwe dewlet nîne. Yek ji hîmê şaşiyên gelek caran tên kirin ew e ku desthilatdarî weke dewletê û şêweyên wê tê binavkirin. Jixwe hin caran çalakiyên şeran ên zêde li ber çavan û beloq ku bi kirinên desthilatdariyê re dikin yek û pêşkêş dikin, ev yek ji şîroveyên herî oportunîst ên der barê desthilatdariyê de ne. Min di vê xebata xwe de têgîna 'zilamê bihêz û xasûk' weke formekê tim bi kar anî. Çawa ku di nava piyaseyan de behsa 'destekî veşartî' tê kirin, ev jî tiştekî wisa ye. Lê ji bo mirov bingehê desthilatdariyê fêm bike, ez yeqîn dikim ku di warê hînkirinê de qîmeteke xwe ya mezin heye. Hin caran xwe eşkere didin der û bi piranî di bin rûyê eşkere yê civakê de têkiliyên desthilatdariyê datînin, yên van têkiliyan datînin û xwediyên van têkiliyan avakerên desthilatdariyê ne.

Desthilatdarî yek ji wan diyardeyê civakî ye ku her tim domdar e û xwe zêde dike. Zilamê jin kedî kir, belkî jî yek ji wan kesên pêşî ye ku di vê de herî zêde xwedî par e. Şamanên li ser hêza maneyê yekdestdarî ava kirin, bûn rahib û pêre nasnameya dînî bi dest xistin û di pîrozkirina hêza eşkere ya desthilatdariyê û dayîna wê ya xisleta esrarengî de bi tesîr bûn. Mirov dikare bi tevahî têgînên xwedabûnê û mîtolojiyên desthilatdariyê bi vê grûbê ve girê bide. Vegotina dînî û mîtolojîk bi piranî di avakirin û rewakirina desthilatdariyê de pir bi tesîr e. Di rejîma bavan a hiyerarşîk de sêberiya rahib + rêveber + fermandar ew kom e ku di civakê de zemînê desthlatdariyê bi awayekî berfireh belav dike. Di textdanîna pêşî ya desthilatdariyê de ew afirînerên vê rêûresmê sembolîze dikin. Ji vê demê nîşaneyên bi hêz ên desthlatdariyê bi

têgînên weke xwedayetî, text, bilindbûn, jihevqutbûna mirov û xwedê, piçûkxistina xwedawendan û evdîtiyê têne îfadekirin.

3- Desthilatdariya dewletê, şêweyekî berçav û mayînde yê desthilatdariyê ye, li ser zemînê hiyerarşîk û kedîkirina jinê û kolekirina evdîtiyê pêk tê. Ev yek, birêkûpêkkirina têkiliyên desthilatdariyê yên li civakê berfirehbûyî, wan bike xwediyê asteke diyar a berpirsiyariyê û bi tesîrtir û ekonomîktir bikarînana wan, îfade dike. Desthilatdarî di nava xwe de dewletê dihewîne. Lê ya di nava xwe de dihewîne ji dewletê zêdetir e. Dewlet di dîrokê de ji wan saziyan e ku xwe herî zêde kirin têgîn û ji wan saziyên yekdestdar e ku dîrokê bi xwe dide destpêkirin. Di çarçoveya analîzên dawî de; hêza ekonomîk a civakê ya zêde dibe nahêle bikeve rojeva siyaseta demokratîk û weke hêza desthilatdariyê hewl dide yekdestdariya xwe ava bike û bi vî awayî hewl dide berhem û nirxên zêde desteser bike îfade dikin. Ji bilî vê her tiştê din ê bi dewletê re têkildar e, weke mîtolojî, felsefe, dîn, zanist, şer û siyaset têkiliya hemûyan bi vê armanca bingehîn re heye. Eger dewlet komînîst be jî ev encam naguhere. Dewlet û desthilatdarî di civakê de fermî dibin û rewabûna xwe pêşde dibin.

Çalakî, şer û vegotinên civak dikarin manedar bibînin ji wan mijaran e ku herî zêde kesên li ser navê dewletê tevdigerin pêre têkildar dibin. Dewlet ji aliyê huqûqî ve yekparebûna rêzik û pîvanan e. Rewşa bi pîvanan a rêûresmê ya bi hêzê palpiştiya wê tê kirin, dikare weke binavkirina dewletekê were bikaranîn. Di vê çarçoveyê de mirov dikare weke tevahiya têkiliyên neberçav ên pêşketî jî qebûl bike. Herçiqas dewleta dîn, despotî, qraltî, împaratorî, komarî, mutlaqiyet, neteweyî, çînî, etnîkî, huqûqî, laîk, demokratîk û civakî jî were binavkirin û ji aliyê şiklî ve cihê bin jî di cewherê xwe de birêkûpêkirineke desthilatdariyê ne. Berçavbûyîna têkiliyan e. Kengî bajar ji aliyê civakî ve tevlîhev bûn û di warê çînî de dabeş bûn, di avabûna dewlet û desthilatdarî dest

pê dikin de bi rolên sereke radibin. Lê nabe ku mirov bajar bi tenê bi dewletê re yek bibîne.

4- Hûrûkûrbûna dewletê li ser bajêr û di vê çarçoveyê de serdestiya wê bi awayekî berfireh li ser civakê şaristaniyê îfade dike. Rêvebirina dewletê ya bajêr hewldaneke destpêkê ya ciddî ya şaristaniyê ye. Gotineke din a berdêla şaristaniyê tê 'medeniyet' jixwe bajartî ye û wesfên weke bajarî û bajarvanîtî vê maneyê rave dikin. Hin xisletên şaristaniyê hene ku ji dewletê dibihurin. Têkiliyeke xwe ya xurt bi zeman û mekan re heye. Di nava xwe de hejmareke zêde etnîsîte, qewm, netewe, dîn, bawerî û fikran dihewîne. Dewlet kakilê şaristaniyê ye. Lê her tiştê wê nîne. Bajar jî ji bo dewletê mekanekî bingehîn e. Lê bajar jî bi tenê dewlet û heta desthilatdarî nîne. Şaristanî li mekan û zemanên cihê dikarin pir bibin. Mîna şaristaniyên Misr, Sumer, Pers, Greko-Romen, Xirîstiyanî, Îslam, Hind, Çîn, Aztek û Ewrûpayê. Ya ku hemûyan dişibîne hev bajarîtî, çînayetî û bajar e. Têkiliyên şaristaniyan ên hundirê xwe û di navbera xwe de li gorî naveroka wan a yekdestdariya aborî û siyasî, dikarin aştiyane yan jî şerane bin, dikarin vê weke parvekirineke adil qebûl bikin û li hev bên. Eger pê razî nebin, şaristanî ango dewlet weke amûreke dadê herî zêde serî li şer didin. Di navbera şer, şîddet, şaristanî, dewlet, dad û huqûqê de têkiliyeke xurt heye. Di cewherê xwe de li ser çalakiyên cewherî yên kes û komên civakîhakimiyetê datînin, li ser navê xwe yan xwedî lê derdikevin yan jî kom û kesên din xwedî li çalakiyên wan ên ekonomîk, siyasî û îdeolojîk derdikevin, îfade dike. Şaristanî bi tevahî yekparebûna têkiliyên van rêûresm, sazî û pîvanan e. Dibe ku carnan li gorî pêkhatina şêweyê berhemê zêde û çînê jî bêne îfadekirin. Mîna şaristaniyên koledar, feodal û kapîtalîst. Jina kedîkirî + hiyarerşiya bavikan + dewlet + şaristanî = yekparebûna desthilatdariya ketiye serhevdu, formule dike ka çiqasî têkiliya hêzeke komple nîşan dide.

5- Şaristaniya demokratîk an jî medeniyet, ji şaristaniya dewletdar cihê kategoriyeke civakî ye. Çi formên civakî yên berî dewletdarî û şaristaniyê, çi jî pêkhatinên dewletê yên li derveyî dewletê mane, armanca wê ye ku bike têgîn. Tevahiya dîrokê dewletan xwe bi civakê re timî yek dîtin û bi taybetî ev kirin. Di serê vegotinên xwe yên îdeolojîk de timî anîn ziman ku civakîbûneke bê dewlet çênabe. Eger tu bibêjî, civak ji dewletê cihê ye û bi dewletê re nakokiyên xwe yên bingehîn hene, xwediyên dewletê wê ji van gotinên te nerazî bibin û tîrên wan wê berê xwe bidin vegotinên te. Lê gelekî girîng e ku mirov bibêje; dewlet di cewherê xwe de yekdestdariyeke teng e, armanca wê ya bingehîn karên gelemperiyê ango palûteya civakî nîne û vê ji xwe re weke qilifekî xwe pê veşêre bi kar tîne.

Bêguman civak piştî qonaxa komina destpêkê tevlîhev bûye û gelek karên civakê yên hevpar divê bêne rêvebirin derketine holê. Dewletê bi demê re ev kar kirine armanca rewabûna xwe û bi vî awayî civak li derve hiştiye, lê demokrasî pêşniyar dike ku karên behsa wan tê kirin, ji aliyê civakê ve bêne kirin an jî demokrasî ji bo ev yek bibe bi kêr tê. Di bingehê jihevcihêbûna şaristaniya dewletê û şaristaniya demokratîk de ev diyarde heye. Ev diyarde bi qasî manûnemanê girîng e. Kengî civak der barê karê xwe de bûn xwedî gotin û çalakî, mirov dikare behsa demokratîkbûna wan bike. Naxwe kengî ji karên wan ên hevpar bi piranî dewletê yan jî komên din bi cih anîn wê qabîliyet, azadî, wekhevî û têgihîştina xwe wenda bikin. Kom û ferdên nikaribin xwe çalak bikin û bidin axaftin, nikarin bi qabîliyet û serwext bibin, nikarin azad û wekhev bijîn. Cihêtiya diyardeyî ev çend rê li encamên girîng vedike.

Yek ji diyardeyên bingehîn ên der barê civakê de divê mirov bibêje ew e; nîzama komin a klan û qebîleyan e ku berî mîlyonan salan jiyane. Em rewşa destpêkê ya demokrasiyê dikarin di vê nîzama komin de bibînin. Çawa ku dewlet kakilê şaristaniyê ye, nîzama komin a destpêkê jî kakilê şaristaniya demokratîk e. Ev

diyarde bi serê xwe jî nîşan dide ku bingehê demokratîk çiqasî bi hêz e. Dîroka nivîskî timî behsa şaristaniya dewletdar dike. Nabêje ka civak çawa bi mîlyonan salan bi nîzama komin jiyane, karûbarê xwe meşandine. Tu dibêjî qey ev nakeve çarçoveya dîrokê. Lê diviyabû dîroka rastî ev bûya. Ji ber ku cinsê mirov hem ji aliyê mekan ve û hem jî ji aliyê zeman ve herî demeke dirêj û li hawîrdoreke berfireh nîzama komin jiyaye û ev civakê bi xwe îfade dike. Civaka esas bi xwe ev e. Dewlet û şaristanî gelekî piştre tên û li hev çêkirî ne. Mîna xemleke hewce nake weke giraniyekê ketiye ser pişta civaka bingehîn. Eger dewlet û şaristanî nebûna jî civakê wê hebûna xwe dewam bikira. Jixwe dewam kiriye jî. Lê civak mehkûm kirine bi awayekî berevajî, çeloxwarî, bi xwînrijî û mêtinkarî dewam bike.

Em wexta li zimanê nivîskî û dewletdar ê civakê dinêrin, em dibînin ku termînolojiya tê bikaranîn bi tevahî zimanê derew, hîle, zilm û zordestiyê ye. Cîhaneke welê ya forman diafirînin, mîna ku ji civakan re jiyaneke bê zordestî û mêtinkarî, bê evdîtî û koletî mumkin nîne. Ji forman ber bi reelê ve çûn, ango rewşa herikîna xwezayî yanî civak weke potansiyela demokratîk di zarokatiya jiyana xwe de li zincîrê têne xistin. Rewşa awarte ev e, ango şaristaniya zincîrkirî. Ji bo gavavêtina demokratîk sedemên me yên bi hêz hene û divê em wan weha rêz bikin; vê şaristaniyê bombeya atomê teqandiye, di temenê xwe yê pênc hezar salî de bi tenê sêsed salan di nava aştî û aramiyê de maye wekî din timî şer kiriye, hawîrdor xira kiriye û bi tevahî pirsgirêkên civakî kangren kiriye. Ji tevahiya van pirsgirêkan ev şaristanî berpirsiyar e û divê mirov vê bîne ziman. Ya awarte ango ne asayî ew e ku şa-ristaniya dewletdar weke dêwan mezin dibe û li hemberî vê şaristaniya demokratîk bejinbihost dimîne. Di hinavê tevahiya civakan de ev nakokiya sereke heye. Bi demokrasiyê pêş neketin, nexweşiyeke şaristaniya dewletdar, bêgotin û bêçalakî ye. Rewşa civakan a bi kêf û şahî, bi evîn, divê herî kêm bi qasî rewşa wan a bi êş, xemgîn

û bêevîn asayî bê qebûlkirin. Ha şaristaniya demokratîk, wê civaka ber bi şaristaniya şahî û bi evîn diçe, îfade dike. Ev ne bi tenê alternatîfek e, ev jiyaneke azad e ku bi awayekî xwezayî li xwezaya cinsê mirov rûdine, bi mejiyê wî yê analîtîk û hisî re dibe yek.

6- Çawa ku tê zanîn, nîzama sermayedariyê berhemê kapîtalîzma çarsed salên dawiyê nîne, berhemê şaristaniya dewletdar a pênc hezar salî ye. Berhemê zêde yê bi cotkariyê derket holê bingehê maddî yê pêkhatina sermayê ye. Rêxistiniya xwe ya destpêkê di zemînê perestgehan de meşandiye. Di vê sîstemê de li qatê jor xwedê ango rêveberê jor hebû, li qatê navîn hêza rewaker rahib ango alîkarê rêveberê jor; qasidê têkiliyên evdan û civakan hebû, li qatê jêr jî koleyên bi nanozikê dixebitîn hebûn. Vê sîstemê heta roja me ya îro timî xwe mezin kir, pir kir, cihê kir û li xwe zêde kir û hat. Li gorî analîza dawî bajarbûn, çînayetî û dewletbûn berhemên berhemê zêde ne. Civak berhemê zêde pir dike û timî li ser vî hîmî kar dabeş dike, qonax bi qonax dike, bi hêzê techîz dike, dixe pozîsyona êrîş û parastinê û ev hemû diyardeya şaristaniyê îfade dikin û ev yek jî têkiliya wê ya bi sermayê re eşkere nîşan dide. Di çarçoveya maneyeke teng de xwe weke ekonomiyeke di demên kin de pir dike, bi nav dike û di çarçoveya maneyeke fireh de xwepirkirina wê xwediyê heman maneyê ye. Çawa ku komkirina rojane ya bazirgan sermaye be, berhemê zêde yê yekdestdarê axê ango dewleta cotkariyê jî bi hêsanî mirov dikare weke sermayê bi nav bike.

Dîrok nîşan dide ku serdema bazirganiyê ji şaristaniyê hînê demdirêjtir e û ji serdema Ûrûkê B.Z. 4000 salî heta roja me ya îro xwe dispêre paşerojeke şeş hezar salî ye. Şaristaniya bazirganiyê li gorî şaristaniya cotkariyê di dereceya duyemîn de maye û ji aliyê zeman û mekan ve car caran rê li şaristaniyên bi heybet ên bajaran vekiriye, lê di nava civakan de zêde eleqe nedîtiye. Di vê de karektera wê ya di karê de îstîsmarker bi roleke girîng radibe. Zêdetir di goşeyên tenha û dehlîzên dîroka civakî de ji xwe re cih

dîtiye. Di tevahiya serdemên şaristaniyê de mezinbûna xwe misêwa dewam kiriye. Sektora bazirganiyê di dîrokê de cara pêşî P.Z. di navbera sedsalên 13.-16. de li bajarên Îtalyayê, di navbera sedsalên 15.-18. de li tevahiya bajarên Ewrûpayê dibe hêzeke hegemonîk û di derketina şaristaniya Ewrûpayê de bi roleke bingehîn radibe. Tevî ku di civaka nû de dibe aktor, platforma siyasî jî dixe bin bandora xwe. Talanên mêtinkariyê û yekdestdarên mezin ên bazirganiyê di zêdebûna sermayê de bi roleke diyarker radibin. Zanîbû çawa tevgerên Ronesans, Reformasyon û Rohnîbûnê bixe bin bandora xwe.

Di sedsala 19. de bi şoreşa pîşesaziyê re îndustrî bû qada bingehîn a kara sermayê. Kengî hilberandin, gera sermayê û bikaranîna mal ket kontrola yekdestdarên pîşesaziyê, ev yek bû asta herî jor a şaristaniya Ewrûpayê. Vê rewşê li hundir rê li çînayetiyê, li derve jî rê li şerên rizgariya neteweyî vekir. Îdeolojiya hegemon a sîstemê herdu tevgerên berxwedanê di berdêla tawîzên hundir ên sîstemê de bê tesîr kirine. Di dawiya sedsala 20. de di serî de pirsgirêkên hawîrdor û bajaran, krîzên îndustriyalîzmê rê li wan vekirine êdî xwedî karekterê avabûnê ne. Encama vê jî serdema fînansê bû. Ev serdema ku sermaye ji hilberînê û pere jî ji rezervên xwe yên zêr xilas bûye û bi temamî bê berpirsiyar bûye, veguheriye krîza topyekûn a pêvajoya şaristaniyê. Potansiyela civakî ya sermayê qediyaye û xwe weke sîstemên ferazî nû dike û hewl dide dewam bike. Nîzama kar-sermayê ya ketiye rewşa ku xwe dispêre qeydkirina kaxizan, misêwa hewl dide biceribîne civakê bi krîzan bê refleks bihêle. Diyardeya jêre pêngava global a sêyemîn tê gotin, ya rastî qonaxa sêyemîn û dawî ya şaristaniyê ye.Ev jî bi qonaxa pêsîrtengiya strukturel re eleqedar e.

Di cih de ye ku em serdema kapîtalîzmê weke krîza civakî bi nav bikin. Me weke tezeke bingehîn destnîşan kir ku ji kapîtalîzmê re şaristaniya ekonomîk tê gotin, lê ew ekonomî nîne, yekdestdariyeke hêzê ye, ji derve tê, xwe ferz dike û nabe rewa bê

qebûlkirin. Li ser diyardeyeke mîna civakê ya ji yekparebûna koman pêk hatiye, hêzeke mîna kapîtalîzmê herî egoîst, berjewendîperest û şerûd serdestiya xwe çêkiriye û ev jî di dîrokê de rewşeke 'awarte' ango ev jî dikare rewşeke bi krîz îfade bike. Serdema fînansê dihêle ku ev rastî ji gelek aliyan ve û di her parçeyê ci-vakê de xwe nîşan bide. Eger sîstem misêwa terorê diafirîne, beşê mezin ê civakê bê kar dihêle, karkeriyê jî weke şêweyekî bêkariyê bi kar tîne, rê li civaka girse û keriyan vedike; sinaet, seks û sporê dike îndustrî û desthilatdariyê bi heta demarên zîro yê civakan belav dike, ev hemû nîşan didin ku sîstem xilas bûye, qediyaye. Hewa û atmosfereke welê hatiye afirandin ku mîna tevahiya dîrokê û paşeroj bi tenê li ser hîmê sermayê dikare hebe.

Sektora jêre medya jî tê gotin, rola wê ya sereke ew e ku vê civaka ferazî û sîmulakr mîna rastî be nîşan bide. Civaka divê bijî û pêk bê jî misêwa bêber, xeyalî û utopîk tê nîşandan û li derveyî rojevê tê hiştin. Sermaye, ne weke tê zanîn ekonomî ye, berevajî li serê ekonomiyê piçikiye û bûye bela. Ew têra xwe ji rê derxistiye, li şûna maddeyên pêdivî bi wan heye ketiye wan qadan ku têde kara xwe mîna gidîş û lodan zêde kiriye, ev yek bi çavsorî û çavkorî kiriye, ji ber ku ew nîzamekî şîddetê û yekdestdariyeke hêzê ye.

7- Berevajî nîzama sermayê, ekonomî qada tedarikkirina pêdiviyên maddî yên civakê ye. Ekonomî ku demeke dirêj bi nirxê bikaranînê re sînordarkirî mabe, têkîliya vê yekê bi nîzama komin re heye. Yekparebûna civakî bi awayekî jiyana herkesî misoger bike bi şêweyê pîvanekê tê rêvebirin. Ev yek li gorî xwezaya mirov e. Hilberandin ti carî ji bo karê nehatiye kirin. Piştî dudiliyeke demdirêj ango ekonomiya diyariyan, weke encama dabeşkirina kar di nava civakê de, ekonomiya malpevguhertinê karîbûye ji xwe re di nava civakê de cih bibîne. Li nirxê bikaranînê zêdekirî, nirxê pevguhertinê bi armanca karê nîne. Pêdiviyên pircure zêde dibin û li ser hîmê hewcedariya beramber bi hev heyî di hinavê wê de

heye. Têkiliya metabûyîn, bazar û pere di destpêkê de bi armanca karê nîne. Ji bo tedarikkirina vê pircuretiya pêdiviyan û û hewcedariya bi hev, hatine pêşxistin. Diyardeya jêre ekonomiya bazarê tê gotin weke tê zanîn ekonomiya sermaye-karê nîne, ekonomiyek e ku têra xwe têde bihevguhertin heye. Bazirganî eger di berdêla hewldana ger an jî gerandina mal de bibe û parek di berdêla vê de bê girtin wê bibe xebateke ekonomîk a kêrhatî û hewcedarî pê heye. Eger buhayên malan li derveyî reqabeta yekdestdaran li bazarê diyar bibe wê wextê mirov dikare bibêje nebzê ekonomiyê li bazarê lê dide. Pere bi tenê pevguhertinê hêsan dike. Komikên em ji wan re dibêjin dikandarên piçûk û xwedî pîşe hemû, eger di pêvajoya bazarê de berê xwe nedin îstîsmarê, wê bi rola hêmanên ekonomîk ên hewcedarî bi wan hene, bi xêr û kêrhatî, rabin. Pêdiviyên mirovan weke xwarin û vexwarin, lixwekirina cil û bergan, cih û war, vehewîn û strîn, çûnûhatin, şahî û her wekî din dabeşî sektorên cihê bibe, ev hemû nîşaneyên pêşketina aboriyê ne. Bi tevahî hewldanên der barê van sektoran de mirov dikare weke xebatên ekonomîk manedar bibîne. Evxusûsbi tevahî ji bo civakê bi hêsanî têfêmkirin, bi qîmet in û etîk in.

Diyardeya bi nerazîbûn û li ber rabûneke mezin re rûbirû hat û di tevahiya dîrokê de weke xirab, krêt, zordarî, zilm, neheqî û ya divê nebe hat dîtin, ji derve ve li ser ekonomiyê hat ferzkirin an cebren û bi zorê, yan jî bi rêbazên xasûk weke tinebûn, stok,lîstina bi buhayan û nirxên peran ferzkirinên yekdestdaran in. Ji sazkirina vê nîzama yekdestdar re bi giştî nîzama kar-sermaye tê gotin. Li gorî pîvana wê bivê nevê, divê hinek pir zêde karê bikin, beşê mezin jî ango bêkar, xizan û kesên li sînorê birçîtiyê têne ragirtin jî muhtacê nîzama sermayê bêne kirin. Sedema nî-şan jî dide ew e ku wexta keysa bi destxistinê ya mezin bê dayîn, pêşbazî wê dest pê bike û ev yek jî wê ekonomiyê pêşde bibe. Ev dereweke mezin e û ev jî ji rewşa wan kesên îro li serê serdema fînansê rûdinin û ti

têkiliya wan bi ekonomiyê re nîne (ji bilî mijarên spekulatîf ên mîna borsa, faîz, qûr) tê fêmkirin. Têkilîdanîna van kesan bi ekonomiyê re, bi krîzê re heman tişt e. Ji bilî karê ti tişt wan eleqedar nake.

Bi saya disîplîneke zanistê ya berevajîker a bi navê ekonomîk-polîtîk xebatên ekonomiyê yên rastî li derveyî rojevê û li derveyî ekonomiyê têne hiştin. Xebatên ne ekonomî ne weke xebat û pîroziyên ekonomiyê (dîsa mijarên spekulatîf ên weke borsa, faîz û qûr) yên dest ji wan nabe têne nîşandan. Hewl didin wê weke ekonomiya di asta bilind de bidin qebûlkirin. Yekdestdarên hêzê eşkere û li ber çavan a ekonomî ye weke ne ekonomî, ya ne ekonomî jî û heta ya dijberê ekonomiyê weke ekonomiya asta bilind û pîroziyên ekonomiyê dikarin bidin qebûlkirin. Eger were pirsîn ka pirsgirêka bingehîn a ekonomiyê çi ye, wê bersiva wê ew be ku divê mirov wê ji vê yekdestdariya dizekan xilas bike. Ji bo ekonomiyeke rastî pêk bê, divê mirov wê ji ya ne ekonomî û ji ya bi destên yekdestdaran ji derve tê ferzkirin û dijberiya ekonomiyê ye, rizgar bike. Divê mirov xwe ji lîstikên spekulatorên qûr, borsa û faîzê yên di bin navê nûçeyên ekonomiyê de tên pêşkêşkirin xilas bike; ekonomiya rastî ew e ku bi rêkûpêk bersivê dide pêdiviyan û mirov bi hêsayî bi teknîkeke dost a zirarê nade hawîrdorê xwe digihîne wan û bi vî awayî hildiberîne, dabeş dike û bi kar tîne. Ji bo avakirina ekonomiyeke bi vî rengî em dikarin bi nav bikin gava pêşî ya divê em biavêjin ew e ku divê em bi rêxistin, bi bername û bi plan xwe ji ya ne ekonomî ye, xilas bikin.

8- Li hemberî barbariyên serdema kapîtalîst qebîle û ezbetên pêşî ku xwestibûn wan li ber mêtinkarî û nîv-mêtinkariyê stûtewendî bikin, li ber xwe dan û serî rakirin. Qebîleyên Çermsoran ên li Bakurê Emerîkayê û şaristaniya Aztek a li Başûrê Emerîkayê heta dawiyê li ber xwe dan. Şaristaniyên Asya û Efrîkayê, qewm û qebîleyên wan, şaristaniyên Çîn, Hindistan û Hebeşîstanê bi hezaran qebîleyî timî serîhildan û berxwedanên

xwe dewam kirin. Hînê bi awayekî serwext û rêxistinkirî, piranî jî bi şêweyê tevgerên rizgariya neteweyî yên sedsala 20., kêm be û şaşiyên wan hebin bin jî serketinên gelekî girîng bi dest xistin. Di hundir de hişyarkerên mezin jî pêvajoya proleterbûnê bi xwe bû. Çawa ku tê zanîn di piyaseyê de bi awayekî azad firotina keda xwe mirov ji serftî û nîv-koletiyê xilas nake; berevajî, mehkûmiyeteke gelekî zalimane ya koletiyekê ye, ji bilî heqdestekî ti çareya xwe nîne. Bi qasî peydenekirina kar, timî heqdesta kêm, karekterê rejîma nû ya zordar nîşan dide ku gelekî ji ya berê xirabtir e.

Bi tevahî serhildanên mezin ên li dijî kapîtalîzmê ji bo nebin karkerên bi vî rengî çêbûn. Ev serhildan ne têkoşîna karkerbûnê ne, têkoşîna ji bo karkernebûnê ne. Bi danasîneke şaş gotina ‘Bijî têkoşîna karkeran’ û gotina ‘Bijî koletî’ yek tişt e. Ya rast û ya jiyan jî destekê dide ew e ku divê mirov li ber mehkûmetiya bi heqdestê rabe. Ev serhildanên nîv-dezgehdaran û nîv-gundiyan ku weke lod û gidîşan xweber mezin bûn, timî bi dîroka kapîtalîzmê re di zikhev de ne. Rewşenbîrên ji pêşeroja nîzama feodal bê hêvî bûn û texmîn nedikirin ku wê nîzama nû ya pêşerojê çawa be, misêwa li ‘welatekî rojê’ geriyan. Utopyagerên pêşî ti carî xeber ji kapîtalîzmê nedan. Berevajî, li dijî vê kabûsê bi pêşerojeke tijî hêvî rabûn û xeyal be jî xwe paşve nedan ji bo di vî warî de projeyên xwe pêşkêş bikin. Serdema gavavêtina kapîtalîzmê di heman demê de di serî de Saint Simon, Campanella, Fourier, Erasmus û gelek utopyagerên mezin û nifşekî qehremanan ji bo wekhevî, azadî û nîzama komin têkoşiyan.

Bi pêşengiya K. Marks û F. Engels cara pêşî li dijî kapîtalîzmê ala têkoşîneke bingehê wê zanist hat hildan. Herçiqas di hinavê wê de şaşî û kêmasiyên girîng hebûn jî di bin navê sosyalîzma zanistî de dijberiyeke sîstemê ya sedûpêncî salan bajo û bibe xewneke xeternak a kapîtalîzmê, pêk hat. Qehremaniyên gelekî mezin hatin nîşandan. Çeperên gelekî girîng hatin bidestxistin. Demeke dirêj bi qasî heftê salan bû îdeolojiya fermî ya YKSS’ê. Çîna parzemînê

rakir ser piyan. Ji tevgerên rizgariya neteweyî re bû îlham. Bêşensiya vê tevgera li dijî sîstemê ew bû ku nikarîbû modernîteya kapîtalîst ji hev derxîne û nikarîbû bi awayekî radîkal xwe ji wê qut bike. Paradîgmaya wê ya zanistî, pozîtîvîst bû. Şaristaniya dewletdar û rêûresma desthilatdariyê ya di şaristaniya kapîtalîst de dewam kir, pir zêde fêm nekirin. Lê dîsa jî ji zû ve heq kirin ku bibin yek ji kevirê çarqozî yê şaristaniya demokratîk.

Divê mirov antî-kapîtalîstiya anarşîstan ti carî piçûk nebîne. Di serî de Proudhon, Bakunin, Kropotkin û gelek anarşîst weke wan şoreşgerên gelekî hoste bûn; rexne li sîstemê dikirin û hewl didan wê bi demokrasiya komin re bikin yek. Tevgera azadî û komin gelek tiştan deyndarê wan e. Tevgera anarşîstan jî nikarîbû bi temamî bingehê desthilatdarî û şaristanî li ser bilind dibû bibîne, nikarîbû qalibên modernîteyê bişkîne û wan jî kapîtalîzm bi tenê weke sîstemeke ekonomiyê dîtin. Xalên me jimartin kêmasiyên wan ên bingehîn bûn û nuqteyên sereke bûn ku têde xapiyabûn.

Tevgera ciwan-rewşenbîran a di sala 1968'an de derket pêş, di ketina serdema fînansê de tevgera herî mezin a protestoyê bû. Herçend aliyê wê yê utopîk li pêştir bû jî li dijî serdema herî qirêj û tarî bû meşaleya azadî û rohniyê. Piştre tevgerên çandî, femînîst û hawîrdor-ekolojîk pêşketin, bi perspektîfên xwe yên pêşî yên antî-modernîst rêyeke nû vekirin. Bêyî xwe bispêrin desthilatdariyê vegotina têkoşîna wekhevî, azadî û demokratiyê xurt kirin. Li dijî sermayedariya global gav û navê civaka global weke dijberên sîstemê hat bihîstin, bi rexneyên der barê rabihuriyê de li xwe kirin, cara pêşî bi awayekî bi rêkûpêk bi têgihîştineke dîrokî û civakî xwe xurtkirin, bi veqetîneke temam ji şaristaniya kapîtalîst û bi yekbûna bi şaristaniya demokratîk re karîbûn li ser rêya azadî, wekhevî û kominalîzmê pêşde biçin.

9- Şoreşgerên di sedsala 19. û 20. dedi mijara desthilatdarî û forma wê ya berçav û modern ango dewleta netewe de xapiyan, sedema sereke ya binketinên wan jî ev e. Di çareserkirina

pirsgirêkên civakî de weke xeleka bingehîn xwe gihandina desthilatdariyê didîtin. Di bernameyên wan de hedefa pêşî xwegihandina desthilatdariyê dihat nîşandan. Bi tevahî şêweyên têkoşîna wan bi vê perspektîfê ve hatibû girêdan. Lê jixwe desthilatdarî bi xwe azadnebûn, ne wekhevî û antî-demokratîzm bû. Amûr xwediyê wan xisletên kevneşopiyê ne ku dikarin her şoreşgerê herî li ser xwe jî nexweş bixîne. Jixwe der barê desthilatdariya amûrê rizgariyê dihesibandin de ti analîza wan a dîrokî-civakî tinebû. Qet neanîn ziman ku di tevahiya dîrokê de desthilatdarî çawa pêk hat, di kîjan qonaxan re derbas bû, têkiliya wê bi dewlet û ekonomiyê re çi bû, di nava şaristaniyan de bi kîjan rolan rabû û di nava civakê de çawa cih girt. Bawer dikirin ku bikeve destê şoreşgeran wê weke 'çoyekî bi sêhr' bi ku ve bibe, ew dever ê veguherîne buhuştê. Bi kîjan pirsgirêkê bikin, wê biketa rê û çareser bibûya. Şêwazê dîktatoriyê jî dikarîbû hîn bal bi-kişanda. Li hemberî dîktatoriya bûrjûwayê dîktatoriya proleteryayê hatibû îlankirin. Ji vê eşkeretir mirov xwe bi xwe nedixist feqê. Têkoşîna qehremanan a sedûpêncî salî, di geravên desthilatdariyê de xeniqîn, çûn. Di dawiyê de amûrê weke desthilatdariyê di destê wê de ma, hat fêmkirin ku mekanîzma kapîtalîzmê ya herî paşverû, antî-demokratîk, ne azadî û ne wekhevî ye. Lê gelek tişt ji dest çûbûn. Nexweşiyeke desthilatdariyê ya mîna di dîroka Xiristiyantiyê de xwe dubare kiribû.

Nêzikbûna ji dewleta netewe re hînê rewşeke bi felaket bû. Ev Levîathanê modernîteyê yê herî milletgir, cinsiyetparêz, dîndar û bi zanistê hatiye strandin ji bo têkoşînê weke hîm û çarçoveyeke rast dihat qebûlkirin. Li hemberî Konfederalîzma Demokratîk dewleta netewe ya navendî weke amûrekî pirsgirêkan çareser dike û pêşverû ye, hat qebûlkirin ango weke armanceke rast hat pêşkêşkirin. Nava desthilatdariyê bi milletgiriya yekreng, civaka cinsiyetparêz, dîndariya fanatîk û zanista pozîtîvîst hatibû tijîkirin û nepixandin. Hat fêmkirin ku dewleta netewe hîmê wê avahiyê ye

ku di dîrokê de welatiyê herî sosret afirandiye, civak bi tevahî di nava dewletê de helandiye û di encamê de biriye faşîzmê. Ev dewleta netewe bi ti awayî ji hev nehatiye derxistin û analîzkirin. Ev amûra ku desthilatdariyê dawerivand heta bi çeperên civakê, kengî bû tercîha sosyalîzma zanistî jî çarenûsa sosyalîzmê ji destpêkê ve diyar bû. Jihevdeketina fermî ya di sala 1989'an de tenê formalîteyek bû. Kengî xisleta demokratîk a Sovyetê di destpêka Şoreşa Cotmehê de ji dest çû, diviyabû diyar bibe ku ya biwelide wê ne sosyalîzm, lê kapîtalîzm be. Rizgariya neteweyî, ya ku mirov jê bi hêvî bûn neda, ev yek jî ji nêz ve têkildarî vî şêweyê desthilatdariyê bû. Amûrekî ku bingehê tepisandina azadî, wekhevî û demokrasiyê bû, wê çawa pê azadî, demokrasî û wekhevî bihata avakirin? Ji ber ku demokrasî weke amûrekî ku desthilatdariyê sist dike dihat dîtin hînê di destpêka desthilatdariyê de ji dewreyê hatibû derxistin.

Dewleta netewe weke proto-faşîzmê di ser dewlemendiyên civakan tevahiya dîrokê bi destxistî re weke bûldozerekê derbas bû û hêviyên pêşerojê di tariyê de difetisandin. Li dawiyê bi tenê dewleta netewe ya xwe kirî xwedê dima ku xwe bi dînekî milletgiriya pozîtîvîst a pûtperest diparast, xwe rastiya bi tenê didît û ava dikir, bê hest û zalimek e ku kareserî li qirkirinê bide. Di dîroka pênc hezar salî ya sermayê de cara pêşî ekonomî, siyaset, civak û îdeolojî bi yek destarî hatin hêran û ev hêza yekdestdariyê ya jê hat bidestxistin, bingehê pirsgirêkan tevan e. Eşkere bû ku heta dewleta netewe weke têgîn û pratîk li dawiyê nehata hiştin, têkoşîna sosylîzmê wê xwe ji xapandinê wêdetir neçûya. Îndustriyalîzm jî heta ku weke cêwiyê dewleta netewe neyê analîzkirin, di serî de kansêrbûna bajêr, wê rê ber li hilweşîna hawîrdorê neyê girtin. Îndustriyalîzma ku weke hedefeke şoreşger tê nîşandan şêweyekî kara zêde yê yekdestdariya dewletê ye. Hebe nebe, mirov dikare weke sosyalîzma firewnan maneyekê bidiyê. Heta jihevdeketinê YKSS, di roja me ya îro de jî sosyalîzma Çînê,

weke pratîkvanên herî çor ên îndustriyalîzmê, ji wan rejîman bûn ku herî zêde sîstema kapîtalîst xwedî kirin. Herdu jî bi awayekî pir hişk, bûn dewleta netewe û modernîteya îndustriyalîzmê ku ev jî serketina kapîtalîzma lîberal bû.

Sîstemeke ku xwe weke serdema fînansê, gelekî ekonomîk nîşan dide, ji bo mirov wê fêm bike, divê timî wê berepaş bixwîne. Heye ku mirov ji vê rêbazê gelekî hîn bibe. Wexta ku ew fînans dibêje; divê mirov desthilatdariyeke heta çeperên civakê belavbûyî fêm bike, wexta ew ekonomî dibêje divê mirov a li derveyî ekonomiyê û dijberiya wê fêm bike, wexta ew neolîberalîzm dibêje, divê mirov muhafezekariyeke hişk fêm bike û ev yek jî wê me bigihîne şîroveyên hînê rastir.

Yekdestdariya fînans, îndustriyalîzm û dewleta netewe amûr in ku ne bi tenê modernîteya kapîtalîst, pêşiyê li jihevdeketina avahiya şaristaniya pênc hezar salî jî digirin. Ji bo karibin xwe bi awayekî mayînde ji nû ve ava bikin wê alternatîfên xwe neçarî gavavêtinên kêm û şaş bikin, di nava xwe de wan kedî bikin, bê tesîr bikin û wan weke sîlehê bi kar bînin.

10- Di tevahiya dîrokê de beşên civakî yên xizan û demokratîk di têkoşîna xwe de ‘hespê şaş’ hilbijartine. Wer bawer dikirin ku bi tenê bi sîlehên dijminên xwe karin dijminên xwe têk bibin. Li gorî karektera xwe ya azadîxwaz, wekhevîxwaz û demokratîk nikarîbûn sîlehan çêkin. Çêkiribana jî li gor serketin û binketina xwe bi hêsanî dikarîbûn dest ji wan bikişînin. Sîlehên pêşketî yên dijberên wan ji wan re hêsan bûn. Ne bi tenê amûrên wan ên eskerî, ji avakirina wan a xwedayan heta cil û bergên wan, ji mîmariya wan heta bi şêwazên wan ên aqil, ji şêweyên wan ên mêtinkariyê heta bi hûnandina wan a desthilatdariyê, sazî û zêhniyeta şaristaniya berê hatiye avakirin weke heyî hemû dewr girtin. Yan jî di nava wan de heliyan û bûn ew bi xwe. Eger mirov û dijberên xwe, heman hespî hilbijêrin encam ev e.

Serekqebîleyên Semîtîk û Aryenîk ên ji çar aliyan ve êrîş birin ser şaristaniya Sumeran, yan weke heyî çûn serê sazî û zêhniyeta Sumeran an jî di navê de bûn evd û çûn. berxwedaniyên destanwarî yên hezarê salan ên qebîle û êlan ku hînê jî awazên wan li ber dahol û zirneyan dilê me zîz dikin, bi vî awayî badilhewa çûn.

Apîrûyên êrîş birin ser şaristaniya Misrê, piraniya wan bûn kole û kêm kesan ji wan di nava burokrasiya qesrê de cih girtin û jê wêdetir jî neçûn. Em qebîleyeke Ibraniyan nas dikin; hem ji Sumer-Babîlan, hem ji şaristaniya Misriyan mîras mayî. Ew jî hem bûn bela serê xwe hem jî bûn bela serê dinyayê. Ne bi temamî bûn kole, ne jî bi temamî azad bûn.

Êlên Med û Skîtan bi qasî sêsed salan li hemberî împaratoriya Asûr li ber xwe dan û êrîş kirin. Di encamê de rêyaîmparatoriyên Ûrartû û Persan ên kukopiyên Asûr in vekirin. Hinek ji wan bûn serdarên leşkerî yên Ûrartû û Persan û bi piranî bûn evd û nikarîn xwe ji vê xilas bikin.

Li dijî şaristaniya Greko-Romen ji derve berxwedana qebîleyan û êrîşên Keltîk, Nordîk, Gotîk û Hûnîkan û di hundir de jî serhildanên koleyan û berxwedana Xirîstiyanan a weke partiyeke tevahiya xizanên bi koka xwe etnîk bûn, tevahiya pêncsed salan li pey hev misêwa dewam kirin. Serketina hat bidestxistin ji kopyayeke rengmirî ya taca Romayê ji xemla serê hin qebîle û papatiyê wêdetir neçû. Bîranînên bi mîlyonan têkoşerên avêtin ber şêran, hatin şewitandin û li çarmîxê hatin xistin, di nava hesabên sar ên şaristaniyê de qeşagirtin û man.

Qewm û binemalên Helen, Çerkez, Asûrî, Ermenî, Kurd, Tirk û Ereban tevahiya heftsed salan li ber xwe dan û êrîş birin ser şaristaniya Sasanî û Bîzansan û mîratxwirên wan, di encamê de li dawiyê kopiyên tacên rengmirî yên siltanan û bi mîlyonan qebîleyên xizan, bendeyên axayan û kole hiştin.

Jixwe ya çi bi serê wan kesên li hemberî şaristaniya kapîtalîst a Ewrûpayê li ber xwe dan û serî rakirin, hat, min bi firehî diyar kiribû.

Di serdema neolîtîk de komên mezin ên şoreşger nîzama wan a komin tijî pîrozî bû. Bi tevahî şaristaniyan ji aliyê maddî û manevî ve mîrasa vê serdemê xwarin, xwarin neqedandin û ev rewş dilên me, dilê min xemgîn dike. Divê em dîroka destanwarî û bi heybet a van êrîşkar û têkoşeran a xwe bihesibînin ango ‘dîroka şaristaniya demokratîk’. Lê divê em vê dîroka hatiye jibîrkirin û hatiye desteserkirin baş ji hev derxînin, binivîsînin û xwedî lê derkevin. Divê em bi ti awayî xwedî dernekevin li dîroka evdên li qesran û xwediyên tacên rengmirî yên çavberdan xemlên tacên şaristaniyê, bi qebîle û hemû etnîsîteyan, bi keda qewmên xizan, bi berxwedan û serhildanên wan, bi zanyartî û qehremantiya wan re îxanet kirine. Em heta van ji hev nekin, em nikarin dîroka şaristaniya demokratîk binivîsînin. Ev dîrok heta neyê nivîsandin wê têkoşîna rojane ya azadiyê, wekheviyê û demokrasiyê bi awayekî serketî neyê meşandin. Dîrok kok e. Her giha li ser koka xwe hêşîn dibe. Çawa ku ruhberekî li ser koka xwe ranebe, nikare xwe dewam bike, cinsê mirov jî bi dîroka xwe ya civakî ranebe nikare rêyeke jiyanê ya bi anor û azad hilbijêre.

Dîroka şaristaniya serwer îddîa dike ku ewdîroka yekane ye, teza dibêje nabe dîrokeke din hebe, esas digire. Mirov heta xwe ji vê têgihîştina dîrokê ya dogmatîk û reduksiyonîst qut neke, têgihîştina li dîroka civakî-demokratîk çênabe. Bila kes yeqîn neke ku sazî, têkilî û bûyerên dîroka şaristaniya demokratîk tinene yan jî kêm in. Berevajî ev dîrok bi materyalên herî dewlemend tijî ye. Herî kêm bi qasî dîroka şaristaniyê mîtolojî, dîn, felsefe, zanist, huner, zanyar, hozan û nivîskarên wê hene. Ya hewce ew e ku divê em zanibin bi paradîgmaya xwe binêrin, ji hev bikin, hilbijêrin û binivîsînin! Ez nabêjim ku mirov ji zêhniyet, sazî û sîlehên dijmin û hevrikên xwe sûdê wernagire. Lê bi qasî ku mirov jê sûdê bigire,

divê zêhniyeta xwe, sazî û sîlehên xwe çêke û esas bigire, naxwe mirovê nikaribe xwe li ber zêhniyet, sazî û sîlehên wan ji têkçûnê xilas bike û mirov ê nikaribe xwe xilas bike ji destê wan ji bo nebe weke wan.

11- Weke encam, mirov ji tevahiya van tez û analîzên min divê hukmekî weha dernexîne 'şaristanî bêyî ku li hev bikin heta hevdu tine bikin û serketinê bi dest bixin şer dikin'. Çavkaniya hukmên bi vî rengî, têgihîştina diyalektîkî ya tine dike ye û weke min di têgihîştina xwe ya felsefî de jî hewl dabû rave bikim, ez wê li gorî diyalektîka herikîna gerdûnî li cih nabînim. Herçiqasî seriyên hevdu tine bikin hebin jî ya esas ew e ku dualî bi hev ve girêdayî ne û hevdu xwedî dikin ango têkiliyeke simbiyotîk e. Di xwezaya civakê de zêdetir ev cewherê diyalektîkê dimeşe. Ji bo civakan jiyanên hevbeş esas in; li hev dikin, bêyî ku hevdu tine bikin, beramber hevdu xwedî dikin. Dîrok û aktualîte bi giranî vê xwezayê bi mînakan piştrast dikin. Şêweyên têkiliyê yên tine dikin û zêde ji xwe cihê dikin, rewşên îstîsnayî ne. Çawa ku di cîhana heywanan de şêr îstîsna ne.

Şaristaniya dewletdar û şaristaniya demokratîk bi hev re û bêyî ku hevdu tine bikin, dikarin li hevdu bikin. Ji bo vê jî şertê pêşî ew e ku şaristanî nasnameyên hevdu nas bikin û bi rêz bin. Eger aliyek li ser aliyê din nasnameya xwe bi zorê yan bi hin avantajên di destên wê de yan jî bi pêşengiya xwe hewl bide pê bide qebûlkirin, ev lihevkirin nîne, rêbaza tinekirinê ye. Di tevahiya dîrokê de ev rêbaz derdikeve pêşiya me û di roja me ya îro de jî heta bi çeperên civakan belav bûye. Ev rêbaz a şer û desthilatdariyê ye. Ewrûpa, hinekî jî DYE weke hêzên hegemon ên sîstema kapîtalîst ji rêbaza şer-desthilatdariyê ya tevahiya çarsed salan hat pêkanîn, dersên hewce girtine û bêyî ku bi tevahî dewleta netewe (Ji ber ku sedema bingehîn a şerê hundir û derve rêxistiniyên bi vî rengî yên desthilatdariyê ne) hilweşînin, hewl didin bi şêweyên yekîtiyên federal ji nû ve ava bikin. Wexta vê

yekê jî dikin, argumanên weke mafê mirovan, civaka sivîl û demokratîkbûnê jî tevlî dikin. Eşkere ye ku dixwazin dewleta netewe ji şêweyê wê yê hişk daxînin û nerm bikin, ango dixwazin dewletê bînin astek amûrekî hîn zêdetir bi roleke çareserker rabe. Li Rûsya û Çînê jî hewldanên bi heman rengî hene. Dewletên mîna Koreya Bakur, Iraq, Sûrî, Tirkî, Îran û welatên weke wan ên dewleta netewe di hişkbûnê de israr dikin li helwestên hişk rast tên. Iraq ji bo bibe numûne û êbret, hedef hat nîşandan. Êdî dixwazin ji vê rewşa kaotîk dibe û ji krîzê bi xisareke kêm û hindik birînan derkevin.

Tê guftgûgokirin ka gelo sîstem mîna Romayê bûye xwedî împaratoriyekê. Bêguman di roja me de ji Romayê bi tesîrtir xwediyê rêveberiyeke global e. Çi hêza hegemonîk, çi jî împaratorî be, hêza vê îradeyê xwediyê giraniyekê ye ku cih ji nîqaşê re nahêle. Timî wê hewl bide sîstema xwe restore bike û li ser piyan bihêle. Nîzamên parzemînî yên mîna Yekîtiya Ewrûpayê ji bo Asya, Efrîka û Emerîkayê jî di rojevê de ne. Ji bo Rojhilata Navîn, Projeya Rojhilata Navîn a Mezin pêşde dibin. Difikirin ku Neteweyên Yekbûyî NY reforme bikin. Ji nû ve sererastkirinên civakî, çandî û ekonomîk misêwa di rojevê de ne. Ango li hemberî me û sîstema şaristaniyê ya ku em di nava wê de têne ajotin, herçend di serdema xwe ya herî kaotîk de be jî vala nasekine.

Eger bê pirsîn ka gelo refleksa wê ya lihevhatinê heye yan na, ez ê bibêjim vê rêbazê jî hîç kêm nake. Jixwe di dîroka xwe de rêbaza misêwa serî lê dide û esas encamê jê digire, ev rêbaz e. Sîstem ên hemberî wê çiqasî bê însiyatîfa rêxistin, têgihîştin û azadiyê be, her tim ji pêvajoyên lihevhatinê serketî derketiye. Di mînaka sosyalîzma pêkhatî de bi vê rêbazê di serî de YKSS û Çîn bêtesîr kiriye. Modernîzmê qelsiyên wan ango dewleta netewe, îndustriyalîzm û pozîtîvîzm bi kar anî û ev serketin bi dest xist. Hêzên rizgariya neteweyî û sosyal-demokrat hînê bi hêsanî asîmîle

û bêtesîr kirin. Karîbû tevgerên mîna anarşîst, femînîst, ekolojîst û hin tevgerên radîkal jî marjînal bike.

Tevî van nîşaneyan hemûyan jî hêza sîstemê her tişt nîne. Ji vê jî wêdetir di dema xwe ya herî qels de ye. Eger bereya şaristaniya demokratîk, destketiyên hînê dixwaze, yên hewce û heq kirine nikare bi dest bixe, sedema vê ya bingehîn ew e ku şoreşa paradîgmaya pêdivî pê heye (nêzikbûna zanistî ya bingehîn) hînê bi temamî nekiriye û nikarîbûye xwe bigihîne hêza têrê dike ya bername, rêxistin û çalakiyê. Ev ne ew hedef in ku mirov nikaribe bi dest bixe û nikaribe xwe bigihîne wan. Tevgera şaristaniya demokratîk dikare li nasnameya xwe ya rastî xwedî derkeve ango li azadî, wekhevî û demokrasiyê, dikare analîzên xwe yên dîrokî-civakî xurt bike û bi vî awayî şêweyên xwe yên bername, rêxistin û çalakiyê yên di asta dinya, herêm û xwecihî de ava bike. Konfederalîzma Demokratîk a Dinyayê; ji bo Asya, Efrîka, Ewrûpa û Awûsturalyayê weke konfederalîzmên demokratîk ên herêmî dikarin di rojevê de cih bigirin. Nexasim ji bo Rojhilata Navîn, projeya Konfederalîzma Demokratîk a Rojhilata Navîn ji bo derketina ji rewşa kaotîk a heyî dikare bibe xebateke manedar.

Divê mirov xwe ji helwestên taktîk ên weke 'yan hemû yan jî hîç' dûr bigire, dîsa helwestên weke heta dawiyê şoreş an jî şer û dijberê wan helwesta Hz. Îsa heta dawiyê aştî, li hemberî diyardeya desthilatdariyê ya komplîke û kevneşopiyê nikarin bi tesîr û serketî bibin. Divê mirov berxwedan, serhildan û xebatên avakirinê bike şêweyekî jiyanê, bêyî ku însiyatîfa azadiyê ji dest berde bi tevahiya hêzên sîstemê re li her cihî û demê li hev bike, ev rêbazek e ku wê zêdetir pêşde bibe û bi ser bixe. Lê divê ez dubare bikim ku şaristaniya demokratîk nasnameya me ye û mirov dikare bi hêzên sîstemê re li hev bike, lê bi ŞERTÊ ku divê em zanibin xwe di nava şaristaniya dewletdar de ti carî nehelînin, ji dest nedin, şaristaniya demokratîk ava bikin û biparêzin.

12- Di encamê de ez dixwazim çend xusûsan li ser şêweyê nivîsîna xwe diyar bikim. Wexta min destpêkiribû, min anîbû ziman ku ez ê rêbaza bikaranîna kategoriyên mîtolojî, dînî, felsefî û zanistî di nava hev de bi kar bînim. Ez yeqîn dikim ku ez di vî warî de hinekî jî serketî bûm.

Em nikarin dest ji vegotina mîtolojîk berdin. Nexasim berî dîrokê, dîroka neolîtîk, serdema destpêkê û şaristaniya demokratîk beşekî mezin mîtolojîk e. Di vegotinên zanyaran û efsaneyan de xwe tînin ziman. Eger ji aliyê civakî ve bi awayekî serketî ji hev bêne derxistin wê vegotina dîrokê ji sedî sed bi hêz û rengîn bikin.

Divê ne ku weke hene, pêwîst e ku mirov wan bixe ber şîroveya sosyolojîk û ji sedî sed fikra dînî jî armgumaneke vegotina dîrokî ye ku dest jê nabe. Dîrok heta rêjeyeke girîng bi dogmayên dînî hatiye veşartin. Sedemên vê yekê gelek in. Dîsa bûyerên civakî jî bi piranî di dîn de bi vegotineke xweser cih digirin. Eger bi helwesteke dîrokî-civakî mirov wan bigire dest ji bo agahdarkirinê çavkaniyeke mezin in.

Eşkere ye ku dîrok bê felsefe nayê nivîsîn. Tevî ku ew bi xwe metafizîkeke çor e, teza pozîtîvîzmê a kudibêje ‘bi tenê bi diyardeyan dîrokê vedibêje’ beredayî ye. Pozîtîvîzma ku dîn û fikra fermî ya kapîtalîzmê ye, mîna ku didîrokê de sermayenîne û her tişt ji nişkê ve ji ezmên daketiye Ewrûpayê nîşan dide, ya rastî ev helwest bi xwe jî mîtolojîk e. Wexta ku dînî dibin, serdema modernîzmê ya pûtperestiya objektîv temsîl dikin. Ji lewra ji bo vegotina civakî-dîrokî her tim û zêde bikaranîna felsefeyê, çavkaniyek e ku dest jê nabe.

Ya ez dixwazim bi helwesta zanistî bêjim, ne şêweyên vegotinê yên bi giranî subkektîf û ne jî yên bi giranî objektîf in. Haya min ji wekhevbûn û şibandina hiskirin û diyardeyê heye. Rêbaza min a zanistî, ji ber ku min bi tevahî çavkaniyên behsa wan kir di zikhev de bi kar anîne, dikare weke ‘şîrovekariyê’ jî bê nirxandin. Ji şêwazê min ê analîzê gelekî baş tê fêmkirin ku min giraniya xwe

nedaye objektîvîteyê û min hewce pê nedîtiye. Gelek kesên di mijarê de xwedî gotin wê bi hêsanî karibin bibînin ku ez zêde bi nava sûbjektîvîzmê de neçûme.

Min xwest, bêyî ku ez cudahiya obje-sûbjeyê înkar bikim, jê bibihurim û misêwa hêza şîroveyê pêş bixim, di vê çarçoveyê de eger bi awayekî çor min nikarîbû têrê bikim û kêmasiyên min hebin, dixwazim bêne bexşandin. Eger bê fêmkirin ku min hêz daye hêza maneyê ya her kesê bi civakê re pêwendîdar, ez ê xwe bextewar bihesibînim.